# *Li ser rastî û pêvajoya çareserîyê li Kurdistanê*

•

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

**Li ser rastî û pêvajoya çareserîyê li kurdistanê**

.
Weşanên SORAN e
. Soran lêkolîn
2014
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
https://www.facebook.com/kovaraxwenas
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-981668-67-8

Ya ku civatekê radike serpîyan, pêş dixe û pêşaroja wê ve berê wê didiyê û pêşavaniyê dike jî rewşenbîrî ya. Di vê pêvajoya ku me buhurand de, me ev yek bi awayekî vekirî dît. Rewşenbîrîya kurd, di vê dema dîrokî û ya ku weke serdema ´zanîn û ragihandinê´ tê bi nav kirin de mirov nikarê bêje ku birol û weyna xwe ve bitememî rabûya. Rewşenbîrîyeka ku zimanê civate xwe terikendî, çendî dikarê bi rol û weyneka dîrokî re rabê serpîyan? Ev mijar bi serê xwe, mijereka ku divê ku mirov li ser bisekinê ya. Di çerçoveya vê pêvajoya çareserîyê de, em divê ku vê mijarê jî hildina li dest. Dibêt ku gelek bibêjin ku ma çi eleqeeya pêvajoya çareserîyê û rewşa rewşenbîrîya kurd bi hevdû re heya. Bersiva ku mirov ji vê re werêne ew a ku pêvajo, pêvejoyek civatî ya. Weke pêvajoya bidestxistina maf û azadîya civate kurd jî mirov dikarê bi nav bike. Serkevtin û sernekevtina wê, mijareka din a. Lê ku biserkeve jî û bisernekevê jî, fêr û cerbeka civatî ya dîrokî bo kurdan afirandîya. Emê, di çerçoveya mijarê û hebûna mijarê de, vê xalê esas bigrin û hewl bidin ku bi wê re mijarê bi çerçova bikin. Ev pêvajoya ku wê baxtê rojhilat giştî eleqeder bike, divê ku mirov di vê çerçoveyê de li mijarê nêzîkatîyê bike û di navarok û navika wê de jî civate kurd bi pêvajoyê re fahm bike. Lê em ku ji aliyê civata kurd ve li mijarê binerin, em divê ku vê rastiyê bibêjin ku berî hertiştî divê ku rewşenbîrîya kurd, destê xwe bi civatê re kiriba bin pêvajoyê de û rakiriba serpîyan. Divîyabû ku pêvejoyek ku zimanê civate xwe ji xwe re bikira zimanê rewşenbîrî bide destpêkirin. Lê ev nekirin. Ji rewşek ´sefîl´ xwe dernexist. Bo vê yekê, di çerçoveya dîrok û hebûna civate kurd de weke mecbûrîyekê bû ku em di destpêka mijare xwe de bi dîrokê re gotina ´rewşenbîrîya kurd´ hildina li dest. Ev bo çi giringa? Bo vê yekê giringa ku emê bi vê bibînin ku di demên buhurî de rewşenbîrîya ku pêşketîya çawa civat hilgirtîya, pêşxistîya, lê xwedî derketîya û her wusa parastîya. Her wusa, pêvajoyên bi vî rengî çawa birina sêrî. Ev jî, wê bi serê xwe werina dîtin. Piştî Mîtra re pêvejoyekê destpêkir. Yên ku ev pêvajo pêşxist û kir civatî û biserxist jî asta zanîn û rewşenbîrîya demê bû. Piştre di dema Zerdeşt de jî, ev rewş dihê dîtin. Zerdeşt, dema ku pêvajoyekê dide destpêkirin, ya ku wê pêş dixe zanistên civatê na. Piştre li ser wê serxistina wan re, wê desthilatdarîya Medîya ava bibe. Bi heman rengî, piştî Zerdeşt re heta Dema Manê jî, em vê rewşê dibînin. Em tenê ku ji Mîtra hildina li dest û werênina serdema Zerdeşt û piştî wî re li ya Manî, emê bibînin ku pêvajo bi pêvajo, di vê temenê de çawa serdema ´civate avesta´ hatîya dayîn destpêkirin, serxistin û pêşxistin. Di destpêka mijarê de hewldana fahmkirina rastîya rewşenbîrîyê, bo vê rastiyê giring û jîyanî ya.

## Destpêk: Li ser rastî û dîroka rewşenbîrîyê li Kurdistanê

Bi vê beşa pêşî a li ser rewşenbîrîyê, min xwest ku rastiya rewşenbîrîyê çîya û ne çîya bênina li berçav. Î ro, di nava civate me kurdan de, bi gelek şaşîyên wan re gelek mirov bi navê xwe re wê îdîaya rewşenbîrîyê dihênina ser ziman. Lê gelek ji wan bi rastî, levzekê jî zimanê kurdî nizanin. Di vê rewşe de ka ew dibina rewşenbîrên kurd û ankû na, emê raxina li berçavên wan. Bo civateke rewşenbîrî, jîyanî ya. Bo pêşketina wê û xwe domandina wê ya li pêşarojê jîyanî ya. Lê bo civatekê ku karibê xwe bide domandin û ji wê rewşenbîrîyê sûd bigrê, divê ku çi bê û çawa bê, ew jî pirr giring a. Ya herî giring di mijarê de ev a. Î ro, pirraniya mirovên ku di wê îdîayê de na ku rewşenbîrên kurd in, ew bidestê xwe civate kurd bi nirxên wê re yên dîrokî re bişavtinê (asîmlekirinê) li ser wê dimeşênin. Yanî, bi zanebûnî bê û ne bizanebûnî bê, qatilên

civate xwe na. Weke ku carna pêşîyên kurdan digot, ”ku kûrmê darê ne ji darê bê, wê qalandina darê nebê. Ev gotin, rastîya rewşa mirovên ku di wê îdîayê de na ku rewşenbîrên kurd in, prr baş radixe li berçav.

Li ser rastî û dîroka rewşenbîrîya kurd ku mirov dişêninê, mirov rastî gelek rewşên ên giring tê. Î ro, rewşe ku di sedsala 21´ê de ku rewşenbîrîya kurd wê de ya, gotina ´sefeletê´ jî ji wê re zêde tê. Di rewşeka hê xirabtir de ya. Berî hertiştî, ev rewşenbîrîya ku weke ´rewşenbrîya kurd´ dihê bi nav kirin, zimanê civate kurd terikendîya. Zimanekî din li ser civate ku xwe bi navê wê dihêne ser ziman farz dike. Mirovê rewşenbîr, ku bi koka xwe ji kîjan kokê bê bila bê, ew zimanê ku wî û ankû wê bikarhanîya, wî û ankû wê dike rewşenbîrê wê civatê ku ew ziman zimanê wê yê ya. Ji ber vê yekê ya, ku hin **pêşenivîsar**(´taslak´)ên nivîskarên kurd, ku xwe bi navê rewşenbîrîyê dihênin ser ziman, mirov nikarê wan bi wê gotinê werêne ser ziman. Ev jî, tê we wateyê ku rewşenbîrîya kurd, ji rewşenbîrîya kurd zêdetirî, weke amûrekî lawazkirin û têkbirina civate kurd jî mirov dikarê şîrove bike. Bi wê re jî, divê ku mirov bibêje ku Ziman, hebûna civate bi rêxistin dike. Çerçoveya hebûna civatî, bi nirxên wê ên weke kevneşopî û çandê û hwd re bi ziman xwe dîyar dikin û dihênin ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov, ziman bi giringîyeka mazin werêne ser ziman. Dema ku mirov gotina ´rewşenbîrîyê´ bi navê civatekê re werêne ser ziman, divê ku hingî ew reşenbîrî bi zimanê wê civate û nirxên wê re û her wusa bi dîroka wê êdî werêne ser ziman. Weke berpirsîyarîyeka rewşenbîrî jî ev a. Rewşenbîrî, divê temenê de weke erkek û karekî giring ê civatî jî miirov dikarê bi nav bike.

Civate kurd, xwediyê dîrokek pirr dem dirêj a. Lê rewşenbîrên wê ên ku karibin bêjin me li ser wê dîroka wê bi zimanê wê civatê lêkolîn kirîya û karekî baş bo wê çîvatê kirîya ji ji pênc telîyên destekî derbas nabin. Ji wê zêdetirî, hin taslekên nivîskarên kurd, ku xwe bi navê rewşenbîrîyê dihênin ser ziman, mirov nikarê wan bi wê gotinê werêne ser ziman. Zimanê temenê civatê ya. Stûna civatê ya. Çanda civatê bi zimanê wê re heya û dikeve xizmeta wê de. Civat, xwe bi ziman re bi rêxixstin dike. Li ser ziman re jî bi çend û kevneşopî xwe pêşdixe. Dema ku em civate weke dîmenekî werênina berçav û ji ziman ji nav derxin û bêziman bikin, emê hingî temenê pêşketina civate a bi çand kevneşopîya wê ya bi dîrokê re ji holê ra bikin û tûna bikin û piştre jî bi rêxistinî û pergale civate re êdî civatê bigiştî ji holê ra bikin. Bi teybetî, hebûna civatekê bi ziman û rewşenbîrîya wê re pêş dikeve, bi rêxistin dibe û xwe barî pêşarojê dike. Di vê temenê de dema ku mirov bahse gotina ´rewşenbîrîyê´ dike, mirov weke ku bahse rewşek û pêşketina pirr bi cidîyet dike. Di temenê pêşketina rewşenbîrîyê de rastîyên dîrokî ên civatî ku bi demê re pêşketina û bûna hena. Bi vê yekê û rengê, dema ku rewşenbîrî biaxifê û bêne ser ziman, li gorî wê rastiyê dihêne ser ziman. Li gorî demê bi wate û salix kirina hebûna civatî bi rewşenbîrîyê re dibêt. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku di serdema şariştanîyê de hertimî civat bi aqil dihên bi rêvebirin. Bo vê yekê, weke ku Platon jî, di serdema kevnera de digot ku "divê ku filosof civatê bi rê ve bibin" jî, hin bi hin bi pêşketina serdemên şariştanîyê ên bi aqil re ew dihê kirin. Di vê demê de jî, ya ku dihê kirin ev a. Li vir, ya ku em bênina ser ziman, ne divê ku zane divê ku civate birêve bibin, ji xwe civat bi zanebûnê xwe û pêşaroja xwe diafirêne û bi aqil û hişmendiyê tê bi rêvebirin. Ev weke rastîya ku em nikarin li ser nîqaş jî bikin a. Aqlê civatê, civatîtîyê bi rêxistin û pergal dike. Li ser wê re çand û kevneşoppîya wê

diafirêne, ku çand û kevneşopî di aslê xwe de ji aliyê xwe ve fêr û cerba dîrokî ya civatîtîyê bixwe jî ya. Em divê ku civatîtîyê di vê temenê de bi heyîn û hebûna wê rê ya birêxistinî û pergalî re werênina ser ziman. Her civat, bi hebûna xwe re nirxekê diafirêne û ew jî nirxîtîya şariştanî ya. Her civat, bi serê xwe bi rêxistinî û pergale xwe re di aslê xwe de şariştanek piçûk yan jî mazin a. Dema ku rastîya civatîtîyê ev bê, hingî, em divê ku ziman, di temenê wê rastîya civatî de bi pêvajoyên wê dîrokî ên pêşketî re werênina ser ziman.

Dîrok, rastîya wê girina ku mirov li ser bisekinê. Hebûna dîrokê, xate pêşketina civatî û şariştanîya wê dide kifşkirin û dîyar kirin. Fahmkirina dîrokê bi felsefeya wê re weke karekî rewşenbîrî ê ku nebê nabê ya. Di serdema şariştanî de, bo civateka ku zindî û ku dayimî di nava pêşketina xwe de ya, felsefe û beşên wê yên aqil hemû jî, pêwîstî bi wan tê ditin. Civatek, biqasî pêwîstîya wê bi pêşketina aqilê felsefîkî heya, bi heman rengî ji wê pêşketina civaknasî, deronîvanî, û beşên din ên wêrze(´matamatik´) û bîolojikê û hwd jî pêwîst in. Ev kar jî, dema ku karê rewşenbîrîyê bin, wê çaxê pêwîstî bi rêxistinkirina rewşenbîrî hem ji aliyê aqil û hizirên nava wê ve û hem jî ji aliyê bisazîbûna wê bixwe ve jî pirr giring û jîyanî dibêt. Di vê temenê de pêwîstî bi sazîbûnkirina rewşenbîrîya kurd heya. Rewşenbîrîya kurd, di derbarê dîrok, çand, û felsefeya civate kurd de bêhiş û hişmendî ya. Nezan a. Di derbarê civaknasîya wê de bêfahm a. Zimanê civate kurd, terikendîya. Bi vê re jî ji rastîya civatê û pêşketina wê ya dîrokî, felsefîkî û şariştanî pirr dûr a. Hin mirovên ku bi navê rewşenbîrîya kurd dinivîsênin ku çendî ku bi koka xwe kurd jî bin, bi zimanê tirkî, arabî û farisî dinivîsênin û xwe weke ´rewşenbîrên kurd´ bi nav dikin. Lê ew bixwe jî dizanin ku ew nabina rewşenbîrên kurd. Lê bo ku wê rewşe bidina domandin, hêncetên ku dîtina ew in ku "em ne nîjadperest in", "bo ku mirov bibêje rewşenbîrê kurd hewce nakê ku mirov bi kurdî binivîsênê", û an jî di wê êdîayê de na ku "nirxên civatî ên civate kurd diparêzên". Lê ev gotin tenê dibin hin gotinna weke maske. Ji wê û pê de, ti wateya van gotinan tûna ya. Ku yekî alman karîba bi zimanê ingilîzî û ankû firansî nirxên civate alman biparasta, çima wê bi almanî binivîsanda? Vê pirsê, vajî wê jî mirov dikarê bipirsê. ..

Nirxên civatî, hebûna civatê dihênin ser ziman. BI hanîna wan ya ser ziman re di nava civatê de zanîn û fahm pêş dikeve. Bi wê re jî, civat xwe diafirêne û pêşdixe. Bi wê pêşxistin û afirandinê re êdî xwe barî pêşarojê dike. Ev weke rastî û destûrên xwe parastin û pêşxistinê ên civatî na. Di serî de, di vê warê de divê ku mirov li rastîya rewşenbîrîyê, erk û berpirsîyarîya wê bigerihê. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku rewşenbîrî, hin berpirsîyarên wê ên li ber hebûna rastîyên civatî hena. Ev jî, çi na? Ew jî, ew in ku civat bi rastîyên wê re werênina ser ziman. Î ro, rewşenbîrîya kurd, weke lingekê bişavtin(´asîmlekirin´)a civate kurd jî kar û xabatê dike. Zimanê civate kurd, zimanê kurdî ya. Lê bi zimanekî din ji wê re dinivîsêne û xîtabî wê dike. Bi wê re jî, civatê ji rengê wê derdixe. Bişavtina civatî pêş dixe. Dema ku em bahse hebûna civatan bikin, em bi rengê wan re bahse wan dikin. Ziman, çand, kevneşopî, dîrok, felsefe û hwd, çend ji wan nirxên civatî na. Li ser wan re mirov dikarê bahse wê civatê bike. Lê dema ku ev rastiyên civatî hatina ji holê rakirin, wê rastîya civatî ya wê civatê bi rêxistinîya wê ya ku heyî re were tûna kirin û ji holê rakirin. Her wusa, ziman, giring a. Bi ziman re çand û huner dihê parastin. Çand û hûner, dulingên civatê ên ku nebin nabê ya. Dulingên civatî ên pirr giring in. Civat, xwe li ser wan herdû lingên xwe re dide jîyandin û domandin. Bi vê temenê re divê ku mirov li hebûna civate binerê û wê

hilde li dest. Di vê temenê de divê ku mirov rewşenbîrîyê û berpirsîyarîya wê jî bi erk û karê wê re lêbipirsin. Dema ku di van waran rewşenbîrî, ne bi rêxistinkirî û pêşketî bê, wê çaxê, mirov nikarê bahse ti rewşenbîrîyê bike. Hele bi navê wê civatê, mirov hîç nikarê bahse wê bike.

Emê li bin di dewama mijare xwe de bi berfirehî li ser bisekin in ku di dîrokê de civate kurd, rewşenbîrîya wê heta deverekê berpirsîyarîya xwe hanîya li cih. Lê piştî têkçûna xate civatî a êzdayî û hebûna civatîtîya avestayî ku li ser xate yazdan-melekê tawis-Mîtra-Zerdeşt-Manî-Şêx Adî re êdî pêvejoyak nû dest pê kir. Piştî vê serdemê re em divê ku bahse têkçûna rewşenbîrîya kurdî ya pîretîkî û demî serdestî û serdemîya wê re bikin. Ev jî, weke mijareka ku ji gelek aliyan ve divê ku bi xate pêşketina dîrokê û civatê re were hildan li dest a. Xate rewşenbîrîyê, heta bi serdemên civatên avestayî, serdestîya wê bi serwerî heya. Lê piştre wê hin bi hin bi demê re winda bike. Wê kêm bibe. Wê weke çîraya ku finda wê were kişandin li xwerê wê rohnîya wê kêm bibe û were bermivirînê. Di vê çerçoveyê de weke pêvajoya pêşî a rewşenberîya civatî a kurdistanî û civatî, em pêşî li rewşa hebûna civatên kurdistanî ên avestayî binerin. ..

.

**Serdema rewşenbîrî a civakên avestayî a serkevtî**..

Bêgûman, dema ku mirov bahse rewşenbîrîyê û karên rewşenbîrîyê bike, ku li gorî rstî û rastteqînîya civatî, rastî, têgihiştina dîrokî û hwd ku hatibê kirin bêê, rêz û hûrmetekê pêşî ji mirov bi maf dike. Her wusa, rewşenbîrîtî û dîrokatî, du mijarên ku em divê ku hertimî di çerçoveya dîrok û pêşketinên wê ên bi jîyane civatî re li ser wan bisekin in. Civateka ku rewşenbîrîya wê ji destê wê hatibê girtin, bi awayekî mejiyê wê ji dest hatîya girtin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê bibêje ku mejiyê civatê, hertimî bi rewşenbîrîya wê re heya û xwe dijî. Pêşketina civate, dema ku em bahse wê bikin, bi hezaran salan em dikarin bahse wê bikin. Pêvajoyên şariştanî û her wusa civatî ku pêşketina, temenê wan li ser hebûna aqil a. Di serdemên civatî de, hertimî civat bi aqil bi rêve diçê û tê bi rêvebirin. Ku em bibêjin aqil, rêveberîyê herî serdest ê civate û serdemên şariştanî ya wê pirr di cih de bê. Di vê temenê de divê ku mirov giringiya aqil hildina li dest. Çawa ku dema ku em giringiya aqil bi hebûna civatê û pêşketinên wê yên şariştanî re bigiringî hildina li dest, bi heman rengî, divê ku mirov bi heman rengî bahse nivîsandina dîrokê û heyîna wê ya civatî jî bike.

Li vir, di serî de, berî ku mirov were ser aqil û bahse aqil bike, divê ku mirov hinekî li ser dîrok, dîrokzanî û dîroknasîyê bisekinê û wê bi hanîna wê ya li ser ziman re fahm bike. Ji ber ku ev weke mijareka giring ya ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Dîrok, weke şerebe ku di şûşeyê de ya. Dîrokê jî, em nikarin tenê weke nivîsanaka qaydkirî ku li dîrokê û mejûyê hat kirin şîrove bike û werêne ser ziman. Ji wê zêdetirî wate giringîya wê bo jîyane civateke zîndî û ku hê dijî heya. Rengê nivîsandina dîrokê û hanîna wê ya li ser ziman, hertimî wê xate têreçûyînê ya pêşketinên civatî jî bide dîyar kirin. Ev jî, weke aliyekî teybet ê ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Dîrok, hertimî, bi hebûna xwe re kifşkarîyeka wê ya teybet heya. Hebûna dîrokê bi nivîsandina wê re, ku em bişibênina ´civa´yê wê pirr rast bê. Hertimî ji binî ve kifş dike. Bo vê yekê, felsefeya dîrokê, hertimî û her demê giring a ku divê ku mirov li ser rawastihê û

wê pêş bixe ya. Ya ku pêşketina civatê weke rêveberekî ku bi têgihiştina xwe re bi rê ve dibe û bi wê aqilê xwe yê ku dihêne ser ziman ku bandûrê lê dike jî ev bixwe ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov, vê yekê, weke rastîyeka dîrokî, têgihiştinî, felsefîkî, civatî û hwd hilde li dest û werêne ser ziman. Li vir, ezê hewl nedin ku felsefeyeka dîrokî ji serî heta binî werênina ser ziman, ku ez rabin li ser gotina "rastteqînîyê" re rabin bi gelek awayên wê şîrove bikin û werênina ser ziman. Ev jî, di çerçoveya vê mijarê de bêgûman, divê ku were kirin. Lê emê wê jî, ji bikina mijare nivîsna xwe yên din ên di vê çerçoveyê de.

Hebûna civatî, dema ku mirov bi dîrokê re werêne ser ziman, weke ku mirov di xatekê de bi zindîtiya wê re wê werêne ser ziman a. Dîrok, rengê wê yê têgihiştinê ê bi wê hanîna li ser ziman û her wusa qaydkirina wê, giring a. Bi xwe re, zelalbûnekê bi berpêşarojê re di çerçoveya jîyane civatî û pêşketina wê de di mejî de dide çê kirin. Em mirov û jîyane me ya ku heyî, di hundurê wê xate dîrokê de di temenê jîyanbûyînîtîya xwe de heya. Di vê çerçoveyê de, dema ku mirov wê werêne ser ziman, divê ku mirov bi felsefeya dîrokê re werêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov bibêje ku dîrok, weke lingekî giring ê ku nebê nabê yê di temenê pêşketina mirov ê civatî de ya. Di vê temenê de divê ku mirov bahse hebûna jîyane civatê jî bike. Jîyane civatî, bi jîndayîtîyên xwe yên demên berê re perspektifên xwe yên demên pêş ên bo xwe jî diafirêne. Bo vê yekê ew gotina ku tê gotin ku "pêşaroj, di paşarojê de vêşarî ya" bi awayekî û rengekî di vê gotinê de xwe piştrast dike. Dema ku em dîrokê lê binerin, divê temenê de divê ku mirov lê binerê. Bi vê rengê jî, rengê nerînê ê biaqil, di vê çerçoveyê de xwe dîyar dike. Li vir, weke çawa ku dema ku mirov û ankû pîrka mirov kenzeyekê ji mirov re dihûnê û çê dike ku bo ku miirov lixwebike, bi heman rengî ew kenze çawa hatîya hûnandin û bi çê modelê û awayê hatîya hûnandin, wê bi kenze re were ditin. Hûnandina bidîrokê ya bi jîyane civatî re jî, ji aliyekî ve dişibihê vê yekê û rastiyê.. Dema ku mirov wê hewl dide ku fahm bike, mirov vê yekê bi wê re bia wayekî pirr baş û vekirî kifş dike.

Aqil û ankû rengê wê yê pêşketî ên di serdemên piştre ên şariştanîyê de a felsefê, bi heman rengî giringîya wê ya di nava jîyane civatê de heya. Di vê temenê de dema ku em li şariştanîyên demên berê dinerin, ji serdema qasîtan, û heta serdema gûtîyan, em awayekî têgihiştî ê pêşketinê dibînin. Gûtî-qasîtan awayekî vekirî ê pêşketinê bi jîyane civatî re bi rêxistin kirin û derxistina asta aqil û rengê wê yê felsefeyê û ku em dikarin bi ´felsefeya xwezayê´ re û hwd, re, werênina ser ziman. Piştî wan re, hûrî û mîtannîyan di wê temenê de, weke astaka hê pêşketîtîr di wê xatê de bi pêşketina xwe re xwe dana li der. Zanistvanîya di van deman de kju pêşketîya di çerçoveya hanîna ser ziman bi jîyane civatê re, em dibînin ku pirr pêşketîya. Mînaqên zanistvanî ên weke Mîtra û hwd, di vê çerçoveyê de hizir û aqilekî pirr pêşketî pêşkêşî me dikin. Mîtra, î ro, di sedsale 13 ´min û ankû 12´min a BZ û hwd de jî, navê wî hatîya. Mîtra, bi aqilê xwe yê ku bi zimanê civatê re hanî ser ziman re dîroka dema xwe da kifşkirin. Bi wê re jî, di çerçoveya felsefeya xwezayê de serdemeka nû da vekirin. Di aslê xwe de, em dikarin Mîtra weke pêvajoya navikê ya buhurîna ji felsefeya xwezayê li felsefeya aqlê saf û mantiqê û hwd jî, bi hasibênin. Piştî wî re Zerdeşt, wê vê rastiyê biawayekî vekirî werêne ser ziman. Zerdest, di xate têgihiştin û felsefeya xwezayê de, demeka nû ya ya bi pêşketina aqlê saf a. Bo vê yekê, em nikarin bi tememî felsefeya Zerdeşt, weke felsefeya xwezayê werênina ser ziman. Hinekî jî felsefeya Zerdeşt, di çerçoveya aqlê saf û têgihiştinê wê de teybetmendîya wê ya sereke ew a ku pêvejoyaka felsefeyê ku ji

xwezayê hin bi hin qûtbûn û beyenîbûn pêş dikeve, bi felsefeya Zerdeşt re dihêne ser ziman.

Di vê çerçoveyê de dîroka aqil ya ku bi felsefeyê re û her wusa bi Mîtra-Zerdeşt re dihê ser ziman, em dibînin ku weke serdekema aqil ya teybet a. Ev jî, bi teybetîya wê re dihê ser ziman ku di serdema Mîtra-Zerdeşt de felsefeya xwezayê û ya ku êdî aqlê saf li pêşa û ji xwezayê dûr dikeve di zikhevdû de pêş dikeve. Di nava hevdû de pêş dikeve. Bi wê yekê û rengê êdî pêşketinaka nû ya bi aqil re derdikeve li holê ku mirov dikarê bi teybetî li ser bisekinê. Serdema Mîtannîyan, ku di wê de Mîtra derdikeve û dihê li holê, wê bi têgihiştin, gotin û aqillê Mîtra ku wî hanîya ser ziman, wê rêxistinîyeka xwe ya demî ya teybet bidest bixe. Bandûra Mîtra li wê serdema Mîtannîyan, bi hebûna wê re dîrokî ya. Piştî wî re weke ku çawa ku Bandûra Zerdeşt li derketin û pêşketina Medîya heya, wê were ditin. Ev rewşa bi bandûra Zerdeşt a li Medîya ku ji temen ve, em dikarin weke ya Mîtra di dema Mîtannîyan de werênina ser ziman. Mîtra, di vê temenê de giringîya wî pirr zêde heya. Mîtra, bi felsefeya xwe ya hanî ser ziman re, wê formên olên yek-yazdanî pirr xort û dîyarker bike. Di wê jîyane ku di wê de aqlê saf pêş dikeve û bi wê şariştanî gavek din bi pêş ve diçê re ol û bawerî çawa divê ku hebe û were ser ziman û ankû were kirin, wê Mîtra mînaqaka giring ya wê bê. ..

Mîtra, di vê temenê de kifşkarîyeka wî ya dîrokî ku em nikarin ji wê ti gûmanê bikin jî heya. Her wusa, formên bawerîyê ku piştre wê bi cihutiyê re xwe bidina li der li ser esta qabiletiyê û ankû formên ku bi xiristiyanîyetê re ku li ser asta gerdûnbûnê re xwe didina dîyar kirin, wê rengekî wan yê pêşî bi Mîtra re derkeve li pêş. Li vir, divê ku em vê yekê jî bi bêgûmanî bibêjin ku wê xiristîyanetî û berî wê cihutî jî, wê gelekî ji Mîtratiyê û xate yazdanîtîyê û pêşketina wê ya aqilîya demê ku êdî hin bi hin bi aqlê saf pêş bikeve bigrê. Heta ku wê hinek formên Mîtrayî, xwe di nava van xatên bawerîyê ku piştre li dûv hevdû tên de xwe bidina domandin û jîyandin. Di vê temenê de Mîtra û aqlê wî yê safî, kifşkarîyaka wê ya ji temen ve heya. Bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê bi teybetî jî bibêje ku Mîtratî temenê wê li ser melekê tawistiyê ya. Melekê tawisî, bi felsefeya xwezayê re xwediyê formên bawerî û olî ya. Olê heta ku dem tê demên mîtratiyê, êdî ew formên felsefeyî ên xwezayî ber bi pêşketina aqlê saf ve peresendinekê bi xwe re didin çêkirin û pêş dikevin. Ev jî, temenê wê li ser ´yazdantîyê´ ya. Yazdanî, yanî yên ku tenê bawerîyê bi yazdan tênin û tenê ji wî re bergê dikin in. Yanî ew tenê yazdan(xwûdê) nas dikin. Li ser wan re ji yazdan pê ve ti kes û hêz tûna ya. Piştî wan re, wê êdî temenên pêşketinên bi vî rengî ên bawerî li ser wê xatê werin û biafirin. Li vir, pêşketina Zerdeşt, pirr bale mirov dikişêne ser xwe. Weke ku çawa ku pêşketina Mîtra, di rengê xwe de car bi car weke xateke felsefîkî û car bi car jî weke xateke olî û bawerî were li berçav, wê heman rewş bi Zerdeşt re jî xwe bide li berçav. Ev jî, ji teybetmendiyeka wan ya giring tê ku mirov divê ku bi teybetî wê kifş bike û li ser bisekinê ya. Mîtra, di temenê pêşketina xwe ya olî û bawerî de aqil yekser bikardihêne û hertimî bi aqil tefsîr dike. Yanî, temen li ser aqlê saf a. Hewldana şîrovekirin û her timî hewldana hanîna ser ziman, bi aqil a. Ev teybetmendiya aqil, weke teybetmendiyaka bawerîya Mîtra û bi wî re heya. Piştî wî re Wê bi zerdeşt re ev rewş zêdetirî xwe bide dîyar kirin. Zerdeşt, wê bi tememî olê û bawerîyê di forma felsefe û felsefeya aqil de werêne ser ziman û bijî.

Bo vê yekê ya ku dema ku rengê bawerîya Mîtra-Zerdeşt dihê ser ziman, ji rengê şîroveyeka teolojî-bawerî zêdetirî, şîroveyeka bi aqlê saf-felsefê re dihê kirin û bi wê

re ew û rastîya wan bi aqil û bawerîya wan re dihê hanîn ser ziman. Ev bo dema wan û pêşketina wan giring a. Her wusa, di vê temenê de rengê pêşketina wan, li ser aqlê saf-felsefeyê dimeşêt. Li vir, dema ku em ji vir gavê biavêjin û hewl bidin ku rengê pêşketina-asta demê werênina ser ziman, vê ev gotin û rengê pêşketinê bi pêşketina xwe re pirr dîyarker bin ji me re. Mîtra di dema xwe ya Mîtannîyan de, di vê temenê de oleka ku temenê wê li ser paganîsman ava ya jê dibuhurênê. Gotina bingihîn a bawerîya Mîtra, ´yazdan´ û melekê tawis a. Her wusa, di dema Zerdeşt de jî, wê ev temen hebe. Zerdeşt, bi avestaya xwe û çerçoveyeka wê ya xort re wê beşa dîrokê a dema xwe û piştî wî ku tê ku wê bide kifşkirin dihêne, li laş dide û didêne ber mirovan. Piştî wî re, wê ´civatên avesta´ wê biafirin û werina ser ziman. Ji ber diclê-firatê û heta ku digihijê ber hîndistan û Çînê, di qadaka mazin û fireh a asya de, wê pêşketin û bandûra wî hebe. Li vê herêma berfireh, wê civatên avesta biafirin û serxwe bibin û pêvajoyên şariştanîyê bi xwe re bi buhurênin. Zerdeşt, hê di dema xwe de wî bandûra avesta dît. Ji xwe Medîya, weke nirxeka civatî û desthilatdarî ku temenê wê li ser wê felsefeya wî ya avestayî bû, bû.

Ji serdema ku di wê de Zerdeşt avesta nivîsand û heta serdema Manî ku ew di wê de dijî, wê gelek asir bi buhurin. Wê serdemka ku ne bin 800 salî re ya wê bibuhurê. Di hundurê vê demê de wê civatên avestayî biafirin û pêvajoyên xwe yên şariştanî, çandî, aqilî, bawerî û hwd, pêşbixin, bijîn û bibuhurênin. Her wusa, Zerdeşt-avesta, weke destpêkeka giring a dîrokî di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman. Civatên avesta, bi pêşketina xwe re wê dîroka xwe binivîsênin. Ew dîroka wan ya ku bi aqil û civatî nivîsandin, dem bi dem ew ji astekê di buhurand li astaka din. Ji serdema Zerdeşt-avesta û heta ku dem tê dem û serdema Manî-manîvanîyê, wê pêvajoyên şariştanî ên civatên avestayî bibuhurin. Manî, bi serê xwe weke pêşketinaka dîrokî, civatî, felsefîkî, bawerî, ahlaqî û hwd, ku hê jî mihtacî fahmkirinê ya, pêşdikeve. Hê jî, tevî ku bi ser Manî û dema wî re ser 1800 sal buhurî ya jî, em nikarin bibêjin ku ew bi tememî û bi başî hatîya fahm kirin. Em nikarin, ew rastîya hatîya derxistin li holê bi fahmkirin, têgihiştin û felsefeyê re. Di çerçoveya têgihiştina dûalîstîkî a felsefîkî de, hewldana fahmkirina wî pirr kêm a. Her wusa, ew rengê dûalismê ku dihê şîrovekiriin di çerçoveya laş-gîyan, şev-roj, başî-qancî û hwd de jî, têra fahmkirinê bi wî re û her wusa wê dîroka di temenê wî de nakê. Ev tenê beşeka dûalismê dihêne ser ziman. Dema ku vê rengê dûalismê bi ahrîman û Ahûra Mazda re bênina ser ziman, wê bi dûîtîyekê re werê ser ziman, weke ku di roja me de jî dihê hanîna ser ziman. Lê weke ku Mîtra û Zerdeşt jî, û piştî wan re Manî jî dikir ku em weke bavê Ahriman û Ahûra Mazda ´Zerwan dênina ser serê wan, wê hingî ew dûîtîya dûalistikî bibe pêvajoyaka li binî ya ku pêşketîya. Weke ku çawa ku Ahûra Mazda-Ahriman dûîtîya dûaslîstikî dihênin ser ziman, Zerwanîtî jî, yekîtîyeka bi têgihiştinî, aqlî û çandî dihêne ser ziman. Yanî, li vir, dihê ditin û fahm kirin ku dûalîsm, ne bi serê xwe weke felsefeyekê daye kifşkirin. Dûalîsm, weke felsefeyeka hundîrîn ya xate zerwanîsmê ku zerwanîsm ji serî ve dide kifşkirin û dûîtîya Ahûra Mazda-ahrîman ji li binî wê dide kifşkirin, di çerçoveya hîyererşîyekê de dihê li berçav. Ev jî, weke rengekî din ê felsefîkî ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya.

Manî, di vê çerçoveyê de pêşketinaka wî ya aqilî û hişmendî heya. Lê Manî teybetmendiya wî ya sereke ew a ku ew zanyar, filosof, bawermend û kifşkarê serdemeka civatên avestayî ya. Piştî Zerdeşt-avesta re, ew serdema dirêj a li dora 800

salî û dibêt ku zêdetir jî bê, wê di hundurê wê de civatên avestayî biafirin. Di hundurê vê demê de wê rengê pêşketinê, felsefeya civatî a avestayî, bawerî û hwd jî wê biafirê û xwe dîyar bike. Manî, van rewşan hemûyan dibînê. Bi wê re jî Manî, wê aqilmendîyê(aqilperêzî) dide nîşandin ku bi asta têgihiştin û felsefeya demê re ku wan rewşan bi hevdû re û di zikhevdû de şîrove bike û sentezekê ji wan li gorî demê derxe. Ya ku Manî dike jî ev a. Lê ya ku Manî derdixe li holê, dibêt ku wî jî heyîdar kiribê ku temenê wê li ser felsefe û aqlê saf a. Bo vê yekê, Manî, wê rêbazekî olî û bawerî, ku bi tememî ji serî heya binî bi rêbazên felsefîkî hatî birêxistinkirin derdixe li holê û dide jîyankirin weke rengê bawerîya xwe. Ev rengê ku Manî derdixe li holê, di cih de bi Manî re dide nîşandin. Lê her wusa, Manî jî, bi wê cudahîya ku wî bi olê re hanîya ser ziman dide berçav. Ya ku wê Manî, pirr zêde werêne berçav, wê ev bê. Ji ber vê yekê, di destpêkê de, wê bawerîya Manî weke bawerî jî newê ditin. Heta ku wê bê gotin ku "manî ji rê derketîya". Piştre jî, gotinên weke "rêşaş" û hwd, wê bi navê Manî re werina ser ziman. Lê Manî, di ya xwe de û di serê xwe de zelel a. Ya ku wê piştî Manî re, bike ku Manîvanî yanî rengê pêşketina wî bi serbikeve jî, wê ev bê. Di aslê xwe de, ev rengê pêşketina Manî, berî wê me bi Zerdeşt re dîtibû. Ji ber vê yekê, mirovekî ku heya xwe bide ser Zerdeşt, wê bi hesanî vê rewşê bi jîîyane Zerdeşt re bi başî jî kifş bike.

Manî, weke zerdeşt, temenê têgihiştina xwe li ser aqlê felsefe û civaknasîya civatî didêne. Lê wê bi Manî re, ew aliyê temenî ê temenê civaknasîtî pirr zêde werina ditin. Piştî Manî re, Mezdek, Hûrem û Babek ku tên, wê di şopa wî de bin û di bawerîya wî de bin. Lê wê herî zêde li ser wê rengê civaknasîyê ku Manî bi têgihiştin kirî û temenê wê jî bi Zerdeşt-avesta re heya biponijin. Di dema Zerdeşt de, weke ku bandûraka mazin ya Zerdeşt li ser keyê Medî Dîyaqos hebe, têgihiştina civaknasî ya xort bi wî re xwe dide li der. Heta ku ku weke ´bavê dîrokê´ jî tê bi navkirin Heredot, di pirtûka xwe ya ´dîrok´ê de dihêne ser ziman û dibje ku "dîyaqos, digot ku ´ezê xwe bidim pêşxistina civaknasîya civatê." Yanî, vê gotinê heredot, di temenê ku weke ku Dîyaqos, weke gotinaka beremberî bûyîna keyîtîya wî dihê hanîn ser ziman. Her wusa, di dema Manî û piştî wî re jî, wê heman rewş werina ditin. Mezdek, dema ku li dijî keyê Sasanî Kawê dikevina nava tevgerê de û li dijî wî gotinê dibêjin, wê bi gotinan balê bikişêne li ser "bêadeletîya di nava civatê de ku pêşketî". Bi wê re jî, wê balê bikişêne li ser "dewlemendî û xizaniya ku heya" ya. Ev, gotinên ku di temenê wan de zihniyetek û têgihiştinek civaknasî û felsefeya wê ya xort heya, wê rengekî têgihiştin û felsefeyê bi xwe re werênina li berçav. Her wusa, piştî Mezdek re wê Hûrem jî di şopa wî de herê û di heman şêwayê de gotinê werêne ser ziman.

Em divê ku li vir êdî hinekî jî balê bikişênina li ser pêşketina civatî a demê. Di demê de pêşketina civatî heya û bi civaknasiya xwe re jî hin bi hin pêş dikeve. Felsefe, wêjevanî, helbestgerî û hwd pirr zêde pêşketîya. Ev jî, rengna pêşketina hişmendî ên ku em divê ku bi teybetî balê bikişênina li ser wan in. Xate civatî a avestayî, wê piştî Manî re ser 300 salî re wê xwe bijî. Wê bi hizrên Manî re xwe ji nû ve biafirêne. Manî, teybetmendiya wî ya hizrî, ew a ku hizrên xwe bi felsefîkî bi rêxistin dike û giringîyê dide perwerdekirin û mirovê bizane li şûna xwe kirina desthilatdar. Tîpolojîya keseyetîya zane ku Manî lê hizirîya, weke keseyetîyek pêşketî a demê ya bi zane ya. Ev keseyet, bi felsefe, têgihiştin û bawerîya bi aqil a. Di vê temenê de rengekî civatî a bizane di serê Manî de heya. Manî, di vê çerçoveyê de piştî wî re wê ev serdest bibe. Dema ku em bi xate yazdanîyê re Mîtra-Zerdeşt-Manî werênina ser ziman, her wusa,

weke serdemeka giring a felsefîkî-olî mirov dibînê û kifş dike. Lê di rengê pêşketina xate Mîtra-Zerdeşt-Manî de felsefetî û zanyarîtî li pêştira. Bo vê yekê, dema ku dîrokzanan bahse wan û demên vê xate Mîtra-Zerdeşt-Manî kirina, bi gotinên felsefê weke xatek felsefîkî şîrovekirina û hanîna ser ziman.

Civate avesta û xate wê ya pêşketinê wê ji sedsala 7´min a PZ. û pê de, wê were birrîn. Wê weke ku makas lê wer xistin û were birrin, lê were. Wê piştî vê demê re ola ku nû derket ya Îslamê wê li herêmê di demek pirr kin de xwe pêş bixe û serdest û serwer bike. Wê Ola îslamê, weke oleka desthilatdarîyê jî pêş bikeve. Bo vê yekê, ew rewşên bi Manî û hwd re ku weke ku li desthilatdarîyê ne hizirin û hwd, wê êdî bibina rewşna ku weke rewşna ku lawazîyê biafirênin bin. Ev ne hizirîna Manîyan li desthilatdarîyê wê ji wan re bê temenê rewşeka paşwendî (**dezavantajî**) jî. Li ser wê re, êdî wê îslam bi zorê xwe serdest bike. Piştre jî, wê hemû rewş, têgihiştin û felsefeya hetî û nivîskî, hemû ya civatên avestayî wê were ji holê rakirin û tûnakirin. Bi vê re, weke ku navê avestayî û civate û rengê jîyane wê bi tememî were ji holê rakirin. Ev dem û rewş, bi teybetî divê ku mirov bi dîrokê re li ser bisekinê. Ji ber ku di hundurê wê de gelek mifteyên pêşketinê ên hişmendî ên civatî û hwd di wê de vêşarî na.

Îslam, wê piştre di demek kin de xwe li herêmê bike serdest. Piştre jî, ev rengên bawerîyan, wê yan di nava îslamê de were bişavtin û mihandin û yan jî wê werina tûnakirin û ji holê rakirin û ji dîrokê birin. Di vê temenê de, hanîna ser ziman, seferên artişên îslamê li herêmên kurdistanê giring a. Her wusa, hêrîşên li ser serê bawerîyên kurdistanê ên weke êzdatîyê ku dewama wê xatê na jî, wê têra xwe zanîn û agahî di derbarê dîrok û pêşketinên wê ên herêmê de bide me. Di civatên avestayî de, piştî derketina îslamê û pê de, wê tengezerîya herî mazin ku bi têkçûna wan re bi sînor namêne ku wê wan ji dîrokê jî bibe wê derkeve li holê. Li kurdistanê, wê bi civatî gelek ji wan wê li berxwe bidin. Yên ku birêxistinî wê karibin xwe biparêzên. Wê gelek komkuji jî werina werina serê wan. Wê gelek zîyanê bibînin. Lê wê karibin xwe bidina domandin. Piştî derketina Îslamê û heta sadsale 11´min û pê de, wê pêşketina civatên xate yazdanî wê di reng û formeka din de bi derketina Şêx Adî re derkeve li holê. Her wusa, Şêx Adî, piştî serdema Mîtra-Zerdeşt- Manî re wê weke destpêka serdemeka nû ya li ser wê temenê û xatê wê derkeve. Şêx Adî, wê temenê xwe bi têgihiştin û felsefeya xwe re li ser ´yazdan-melekê tawis re bi rêxistin bike. Yazdan û melekê tawis, bi felsefe, têgihiştin û xate xwe ya dîrokî re temenê serdema Mîtra-Zerdeşt-Manî jî bûya.

Yazdan, her wusa, weke navê wê ´xwûdê´ û wê xatê û mirovên ku bawerî pê dikina jî. Li gorî rêzimanê, ên ku bawerî dikin û ankû ji wê bawerîyê na, ´yazdanî´ na. Li dawîya gotina ´yazdan´ wê tîpa ”î” were zêdekirin û yawêtîyê(aîdîyetê) werêne ser ziman. Ev lêkerîkirin, di zimanê mîtannîyan(kurdiya mitannîyan) de jî heya. Bi vê re wateya gotina ´yazdanî´ jî, ew a ku "mirovên ku tenê bawerîyê bi yazdan tênin" û ankû "zarokên ji yazdan(xwûdê)in na." Î ro di roja me de ´êzîdîtî´yê, mirov dikarê weke hebûna wê xatê werêne ser ziman. Êzîdîtî, bi kevnbûna xwe û dîroka re dîroka wê heta serdemên gûtî, hûrî û mîtannîyan diçêt. Li gorî dîyarde û çavkanîyên ku hin bi hin derdikevina li holê, êzîdîtî weke ola pêşî ya yek-xwûdayî ya. Xwûdayê ola êzîdîtîyê, weke ku navê wê bi xwe li olê û bawermendê wê jî ya, ´yazdan´ a. Melekê tawis, weke bawermend û pêxemberê wê ku ji wî re ji yazdan wahî şandîya ya. Wahî jî, bi ´kurmancî ´ ji wî re hatîya. Piştî Melekê tawis re, di wê xatê de li dûv hevdû, Mîtra, Zerdeşt, Manî û Şêx Adî tên. Şêx Adî, piştî derketina îslamê hatîya. Şêx Adî, bi zanyar û

aqilmendiyaka pirr mazin, ew xate yazdan ku bi navê ´êzîdîtiyê´ bi nav dike ji tûnebûnê xilas dike. Di vê temenê de Şêx Adî, bi xilaskirina vê xate yazdanî a civatên avestayî û hwd re rol û weyneka dîrokî leyistîya. Rol û weyna ku Şêx Adî di dema xwe de leyist, heta roja me jî bi başî û li gorî wê mazinahîya xwe ne hatîya fahm kirin. Şêx Adî jî, weke zanyar û pêxemberên xate yazdan ên weke Mîtra, zerdeşt û Manî, dahîyekî pirr mazin a. Şêx Adî, rastîya civate xwe bi dîroka wê re li berçav girt û projeyek civatî bi rengê ”civate zane´ û ku di temenê wê de ´mirovê zane´ û ´mirovê perwerde kirî´ heya, hanîya ser ziman û li ser wê re xwestîya ku perwerde bike. Perwerde kirîya jî. Dîyardeyên civatî û felsefîkî ên di temenê zanîn û felsefeya Mîtra de xwe disipêrêna aqilê felsefîkî ku bi felsefeya xwezayê û ku hin bi hin ji felsefeya xwezayê divaqatihê û bi ber felsefeya aqil a aqilê saf ve diçê ya. Piştî Mîtra re, ew pêşketina felsefeya bi aqilê saf ku bi Mîtra re hin bi hin pêş diket, wê bi Zerdeşt û avesteya wî re rengekî zelal û safî bistêne. Di vê temenê de Zerdeşt civateka bi aqil di aveste de dihêne ser ziman. Piştî wan re heta ku dem tê serdema Manî, wê Manî wê têgihiştina civatî ku temenê wê li ser aqlê saf a, wê êdî fahm bike û ji wê gavê bi avêje bi berpêşarojê ve herê. Têgihiştina ku bi Manî re derdikeve li holê, di rengê pêşxistina ”civate avesta a zane” ya. Yanî, weke civateka ku bi tememî êdî bi aqle saf dijî ya. Di vê rengê de weke ku Manî Mîtra û piştî wî re Zerdeşt temem dike di wê xate dîrok û civatî de. Bawermendên Manî, pirr zêde bi perwerdekirina mirov ve eleqeder dibin. Hinekî jî, ev nêzîkatî, temenê wê li ser vê rastiya ku Manî bi xwe bi aqilê xwe kifşkirîya û bi wan daye rava kirin a. Têgihiştina civate zane, bi têgihiştina felsefeya bi aqlê saf hatîya şiştin. Manî, di vê çerçoveyê de rengê civate zane, mirovê zane ê ku wê di nava wê civatê de bijî û çawa bijî bi aqilîya wî re dide kifş kirin. Filosofên demê ên weke Spinoza bixwe jî, weke ku di rengekî hewldana fahmkirina Manî de bin, tevdigerihin. Spinoza, çend ku di dibistanaka teolojîkî de perwerdeya didomêne jî, wê bi wê têgihiştina ku di nava wê de perwerde dibînê pirsgirêkan bijî û heta ku tê wê astê ku ji dibistanê jî bê avêtin.Ev rewş hemû bi têgihiştina ku wî li dervî wê girtîya ve girêdayî ya. Nakokîyên di serê Spinoza de li ser awayê civatî û rengê pêdeçûna wê ya di dîrokê de ku afirîn, dijî. ..

Wekî ku Spinoza bawer dikir ku mirov ji du pêkhateyên cuda pêkhatîya. Ew jî, yek gîyan û ya din jî Laş a. Wî bawerî bi hindê hebî ku Xwûdê û Hebûn (Kewn) du aliyên yek tiştî na. Wî ji wî tiştî re digot hêman(*substans)*a. Sipinoza, ramana vê peyvê bi ´hêmanê(diyarde)´ dihanî ser ziman û wî ev hêman jî weke ramana ku ´koka her tiştî´ ya. Ev rengê felsefîkî û hizirkirinê ê Manî ya û berî wî bi hin şêwayna bi Zerdeşt re jî hatibû ser ziman. Lê Manî, ev têgihiştin bi têgihiştinî û felsefîkî kifşkiribû, bi gotin kiribû û hanîbû ser ziman. Ji vê yekê, tê fahmkirin ku Spinoza jî, wê **çûnûhatina** xwe ya di serê de di vê çerçoveyê de dijî. Ev rewş û rengê hanînê a li ser ziman, bo fahmkirina bandûra felsefeya Manî giringa ku mirov kifş bike. Piştre, ev rengê felsefîkî ku Spinoza bi xwe re pêş dixe û temenê Manî û felsefeya wê ya, wê Bandûrê li Descartes û felsefeya wî jî bike. Dahûrî(analiz)yên Descartes ên li ser ”dûalîsmê” jî vê yekê radixin li berçav. Ji vê yekê bi awayekî vekirî tê dîtin ku felsefeya Manî, temen û hêmanê pêşveçûnên felsefîkî ên bi vî rengî ên wek bi Spinoza, Descartes û hwd re (y)a.

Manî, bi zanîna xwe li ser wan re ya. Bandûra Manî, di vê çerçoveyê de bi felsefeya wî ya ku li dema wî û demên piştî wî re ku tên serdest dibe re tê dîtin. Manî, dixwezê ku

di dûalîteya ku heyî ya wê xatê de bi navê Zerwan re yekkirinekê bide çêkirin û çê dike jî. ..

Lê yê ku vê yekkirinê bi felsefe dike û li demên piştre serdest dike jî wê şêx Adî bê. Şêx Adî, dîrokê ji nû ve şîrove dike. Têgihiştineka dîrokî ya nû dihêne ser ziman. Hemû demên berê ên dîrokê ên wê xatê ku ew li ser wê dimeşê di berçav de derbas dike û şîrove dike. Bi vê yekê û rengê, li gorî demê, ji nû ve bitêgihiştin dike. Bawerîya yazdanî, wê bi navê êzdayî xwe bide domandin. Di vê xatê de, wê hin bi hin di temenê mezhebî de formên nû ên vê xatê biafirin. Bi ji nû ve vejînkirina êzdayîyan re, wê yarsanî û ankû yeresanî, feylî, şebekî, Zerdeştî( ku piştî serdema hatina îslamê re bi vê navê dijîn), û hwd, wê derkevina li holê. Wê hin navên din jî bi demê re li van zêde bibin. Ev nav, çendê ku weke navê xatek û ankû ekoleka bawerîyê û felsefeya wê na, wê navê hin komên civatî ên kêmnetewî (etnîkî) ku ji heman civatê jî bin.

Civate kurd, piştî hatina îslamê re, wê heta serdema navîn, wê ji nîvê wê zêdetir wê bina misilman. Lê wê gelek beşên civatê jî, di bawerîya xwe ya kevn de bimênin weke êzdayî, yeresanî, şebekî û hwd. Lê wê rengê jîyane xwe li gorî ya dema nû ku ola îslamê hanîya biadilênin ku karibin bijîn û hebûna xwe biparêzênin û bidomênin. Lê ev jî, wê dem bi dem bê temenê hêrîşên li wan. Bi vê yekê û rengê, civatên kurdistanî, wê bi demê re bikevina nava tengezerîyên mazin ku wê bi hebûna re têkçûnê bi wan bidina jînkirin. Li gorî ola nû a îslamê wê bi demê re zanyarên kurd ên weke Bavê tahirê ûryanî, bavê henifî dinwerî, teymiyê harranî, Êlî herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ahmedî Xanî û hwd, wê derkevin. Wê gelek zanyar derkevin. Lê ev zanyar jî, çend ji wan ên sereka ku bi navê xwe re mohra xwe li dîroka cîvatê xistina. Her wusa bi heman rengî, li aliyê din jî, di xate êzdayîyê de wê piştî Şêx Adî, zanyar û bawermendên weke Şêx Faxrê Adîyan û û hwd wê derkevin ku wê mohra xwe li dîrokê bixin bi têgihiştina bawerîya xwe re. Weke ku çawa ku di cihutiyê de yê ku Musa temem dike Harûn a, di xiristiyaniyetê de yê ku Îsa temem dike ku bi hawarîyên wî re Paulos a, Di îslamê de yê ku hz. Mihemed temem dike Alî ya, Di êzdatîyê de jî yê ku Şêx Adî temem dike Şêx Faxrê Adîyanî ya.

Rewşenbîrîya kurd, xwestîya gaveka giring ji vê demê û pê de biavêje. Bo vê yekê, weke rewşenbîrên demê ku xwestina pêş bikevin, em di vê demê de rastî gelek navan tên. Di nava wan navan de, hin navên ku serkevtî na, ên weke Weysel Qaranî, Bavê henîfê dinwerî, Bavê tahirê ûryanî, Teymîyê harranî, Êlî herîrî, Ebûlîzê Cizîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ahmedê Xanî û hwd in. Weke van rewşenbîrên kurd û ku di rewş û asta wan de na, em dikarin, gelek navên din jî li vir li dûv navên ku me rêzkirin rêz bikin. Lê Wê asta wan jî, heta deverekê bersiv daye dem, serdem û pêvajoyên ku di wê de dijîn. Minaqe rewşenbîrîyê ku di çerçoveya rewşenbîryê de ku li kurdistanê serkevtî ku mirov dikarê werêne ser ziman, minaqe rewşenbîrîya kurdistanî ya bi serdema Yazdan-melekê tawis- Mîtra- Zerdeşt-Manî Şêx Adî ya, weke minaqaka ku serkevtî mirov dikarê werêne ser ziman. Ji ber ku di asta bilind a pergalî de û her wusa ya demografîkî de temenê xwe ji nava civate girtîya. Piştre jî, li nava xalkên din ên herêmên din jî hatîya bihîstin û belav bûya. Biqasî ku pêşî rêz û hûrmeta civate girtîya, piştre ya civatên jî bi mafî girtina. Ev, temen û rewşa serkevtinekê dihêne ser ziman. Piştî ku Îslam hat û pê de, ew navendîtî guharî. Piştî ku wê rewşenbîrîya kurd, navendîdîtya xwe winda kir û pê de, êdî dem bi dem winda kir û rohniya wê mivirt. Lê

wekî din jî, em nikarin bibêjin ku rewşenbîriya kurd di dîrokê de pêşneketîya. Ku em vê bibêjin ku pêşketîya û hebûn nedaye nîşandin, emê di serî de neheqîyê li minaqên weke Mîtra, Zerdeşt, Manî, Şêx Adî, û hwd jî bikin. Bi wan re jî, em divê ku bi rastî wê werênina ser ziman. Kêmesîyên wê çi na, divê ku mirov wan kifş bike û werêne ser ziman.

Minaq, emê weke li jêr bi berfirehî li ser bisekin in, ji ber çi rewşenbîrîya kurd di sedsale 20an û 21´ê de di rewşeka têkçûyî û sefeletê de ya, emê vê rewşê bi bersiva wê re bibînin ku çend pêşenivîsarên kurd ku derketina li holê rastîya dîrok, civata xwe û nirxên wê weke nevend negirtina. Dema ku tê kîjan dever û nirx ji xwe re kir navend û esas girt, wê hemû xabate de ku bi çi navî bê bila bê, wê ji wê re bê, di xizmeta wê de bê û bi navê wê bê. Ev yek, weke rastîyeka ku mirov nikarê li ser nîqaş bike jî ya.

Li kurdistanê, pirsgirêka herî mazin ya vê xalê ya. Ya rastî, î ro di roja me de yanî di sedsale 21´ê yekê de, gelek pêşennivîsarên kurd ku xwe weke nivîskarên kurd û ku gotina netewperestiyê dihênin ser ziman, di derbarê vê gotinê dîrok, têgihiştin û navaroka wê de ne xwediyê ti agahî û zanînê na. Di vê temenê de çend ku xwe weke ´nivîskarên kurd´ bi nav dikin jî, di rewşa sefîlên li ber hêtên sûkan ên sedsalê de dijîn.

Cihane aqil, di serî de bo pêşketina xwe weke cihane şer jî mirov dikarê binav bike û werêne ser ziman. Dema ku mirov dikeve şerekî de ku çawa ku stretejîk û taktîkên xwe kifş dike û li gorî wan ji xwe re rewş û navendan di afirêne, bi heman rengî mirov dikarê wê jî werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de rewşenbîrî, dema ku stretejî û taktîkên xwe yên di temenê pêşketina xwe de dide kifşkirin jî, rastîyên dîrokî ên felsefîkî, dîrokî, civaknasî û şariştanî ên ku hena esas digrê û li ser wan re xwe pêş dixe. Bi wê re jî, pêş jî dikeve. Çendî ku ew pêşket, wê pêş bixe jî. Lê dema ku rewşenbîr, weke rewşenbîrên ku ku di sedsale 20an û 21´ê de di rewşeka sefîl de bijî, wê hingî nikaribê ti pêşketinê bide çê kirin. Dev ji çêkirina pêşketinekê berde, wê li pêşîya pêşketinên ku hena jî bibe astang. Naxasim, dema ku mirov li rewşên van serdeman dinerin, em vê yekê weke rastîyaka civate kurd û ´rewşenbîrên kurd ku dilê mirov dihêşêne mirov rastî wê tê.

Li kurdistanê, civate kurd û civatên din ên kurdistanî ku xwedîyê dîrokek qadîm in, rastîya wan çî ya, mihtacî fahmaka rewşenbîrî a demê na. Î ro ku em bahse civate kurd dikin, em gotina "civate ku xwediyê dîroka herî kevn" bikardihênin. Lê rewşenbîrên wê, çiqasî ew civat mazina û xwediyê dîrokek wusa demdirêj a, di vê demê de wilqasî acuckin û piçûk in û nezan in. Yanî, ji vê aliyê ve jî, rewşeka vajî dijîn. Her wusa ji wê qûdret û rûmetê jî dûr in ku karibin zimanê civate ku dibêjin em rewşenbîrên wê na jî bikarbênin. Wusa, di rewşek pirr xirab de na. Bi vê yekê re, di aslê xwe de, ku mirov bi rastî bibêje, ya civate kurd di vê serdema sedsale 21´ê de kirî rewşek xirab de, ne tenê ew hêrîşên hov û xadar ên li ser serê wê na. Her wusa, ev rewşên rewşenbîrên wan jî na. Civatek, çendî ku hêrîş lê biibin, ku xwediyê navendîtîya xwe ya civatî ku dayîmî xwe diafirêne bê, wê karibê hemû hêrîşên ku bi çi cûreyê û astê bin himbêz bike û bersiva rast bide wan û wan bêbandûr bike. Li vir, ev gotin pirr rast a ku di vê demê de tê gotin

ku "zanîn hêz a." Dema ku zanîn hêz bê, wê çaxê, divê ku mirov fahm bike, ku civate tenê dikarê bi wê hêzê bijî. Zanîn, ne ew a ku çend pirtûk werina nivîsandin a. Zanîn, aliyekê wê jî ew a ku di çerçoveya rastîya civatî û serdemê de rêxistinîya wê were kirin û pêşxistin. Bi wê re jî, bi zanebûnê re civate bike weke navend û wê navendîtîyê pêş bixe. Ev gotina navendîtîyê, em bi zanebûnaka pirr alî bikar dihênin. Bo vê yekê, divê ku mirov hinekî jî, bi teybetî balê bikişêne li ser wê. Navendîtî ew a ku dema ku bi gotina rewşenbîrîya civatî re civat hat xistin weke navendekê, hingî çendî ku zanîn pêşket û pêşveçû, wê ew civat jî weke navendekê wilqasî pêş bikeve û pêşve herê. Ev bi hevdû re di nava ahang û hevrastîyekê de na.

Ya ku ji mejiyê civate kurd bi gotina rewşenbîrîyê re hatî derxistin û tûnakirin ev rastî bixwe ya. Bo vê yekê ya ku bo pêşenivîsarên kurd ku xwe weke nivîskarên kurd bi nav dikin, giring nabê ku bi zimanê civate kurd binivîsênin û civate xwe weke navendekê şariştanî derxina li pêş. Hinekî jî, di temenê pêşxistina van aliyan de jî, têgihiştina civatî bi dîrok û rastîyên wê re di temen de cih digiriê. Civate kurd, li vir, divê ku mirov bibêje ku zanîna xwe ji rewşenbîrên xwe nagirê, ji nava xwe digirê. Car bi car, dema ku em dibêjin û bahse civatê dkin û em bahse ´çand û kevneşoîyên wê´ dikin. Ev rastî, wê didin domandin. Ku civate kurd ne xwediyê dîrokek demdirêj van kevneşopîyên xwe ba, dibêt ku nûha meyê bahse wê jî nekiriba. Di sedsala 21´ê de, weke tevgerek rewşenbîrî derket li holê tegera azadîya û serokê wê Birêz Ocalan bû. Di vê temenê de, wan karî ku xwe bikina weke navendekê. Lê di temenê bi rêxistina wê zanîna van herdû dîyardeyên civatî ên kurdistanî û ku di sedsale 21´ê de derketina li holê de jî, kêmesî hena. Her wusa, wê çawa zanîn were bi rêxistinkirin û ji wê sûd werre girtin, di wan waran de pirr kêmesî hena. Sazîyên xwe yên rewşenbîrî û her wusa pêşketina têgihiştinî li gorî rastîya civatê û têr ne afirandina. Ev jî, valahiyekê diafirêne. Her wusa, civateka weke civate kurd ku zimanê wê qadaxaya û nikarê bizimanê xwe êdî xwe perwerde bike, ji van aliyan ve rêxistiniyên wê pirr giring in. Di van waran de, gelek kêmesî hena. Li ser tevgera azadîya kurd re em gotina "tevgerek rewşenbîrî" bikardihêênin, lê ev gotin di jîyane de bi zanînî çawa mirov dikarê şenber bike û dêne li berçav jî, ew jî, aliyên din ên bikêmesî na. Rexneyên birêz Ocalan ên di van waran de ku di cih de na, divê ku mirov li vir wan bibîr bixe. Rewşenbîrîya kurd ku hê heta roja me, civate xwe nekiribê weke navend ji xwe re û zimanê civate hê terikendî hiştinê û weke zimanê xwe yê rewşenbîrî pêşnexistibê û bi wê re jî weke sefîlên sedsale 21´ê ên li ber hêtan dijîn bin, ev dide nîşandin ku hê ew rexne baş fahm nekirina û li gorî wan başkirinaka û têgihiştinek di nava xwe de çênekirina û xwe bi pêş de nebirina. ...

- rewşenbîrîya kurd divê ku xwe nas bike, rastîya xwe ya dîrokî li berçav bigrê û xwe ji serî heta binî di berçav de derbas bike. Rexnekiirna li xwe, temenê xwe ji nû ve afirandinê ya. Dema ku rewşenbîr nikaribê vê yekêê bi xwe re pêş bixe, wê çaxê, wê nikaribê wê ´sifatê´ rewşenbîrîyê jî bi navê xwe re werêne ser ziman. Di serî de divê ku bi zimanê civate xwe xîtabê ji civate xwe pêş bixe. Ji vê xalê jî divê ku gav bavêje û dîroka civate xwe werêne ser ziman. Civatekek, tenê û tenê di temenê parastina hebûna wê de mirov dikarê bizimanê wê xîtabî wê bike. Ji wê zêdetirî jî, mirov dikarê bahse ti tiştekî din bi wê re bike. Rewşenbîrî, rastîyên civatê fahm dike û wan derdixe têgihiştinê û zanîna di derbarê wan de di nava civatê de diafirêne. Bi wê re jî, temenê parastina civatê di demê de bizanînê diafirêne. Zanîna civatê, bi dîrok, felsefe, civaknasî,

deronînasî, werzê û bîoloji û hwd, bi hemû beşên wan re di nava civatê de di temenê bersivdayîna civatê de dihên birêxistinkirin û pêşxistin. Ev alî hemû weke aliyna ku mirov bi teybetî li ser wan bisekinê na. Civatek, bi dîrok û felsefeya xwe ya, hebûna xwe bi kevneşopî û û çanda xwe pêş dixe. Û çendî ku bi wan aliyan re pêşxist jî, wê xwe hilbêrêne û pêşve bibe û pêşaroja xwe ava bike. Civat, bi têgihiştina wê re gelemper a. Mirov, bi kesena bi wê dijî. Mirov, bi kesena çendî ku bi wê dijî û wê bijî, civat jî, di temenê têgihiştineka hîyererşîyekê de bi kesyetî re xwe bi rêxistin û zanîn dike. Kes, meneya binî a civatî ya. Di vê temenê de, fahma wê pêş dikeve. ..

- Dema ku em bahse civatê bikin di serî de em divê ku dîroka civatê di serî de hildina li dest û fahm bikin. MInaq, dîroka civate kurdistanê a rewşenbîrîyê ku em di perspektifîya rewşenbîrîyê û dîroka wê ya civatî de hildina li dest, di serî de divê ku serdemên giring ên rewşenbîrî û pêşketina civatî ên destpêkekê ên weke ya yazdan-melekê Tawis-Mîtra-Zerdeşt-Manî-Şêx Adî were fahm kirin. Ev serdemeka têgihiştinî a felsefeyê û civatê ya pêşketîya. Pêvajoyên wê serdemê ên felsefeê di çerçoveya felsefeya xwezayê de tên ser ziman û pêvajoyên dawîyê jî di çerçoveya felsefeya aqil û ji xwezayê ku qûtbûyî dihê ser ziman. Lê pêvajoyên berî vê serdemê ên pêşketina bi aqil ku ji demên neolîtîkê û sûmeran û hwd jî, divê ku ew jî, weke serdemna dîrokî ên li pêşîya wê ku temenê vê serdema aqil ya yazdan-melekê Tawis-Mîtra-Zerdeşt-Manî-Şêx Adî ku li ser wan rûniştîya ya. Di vê temenê de bi demên civatî û dîrokî re dema qasît-gûtî re destpêka vê demê tê ditin. Dema hûrî-mîtannî-Medîya jî, weke serdemeka yekqat ku divê ku mirov werêne ser ziman a. Di vê temenê de, dîroka civatê, divê ku bi teybetî bi hemû rengênn wê werina ser ziman. Me li jor, tenê di xate jîyane yazdan-avesta de pêvajoyên rewşenbîrî ên vê xatê hanîn ser ziman. Lê bêgûman ji hin aliyna din ve jî, bi derfeta ku mirov dikarê fahm bike û werêne ser ziman. Ev serdem di hundurê xwe de gelek dem û pêvajoyêyan di hawêne. Ev hemû jî, weke lebratûwara rewşenbîrên vê civatê ên di farqe wê de na.

- civate, ol û bawerî bi têgihiştin û têkiliyên wê ên bi hevdû re divê ku mirov li wan bihizirê û werêne ser ziman. Î ro, dema ku em bahse dîroka herêmê dikin, em dibêjin ku ev herêma mesopotamya, destpêka di hemû bawerî û rengên têgihiştinî ên dîrokî ên ku pêşketina de ya. Ev gotin çendî rast a, ev çendî jî, di derbarê wê û fahmkirina wê de kêmesî û ne hanîna li ser ziman a wê heya. Li vir, di serî de divê ku mirov bi dîroka civatê û civaknasiya wê re û her wusa ku weke ku çawa ku pêşketîya û ev civatîtîya ku vê herêmê ku ji xwe re kirîya navend, divê ku mirov wê weke rastiyê esas bigrê û bi wê re li gorî rastiya wê werêne ser ziman. Rastîya bawerîyan, zaynar û rewşenbîrên vê axê û her wusa pêşketina dem bi dem a civatî bi teybetmendiyên wê re divê ku mirov bike mijare lêkolînê û li ser biponijê. Li kurdistanê, bi vî rengî, divê ku mirov werêne ser ziman ku dîroka wê pirtûkxaneya wê ya. Lê ev pirtûkxaneya wê ne hatîya nivîsandin. Anî jî, ku hatibê nivîsandin jî kêm hatîya nivîsandin. Em dema ku bahse serdema Sûmer dikin, em bahse serdemaka ku ser 6000 salan re dikin. Dibêt ku ji wê zêdetir jî bê. Lê li vir, li gorî wê hanîna ser ziman, giring a. Hanîna ser ziman jî, bo parastina vê civate vê axê ya weke dewama civatîtyên wê demê ya, mecburîya. Di vê temenê de, rewşenbîrî, di bin mecburîyaka dîrokî ya biahlaqî de ya ku divê ku bi mecburî werêne li cih a. Wekî din, ku ne hanî li cih ev berpirsîyarî, piştre ku çi komkuji li ser vê civatê û civatên vê

axê ku bibin, biqasî yên ku ew komkuji hanîna serê civatê di demên dîrokê de ew rewşenbîrî jî divê ku xwe weke wan yên ku ew kirina bi berpirsîyarî bibînê.

Civatên avestayî, ji sedsale 6´min û pêde, weke ku hebûna ya bi dîrokê bi makas lê were xistin û were birrîn lê hat û êdî bi carekê hebûna wan ya ku heta wê demê xwe domand, êdî ew domandina wê weke di wê demê de lê nûqta were xistin lê hat. Ev jî, mijareka ku bi serê balkêş a ku mirov divê ku li ser bisekinê û rastiya wê rohni bike ya. Her wusa, biqasî, jîyane civatên avestayî a bi hezaran salan ku divê ku divê ku were ser ziman û fahm kirin, bi heman rengî sekinîna domandina wê jî, divê ku mirov biawayekî vekirî li ser bisekinê. Ev jî, weke mijareka giring ku dikeve ser milê vê rewşenbîrîyê de ya. Zanîn, weke ku çawa ku dikarê hemû rastîya ku hatina jîyandin derxe holê û rohni bike biheman rengî jî dikarê parastina cewherî û dîrokî, û hwd pêş bixe bi rastî û dîrok û hebûna civatî û navendîtîya wê re. Em li vir, divê ku vê rastiyê bi teybetî li ser bisekin in û wê fahm bikin. Rastîya civatên avestayî û fahmkirina wan, wê temenê afirandina serdema me ya î ro jî bê. Rastîyaa civatên avestayî, weke serdemeka bi hezaran salan, rastîyaka dîrokî ya dîrok û civatên kurdistanî ên roja me na. Di serî de divê ku mirov vê yekê û rastiyê werêne ser ziman. Bi windakirina civatên avestayî re civatên kurdistanî ên kevnera ên vê axê yên qadîm windakirina. Hatina ji dîrokê birin. Dîroka wan jê birin. Her wusa, dîroka wan ya ku wan civatan bidestê xwe nivîsandina, ew jî hatina tûnakirin û ji holê rakirin. Di aslê xwe de, tûnakirin û jenosîda civatî ya ku li mejiyê civatê hatîya kirin a. Ya ku herî zêde bandûra wê li civatê heya jî ev bixwe ya. Dema ku civatek were xwestin ku ji dîrokê were birin, pêşî, hebûna wê ya ku xwe bi dîrokê re dide domandin tê tûnakirin û pêşîya wê ya xwe ku didomêne bi dîrokê re tê ji holê rakirin. Ev jî, bi ji holê rakirina mejiyê ku hatî hat nivîsandin û her wusa mejiyê ku di hizirê jî ku pêşîya wê were girtin a.

- Kurdistan, bi dîroka civatên xwe yên kevnera re heya. Her wusa, dîroka civatên avesstayî ê kurdistanî, pêvajoyeka mejûyî ya dîrokî diafirêne. Divê ku mirov cihekî giring bide wê. Tevî, hebûna civatên avestayî hatina ji dîrokê birin jî, di bin navê nêzîkatî û rêxistiniyên mezhebî ên weke Manîvanîyê, yeresanîyê, şebekîtîyê feylîtiyê, êzdayîtîyê û hwd re xwe domandîya. Ezdayîtî, teybetmendî wê ew a ku xate navendî ya civatên avestayî ya jî. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov li ser wê bisekinê û wê fahm bike. Di dîrokê de ev rastî, hatina jînkirin. Her wusa, civatek, çendî ku bi teybetmendîyên wê re hat parastin, dikarê were parastin. Civatîtî bixwe jî, temenê wê xoslet û teybetmendiyên civatîyane na. Mirov, bi wan dijîn. Her wusa, dîroka wan teybetmendiyan, temenê pêşketinên civatî jî diafirênin. Fahmkirina wan, hinekî fahmkirina rastiyên civatî ên giring in. Em divê ku rastîya civatî ku çi ya, di wê temenê de teybetmendiyan werênina ser ziman.

Rewşenbîrî ya kurdistanî, ku bi civate xwe ya kurdistanî re navende xwe çêkir û afirand, wê karibê hem li herêma xwe giştî û hem jî li cihanê bibe navendek li pêş. Ev bi temenê wê yê dîrokî û jîyane wê ya civatî a kevn re xwedî derfet a. Dîroka civatê di vê temenê de divê ku mirov wê hilde li dest û fahm bike. Li kurdistanê, bêgûman dema ku miov bahse rewşenbîrîyê bike, wê di cih de serdemên wê ên dîrokê ên kevnera werina bîra mirov. Bi wê re jî, wê di cih de navê Mîtra, Zerdeşt û Manî û hwd werina berbîra

me. Ev rewşenbîrna civatî ku bi weyn û rola xwe ya civatî û demî re rabûna na. Berpirsîyarîya xwe demî hanîna li cih in. Di vê temenê debi rêz û hûrmet bahse wan bikin. Pêvajoyên felsefeya civatî a bi aqil û û hwd, ên wan bi hizrên xwe pêşxistina, wan civate xwe weke navende bijartina û li ser wê re qaviztina li nava civatên din jî. Di vê temenê de, divê ku mirov rastîya wan baş fahm bikin. Pêşveçûna ku bi hizrên xwe re van mirovan derxist li holê, serdem û pêvajoyên piştre ên pêşketinê jî dane kifşkirin. Di vê xatê de, weke pêşketinên têgihiştinî û olî ên weke êzdatîyê navendna civatî ên rewşenbîrî jî na. Mirov dikarê bi vî rengî jî, wan birêxistin bike li gorî demê. Her wusa, ev navendên felsefîkî, bi li gorî demê şîrovekirina wan û bi pêşxistina wan re temenê pêşketina civate giştî a kurdistanê bi navendîtîya wê re êdî dihê pêşxistin û afirandin. ..

**Sefîlîya rewşenbîrên kurd di sedsale 20´an û 21´ê de.**

**Ku civate kurd di sale 2014´an de jî, hê jî zimanê wê qadaxa bê û mirovên ku xwe weke ´rewşenbîrên kurd´ didina nasîn ku bi zimanê tirkî bo civate kurd dinivîsênin û li ser navê rejimê bişavtina civate kurd pêş dixin, ji vê gotinê sefîlîyê û pê de, rasttir ti gotinên din tûna na ku mirov bo wan bikarbêne. Rêz û hûrmeta li civatekê, bi wê pêwîstî pê dide dîtin ku mirov bi zimanê wê xîtabî wê bike. Ku mirov bi koka xwe ji kîjan kokê bê, ew mijareka din a, ne mijara nîqaşa me ya. Lê her civat bi kok û rengê xwe re rêz û hûrmetê heq dike. Weke pêwîstîyaka wê rêz û hûrmetê ya ku dema ku mirov xîtabî wê civatê bike mirov bi zimanê wê xitabî wê bike. Dema ku zimanê civate kurd ku zimanê kurdî bê, û ez herim bi zimanê tirkî xîtabekê li wê pêş bixim, ez nikarim bahse rêz û hûrmeta xwe ya li wê civate ku bikim, ku ez bixwe jî ji wê bim. Bi heman rengî, bo civatên din jî wusa ya. Ku ziman, wilqasî ne giring ba, tenê zimanê ingilizî bo hemû civatên ewropî bes û têr bû. Em rewşenbîrekî kurd bikina cihê yekî ingilizî de û civate kurd jî bikina cihê civate alman de, ku bila bi ingilizî ji wê re binivîsênin. Wê civate alman, çendî ew mirovê ku bi ingilizî dinivîsand fahm bike, ew çendî jî mirovekî ji civate kurd rewşenbîrekê ku bizimanê tirkî dinivîsêne fahm dike.** Yekî firansiz ku bi firansizî dinivîsêne û dibêje ez civate alman di parêzêm, ev çiqasî rast bê, evçendî jî dema ku ´rewşenbîrekî kurd´ bi zimanê tirkî dinivîsêne hebûna civate kurd diparêzê. Em dema ku li rewşe rewşenbîrîya kurd binerin, em divê ku bibêjin, em demên ku weke ´demên hemdem´ tên bi navkiirn de rewşa rewşenbîrîya kurd sefîlane ya. Rewşa rewşenbîrên kurd jî, di rewşa sefîlên li ber qûncikên li sûkan a. Ji wê ne buuhurî ya. Mirovê sefîl, li sûka dijî. Kar nekê. Yê ku di ber tê û diçê, destê xwe jî lê dikeve ku tiştekî bidîyê de. Yanî, bi gotinaka din bi hajarîya xwe re parsektîyê dike. Civetaka weke civate kurd xwediyê dîrokeka wilqasî kevn û demdirêj, çendî bo wê xamginîya ku rewşenbîrên wê di rewşek bi vî rengî de ya, bi hajarî parsektiyê dikin. BIla xelat newê fahm bikin. Ez vê gotina haharî û parsektiyê di temenê rewşa rewşenbîrên kurd de dihênim ser ziman. Xwe kirina rewşek wusa de ku mirov lli dîroka civate kurd dinerê, mirov ji wan fihet dike. Di nava kurdan de goinaka xalkê de heya. Ew jî, ew a ku tê gotin ku "ma ev mala wusa mazin ev mirovê pîs çawa jê derket", Bi vî rengî carna rewşna jî tefsîr dikin. Ya rastî, rewşa rewşenbîrên kurd ji vê xirabtira jî. Lê ya ji vê xirabtir jî, ew a ku ev mijarê wilqasî ketî û piçûk û bi hajarî parsektiyê dike jî, wê rewşa yan nabînê û yan jî ku bibînê jî herê nakê. Ev jî, ya herî xirab a ku mirov divê ku li ser bisekinê ya.

Rewşenbîrî, berî hertiştî zanyarîtî û hişmendî ya. Gotina rewşenbîrîyê jî, temenê wê

li ser ya ´rewşen´ a ku tê wateya rohnîbûnê, rohnîkirinê, biaqil dîtinê, mirovê xwedî têgihiştina heqiyê û li heqiyê xwedî derdikeve ya. Di vê temenê de mirov dikar bahse gotina rewşenbîryê bike. Ji wê zêdetirî jî, rewşenbîrî, bi wateya xwe re bahse mirovê ku rê şanî dide jî dike. Di vê çerçoveyê de, mirov li gotina rewşenbîryê bixwe jî dinerê, mirov dibînê ku cihê wê rewşa rewşenbîrên kurd ku ew bixwe di wê de na, di hundurê gotina rewşenbîryê de tûna ya. Di serdemeka ku zanîn û ragihandin bûbe weke xosletên wê mirov nikarê mirovekî bi çend nivîsan û ankû gotinan weke rewşenbîr bihasibêne. Ya rastî ew aku di demên berê de jî, wusa ne hatîya hasibandin. Ji wê zêdetirî, mirovê ku bi hişmendî afirandîya û pêşengtî bi têgihiştin û zanîna re di hundurê dîrokê de kirîya ya. Di serdemên buhurî de, ev gotin û maneya wê, li gotina ´pêxemberîyê´ hatîya kirin û bi wê hatîya ser ziman. Pêxemberên serdemên kevnera zanyar û rewşenbrîên roja me na. Lê mirov bo ku wê gotinê bi maf bike jî, hinek şert û mercên wê jî hena. Ew jî, ew in ku pêngavan bi têgihiştinî û felsefekî û di jîyanê de bi civatê bide avêtin. Mirovê bi vî rengî, di serî de, ku di çi sert û mercê de bû, ew serkêş û pêşeng a. Ji xwe serkêşî û pêşengî, di nava wate û maneya gotina rewşenbîrîyê de heya. Di serdemên berê ên civate kurd de, li civatênn kurdan, mirovên pîr ku weke ´pêşengên civatê´ dihatina ditin dirûniştin. Wan ditin û serborîyên xwe ji hevdû re di nava civatê de dihanîn ser ziman. Li hevdû dihisandin. Mirovê herî zane û ku karîbû gotina baş bihanîya ser ziman, diaxift û herkesekî jî lê dihisand. Lê ew mirovê ku di axift jî, ji rastîyên civatî, dîrokî û ahlaqê civatê diaxift û dihanî ser ziman. Bi gotinên xwe re wan mirovan weke ku civatê perwerde bikin diaxiftin. Bo vê yekê bû ku, car bi car mirovê kurd jî ji zaroyên xwe weke ´şîretekê ku lê dikirin´ dihanîn ser ziman ku ´herîn li civatekê rûnihin û li ser çend gotinên mazinên xwe bihisênin, da qana win jî çend rastîya ji wan bigrin di serê xwe de. ´ Ev, weke kevneşopîyekê jî ya. Ev gotin, dema ku tê ser ziman, ji serî heya binî. kevneşopîyeka civatî dihêne ser ziman.

Civate kurd, di vê temenê de divê ku mirov werêne ser ziman ku xwediyê gelek pêşengîyên ku ´dunya dîtî´ bûn. Mirovên ku pîr û kal, weke ´mirovên dûnya dîtî´ bûn. Ji xwe, pîr û kalên civatê, ku weke çînaka serdest hertimî bi hebûn û gotin bûn, hinekî jî bi sayaserê vê rewşê bû. Li kurdistanê, ev rewş, pirr giring a ku divê ku mirov li ser bisekinê ya. Di nava civatên kurdan de, ên ku hertimî bi gotin bûn, hozanên civatan bûn, pîr û kalên civatê bûn û mazinên ku weke pêşeng û mîran ku civat bi rêve dibirin bûn. Di vê temenê de rewşeka rewşenbîr bû. Di vê temenê de bi vir ve girêdayî divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku van beşên civate kurd, bi civatên xwe re navendîtîyek civakî afirandibûn di nava civatê de ku di wê de hertimî hizrên xwe ji civatê re dihanîn ser ziman. Ew civat, weke zanîngehên xweza ên civatê bûn. Weke navendên ku ji wan aqilê civatê dihat ditin bûn. Mirovê zane, di wan civatan de diaxiftin. Lê dema ku di axiftin jî, ku kî jî ba, wê li zimanê wî bihata nerîn. Çendî dikarê zimanê xwe baş bikarbêne. Çendî serdestîya wan bi zimanê wan hebû. Ev, weke mijarna ku cidiyeta wan mirovên ku bi zaneyî ku diaxiftin jî ku dide kifşkirin bû. Ziman, di wan civatan de, hertimî weke mijareka sereka ya civatî ku nebê nabê dihat ditin.

Lê mixabin, î ro, yekî ku xwe weke "rewşenbîrê kurd" bi nav dike, dikarê bi rehetî bibêje ku "ziman ne giring a." Ev gotin, hinekî rewşa nezanîya mirov jî dihêne ser ziman. Ev gotin, dide nîşandin ku mirov çendî ji rastîya civate xwe dûr ketîya. Sefîlî, bi ji rastîya civatî dûrketinê re pêşketîya. Ya ku di serî de di vê serdemê de rewşenbîrên kurd bibinin jî ev bixwe ya. Heta ku vê rastîyê nebînin, wê nikaribin weke rewşenbîr

werina herêkirin û rûmeta civatê bi rêz bidest bixin. Rastîyên civatî, çi na? Hertimî, em van gotinan dihênina ser ziman. Ev gotin, vala nayên ser ziman. Bi sedem û armancakê tên ser ziman. Ew serdem û armanc jî, xwe bi hebûn û rastîyên civatî re biwate dikin.

Çerçoveya têgihiştina gotina rewşenbîrîyê ew a ku mirov çendî li gorî rastiyên civatî bizanebûna û dijî ya. Bi wê re jî, çendî ew fahm kirina. Herî hindîk, ev ast û pîvan, weke pîvanna ku nebin nabin a. Lê wê zêdetirî jî, ku em asta û pîvana demê re û bi hebûna serdemmê û zanîna wê re werênina ser ziman jî, di çerçoveya wê de jî, di temenê pêşxistin û bi têgihiştina li gorî demê û gihandina hebûna asta civatê li wê radeyê û pêşxistina temenê civatê ê pêşketin û parastina wê di wê demê de jî, çend ji wan ast û pîvanên demkî na ku mirov divê ku wan li gorî demê werêne ser ziman in. Rewşenbîrî, di vê temenê de, parastvanê nirxên civatî û mirovatiya wê na. Li wan xwedî derdikeve. Bo xwedî derketinê jî, wan kifş dike, fahm dike û di keseyetîya xwe de digihêne têgihiştinê û zanînê û piştre li gorî wê dihêne ser ziman. Her wusa, di vê temenê de, bo parastina civatê bi nirxên wê re ziman, hebûnaka ku mirov nikarê li ser nîqaş bike ya. Dema ku em li ser hebûna zimanê civatê û weyn û rola wê ya dîrokî ku em nîqaşê jî bikin wê dîrok me afû nekê. Ji xwe, ew nîqaşkirin ku derbarê ziman de bê, dibe nîqaşek hebûn û nebûnê di derbarê civatê bixwe de jî.

Di vê temenê de rewşenbîr, ku em bahsê dikin, em dibînin weke ku em bahse keseyetek kifşkar ya di nava civatê de dikin. Ev keseyet bi ziman, têgihiştin û zanîna xwe re ku li civatê xwedî derdikeve ya. Bi wê re jî, keseyetîya rewşenbîrî, weke ku di demên berê de di çermê pêxemberan de hatîya hanîn ser ziman, çawa dibe ku di vê demê de bi wê rengê bi hesan dikarê were şîrovekirin û ser ziman? Î ro ez bixwe, dema ku ez dixwezim keseyet rewşenbîr bibîr bikin û werênima berçavê xwe, keseyetîya Mîtra, keseyetîya Zerdeşt, keseyetîya Manî û hwd dihên berçavên min. Bi vî rengî, keseyetîyên ku hena, em dikarin weke keseyetîyên rewşenbîr ku bi weyn û rola xwe ya dîrokî ve rabûna na. Rastîyên civatî hanîna ser ziman, pêşxistina û parastina. Ji ber ku ev jî, wan ji xwe re weke erkek pîroz dîtina. Rewşenbîr, dema ku bahse gotina "pîrozî"yê bike, di serî de, divê temenê de weke ku Zerdeşt hanîyan ser ziman divê ku bibîr bike û lê bihizirê. Wekî din, nexwe divê ku wê gotinê bi lêv jî neke. Dema ku mirov gotinek bi lêv kir, divê ku mirov mafê wê bidîyê de. Ev jî, ya ku di serî de ji keseyetîya rewşenbîr tê xwestin a. Sefîlî, ne rewşe keseyetîya rewşenbîr a. Weke rohnî û tariyê vajî hevdû na gotina rewşenbîrî û sefîlî. Bo rewşenbîr, sefîlî çi ya? Sefîlî, ew a ku di rewşek acîzane de bê, ji ziman, çand, û nirxên civatî dûr bê, nikaribê xwe û nirxên civatî biparêzê, hertimî dûvikê hinekan bê, li gorî ku hinek dibêjin ku bike bê, ji têgihiştiin maf û azadîyê dûr û bêxaber bê, di wê çerçoveya wan nirxên maf û azadiyê de ku li civatê nehizirî bê û tekoşîna wê bi pênûsa nekiribê, nikaribê bi zimanê civatê xîtabî civatê bike, Ji aliyê deronî û civaknasî û felsefîkî ve ku ji civatîyê dûr bê û bi civatîtîya xwe ne di têkiliyê de bê, ku temenê pêşketina perwerdeyî û têgihiştina a civatî ne afirandibê, û hwd, nîşanakên mirovê sefîlane na. Weke van xosletan, em dikarin hê jî gelekên din jî lê zêde bikin.

Li vir, ya ku divê ku vajî vê were kirin ew a ku keseyetîya ku em bahsê dikin ya rewşenbîr ku karibê xwe bi zanîn û têgihiştin xwe re xwe bike weke navendek. Lê ew navendîtîya wî û ankû wê jî, hebûna civatê wê û navendîtîya civatî ya bi dîrok, çand, ziman, felsefe û hwd re bê. Civat, bi van rastiyên wê re navende rewşenberîya ku bi navê wê werina kirina jî. Nirxên civatê, bi dîroka wê re çendî ku di nava civatê de

têgihiştina wê dem bi dem hat afirandin û pêşxistin, wê temenê pêşketin û pêşveçûna wê ya bi pêşarojê ve jî bê afirandin.
.

**Ziman, rastî û pêvajoyên wê ên pêşketinê, civat û pêvajoyên wê yên şariştanîyê.**

Ziman, weke rastîyeka civatî, divê ku mirov li vir bi rewşenbîrîyê re li ser bisekin in. Dîroka ziman, dîroka şariştanîyê û hinekî jî jê wirdetir dihêne ser ziman. Mirov dema ku bidest axiftinê kir, hingî jî, bidest pêşketinê kir. Têkiliya ziman û heyîna mirov a laşî û ankû bîolojikê bi hevdû re di nava têkiliyê de na. Temenê ziman, bîolojikiya zîndîtîya mirov di temenê wê de ya. Em ku wê têkiliya di nava ziman û xêva mirov de divê ku mirov dêne. Li ser têkiliya xêvê-ziman, mirov divê ku weke rewşek teybetî a heyînî ku bi pêşketina civatîyê re girêdayî ku keseyetîya mirov bi pêşketina wê re di temenê wê de, mirov divê ku werêne ser ziman. Dîroka mirov a têgihiştinê di temenê pêşketina ziman de ya. Felsefevanên serdema kevnera, di serî de heyîna felsefê bi gotinên zimên re bi sînor jî hanîna ser ziman. Li ser vê jî, nîqaşên felsefîkî hatina kirin. Ew nîqaş, ji serdema kevnera û heta serdemên navîn û serdema piştra a zanînê ku di nav de, wê di van serdeman hemûyan de nîqaşên felsefe-ziman bi hevdû re werina kirin. Em li vir, divê ku felsefeyê di serî de weke lingê ziman ê fahmê û hişmendiyê werênina ser ziman.

Em ku bahse dîroka ziman bikin, emê bi wê re di nava dahûrkirina xwe de dîroka hizirkirinê jî werênina ser ziman. Bi wê re, em divê ku bibêjin ku em dîroka rewşenbîrîyê(serdemên pêşî ên fahmkirinê) jî werênina ser ziman. Ziman, pêşketina wê ji aliyê pirranîya dîrokzan, felsefevan û zanyaran ve weke şoreşaka mirovatiyê ya biqiymet hatîya hanîn ser ziman. Di vê temenê de ziman, bi giring hatîya hanîn ser ziman. Dîroka ziman, bi dîroka felsefe, şariştanî û bi giştî dîroka fahmkirinê re di temenê pêşketina civatî re em divê ku werênina ser ziman. Her wusa ziman, rastîya wê weke mijareka giring ya dîrokî ku em bi hesanî nikarin ji nav derkevin a. Bo fahmkirin û ji hevderxistina pêşketin û dîroka ziman bi rastîya wê, re wê bi me dîroka, şariştanî, felsefe, têgihiştin û mirovatiyê bigiştî bi xwe re bi me bide ji hevdû derxistin û fahmkirinê. Di vê çerçoveyê de ziman, ne mijareka hesanîya ku mirov wê bi hesanî werêne ser ziman. Zimanê pêşî e ku rengê wê bi dengên ku ji qirikê derdiketin û li ser nîşana ava ya, wê bi rengê "wênakirinê" bide dîyar kirin. Mirovan, di dema ku hê ziman pêşneketibû, weke pêvajoya pêşî ya zimanan, ajo û hîskirin bû. Pêvajoya duyemin wênekirin û çêkirina ´nîşanan´ bû. Pêvajoya sêyemin jî, pêvajoya deng derxistin û bi xîzkirina wê re bû. Pêvajoya çaremin, bi wênekirina di mejî de ya û biwê de bidengê ku tê derxistin re ku ´gotin´ ankû ´peyv´ tên derxistin li holê in. Ev pêvajo, weke pêvejoyeka giring a. Pêvajoya pêncemin ya zimanan û pêşketinan zimanan jî, bi hizirkirin û êdî pêşketina xîzkirin û piştî xizkirinê re kifşkirina nivîsandinê ya.

Ev pêvajoyên giring ên pêşketina ziman, hemû biserê xwe pêşnekevin. Her pêvejoyek ji van pêvejoyan bi hezaran salan ser xwe re bi jîyane mirov re dide buhurandin. Lê li vir, em divê ku vê yekê bibêjin ku weke têkiliya pêşketina ziman bi hebûna mirov a zindî ya ´xêvê´ re jî divê ku mirov biteybetî werêne ser ziman. Ziman, di aslê xwe de em dikarin bikina xêv û ankû girtina di xêvê de. Ji ber ku ya ku di temenê hebûna ziman û pêşketina wê de ev in. Ziman, di vê temenê de bi temen a. Em nikarin ji vê temenê cuda ziman werênina ser ziman. Di pêvajoyên şariştaniyên ên ji demên

sûmerîyan bigra û heta ku digihijê serdemên şariştanîyê ên pêşketina bi hemûyan re ziman di temen de ya. Î ro, dema em hewl didin ku pêşketina sûmeran, qasîtan, gûtîyan, hûrîyan, mîtannîyan, medîyan û hwd, fahm bikin, em weke rêbazekî fahmkirinê û lêkolînkirin û fahmkirinê li zimanê wan dinerin. Her wusa, li hemû pêşketinên mirovatiyê ên bi vî rengî ku li mesopotamiya, misra kevn, qitaya emerika, afrîqa, asya û hwd, em bi pêşketina ziman re dihênina ser ziman. Ziman, astaka pêşketinê ya mirovî ya. Her wusa, em divê ku ziman, bi teybetî hildina li dest. Ya ku bû temenê ku mirov weke zindiyekê ji nava jîyane xwezayê ji heywanên din cuda bike jî pêşketina fahmkirina wê û hanîna wê ya li ser ziman bû. Di vê temenê de ziman, şoreşek zihnî ya. Piştî wê re şoreşek civatî ya. Piştî wê re jî, şoreşek fahmkirinê, têgihiştin û piştre felsefeyê ya.

Em divê ku li vir, bi dîrokê û pêşketina mirov a di nava demên dîrokê de bi pêşketina jîyane mirov re li ziman bihizirê. Î ro, dema ku em li şikeftên ku ji serdemên berî demn şariştanîyê dinerin, em rastî gelek xîzkirinên hatinakirin tên. Ev xîzkirin û ankû wênekirina sûretê heywanan û ankû çêkirina pêykelan weke zimanê pêşî ê ku pêşketî jî dihê şîrove kirin Ev rast a. Ew zimanê pêşî ya. Mirovê roja me ku ew zor û zehmeta wê demê ya mirovê wê demê ku kişandî ku kişandiba, wê qiyemetê ziman baş bizanîya.

Em li vir, divê ku ziman bi pêvajoyên pêşketina şariştanîyên ku li dûv hevdû hatina hewlbidin ku fahmkirin û werênina ser ziman. Rastîya ziman bi wê re divê ku baş were fahmkirin. Di hebûna şariştaniyekê de û her wusa di pêşketina de, ziman tenê ne amûrê hanîna ser ziman a. Ji wê zêdetir û wirdetir, ziman heyîn û hebûnakatê gihiştî ya ku bi wê asta şariştanîyê jî dihê ser ziman. Lê bi wê re, weke aliyekê wê yê bi mirov re em divê ku werênina ser ziman. Di hanîna wê aliyê wê bi mirov ve girêdayî, em xêva mirov li berçav bigrin û werênina ser ziman. Mirov, kengî, di bîra(hafiza) mirov pêşket û mirov di wê de bidest girtinê kir, êdî temenê hebûna ziman afirî. Ev jî, ziman, weke lingê wê yê pêşî ê giring bîra û ankû xêva mirov dide nîşandin. Lingê duyemin ê ziman jî, çêkirina gotinan ji aliyê meji ve ya, ku ev bi serê ve xwediyê gelek pêvajoyên tevlîhev ên bîolojikî ya. Di vê temenê de dema ku em li ziman dihizirin, em dibînin ku ziman, weke rastîyaka ku em nikarin tenê bi aliyekê wê jîyanî û ankû civatî, şariştanî, têgihiştinî û hwd re, bi tenê fahmkirin. Ji ber ku ji wê zêdetirîn temen û bingihê ziman heya.

Gotinaka ku mirovê ku bi aqil ve mijul a ku dayimî dihêne ser ziman ew a ku dibêje ku "ziman, civatê bi rêxistin dike" ya.. Ev gotin, çendî rast a, em dema ku li jîyanê binerin emê bibînin. Dem bi dem bi pêşketina di hundurê jîyanê de ziman xwe dîzayn û rêxistin dike. Ev jî, bi xwe re rêxistin û rastkirina jîyane mirov bixwe re dihêne. Şekl û awa dide jîyane mirov. Mirov di jîyane xwe de, bi sembolan bê û ankû bi rastkirinên ku di wê temenê de kirina re, êdî ji hevdû derdixe, Ankû wusa dibîne. Gotina "ji hevdû derxistinê" gotinaka pirr bi îdîa ya. Dibêt ku em nikaribin bêjin ku mirov ji hevdû derdixe. Em dikarin bêjin ku di derbarê çend rewşan de dibê xwediyê zanînê. Dema ku mirov got ´ji hevdû derdixe´, wê çaxê, em dibêjin ku rastiyên ku hena ên bi ziman re hemû fahmkirina û derxistina têgihiştinê. Ev jî, bi carekê bo mirov ne bi derfet a. Dema ku em pêvajoyên zaroktiyê ê mirov li berçav bigrin û wee minaq ji vê rewşê re bidin, wê pirr di cih de bê. Mirov gav bi gav di wan pêvajoyan fêr dibe. Ev pêvajo, bi serê xwe pirr giring in. Dema ku em van pêvajoyan li berçav bigrin, emê hingî rastiyê fahm bikin.

Zarokek, li gorî şert û mercên ku di wê de mazin bûya fêr dibe. Du zarokên ku di sert û mercên cuda de hatina mazin kirin, wê fêrbûn û fahmkirina wan jî ji hevdû cuda bê. Heta ku wê ew cudabûn, bandûrê leze fahmkirina wan û hildana wan jî bike.

Mirovê mazin jî wusa ya. Di jîyanê de tişta ku dibînê, di şibekeya fêr û cerbên ku buhurandina de dixwêne û fahm dike. Bi wê re jî, dema ku dihêne ser ziman, zan dike ku fahm kiriya û dihêne ser ziman. Asta xwe têr dibînê. Ew têr dîtina mirov a asta xwe, heta wê nûqteya ku xwe ya ku ´qinyat´ pê hanîya dike. Lê ew nûqteya ´qinyata mirov´ ne sînorê fahm kirinê ya. Ew tenê sînorê mirov ê ku mirov ji xwe re çêkirîya ya. Têgihiştina qinyatê, zû bi zû nahêlê ku mirov ji wê derbas bibe. Mirov, weke ku di temenê dane bawerkirinê de di cihê mirov de girêdide. Ev jî, weke alî û lingekî din ê sînorê mirov a. Li vir, di aslê xwe de, car bi car, em dibêjin ku "sînorê cihane mirov zimanê mirov a", bi wê qinyatê, sînorê mirov ê ku mirov ji xwe re çêkiriya bin ya ziman re jî ya. Yanî sînorê ziman, pirr û pirr zêde li ser wê sînorê ku mirov bi ´qinyatê´ re ku ji xwe re çêkirîya ya. Em li vir, divê ku vê yekê jî bibêjin ku di felsefeyê de jî, hatîya gotin ku "sînorê fêrbûna mirov zimanê mirov a." Lê sînorê zimanê me yê ku xêv û bîra me di temenê wê de ya, pirr li ser wî sînorê ku em di vê temenê de dihênin ser ziman. Her wusa, ku em di çerçoveya gotina ´sînorê ziman´ de werênina ser ziman, em divê ku bibêjin ku em ku hebûna civatê bi nirxê û dîroka wê re di nav de hasab bikin, wê çaxê, em nikarin bêjin ku em li nêzîkî wê sînorê jî na. Ev jî, weke aliyekî din ê ku mirov li berçav bigrê ya.

Di nava sînorê hebûna şariştanîyê de ziman, her wusa, ji gelek aliyan ve divê ku mirov werêne ser ziman. Dema ku em bahse wê civatê, dîrok û şariştanîyên wê ku bi dîroka wê ya civatî re pêşketina, em divê ku gav bi gav bi ziman re werênina ser ziman. Bi rêxistkirina civatê û afirandina pergale şariştanîya civatî, em dikarin bi gotina ´ziman ´ re werênina ser ziman. Ev alî û hinekî aliyênn din jî di nav de li ser ziman re bi pêşketina civate xwe bi rêxistin dikin. Bi vê rengê, ziman, weke aliyekî giring ku mirov divê ku bi teybetî li ser bisekinê ya. Li vir, ez dixwezim ku tehereka(dîyelektîkekê) ji xêv û bîra mirov û mejiyê mirov bidina destpêkiirn û werima ziman û ji ziman jî werima hebûna pêşketina civatî û rêxistinîya wê ya civatî a ku weke pergale civatî ya. Ku em weke dîyelektîkekê vê werênina ser ziman, wê pirr rast bê. Ji xwe, ya ku weke rêbazekê pêşketinê ji mejî-xêv-bîrê ku heta ziman-civatê û piştre ku digihijê pêşketinê-şariştanîyê ya. Ev rengê formulekirina ku ez dikarim di temenê rastîya pêşketina ziman de werênima ser ziman a. Di nava dîyelektikeka bi vî rengî de ziman, cihê wê pirr giring a. Em carna dibêjin ku "ziman, hebûna civatê ya´". Bi zanebûnî bê û ankû ne bizanebûnî bê, em li vir bi dîyelektîke wê re rastîyaka ku bi navê ziman re ku li pêşîya pêşketin û hebûna şarîstanî disekinê û li aliyê wê yê destpêkê jî ku mejî û xêv û her wusa bîra me ya ku êdî dîmenan di xwe de qayd dike ku heya, em bahsê dikin. Di vê çerçoveyê de, em bahse pergaleka giştî ya komlîka ku bi jîyane mirov re afirîya dikin. Em li vir, divê ku vê rastiyê baş fahm bikin. Hinek ahmaqên ku tiştek ji dunya xwe fahm nekirina ku dibêjin "ziman, nebê jî mirov dikarê jîyane xwe bidomênê", heya wan ji dîroka bi hezaran salan û têgihiştin û pêvajoyên wê yên pêşketinê ên ziman tûna ya. Ku bibêjin ´me xwedîya jî´, wê çaxê mirov dikarê bêje ku fahm nekirina.

Mirov, dema ku zimanê xwe winda kir, xêv(hafiza)a xwe û bi bîra wê re ku pêvajoyên pêşketina mejiyê wî bîolojikî û civatî jî di nav de ji dest winda dike. Ev pêvajo û hemû pêşketin jî, weke temenê mirov a. Temenê jîyane mirov a. Mirov, di

ziman de hîs dike. Di her ziman û nirxên wê de hîsên cuda hîskirina wan heya. Ew cudahî, ya ku dide kifşkirin rengê pêşektina civatî û nirxên wê yên ku henna û afirîna na. Ji vê aliyê ve dema ku mirov li ziman dinerê, mirov rastî rewşek pirr tevlîhev ya bi jîyane civatî re tê. Jîyane civatî, em ku em wê werênina ziman bi heyîna zimanê wê re, divê ku em heyîna dîrokê bi felsefeya wê re û her wusa bi dîyelektîka dîîrokê re li berçav bigrin. Hingî, mirov wê karibê rastiyên civatî baştir fahm bike.

Her wusa, li vir, em dema ku bi civate re bahse ziman bikin, divê ku em bibêjin ku şoreşa ziman a di dîrokê de di temenê hemû pêşketinên şariştanî ên ku piştre bûna na. Di nava jîyane şariştanîyê de, dema ku mirov li rengê ziman bihizirê, mirov wê bi rengê ziman ê pêşketina wê ya herî dawî ê bi felsefe û zanistê re rastî wê were. Ji xwe rengê aqilê ê bi felsefeyê re ku pêşketîya, em divê ku weke rengê hizirkirin, pêşketin û aqilê dema şariştanîyê werênina ser ziman. Aqlê dema şariştanîyê felsefe, asta ziman a herî pêşketî ya. Ev ast, weke astaka têgihiştinî ya mirov a. Li vir, bi ziman re, pergalbûnek hatîya pêşxistin. Ev pergalbûna ku bûyî, bi wê re civat jî hatîya bi rêxistinkirin. Lê ew bi pergalbûna ziman, di temenê wê de dengê ku mirov wan di mejiyê xwe de bi hiş û hişmendî dike û bi wê re ku derdixe hena. Her wusa, di vê temenê vê çêkirinê bi xwe de jî, gelek pêvajoyên pêşketinê ên ku mejî di nava xwe de buhurandina hena. Yanî, li vir dîsa em di gerihin û divegerihina li ser wl dîyelektîka di nava mejî- ziman-jîyane de. Di temenê vê hebûna mejî-ziman-jîyanê de ku em li rex wê bicih biikin û werênina ser ziman, jîyan-mejî-ziman heya. Ev jî, di temenê heyîn û bandûra derve ve xwe bi temen dike. Piştre, di dema asta xwe ya pêşketinê de mejî-ziman-jîyan heya. Formula di temenê gotina ´pêşketina di jîyanê de jî ev bixwe ya. Her wusa, ev gotina ´pêşketinê´ jî, hebûna jîyan civatî û hwd jî di nav de wê hemû pêşketinên jîyanî û şariştanî bi xwe re êdî werêne.

Ziman, di vê temenê de bi tememî di temenê fahmkirina wê de pergaleka giştî ya pirr-alî a li jîyanê heya. Di vê temenê de em divê ku gotina ziman bi heyîna wê re bi tenê ne hildina li dest û fahm nekin. Her wusa, bi wê re divê ku mirov bi rastiyên civatî re we werêne ser ziman. Bi pêvajoyên bîolojikî ku di temenê wê de na, bi wan re werêne ser ziman. Em ti carî, nikarin hebûna ziman bi pêşketina wê ya bi jîyan civatî re ji wan pêvajoyên pêşketinê ên biolojikî cuda werênina ser ziman. Yanî li vir, em divê ku bibêjin ku dema em bahse pêşketin, têgihiştin û rewşenbîrîya di zimanekî de dikin, em bahse vê xate pêşketinê ya mirov û bi wê re bi civatê re dikin. Dibêt ku mirov ne di farqê de bê, lê bi vê rengê ku me hanî ser ziman, gotina rewşenbîrîyê ku temenê wê li ser heyîna ziman a, berpirsîyarîyên mazin bi pêşketina civatê re didêne ser milê mirov. Her wusa, gotina rewşenbîrîyê bixwe jî, bi temenekî giring re tê ser ziman. Ji zimanê mirovên pêşî ku di şikeftan de dijîn û heta zimanê ku mirovê ku di dema şariştaniyê de dijî, pêvajoyên pêşketinê ên ku bi mejiyê mirov re ku di jîyanê û ziman de buhurîna, giring û biqiymet in. Ji vir mirov vê yekê fahm dike ku piştî ku van pêvajoyên pêşketinê, wê êdî di dem û serdemên şariştanêyê de lez pêşketinê jî zûtir bibe. Leza pêşketinê a piştre ku di demên şariştanîyê de ya, wê têgihiştinê û hîsa zanînê çê dike ku rengê pêşketinê bi awayekî geometrîkî bi pêş de diçêt.

Di dema şariştanîyê de rengê pêşketinê bi vî rengî ya. Her wusa, ev rengê pêşketinê ku em kifş dikin ku weke ku bi rengê pêşketina geometrîkî pêş dikeve, têgihiştineka din jî bi me re dide çêkirin. Ew jî, ew a ku pêvajoyên di temenê de ên bi mejî re ku çawa li gorî demê û bi xwe re êdî ku lêhatinîîyê çê dike. Mejiyê mirov, di serdemên pêşî ên

demên şariştanîyê de bi pêşketinên mîtolojikîî pêş dikeve. Di nava rengê pêşketina mîtolojikî de, wênekirin, xîzkirin, xîyalkirin, bi pêşnûma kirina xîyalê û hwd, hena. Ev pêvajo, weke pro-tîpê wan ê ên pêşî û ankû weke pêvajoyên wan ên pêşî, pêvajoyên serdemên berî demên şariştanîyê hena. Mirov, care pêşî, bi girtina dîtinê re bidest fahmkirinê dike. Girtina dîtinê, bi qaydkirina di xêvê de ya. Ev jî, biserê xwe pêvejoyek giring xêvê ya. Xêv, çendî ku digirê bîra mirov çê dike. Piştre li ser wê re hişkirin, hişmendî, jîr û hwd, weke pêvajoyên piştre pêş dikevin. Di nava xîyalkirinekê de û ankû di temenê wê de ev pêvajo hemû jî hena. Mîtoloji, li vir tiştekî vekirî bi mejiyê mirov re şanî miiov dide mirov. Ew jî, ew a ku mejî çawa ku bi şembolkirinê dijî ya. Ji xwe mîtolojikî jî sembolkirina. Lê dema ku em bibêjin ku dema ku mirov bi aqilê xwe dema mîtolojiyê buhurand êdî dema dema sembolan buhurand, ew jî ne rast a. Ji ber ku her çendî ku sembol hebin, wê meji evçendî jî zanînê di mejî de biafirêne. Weke girêka rojê ku pêketî ku li nîvê fezeyê bê, wê di dema aqil de sembol ku di kirasê ajoyan de wê xwe bidomênin. Ji xwe, zanîna mirov, ew fahmkirina ku li dora ajoyê pêş dikeve ya. Çendî ku mirov ew ajo bi zanîn kir, mirov li wê êdî serdest dibêt. Lê heta ku mirov negihiştibê zanîna wê jî, mirov nikaribê vê bibêje.

Li vir, têkiliyek giring di nava gotinên ziman û ajoyan de heya di mejî de. Mejî, gotinan dema ku bi sembol dike, di xêvê de, ew sembol, ajoyên nemir ê ku di temenê wê gotinê de na. Her gotinek, di xêva mirov de ku weke nemiriya wê ajoya wê ya ku meji bi rengê sembolê afirandî heya. Yanî, li vir, gotin bi serê xwe ne tenê gotina. Ji gotinê zêdetir wate û girîngiya wê heya. Ew asta ziman ku em di jîyane xwe ya asayî a civatî biferheng dikin jî, astaka pirr stûr(gir=qaba= )ku em bi wê dijîn a. Em gelo di farqê de na ku her gotineka zimanê me yê zikmakî, di mejiyê mirov de û her wusa di xêva mirov de xwediyê hin pêvajoyên bîolojikî ên ku buhurandina na? Bêgûman, em di derbarê vê de xwediyê kêm zanîn in. Zanînên me yên ku hena jî, em bi sayaserê hîsên bidest dixin a. Piştre jî, hinek ji wan me cerb li wan kiriya. Lê ev jî, ne têra bo fahmkirinaka giştî ya di derbarê de.

.

**Tevgerek rewşenbîrî ku karibê bi zimanê civatê biaxifê, pêşketinê di nava civatê de çêbike û bersivê bide pêdivîyên civatê û demê.**

Civate kurd, di serî de divê ku mirov bibêje ku pêwîstîya wê bi tevgereke rewşenbîrî ku karibê civatê û nirxên wê li gorî demê bi wate bike û biparêzê heya. Ji wê jî, zêdetirî pêwîstî bi tevgerek civatî a rewşenbîrî ku di têgihiştina dîrok, çand, felsefe û civaknasîya civatê de bê. Bi wê re jî, ku karûbarê rewşenbîrî bi zimanê civatê dike. Pêwîstî bi vî rengî pêwîstî bi tevgerîyek rewşenbîrî heya. Di serî de, rewşenbîrîtîya kurdistanê, divê ku civate kurd û dîroka wê ji xwe re weke navend esas bigrê û li ser wê re bi mejiyê xwe re xwe birêxistin bike. Berî hertiştî, heka rewşenbîrîya kurd di wê îdîa û gotinê de ya ku civate kurd bi nirxên wê û dîroka wê re biparêzê, divê ku bizimanê wê xwe birêxistin û sazî bike. Divê ku dev ji wê qaşmerîya ku bi zimanê tirkî dinivîsêne ji civate kurd re berdê. Ev, ji qeşmerîyeka sefîlane û pê ve ne ti tiştekî din a. Di serî de divê ku xwe ji wê qaşmerîyê derxe. Di serî de divê ku xwe bike mirov û nirxên mirov biaxifê. Biaqil, dîrok, civaknasî, deronî û hemû nirxên din ên demî û civatî ku ka çi na, ew werina ditin, kifşkirin û li ser wan xwe re li gorî demê birêxistin bike. Ya ku temenê pêşaroja civatê ya jî ev bixwe ya.

Rewşenbîrî, berî hertiştî di çerçoveya hebûna civatî û parastina wê de bi nirx, ziman û çanda wê re stretejî û taktîkên wê ên aqilane hena. Ev jî, li ser rêxistineka bi aqil re xwe birêxistin dikin. Dema ku em bahse civatê bikin, em bahse xate dîrokî ku bi heyîna komên mirovan ên girseyî re ku li ser esasê nirxên hevbeş, dîroka hevbeş, çanda hevbeş, zimanê hevbeş, kevneşopîya dîrokî a hevbeş, bawerî û oldarîya hevbeş û hwd re dimeşê û xwe birêxistin û biwate dike. Dema ku em li dîroka olê binerin, em dibînin ku ol û bawerî jî, di temenê wê de parastina hebûna civatî heya. Ji xwe, dema ku ev nebê û newê parastin wê temenê wê û pêşketina wê jî nebê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov dîrokê pirr giring werêne ser ziman. Bo civatê û parastina wê bi nirxên wê re, sêlingên wê ên ku nebin nabin hena. Yek ji wan lingan, ziman û xwe hanîna ser ziman a bi wê zimanê civatê ya. Lingê duyemin, çanda ku xwe li ser ziman re birêxistin dike ya. Lingê sêyemin jî, hebûna civatî a giştî bi beş û komên wê ên hundurînên ku werina ser ziman. Ya ku di aslê xwe de lingekê pêşketinên civatî dewrûdayim dike jî ev a. Lê ev dewrûdayimîtî jî, li ser aqil û têgihiştinê re dibêt. Ti civat tûnaya ku xwediyê dîrok û çandê û felsefeyeka civatî nebê. Felsefeya civatî ew a ku di temenê xwe fahmkirin, naskirin û birêxistinkirin û her wusa barkirina pêşaroyê ya.

Em li vir, di serî de divê ku hebûna civatî weke navend hildina li dest û werênina ser ziman. Hebûna civatê, bo hemû karûbarên rewşenbîrî weke navendekê ya. Her wusa, bi dîroka wê re jî, xwediyê mejûya xwe ya ku karibê xwe bêne ser ziman. Dîroka civatekê ku hat nivîsandin û hat danîn li ser wê, hingî, ew civat li ser wê re xwe birêxistin dike û barî pêşarojê dike. Bêgûman, serdemên civatê ê ku di wê kêlîka ku di wê de dijî jî, tên fahmkirin.Lê bi wê re, pêşî wê çawa civat xwe werêne ser ziman, ew bi dîrok û çanda wê re dihê ser ziman. Ev dewrûdayimîya bi vê re û bi civate jî, di temenê wê de hanîna li ser ziman a nirx û çanda civatî bi zimanê re ji wê re ya.Ew hîsa civatî ku heya, li ser vê temenê de xwe diparêzê. Ya ku temenekî mazin ji pêşketina civaknasîya civatî, deronî û her wusa çandî re diafirênê ew hîsa civatî ya. Civaknasî, xwe salix dike. Dema ku xwe salix dike jî, wê rastîya ku heyî, bi dîroka wê ya ku buhurî re werêne ser ziman. Ev jî, weke aliyekî giring ê ku mirov biteybetî li ser bisekinê ya.

Î ro, dema ku em hewl bidin ku civaknasîya civatên avestayî fahm bikin, emê pêşî bi rengê jîyane wan re li felsefe û çanda wan binerin. Li ser wê re, em nirxên din ên civatî în wee bawerî û olê jî werênina ser ziman. Emê wan jî fahm bikin. Li vir, divê ku mirov bibêje ku navaroka civatî ku bi çi rengê xwe birêxistin kiribê, wê ew rengê wê xwe di çand û kevneşopîya wê de werêne ser ziman. Her wusa bi wê re jî, ol û bawerî jî, di rengê xwe de li gorî wê rêxistinyekê xwe bixweza diafirêne. Di temenê vê de jî, aqilê civatê heya. Li vir, dema ku em bahse rengê bawerîyê û olê bikin, em divê ku li ser aqlê civatê û biteybetî li ser felsefeyê re bahse wê bikin. Felsefeya civatî, mirov wê çawa wê werêne ser ziman, li vir giring dibe. Mijare bawerî û olê, mijarên ahlaqî û kevneşopî ku bi hevdû re di wê temenê de hatina hûnandin in. Ahlaq, xwe û hîmê xwe ji rengê jîyanê û awayê wê digrê. Ziman çawa ku hîmê rêxistin û pergale civatî ya, bi heman rengî li ser ziman re ahlaq, kevneşopî û çand jî bi hevdû re adilandin û bipergal kirina civat çê dike. Temenê ahlaqê, rengê jîyane civatî ê ku bi navê çand û kevneşopîyê bi hişar û têgihiştin bûya ya. Hinekî din jî, têgihiştina wê, çanda civatî ya. Ev nirxên hevbeş, civatê bi hevdû ve digrin. Çawa ku em nikarin ziman, çand û kevneşopîyê ji civat û ji hevdû cuda werênin ser ziman, em bi heman rengî jî nikarin ahlaqê jî ji kevneşopîyê û bi wê re ji çandê ji temen ve dûr şîrove bikin. Ahlaq, rêgezên kevneşopî na. Kevneşopî,

hevbeşîya wê civatî li ser çandê re heya. Ji vê aliyê ve dema ku mirov şîrove dike, mirov dibînê ku bi civatê re ahlaq, ji temen ve bi kevneşopî û çandê re û her wusa bi ziman re di zikhevde pêş dikevin. Lê ziman, di çerçoveya heyîna civatî de pergalebûnîya wan bi gotinên kevneşopî bê, bi gotinên ahlaqî bê û her wusa bi gotinên çandî ku piştre pêş dikevin bê birêxistin dike. Rêzimanîya zimanî û pergalîya civatî, şêwayê rêxistina civatî bi pêşketina wê re diafirêne. Destûrên ahlaqî ên civatî, bi wê re xwe dijîn. Em li vir, dema ku di çerçoveya civatê de bahse ahlaqê bikin, em nikarin tenê li ser olê û hwd re bahsê bikin. Em dîmen û rêûresmê civatê bênina berçavê xwe û em ji hebûna gotina civatîtîyê ziman derxin û tûna bihasibênin, emê çand û kevneşopîyê jî bi wê re tûna bikin û tûna bihasibênin. Bi wê re jî temenê ahlaq, civaknasî û deronîya civatî jî wê were ji holê rakirin. Bi kortasî, wê civatîtîya civatê bi tememî were ji holê rakirin û tûnakirin. Yanî civatîtî, wê were ji holê rakirin û tûna kirin. Em dem ku hevokan di temenê ´şoreşa ziman´ de ava dikin, em vê weke destpêkekê dihênin ser ziman. Lê vê destpêkekê jî, êdî di temenê destpêkeka şariştanî de em dihênina ser ziman. Ev rast tenê jî biserê xwe dide nîşandin ku hebûna ziman bo civatîtîya civatekê jîyanî ya. Yên ku vê giring nabînin û dihizirin ku wê bi zimanekî binivîsênin û civateka din biparêzên, ne ji nezanîya wan bê ji ahmaqîya wan a,  ku wusa dihizirin û dihênin ser ziman. Heman tiştî mirov dikarê bo yên ku ziman giring nabînin jî werêne ser ziman. Tenê yekî ahmaq û tiştek ji dunya xwe fahm nekirî dikarê wê bike. Ev jî mirovna, dev ji ”zanebûna” wan biqariha, mirovna ku ”gîya hatina û wê ka herin” in. ji wê zêdetir jî, bi têgihiştinî rêgezên jîyanî ên civatê ên ji hevdû cuda hena. Ev jî, weke mijarên giring ku felsefeya civatî wan ji xwe re dike mijar û lêdikolê na.

Ya ku civate weke lûleyekê bikar dihêne û di wê re bêhnê distêne jî civaknasîya civatî ya. Em li vir,, divê ku civaknasiyê weke mijareka sereka ya giring ya civatî hildina li dest. Her wusa, ahenga ku di nava hemû beş û nirxên civatî de çêdibe jî, di temenê wê de civaknasîyeka civatî heya. Em li vir, di serî de divê ku werênina ser ziman. Civaknasî, temenê wê li ser têkilî û hîsên civatî ya. Her wusa, rewşa hevbeşîya jîyane girseyî temenê wê ya. Her civat, xwediyê hevbeşîyên ku bi wê dijî ya. Ziman, çand, bawerî û hwd, çend ji wan nirxên civatî ên hevbeş in. Her wusa, çand li ser ziman re heya. Dema ku ziman hat tûnakirin, hingî wê çand jî biwê re were tûna kirin. Ji xwe, dema ku çand hat tûnakirin, wê êdî rêxistinîya civatî were ji hevdû belavkirin kirin. Li vir, em balê bikişênina li ser qadaxaya ku li rejima tirk, îranê û hwd bi rejimên berê ên ku î ro xûrîyana ên weke îraqê û sûrî re ku danîbûbûna ser ziman kurdî, bi armanca tûnakirina civatê û ji dîrokê birinê ya. Ziman, biqasî rengê civatekê dihêne ser ziman, her wusa rêxistinîya wê li ser çandê û hevbeşîya zimên re diafirêne. Yanî ziman, tenê ji bo axiftin û têkildanînê ya. Ji wê zêdetirî jî, di çerçoveya hebûna civatî û nirxên wê de bi wate ya. Em dikarin weke stûnaka binê konekî weke minaq bo ziman bidin. Çawa ku dema ku ew stûna navîn hat ji holê rakirin wê kon jî bikev û êdî nikaribê xwe li ser xwe û lingan bigrê, biheman rengî, dema ku zimanê civatê hat ji holê rakirin, wê hingê ew civat jî, were ji holê rakirin. Ya ku civate di temenê pêşketina wê ya bi dîrokê re hertimî weke navendekê pêş dixê jî di aslê xwe de ziman û bi wê çand a. Di vê temenê de li ser ziman re, çanda civatê, rêxistinîtîya wê û felsefe û hişmendîya wê mirov dikarê werêne ser ziman. Ev jî, wek dîyardeyên giring ên ku civatîtîye diafirênin û civat xwe bi wan re dide domandin in li pêşarojê.

Em dema ku bahse çanda civatî dikin û her wusa pêşxistina wê dikin, em hinekî jî

bahse xwe hanîna li ser ziman a bi ziman çandê re jî dikin. Ya ku serdestîya civatê diafirêne û pêşaroja wê diafirênê çanda. Her wusa, temenê xwe parastin û pêşketina wê jî ev a. Em mijare çandê, di çerçoveya jîyane civatê de û her wusa bi zimanê civatê re, ti carî nikarin ji rêzê bihasibênin û werênina ser ziman. Bi wê re jî, divê ku mirov vê jî bibêje ku çand, hinekî jî bi pêşketina wê re serwerîya civatî li demên wê ku tên û ew dijî jî diafirêne. Yanî, weke ku çawa ku civat bi civaknasiyê re bêhnê distêne bi çandê re jî xwe dihêne ser ziman û dîyar dike. Bo vê yekê çand, weke mijareka giring a pirr giring û dîrokî ya bo civatê. Her wusa bo parastina çandê û pêşxistina wê jî, zimanê wê civatê nebê nabê ya. Dema ku ez nav û çanda kurd, bi zimanê tirkî werênima ser ziman, ev hanîna ser ziman, nekeve xizmeta civate kurd û pêşketina wê de. Ew tenê dikeve xizmeta civate tirk de. Wekî din jî, hanîna wê ya li ser ziman bo civate kurd ti wate ya wê tûna ya. Bo vê yekê, mirov divê ku vê jî bibêje ku bo civatekê karên çandî û hunerî ku werina kirin ku bo wê werina kirin, divê ku bi zimanê wê civatê bin. Ev jî, weke xaleka ku nebê nabê ya. Ya ku wê di temenê pêşxistina civatê de jî bê, wê ev bê. Her wusa, her pêşxistin jî, dikeve xizmeta parastina wê civatê de jî.

Di serdemeka ku bo wê tê gotin ku ´serdema zanîn û ragihandinê´ jî, mirov ne bi artişên pirr mazin û şerker dikarê parastinê bike. Ew jî, di rengê ku hêrîş tên û li ber wan bisekinê de rola xwe dileyizin. Lê di serdemeka bi navê zanîn û ragihandinê de, herî zêde bi ziman û çandê dikarê ew parastina civatî were kirin. Ev herdû lingên civatî ku bi ziman û çandê, weke du lingên jîyanî na. Ziman, bi têgihiştin û fahmkirina di hundurê xwe de ku bi jîyane civatî û nirxên wê û her wusa têgihiştin û ankû felsefeyê re çêkirî, wê parazvanekî mazin ê dîrokî bê. Çend ku ziman nebê, wê çanda wê civatê jî nebê, bi heman rengî, çand jî weke ardê ku li ser ziman xwe diçêne û şîn dibe û pêş dikeve ya. Yanî, ziman û çand, di çerçoveya jîyane civatî de xwediyê pirr ´denklem´ên ku li hevdû badayî na. Di vê çerçoveyê de, dema ku mirov ji aliyê ziman ve ku li çandê û hunerê binerê û ku mirov ji aliyê çand û hunerê ve li ziman binerê, her aliya ku me ji wê ve nerî, mirov wê ancamên pirr mazin û dîrokî ên têgihiştin bi jîyane civatî bidest bixe. Car bi car, em dibêjin ku "sînorê civatê ziman a." Ev çendî rast a, bi heman rengî çerçoveya zimanê civatê ji temen ve jî çand û hunera wê ya ku bi wê zimanê dihê kirin diafirêne. Çend ku çand û huner hat kirin û pêşxistin, wê gav bi gav bi wê re ziman bê gihiştandin li kapasîteyeka mazin ya ku çerçoveya hebûna çerçoveya civatî diafirênê ya. Bo vê yekê, têkiliya ziman û çandê, çendî bi hevdû ve ji navikê ve girêdayî ya, bi heman rengî jî bi hebûna civatî ve jî girêdayî ya. Em nikarin wan ji hevdû cuda werênina ser ziman. Li vir, teherek giştî di nava ziman, çand û civatê de bi hevdû re heya.

Em divê ku ziman tenê weke rêbazê civatî ê têkildanînê ne hasibênin. Hertimî ji wê zêdetirî jî xwediyê wate giringîya pirr ji wê maztira jî. Bi wê re jî, zimanê mirov, ku em di çerçoveya mirov û civatê de werênina ser ziman, Çendî ku bi têkilî û gîrêdanaka çandî re em dikarin girêbidin, bi heman rengî divê ku em li ser ziman re têkilî û gîrêdanaka bîolojikî jî li ser xêv û mejiyê mirov re bi civat û dîroka wê re girêbidin. Ya ku weke benê girêdanê û her wusa hanîna ser ziman jî, ziman bixwe ya. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li ziman-çand-civatê dinerê, em dibînin ku di temenê wê de têkiliyên çandî, felsefîkî û bîolojikî hena. Ev sê rengên têkilî û girêdanên ku hena. Ji bilî van jî, hinek ben û girêdanên din jî li di temenê têkiliyên ziman, çand û civatê de hena. Em di vê temenê de bi ziman, çand û civatê re sêkikeka giring a jîyanî ku di temenê pêşketina mirov de ya jî dihênin ser **ziman**.

.Em dema ku bahse ziman bikin, em bahse heyîna civatî ku civat bi wê li ser lingan a û heya dikin. Di vê çerçoveyê de ziman giring a. Bo vê yekê jî, dema ku em bahse rewşenbîrîya civatî ku di hundurê civatê civatê û nava jîyane civatê de ku were kirin dikin, em li ser van temenan û parastina wan re dikin. Rewşenbîrîya civatî, di serdema me ya ku em î ro di wê de dijîn, bo xwe domandina hebûna civatekê weke tiştekê ku nebê nabê ya. Yanî, ne kar û xabateka ku mirov li kêfê berdê ya. Bi gotinaka din, di serdemeka ku bi navê ´zanîn û ragihandinê´ de, weke kar û xabateka zarorî û mecburî ya jî di temenê pêşxistin û parastina hebûna civatê de. Civate kurd, civatek ku xwediyê dîrokek herî kevn a. Her wusa, civatekek ku xwediyê mejû û felsefe ya. Ev jî, weke aliyna ku mirov bi teybetî li ser bisekinê na. Ji xwe, li ser van aliyan re hanîna ser ziman û afirandin, wê temenê pêşketin û parastina civatî a di demê de biafirêne.

Dîroka civatê, dema ku em bahse wê dikin, em bahse pêşketina wê û pêvajoyên wê ên şariştaniyê dikin. Di hemû serdemên şariştanîyê de aqil mirov û civatê û her wusa jîyanê bi rê ve dibin. Dema ku rewş weha bê, hingî jî, divê ku mirov bi teybetî li ser pêşxistina giringîya aqil di zimanê wê civatê de bo wê bisekinê. Civatîtî, hinekî jî şariştanî ya. Em dema ku gotina civatitiyê bi nav dikin, em hinekî hebûna şariştaniyê bi wê re dihênin ser ziman. Dîroka civatîtîyê, dema ku mirov lê dinerê, mirov, di temenê pêşketina wê ya şariştanî de dibînê. Li vir, dema ku em bahse civate kurd jî bikin, em divê ku bi teybetî li ser pêvajoyên şariştanîyê ên mazin ên ku di hundurê zimanê kurdi de pêşketina werênina ser ziman. Ji serdemên berî zayina îsa, ji serdema sûmerîyan û bi vir ve pêvajoyên şariştanîyê di vê zimanê de hena. Serdema Qasîtan, weke serdemeka kurdistanî a civate kurd a. Piştî wê re serdema gûtîyan, weke serdemak şariştanî a pêşketî û bi felsefe mirov dikarê werêne ser ziman. Di vê serdemê de felsefeya xwezayê, em divê ku bibêjin ku bi teybetî heya. Her wusa, em têgihiştineka felsefîkî di vê demê de pirr baş û zelal kifş dikin. Piştî serdema Gûtîyan re wê serdemên Hûrî û mîtannîyan werin. Ev serdem jî, weke serdemna şariştanî ê pêşketî û bi aqil û felsefe na. Heta ku em divê ku serdemên Hûrî û mîtannîyan, weke serdemna şariştanî ên hemdem jî werênina ser ziman. Di van serdemên bi hezaran salan de, dîroka civate kurd pêvajoyên pêşveçûnê ku li herêmê bi pêşketina xwe û zimanê re buhurandina, wê dîrokê ji nû ve bidina nivîsandin. Bi zane û zanyarên demî ên weke Mîtra û hwd re ku civate xwe weke navend bijartina û li ser wê re xwe hanîna ser ziman, wê pêvejoyek serdestîya civatî bi civate xwe re li herêmê bidina jîn kirin.

Zaneyên weke Mîtra bi têgihiştina yazdan û pêxemberîya melekê tawis re xwe ji nû ve bi têgihiştina felsefîkî li gorî demê di fasilênin û dihênin ser ziman. Mîtra, divê temenê de mînaqek giring a ku divê ku mirov bi teybetî û giringî li ser bisekinê ya. Mîtra, aqilê saf û zelal bi felsefeyê re diafirêne. Di serdema aqilê felsefeyê de wê çawa were jîyîn, ew wê bi temenê wê re dihêne ser ziman. Piştî wî re zanyer û filosofên weke weke Zerdeşt, wê li ser xat û kifşkirina ku wî daye çêkirin de wê hizrên xwe biafirênin û werênina ser ziman. Mîtra, weke serdem û pêvajoyeka nû ya di wê xatê de ya. Weke ku çawa ku Mîtra serdem û pêvejoyeka nû ya di wê xatê de û ji nû ve afirandinakê bi rengê ronasansî bi xwe re dihêne li holê, wê Zerdeşt jî di serdema xwe de weke wî bike. Zerdeşt, wê êdî Mîtra nû bike di demê de. Wê ji nû ve şîrove bike. Bi wê re jî, bandûra Zerdeşt, wê weke ya Mîtra ku çawa di dema Mîtannîyan de pêşket wê pêş bikeve.

Zerdeşt, wê pêvejoyeka aqilê felsefê a nû êdî li demê difasilê. Mîtra pêvejoya hemdem a rewşenbîrîyê jî bi xwe re dihêne. Di vê temenê de dema ku em di çerçoveya gotina rewşenbîrîyê de bahsê bikin, wê rewşenbîrekî demî ê afrîner a. Wî, dema xwe ku civate xwe ji wê re kir navend birêxistin kir. Rewşenbîrîya Mîtra,, di vê temenê de wê piştre jî bandûra wê bi zêdeyî hebe. Piştî wî re rewşenbîrîya Zerdeşt jî, heya. Rewşenbîrîya Mîtra, weke ya Mîtra dîsa civate xwe dike navend û li ser wê re pêş dikeve. Ya ku wê civate wî bike navend û li ser wê re heta ku ´civatên avesta´ jî biafirêne wê ev bê. Ev rewşenbîr û rewşenbîrîya wan, giringa ku bi dem û dîroka wan ya civatî re mirov hilde li dest.

Rewşenbîrîya civatî çawa dibe û dihê kirin, di vê çerçoveyê de mîtra û Zerdeşt, mînaqna giring in ku mirov dikarê ji wan ders û fêrna mazin derxê na. Piştî wan re Manî tê. Manî, bi serê xwe minaqeka pirr balkêşa. Manî, Navendetîtîya wî jî weke ya Mîtra û Zerdeşt kifş a. Li vir, weke minaq, dema ku em di xate dîrokê de ji mîtra dîrokê dihildina li dest û dihênine heta Zerdeşt û ji wî jî dihildin û dihênin heta Manî, em dibînin ku çawa bi kirina navend a civatîtîya xwe ya demî re serketina mirov bi wan re kifş dike. Her wusa, di wê çerçoveyê de xwe mazin kirina. Her hizir û raman, di temenê xwe de civaknasîyeka civatî dixwezêt. Ev civaknasî jî, divê ku bi têgihiştina civatî bê. Di aslê xwe de ya ku ramana felsefê ji ya olê cuda dike jî ew civaknasîya civatî a ku heya ya. Ramana olê, hin bi hin bi ahlaqê û hwd, rêgezên xwe diafirêne û navendek ´xwûdayî´ diafirêne. Lê felsefe bi civaknasîya wê re navenda wê civatîtîya ku heya ya. Li vir, ya ku dike zorê de ku felsefeya mîtra jî, ya Zerdeşt jî û ya Manî jî, ku bi tememî weke ya olî şîrove bike jî ev a. Van hersê zanyaran jî, li şûna ku xwûdayekî navend esas bigrin, li şûna wê civat bi civaknasiya wê re esas girtina û hebûna yazdan bi wê tefsîr kirina. Di wê temenê de ahengek çê kirina. Mîtra jî, Zerdeşt jî û Manî jî, ne hiştina ku ramanên wan ji felsefeyê û xate wê ya pêşketinê qût bibin. Ya ku hertimî kirîya ku wan weke xateke felsefîkî jî werêne ser ziman ev a. Di vê temenê de dema ku temen bi vî rengî li ser felsefeyê bê, wê çaxê tefsîrkirin weke lingekî pêşxistinê di nava wan de giring dibê. Her rewş û mijarên ku hena jî, ew hewceyî fahmkirin û tefsîrkirina wê dibînin. Ev jî, rêbezakî felsefê ya. Yanî, bi gotinaka din bi rêbazê felsefeyê ol û bawerî jîyankirina û pêşxistina. Di vê çerçoveyê de Mîtra jî, Zerdeşt jî û Manî jî, sê zanyar û filofosên civatî na. Her wusa sê rewşenbîrên civatî na ku mirov divê ku wan bi teybetî di vê çerçoveyê de hilde li dest û weme minaq werêne ser ziman in.

Di aslê xwe de, ku em Mîtra jî, Zerdeşt jî û Manî jî di çerçoveya tevgerîyek rewşenbîrî de hildina li dest wê pirr rast bê. Wê rastîya wan zêdetirî werêne ser ziman. Bi felsefeya civatî re ev hersê zanyar û filosof çêtirî dihên ser ziman û bi wate kirin. Rastîya wan baştirîn tê fahmkirin. Bo vê yekê, em dikarin di temenê pêşxistina tevgerek rewşenbîrî de em dikarin Mîtra, Zerdeşt û Manî weke sê destpêkên dîrokî ên civatê û herêmê werênina ser ziman. Xwemalî (orjînalî)ya wan di vê temenê de heya. Ders û fêra pêşî a ku em ji van hersê zanyar û filosofan derxin ew in ku wan herseyan jî, dema ku hizrên xwe hanîna ser ziman, civatîtîya xwe ya herêmî ji xwe re kirina navend û li ser wê re hanîna ser ziman bi wate kirina. Bi wê re jî, dane nîşandin ku bi kirina civatê weke navend, civatê dike weke hêzek demî di wê dema ku ew di wê de dijî de.Em vê yekê di dema Mîtra de bi mîtannîyan re dibînin. Di dema Zerdeşt de bi Medîya û

pêşketinên piştî wê ên civatî re dibînin. Di dema Manî de di temenê ji nû ve li gorî demê pêşxistin û bi rêxistin kirina li ser aqilê demê felsefeyê ya ´civatên avestayî´ re dibînin. Cidiyeta wan jî, ji wê rewşa ya ji nava civate wan tê.

Di vê temenê de dema ku em bahse tevgerek rewşenbîrî a kurdistanî li herêmê û pêşxistina wê bikin, ev minaq û gelek minaqeên din ên weke wan, ji me re hem dibina temen û bingeh û hem jî dibina rafarans di temenê pêşxistin, pêşketin û xwe birêxistinê de. Her wusa di temenê kirina weke navendekê de ya civatê de jî, ew ji me re dibina minaqên bêhempa ên xweşik û dîrokî. Di aslê xwe de**, Mîtra jî, Zerdeşt jî û Manî** jî, tevgerek rewşenbîrî ku bi aqilê demê felsefeyê re pêşxistin. Lê dem bi dem jî, wan hevdû fahmkirina û li gorî demê bi wate kirina û hanîna ser ziman. Ya ku wan mazin kirîya û mayînda kirina ev rastî ya. Bi wê re jî, weke xala sereka ku di temenê wan de ew mayinda kirina jî, ew civatîtîya wan ku wan ji xwe re û ji têgihiştin, raman û felsefeya xwe re kirîya temen û navend a. Ev jî, weke aliyekî pirr giring ê rewşenbîrîya wan ya civatî jî mirov dikarê werêne ser ziman. Rewşenbîrîya civatî, di vê temenê de piştî wan re jî, wê xwe bidomêne. Em dema ku li demên pişt wan re ku tên dinerin em dibînin ku wê Piştî Mirovên weke Manî re **Mezdek, Hûrem û Babek** werin. Ew jî, wê Mîtra, Zerdeşt û Manî li dûv hevdû ji xwe re bikina weke navend. Ji xwe, dema ku ew wan ji xwe re dikina navend, êdî di temenê tevgerek rewşenbîrî a civatî de civate ku ew di nav de dijîn ji xwe re dikina weke navendekê û bi wê re pêş dikevin. Ew jî, bi vê yekê, hem wan bixwe re didina domandin û hem jî xwe jî bi wan di dewama wan de mazin dikin. Her wusa, piştî wan jî, ku di dema wan de tên. **Zäd Hûrmûzd, Sultan Sahaq û Şêx Adî** tên. Piştî wan re di serdem Îslamê de jî zanyar û filosofên weke **Bavê tahirê uyanî, bavê henifê dinwerê û Êlî Herîrî** tên û bandûrek mazin bi têgihiştin û rewşenbîrîya xwe re dihêlin û diçin. Fêr û dersa ku em ji wan bigrin, ew a ku em wê tevgera wan ya rewşenbîrî di dewama û pêşketina civatê ya bi demê re de bidina domandin. Di serdema jinûvebûnê(rosananşê) li kurdistanê zanyarên weke **Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ahmedê Xanî** hena. Ev hersê jî, serdemek nû bi têgihiştin û aqilê xwe re li şûn xwe dihêlin û diçin. Em divê ku wan jî, di berdewamîya rewşenbîrîya civatî a kurdistanî de werênina ser ziman. Ev rewş wê piştre di sedsale 19 ´min bi tevgera rewşenbîrî a di nava Bedirxaniyan de ku herêma botanê ji xwe re weke hîm û navend girtîya wê xwe bide nîşandin. Ev tevgerên rewşenbîrî, piştî wan re bi tevgera azadîya kurd re xwe domand. Hizrên Birêz Ocalan, em dikarin ji aliyekî ve jî weke di berdewama vê xata rewşenbîrîyê de jî werênina ser ziman. Ev rewşenbîrên civatî ku me di hundurê nivîsandina xwe de ku heta vir me hanî de ku navê çendan hilda jî, hemûyan civatîtîya kurdistanê ji xwe re kirina navend. Ji ber wê ya ku wilqasî mazin bûna û bi xwe re civate xwe jî mazin kirina. Bi vê re jî, ev jî dide nîşandin ku ti rewşenbîr û tevgerên rewşenbîrî ku civatîtîyê nekina navend û temen, wê ti temen û sansê wan ê pêşketin û serkevtinê jî tûne bê. Ev jî, bi rastî, jîyan û ramanên van zanyarên civatî ku me li jor navê hilda re tê dîtin û **kifşkirin**. Ew jî, bi heman rengî civatîtîya kurdistanî a ku ew ji wê derdikevin ji xwe re weke navend esas digirin û hemû kar û xabatên xwe tên rewşenbîrî di rengê bawerî û bîrewerîya xwe de pêş dixin û wan jî weke dîroka li pişt xwe bi xwe re didina domandin. Li vir bi vê, ya ku em dixwezin bibêjin ew a ku rewşenbîrîya ku kirina, civatîîtya xwe ya kurdistanîkirina navend û li ser wê re pêşketina xwe çêkirina. Bi wê re jî, çendî ku xwe mazin kirina, civate xwe jî êdî

bixwe re mazin kirina û barî pêşarojê kirina. Di vê temenê de kar û xabate wan ya rewşenbîrî, pirr bi qiymet û ders û fêr tişî ya û li pêşîya me sekinîya ku em wê esas bigrin û di vê demê de bi demê re êdî bi rêxistin bikin. Bi wê re hem xwe mazin bikin û hem jî bi xwe re civate mazin bikin, pêş bixin û biparêzên.

**"Rewşenbîrên kurd" û pirsgirêka wan ya civatî û ahlaqî. ..**

Ku rewşenbîrî, bi zimanê civate xwe û li gorî nirx û dîrok û hebûna wê nivîsandin bê, em nikarin bahse ´rewşenbîrên kurd´ bikin. Lê ku rewşenbîrî, ne xwe hanîna ser ziman bi zimanê civatê û nirxên civatê bê, hingî em dikarin bahse ´rewşenbîrîya kurd´ bikin. Rewşenbîrîya kurd, ku em li dîrokê binerin, em dibînin ku ji bedîrxanîyan û bi vir ve bi awayekî rêk û pêk nayê. Piştî bedîrxanîyan, çend mirovên ku derketina û bizimanê civate xwe nivîsandina bûna. Lê bi awayekî vekirî, em nikarin bahse rewşenbîrîya kurd bikin.

Î ro, ku di dîrokê de û di ti demê û civatê de mînaqa wê tûna ya, çend nivîskarên ku bi tirkî dinivîsênin, ji xwe re dibêjin ´em nivîskarên kurd´ in. Î ro, bi vê yekê re, em vê jî bibêjin ku nivîskarîya kurd lingekî jenodîsa civate kurd a. Ku li temenê domandina asîmlasyonê were lêgerîn û derxistin li holê, wê bê ditin ku lingekî herî mazin û giring ´nivîskarên kurd´ diafirênin. Î ro, rojnemeyên tirk, li kurdistanê di nava kurdan de, dibêt ku sab lib jî nayê firotin. Lê yên ku wê pergale asîmlasyonê li ser serê civate kurd bi rê ve dibê jî ev ´nivîskarên kurd´ in.

Di cihanê de, ku ti minaqa wê tûna ya, mirovekî ku bi tirkî dinivîsêne, di karê derkeve ber mirovan û li nava çavên wan binerê û bibêje ´ez nivîskarên kurd´ im. Ku em li pirsgirêka ahlaqî û civatî lê bigerin, divê ku em di vê xalê de lê bigerin. Zimanê kurdî, î ro ku di nava kurdan bixwe de jî, newê bikarhanîn, Divê ku mirov bibêje ku ev pay û keda van mirovan di wê de pirr zêde heya. Min bixwe, hinekî li rewşa rewşenbîrên ewropî jî nerîya. Ez ti carî di nava wan rastî wê nehatima ku yekî çûbê bi almanî nivîsandibê û bibêje ´ez nivîskarê firansizî me´. Ankû, yekî ku bi ingilizi dinivîîsêne, rabê û bêje ez nivîskarê alman û ankû firansiz im, ku bi koka xwe ji wan gelan jî bê. Ji xwe, ne rasta jî. Tu bi kîjan zimanî binivîsêne, tu nivîskarê wî zimanî yî. Dema ku tu bi zimanê tirkî, binivîsêne û bêje ez ´nivîskarê kurd´ im, wê ev ne rast bê.

Ji xwe, ya ku herî zêde derbe li kurdan xistîya jî, ev a. Her civatek, bizimanê xwe re û bi nirxên xwe re heya. Dema ku zimanê civatê were ji holê rakirin, wê civat jî were ji holê rakirin. Yanî, li vir, ziman, weke aliyekî giring ê civatî ê hebûnî ya. Ez ku nivîskarekî kurdî bin, û rabim bêjim, ez nivîskarê tirk im û ankû nivîskarekî swêdî û ankû norwêcî ma, ew ne rast a. Ez, ku bi zimanê wan gelan di nava civate xwe de jî binivîsênim, wê çaxê, ez zimanê wan gelan li ser gelê xwe farz dikim. Wê çaxê, ez zimanê civate xwe tûna dihasibênim. Bi vê re, ez hebûna civate xwe jî înkar dikim.

Li vir, ev jî heya. Dema ku ez zimanê civate xwe nizanibim, ezê nikaribin, pirsgirêkên wê jî fahm bikin û werênima ser ziman.. Wê çaxê, di çapameniyê de çi gotin ku şaş bin û rast bin farq nakê, ku bi çi awayê hatina ser ziman, ezê wan weke rastiyekê herê bikin û li gorî wan bênima ser ziman. Ev jî, di serî de, divê rewşek bo min ku ez civate xwe bi pirsgirêkên wê ve ji nedîtî ve têm. Wê çaxê, ez nikarim bêjim ku ez hebûna civate xwe diparêzêm û li ser pirsgirêkên wê dinivîsênim. Ji xwe, ku ez bêjim jî, wê ne ahlaqî jî bê û ne rast jî bê.

Î ro, weke astanîya herî mazin li pêşîya pêşketina civate kurd ev a. Ev nivîskarên ku

weke ´nivîskarên kurd´ bi nav dikin û bilêv dikin, bi hebûna xwe re û rengê nivîsandina xwe re astangîya herî mazin in li pêşîya pêşketina civata kurd. Çend ku çar bi car, derdikevin û dinivîsênin û dibêjin ku "em li ser pirsgirêkên civate kurd dihizirin" jî, ev ji rastîyê dûr a.

**Rewşenbîrîya kurd, piştî bedîrxaniyan û pêde mirîya. Hê jî, mirîya. Bi dehan mirovên ku dinivîsênin û xwe weke ´nivîskarên kurd´ bi nav dikin jî, ne nivîskarên kurd in. Ti eleqeya wan bi wê gotineka re jî tûna ya. Ew, bi tirkî dinivîsênim û zimanê tirkî li ser civate kurd farz dikin. Ew nivîskarên zimanê tirkî na. Lê bi aslê xwe, dibêt ku kurd jî bin. Tu bi koka xwe kurd bê û bi tirkî binivîsêne, ew te nake nivîskarêê kurd. Ya ku wê tenê te bike nivîskarê kurd, kengî te bi zimanê wê civatê xwand û nivîsand, hingî tu karê wê bibêje.** Lê gotina ´em nivîskarên kurd´ in, ku ji devê wan derdikeve jî, tenê xapandina. ..

Di aslê xwe de, di vê serdema zanîn, teknîk û têknolojiyê de, astangîya herî mazin li pêşîya pêşketina civate kurd ev dordor in. Van dordoran, pêşîya pêşketina civate kurd qadaxa ya. Î ro, ku hê zimanê kurdî qadaxa bê û perwerdeya bi zimanê kurdî hê nebê, hinekî jî pay û keda van dordoran di wê de heya. Divê ku ev dordor, xwe ji wê berpirsîyar bibînin. Gelek mirovên ku dinivîsênin, bi wê mantiqê ravîna welatên ewropî jî, L welatên ewropî, dibêjin ku ´em nivîskarên kurd´ in. Bi vê gotinê mafê bicihbûnê jî digrin. Lê piştre jî, ew asîmlasyona li ser serê kurdan bi destê wan dihê meşandin, li ewropan jî, bi destê wan tê domandin. Li welatên ewropî, di nava dîyaspora kurdan de jî, ên ku zimanê tirkî jî bicihkirina û asîmlasyon pêşxistina, dîsa ev dordor in. Wusa hasab bikin ku zaroyekî kurd, ku li welatekî ewropî mazin dibe, zimanê welatê ku lê mazin bûya baş nizanê, zimanê dayika xwe baş nizanê, lê zimanê tirkî ji herdûyan pirr baştir dizanê. Di temenê wê pirsgirêka civatî a civate kurd de jî, nivîskarên kurd hena.

**Rewşenbîrîya kurd, li şûna ku di xizeta pêşketina civate kurd, ziman û çanda wê de ba, mixabin dijberî wê ya. Li dijî wê, di temenê asîmlekirinê de di pozisyonekê de ya. Î ro, ji ber vê yekê, ku em bahse jenosîda li ser serê civate kurd bikin, divê ku em vê rewşa nivîskarên kurd, bi wê gotina jenosîdê re werênina ser ziman. Nivîskarên kurd, bûna lingekî jenosîda civate kurd. Heta salên 1990´î, mirov dikarî bêje ku zimanê kurdî qadaxa ya û kurd nikarin zimanê xwe bikarbênin. Lê tekoşîna kurda, ev şikand. Di aslê xwe de, ew qadaxa ya li ser zimanê kurdî, di salên 1990´î û hwd de bi rakirina zagonên 140, 141, 142 û hwd re, ew qadaxa şikeşt û temenê wê ji holê rabû. Lê piştre, çend ku astangî û hewldanên dewletê ên pêşî lêgirtinê doman jî, em nikarin weke demên berî rakiirna zagonan werênina ser ziman. Piştre jî, çapameniya kurd, li şûna ku zimanê civate kurd bikarbêne, zimanê tirkî, weke zimanê xwe bijart û li ser civate kurd farzkir û di asîmlaskirin û ji holê rakirina nirxên civatî ên civate kurd rol û weyn leyist.**

Î ro, ku rojnemeyek tirk, dibêt ku sad lib jî, li kurdistanê di nava kurdan de nayê firotin, sazîyên kurd, çapameni û rojnemeyên kurd, wê valahîya di asîmlekirna kurdan de diagirin û civate xwe bi ziman û çanda wê re ji dîrokê dibin. Ku hinekî li gorîî rastiyên civatî û ahlaqê civate were hizirin, ez pirr mereq dikim ku wê çapameniya kurd çawa werênê ser ziman ku bo civate kurd rojnemeyan bi tirkî derdixe.?..

Nivîsandina nivîskarên kurd, xitabî kurdan û civate kurd nakê. Andamên civate kurd ji zimanê wan fahm nekin. Kengî ku andamekî civate kurd, zimanê civate xwe terikend û asîmle bû, wê hingî, zimanê nivîskarên kurd jî baş fahmbike. Nivîskarên kurd,

ji nirxên civaknasî, dîrokî û rastîyên civatî ên civate kurd dûr in. Ew, hîs û hêstîyarîya civatî ya kurdî, bi wan re tûna ya. Ji ber ku zimanê civate kurd nizanin. Ez bixwe, miroveekî ku gotinekî ji zimanê kurdî nizanibê û ne nivîsandibê, çawa dibe û dikarê ji xwe re bibêje ku ´ez nivîskarê kurd´ im. Dema ku ew vê gotinê bikardihênin, ya ew mirovên li dora xwe dikina cihê ahmaqan û yan jî ew bixwe ahmaqên cihanê ên bêaqil in.

Nivîskarên kurd, bo ku vê rewşa xwe bidomêne jî, argûmanên ku T. Ardogan dihêne ser ziman bo qadaxa ya li se ziman û nirxên civate kurd, ew jî bi rengna din bo xwe dihênina ser ziman bo ku xwe pê biparêzên. Minaq, dema ku ji mirovekî ji van mirovên ku ji xwe re dibêje ´ez nivîskarê kurd im´, ku ka "çima, ti bi zimanê civate xwe na nivîsêne", bersiva ku wê bide, em ne nîjadperest in. Ji vê gotinê, dihê fahm kirin ku di derbarê gotina nîjadperestîtîyê de jî, ne xwediyê ti zanîn û zanebûnê na. Dema ku yekî got ez nivîskarê kurd im, divê ku bi wî zimanî binivîsêne. Dema ku got ku ez nivîskarê tirkî me, divê ku wî bi zimanî binivîsêne. Dema ku navê zimanekî din ên welatên ewropî û ne ewropî jî got, divê ku di wî zimanî de binivîsêne. Di roja me de, bi teknolojiyê de, pirr zimanekî jî pêşketîya. Gelek nivîskarên ku bi du zimanan dinivîsênin bûna. Lê wê jî, li gorî ahlaqê wê dikin. Naçin di nava kurdan de bitirkî û di nava tirkan de bi kurdî, di nava almanan de bi firansizî, di nava firansizan de jî bi almanî û hwd nanivîsênin. Dema ku bo kijan civatê binivîsênin, wê bi zimanê wê ji wê re binivîsênin. Ya bi rastî û rûmet jî ev a.

**Î ro, ku rojnema, nivîskar, malper, kovar û hwd, hemûyên ku di nava civate kurd de bi tirkî dinivîsênin ku carekî zimanê civate xwe bikarbênin û bi kurdî binivîsênin, wê sadî sad temenê wê asîmlesyonê bi tememî ji holê ra bikin. Ji ber ku ji wan pê ve, ti kesek nemaya ku wê asîmlasyonê li ser civatê dide domandin. Tenê ew mana. Ew, wê asîmlasyonê li ser lingan digrin û bi rê ve dibin. Î ro ku navê zaroyên kurd "zelal", "Rêzan", "Zîlan" û "Agît" bê, û zimanê wan tirkî bê, divê ku ev dordor hem ji xwe fihêt bikin û hem jî berpirsîyarîya xwe di wê de bibînin.**

Dema ku mirov di nava civatekê de ji wê re nivîsand, divê ku mirov bi zimanê wê binivîsêne. Dema ku mirov, bixwezê xîtabî civatên din bike jî, mirov bi zimanê wan xwe dihêne ser ziman. Ev, weke prensîbeka rastî û ahlaqî ya xwe hanîna ser ziman a jî. Hingî, mirov wê karibê bibêje ku rêz û hûrmeta mirov ji wê civatê re jî heya. Lê dema ku zimanê civate kurdî bê û tu herê bi tirkî ji wê re binivîsêne, ti nikarê bêje ku ez birêz û hûrmet im ji wê civate re. Ku tu bêje jî, wê derew bê.

Her civat, zimanê, nirxên wê ên civate hena. Rêzgirtina ji wê civatê re, bi rêzgirtin esasgirtina wan nirxan re biderfet a. Ku mirovek ji wê civatê jî bê, ku bi zimanê wê civatê xwe neyêne ser ziman, nikarê bêje ku ez ji wê me. Î ro, tenê, mirovên ku ji xwe re dibêjin ´em nivîskarê kurd´ jî, tenê li dîyaspora, pirtûkxaneyek bi zimanê tirkî afirandin. Bi vê rengê, hemû karê xwe bi tirkî kirin. Ev xizmetaka mazin a ji zimanê tirkî re ya. Lê ne xizmeta ji zimanê kurdî û ji civate kurd re ya. Di dîrokê de, ku bê pirsin ku di nava kîjan civatê de nivîskarên wê ne bi zimanê civate xwe û bi zimanekî din dinivîsênin û wê asîmle dikin û bi vê rengê bêbaxtî li civate xwe kirina, wê di cih de navê nivîskarên kurd were bîra mirov. ..

.. **Ku** em bahse zimanê kurdî bikin û di wê de bahse perwerde kirinê bikin, divê ku em bahse dîrokeka pirr kevn bikin. **Di van demên ku di rojava kurdan de ya ku bi**

**zimanê xwe yê dayikê perwerde bibînin, hin gotin bi şaşî dihên ser ziman. Hin gotin, weke ku dema ku dewleta tirk, ew qadaxaya danîya ser zimanê kurd, ku rakir û pê de, êdî wê ji care pêşî perwerde di kurdî de bibe întîbayek dihê afirandin di mejîyan de. Lê ev întîba, pirr şaş û xelat a. Ji xwe, rayadarên dewleta tirk, berî î ro, bi caran gotinên qirêt li dijî zimanê kurdî bikarhanîn. MInaq, mirovên weke BIlant Arinc, derketina berçapameniyê gotinê ku "zimanê kurdî, ne zimanekî şariştanî ya ku di wê de perwerde bibe." Her wusa, gotin ji devê T. Ardogan jî û her wusa, gelek rayadarên din ên dewletê û hikimeta AKP´ê jî derketîya. Heta ku rayadarên dewletê û hikimeta AKP´ê derketina berçapamaniyê û gotina ku "xwestina perwerdeya bi kurdî, karê şaytên a." Bi wê re jî bi sînor nema û gotina ku "xwestina perwerdeya bi kurdî kirina li gorî şaytên a." Bî vî rengî, pirr gotinên qirêt, ji devên rayadarên dewlet û hikimeta tirk hatina gotin.**

Bo ku zimanê kurdî, di mejiyan de reş bikin û ankû piçûk bidina nîşandin, çi ji wan hatîya kirina. Gotinek nemaya ku ne gotina. Kirinaka bi hêrîşkarî ku bikin nemaya ku ne kirina. Di roja me de jî, ev hêrîşa li zimanê kurdî dibin. Lê ez di wê bawerîyê de me ku di vê dema ku tê gotin ku "Pakêta demokratik tê amede kirin de." Çend ku kurd, bi yekdengî di nava xwepêşandinan de na ku ew qadaxaya li ser zimanê wan were rakirin de jî, dîsa wê hikimeta AKP´ê, wusa xuya dike ku wê bixwezê ku wê qadaxaya li ser zimanê kurdî bide domandin. Bo vê yekê jî, wê gotinên xapandinê, bi gotinên piçûkxistinê re di rojên me ên piştî vekirina pakêtê ji raya giştî re wê pirr werina kirin. Ji ber ku dewlet, hê jî, di înkare kurdan de îsrar dike. Naxwezê ku zimanê kurdî, serbest were hiştin weke zimanê perwerdê. ..

Zimanê kurdî, di demên me yên ku buhurîna de, rayadarên dewletê, pirr hewldan ku weke zimanekî ku di wê de "derfet tûna ya ku perwerde were dayîn" bidina nîşandin. Pirr ketina nava hewldanên bi vî rengî de. Lê di hewldanên xwe de, bi serneketin. Piştre jî, gotinên qirêt û bi armanca reşkirinê bidest gotinê kirin bo zimanê kurdî. Lê bi wê jî, biserneketin. Hemû hewldan û gotin û reşkirin, tenê armancek di temenê wê de hebû. Ew jî, ew bû ku zimanê kurdan bixwe li berçavên wan reş bikin û piçûk bikin û pêşî li wan bigrin ku ew xwesteka perwerdeya bi zimanê kurdî bixwezin. Bi vê yekê, di vê demê de jî, emê rastî gotinên bi vî rengî werina weke ku di demên berê de em rastî hatina. ..

**Zimanê kurdî, dîroka wê pirr kevn a. Em ku li ser gotinan re herin, em divê ku bibêjin ku dîroka wê diçêt ta dema Sûmerîyan. Ku em li ser gotinan re bibêjin gotinên ji zimanên kurdî, pirranîyan wan, em ji dema Sûmerîyan, piştre jî ji demên gûtî, hûrî û Mîtannîyan û hwd kifş dikin. Ji dema Medîya jî ku ji avesta û hwd bê, em kifş dikin. Ev pêvajo û demên şariştanîyê, demên şariştanîyê ên civate kurd û her wusa demên şariştanîyê ên ku bi pêvajo bi pêvajo ku di zimanê kurdî re pêşketina na. Gotinên weke "ziman," "zanîn", "hiş", "Laleş", "aşîtî", " hawar", ", "sittar", û hwd, çend ji wan gotinên dema aqil in ku em dikarin ji dema hûrî û Mîtannîyan ku kifş bikin û bênina ser ziman in. Her wusa, ku em tenê bikevina nava kifşkirina gotinên ji zimanê kurdî ji van deman û hwd, emê pirranîya gotinên zimanê kurdî kifş bikin. Heta roja me jî, hemû gotinên ziman, ên ku bi ferhengî hatina kifşkirin û nivîsandin û hwd, ku ferhengên Celadet Alî bedirxan û hwd jî di nav de, hemû bi gotinên ku ji wan demên berê bi kifşkirina wan re bi sînor nemana. Ev rewş, weke rewşeka teybet, ku em dikarin bo ´zimanzanên´ kurdî ên**

**roja me bênina ser ziman a. Yanî, tenê hewldane ku ên demên berê kifş bikin û hwd**. ..

Di demên piştre ên weke demên hemdem demên Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ahmedê Xanî û hwd jî, demna pêşketî ku di wan de li gorî astaka ku em nikarin ji ast û pêşketina roja me dûr şîrove bikin, di wan de perwerde kirinaka mazin hebû. LI vir, divê ku ez vê yekê jî bibêjim ku Melayê Cizîrî jî û Ahmedê Xanî jî, du ji wan mirovên zane ên kurd bûna ku jîyane xwe hemû dane perwerde kirinê. Berhemên wan ên ku nivîsandina jî, di temenê berhemên perwerde de bûna. Her wusa, zaneyên kurd, ên ku misilman bin û ku êzîdî bin, giringî dane perwerde kirinê. Di wê temenê de gotina xwe gotina û ketina nava hewldanê de. **Her wusa, ji dema Şêx Adî jî, ku em hildina li dest û heta ku dema Şêx Faxr Adîyanî û hwd, ku zaneyên êzîdî û hwd jî, di vê temenê de hebûna. Nêzîkatîya wan, hertimî li ser rastîya civatî bi perwerdekirinê re dihê li berçav.** Di vê temenê de, divê ku em bibêjin ku ji bilî oldarî û zanetîya wan, bi awayekî din jî bi mamostetîya wan jî, divê ku mirov li wan binerê û wan fahm bike û hilde li dest û bêne ser ziman.

Zimanê kurdî, wê heta sale 1923´an, wê di wê de perwerde bibe. Piştî ku komare tirk di vê demê de ava bû û piştre, êdî çû bi ser kurdan de û zimanê kurdî hat qadaxa kirin. Li ser wê re jî, hemû berhem û nivîsarên bi kurdî hatina ji holê rakirin. Gotinên "kurd" û "Kurdistan"ê, bûna gotinên ku dema ku dihatina bi lêvkirin, ya mirov bo wê bi lêvkirina xwe dihat kuştin û yanî rastî cezayekî pirr mazin dihat. Ew qadaxa kirina li ser van gotinan, heta roja me jî didomê.

**Ji destpêka komarê û heta roja me, bo ku zimanê kurdî newê bikarhanîn û bo ku ev ziman were ji holê rakirin, çi ji destê dewletê hat kir. Hê jî, dike. Bi vê yekê re, divê ku mirov bibêje ku di vê temenê de dihê bi ser kurdan de. Li vir, divê ku ez bi teybetî binxat bikim jî, ev pakêta qaşo ku weke "pakêta demokratik" tê bi nav kirin jî, wê di wê de hezar û yek lîstikî bikin bo ku bi wê bertekên kurdan ên bo zimanê wan ê dayikê bidina şikandin. Ev yek, wê bibe. Her wusa, wê li ser rêbazên weke bi hewldane dane herêkirinê ya pakêtê bi zorê bi kurdan bê, her wusa bi hewldanên reşkirina zimanê kurdî bê û hwd, wê ev rêbaz û lîstik, di demên pêş de zêdetir bibin. Li vir jî, wê hewl bidin ku wê qadaxaya li ser zimanê kurdî bidina domandin. Hemû lîstik û kirinên rayadarê dewletê ên bêrûmet, wê bi armanca domandina wê wê qadaxaya li ser zimanê kurdî bê**.

Zimanê kurdî, dema ku em di wê de bahse perwerdeyê bikin, divê ku em bahse rewşeka teybet bikin. Ew jî, her wusa ew a ku di demên berê de û ji berê ve di zimanê kurdî de ji xwe perwerdekirinê hebûya. Ji sadsale 20´an û pê de, gelek ji ziman, pêşketin û bûna weke zimanên perwerde û êdî di wan de bidest dayîna perwerde hatina kirin. Lê li herêmê bi zimanê kurdî re rewşek vajî wê afirî û pêşket. **Ji ber ku zimanê kurdî, berî wê demê jî xwediyê pergale xwe ya perwerde bû. Di wê de perwerde dihat kirin. Lê perwerde di wê de hat ji holê rakirin. Bi vê yekê, zimanê kurdî, ket rewşeka nû de. Gotinên rayadarên tirk ên weke Bilant Arinc û hwd, ku dibêjin "zimanê kurdî, ne zimanekî şariştanî ya ku di wê de perwerde bibe" jî, hinekî bi armanca ser vê rewşê dîrokê girtin jî dihê gotin. Yanî, ev gotin, tenê bi armanca reşkirinê nayêna gotin. Ji wê zêdetir, bi armanca vajîkirina rastîya jî ya zimanê kurdî jî dihên gotin. BI van gotinan, di xwazin vê întîbayê jî di serê mirovan de bidina çêkirin ku zimanê kurdî di van demên dawiyê de pêşketîya û hatîya wê astê**

**ku kurd dixwezin ku di wê de divê ku perwerde bibe. Lê ev ne rast in. Zimanê kurdî, zimanekê ku em tenê di temenê demên piştî zayina Îsa de bibêjin. Êlîye Herîrî di wê de perwerde dîtîya û daye. Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ahmedê Xanî û hwd, di wê de perwerde dîtina û dane**. Di aslê xwe de, tenê ku em ji destpêka avabûna komara tirk û hwd û pê de, hildina li dest, emê bibînin ku wê hewl bê dayîn ku ew rewşên pêşketî ên di zimanê kurdî de bo ku hundurê wê were darxistin wê hewldanek hebe.

Dibistanên ku di wan de kurdan zaroyên xwe perwerde dikirin û hwd, wê bên girtin û ankû qadaxa kirin. MInaq, piştî avakirina komarê û hwd, hê di salên pêşî ên ku di wan de komara tirk avabûya de, wê gelek oparayonên leşkerî wê li jîyane sivîl ya Cizîra bota bixwe jî, werina kirin. Armanca wan, ew bû ku dibistanên û ankû medreseyên kurd ên weke "medreseya sor" û hwd ku di wan de bi sadsalen perwerde dihat dayîn werina ji holê rakirin. Hinekî jî, di aslê xwe de, ew oparayon, li wê temenê wê medreseya sor û hwd bûn. Di wê demê de, ew oparasyonên ku piştî salên 1925´an û hwd hatina kirin, di nava gelê herêmê de jî, heta roja me jî, pirr vegotin li ser wan dihên vegotin. Di hin vegotinna de dihê gotin ku "diçûna cihên weke medreseya sor´ û wê çi di hundurê wan de hebê bi nivîskî, wê derxistin û bibin". Ev gotinên bi vî rengî, ku heta roja me jî dihên vegotin, di aslê xwe de rastîyeka giring bi xwe re dihanîn ser ziman. Ew jî, ew bû ku bi tememî, zimanê kurdî ji jîyanê dûr bikin. Di vê temenê de, piştî salên 1930´ û hwd, êdî dewletê tiştekî din kir. BIdest amedekirina ferhangna ku di wan de piranîya gotinên kurdî weke ên "zimanê tirkî" ku werina ser ziman. Gotin ku ne dikarîn ku bi zimanê tirkî werênina ser ziman jî, bo wan digotin ku "ev gotin, ji zimanê farisî na." Bi vê rengî, hewl didin, bi xalkê bidina bawer kirin.

Lê çend ku zimanê bi vî rengî, hewl dan ku ji holê ra bikin jî, tiştekî din li pêşîya wan weke asten hebû. Ew jî, "navên kurdî" bûn. Wê çawa ew nav ji holê rakiriban.? Bo vê yekê jî, bi teybetî êdî bi derxistina "zagona nav û paşnav" re hewl dan ku wê rewşê jî li gorî xwe rast bikin. Dewletê, di wê demê de di temenê vê tedbîra xwe de, hingî, di cih de çend pirtûkên ku di wan de navên ku werina bikarhanîn bicihkirina li herêmê belav kirin û da zanîn ku "ji van navên di van pirtûkan û pêde, navna din werina bikarhanîn wê qadaxa bê." Di vê temenê de, êdî piştre bi mecbûrî, her malbatên ku zaroyên wan çêdibûn, mecbûr diman ku navên zaroyên xwe ji wan "pirtûkên nav û paşnavan" hilbijêrên. Ev rewş, weke tedbîreka dewletê, ya asîmlekirinê ya li ser navan re bû.

Heta sal tê salên 1990´î û pê de, wê ev rewş bidom in. Lê di van deman de, derketina tevgera azadîya kurd û gihiştina wê ya girseyan, wê pêşîyê li vê bigrê. Piştî pêşketina tevger azadîya kurd wê êdî hin bi hin navên kurdî di nava xalkê zêdetir werrina bikarhanîn. Di demên berî salên 90´î û hwd de jî, kurdên ku li dijî wê rewşê derdiketin û navên kurdî li zaroyên xwe dikirin hebûn. Lê wan jî, bi tirs ev dikir. Piştî ku zaroyên wan dibûn, ya wê navê kurdî zaroyên xwe bikin û wê qayda zaroyên xwe nekin û ´nasnema´ ji wan re dernexin û yan jî wê dema ku zaroyên xwe qayd dikirin û ji wan re derdixistin, wê navekî din ê bi tirkî bibînin bi wê zaroyên xwe qayd bikin û nasnema ji wan re derxin û di jîyanê de jî bi navê kurdî jîyane zaroyên xwe bidina domandin. Ji destpêka komarê û heta roja me ev rewş bûya. Û ez vê yekê jî bibêjim ku heta roja me jî, pirranîya kurdan bi du navan in. Navê kurdî ê ku dê û bavê wan li wan kir û navê ku bi wê xwe qaydkirina û bi wî navî ku xwediyê nasnema na. Kurdan, di nava xwe de ji wê navê ku bi wê qayda xwe dikirin re digotin navê "nasnmê". Navê ku

ji piçûkatîya xwe yanî ji dema bûna xwe ku ji dê û bavê xwe re girtina jî, ji wê re digotin "navê rast."

-- Piştî salên 1990´î ûû pêde, kurdan êdî bi girseyî bidest bikarhanîna navên kurdî kirin. Lê di wê demê de jî, êdî hin bi hin ji ber ku bi zimanê dayika xwe ê zimanê kurdî perwerde ne didîtin, êdî gelek kurdên bi navê "rêzan", "baran", "Zelal", "zîlan", "xoşnaw" û hwd bûn, lê ku tenê gotinekê jî bi zimanê dayika xwe ne dizanîn. Yanî, bi nav û rengê xwe kurd bûn. Lê zimanê xwe yê civatî û dayikî zimanê kurdî ne dizanîn.

Di vê ku mirov vê yekê jî bibêje ku heta salên 1990´î û hwd jî, bi medreseyan re yanî bi perwerdeya olî û hwd re, gelek kurdan bi kurdî xwandin. Piştre jî, di aslê xwe de, ev camaate fethullahçîyan û dibistanên weke ên bi navê "îmam Hatîp" û hwd, weke tedbîrekê ji vê rewşê re hatina pêşxistin û li kurdistanê di nava kurdan de bicih kirin. Yanî, wê çawa kurdan bi dewletê ve girêbidin û wê çawa zimanê kurdî ji jîyane wan derxin, hinekî bo vê yekê pêşketin. BI vê yyekê, bi sadan dibistan ên bi rengê ´îmam hatîp´an bin û ankû dibistanên ku ´dibistanên şevborîn´ bin ku bi tikî ji wan re "yatili okul" dihatin girtin û hwd hatina pêşxistin. Ev jî, weke tedbîra duyemin bû ku bi wan zimanê kurdî ji jîyane civatî ya kurdan dûr bikin û li şûna wê zimanê tirkî bicih bikin. ..

Ev rewş, wê piştre zêdetir bibin. Wê bi demê re, li gorî xwe di temenê asîmlekirinê de, wê hin ancamna jî bidest bixe. Dewletê, di vê temenê de, pêvajoya asîmlesyonê da domandin.

**Bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku li herêmên kurdan bi vî rengî li ser zagon û destûrên ku hatina derxistin re hertimî rastkirin hatina kirin. Wê çawa pêşketina civatî a kurdan pêşî lê were girtin, li ser vê yekê pirr serî hatîya wastandin û bergir(´tedbîr´)ên ku hatina girtin bûna. Zagona ´nav û paşnavan´, zagonên xwandinê, zagonên niştecihbûnê û hwd, hemû di vê temenê de hatina amede kirin. Li kurdistanê, heta roja me jî, nav ´kurd û ´ Kurdistan´ê qadaxa na. Di demên berê de, ên ev gotin digotin û ankû bi lêv dikirin, ji kuştinê bigrê heta ku digihişt gelek rengên din ên "ceza"kirinê bo wan dihat hanîn li cih. Bo vê yekê, destûr û zagonên destûra bingihîn a dewletê li gorî vê hatibûbûna rastkirin. Minaq, wê weke ku di roja me wê dema ku komkujiyên weke "komkujiya Roboskî" û hwd ku hatina kirin, wê bi destûrî û şîroveyên destûrî û hwd, wê çawa ser wan were nûxûmandin û hwd, di vê temenê de ew destûr û zagon di hatina bikarhanîn.**

Zimanê kurdî, bi vê yekê û rengê, ji destpêka komare tirk û hwd, hewl hat dayîn ku navaroka wê were valakirin û piştre ji holê rakirin. Di vê temenê de, bi destûr û zagonan, hat rastkirin ku "wê tenê perwerde bi zimanê tirkî bibe." Piştre jî, li ser wê perwerdekirinê re, wê mirov çawa bawer bikin ku ´tirk´ in û ankû ji wê tirkitiy na û hwd, li gorî dewletê tedbîr girtin. Li ser wê re jî, çû bi ser kurdan de. Qadaxaya zimanê kurdî, tedbîrek ji wan tedbîran a mazin a.

Zimanê kurdî, berê zimanekî perwerde bû. JI ber vê yekê, ya ku herî zê de li pêşîya ji holê rakirina zimanê kurdî ji aliyê dewleta tirk ve dibû ev. Zimanê kurdî, rewş û qalibên wê ên perweerde ku di serê mirovan de rûniştî na, pêşî dewletê hewlda ku wan ji holê ra bike bi qadaxa kirinê. Lê piştre dît ku wê nikaribê, bi qaaxa kirinê ji holê ra bike, piştre êdî hewldanên ji nû ve şîrove kirina wan qalib û rewşan di nava pergela perwerde ya tirk de kir ku wan bi navê tirkî û hwd werêne ser ziman. MInaq, dema ku dewletê oparasyon li Cizîra bota kir bo ku medreseya sor û temenê wê ji holê ra bike û ku piştre ku qadaxa kir ku di wê de perwerde were dayîn jî ku nekarî pêşîya wê bigrê, êdî weke

rêbazeka din ya ku pêşxist ya tirkkirina wê bû. MInaq, bi vê armancê, "îmam hatîp" hatina vekirin ku dewsa wan medrreseyên kurdî ku di wan de hertimê perwerde bi kurdî dihatina dayîn ji holê ra bike. ´ Îmam Hatîp´, rengekî dewşîrmekirî yê medreseyên kurdî ên berê bû. Bi armanca ji holê rakirina wan medreseyên kurdî hatin pêşxistin.

Zimanê kurdî, ne zimanekî ku di wê de pergale perwerde pêş diket û dixwestin ku pêşîya wê bigrin bû. Zimanê kurdî, di wê de ji xwe di demên berê de perwerde dihat dayîn. Hemû bergir(´tedbîr´)ên ku dihatin girtin ji aliyê dewletê ve, bi armanca asîmlekirin û ji hevdû felişandina vê pergale perwerdeyê ya di hundurê zimanê kurdî de ku bi sadsalan pêşketibû û hebû bû. Yanî, bi armanca tûnakirna wê pergale perwerde ya di hundurê ziman de bû. Di vê temenê de divê ku mirov li rastîya zimanê kurdî binerê. Zimanê kurdî, di wê demê de pergale perwerde û bi awayê perwerde kirin, bi awayekî pêşketî heya. Minaq, di **Ebûlîzê Cizîrî,** zanyarekî kurd a ku di sadsale 11´min de jîîya ya û li ser teknîk û fîzîkî hin kifşên wî bûna. Ev, pêşketinên di ancama perwerdekirinê de ku di zimanê kurdî de bi dîyarî xwe dane li der in. Her wusa, gelek pêşketinên bi vî rengî ku em dikarin bahse wan bikin hena di zimanê kurdî de.

.. **Kurdên** li ewropa bi hezaran derfet di destê wan de hebûn ku hem çanda xwe pêş bixin û hem jî zimanê xwe. Li ewropa, her pêşketina ku wan di zimanê xwe de da çêkirin, wê di pêşketina civate wan a li kurdistanê de jî rol û weyn bileyîsta. Lê mixabin, kurdên li ewropa ev yek bi başî ne kirina û bikar ne hanîna. Hata ku ez dikarim bibêjim ku derfetên ku derketina li ber wan ji sadî 10´ê wan jî baş bikar ne hanîna.

Di van rojan de bahse ´kampanya fêrbûna ziman dihê kirin ya bi dirişma "ne hat fahm kirin." Lê divê ku mirov bibêje ku çend pûrtûkên wan ên bi kurdî jî tûna na ku bigihijênina mirovan ku ew bixwênin. Dev ji wê berda, di roja me de, pêşketin pirr bi lezekê bi rê ve diçê. Salê bi sadan pirtûk tên weşandin li her welatî. Di nava kurdan de, sazîyek rewşenbîrî tûna ya ku salê çend pirtûkan ji wan wergerêne li zimanê wan ku ew bixwênin. Nûha jî, dema ku bahse ku kampanya ziman û fêrbûna wê were kirin, divê ku mirov bibêje ku heta roja me, ev ji gotinê ne buhurtîya. Kampanya, ew a ku dema ku te bahse wê kir, tê bernemeya xwe ya kampanya derx û tê di wê çerçoveyê de bibêje ku ezê halqa pirtûkan wergerênin û ankû bidiman nivîsandin û bigihijênima mirovan ku bixwênin. ..

Dema ku rojnema, kovar û hwd, ên ku xîtabî kurdan bikin ne bi kurdî bin, mirov wê çendî karibê bahse pêşketina ziman bi kampanya bike. Tenê ji bo ku mirov bibêje mirov ´kampanya li darxist´, kampanya nayê kirin. Kampanya armancaka wê heya. Heka rast, di çerçoveya wê kampanyê de dihê xwestin ku bi ser kevin, divê ku ew rojnema, kovar û hwd êdî zimanê civatê xwe bikarbênin. Li ewropa, dema ku zaroyek li wir mazin bû û piştre ku çû sazîyeka kurd, li wir ji dêla zimanê kurdî, zimanê tirkî fêr dibe. Kurdên ku li ewropa mazin bûna, zimanê kurdî nizanin. Lê zimanê tirkî ji zimanê welatê ku lê dijîn bêhtirî û baştirî dizanin.

Ev rewş, di nava kurdên li ewropa û ankû li dîyaspora de, bûya weke sendromekê jî. Li ewropa, derfet pirr zêde jî hena ku ziman û çand were pêşxistin. Lê tenê hewceyî bi çend mirovên ku dixwezin ku pêş bixin û ku zanibin pêş bixin heya.

Sazîyên ewropa ku rast bixwezin bibina bersiv ji xwestekên civate xwe re, di serî de divê ku pirtûkxaneya xwe wergerênina kurdî. Saziyên wan ên rewşenbîrî zimanê civate xwe bikarbênin. Çend ku î ro kampanya fêrbûna ziman ya bi dirişma ´ne hat fahm kirin´ hatîya destpêkirin jî, di wê çerçoveyê de tii rêxistinîtî û pêşketin tûna ya.

Tenê bi çend gotinan derketina ber mirovan gotina "li zimanê xwe xwedî derkevin" û hwd, wê ti tiştek nebê. Kampanya ew a ku bi sazî temenê wê were afirandin a. Çi temen hatîya afirandin? Î ro, divîyabû ku li komelên kurdan ên li welatên ewropa pirtûkxaneyên bi hezaran pirtûkên bi kurdî heban. Û divîyabû ku dem bi dem li gorî demê pirtûkên nû hem bi nivisandiba û hem jî bi wergerandina ji zimanên din ba, lê hatibaa zêdekirin û ew hatiba dewlemend kirin. Lê ev nebûya.

Di roja me de, ev karên rewşenbîrî, herî zêde di nava ciwanan û hwd de, li pêş in. Pirtûkên ku xîtabî ciwanan bikin, pirtûkên ku xîtabî Jinan bikin û ku pirsgirêkên di wan de werina ser ziman bi zimanê civate wan, pirtûkên li ser dîrokê, civaknasiyê, çandê, derûnîyê û hê gelek beşên din û hwd, divîyabû ku heban. Bi rastî jî, li ewropa derfet hebû ku pirtûkxaneya kurdî ya bi vî rengî bi hezaran pirtûkan were afirandin. Lê ji xamsarî û bêxîretî ev ne hatîya kirin.

Li ewropa, nêzî 2 milyonan kurd hena. Ev dibe pro-tîpa kurdistanê bigiştî. Ji hemû beşên civate kurd li ewropa li dîyaspora hena. Her wusa, ev dikarî weke firsandekê biheta ditin û ji bo civatekê û pêşketina wê çi pêwîstî pê heya û çawa dikarê pêşketina xwe bike û bi çi bike, biheta kifşkirin û hemû di nava wan kurdên dîyaspora de biheta kirin. Wê ev yekê, ne tenê wan xilaskiriba ji helandin û asîmlebûnê, her wusa wê kedaka mazin ya wan jî bo pêşketina civate wan wê bi vî rengî biafirîya. Ya ku wê pêşketineka di rengê demê de bide afirandin di nava civatê de jî ev bixwe ya. Bi vê rengê, wê bandûra asîmlasyona wan mirovên ku ji xwe re dibêjin "em nivîskarên kurd in" û bi tirkî nivîsênin ku li civate kurd dimeşênin jî wê bê şîkandin.

Dema ku em di çerçoveya civatê û têgihiştina civatî de hildina li dest, divê ku mirov bibêje ku bi ppêşketina bi demê re pirsgirêkên pêşketinê jî xwe didina li der û li berçav. Pirsgirêkên navmalbatî, pirsgirêkên civatî ên pêşketinî, pirsgirêkên fêrbûn û ziman û hwd, em dikarin hê gelek pirsgirêkên din werênina ser ziman. civat, pêwîstî pê heya ku rewşenbîrên xwe derxe û pirsgrêkên xwe bi wan çareser bike. Bi teybetî, ji aliyê pêşketina ziman û parastina çand û nirxên civatî bi mirov re û hwd, gelek tiştên ku bi komelî werina kirin hena. Bi teybetî, di vê çerçoveyê de, di serî de, ji aliyê rewşenbîrî û çandî ve divê ku temenekî giring ê mazin were afirandin û pêşxistin.

Wek tê zanîn, zimanê kurdî li kurdistanê ji aliyê dewleta tirk ve hatîya qadaxa kirin. Ev jî, ne tenê ji aliyê civatî û keseyetîyê ve pirsgirêkên civatî, civakî û civaknasî, derûnî û hwd jî diafirênê. Bi wê re, hê gelek pirsgirêkên din jî di nav de, bi dehan pirsgirêk diafir in. Di çerçoveya civatî de ku mirov bibêje, ji aliyê çandî ve ku bi zimanê xwe mirov xwe pêş bixe, ne tenê bo pêşketina mirov a ji aliyê zanînî ve giring a. her wusa, ji aliyê derûnî ve jî pirr giring a. Ez dikarim bibêjim ku mirov ku bi zimanê xwe pêşketina xwe jîya û ankû bi xwe re da çêkirin, weke birîneka ku çawa ku dihê dermankirin û piştî derman kirinê baş dibe, wê bi heman rengî ji aliyê derûnî ve jî bandûra wê li ser civate kurd bibe. Bi wê re divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku her nivîsandina ne bi zimanê civatê û li ser civate farzkirina wê, bi xwe re ne tenê asîmlasyonê dihêne. Her wusa gelek pirsgirêkên derûnî ên giring ên civatî jî bi xwe re dihêne.

Carna, dema ku em bahse qadaxaya li ser zimanê kurdî dikin, em tenê ji aliyê asîmlekirinê ve nêzîkî meseleyê dibin. Lê ev tenê bi serê xwe jî ne têr a û kêm a. Divê ku mirov bi zimanê civate xwe xwand û pêşket û bi wê jîyane xwe domand, bi zanistî jî hatîya kifşkirin li ser derûnî û pêşketina mirov bandûra wê pirr mazin a. Her wusa divê ku mirov vê yekê bibêje ku xwand û pêşketina mirov bi zimanê xwe yê dayikê, mirov

dikarê bi tijbihêne mirovekî ku ji aliyê derûnî ve ku pirsgirêkên wî hena û li ber derûnvan(psîkolog)ê xwe rûniştîya ew derûnvanê wî êdî wê derman dike. .. **Zimanê civatê, hinekî bikarhanîna wê, ji aliyê rewşenbîrên wê ve bê û ji aliyê sazî, komelên wê hwd ve bê, civatê ji aliyê derûnî ve derman jî dike. Yanî bi gotinaka din, bikarhanîna zimanê civatê di nava wê de û bi teybetî bikarhanîna zimanê dayikê ji aliyê her mirovî ve, hinekî karekî wê yê dermankirin û tarapîtîya wê heya.Mirov dema ku diçê cem derûnvan, tarapîyê dibîne. Lê mirov bi zimanê xwe yê zikmakî ve ku di farqê de bî û ku ne di farqê de bê, wê tarapîyê bi jîyane civatê re dijî û bi xwe re dike**.

Gelek pirsgirêkên malbatî ên weke pirsgirêkên keseyetî, pirsgirêkê ji hevdû cudabê û hwd, di temenê wan de jî, ev pirsgirêk hena. Mirov, dema ku ji civatekê bê û di malbate wî de ew çand hebe û di nava civateka din de bijî, wê ev bê temenê gelek pirsgirêkên derûnî û keseyetî. Mirov, di malbata xwe de, êdî di wê rewşeê, hat ku mirov dikarê bibêje ku dikarê bikeve rewşeka ku nikarê têkiliyê bi jin, zaro û xizmên xwe re jî dêne. Ev rewş, bo jinê hê zêdetir a. Bi tememî, dikarê ji hemû rewşên wê ên jîyanî û malbatîtî jî bide dûrkirin jî. Mirov, ku di nava civate xwe de û ankû ku bi çand û zimanê civate xwe serdestîya wî û ankû wê hebe, wê karibê serdestiyê di nava jîyane civatên din jî ku bikeve nav de wê bijî. **Li vir, di temenê hemû serdestî û serwerîya keseyetîyê de, nirxên civatî hena**. Ji vê aliyê ve, dema ku em nêzîkatîyê li pirsgirêkên civatî û ên keseyetî bike, divê ku mirov wê destûreka bingihîn, nêzîkatîya civatî ya bi derûnîya wê ji bîr nekê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku ne tenê di nava kurdên li dîyaspora de, ku li kurdistanê û di nava wê bixwe de jî bê, dema ku sazî, rêxistin û komelên civatê û hwd, ku ziman, çand û nirxên civatî di nava xwe de weke temenê xwe bikarneyênin, wê heman pirsgirêkê bixwe re û bi civatê re jî bijîn. Her sazî, komel, rêxistin û hwd, divê ku bi teybetî ji sê aliyan ve bersivê bide civatê. Aliyê pêşî ji aliyê çandî û zimanî ve ya.Her wusa, divê ku mirov bi vê aliyê pêşî te gotina ´têkiliya civatî´ jî bêne ser ziman. Aliyê duyemin, ji aliyê ragihandin û gihandina xwestekên civatî û hanîna wan a li cih a. Aliyê sêyemin jî, dewrûdayîmtîya di wê de ya. Weke ku me di xale pêşî de got, "têkiliya civatî", bo danîna wê û pêşxistina wê, hewce nakê ku mirov li kurdistanê bê. Ku mirov li kûdera cihanê jî bê, mirov dikarê wê dêne. Hertimî jî, pêwîstîtîya wê heya. Têkiliya civatî, li ser ziman, çand û her wusa hemû nirxên civatî ên ku afirîna û ên ku diafirin re ya.

**Di roja me de ´têkiliya civatî´, çendî ku pêşketin bi mirov re û bi civatê re bibe, wê giringîya wê zêdetir jî bibe. Wê hê zêdetir pêwîstîtîya bi wê jî zêdetir jî were ditin û fahm kirin. Bo vê yekê, dema ku mirov ew rêya têkiliyê bi civate xwe re û ziman û çand û nirxên xwe re nedît, wê hewl bide ku bi heman rengî têkiliyê bi nirxên civate ku di nav de jî re dêne.** Lê ew têkilîya ku dêne jî, wê hertimî ji aliyê derûnî ve mirov di rewşekê xwe kêm dîtinê de bide hiştin. Ev jî, wê ji binî ve hemû rewşên pêşketina mirov bi bandûr jî bike. Mirov, mirovekî civaknas a. Hertimî, pêwîstîtîya wî û ankû wê bi têkildanîna wê bi nirxên civatî û hwd re heya. Dema ku li gorî wê xwesteka xwe û li gorî wan pêdivî û pêwîstînîyên xwe yên derûnî û civaknasî ew rewş bi têkilî ne dît û ji bo wê keseyetîyê ne afirî, wê hingî, tengezerî(krîz)yên keseyetî yek bi yek li dûv hevdû wê biafirin û xwe bidina li rû. Mirov, wê dibin wan de bimêne. Ev, wê gelek pirsgirêkên keseyetîyê bi xwe re bêne. Ev pirsgirêkan, ku mirov

dawî li jîyane xwe bêne jî di nav de wê pirr ancamên wê yên ku em nikarin bi aqilê xwe di wê kêlîke ku mirov dihizirê de ku wê bêne ser ziman êdî wê hebin. Her wusa, ji jîyane ketin, depresyon, xwe piçûk ditin, zû bi hêrîsbûn, bêtahamûlîtî, pêşîya ne ditin û di derbarê pêşaroja xwe de nebûna xwediyê ti hizrên şenber, windakirina hêsta xwe ya ku xwe aîdî civatê dîîtinê û hwd, çend ji wan ancamên ku derûnvan jî li wan dihizirin û kifş dikina ji vê keseyetîyê. Bi wê re jî, di temen de bêhêvîtî û ji xwe ne bi bawer bûn jî hena. Di cudabûna jin û mêran, pirsgirêkên navxweyî ên malbatî û hwd jî, divê ku mirov ji bîrnekê ku di temenê wan de ev rewş û keseyetîya bi pirsgirêk heya. Dii van demên dawiyê de di nava civatê zêdebûna pirsgirêkên hevjînan ên jinûmêran bi hevdû re jî, divê ku mirov ji vê dûr neyêne ser ziman. Ew hêsta xwe temem nedîtin û hertimî ji xwe tiştek kêm ditin, wê hertimî bi vê keseyetîye heya, di temenê van pirsgirêkan de jî ya. Bi wê re jî, ev keseyet, ne keseyeteka ku di têkildanînên xwe de serkevtî ya. Çend ku di nava komek heval û ankû mirovên li dora xwe de bijî û bi wan re di axiftinê de jî bê, di xwe de û di hundurê xwe de hertimê xwe bi tenê hîs dike û tenê dibîne. Ji ber ku hêsta wî ya esasî ya civatî ya ji civatî wî di wî de pêşneketîya û ankû windakirîya û cihê wê êdî vala ya. Mirov, çendî ku ji aliye derûnî û civaknasî ve ku xwe rehet hîs kir, wê karibê xwe bi keseyetîya xwe re û bi pêşketina xwe re bijî.

Ev gotina "entegresyonê" jî, divê ku mirov çend gotinan li ser bibêje. Car bi car, mirovên ku derketina dervî welat û ankû li dîyaspora dijîn, bo wan tê gotin ku "di nava civate ku di wê de dijîn pêşxistina entegresyona wan .." bahs dihê kirin. Ev gotin, bi serê xwe gotinaka bi pirsgirêk ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Entegresyon, di carî bo keseyetîyekê ne çareserîya bingihîn a. Entegresyon, di temenê hemû bûhranên keseyetîyê de na. Kengî, mirov bbi civate xwe re pêşketina xwe rast û baş jînkir, piştre di demeka jîyane xwe de herê û di nava civatekê din de bijî jî, wê hingî karibê wê entegreyê bide nîşandin. Lê dema ku ew nejî bê, wê di hêsta xwe windayî de wê bijî. Wê ne jîr bê. Wê nikaribê, di her rewşên ku derkevina ber wî û ankû wê de aqilê xwe baş li gorî ku dixwezê bikarbêne. Di temen de wê pirsgirêkên, ji ziman, civaknasî û derûnîyê, wê hebin. Entegresyon, kengî ku mirov, pêşketina xwe ya zimanî, civaknasî û derûnî bi çand û civate xwe re jîya û piştre li ser wê re ku têkilî bi mirovên civate duyemin re danî, wê hingî di temenekî rast de bê. Î ro, em dikarin bibêjin ku entegresyon di nava hemû mirovên welatên ewropî de heya. Ji xwe, di nava mirovên welatên ewropî de entegresyon di temenekî xweza de ya. Lê hemûyan jî, pêşî li welatên xwe bi çand û ziman re û bi civate xwe re pêşketina xwe jîn kirina. Heta ku bo mirovekî tirk jî ku bi zimanê xwe perwerde xwe hildaya û pêvajoyên pêşketina temem kirina heta astekê em dikarin vê bibêjin. Lê bo yekî kurd, em ti carî nikarin vê yekê bibêjin.

Di roja me de, dema ku em bahse sazîyekê bikin, divê ku em di çerçoveya pêşketina demê de bahse wê bikin. Bi wê re jî, divê ku mirov lê binerê ku ka çendî dikarê bersivê bide pêdîvî û pêwîstînîyên demî. Ev herdû xal weke dû lingên giring ku mirov divê ku li wan bihizirê na. Çendî ku ew bersiv li gorî pêdîvî û pêwîsîtinî hat dayîn, wê ewçendî jî hem ew mirovên wê civatê pêşketina xwe li gorî wê demê bijîn û wê ew sazî û ankû komel jî karibin xwe barî pêşarojê bikin. Her dem û her wusa her rengê pêşketinê ê civatî, li gorî xwe û rastîya pirsgirêkên wê ên demî jî hena ku ji wê pêşketina wê diafir in. ..

.. **Di vê** dema ragihandin û zanînê de, weke tiştekî herî giring û li pêş divê ku mirov

´zanînê´ bêne ser ziman. Civat, divê dema ragihandin û zanînê de, herî zêde dikarin xwe bi zanînê û fahmkirinê û afirandina zanînê xwe biafirênin û barî pêşarojê bikin. Li vir, divê ku mirov vê yekê di serî de bibêje. Ji ber çi dîrok û fahmkirina wê, zanîn û têgihiştina wê, jîyan û hişkirina wî giring a? Ji ber ku di nava civatê de, berî hertiştî ev temenê keseyetîye a civatî jî diafirênin. Dema ku em bahse keseyetîya civatî bikin, em ji kîjan aliyê ve hildina li dest, divê ku em keseyetîyê hildina li dest. Hem keseyetîya mirov ya takekeşî heya û hem jî keseyetîya civatî ku ew keseyetîya mirov li gorî wê afirîya heya. Lê keseyetîya civatî, di temenê wê keseyetîya mirov de jî heya. Ji aliyê derûnî, civaknasî, fahm û têgihiştin û hwd ve, ku çend aliyên din jî werina bîra me û em bi ser ve zêde bikin jî, emê di temenê wan de keseyetîya civatî bibînin.

Dema ku mirov bahse mirovê ku dinivîsêne û ankû weke ku di kurdî de bahse wê dihê kirin ´rewşenbîr´ û hwd, ku em bahse wê dikin, em bahse keseyetîyeka takekesî nakin. Em bahse keseyetîya civatî û xwe hanîna wê ya li ser ziman dikin. Bi vê yekê, rewşenbîrî pirr giring a. Mirov, di jîyane xwe de gotinê bi keseyetîya xwe dibêje. Lê rewşenbîr, ji ber ku gotinên wî û ankû berhemên wî diçina nava civatê û dibina malê civatê, êdî ew dibe keseyetîya civatî.

Ev keseyet, xwe çawa diafirêne û ankû çi di temenê wê û pêşketina wê de heya? Tişta ku heyî, civat û dîroka wê, civaknasîya civatê û her wusa zimanê civatê û hwd hena. Rewşenbîr, xwe xwediyê keseyetîya civata xwe bê, wê xwediyê van teybetmendî û xosletan bê. Wê xwe li gorî wan bêne ser ziman.

Mirov, rewşenbîrekî, çawa dikarê salix bike? Mirov, pêşî li zimanê wî dinerê û li civate ku ew dibêje ku "ez ji wê me" dinerê. Ku ev herdû li hevdû bikin, hingî mirov dikarê wî rewşenbîrî bi navê wê civatê bêne ser ziman. Lê ku zimanê wî zimanê civateka din bê, mirov wê êdî wî weke rewşenbîr û ankû nivîskarê wê civatê bênê ser ziman. Çend ku bi koka xwe ne ji wê jî bê. Minaqa vê yekê, em dikarin ji çend kurdan bin. Çend ku tirkî jî di nivîsênin, dibêjin ku "em rewşenbîrên kurd in". Lê ev derew a. Ew dibêt ku bi koka xwe kurd bin. Lê ne nivîskarên kurd in. Ew nivîskarên civake tirk in û nivîskarên tirk in. Lê van mirovên kurd ên vê gotinê dibêjin, wilqasî ji rastîya xwe û ya civatê û têgihiştina civatî bêxaber in, çend ku bi tirkî jî dinivîsênin, dibêjin ku "em nivîskarê kurd in". Bi vê derewê, ne tenê xwe dixapênên, her wusa, civatê jî dixapênên. Lê bi xapandinê re jî bi sînor namênin, civatê asîmle jî dikin. Di roja me de, ên ku li pêşîya civate kurd bi nirx, dîrok, ziman û civaknasîya xwe pêş bikeve asteng in jî, ev dordor in.

Ev dordor, wilqasî, ji aqil ve xizanîn û hajar in, nayê gotina. Dîrokê nizanînin. Civatê nizanîn û fahm nakin.

Nivîskarê Magrîbî Adward Saîd, gotinaka pirr xweşik gotibû. Wî wusa gotibû. "keseyetîyên bindest, hertimî dixwezin ku xwe weke metinger û ankû serdestê xwe bikin." Ev keseyet dixwezê ku weke serdestê xwe bihizirê, weke serdestê xwe, zimanê wan bikarbênê û weke serdestî xwe, "rastiyê" fahm bikê.

Ev keseyetîya bi vî rengî ku xwe weke "rewşenbîr" derxe li holê jî, tenê bo wê ya rast ew a ku yê serdestê wê hanîya ser ziman a. Ji wê nabuhurê. Ev keseyet, ku karibê bi zimanê serdestê xwe binivîsêne jî, êdî ew ya herî bi "rûmet" a ji bo wê. Lê tiştekî din jî, pirr giring heya ku divê ku mirov bi vê keseyetîyê re bêne ser ziman. Ew jî, ew a ku ev keseyet, tenê "rewşenbîrîyê" ku di wê zimanê serdestê xwe de bike, wê weke rewşenbîrî dibîne û "rewşenbîrîya rast" dibîne. Weke din jî, ku ne bi wî zimanê serdestê xwe

inivîsêne, wê ti carî ew hîs û hêsta ku ew rewşenbîrîya wê pêre çênebê.

Firanz Fanon, ev derûnî, pirr kûr lêkola bû ji çend keseyetîyên ku ji xwe re digotin "rewşenbîr" û ku bi aslê xwe cezayîrî bûn û ku xwe weke firansizî didan nivîsandin û bi zimanê firansizî dinivîsandin. Bo wan nivîsankaran, zimanê cezayîrîyan, "ne zimanê rewşenbîrîyê bû." Tê ku di wê zimanê fransizî de hanîn ser ziman, wê ew bûba rewşenbîrî. Van mirovan, weke van mirovên ku bi aslê xwe kurd in û bi tirkî dinivîsênin û wê nivîskarîya bi tirkî li ser civate kurd farz dikin, wan jî bi firansîzî nivîsand û civate cezayîrê hanîn ber tûnabûnê.

Î ro, ev keseyetîya bi navê rewşenbîrîyê, civate kurd tûna dike. Zimanê civate kurd terikendîya û bi tirkî dinivîsêne û ji xwe re bi derewînî dibêje "ez rewşenbîrê kurd im". Lê ya herî xirab, ew a ku wî bixwe jî bi vê derewa xwe bawer kirîya.

Gotinaka ku divîyabû ku van "nivîskarên kurd" bigota, Bilent arinc li ser navê wan gotibû û kiribû niqaşê de. Ew gotin jî ew bû ku bilant Arinc gotibû ku "zimanê kurdî, ne zimanekî şariştanî(medenî) ya. Pê perwerde nabê". Li ser vê gotinê re, van mirovên kurd jî, hem yên ku berê bi tirkî dinivîsandin û hem jî yên ku piştre bi dest nivîsandinê kirin, lezdane nivîsandinê bi tirkî.

De ne, serokê van dordora, di serî de gotibû, **"zimanê kurdî, ne zimanekî şariştanî ya ku bi wê perwerde bibe."** Êdî, dibê ku ew jî, bibina rewşenbîr û zimanekî ku zimanê rewşenbîrî ya bikarbênin. Êêê, ew jî, "rewşenbîr in.". Ji bo van mirovan, bitirki û zimanê tirkî nivîsandin, tenê bo wan rûmet a. Ji wê û pê de, ti tiştekî ne bi rûmet a. Ew, wê bina "serdest". Wê bi zimanê serdestê xwe binivîsênin. ..Wê êdî wê bêkeseyetîya xwe, bi wî rengî bi keseyet bikin. ..

Ev derûnîya vê "keseyetîya kurd" ku xwe "rewşenbîr" dibîne, an jî ku em li ser van mirovên ku bi tirkî û ankû bi zimanê serdestê xwe dinivîsênin re bibêjin, bêkeseyetî ya. Keseyetîya wan tûna ya. Ew, çend ku bahse xwe û navê xwe bikin û bibêjin ku "em kurd in" jî, ew bixwe jî, di mejiyê xwe de bi wê bawer nakin. Ew, di rastiyê de di mejiyê xwe de, ji wê "firet" dikin. Derûnîya wan, vê radixe li berçav. her gotinên wan ên ku ew dibêjin, ku mirov lê dinerê, mirov vê bi rehetî bi wan re kifş dike.

**Kengî, ev "rewşenbîr"ên me, ji xwe fihêt nakin? Kengî bi tirkî nivîsandin. Ev "rewşenbîr"ên me, kengî xwe weke rewşenbîr dibînin? Kengî ku bi tirkî nivîsandin. Ev "rewşenbîr"ên me, kengî ji aliyê derûniyê ve xwe rehet hîs dikin? kengî ku bi tirkî nivîsandin. Ev "rewşenbîr"ên me, kengî xwe "rast" û "baş" û "rewşenbîr" dibînin? Kengî ku bi tirkî fahmkirin û nivîsandin. ...**

Di aslê xwe de, ev ne rewşenbîr in. Her yekê ji wan kujarek a. Her yekê ji wan, kujarê civatê ya. Sucê ku dikin jî, ew a ku li ser navê dewletê civatê tûna dikin û ji dîrokê dibin.

Weke serdestê xwe dihizirin, weke wî dinivîsênin û bi zimanî wî dinivîsênin. Sucên ku ew serdest bi qadaxakirina ziman bê û înkarkirina nirxên civatê bê û hwd ku dike, ew jî wê dikin û wê didina domandin. Î ro, li kurdistanê, rojnemeyên tirk, her yekê, dibê ku li kurdistanê di nava kurdan de sad lib jî newina firotin. Lê wê valahiyê ev dordor didagirin. Li ser înternettê re bê, bi derxistina kovaran û hwd re bê û hwd, van dordoran, zimanê kurdî qadaxakirina û zimanê tirkî li ser civate kurd farz kirina. Yanî, ev dordor, î ro wê qadaxaya li ser zimanê kurdî didomênin. Tişta di dunyê herî zêde ne jidil ew a ku ev dordor rabin û bibêjin ku "zimanê kurdî qadaxa ya". Ev, ne tenê nejidilbûna wan dihêne ser ziman, her wusa bêahlaqiya wan jî dihêne ser ziman.

Ku rayadarekî tirk û ankû nivîskarekî tirk, derkeve û ji ber ku van dordoran gotîya "zimanêê kurdî qadaxaya" û ku ji van dordoran re bibêje "hinekî jidil bin", wê pirr rast û di cihê xwe de bê. Ji ber ku rast a. Her mirovê bi rûmet jî, divê ku ji van mirovan re bibêje "jidil bin". Ji ber ku ev ne jidil in. Ji ber ku yên ku zimanê kurdî qadaxa kirina ev dordor in.

Kê pêşîya wan girtîya ku zimanê xwe yê dayikê û ankû zimanê civate ku dibêjin "em jê na" binivîsênin? Ne ti tiştî û ti kesekî. Tenê, ew wê nakin. Ji ber ku ew bêkeseyet in. BI wê bêkeseyetîtîyê re bi wan valahiyek heya. Ew keseyetîya rewşenbîrîya tirk ku afirîya ku herin û xwe li dora wê bigrin û bi wê û zimanê wê bênina ser ziman, wê ji xwe weke "keseyet" dibînin. Ev keseyet, bêkeseyet a. Dîroka xwe nizanê. Di derbarê wê bêfahm a. Civat xwe û keseyetîya wê ya ku bi dîrokê re pêşketî nizanê û fahm nekirîya û ji wê bêxaber a. Ew, mirovê ku ji xwe re dibêje "ez rewşenbîrê kurd im", piçekî jî keseyetîya civate kurd nabînê û nizanê. Fahm nakê.

**Ev "rewşenbîr", civate kurd piçûk dibîne. Weke ku Bilant Arinc gotî, "zimanê kurdî ne zimanê şariştanîya ku bi wê perwerde bibe", ew mirov jî wusa dibîn in. Dîtina Bilant Arinc û ya vê rewşenbîrîya kurd, wekehevdû ya. Ti kesek, nikarê û derkeve û bibêje ev ne wusa ya. Ji ber ku ev rast a. Gotina Bilant Arinc, rafaransa xwe ji wê zihniyeta xwe ya serdest digrê. Ev mirov jî, bi wê zimanê serdest dinivîsênin û bi wê re herê dikin. Yanî, ev rewşenbîrîya kurd, dixwezê bibêje ku "rast a, zimanê kurdî ne zimanekî şariştanî ya ku perwerde pê bibe, em jî bo vê yekê êdî çend bidest nivîsandinê dikin, bi wê zimanê şariştanî ê tirkî dinivîsênin. Peyame van dordorên ku ji xwe re dibêjin ku em "rewşenbîrên kurd in" ji bilant arinc re ev a.**

Rewşenbîrîya kurd, xîyaneta herî mazin li civate kurd kirîya. Dîrok jî û hemû dem jî şahidê vê yekê ya. Î ro, rewşenbîrîya kurd, bûya lingekî giring ê asîmle kirina civate kurd. Nûha jî, wê bi rê ve dibe. Ev lingê asîmlekirinê, bi cameatên weke ên "fethullahçîyan" û hwd re, bi hevdû re di ahangekê de bi rê ve diçin. Bi zanebûnî bê û ne bizanebûnî bê, î ro, rewşenbîrîya kurd, bi vî rengî karekî dîrokî di temenê dijberîya civate kurd de bi rengekî ku xizmeteka mazin ji dewletê re bike, dike. **Di destpêka komarê de, piştî ku dewletê malbata bedirxaniyan ji holê rakir, rewşenbîrya kurd jî ji holê ra bû. Piştre jî, mirovên ku bi navê rewşenbîrîya kurd derketina li holê jî, zimanê civate kurd terikendin û bizimanê tirkî nivîsandin. Ev yek, ya ku dewlet xwestibû bû. Yanî li gorî wê bû. Êdî, van dordoran, pirr mazin destûr girt û bidest nivîsandinê kir. Çend mirovên ku weke Musa Anter û hwd, ku bitene serê xwe bi kurdî nivîsandin jî, ew jî ji ber ku wan bikurdî dinivîsand, ew hatina qatil kirin. Ji xwe, di wê demê de, ên ku bi kurdî dinivîsandin hatina qatil kirin. ..**

Weke yekî kurd, ya herî zêde ku li zora min bixwe jî diçê ew a ku ev dordor bitirkî dinivîsênin û derdikevin û dibêjin "zimanê kurdî qadaxa ya." Yanî, wilqasî ne jidilî çênabê. Ji aliyê ahlaqî ve jî ev yek ne rast a.

Yekî alman, dernekeve û nabêje ku ezê bi firansîzî û îngilizî bihizirim û nivîsênim û ezê civake alman biparêzêm û pêş bixim. Yekî, Firansizî, dernekeve û nabêje ku ezê bi almanî û ankû bi ingilîzî bihizirim û binivîsênim û ezê civake firansiz biparêzên û barî pêşarojê bikim. Yekî, ingiliz jî, dernekeve û nabêje, ezê bi almanî û ankû bi firansîzî bihizirim û nivîsênim û ezê civate ingilîz biparêzêm û barî pêşarojê bikim. Her wusa, weke gotina din jî, yekî tirk, dernekeve û nabêje ku ezê bi kurdî hizirim û binivîsênim û

ezê civate tirk biparêzêm û barî pêşarojê bikim. Ji ber ku ev nerast a. Ti carî jî, ev nabê. Ti bi kîjan zimanê binivîsêne, ku ew zimanê kîjan civatê bê, wê tenê ew civat karibê xwe barî pêşarojê bike û biparêzê. Civate ku zimanê wê ne hatî bikarhanîn jî, ew civat, mahkûmê wê ya ku ji dîrokê herê. Ji xwe, ye jî ji wan sedemên ku heta vê sale 2013´an pirsgirêka kurd hatîya û ne hatîya çareserkirin jî ev a. Heta ku ev derdor hebin jî, wê hêvîya dewletê wê hebe ku karibê civate kurd ji dîrokê bibe û tûna bike.

Rewşenbîrîya kurd, ji ber ku di têgihiştinê de û bi fahmkirina bi dîrokê re xwe ne gihand têgihiştina keseyetî bi civate xwe re, êdî di rewşeka bêkeseyet de ma. Ji ber vê yekê jî, êdî ew derûnîya wê rewşenbîrîyê, bi awayekî xweza wan dikişêne bi ber tirkitiyê ve. Bi zimanê tirkî êdî nivîsandin, bo wan dibe sedema bûna weke "rewşenbîr" û "xwedî keseyet" di nava civatê de. Ji ber vê yekê, êdî di her demê de, mirovên ku ji nû ve bidest nivîskarîyê dikin jî ku kurd bin, ji bo ku wê valahiya xwe di xwe de bide dagirtin, êdî bi tirkî bide nivîsandinê dike. Ji ber ku ew bêkeseyet a ji aliyê keseyetîya civate xwe ve, êdî bi rehetî li wê keseyetîya tirkî ya ku ew êdî wê li berçav dibîne xwe digrê û bi tirkî bidest nivîsandinê dike. Lê aliyê din jî, ji ber ku ev dordor ji aliyê keseyetîyê ve xwe bêrûmet dibînin, êdî xwe li digrin ku hinekî bi wê rûmet bidest bixin. Ew keseyetîya ku xwe lê digrin, keseyetîya serdestîyê wan a. Xwe li wê digrin û bi zimanê wê dinivîsênin. Bi wê, dixwezin ku wê hêsta serdestîyê biderûnî dixwe de bijîn. Lê ev dordor fahm nekin ku hêsta serdestîtiyê jî û keseyet jî û hêsta rûmetê û hwd jî, di kifşkirina keseyetîya civate xwe de ya û bi wê û di zimanê civate xwe nivîsandinê de ya.

Lê divê ku mirov, vê jî bibêje ku ev dordor û ankû ev keseyet, çend ku li keseyetîyê û têrbûna biderûnî lê digerihê jî, wê ti carî wê negirê. Kengî, wê dîrok xwe û civate xwe bi keseyetîya wê re fahm kir û kira malê xwe, wê hingî wê valahîya xwe ya di xwe de ya derûnî jî bide têrkirin û buhurandin. Ji vê aliyê ve, ku em ji aliyê derûnî ve jî li rewşê dinerin, em dibînin ku weke keseyetîyeka nexweş û ku pêwîstîya wê bi dermankirinê heya, mirov rastî wê tê. **Ev keseyetîya xizan, ku dema ku gotarek jî bê ku bi zimanê serdestê xwe dinivîsêne ku xwe bi rûmet û serbilind hîs dike, di aslê xwe de, pirr xizan û hajar a.** Xwe bi keseyetîya serdestê xwe bizaxm dide niîşandin. Lê ku ti telîyekê jî lêxe wê bike ardê ji aliyê derûniyê ve. Ji ber ku bêkeseyet a. Lê tenê, di wê rewşê xwe de, xwe weke çekêtekî ku hatî dalaqandin, ew jî bi pizmarekî hatîya dalaqandin. BI wê keseyetîya ku xwe pê dihêne ser ziman, wê "weke keseyetîya xwe" dibîne. Lê piştre ku kengî farq kir ku ew ne ya wî ya, hingî êdî wê bikeve û weke ku bimirê wê lê were.

Ji aliyê ziman ve jî, ev mirov, wê ti carî nikaribê, weke mirovekî tirk serdestîya wî li zimanê tirkî hebe. Wê nikaribê, weke yekî tirk, **wate, kirde û lêkera** ku li gotinê hatî kirin fahm bike û li hevdû bike û fahm bike. Wê tenê, bi wan qalibên ku di serê xwe de bi "jiberkirinê" re ku di serê xwe de bi cihkirina re bi sînor bê. Ji ber ku, her mirov tenê dikarê wê aferîndêryê bi zimanê xwe yê dayikê bide nivîsandin. Ev bo yekî tirkî jî wusa ya û bo yekî kurd jî. ..

Zimanê mirov ê dayikê, hê ku mirov ne hatîya dunyê hê ku di zikê dayika xwe de ya, qalib û anku "darêjk"ên têgihiştinî bi xwe re dihilde ji dê. Piştre ku hat dunyê, wê rewşan û fahmkirin û têgihiştinan re wê derxe têgihiştinê. Ya ku aferîndêrîya keseyetîyê diafirêne jî ev a. Piştre, ji yeksalîya xwe heta ku digihijê şeş û ankû heftsalîya xwe, temenê xwe yê pêşketinê diafirêne û pêşdixe li ser wê re. Piştre, di salên piştî vê re, êdî

çi perwerde hilde, wê bi pêşxistin û têgihiştin û hişkirina bi wê bê. Pêşketin jî, hemû li ser vê re ya. Pêşketina mirov hemû li ser vê re ya. Lê pêşketina civatî jî, li ser vê pêşketinê re ya.

Gotinak di nava kurdan de, hertimî di civatên wan de dihat ser ziman. Ew gotin jî, her wusa ew bû ku dihat gotin ku "her teyr, bi refê xwe re difirê." Dema ku em bi têgihiştin, civatî û civaknasî, hewl bidin ku rewşê fahm dikin, divê ku mirov bibêje ku pêşketina keseyetê bixwe jî, li ser wê xate pêşketina civate wê bixwe ya. Di wê xatê de, dîroka xwe fahm dike, çanda xwe fêr dibe, kevneşopîyên xwe dizanê û mejûya xwe ya hizrî, têgihiştinî û hişî dizanê. Li ser wê re, êdî mirov çendî xwe bi zanebûn kir, wê êdî xwe jî û keseyetîya xwe jî biafirêne. Têkiliya di nava keseyetîyê û pêşketina wê û civakê û civaknasîya wê de, hemû civaknas jî di kifşkirina xwe ya pêşî de wê kifş dikin. Keseyetîyaka ku ne li ser wê xate civate xwe dihizirê û dihêne ser ziman, ew tenê mirîya. Ew keseyet, ji aliyê derûnî, civaknasî û hwd ve, mirîya. Keseyetîya ku ji aliyê derûnî û civaknasîya civate ku dibêje jê ya ku mirî bê, ew keseyet, wê ji aliyê hizirkirinê û zanîn û bi giştî felsefê ve jî mirî bê. Ti kifşkirinên mazin û kifşên mazin ên ku ev keseyet bike tûna na.

.. **Pêvajoya** nû ya ku ji 21´ê Newrozê ve ku heta roja me dest pêkirîya, bi wê re pirr nîqaş hatina kirin. Hê jî, nîqaş tên kirin. Pêvajo, ji qonaxa yekemin buhurîya qonaxa duyemin. Ev qonax divê ku bi nîqaşkirinê re pirr li ser were axiftin. Ev yek, hem bo fahm kirina wê û hem jî bo pêşî li hewldanên dewletê ên mijulkirinê, û hwd jî were girtin, divê ku were kirin. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku nîqaş û bi wê re fahmkirina wê qonaxa duyemin, pirr giring a ku divê ku were kirin.

Di destpêka pêvajoyê de di qonaxa yekemin de, komisyona ku hatibû avakirina û i herêman belav bûbû, tê gotin ku raporên xwe jî nivîsandin û radestê hikimetê kirin.. Lê çi rasthatina ku di roja ku tê gotin ku serokwezirê tirk bi komisyonê re dicivê û ew jî raporên xwe didina hikimetê li herêmên weke Mûş, tatwan, Amed û hwd oparasyona dewletê dest pê dike. Ev jî di heman rojê de ya.

Bi wê re jî, divê ku mirov bibêje ku bi teybetî li kurdistanê nîqaşên li ser ´çareserîyê´ hena. Lê di serê her kurdî de jî pirr gûman hena ji dewletê. Dewletê, piştî ku vekişînê dest pê kir û pê de, giranî daye çêkirina qarakolan û bendavan li kurdistanê. Ev yek jî, herî zêde kurdan dike gûmanê de. Ev yek, di nava hemû kurdan de "weke amedekarîya ji şer re" dihê ditin û şîrove kirin.

Li kurdistanê jî, berî nûha bi çendekê konfaranse netewî a bakûrê kurdistanê pêk hat û bi serkevtî bi dawî bû. Pirranîya komên civate kurdistanê ên hem olî û hem jî ên kêmnetewî û hwd jî tevlî bûna û di wê de bûna xwedî gotin. Ev yek jî, giring a.

Lê li vir, em li vir, pêşî bsşî bi ancambûna konfaransa netewî a kurd re girêdayî gotinekê bibêjin. Bêgûman bi serkevtî bi dawîbûna wê giring a. Lê ji wê giringtir ku hemû komên civatê êdî di nava tekoşîna sîyesî de cihbigrin û tekoşîna maf û azadiyê li kurdistanê xorttir bikin. Ya ku herî giring li vir ev a.

Dema ku em bahse "pirsgirêka kurd" dikin, em bahse hemû cihrengiyên li kurdistanê dikin. Komên civatê ku bawerîya wan cuda bê ku karibin bi Azad wê bijîn û rêz û hûrmet ji wan re were girtin. Ku komên kêm netew bin, ku karibin bi rengê xwe êdî xwe bijîn û xwe barî pêşarojê bikin. Ya ku li vir bi giringî li ser were sekin in ev a. Bi vê yekê, divê ku ev yek, wee dîtin û di vê temenê de tekoşîna sîyasî bi xortî û were pêşxistin. Ya ku wê serkevtinê bixwe re bêne jî ev a.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jê bibêje. Tevî bo ku dengê hemû komên civatî ên kurdistanê bike konfaranse netewî hat li darxistin û bi serkevtî bi dawî bû, divê ku weke wê di temenê rêxistiniya ramanî û têgihiştinî de jî rêxistinbûn bibe. Mînaq, konfaranse perwerdeya bi kurdî dikarê li kurdistanê were li darxistin. Bi wê re, dikarê, sazîya perwerdeya bi kurdî divê ku were avakirin. Komel û enstûtîyên zimanê kurdî, dernekên weke ´kurdî-der´, tzp-kurdî´ û hwd, divê ku din bi banê wê de were civandin. Bi wê re jî ev sazîya perwerdeya kurdî, divê kju bi teybetî, tenê karê wê pêşxistina temenê perwerde kirinê bê. Politikayên perwerde kifş bike. Pirtûkên wê bide nivîsandin û ankû kifşkirin. û hwd. Ev yek, divê ku divê demê de divê ku were kirin. Bi wê re jî, ev sazîya perwerdeya kurdî, divê ku xwe bike dayîmî û mayînda bike. Ev yek, weke pêdîvî û pêwîstînîyeka mazin ya civatî û dîrokî jî ya**.**

Bi teybetî, kompanya û hwd jî, ku wê bo perwerdeya kurdî ku wê werina li darxistin, divê ku ew pêşavanî ji wan re bike. her wusa, di vê warê de, karekî giring pêwîsta ku were kirin. Di vê warê de, di temenê pêşxistina têgihiştin û afirandina pergale perwerdeya bi kurdî de, divê ku seferberîyek bi vê yekê were dayîn dest pê kirin. Ev yek jî, wê kurd û xalkên din ên herêmê wê bikin. Bi wê re jî, wê cihrengiyên çandî û zimanî jî wê bi wê re werina parastin. Bi heman rengî li ser çandê û hwd de jî divê ku rêxistinîtî were kirin û pêşxistin.

Li Kurdistanê, bi teybetî, di vê pêvajoya nû de, bi vî rengî bi rêxistin bûn, wê tenê karibê valahîya sîyasî û civatî ên di waran de dagirê. Ji ber ku di van waran de, karên li se perwerde û hwd de kêm û lawaz mana, êdî hikimeta AKP´ û ankû dewletê bi cemeatê û hwd xwestîya ku olê jî bikarbênin û wê valahiyê li gorî xwe dagirin.

Sazîyên perwerde, komel û dernekên perwerde kirin û bi wê re ku temenê pergale perwerde biafirênin pêşbixin, divê demê de divê ku derkevina li holê. Ya ku wê di vê demê de herî zêde pêvajoyê jî biserbixin û pêşketina di nava civatê de pêşbixin û hwd, wê ev bin. Bi wê re jî, temenê perwerdekirinê û sazîyên çandî û hwd divê ku were afirandin. Tenê, bi çend komel û sazîyan re ev yek bi rê ve naçê.

Bi teybetî, di warê perwerde, çand û xwe bixwe bi rêvebirinê de, divê ku saziyên nû ên bi bandûr divê ku werina avakirin. Bi wê yekê re, divê ku xwediyê kargerîyeka mazin û giring bin. Di vê demê de, ku em divê ku weke xaleka pirr giring hildina li dest perwerdehîya bi zimanê dayikê, weke xaleka giring a. Bo vê yekê, divê ku rêxistinîtî û hwd werina kirin. Bi vê yekê, divê ku pêşxistin were kirin. Li ser ziman, hê bi sadan sazî dikarin werina ava kirin. Li hin herêmên Kurdistanê, ji xwe hê bo saziyên perwerde tûne ne jî. Li hin herêmna weke navend ên weke Amed, Cizir, Nisêbin û hwd, kurdî-der û hwd hena. Lê ev jî, ne bes in û têr nakin. Sazîyeka giştî ya kurdistanî ya perwerde ku li her bajar, navçe û heta ku li her gundê navendên wê ên vekirî hebin divê ku hebe. Ev yek, weke tiştekî ku nebê nabê ya.

Ev alî, hemû valahî na. Dewlet jî, wan valahîyan didagirê li gorî xwe. Piştre jî, ku em rabin çend rexneyan jî bikin, wê ti fêdeya wê nebê. Sîyeseta kurd bixwe jî, pirranîya rexneyên wê, ne li esas û temenê na. Rexneyên ku dikin, li Awa û şekl û awayê û şeklê bi rêve çûyîna wê na. Ev yek, ji xwe di serî de xelat a. sazîyên kurdîstanî ên bingihîn ên ku ew bidestê xwe li herêmê avakiribin û ku karibin van valahîyan dagirin hebin.. Aqadamîyên perwerdeyê divê ku bê şert û merc hebin. Di wan de jî tenê zimanê kurdî hebe û were bikarhanîn. Ji wan aqadamîyan, mirovên ku derkevin ku civatê perwerde bikin û ankû sîyesetê bikin, divê ku di temenê ziman û çanda civate de wê bikin di rojên

pêş de. Bo vê yekê, ev yek, wê bi vê yekê ji wê pêşarojê jî amedekarî jî bê.

Du sazî civatê perwerde dikin û wê barî pêşarojê dikin.. Yek sazîya perwerde û çandê ya. Ya din jî ya rêveberî û sîyesetê ya. bi vê yekê, êdî di van sazîyan de bikarhanîna zimanê civatê û pêşxistina wê û bi cihkirina wê, pirr giring û jîyanî ya. Divê temenê de, li kurdistanê, divê ku di vê demê de rêxistinî were kirin. Sazîyên sîyesî divê ku zêde bibin û bi bandûr bin. Sazîya perwerdeya kurdî, divê ku di vê demê de were ava kirin. Komel û dernek û ankû enstûtîyên weke ´kurdî-der´, ´tzp-kurdî´, û hwd, tenê hin saziyên zimên in. Lê dema ku em bahse perwerde bikin, divê ku saziyên ser wan re hebin û bikar bin. Ji xwe, bi prensîbî û ya rast jî ev a. Bo vê yekê, giring a ku weke sazîyeka serbixwe sazîya perwerdeya kurdî, ku were ava kirin li kurdistanê.

Di vê pêvajoyê de bi du lingan bi giringî divê ku li kurdistanê rêxistinî bibe. Yek li ser sîyesetê re ya. Ê din jî, li ser perwerde û sazîya perwerdeya kurdî ya. Ev herdû ling, bi teybetî jîyanî na. Bi vê yekê, divê ku mirov bi teybetî li ser van herdû lingan bisekinê. Li kurdistanê, ev pêvajoya nû, di nava gel de, hêvîyek afirandîya. Lê mixabin, hê dewletê ti gavên jidil û li berçav neavêtina. Vajî, wê, tevgerîya leşkerî ku kurd wê weke "amedekarîya ji şer re" şîrove dikin dihê kirin. Çêkirina qarakolan, bendav û û hwd, ev hewldanên şerxwezî ên ku divê ku mirov wan bêne ser ziman in.

Li vir, di dawiyê de dixwezim ku vê jî bibêjim ku di civîna "mirovên aqimendl" de gotinên ku ji devê T. Ardogan bixwe jî ku tên û dikevina rojevê de, gotinên ne baş in. Zimanê berê bikardihêne Di civîna mirovên aqilmend de, gotinên ku ketina çapameniyê û ku weke ku mohra xwe li rojevê dan, di cih de ku T. Ardogan dibêje ku "ti xabatên me ên bo perwerdehîya bi kurdî tûna na", "wê çêkirina qarakolan û bendavan wan bê domandin.", û hwd bûn. .. Yanî di serî de, tê gotin ku wê qadaxaya li ser zimanê kurdî bê domandin. Ev gotinên T. Ardogan, didin nîşandin ku çendî pêwîstî bi avakirina sazîya perwerdeya kurd heya. ..

Pirsgirêka kurd, ku em bahse wê bikin, qadaxaya li ser zimanê kurdî xale wê ya bi pirsgirêkî ya herî bingihîn a. Ku çendî ku bê gotin ku wê pirsgirêk were çareserkirin jî, ku qadaxaya li ser zimanê kurdî bê domandin, wê ew gotinên çareserîyê bixwe jî, wê ti wate wan tûnebê. Ji xwe, ev xal weke navikê ya. Ji ber çi zimanek tê qadaxa kirin? Bo ku civatek were tûne kirin û ji dîrokê birin. Bo vê yekê, xale ziman, weke xaleka pirr giring ya ku divê ku mirov li ser bisekinê ya. .. Li kurdistanê, hemû şerê ku dewletê bi kurdan re da, li ser esas û temenê qadaxaya zimanê kurdî bû. Bi wê re jî, şerê wê dan ku tirkitiyê û zimanê tirkî li kurdistanê û li kurdan serdest bikin. Li kurdistanê, pergala şer ava kirin. Her nirx û çanda kurdan, bi navê "terorê" bi navkirin û hanîn ser ziman. Navê ´kurd´ û ´Kurdistan´ê qadaxa ya. Ev kiryar û hemû kiryarên dewletê ên din jî tenê bi vê armancê bûn. Yanî bi gotinaka din, civate kurd di nava ya tirk de bidina halandin. ..

**Li kurdistanê, şerê dewletê li dijî nirxên civatî ên kurdistanî ya. ..**

Li kurdistanê, di vê demê de bi carekê ket rojevê de û di rojevê de, hê jî heyîîna xwe diparêzê. Bi teybetî, bûyara tecewûzê ku li dersimê rûda bû ku şeş leşkerên tirk tecewûzî keçeka kurd ya 14 alî kiribû, hê jî di rojevê de ya. Lê ev bûyar, hemû jî, aliyekî wan ê teybet heya ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê. Êşkence, girtina binçavan û piştre windakirina mirovan, byarên weke li Dersimê rûda a tecewûzê, bi destê polîsên dewletê di nava ciwanên kurd de bicihkirina bikarhanîna maddeyên hişbir û hwd, divê ku mirov bi hevdû re hilde li dest. Ev kiryar û hê gelek kiryarên weke van, ne kiryarên ji rêzê na. Hemû jî armanca wan navaroka civatî ya kurdistanî ya.

Divê temenê de, deme ku em li bûyarê biner in, emê çêtir û rasttir wê fahm bikin. Di vê temenê de, li dijî bûyarên bi vî rengî, divê ku kurdistanî, qîyemetê biqatênin. Ev bûyar, divê ku têgihiştinekê kurdistanî ya civatî di nava ciwanên kurd de bide çêkirin. BI wê re, êdî divêt ku ciwanên kurd, herî zêde li nirxên xwe yên civatî xwedî derkevin. Ciwan, divê ku dîroka xwe bixwênin, li çand û dîroka xwe xwedî derkevin û bizanibin. Bi w re jî, divê ku fahmkirina xwe di derbarê civate xwe de û mejûya civate xwe de pêşbixin. Ya ku wê weke tedbîrekê jî bê li dij kiryarên dewletê ên bi vî rengî ên qirêt, wê ev bê.

Divêt ku ciwanên kurd ku keç jî bin û lawik jî bin, divê ku bizanibin ku têgihiştina di derbarê wan û civate wan de ku pêşketî, wê ji wan re bibe temenê parasina wan jî. Hinekî jî, dewlet, bûyrên bi vî rengî ên bi qirêt ên weke tecewûzê jî, weke astengiyeka ku ev di nava civatan de pêşnekeve dike. Bi wê armancê dike. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman.

Lê li vir, karûbarek dikeve ser milê sazîyên kurd û û hwd de jî. Bi teybetî, divê ku sazîbûna parastina ciwanan û bi rêxistinîya wan pêştir bixin. Divêt ku ciwan, di nava xwe de bi rêxistin bin. BI teybetî, divê ku saziyên xwe yên bi vî rengî ku hem zanebûna wan pêş dixe û hem jî ku weke sihwaneka wan y parastinê û hwd bê, divê ku pêş bixin. BI teybetî, li Kurdistan û lli bajarên kurdistanê divê ku ev werina pêşxistin. Malên perwerde ên ku kurdan ji xwe re i bajarên kurdistanê vekiribûn, ji ber çi hatina girtin? Hinekî jî, bo ku ew zanebûna wan pêşnekeve û di nava xwe de bi rêxistinî nebin û her wusa ku dewlet karibê wan bi tememî bike bin kontrola xwe de. ..

Di vê temenê de, dewlet çû bi ser wan malan de. Dewlet, ji ber ku bi teybetî, hemû nirxên civatî ku dibina temenê pêşketina civatî wan armanc digrê û diçê bi ser wan de. Ku armanc ev bê, divê ku ciwanên kurd jî, hê zêdetir xwe bi rêxistin bikin. Divê ku pirr zêde li ziman û çanda xwe xwedî derkevin. Divê ku ew dîrok û mejûya xwe bizanibin. Ya ku wê wan xweşiktir jî bike wê ev bê. Her wusa ya ku wê wan li dijî hêrîşên bi vî rengî bike hêzek jî wê e bê.

Ciwan, berpirsîyaka giring dikeve ser milê wan de di vê demê de. Di vê demê de, sazgeriyên parastinê ku bo xwe di nava xwe de pêş bixin, wê di demên pêş de, ew sazgerîyên parastinê, wê bina temenê parastinê ji ciwanên kurd ên piştî wan re jî, Bo vê yekê, divê ku ew vê yekê bizanibin û bi vê zanwbûnê tevbigerihin. Ciwan, nûqta wan ya herî zayîf a, ji dewletê û hêzên wê re dibe temenê hêrîşê. Divê ku ev yek were ditin û fahm kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje, ku karekî mazin dikeve ser milê sazgerîyên civatî ên rewşenbîrî de jî. Ji aliyê xwandinê û hwd ve bin, divê ku pêdîvî û pêwîstînîyên wan werina li cih. Saziyên afirandina pirtûkan bi dane nivîsandinê bin, bi wergerendinê û hwd bin, bi gihandina pirtûkan li ciwanan hwd bê, divê werina pêşxistin. Di roja me de,, ev saziyên bi vî rengî ku hatina ava kirin di nava netewên din de, karekî giring ên parastinê jî bo ciwanan, Jinan, zarok û beşên din ên civatê dibînin.

BI tekoşîna azadîya kurd re, jin pêşket û derket li pêş. Di tekoşîna civatî de, jin û kal, giringiya wan pirr mazin heya di wê de. Dewlet jî, bi teybetî van herdû beşên civate kurd dike armancên hêrîşên xwe. Bi vê yekê, bi teybetî, tê bi ser Jinan de. Ji salên 2001 û piştre, êdî hêrîşên dewletê ên li Jinan û ciwanên jin zêdetir bûya. Ew hêrîşên wê jî, pirr bi plan dihên kirin. Hemû hêrîşên wê, bi armanca têkbirina pergale civatî ya kurdistanê ya. Bo vê yekê, hêrîşên xwe bi plan dike. Komên civatê, yek bi yek dinaqêne û wan dike armanca hêrîşan.

Dema ku dewlet, komn civatê yek bi yek kifş dike û dike armanca hêrîşên xwe, wê caxê giringa ku di derbarê komên civatî de jî civat û komên civatê jî bizanebûn bin. Zanebûn, wê aliyekî parastina wan ya giring biafirêne. Heta ku, ez dikarim bibêjim ku wê temenê parastina wan ya cewherî û ya xwe bixwe biafirêne. Lê bi wê zanebûnê re di temenê nirxên civatê xwe de pêşketin jî, wê ciwanan bike hêzeka mazin li dijî wan hêrîşên dewleta tirk ên li wan.

Di civatekê de ku pergale civatî ya ahaqî tkçû, wê hingî ew civat têk herê. Divêt ku mirovê yekê bi teybetî bêne ser ziman û fahm bike. Ya ku dewlet jî, ji xwe re dike armanc ev a. Lê ya ku ciwan jî û her wusa hemû beşên civata kurd jî ku divê ku biparêzên jî ev a.

Ciwanîya bêzanebûn wê nikaribê xwe biparêzê. Lê her wusa wê herî zêde ji hêrîşên dewletê re jî wê vekirî bê. Bi teybetî,

Li kurdistanê, sazîyênn Jinan hena. Lê ji wê zêdetir divê ku di temenê DTK´ê de ku bi bîroyên xwe li herêm bajarên kurdistanê ku xwe bi rêxistinkirî divê were avakirin. Ev sazî dikarê hemû sazîyên Jinan di bin banê xwe de bicivînê û bi rêxistintir bike. BI wê re jî, hertimî, hem di derbarê pêşketina civatê û parastina jinê û hwd, karibê raporan binivîsêne û karibê bigihijêne sazîyên navnetewî û hwd jî. Bi wê yekê re, divê ku em bibêjin ku ev sazîyeka bi vî rengî ya kurdistanî dikarê weke du komên civatê ên pirr giring ku pêwîstîya wan bi parastinê heya zarokan û ciwanan jî bi Jinan re bi rêxistin bike. Bi wê rengê, ev sazî ne tenê weke saziyeka rêxistinî bimêne, her wusa di ware perwerde kirin û bi zanebûnkirinê û hwd de jî, divê ku xwediyê projeyên civatî ên pirr giring bê jî. Bi vî rengî, weke sazîyeka li ser partî û komelên din re jî divê ku xwediyê heyîn û hebûnê bê.

Li kurdistanê, kîjan beşên civatê ên bêparastin in, dewletê hêrîşê dibe bi ser wan de. Herî zêde, xale zayîf, dibîne û hêrîşî wê dike. Bi vê yekê, di vê temenê de, diçê bi ser civarê de.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje. Ji dewletê hêvîkirina parastinê jî, xelatîya herî mazin ya Jinan jî ya. Ji ber vê yekê, divê ku bi vî rengî sazîyên wan ku di warê parastinê û bizanebûnkirinê de divê sazîbûneka giring were pêşxistin. Ji xwe, ya ku wan hêrîşan dike dewlet bixwe ya. Vêce, tevî ku ev yek tê zanîn jî ji dewletê hêvîkirina parastinê û darizandina sucdaran û hwd, ne rast a. Ji xwe, ya ku dike dewlet bixwe ya. Minaqa vê yekê bûyara tecwûzê ya li Dersimê ya. Divê ku ne ciwanên kurd û ne jîî

jinên kurd ji dewletê hêvîya dadî û parastinê nekin. Divêt ku herî zêde ciwanên kurd bin ku têkiliya xwe bi hemû saziyên dewletê re bibirrin. Divê ku di nava civate xwe de sazgerîyên xwe yên civatî ava bike û di nava wan de cih bigirê û hem parastina xwe bike û hem jî ya civate xwe û nirxên xwe bike.

Dewlet, sazgerîyên xwe yên dadî û hwd, bi hevdû re li dijî kurdan bikardihêne. Vêca, dema ku kurd ji wan dadîtîyê bixwezin wê tenê xwe bixapênin. Weke ku çawa ku di dema bûyîna komkujiya roboskî de ku di wê de ji aliy balefirên artişa tirk ve ku 35 ciwanên kurd bi bombabarandinê hatina qatil kirin û piştre ku tenê dozek vekir û piştre ew oz bi armanca serbûyarê girtinê bikarhanî, her wusa di vê doze tecewûzê a li Dersimê de jî, bi vî rengî rewşek heya. Tevî ku şeş û ankû hê zêdetir leşkerên wê ew bênamûsî li ser naê dewletê kirina jî, tenê yek ji wan li ser bertekên ku civatê dan nîşandin hat girtin. Ew jî, girtin jî, bi armanca pêşî li bertekan girtinê hatîya girtin. Ew jî, piştî ku bertek hinekî kêmbûn, wê ew jî were berdan. Ji xwe, tenê bi vê armancê hatîya girtin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje, wê ti carî ji vê dozê jî weke ku çawa di doa komkujiya roboskî de bû, wê mahkumîyet wê dernekeve. Ji ber ku ev poltitikayaka dewletê ya. Dewlet, bi derxistina mahkumiyetekê re wê politikaya xwe mahkum nekê. Di doza komkujiya Roboskî de jî, ev yek wusa ya. Roja ku komkujiya Roboskê bû, di heman rojê de civîna MGK´ê dibe. Piştî ku cîvîna MGK´ê civîya û ji hevdû belav bû û piştre bi seatekê komkujiya Roboskî hatkirin. Piştre jî, dema ku bertek zêde hatina nîşandin, ji bo ku pêşîya bertekan bidina girtin, dozek vekirin. Piştre jî, hikûmeta AKP´ê digot ku "li bendî biryara dadgehê bin." Bi vê yekê, dixwestin ku pêşîya bertekan bidina girtin. Piştre jî, ku ditin ku êdî bertek kêm nebûn. Piştre doz ji dadgeha "sivîl" şandina dadgeha leşkerî. Bi vê yekê, êdî li wir bi tememî wê hewl bidin ku dozê bigrin. Di doza bênamûsîya dewletê û leşkerên wê de ya bi tecewûzkirina keça kurd ya 14 salî a li Dersimê, wê ji wê dozê jî ti biryar dernekevin. Ji xwe, ev doz, "dozên şîkandina bertekan" in. Divê temenê de divê ku mirov vê yekê fahm bike û bêne ser ziman. Di dozên bi vî rengî de, bi du armancan doz tê vekirin. Armanca pêşî ew a ku mahkumiyetek dernekeve ya. Armanca duyemin jî, ew a ku di destpêkê de ev doz tên vekirin û bi armanca kêmkirina bertekan in.

..**Em** divê çerçoveyê de li kurdistanê û rewşa civatî û pêşveçûnên wê binerin. Herî zêde mijara ku em biqadr û qiymet bibênin ya Konfaranse jinê a rojhilat li amedê ku hat li darxistin bû. Konfarans bi ancamekê bidawîbû bû. Di serî de, konfarans, divê ku mirov bibêje ku serkevtinaka mazin a bo rojhilat û pêşketina wê. Her wusa di çerçoveya pêvajoyê de rêxistiniyeka jina kurd û pêşketina wê jî, bi xwe re dihêne ser ziman. Li herêmekê, ku jin ji nava jiyanê hatibê dûrkirin û nikaribê xwe bêne ser ziman, li wir mirov nikarê bahse pêşketinaka bi mirovatî bike. Li herêmê, jin bi tememî ji jîyanê hatîya dûrkirin. Di nava me kurdan de gotinak heya. Ew jî ew ku di van demên dawiyê de bûya dirişma xwepêşandinên jinên kurd jî. Ew jî ew a ku tê gotin ku "**jin jîyan e**". Ku jin jîyan bê, dema ku ew ji jîyanê were dûrkirin, divê ku mirov bibêje ku êdî jîyan tê kuştin.

Li herêmê, hemû dîroka ku hatîya nivîsandin, dîroka desthilatdarîyê û şerên wê ên bi gelên herêmê re ya. Rêveberîyek, wek ya Esad a rejima baasê, bi deh salan dikarê gelên li Sûrî bi rê ve bibe. Piştre jî, ku di keve hemberê wan de, êdî di cih de berê çeka xwe dikarê bide ser wan de. Ev yek, ne tenê bo wê rêveberiyê, her wusa rêveberiya tirk jî di

wê zihniyetê de ya. Di van rojan de, bûyarên li li Stembûlê li Taqsîmê ku dibin, di çerçoveya heman zihniyeta desthilatdarîyê de, divê ku mirov bêne ser ziman.

Jin, ji nava nivîsandina dîroka herêmê hatîya dûrkirin. Li herêmê, dîroka wê ne hatîya nivîsandin. Dema ku em dibêjin ku dîroka wê ne hatîya nivîsandin, em bahse sadsalên piştî zayinê ên ji sadsale 10´min û hwd û pêde dikin.

Lê di aslê xwe de, dema ku em li herêmê û dîroka herêmê ên demên berê dinerin, em divê ku bibêjin ku herî zêde jin li pêş a û dîroka bi dîroka herêmê re nivîsandîya. Bi teybetî, tenê ku em diçina berî zayinê de, em dîbînin ku di pêşketina olî weke ya Zerdeşt û yersanîyan, ku weke pêşketina olî ên di nava kurdan de na û piştre bûna malê gelên din ên herêmê jî, di wê de "**jin pîroz a**." Her wusa, weke hevîya jin û mêrê a di nava têgihiştina Zerdeşt de, divê ku mirov bi teybetî bahse wê bike û bêne ser ziman. Di wê demê de, dema ku bo guhdarkirinê ku li Zerdeşt dihat rûniştin, wê jin û mêr bi hevdû re rûnihin û bihisênin.

Jin û mêr, wekhevîya di nava wan de, mohra xwe li pêşketina Zerdeşt ya destpêkê jî û ya piştre jî xistîya. Di dema Zerdeşt de, ku weke jina key Wîstaspa ya banû Atoşa, jinaka û miroveka ji wan mirovên ku pêşî bawerîya xwe bi Zerdeşt hanîya. Bandûra wê, di dema wê de û di bi teybetî di dema ku Zerdeşt hê li jîyanê bûya, hema bêja biqasî ya Zerdeşt derketîya. Zerdeşt, tê gotin ku "Mafê jinê ê dayiktiyê bi banû atoşa re pîroz kirîya."

Banû Atoşa, jineka ji wan çend mirovên pêşî ku bawerîya xwe bi Zerdeşt hanîna. Di têgihiştina Zerdeşt de, bandûra yazdane jin ya bi navê hebedê ku weke yazdanaka dema hûrî û mîtannîyan a, heya. Bandûra hebedê, ne kêmî ya Ahûra mazda li ser Zerdeşt heya. Hebedê, jineka. Ew jin, weke "dayika hemû mirovatiyê" hatîya tefsîrkirin jî di nivîsên li ser keviran de ku bo wê hatina nivîsandin. Her wusa, di dema Hûrî û mîtanîyan de "Kûpapa" ku di demên berî hûrî û mîtannîyan bi navê "hûwawa" jî tê bi nav kirin heya. Ew jî Yazdanaka jin a. Bandûra wê li herêmên Anatolîa jî belav dike. Yazdana Anatolî a bi navê "kîbela" bixwe jî, çanda wê, ji çanda yazdanê hûrî û mîtannî a kûpapa afirîya. Hinek dîrokzan jî, dibêjin ku "kîbela, Kûpapa bixwe ya ku çanda wê barî anatolê hatîya kirin."

Em, ku li van mînaqên ku weke mîtolojikî jî ku tên vegotin, ku em li wan dinerin, em dibînin ku jinê temenê jîyanê û jîyane bicihbûyî afirandîya. Hertimî jin bûya afrînereka sereka ku navê wê êdî ji demên piştre ku êdî ne hatîya ser ziman.

Di nava kurdan de, kevneşopîya hemawîyê heya. Dema ku bi wê kevneşopîyê, ku du mirov û anku du êl û hwd, ku ketina berhevdû ku levbixin, ku jinê çû û hemawîya serê xwe avêta nava wan de, êdî ew dawî li dijberîya li hevdû tênin û êdî şer û pevçûnê bi hevdû re nakin. Ev kevneşopî, kevneşopîyeka kurdan ya pîroz a.

Lê dema ku em di nava civateê de li rewşa jinê dinerin, di demên berê de, jin rewşa wê ji ya roja me pirr baştir bû. Jinê, berê civat bi rê ve dibir. Minaq, kurdên eyerîdî ku li rojhilatê kurdistanê dimênin di sadsale 9´min û destpêka sadsale 10´min de jinaka bi navê "dayika Annezê" li ser serê wan ser 50 salî re şahîtî kiriya. Her wusa, minaqên weke vê, gelek hena ku em dikarin bênina ser ziman. Di sadsalên dawiyê de, li Dersimê Yaşar xatûn û hwd hebûn. Dewletê ji ber ku ev rewşa jinê ya di nava kurdan de dizanî, di cerdewaniyê de cih da jinê. Ji bo wê kevneşopîyê bi lawitêne û biqirêj bike.

Lê di demên dawiyê de bi tekoşîna kurd a azadiyê re jin, ku ne bi tememî li gorî dil jî bê, derketîya li pêş û pêşketîya. Li vîn û vîyana xwe xwedî derdikeve. Bi teybetî, î ro di

nava kurdan de û bi teybetî di nava tekoşîna azadîya kurd de, jin bûya xwediyê weyneka mazin bo tekoşîn dayinê û ji nû ve avakirina civatê bi dîrok, çand û nirxên wê ku heyî re. Li ser vê temenê, jin pêş dikeve. Î ro, jina kurd, bûya xwediyê wîn û têgihiştinaka mazin bi xwe re ku karibê pêşengtiyê li herêma bigiştî i rojhilat bike. **Konfaranse jin a rojhilat** li Amedê a jinan, hinekî nîşanak û birhana vê yekê ya. Lê ev ne beş in. Divê ku bi proje û planên li berçav ên şenber, jin di nava tekoşîna civatê de bê. Çendî ku bi wê tekoşînê re, jinê xwe pêşxist wê civate xwe jî pêş bixe û çend ku civat pêşket wê ew jî pêş bikeve. Pêşketina civatê û jinê, bi hevdû ve ji navikê ve girêdayî na.

Bo vê yekê, di aslê xwe de, bo tekoşîna azadiyê bo jina kurd û hemû beşên wê ên ciatî, tekoşîn asil ji nûha û pêde dest pê dike. Tekoşîna azadîyê, asil ji nûha û pêde dest pê dike. ...

.. **Bi ´civaknasiyê´** re têkiliyên di nava civatê de, bi zanistî dihên ser ziman. Dema ku bahse zanînê dihê kirin, beremberê wê ku di temenê zanistê de were ser ziman, gotina ´zanyarîyê´ dihê ser ziman. Lê di heman wateyê de gotina ´zanistê´ jî dihê bikarhanîn. Gotina ´zanînê´, gotinaka di zimanê kurdî de ku ji dema hûrî û mîtannîyan a. Ji nivîsên bizmarî ku ji dema hûrîyan in û dihên ditin û xwandin, ji wan gotina ´zanînê´ bi rengê "za-an-ni-in" dihê ditin û kifşkirin. Her wusa, di lêkolînên ku li ser zimanê hûrîyan hatina kirin de, "...dawikên" gotinê ên weke "..îya", "..îsta", "..sta", "îstan" û hwd hatina kifşkirin. Tîpa "î", weke ya ku ´yewêtîyê(aîdîyetê)" û hwd dihê ser ziman a. Minaq, dema ku dihê dawiya gotina ´Kurdistan´ê dibê ´kurdîstanî´ û êdî bahse mirovên ku di kurdistanê de dijîn dike. Ev di zimanê hûrîyan de jî wusa ya. Her wusa gotina ´jinê´ jî, di kurdî de pirr kevn a. Gotina ´jinê´ weke navê jinê ji avesta jî em bi heman rengê kifş weke dikin. Ji nivîsên bizmarî ên ji dema hûrîyan navê jinê bi rengê "ašti-i-nna" dihê xwandin. Lê ji avesta weke ya roja me ku di kurmancî de dihê bikarhanîn ´jin´ a. Ji nivîsên bizmarî ên ji dema sûmerîyan jî, gotina "nîn"´ê weke ya beremberî ´jin"ê hatîya xwandin. Gotina "nîn"´ê, di wate ´jîyanê" de jî ya. di kurdî de navê jinê ê roja me jî, biqasî ku navê jinê ya, wusa jî dihê wate ya ´jîyanê" û dikeve wateya wê de jî.

Di vê temenê de, ku em di temenê rêzimanîya hûrîyan de dihizirin, em divê ku bibêjin ku gotina "zanîyarîyê" weke navê zanînê, em dikarin biafirênin û werênina ser ziman. Li vir, weke gotina ´jineolojiyê´ ku care pêşî rêberê gelê kurd birêz Ocalan hanî ser ziman, em dikarin di kurdî de weke wê biafirênin, ´jinnasî´, ´jinyarî´, û hwd jî biafirênin û werênina ser ziman. Weke temenê gotinê, gotina ´jin´ê, ji kurdî ya û bahse zayendeka di jîyanê de dike. Her wusa, di vê temenê de, dema ku em li ser ´hîmzanîna´ gotinê re herin, wê çaxê weke zanîna zayendekê jî dikarê were fahmkirin. Ji vê aliyê ve, dema ku em lê binerin, wê çaxê em gotina jinyarî, dikarin weke du beşan were ser ziman. Yek, weke aliyên zanistî ên tendûrîstî(´tibbî´), bîolojikî û hwd jî were ser ziman. Lê dema ku bi rengê gotina ´jinnasî´ û hwd jî were ser ziman, hingî, di rengê ´civaknasiyê´ û hwd de di temenê têkilîyên zayendî û hwd, bi cûreyên wê re di nava jîyane civatê de werêne ser ziman.

Li vir, li ser vê gotina ´jineolojiyê´ re, ku mirov bihizirê û ku mirov wê di temenê zanistekê de hilde li dest, wê çaxê, ev gotin, gotinên bingihînî ên binî xwe jî weke beşna ji binî dihêna li holê. .. Minaq, ku em li ser ser gotina ´jineolojiyê´ û ankû bi rengê ´jinnasîyê´ re herin, wê çaxê, beşên zanistî ku rengên têkilîyê kifş dikin, weke ´têkîliya jin û mêr, ´têkiliya jin û civatê,´ ´têkiliya jin û xwezayê´, têkiliya jin û jîyanê´, ´rengê têkiliya jîyane wê bi keseyetî(teybetî) û civatî´ û hwd, bi gelek serekan em dikarin

gotinên wê ên bingihinî ku divê ku werina şîrovekirin û teorîya wan were afirandin jî derdikeve li ber me. Lê dema ku em gotina jineolojiyê û ankû bi rengê ´jinyarîyê´ re werênina ser ziman, wê çaxê, aliyekî vê gotinî ê zanistî û şenber jî bi aliyê tendurîstî(tibbi), lêkolînên bîolojikî û hwd re jî, derdikeve li ber me. Ji vê aliyê ve, biqasî, lêkolînên li ser fîzîkê û hwd re, bi fahmkirina wê re û her wusa bi wê re tendurîstkirina wê re dihê li berçavan. Çawa ku ´**feminism**´ weke gotineka bingihînî dikarê bi gotina ´jinnasîyê´ re weke gotinaka bingihînî were ser ziman, her wusa gotina "**jînekoloji**" û hwd, bi gotina ´zinyarîyê´ weke gotinaka bingihînî ya temen were ser ziman. Bi vî rengî, gotina jineolojiyê, weke ku li ser du lingên xwe dirûnihê. Lingê wê ê pêşî ´jinnasî´ ya û lingê wê yê duyem jî ´jinyarî´ ya.

Jineoloji, di temenê zanistîtîya xwezayî de bi aliyê wê ê jinnasî re, di vê temenê de nêzîkatîya wê ya ku ji rengê hizirkirina wê û xwezaye ya jinê dikarê were fahm kirin, weke aliyekî giring derdikeve li ber me. Li vir, dema ku em ji vê aliyê ve lê dihizirin, em dibinin ku jineoloji, dikarê weke zanisteka civatî xwe bide pêşxistin. Temenê wê heya. Bi vê yekê re, çend ku jîyane civatê pêşket û mirov jî bi têgihiştin û zanîn bû û pêşket, wê pêwîstînî û giringîya wê hin bi hin were ditin. Ev jî, weke aliyekî din ê teybetî ku mirov dikarê li ser bisekinê û wê fahm bike ya.

Beşeka zanistî, di serî de, xwediyê teher(metod)a xwe ya pêşketînê û nerînê jî ya. Bi wê re, li dunyê dinyê dinerê û şîrove dike. Ji aliyê ve şîrovekirina wê hanîna ser ziman, temenê wê ê hişmendî û felsefekî jî, weke aliyekî giring ku derdikeve li ber mirov a. Bi vê aliyê re, wê ne tenê têgihiştin di derbarê wê zanistê bi xwe re çê bibe, wê her wusa ji aliyekî ve temenê felsefekî jî xwe hin bi hin bide afirandin, pêşxistin û dîyarkirin.

Dema ku em ji aliyê felsefeyê zanistî ve lê binerin, divê ku mirov bibêje ku hanîna ser ziman ya têgihiştin û felsefeya wê re û bi wê re jî bi aliyê wê ê jinyarî re dayimî kirina lêkolînên zanistî ê lebratûwarî û hwd re, piştrastkirina wan zanyarîyan, wê aliyekî felsefekî ku hişmendiyê di nava civate de diafirênê bê. Bi vê rengê, wê êdî hin bi hin li gorî demê xwe bide afirandin. Zanist û zanîn, aliyek û lingekî wê giring ê ku wê pêş dixe jî, li ser kifşkirina pirsgirêkan û dahûrkirin û dîtîna çareserîyan a ji wan re jî ya. Bi vê rengê, êdî xwe pêş dixe. Di beşeka zanistî de, derpêşên hizrî, û felsefekî bi reng û rengên wê re dihên kirin û bi lêkolînan dihên piştrastkirin. Ev jî, weke aliyekî giringî ê vê gotina zanistê û zanyarîya wê ya ku mirov divê ku li ser bisekinê ya.

Li vir, wusa dihê li berçav ku gotina ´jineolojiyê´ weke navê beşek giştî a zanistî bi zanyarîya wê re derdikeve li ber me û ji aliyê jinnasî û jinyarî ve, ku ji van herdû aliyan ve bê, wê hin beşên din ên zanistî ku li binê wê werin bicihkirin wê werina kifşkirin û pêşxistin. Bi vê rengî, êdî hem ji aliyê jinnasî´yê yanî ji aliyê civatîtîya wê ve û ji aliyê jinyarî´yê yanî ji aliyê zanistîtîya fizîkî a bi lêkolînên tendûrîstî, biolojikî, lebratûwarî û hwd re pêşketina xwe dide çêkirin û domandin. Ev jî, weke aliyekî giring ku divê ku mirov li ser wê bisekinê ya. Ku li gorî pêwîstînîya nexweşîyên jinê pêşket *jinekolojî*, bi komek nexweşîyên jinê ên malzarok û ankû ´rehîma´ jinê û hwd re eleqeder dibêt. Ev, weke beşeka ku em dikarin di nava jinyarîya jineolojikî de bihasibênin a.

Zanistek, ku weke ´civaknasî´ û hwd, ji nava civat û xweza û hwd, bidest pêşketina xwe kir, wê bi demê re û bi pêşketina xwe re bi ber aliyên ´kînetîkî´ ve bi lêkolînên ku di nava xwe de bike re wê pêşketinê herê. Bi heman rengî, dema ku zanistek, bi aliyê wê yê biolojikî û fîzîkî û hwd ve pêşketibê, wê bo ku xwe di jîyanê de bibînê û bi dest

hanîna ser ziman bike û wê aliyên xwe yên din ên hizrî, felsefekî û civaknasî û hwd re kifş bike û pêşbikeve. Ev jî, li gorî teher(metod)a wê zanistê pêş dikeve. Ji aliyê tendûrîstî(´tibbî´)a xwezayê ve, bi ber ya ku di navenga lebratûwarê ve çûyina pêşketina wê, aliyekî giringî ku mirov nikarê înkar bike ya. Ev rengê pêşketinê, rengekî giring ku divê ku mirov li vir jî li berçav bigrê ya.

Hizrên zanistî ên di bin navê jineolojiyê de ku pêş bikevin, wê bi demê re hizrên ji aliyê mêr ve jî ku divê bi heman rengî ku bibina mijare zanistekê û ankû têgihiştinê û hwd, wê pêş bikevin. Ev jî, wê ji pêwîstînîyekê xwe bide pêşxistin. Ev yek, ne weke artarnatifekê, lê weke pêdîvî û pêwîstînîyekê ku wê vê beşa zanistê temem bike ya. Di vê temenê de, di aslê xwe de, di çerçoveya jîyan û civaknasîya civatî de, wê ev herdû zanist êdî bi civaknasî, deronî, û aliyên tendûrîstî û ankû ´tibbî´ û hwd, wê pêş bixin û pêşbikevin. Li vir, di zaningehê de, dema ku pirtûkên beşeka zanistê dihên amede kirin, wê di çerçoveyeka çawa de û li gorî kîjan destûrên hizirkirinê wê werina kifşkirin, bi giringîya wê re êdî dihên kifşkirin. Li zanîngeheka kurdistanê, heta nûha beşek bi navê beşa jineolojiyê ne hatîya vekirin. Li zaningekên cihanê giştkî jî tûna na. Hin beşên mijarên weke ´jinekolojiyê´ û hwd, di nava beşên biolojiyê û hwd de, hatina bicihkirin û hatina lêkolîn kirin. Çend ku gotina ´jineolojiyê´ weke beşek zanistî, dikarê bi vî rengî were pêşxistin jî, hê jî ne temenê wê li jîyanê hatîya afirandin û ne jî karekî li berçav bo pêşxistina wê hatîya kirin.

Di vê temenê de, ku em gotina ´jineolojiyê´ weke gotinaka ´zanistê´ herê bikin, em nikarin tenê aliyê wê yê civaknasî û çend gotinên felsefekî ên ji aliyê civatî ve wê bi vî rengî werênina ser ziman. Ev, alî ku werina ser ziman, wê tenê bina aliyekî wê ê pirr zêde piçûk. Lê wê ne bin ji zanyarîya wê ya ku were ser ziman ji sadî 2 jî bê. Bo vê yekê, divê ku mirov bibêje ku beşeka zanistî, çerçoveya xwe ya aqadamikî ku afirand, wê di wê çerçoveyê de aqadamisyenên xwe jî biafirênê û wan bide hizirin û bi wan xwe pêş bixe. ..

Zanistvanîya wan aqadamisyanan, ya ku di çerçoveya wê çerçoveya wê gotinê de pêş dikeve, wê hin bi hin weke dareka ku hin bi hin pêşdikeve û çiqilên wê ên nû derdikevina li holê, wê temenê beşên wê zaniyarîyê ên nû hin bi hin bi kifşkirina wan re biafirênin. Ev jî, weke aliyekî wê ê din a ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Li vir, ez vê jî bibêjin ku ´ weke zanistek civatî jineolojiî´, wê tenê wusa întîbaya wê bi me re biafirêne ku aliyekî bi gotina ´jinnasîyê´ re dihêne ser ziman a. Ev, dibê tenê weke aliyek û lingekî wê. Lê dema ku bi gotina ´zanistê´ me hanî ser ziman, hingî, divê ku em li aliyên wê ên din jî bihizirin û wan jî hin bi hin kifş bikin û hewl bikin werênina ser ziman. Bi wê re, wê hingî tememî ya wê xwe bi berçav û dîyarkirin. Li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku çiqasî em dikarin gotina ´jineolojiyê´ weke gotinaka zanistî bicih bikin û bi zaninnasî û zanyarîya wê re pêş bixin, wilqasî jî em nikarin tenê bi aliyekî wê re werênina ser ziman. Lê em dikarin bi aliyekî wê re dest bi pêşketina wê bikin. Weke ku çawa ku jina kurd, ku bi zanînnasîyekê re bidest pêşxistina gotina jineolojiyê kir û bi aliyê wê civaknasî û têkiliyên zayendî û hwd re bi awayekî jinnasî re bi jîyane civatê re û di çerçoveya wê de ku hanî ser ziman.

Em ku ji aliyê fîzyolojikî ve jî lê bihizirin, jin cûdahîya wê ya ji mêr heya. Weke ku carna, çendî ku ti pirtûkên pîroz de dihê gotin ku ´jin, ji mêr afirîya´, ev di jîyanê de vajî wê hatîya piştrastkirin. Di dema Sûmerîyan de û di mîtolojiya wan de, dihat gotin ku "jin ji hastûyê tihêlê ê mêr afirîya". Ev têgihiştin û teorîya wê demê, piştre bi vegotina

´Adam û hewa´ jî hatîya ser ziman. Bi vê re jî, êdî hertişt, mêr weke xwediyê wê, hatîya şîrove kirin. Lê ku em ji aliyê fîzyolojika jinê hem bi mejiyê wê re û hem jî bi laşê wê re cûdahîyên teybet ku bi zanyarî mirov divê ku li ser wan bidemê re rawastihê hena. Minaq, naqşaya hizirkirinê a mejî ê jinê ji hinek aliyan ve, ji ya mêr cûda pêş ve diçê. Ev, bi zanistî û lêkolînên ku hatîya kirin jî, hatîya piştrastkirin.

**Bi** zanisteka ku navê ´jineolojî´ lê were kirin re, wê bi jîyanê re gotina ´jin´ê û ya ´zanîn´ê wê bi hevdû re werina hûnandin. Di çerçoveya wê hûnandinê re, êdî wê hin bi hin rengê pêşketina wê di nava jîyanê de bibe. Rengê salixkirina gotinan û hanîna wan a ser ziman, wê temen û rengê pêşketina wan jî bi awayekî vekirî dîyar bike. Bi vê dîyarkirinê re wê pêşketin û pêşveçûn bi wê qadê re bi zanistî bê dayîn çêkirin. Berî hertiştî, weke ku çawa ku dema ku em gotina zanistê salix dikin û em bi wê salixkirinê re dibêjin ku "zanîn jîyanê û ji jîyanê" ya, bi heman rengî, dema ku em gotina ´jineolojiyê´ salix bikin, wê bê ´zanîna ji jinê û ji jîyanê wê´. Lê li vir, bi vê gotinê re salixkirina wê, wê bi tememî çerçoveya wê gotinê neyênê ser ziman. Bi vê rengê rengekî civatî ku weke kiras li wê gotinê hatî kirin, bi wê re dihê ser ziman. Di vê temenê de, êdî dibê "zanînê jinê bi têkilî û jîyanê civatî re". Ev jî aliyekî wê dihê ser ziman. Tenê aliyê wê yê jinnasî´yê dihêne ser ziman. Lê aliyên din ên weke beş ku di bin wê de werina ser ziman, bi biolojikî jî, wê bi teybetî wê hebin.

Zanina civatê, dema ku dest bi pêşketina xwe kir, bi zanîna civatî destpê kir. Î ro, "beşa zanîna zanista civatê a aborî", beşa zanîna zanista civatê a zanistê", "beşa zanîna zanista civatê a felsefe", "beşa zanîna zanista civatê a derûnî" û hwd, bi gelek beşên din ên rêvebirinê û hwd re jî hena. Ev, bi serê xwe awayekî û rengekê pêşketinê ê bi demê re dihêne li berçavê me û bi me dide fahm bikirin. Zanista jinê û ankû ´jineolojî´, wê nebe weke beşek felefeyê û ankû civaknasiyê. Ji wê zêdetirî, wê bê beşek ku du lingên wê ên bi rengê jinnasî(bi aliyê têkili û civatî ve dihêne ser ziman) û jinyarî(bi aliyê fizîkî, biolojikî, tendûrîstî û hwd re bêne ser ziman), wê ji destpêkê bi ber pêşarojê ve dem bi dem pêşketina xwe bijîn û xwe dewlemend bikin. Rengê feminisme ku bi jinnasiyê re were ser ziman û jinekolojîya ku bi jinyarîyê re were ser ziman, wê bi zêdetîrî hebin.

Li vir, ji aliyekî din ve jî, li ser têkilî, rewş û gotinên fîlosofan re, di demên berê de ku hanîna ser ziman re bi jîyanê civate re, ku dikarin bibina alîkarîya nivîsandina dîroka vê beşê, wê bibe. Bi wê re jî, di nava jîyane şariştanî de, rewşa jinê û têkiliyên wê ên heyî û neyî, wê werina ser ziman. Rewşa ku heyî û çawa ya, û rewşa dibê ku hebê û çawa bê, wê cûda bi jîyane civatê re werina şîrovekirin û werina ser ziman. Ev jî, weke aliyekî pirr giring ê felsefekî û dîrokî ê vê gotina jineolojiyê bê. Her zanist, bi rengê têgihiştina wê re, kifşkarîyaka wê ya têgihiştinî heya. Bêgûman, wê kifşkarîya vê zanistê jî hebe ku pêşbikeve û ankû ku pêşket. Ji vê aliyê ve dema ku mirov lê dihizirê, mirov weke beşeka ku pêşketina civatî kifş dike dibînê. Weke çend gotinên ku em dikarin li gorî pêşketina roja me di temenê vê gotinê de ku pêşbikevin werênina ser ziman, jinnasî, jinyarî, û hwd in. Lê divê ku em aliyekî wê ê pirr giring jî ji bîrnekin ku bi gotina "derûnîyê" tê. Ji ber ku ev zanistî ku pêşket, wê zanista zîndîyê bê, ev alîyê wê, weke nebê nabê ya. Wê bê şert û merc xwe bide pêşxistin. Heta ku ez dikarim bêjin ku aliyê derûnî, weke beşekê wê weke aliyekê pirr giring jî di nava jîyane civatê de wê derkeve li pêş.

Zanîn, biqasî ku ji jîyane me ya, di kifşkirina berê jîyane me ya bi ber pêşarojê de jî

dide kifşkirin. Bandûra wê pirr zêde li ser wê heya. Her wusa, bi zanistê re, pêşî, em xwe, hewirdor û jîyane xwe nas dikin. Piştre jî, bi wê re digihijina têgihiştinekê. Êdî bi wê têgihiştinê re em dibînin, dihizirin, didin dîyarkirin û diafirênin. Zanîn, piştî ku hişmendîya xwe ya di derbarê xwe de çêkir, êdî weke hêzeka afrîner lê tê bi zîndîtîya mirov a di jîyan de re. Ji vê aliyê ve, dema ku em li gotina ´zanistê´ dinerin, em dibînin ku weke gotinaka bingihîn a jîyane pêşketî a dema şariştanîyê ya. BI vê yekê re, jîyane mirov pêş dikeve. Çendî ku pêşket jî, wê pêdîvî û pêwîsîtînîyên mirov bi tiştên nû û hizirkirina nû wê hebe. Bi wê re jî, êdî diafirêne. Berî hertiştî, gotina zanistê ku di kurdî de temenê wê li ser ya ´zanînê´ ya, bi hizirkirinê re dîtîna pêşîya xwe ya bi ber pêşarojê ve ji mirov re ji aliyê xwe ve pêşnîyar dike. Ji vê aliyê ve, wê bi têgihiştinî gotina ´jineolojiyê´ temenekî afrîner ku dikarê şoreşên civatî û civaknasî di nava civate bide çêkirin jî bê.

Jineolojî, weke beşeka zanistî bi pêşketina xwe re azadîya jinê jî ji xwe re dike mijareka sereka. Azadîya civatê, di azadîya jinê û têkilîya biazadî a di nava zayendan de dibînê. Bi wê re, xwediyê vacaka civatî a bi têgihiştinî ya. Gotina azadîyê, ji jinê bi ber civatê ve di temenê hîyererşîyeka civatî de dihêne ser ziman. Bi hebûna jinê re xwe bi rêxistin dike. Bi wê re jî, di nava têkiliyên zayendî û civatî û hwd de, xwestek û azadbûnê bi hevdû re dihêne ser ziman. Bi vê rengê, di temenê ku her zayend têkiliyên xwe bi xwe bidina kifşkirin re salixkirinê dike.

.. **Di dema** Şerê Firansa ê li Cezayîrê de, çend mirovên cezayîrî jî bidest nivîsandinê kiribûn. Wan jî, bi zimanê firansiz dinivîsandin. Ku ji wan dihat pirsîn ku ka çima bi zimanê xwe nanivîsênin, bersiva wan ew a ku "zimanê firansizî zimanê zanistîyê ya." Firanz Fanon, vê derûnîya mirovên cezayirî, bi rengekî din jî dihêne ser ziman. Dihêne ser ziman ku dema ku ji mirovê cezayîrî dihê pirsîn ku ka "çima bi zimanê xwe neaxivê û peyivê", ew jî bersiva ku didîyê de, "ez nikarim xwe bi wê bênima ser ziman." Î ro, dema ku em li rewşenbîrên kurd dinerin, em heman rewşê dibînin. Dema ku ez pirtûka Firanz Fanon ya "lenetîyên li ser rûyê ardê" ku dixwênim, ev rewşa mirovê kurd tê bîra min. Ev pirtûk, berî î ro deh salan min xwand. Lê weke ku min dûhû xwandibê, di serê min de zindîya. Lê dema ku ez li wê pirtûkê dihizirim, ez wusa dibînim, ku weke ku Firanz Fanon ev "rewşenbîrên kurd" dîtibê û ew pirtûk nivîsandibê. Ji bo rewşenbîrên kurd, di wê pirtûkê de kêm hatîya ser ziman lê zêde ne hatîya ser ziman.

Dema ku mirovek, rajê çekê û mirovekî bikujê wê ew kuştina wî mirovî bi yekî re bi şînor bimêne. Lê rewşenbîr, bi terikendina zimanê civate xwe civatekê bi tememî dikujê. Bi gotinaka din, em dikarin, bi vî rengî, vê rewşa rewşenbîr, bitijbihênina rewşa Nazîyan ku xalkê cihû dikira wargahan de û di wan de dikuşt in. Rewşenbîr, dema ku di rewşa rewşenbîrên kurd ya roja me de bê, dikeve rewşeka weke wê rewşa nazîyan ya bi tememî ji holê rakirina cihûyan. Ji ber vê yekê, weke ku min di serê nivîsê de nivîsand, li kurdistanê, her rewşenbîr dibe kujerek li dijî civate ku ew bixwe jî jê ya. Kujerek, dema ku kuştinekê bike, wê mirovekî bikujê. Lê rewşenbîr civatekê dikujê. Ew kujerîya rewşenbîr, qat bi qat ji ya wî kujerê ji rêzê maztir û kujertira. Ew kujerê ji rêzê, dîrokê nakujê. Lê rewşenbîr, dîrokê dikujê. Civatekê bi tememî dikujê. Hîtler jî, ev yek kiribû. Hîtler, li dijî neteweka din ev kujerî bi komî kir. Rewşenbîrên kurd, li dijî civate xwe wê dike. Lê rewşenbîrên kurd, rengê asîmlekirina bi çandî, zimanî û hwd dikin.

Dema ku em li dîrokê dinerin, em dibînin ku hemû çand, bi xwe hanîna li ser ziman re pêşketina. Bi wê re jî, nivîsandina. Çend ku î ro, dema ku bahse hûrîyan dihê kirin û

dihê gotin ku "wan zêde ne nivîsandîya" jî, ez divê ku bibêjim ku em vajî vê gotinê ji dîrokê piştrast dikin. Î ro, tenê ku ji dema hûrîyan in, nivîsên bizmarî ku em em dibînin, temenê pêşketina dema me bixwe jî didina kifşkirin.

Bi wê yekê, dîrokê xwe bi wan da domandin. JI ber ku wan di dema xwe de pirr zêde nivîsand, di demên piştî xwe de, bûna kifşkar. Lê mixabin, î ro, civate kurd, bidest rewşenbîrên kurd dihê asîmlekirin. Hinek dordor ji vê re dibîjin "oto-asîmlasyon". Lê rewş, wilqasî girana ku em nikarin tenê bi vê gotinê re bênina ser ziman. Rewş, gotinaka ji vê gotinê girantir dixwezê bo ku bi wê were ser ziman.

Di demên berê de, di nava civate kurd de, mirovên oldar, weke rewşenbîr derketina li pêş. Wan, civate xwe bi zimanê wê û çand û dîroka wê re perwerde kir. Çend ku em î ro rexneyê jî li wan bigirin, em divê ku bibêjin sadqatî ji "rewşenbîr"ên bi rûmettir bûn. Di roja me de, rewşenbîr, civate xwe asîmle dike. Her nivîsên xwe bi zimanekî din dinivîsêne û wê li ser civatê farz dike. Vê jî, di bin navê "rewşenbîriyê" de dike. Dema ku yekî ji wan re got, vê nekin, dikarin yê ku ji wan re got vê nekin rexne jî bikin. Wê bêjin ku "em ne nîjadperest in". Yanî, li gorî wan, nebûna nîjadperest, bi ne nivîsandina zimanê civate xwe ya. Li gorî wan "rewşenbîr"an, bahse wê kirin jî nîjadperestîya.

Dema ku gotina "rewşenbîr", tê salixkirin, tê gotin ku "rewşenbîr, mirovê ku bi zimanê civatê ku hizrên xwe dihêne ser ziman û dike malê civatê ya." Ev ne xelat a. Lê rewşenbîrên kurd, ti carî, em nikarin di çerçoveya vê gotinê û wateyê de bênina ser ziman. "Rewşenbîrê kurd", xwe di rewşeka ku metingeriyê li ser serê civate xwe dike.

Î ro, em di pêvajoyaka nû de na. Dema ku pêvajo tê nîqaşkirin, dihê gotin ku divê ku "cerdewanî were belav kirin." Cerdawan kî na?" Cerdewan, ew mirovên ku rahiştina çeka dewletê û li dijî civate xwe ya ku ew dibêjin "em jê na" ku li dijî wê bikardihênin. Yanî, dewlet dixwezê civate kurd bi tememî ji dîrokê bibe û ji bo wê li dijî civate kurd şer dike. Ew jî, alikariyê dide dewletê di wê şerê wê yê bi civate kurd re. Lê ti çeka cerdawanekî bi qasî rewşenbîrekî kurd, alikarî nedeya dewletê. Çend ku wî cerdewanî, xîyanet bi civate xwe re kir û dijminatî li wê kir, her wusa rewşenbîrên kurd jî, dehqatî wê dijminatiyê, dijminatiya civate kurd dike. Cerdewan, nikarê bi çeka xwe re civate asîmle bike. Lê rewşenbîr, bi nivîsandina xwe re asîmle dike. Rewşenbîrê kurd, bi nivîskarîya xwe, cerdewanîya herî mazin ji dewletê re dike. Her rewşenbîrê kurd, bûya cerdewanekî ku bi zimanê tirkî li dijî civate kurd şer dike bo ku wê asîmle bike. Cerdewanîya biçek ya ku ew mirovên biçek dikin a. Lê cerdewanîya bêçek ku bi nivîsandîna li ser zimanê tirkî re ku dikin jî, weke ya rewşenbîrên kurd a. Cerdewanek, bi çeka di şer de bi fîzîkî dikujê. Rewşenbîrek jî, bi zimanî û çandî dikujê. Kujerîtîya rewşenbîr, maztir a. Ji ber ku rewşenbîr bikomî dikujê û ankû asîmle dike. .. **Î ro, ku nifşên nû ên ciwanên kurd, bi zimanê kurdî nizanibin, berpirsîyarîya wê, rewşenbîrîya kurd a. Divîya bû ku vajî wê ba. Divîya bû ku her ku nifşên nû hatin, zimanê wan û pêşketina wan û serkevtina wan ya biziman û çanda wan û zanîna wan re maztir ba. Lê ku em ji salên 90´î û pêde, hildina li dest, em dikarin bêjin, hê zêdetir bi şûnde ketîya. Hê zêdetir, têkçûya. Hê zêdetir, ziman û çanda tirkî ji dêla ya kurdî di nava ciwanên kurd de bicih bûya. Ji vê yekê jî, rewşenbîrya kurd berpirsîyar a.** Yanî, karê rewşenbîr, bo dewletê di tûnakirina civate kurd de zêdetir û giringtira bo dewletê.

Dewletê, heta roja me, zimanê kurdî qadaxa kirîya. Lê dewletê ji salên 1991´ê û pê de, êdî nekarî wê asîmlasyonê bide domandin. Di aslê wê de, politikaya asîmlasyonê ya dewletê, hê di sale 1991´ê de bi rakirina destûrên 140, 141, 142 re şikeşt. Bi wê rakirinê re, êdî politikaya dewletê ya asîmlesyonê ji holê rabû. Çend ku di destûra wê de, hê jî ew înkar bi rengekî nivîskî hebe jî, lê êdî şikeşt. Lê ji salên 1990´î û pêde, "rewşenbîrên kurd" dewlet ji wê şikeştina wê xilas kirin. Yên ku ew înkar piştre ji dewletê dewrgirtin û domandin, ev mirovên ku ji xwe re dibêjin "rewşenbîrên kurd" in. Dema ku em li rojnemeyên tirk binerin, em dibînin ku li kurdistanê di nava kurdan de, her yekê dibê ku sad libî jî nefiroşê. Lê rewşenbîrên kurd, bi rojnemeyên tirkî ên ku derdixin bin û bi malperên înternetî bin, wê qadaxa ya li ser zimanê kurdî doimandin û înkare kurdan hanîn heta roja me.

Civateka weke civate kurd, ku tenê li bakûrê kurdistanê hijmare wan ne bin 20 milyonan re, tenê rojnemeyeka wan bi kurdî heya. Ew jî, "azadîya welat" a. Lê ew jî, firotina wê, ji sînorekî ne buhurê. Di aslê wê de, dîsa ev rojneme jî li astengîya van mirovên ku ji xwe re dibêjin "rewşenbîrên kurd" û bi tirkî dinivîsênin.

Van "rewşenbîrên kurd", gelek ji wan piştî salên 90´ê bo sedemên sîyesî goçî welatên rojava ên weke Almanya û firansa û hwd kirin. Li wanderan jî, çend ku derfetên mazin bo wan hebûn ku zimanê civate pêş bixin û bi wê bidest nivîsandinê bikin. Ew jî, bikarne hanîn. Li wir jî, bi tirkî nivîsandin. Tevî wê jî, derketin û çûna ber rayadarên welatên ewropî û gotin ku "zimanê me qadaxa ya." Lê dema ku ew wê gotinê dibêjin ku rayadarekî almanî û ankû firansîzî ji wan bipirsê ku ka "gotarek jî bi zimanê xwe yê bidayikê ji vir binivîsa ka wê kî û çi li pêşîyê asteng bê.", wê nikaribê wê gotarê jî binivîsêne. Lê gelek ji van mirovên ku ji xwe re dibêjin "rewşenbîr", derewek jî dîtina ku xwe bi wê diparêzên. Dibêjin ku "derfeta me ya fêrbûna bi kurdî tûna bû, êdî me jî bi tirkî bidest nivîsandinê kir". Lê ev derewek a. Her wusa, gelek ji wan dibêjin ku "dema ku em piçûk bûn, li malê û derve hemû karê me bi tirkî bû." Ev gotin jî derew a. Ji ber ku di nava civate kurd de, heta salên 90´î, ez dikarim bêjim ku ji sadî 90´î malbatên kurd zimanê kurdî bikardihanîn. Lê ji salên 90´î û piştre, bi sayaserê van rewşenbîrên kurd, î ro ew ji sadî 90´î hatîya ji sadî û 30´î û li wê sekinî ya.

Mirovekî ku ji herêmên kurdîstanê ê agirî, mûş, Wan, şîrnax, cizîr, nisêbîn, mêrdîn, êlîh û hwd bê û bêje "dema ku ez piçûk bûm, derfeta min ya fêrbûna kurdî nebû", wê ew derew bê. Wê ew bê dereweka mazin. Ku kî jî bê, ku bê bibêje, wê derewê bike. Ji ber ku ev herêm, hertimî, zimanê kurdî li wan serdest bûya. Heta salên 1990´î, ev herêm hemû jî, bi kurdî pirr pêşketî bûn. Lê piştî salên 90´î û pêde, ku êdî înternet pêşket û rojnemetîya înternetî bi malperan pêşket û pêde, êdî rewş hin bi hin guharî. Ên ku ew rewş guharandin jî, ev rewşenbîrên kurd in. Wan, hin bi hin, ji salên 90´î û pêde, tekoşînaka mazin bi civate kurd re dan bo ku zimanê civate kurd biguharênin û bikina zimanê tirkî. Ji bo vê yekê, li ser navê dewletê, "rewşenbîrên kurd", civat bi tememî li ser navê dewletê asîmle kirin. **Î ro dema ku mirov herê herêma Wan´ê, Mûşê, Agirî, Şirnaxê, Cîzîrê û hwd, zarok navê wan "zozan, zilan, agîd, rojîn, berîwan, û hwd. Lê zimanê zozanan, zilanan, agîdan rojînan berîwanan û hwd, bûya tirkî. Ev, ne li rojavayê tirkiyê ya. Ev li kurdistanê li herêmên ku herî zêde di wan de çanda kurdî bicih a, di wan de bûya. Ên ku ev kirina, kî na? Ên ku ev kirina, ev mirovên ku ji xwe re dibêjin "em rewşenbîrên kurd in". Lê di aslê xwe de, ev jî derewek a. Ew ne rewşenbîrên kurd in.** Ew rewşenbîrên tirk in. Lê weke ku T. Ardogan dibêje ku

"hemwelatîyên min ên bi koka xwe kurd" in. Ev jî, hemwelatiyên T. Ardogan ên ku bi koka xwe kurd in. Bilan Arinc, dema ku got ku **"zimanê kurdî, ne zimanekî şariştanî ya ku bi wê perwerde bibe.",** temenê gotina wî ev rewşenbîrên kurd bûn. Di aslê wê de, gotina Bilant Arinc, ne bê bingeh a. Yên ku bingehê wê diafirênin jî, ev rewşenbîrên kurd in.

BI teybetî, du tiştan roleka mazin û giring leyist di asîmlekirina civate kurd de. Yek, ev rewşenbîrên kurd in. Ya din jî, ew her malperên internettî ku dibêjin "kurdistanî na" û ku zimanê wan tirkî ya. .. Van herdûkan civate kurd, têkbir.

Î ro, ku em bahse têkçûnekê bi civate kurd re bikin, divê ku em navê rewşenbîrên kurd hildin û van malperên înternettî ku dibêjin "kurdistanî na" ku zimanê wan tirkî ya. Ev herdûk, di asîmlekirina civatê roleka mazin dileyizin. Î ro jî, ez dikarim roj bi roj, wê karê asîmlekirinê hê dikin. Yanî, civatê bi nirxên wê ji dîrokê dibin.

Ziman û çand, bi hevdû re temenê civate diafirênin. Dema ku mirov bixwezê civatê pêş bixe, di serî de, mirov van herdû aliyan kifş dike û wan pêşdixe. Ev herdû alî, dema ku pêşketin, wê civatê pêş bixin. Lê dema ku ev herdû ji holê rabûn, civat jî, ji holê dirabê. Di roja me de, dewletê giringî daye pêşxistin û domandin zimanê tirkî ku di nava "rewşenbîrên kurd" de ku pêş bikeve. Ji xwe pêşketîya. Lê bo ku ew rewş xwe bide domandin, li ser tedbîrên wê dihizirê. Aliyê din jî, hemû malperên ku bi tirkî dinivîsênin ku bikin ku civat û mirov bi hesanî karibê xwe bigihêne wan. Lê yên ku bi kurdî, ku nikaribê xwe bigihêne wan. Î ro, di vî warî de jî, li ser înternettê re jî, şerekî mazin li dijî kurdî û zimanî kurdî ji aliyê dewletê ve hatîya destpêkirin. Di dema ku "em di zindanê de bûn", hingî digotina me "bitirkî biaxivin û pirr biaxivin". Ev gotin, ji derve jî pirr hatîya bihîstin. Î ro jî, bi tirkî diaxivin û pirr diaxivin. Heta ku weke rewşenbîrên kurd, roj bi roj gotaran dinivîsênin bi tirkî. Ya herî zêde bo wan weke rûmetê ew a. Ku çendî ku bi tirkî nivîsandin, ew bi rûmet in û xwe wusa bi rûmet hîs dikin. Her wusa, xwe mazin jî hîs dikin.

Ev rewşenbîrên kurd, di bin navê gotinên "rewşenbîrî", "pêşketin", "xwe hanîna ser ziman" û hwd de, zimanê kurdî ji holê rakirin û zimanê tirkî serdest kirin. Di van demên me de, kurdekî ku bi tirkî nizanibê jî, dema ku nêzî rewşenbîrekî qaso kurd a ku bibe, wê tirkî fêr bibe û wê bi tememî asîmle bibe. Wê çanda xwe û zimanê xwe ji bîr bike. Wê dîroka xwe ji bîr bike. Wê bi tememî, zimanê wî ji holê rabê. JI ber vê yekê, ez ti carî li vir pêşnîyar nakim ji ti kurdî re ku xwe nêzî mirovekî ku ji xwe re dibêje "ez rewşenbîrê kurd im". Ji ber ku dema ku ew nêzî wî û ankû wê bû, wê bi tememî asîmle bibe û zimanê xwe û çanda xwe winda bike.

Rewşenbîr, bo civatekê wate wê ew a ku ew civwatê barî pêşarojê dikin. Lê rewşenbîrên kurd, hemû jî kujerên civate kurd in. Ew civate kurd, ji nirx, çand û zimanê wê dûr dikin. Wê asîmle dikin. Wê ji holê dirakin. Rewşa rewşenbîrên kurd, bûya weke wê rewşa wan mirovên cezayîrî, ku dema ku ji wan dihat pirsîn ku zimanê xwe yê dayikê weke zimanê pêşketinê û zanîstî ne didîtin û zimanê firansizî weke zimanê pêşketin û zanistî didît in. Rewşenbîrên kurd qatilên civate xwe na. Ew civate xwe ji dîrokê dibin. Ew civate xwe asîmle dikin. .. … **Li kurdistanê**, ev demeke dirêja ku dewlete tirk, kîjan kurdê ku serê xwe rakir û bahse kurdan û navê kurdan kir, wî digirê û dike zindanan de. Î ro, di zindanan de bi hezaran kurd hene. Ku î ro, mirov li zindanan binerê, û mirov pirsekê bi pirsê, mirov wê pirseke bi pirrreng bide. Minaq, Têde, parlamantar, rêveber, rewşênbîr, jin, zaroyênk u

temenê wan pirr biçûka ku ji ber keviravêtinekê hatiya girtin hena. Ev, dîmen, hemû rastiyekê dide ber me. Arncama wê ew a ku vina gelekî were şikandin. ew gelê kî ya? ew gel, gelê kurd a. Bi vê yekê, ew girtî hatina girtin. Mirov ku hate girtin ji hemû aliyan ve bê parastin dibêt. Ji canê wî û vîna wî pêde, ti tiştekî wî nîn a. hemû mafên wî yên azadiya wî jê hatina standin. Di destê wî de ti tiştek namêne ku xwe pê bi parezê. Ew êdî bi tenê û bi serê xwe ya.

Li kurd, bi zindanan re ne beyenî na. Di zindanan de, berî î ro bi 33´ê salana ciwanên dilê kurdan ên weke H. Dûrmus, elî Çêçek, Kemal Pîr û hwd hebûn. Ev mirov, her kurdek wan nas dike. Navê wan carekê bê û an jî ducaran bê di jîyane xwe de bihîstiya. Kurd, wan nas dikin û dizanîn ku ew ji ber çi ketina zindanê de. Ji ber çi di zindanê de bûn. Ji ber çi di zindanê de hatina hiştin. Ew ji bo azadî û rûmetê tekoşîyan û ketina zindanê de û di wir de jî dev ji wê tekoşîna azadî û rûmetê ne berdan. Î ro, bi vê yekê hertimî navê wan bi rûmet di xêve me dijîn. Ew dagerên rûmetê na. BI wan re, di zindanan de kevneşopîyek afirî. Ew kevneşopî jî, ev bû ku di zindanan de di bin êşkenceyan de jî ji tekoşîna xwe ya azadiyê û rûmetê dûrnekevin. Bi vê yekê re, wan di wir de di nav çar dûwaran de jî, ew tekoşîn doma.

Li li şûn wan re, hê jî, bi hezaran kurd, di zindanan de dijîn. Hemû jî, di xata wan de di rê ve diçin. Di xata wan de, di rê de diçin. Ew roj, bû dîrok ji vê roja me ya î ro ya.

Ji wê rojê heta vê rojê, di zindanan de, tiştek ne guharîya ji bo kurdan. Di wê demê de jî, ji ber ku kurd bûn dihatina girtin û diketina zindanan de î ro jî, ji ber ku kurd in û doza maf û azadiya xwe dikin, di zindanan de na. Î ro jî, ew tekoşîna kurdan ya di zindanan de jî di domê. Ew tekoşîna kemalan, heyriyan, Mazluman, Alîyan, di domê. Di rê de, dimeşê. Ew tekoşîn tekoşîna mirovatiyê ya.

Ji wê rojê, dem ku hin bi hin bi vir ve tê, di zindanan de, mirov zêde bûn. Di wê demê de jî bi sadan kurd hebûn di zindanê de î ro bi hezaran hene. Zindan, î ro, wî karê wan wargehên ku Firansiziyan li dijî tekoşîna Cezayiriyan ku ava kiribûn û bi hezaran cezayiri kiribûn wan dibîne. Ew zindan, î ro, bûna wargehên Naziyan li Kurdistanê. Ew, bûna wargehên Naziyan ên hemdem ku li gor demê hatina avakirin. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku karekî wan yê bi vî rengî heya. Kurd, di wan de, rastî hemû cûreyên êşkenceyan tên. Di wan de, kuştin û êşekence ji rêz tê pêkhanîn, weke ku di wargahên Naziyan de dibûn.

Î ro, zindan dîsa di roja kurdan de na. Bi sê sedeman. Sedeme pêşî ya Girtina zaroyên kurd ku hê temenê wan biçûk a û wan bixinê de. Sedeme duyemin ew a ku di wan zindanan de destavêtin, kuştin û êşekence di wan de bûna wê ya. Sedeme sêyemin ya herî giring ku em weke sedeme sereke li ser bisekin in, girêvên birçîbûnê na. Î roj, ser hezar ciwanê kurd ketiya girêva birçîbûna ya bêdorveger ya dayimî de. Rewşa wan jî hin bi hin ku diçê xira dibêt. Girtiyên kurd, sê xwestekên wan yên mirovî ên sereke hene ku dixwezin ku were li cih. Yek di xwezin ku tecrida li ser serokê gelê kurd birez Ocalan rabê. Oparasyonên ku her roj di wan de dewlet çekên kimyewî û yên bi tekonolojiya dawiyê ku hatina çêkiirn li dijî kurdan bikar têne di wan de, ew oparasyon werina rawastandin. Xwesteke din ew a ku qadaxa ya li ser zimanê kurdî were rakirin.

Zimanê kurdî, hê li tirkî qadaxa ya. Li wir, li beşa kurdistanê ya di nav sînorê wê de ya bakûrê kurdistanê de ser 25 milyonan kurd dijîn. Lê zimanê wan qadaxa ya. Dixwezin ku ew qadaxaya li ser zimanê wan were rakirin. Ev xwestekên wan xwestekên mirovî na. Ev xwestek, xwestekên her mirovî na. Her mirov, xwediyê ziman

a û di qadaxayê li ser zimanê xwe naxwezê. Her mirov kuştinê naxwezê. Ji ber vê yekê jî, xwesteke sereke ew e ku dewlete tirk dev êdî ji vê kuştina kurdan berdê û oparasyonên leşkerî rawastînê. Serokê gelê kurd, bi milyonan ew weke vîna xwe hilbijartiya. Ew î ro, li ser navê gelekî di zindanê de ya.

Di vê demê de, ku li rojhilat, evqas pêşveçûn di bin û weke ku ji nû ve rastkirin û dîzaynek têde dibê, di wê demê de, ji ber ku kurd, negihijinê mafê xwe, êdî dewlet, evqasî diçê bi ser kurdan de û wan digirê û du kujê û di avêje zindanan. Bi vê yekê re, politikayên wan tûnakirina kurdan, hê ji holê ne rabûn. Hê di meriyête bi fermî dimeşîn.

Di vê deme ku bahse çêkiirna destûraka nû ya bingihîn tê kirin de, dewlet, naxwezê ku ti mafê kurdan bi navê wan tê de cih bigirê. Dixwezê, dîsa bi wê destûrê ku ew jê re dibêje "nû" ya û "ji nû ve çêdike" jî, ew jî li ser esasê tirkitiyê ava bê. Ji ber vê yekê bû, di wê deme ku kurdan ji bo perwerdehîya bi zimanê dayikê kampanya li dar xistin, T. Ardogan derket pêşî çapemeniyê û got ku "bila ti kesek, mafê perwerdehîya bi zimanê dayikê ji me nexwezê.” Piştre ne bi gelekî re, li dûv hevdû rayadarên dewletê gotin, "perwerdehîya bizimanê dayikê wê nebe". "Perwerdehîya bi zimanê dayikê, wê welêt perçe bike" û hwd. Herî dawî jî, alîkarê serokwezirê tirk T. Ardogan, Bilant arinc derket ber çapemeniyê û bi kaqaretî û hêrîşî çû bi ser zimanê kurdî de. Wî nêzîkatîya hukumetê ya di destûrê da kifşkirin û got " wê perwerdehiya bi zimanê dayikê nebe" weke rayadarên din ên hukumete û bi wê re jî bi sînor nema û got ku "Zimanê kurdî ne zimanekî şaristanîya ku perwerde têde bibe". Bi vê yekê re, ev zimanê gelê kurd bi hezar salan demne dirêj buhurandina hêrîşî wê kir.

Bi vê yekê re, ez karim bêjim ku î ro, zimanê kurdî hê qadaxa ya. Kurd, dixwezin ku qadaxaya li ser zimanê wan rabê û dawî li wan programên dewletê ên asimlasyonê werina hanîn. Lê dewlet di wan de israr dike. Hê bêhtir diçê bi ser kurdan de. Ew dike û dixwezê ku kurdan ji holê rakê.

Ji ber çi di deme ku dewlet dibêje ku "ez destûreke nû çê dikim de, evqas kurd hatina girtin û ketina zindanan de". Ji ber ku dewlet, naxwezê ti mafî wan bide wan. Ji ber vê yekê dixwezê heman destûra ku kurdan berî î ro bi dusalan gotibû boykot, wê caraka din di şert û mercne din de bibe rafaarandûmê û bi kurdan bide herê kirin. Tenê dixwezê temenê vê çêke careka din bi wan girtinan re. Dewlet di programam wê de, ti planên wê çareserkiirna pirsgirêkan bi riyên aşîtîyana nîn a. Ku hebe, wê di deme ku hevdîtin bi tekoşîna kurdan û serokê wan re dibûn, wê bihanîyan li rojevê.

Ji wê pêvajoyê û heta î ro, em hatina û em hatina û ketina pêvajoyaka çawa de? Ku mirov li demê bi nerê, li wî şerê ku dewletê li dijî kurdan daya destpêkirin binerê, mirov wê bersiva pirsa xwe bi awayekî rast û pak hildê. Dewleteke ku di çantê wê de plana çareseriyê hebe, wê ne rabê û şer nede dest pê kirin. Î ro, şer hatiya dest pê kirin. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov bibêje ku gotinên wan yên di derbarê pirsgirêka kurdan de ne jidil û nesamîmî na. Serokwzirê tirk di rabê ji bo jenosîda dersimê lêborînê bi nîvdevî dide, lê ew bixwe, di heman demê de bi haman rengî û têgihiştina ku bi wê ew jenosîd pêk hatiya komkujiyan dike. Ji wê rojê heta ku î ro, çi guhariya? di nêzîkatiya li dijî kurdan de, ne ti tiştek. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov bibêje ku ev pêvajoya ku dewleta tirk li dijî kurdan bi şerê ku daya destpêkirin bi rê ve dibe, pêvajoyaka jenosîdê ya. Gelê kurdî li dijî vê li qadana. Di zindanan de di girêvên birçîbûnê de na.

Î ro, li kurdistanê tirkî li bakûrê kurdistanê, li zindanan bi sadana kurd, laşê xwe razandiya li mirinê. Ew mirov hemû jî, weke ku Kemal Pîr gotibû, "Em, jîyanê biqasî ku

ji bo wê herina mirinê hijê dikin."Î ro, ew mirov hemû jî bi vê gotinê û felsefe wê dijîn û laşê xwe li mirinê danîna li birçîbûnê. Ew mirov, di zanîna jîyanê azad de dijîn. Ew, bi têgihiştina jîyaneka bi rûmet dijîn. Ji ber vê yekê qabûl nakin ku zimanê wan yê dayikê qadaxa bê. Ji ber vê yekê ya, ku mirovatiya wan, wan bêdeng nahêlê li ber oparasyonan û mirinên ku têde dibin.

.... **Li Zindanan** berxwedanên ku bûna, hemû jî ji bo ku mirov rûmete xwe bi pparêzê. Di sale 1982´an de, ciwanên kurd bidest girêve birçîbûnê kirin. Di wê girêva birçîbûnê de, piştre kemal Pîr. M. Hayrî Durmş û Alî Çîçek û hwd jîyane xwe ji dest dan. Ew mirovên ku di dilê gelê kurd de hertimî bi rûmetî heyîn û hebûna xwe parastina na. Dsi zindanan de di wan deman de, li berxwedan, berdêla car bi car mirin bû. Ji wê demê gelek mirovên ku ketina zindanê de û heta roja me jî ku ji wan agahî ne hatiya girtin hene. Gelek piştre jî, di ancama wê li berxwedanê de jîyane xwe ji dest dan. Gelek jî, di li berxwedanê de jîyane xwe ji dest dan. Ji wê pêvajoyê û heta çî guharî? Ku mirov pirsaka weha bi pirse û li bersiva wê lê bigirê, mirov wê dîrokaka pirr bi demdirêj û titşî rastî wê werin. Kurdan, ji bo rûmete xwe gelekî ku diçê mirinê jî ya. Dewletê û rayadarên wê yên ku di zindanê de gardîyantî dikirin jî ev yek dizanîn. Rayadarê dewletê ên payabilind jî ev dizanîn. Ji ber vê yekê, hertimî di zindanan de kirinên ku rûmetê bişikênin û ku ti carî newina ji bîrkiirn dikiirn bi girtîna.

MInaq, di van rojên dawiyê de ku di çapemeniyê de bahse girtîgaha "bozanti"yê tê kirin. Weke ku di çapemeniyê de tê ser ziman, zaroyên kurd, yên ku ji ber ku kevirek avêtina hatina girtin di zindanê de rastî destdirêjîyê hatina. Ev kirin hemû jî, bi plan û program hatina kirin. Ji du aliyan ve dewlet li ancamên wê di hizirê. Aliyek ew a ku dewlet dihizirê ku wê êdî kurd ne hêlin ku zaroyên wan bikevina çalakiyan de, Bi vê yekê re, wê êdî pêşîya levcivina wan lê were girtin û wê ew bi vê yekê li derve teslim werina girtin. Aliyê din jî, ew a ku dewlet dixwezê ku bi vê yekê rûmete gelê kurd bişikêne. Bi vê yekê re, ev kirin ji vî aliyê ve pirr bi plan hatiya kirin. Bûyarên bi vî rengî, banbdûr û tesîra wan li ser mirov û deronîya mirov pirr heya. Bi vê yekê re dewlet li wê hizirîya. Bi vê kirinê re divêt ku mirov bibêje ku pirr hasabên wê yên ku ew bi dewletî û sazî lê hizirîya heya.

Bi vê yekê re divêt ku mriov bi teybetî li ser wê bûyara li girtigaha bozantiyê li ser bisekinê. Bi vê yekê re, divêt ku mirov ji dû aliyan ve li ser bisekinê. Ev kirin, di serî de, divêt ku mirov bibêje ku di deme ku hat bihîstin de, rayadarên dewletê, di cih de zimanekê ku weke ku bixwezin wê asayî bidina nîşandin bi kar hanîn. Piştre di cih de komisyonaka ku liu bûyarê lêkolin bike hat çêkirin û hat şandin li girtigahê. Lê divêt ku mirov bibêje ku ev komisyona ku tê gotin ji "mufettişan" pêk tê, tenê ji bo ku li ser girtina û pêşîya bertek û tepkiyên bi wê bibin bigirin a. Bi vê yekê û armancê, ev komisyon hatiya avakirin û hatiya şandin, li girtîgahê. Piştre jî, herkesek dizanê ku wê tenê, weke ku di komkujiya Qilabanê de bû ku dewleta tirk li Meclisa xwe komisyonak ava kir ji bo ku pêşî li bertek û tepkiyan bigirê ava kir, lê piştre wê komisyonê bi gotinên wê yên ku di çapemeniyê de derketin, li ser temenê ku wê dewletê paqij derxin hatibûbûn hunandin û plankirin. Bi vê yekê, ev nêzîkatî û avakirina komisyonan jî, tenê ji bo ku pêşîya tepkiyan û bertekan bigirê ya.

Dewlet, ji ber çi ev herdû, bûyar kirin û bi vê yekê re, piştre ti kesek jî gunehbar nedit û bûyar wilo weke xwe hatina hiştin? Ji ber ku ev bûyar herdû jî, bûyarên tafisandin û rûmet şikandinê na. Deme ku ew mirovên ku ew bombabarana li Qilabanê

kirina ku hatiban derxistin li holê û darizandin, wê hingî, ew armancên dewletê yên di binê kirina wê komkujiyê wê de wê vala derketiban. Ji ber vê yekê, wê mirovên sucdar ku ew komkujiî pêk hanîna wê dernekevina li holê. Ji ber ku mirovên rûmet şikandinê, rûmet şikandinê û tafisandinê ku dewletê kir û ku sucdarên wan derketina li holê, wê bandûra wê li gor wê û mantigê wê nemêne. Bi vê yekê re, êdî ew sucdarên wê dernekevina li holê. Bûyar li girtigaha li Bozantiyê jî, divêt ku mirov bibêje ku ev jî, bûyerek ji wan bûyaran a bi vî rengî ya. Rengê qarakterê bûyarê li girtîgahe Bozantiyê ji ya bûyara komkujiya li Qilabanê ku di çapameniyê de weke "komkujiya roboskî" jî tê nasîn, ne cudatira. Herdû jî, di xat û têgihiştina plan û programaka dewletê ya li dijî kurdan de hevdû temem dikin. Di serî de serî de divêt ku mirov vê yekê kifş bike.

Bûyara, girtîgahe Bozantiyê, ne bûyaraka ji rêzê ya. Di serî de, di çapemeniyê de bi zimanê ku ew bi wê tê ser ziman û nivîsandin jî, di serî de, wê çawa bandûra wê zêdetir bibe li wê dihê nerîn. Bi teybetî, zimanek ji bo wê dihê bi karhanîn. Bi vê yekê re, gotinên ku dihêne bi karhanîn, bi teybetî, gotinên ku wê çawa di aqil de bimênin û bi wan re çawa rûmeteke gelê kurd bi wan were şikandin li wê dihê nerîn. Bi vê yekê re, hemû kirin û nivisandin jî, bi plan dihê kirin.

Li ser vê bûyarê û metodê vê bûyarê, ku mirov li ser di hziirê bi teybetî, di deme şerê li cazayirê de, mirov rastî, hin minaqekên weke wê yên destavêtinê dihêt. Di deme Şerê li dijî Cazayirîyan ku dewletê kiribû, mirov karê bibêje ku çawa diçê biser cazayirîyîyan de. Ev kirinên dewletê ên li girtîgahe Bozantiyê, weke wan bûyarên ku li gorî roja me hatina formûlakirin in. Bi vê yekê re divêt ku mirov bibêje ku şerekî qirêt û qirêj li dijî kurdan dihê meşandin.

"**Di şerê li dijî civatekê de û gelekî de di serî de divêt ku destavêtina li rûmetê wê were kirin**." Dewlet bi vê yekê di hizirê, Di serî de, dixwezê ku keseyetiyê bişikenê. bandûra bi bûyara li girtigahe li Bozantiyê ya namerdana, di serî de ev hedefe wê keseyetîya civata kurd a. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje. Civateke ku êdî ji keseyetîya dûr bikeve, divêt ku were çêkirin. Bi vê yekê re, keseyetiya civatê ya ku bi tekoşîna azadiyê re afirîya û bûya, hêrîş di serî de divêt ku mirov bibêje ku li wê bûya. Hêrîş li wê keseyetîya civatê ya dîrokî bûya.

Ji aliyê deronî ve divêt ku mirov hinekî li vê bûyarê bi sekinê. Ji ber ku ev bûyar, hedefên wê pirr in. Ji bo ku ew hedefên wê werina fahmkirin, di serî de divêt ku mirov li bûyarê pirr baş lê bikolê. Tiştek, bi bûyarê re pirr derdikevê li pêş. Ew jî, Zimanê ku radayaderên dewletê û çapemeniya tirk yê bi kar dihênin a. Di serî de, weke ku bûyaraka ji rêzê dihênina ser ziman ku diaxivin. Lê ku diaxivin bi gotinên ku wê çawa ji aliyê deronî ve bandûra wê mazin bidina çêkirin di serê kurdan de û wê rûmete wan bişikênin, bi wî rengî li ser wê disekin in. Nivîskarekî Kubayî bi navê Firanz Fanon, pirtûkek bi navê "lenetliyên li ser rûyê ardê" nivîsandibû. Ew di pirtûkê de, bi teybetî li ser wê sekinî bû ku deme ku dewlet çawa dike ku rûmeteke mirovekî bisekin e û piştre ku ew mirov çawa xwe biçûk û xilasbûyî dibîne. Gotinên rayadarên dewletê ên ku ew dikin, di wan de dibêjin ku "li girtigahan ev pirr dibin û divêt ku wilo newê mazin kirin." Ev gotin, bi serê xwe, pirr bi plan hatiya hizirkirin û hatiya gotin. ..

Ew mirovê ku rûmete wî bi destavêtinê hatî şîkandin, di serî de, êdî piştre dihizirê ku ew êdî kêrî ti tiştekî nayê. Bi wê rûmet şikandinê re gotinên ku tên bi karhanîn, di serî de dikin û dixwezin ku bi vê rengê deroniyekê bi mirovên civate kurd re bidin çêkirin. Bi vê yekê re di serî de carek din divêt ku ez bibêjim bûyaka di serî de weke hêrîşeka

mazin ya li keseyetiyê ya. Ev bûyarên bi vî rengî ku tên kirin ji aliyê dewletê ve, di serî de ji hemû aliyê ve li ser dihê hizirin. Psikolog û hwd, lev dicivin û li ser navê dewletê dihizir in li ser ancamên wê. Bi vê yekê re, ew psokolog disa rê şandî wan didin ku wê çawa êdî piştî bûyarê re gotinên xwe bibêjin. bi vê yekê re, weke ku bûyaraka ku li ser hatî hizirkirin divêt ku mirov li ser wê bi hizirê. Ev bûyar, hemû, weke bûyarên di deme ku Firansa li Cezayirê dikir û bi wê re rûmete mirovên cazayirî dişikand û piştre bi wê re ew di wan de bi keseyetîya wan re xilas dikir, her mirov karê bibêje ku bûyaraka bi vî rengî ku li gor demê hatiya formûlakirin a.

Di vê demê de, mirov wê çawa li ber van bûyaran bisekinê divêt ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Hertimî, dewlet bi rayadarên xwe re deronîya ku dixwezê li ser vê bûyarê re bi afirêne ew a ku weke ya jinaka ku dest avêtina lê bûbe û ew jî piştre bi keseyetîya xwe re êdî xwe xilasbûyî bibîne, dewlet di xwezê deroniyaka bi vî rengî di nava kurdan de li ser vê bûyarê re çê bike. Bi vê yekê re, bandûra bûyarê, çendî dirêj di çapemeniyê de li ser hat sekin in û bûyar ne hat çareserkiirn jî, wilo ya ku dewlet li ser wê jî hizirîya û bi wê re wê êdî wê demê dirêj bike û dayimî di rojevê de bi wê rengê wê gotina ku bi teybetî afirandî bihêle. Bi vê yekê re divêt ku mirov bi teybetî bibêje ku şerê deronî ê bi teybetî ku di hedefe wê de bi teybetî keseyet û nirxên keseyetiyê ku di afirênin heya. Bi teybetî nirxên ku keseyetiyê çêdikin û afirênin, bi wê re hêrîş li wan dibêt. Bi teybetî, di vê çerçova de, ez ku komkujiya Qilabanê jî di nav de bê hasibandin, ez bûyaka din jî bênina ser ziman. Di sale 2009´an de li gundekê li dora Amedê ku malbata ku ku kurucî bû û di herêşa wê wê ya ya mala din de 44 mirov ji wê hatibûbûna kuştin hebû.

Hing jî, cara pêşî ku serokomarê dewletê Abdullah Gul derketa pêşîya çapemeniyê, gotina ku got li ser kevneşopîya kurdan bû. Bi vê yekê re, wî bahse kevneşopîyê kiribû. Hingî hat gotin ku bûyar li ser ard û ne levkirinê hatiya kirin. Bi vê yekê re bûyar di çapemeniya ewropa de jî cih girt. Lê zimanê wê demê yê dewleta tirk, weke zimanê vê demê yê vê bûyara namerdana ya girtigahe Bozantiyê bû.

... **Di vê demê** de ev deme ku kurd di rojava wan de çalekiyên birçîbûnê hene. Li kurdistanê çalakîyaka birçîbûnê ya bi dorveveger hatibû dest pê kirin. Lê piştre li Zindanan bû bêdorveger. Î ro, weke çalakiya birçîbûnê ya bêdorveger didomê. Heta deme ku min ev nivîs nivîsand de, çalakvanên ku ketibûbûna çalakiya bêdorveger de, ketibûbûna roja 17´an de. Ji vê astê û pê de, êdî di laş de klmbûn û xirabûn çê dibe. Êdî pirsgirêk di laş de didina dest pê kirin. Mirovekî ku berê nexweşiyek bûhurandîya, wê bi wî re bêhtirî nexweşî xwe bi wî re bide der. bi vê yekê re mirov divêt ku bibêje ku li kurdistanê, di vê demê de, î ro jîyane mirov ketîya rewşa xatarnak de.

Kurd, çî dixwezin bi vê çalakîya ku êdî weke mirinê ya.? Kurd, dixwezin ku şerê ku dewlete tirk li dijî kurdan dide bidawî bibe. Zimanê kurdan, qadaxaya li ser rabê. Serokê gelê kurd birêz Ocalan tecrîde li ser serê wî rabê. Bi vê yekê re dixwezin ku pirsgirêka kurd, li ser muzakare werina dest pê kirin û bi riyên aşîtîyana werê çareser kirin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku êdî dixwezin ku bi civatî ew jî jiyane xwe bidomênin. Lê dewleta tirk, dixwezê ku kurdan ji holê rakê., Zimanê wan qadaxakirîya. Nahêle ku ew zaroyên xwe perwerde bikin. Malên perwerde ên kurdan bi derfet û imkanin xwe vekirina, ew jî, yek bi yek êdî tên girtin. Bi vê yekê re, bi tememî şer li dijî kurdan û civake wan hatiya dest pêkirin. Asta şerê li dijî civate kurd gihiştiya kîjan astê ku mirov li wê bûyara namerdana ya girtigahe Bozantiyê lê binerê, mirov wê fahm bike. Bi vê

yekê, mirov karê bibêje ku ev bûyara namerdan, weke astaka şerê dewleta tirk yê bi kurdan re ya. Bi wê re mirov karê bibêje ku şeklê şerê wê yê qirêj a jî. Dewletê tirk, hertimî nemerdîyek li dijî kurdan bi şerên wê yên vî rengî li dijî kurdan meşandiya. Bi vê yekê re mirov divêt ku bibêje ku şerê dewletê yê bi kurdan re ew şerê namerdana ew serê qirêj, êdî bi vê rengê hebûna xwe dide berçav.

Di vê demê de kurd, serîlêdana çalakiyaka weke ya çalakiya girêva birçîbûnê, divêt ku mirov êdî weke gihiştina wê astê ya tişîbûnê ya kurdan. Êdî kurd, tişî bûna. Êdî, tehemulî wê kiirnên dewletê yên bi bêmanûsî nakin. Êdî bi vê yekê re, li dijîî, ew jî, bi li rûmeta xwe lê xwedî derketinê re tekopşîna xwe didina meşandin. Dewlet, êdî bi awayekî pirr bi bêahlaqî tê bi ser kurdan de. Êdî had û sînorê mirovatiyê derbas kirîya. Bi nêzîkatiyên ku ti nesibên xwe ji nirxên mirovatiyê negirtin û bêahlaq, êdî tê bi ser kurdan a.

Kurd, li ber vê yekê, êdî di rabina ser xwe. Êdî ji vê re dibêjin êdî bes a. Êdî li ber wê serê xwe dirakin û dbêjin êdî bes a. Dewlet, ji ber ku hê ew nêhtên wê ji holê rakiirna kurdan di serê wê de heya, êdî tê bi ser kurdan de. Êdî dike û dixwezê ku herê biser kurdan de. Ji ber ku hemû gotinên wê yên bi navê demokrasiyê û miorvatiyî hanîna ser ziman, êdî derew derketina û derew in, êdî ew jî dibîne ku ti kesek li wê derew a wê êdî ne bi bawer a, êdî ew jî çareyê dihêrîşa li ser kurdan de dibîne. Bi vê yekê re, êdî ew diçê bi ser kurdan de.

Li ber van kirinên dewletê ên weke ên li girtigahe li bozantiyê, mirovê ku bêdeng bimêne, ew bila ti carî ji xwe re nebêje ez mirov im û mirovatî bi min re heya. Divêt ku ti carî êdî bahse mirovatiyê nekê. Ew mirovê ku bêdeng a, ew mirov, ne nava mirovan a, ew ji nava ne mirovan a. Ew, divêt ku ji devê xwe ti carî gotinên ku têde banse mirov û mirovatiyê dikin, êdî dernexe. Miirov, bi çî mirov a? Mirov, bi mirovatiya xwe re mirov a. Ew nirxên mirov ên civatî, mirovatiya mirov bixwe na. Ku hêrîş li wan nirxên mirov bûn li ber wê bêdengî bû, êdî li wir, tenê bêahlaqî û nemirovatî heya.

Di roja me de, hêrîşên li kurdan wilo zêde bûna, êdî ji had û hasabê xwe derbas kirin. Hêrîşn ku dibin, hemû bi plan li keseyetîya wan ya civatî û civatî dibin. Ji ber ku ew keseyetîya wan ya civatî û civakî were halandin û ji holê rakirin, êdî ev hêrîşên amerdana û bêahlaq lê dibin. Hemû hêrîşên ku lê dibin jî, bi plan û program dibin. Wê ji kîjan aliyê ve hêrîş li keseyetiyê werina kirin, ew jî, bi teybetî hatiya kifşkirin. Bi teybetî, nirxên civatî ên ku keseyetiyê di afirênin, hêrîş, li wan dibin. Ew kurdên ku li cem AKP′ jî na, li ser wan jî, van bûyarên ku dibin ên weke bozantiyê, dikin ku meşrû bidina nîşandin. Di wê bûyarê de, çî mirovê ku bêje ez kurd im, ev hêrîşê li girtigahe Bozantiyê, li wan li nirxê wan û li rûmeta wan a. Ku piçekî jî şeref û namûs bi wan re hebe, wê êdî li ber wê serê xwe rakin û bêjin êdî bes a. Lê mirovê ku rûmeta xwe windakirî, ji wan hêvîya nêzîkatiya bi rûmetkirin çendî berhewa ya. Ku mirov li wan kurdên li cem AKP, di sekinê, mirov fahm dike.

Çalakiya girêva birçîbûnê di vê demê de li dijî van bêrûmetiyan û şerê ku li kurdistanê tê meşandin, dengekî mirovatîyê ya. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku ew deng, dengê mirovê ku hê şeref û rûmeta xwe winda nekirîya ya. Bi vê yekê re, ew deng, dengê rûmet û hebûna rûmetê jî ya. Ez pirr meraq dikim, ku zaroyek ji wan zaroyên ku Bozantiyê ku zaroyê kemal bûrkay ba, wê çî kiriba? An jî, ew kurdên ku dengên wan weke yê cerikan derdikeve û hertimî hêrîşî vê tekoşîna wî gelî û nirxên wê

dikin, wê çî kiriban? Bila, di serî de, ev vê pirsê ji xwe bikin, û hinekî şeref û rûmetê bibîr bikin.

Civatek, bi keseyetiya xwe re heya. Hemû hêrîşên li keseyetiya wê, li wê bixwe na. Di vê demê de, hêrîş têne ser keseyetiya civate kurd ji aliyê dewleta tirk ve. Bi teybetî, xalên ku rûmeta civate kurdan di xwe de diparêzên û bi wan li ser lingan e, hêrîş li wan dibe. Bi teybetî, mirov karê bibêje ku hêrîş li stûnên hebûna civate kurd dibin. Divêt ku mirov bi teybetî vê yekê bibêje. Civata kurd, bi van hêrîşên bi vî rengî ku lê dibin re, dihê xwestin ku ji temenê wê ve were xuruxandin. Bi teybetî, ew xalên civatî û nirxên pîroz û bi qadr ên ku hene û di nav civatê de ku mirov li dora wan lev dicivê, bi teybetî hêrîş li wê dibêt. Ev hêrîşên bi hasap û kitap ku li kurdan û li keseyetîya wan ya civatî dibin, armanc û hedefa wan, ew a ku temenê hevgirtina kurdan bi wan ji holê were rakirin. **Bi** teybetî, divêt ku mirov bibêje ku hêrîş li wan nirxên ku kurd li dora wan lev civîna bi civatî. Bi teybetî, li nirxên wan yên kevneşopî û rûmetî dihê kirin. Ew nirxên weke kevneşopîyê û rûmetê ên civatê, weke star û cilahayayê ya li ser a. Bi wê nirxê, re dikene, digirî û bişahî dibe, û mazin dibe. Bi wê re, riya xwe dibîne. Ew nirxên civatî, ênku î ro dewleta tirk hêrîşê li wan dike, divêt ku mirov gotinekê li ser dîroka wan jî bibêje ku bi hezar salan jîyana û bûna temenî mirovatiyaê herêmê hemûyî jî, Ola islamê bixwe jî, bi wan nirxan mazin bûya. Olên din jî pirr ji wan nirxan hildana nava xwe. Di aslê xwe de, bi vê yekê re, ez wê hêrîşa dewleta tirk li wan olan bixwe jî dibênim. Nirxên hevpar yên mirovan ên weke rûmet, çand, kevneşopîyê û hwd, hertimî ku hêrîş li wan bûn, ku hêrîş li deverekê li wan bûn, weke ku hêrîş li hemû deveran li wan bûbe ya.

.. **Dîroka** baweriyê, dîrokaka pirr demdirêj a. Di vir de, di vê nivîsa pirr kin de, em ne di wê îdîayê de na, ku wê dîroka demdîrêj hemûyî bênina ser ziman. Lê di vir de, bi dema me ve girêdayî, hin xalna bi wê ve girêdayî, divêt ku em li ser bisekin in. di vêr demê de, ev yek weke xaleka pirr giring jî, li pêşîya me kurdan bixwe jî disekinê. Bawerî, di serî de, koka gotina wê, ji bîrbûnê tê. Hinekî jî, bi zanebûnê ve girîdayî ve girîdayî ya. di aslê xwe de, ku mirov tenê gotina ´bawerî´yê jî bi tenêserê xwe hilde li dest, ne bêderfet a ku mirov nêzîkatîya bi pergalî lê nekê. Bawerî, bi xwe û gotinîya xwe re û dîroka xwe re, xwediyê awayekî pêşketinê yê bi pergal a. di serî de, ku mirov hewl bide ku wê pergalîya wê fahm bike, di temenekî hîyararşîkî de divêt ku mirov di xateka jîr û bîrê de di dîrokê de bimeşê û were ta roja me. Ev yek, wilo ku bû û hat hat ser ziman jî, wê aliyekî wê yê pirr giring lê ne hemûkayîya wê bêîne ser ziman.

Ku mirov bahse bawerî û bawermendîya olî bi dîrokê re bike, di serî de weke xaleka pirr girîng, berdicle û berfiratê dihê berbîra me. Ev hatina bi vî rengî ya berbîrê, ne belesebeb a. Pirr sedemenên wê hena. Lê sedeme wê ya sereka ku mirov lê binerê û wê fahm bike, dîroka bi bawerîyê û dîroka olê ya ku pêşketîya re dihê berçav. Yê min bixwe, ku ez nahaka jî li dîrokê dinerîm û bi tebyetî jî li dîroka bawerîyê ya li berdiclê û berfiratê ku bi dîrokê re pêşketî, ez dîrokaka wê ya bawerîyê ku hê dest lê ne hatîya dayin dibînim. Ev nerîna min du sedeman di bin xwe de bi nerîna li lê re di xwe de diparezê. Di serî de, weke sedeme pêşî ku ez bênima ser ziman, ev a ku dîroka wê ya ku heta î ro bipiç jî bê ku hatîya ser ziman, ji ber ku ne li gor wê awayê pêşketina wê û bawerîya wê ya, êdî ew hatîna li ser ziman jî, tenê bi serê xwe bi xwe re dimenê li holê. Êdî dîroka ku hatî jînkirin jî, weke ku dest lê ne hatî dayin di cihê xwe de dimêne. Lê ew hatina li ser ziman jî, car bi car jî, weke "dîroka wê ya ku hatî ser ziman" jî dihê ser ziman û dihê bilêv kirin. Çendî ku li gor ku çawa ku hatîya jînkirin ku ku li gor wê

hanîna li ser ziman bû, wê hingî, ew were ser ziman. Lê wekî din jî, wê çendî jî bi wê awayê ku î ro bi hin awayna dihê ser ziman ku were ser ziman û nivîsandin jî, wê ew nivîsandina wê ku hatî kirin, wê weke hizir û an jî nivîsaraka farazî ya ku hatî nivîsandin wê li holê bi serê xwe ku ti girêdana wê bi wan jînbûyînên ku jînbûna re nîna wê bimêne. Bi vê yekê re, êdî mirov divêt ku bibêje ku dîrok, êdî weke ku ne hatî ser ziman jî, di cihê xwe de dimêne.

Di roja me de, pirr mazin pêşketineka mazin ya bi çapameniyê re heya. Car bi car jî, bi wê çapameniyê re, hin nivîsandin, weke ku li tirkî bû dihê kirin di temenê ´şerê teybet ´ ku bahse wê dihê kirin de. Bi vê yekê re, di aslê xwe de, ew awayê hanîna li ser ziman ya farazîyan ne tenê bêhişkirinekê bi têgihiştina dîrokê re bi mirov re çêdike, her weha pêşî li nivîsandina dîrokê jî li gor rastîya wê digirê. Bi vê yekê re, dîrokaka ku mirov wê di nav neynokê de bahse wê bike dihê nivîsandin û ya ku bi rastî jî hatî jîn kirin, di cihê xwe de di dema xwe de ne nivîsandî dimêne. Ev awayê kirinê, bi olê re jî dihê kirin. Dîroka olê hem ya berî zayinê û hem jî ya piştî zayinê, ez bi teybetî nikarim bibêjim ku bi rastî li gor xwe û jîyîna xwe hatîya nivîsandin. Li hin der û deverna ji nezanî kêm hatîya nivîsandin û li der û deverna jî, bi zanî ne li gor rastîya wê hatîya ser ziman.

Di vê temenê de, ev awayê nivîsandinê yê ku mirov bi têgihiştina roja me ku weke ´têgihiştinaka popûlar´ jî dihê zanîn û ser ziman hatîya nivîsandin, di aslê xwe de bi dîroka roja me re, di bin de maya. Biqqasî ku xwe di bin de hiştîya, her weha ne hiştîna nivîsandina rastîya ya dîrokê jî li gor rastîya xwe re di bin de maya. Hin bi hin jî, bi vê awayê wê re bi bin dikeve. Ku mirov bahse vê yekê biawayekî rast bike, di aslê xwe de, çend ku bahse rojhilat dihê kirin û dihê gotin ku ´hê dîroka wê ne hatîya nivîsandin jî´, pêşketina wê ya herî mazin mirov li vê qadê dibîne. dîroka herêmê ya ku hatrî nivîsandin, ne li gor ku kî çawa hatîya û jînbûya û dîrok çawa buhurîya dihê nivîsandin, li gor ku kî bihêz û serdest a, li gor wî û hêzîya wî ya zordest dihê nivîsandin û bi perwerdekiirnê re dihê dayin herê kirin. Bi vê yekê re, dîroka ku ne hatî jînkirin lê hatîdayin herê kiirn heya ku hatî nivîsandin.

**Ji denezena azadîyê ku birêz Ocalan ku di Newrozê de denezendî û heta deklerasyona KCK`ê.**

Berî Newroza 2013´an, rayadarên dewleta tirk, bi serokê gelê kurd birêz Ocalan re hevdîtin çê kir. Hevdîtinên ku çêbûbûn jî, di ancama bi sadan xwepêşandinên ku gelê kurd li darxistî û girêvên bircîbûnê ku girtîyê azadîyê kiribû bû. Bi van herdû herdû aliyan ve em dikarin gelek aliyan jî em rêz bikin.

Ji temûza 2011´an de ku hevdîtinên bi birêz Ocalan hatibûbûna birrîn, kî ji rayadarên dewletê derdiket ber çapameniyê digotin ku "êdî dewra ocalan bi dawî bû".Hin kurdên ku li ser xwûna kurdan sûnd xwarina û ddijimatîya kurdan li rex dewlet dikirin jî, di dora wan gotinan de di nivîsandin û aqil dimeşandin. Lê gelê kurd, di her qadê de li rêberê xwe xwedî derket. Ji kurdistanê bigra heta ku digihişt welatên ewropa, her roj kurdan jî xwepêşandin li dar dixist û digot ku "ocalan wîna min a". Bi wê re kurdan digot ku "li ser navê min bi wî(birêz Ocalan) re hevdîtinê bike." Bi vê yekê re, birêz Ocalan weke "muzakarevanê yekem" li ser navê xwe bijart û navê wî hanî ser ziman.

Di aslê xwe de di ancama wanqas xwepêşandin û girêvên birçîbûnê de hin bi hin temenê hevdîtinan afirî û dewletê jî bi birêz Ocalan re hevdîtin kir. Piştre jî, li ser hevdîtinan û rêbazên wan nîqaş bûn. Gotina "em wî weke anstrûman bikardihênin" jî, hingî ji devê rayadarên dewletê derketin. Mirovekî ku gelê kurd gelekî ku ser 40 milyonî re ya ku gotî "ew vîna min a", ev gotinên qirêt bo wî dihatin bikarhanîn. Lê ne aliyê kurd û tevgera kurd û ne jî birêz Ocalan û ne jî gelê kurd li van gotina ne aliqîn û ji xwe re ne kirina asteng û xwestin ku hevdîtin bi wî re were kirin. BI wê re jî, hevdîtin, dest pê kirin. Di ancama wê hevdîtinê û sozên ku ji hevdû re hatibûbûna dayîn, birêz Ocalan ew nameya xwe ku di Newroza 2013´an de hatxwandin, nivîsand. Li gorî wê, wê bi nameyê re temenê hevdîtin û piştre muzakareyan biafirîyan a. Ya ku gelê kurd jî, hêvîî dikir û li bendê bû ev bû. Lê ew nebû.

Gelê kurd, li bendê ma. Tevgera kurd, hêzên xwe bo ku rewşeka aramî bo çareserkirina pirsgirêka kurd biafirê vekişanda başûrê kurdistanê. Armanc, bi vê vekişînê re ew bû ku wê temenê çareserkirinê biafirîyana. Li gorî wê jî, wê pêvajo bi rêve biçûya û wê êdî bi tememî heta ku rengê hêzên kurd ê gerîlla´ jî bihata nîqaş kirin ku di jîyane de di rewşeka çawa ya parastina kurdan de wê bihata bicih kirin.

Lê rayadarên dewletê, ji dêla ku wê gavê û gavên din ên ku aliyê kurd avêtina wê hilde cidîyetê, nîqaşên bêwatekirinê dan destpêkirin. BI wan nîqaşan hewl da ku bêwate bike. Cidîyeta wê, ji cav bide xistin. Ya ku bû ev bû. Piştre, ji rayadarên dewletê, nîqaşên ku bûn, "na, ji sadî 10 vekişîna,", "na, ji sadî 20 vekişîna", " na, ên pîr û kal vekişîna" û hwd. Lê kesekî aqil nekir û ne pirsî ku di nava rewşeka şer de çê karê pîr û kalan heya?

Aliyê kurd, pirr gav avêtin, lê dewletê ti gav neavêt. Ji ber ku herkesekî didît ku aliyê kurd û tevgera kurd pirr gav avêtin û ev jî wê li ser hikimetê bê weke giranî û temenê zordayina li wê´, êdî gotin ku em pakêtê amede dikin. Bi rojan li ser wê pakêtê nîqaş dan kirin. Gotin ku "sûprîzên me hena". Kê ku dipirsî ku ka ´çi di pakêtê de heya´, digotin ku ´li bendê bin. Bi rojan ev dane nîqaş kirin. Piştre ew roj hat û pakêt ji rayagiştî re hat vekirin. Ji pakêt, tişta ku derket, dîsa domandina înkar kurdan û qadaxaya li ser zimanê kurdî bû. Lê tenê tiştek hebû. Ew jî, ew bû ku êdî ne dikarin bi rêbazên berê şerê xwe yê bi kurdan re bidomên in, êdî hin rêbazên nû bo domandina şer pêşxistin. Pêşî, ´trt-şeş´, piştre gotin "kursîyên kurdî", piştre hat û derket "dibistanên teybet." Yanî, kurd, wê zimanê xwe yê dayikê, weke ku çawa ku zimanakî beyenî fêr dibin, wê fêrbûban. Zimanê kurdî, dikirina statûya ´zimanê beyenî´ de bo kurdan, tevî ku zimanê kurdî zimanê kurdan a.

Di wê navberê de, gelê kurd û tevgera kurd, hertimî xwestin ku derfet ji birêz Ocalan re were afirandin ku ew karibê rol a bileyizê. BI wê re jî, dixwestin ku pêvajoya çareserîya demokratik were pêşxistin û bê bi serxistin. Lê tii tiştek ne guharî. Ne zimanê rayadarên dewletê guharî. Ne ew tecrîda li ser birêz Ocalan hat rakirin û ne jî qadaxaya li ser zimanê kurdî hat rakirin. Vajî wê, dewleta tirk, şerê ku li bakûrê kurdistanê bi kurdan re dawî lê hanî, herikand rojavayê kurdistanê û li wir bi kurdan re şerê xwe yê bi kurdan re da domandin. Ev pêvajo û rewşa wê ya bêşerî jî weke firsandekê ji wê rewşê bikarhanî.

Di pêvajoyê de, ya ku aliyê kurd li bendê bû ku weke gavavêtinê werina avêtin, ew bû ku di temenê nasîna statûya kurdan de gav werina avêtin, qadaxaya li ser zimanê kurdî were rakirin û şer bi tememî dawî lê were hanîn. Lê ev nebû. Ji xwe, dewletê, weke ku alîyê kurd û bi giştî kurd tûna na tevgerîya. Di pakêta ku dibêje "pakête demokratik" û qaşo ya çareserkirinê ji xwe navê kurd jî nabuhurê. Yanî, ne tenê di wê pakêtê de, heta roja me, di ti belge û ankû dokumentên fermî de navê kurdî ne hatîya nivîsandin û ne hatîya bicih kirin. Divê ku emm vê yekê jî bi teybetî binxatkin û bibêjin. Ev kevneşopî, di pakêtê de jî ne guharî û di wê de jî navê kurd nayê bikarhanîn.

Bi wê re, pêvajo, çend ku bi rê ve diçê, dewletê, rayadarên wê ne zimanê xwe guharandin û ne jî gavek avêtin. T. Ardogan dibêje "bila herin ku bikûve herin." **Bilant Arinc, dibêje "heta dojehê rêya wan heya."** Her wusa, li dûv hevdû gotin li ser gotinê di temenê dijberîya kurdan û mafê wan û tevgera azadîya kurd de hatina gotin.

Dewleta tirk, ku di destpêka pêvajoyê de, hemû hasabê xwe li ser mudahaleyeka mihtemel ku li Sûrî kiribû, ku pêvajoya şerê li Sûrî destpêkir, wê jî komên çete bi rêxistin kir û şand bi ser kurdan. Heta roja me, bi sadan kurd bi destê van komên çete û kujar hatina qatil kirin. Komkujiya ´til-hasil´ û ´til-Eran´ê hatina kirin ku di wan de bi dehan kurd hatina qatil kirin. Yanî, bigiştî li Sûrî û bi teybetî li rojavayê kurdistanê, pêvajoyaka din ya nû weke ya ´anfalê´ ku li başûrê kurdistanê li dijî kurdan pêşxistin, xwestin ku li rojavayê kurdistanê jî li dijî kurdan pêşbixin. Hemû hasab li ser wê bû. Lê piştî ku pêvajoya li Sûrî bi aliyekî din de herikî û mudahale lê nebû, tirkiya jî bi hasab û kiryarên xwe re li holê bi tenê ma.

Î ro jî, di van rojên dawiyê de em li ser çi nîqaş dikin? Em li ser herdû destûrnameyên şer´ ên ku hikimeta tirk a AKP´ê ji meclîsê buhurandin diaxvin. Destûrnameyek, destûrê dide ku bi leşkerî hêrîşê karibê bibe li ser kurdên başûrê kurdistanê. Destûra duyemin jî, destûrê didiyê de ku hêrîşa leşkerî karibê bibe li ser

kurdên rojavayê kurdistanê. Ev herdû destûrname, piştî ku meclîs ji batlaneyê vegerîya, karê wê yê pêşî derxistina wan herdû destûrnameyên şer bû. Bi wê hêvî şikeştina bi pakêta hikimeta AKP´ê re, ev herdû destûrname bi carek di meclîsê de buhurandin.

Di vê pêvajoya ku em destpêka wê ji newroza 2013´an didina destpêkirin de, heta roja me, kurdan gelek gav avêtin. Rayadarên dewletê, sozên ku dabûbûn jî ne hanîn li cih. Pêşî soz dan û piştre derketin ber çapameniyê û gotin ku "me ti soz ne dane ti kesekî". Ev gotin, gelek caran hat ser ziman. Yanî, di dema ku ev gotin, hat gotin ji devê T. Ardogan, hingî gûmana pêşî di serê kurdan de çêbû. Piştre, hin bi hin êdî gûman pêşketin. Ji ber ku kurd, qarakterê dewletê dizanîn. Hertimî soz dane û piştre gotina me ti soz ne dane. Di dema Sêd Riza de jî, ev wusa bûbû. Hingî jî, çûbûbûn û bi wî re hevdîtin kiribûn û jê re gotin "emê di cih de gavan biavêjin." Lê piştre, ji dêla gav avêtinan, oparasyonên leşkerî û seferên leşkerî ên li kurdan û li kurdistanê hatibûbûn li darxistin. Ji xwe Sêd Riza jî, dema ku rayadarên dewletê gotinê de "em bi hevdû re hevdîtinê bikin" û piştî ku li ser wê sêd Riza bi şeş şêwîrmendên kurd ên bi wî re ku li ser navê kurdan ku wê herina Erzînganê û li wir hevdîtinê bi dewletê bikin bo ku pirsgirêka kurd were çareser kirin, di wê hevdîtinê de wê Sêd Riza û şeş hevalên wî werina girtin û piştre werina bi derve kirin. Mirov, dikarê vê pêvajoyê jî, bi vî rengî weke pêvajoya duyemin ya vê ppêvajoyê şîrove bike.

Gelê kurd, hemû maf û azadîya wan ji wan hatîya girtin û standin. Zimanê wan hatîya qadaxa kirin. Li herêmên wan navê wan jî û navên herêmên wan jî hatina qadaxa kirin. Kurd, dixwezin ku qadaxaya li ser zimanê wan were rakirin û ew karibin bi ´xweserî´ li herêmên xwe bi ziman, çand û nirxên xwe yên civatî re êdî jîyane xwe ya civatî bidina domandin. Ya ku ew dixwezin ev a. Kurd, dixwestin ku tişta ku ji wan hatîya girtin û standin bi şûn ve were dayîn. Wekî din, ew tiştekî ji ti kesekî zêdetir naxwezin bo xwe.

Ji Newroza 2013´an û heta roja me yanî 10 kewçera 2013´an, pêvajo di temenê înkare kurdan de ji aliyê dewletê ve hatîya meşandin. Pakêta ku di bin navê "pakêta demokratik" de denezendin jî, di wê zihniyetê de bû ku înkare kurdan bide domandin û qadaxaya li ser zimanê kurdî were domandin. Di vê temenê de, di temenê hin hasab û listikên ku dihat xwestin werê kirin û bi wan di hilbijartinan de bê ku derbeyê li kurdan bixin û xwe jî serkevtî bidina nîşandin û bi wê re jî di vê temenê de pêvajoyê di temenê şikandina vîna kurdan de li gorî xwe biancam bikin.

Li ti devera cihanê minaqa wê tûna ya ku muzakare yekalî bin. Dewlet, bi zihniyeta xwe, ji ber ku hê înkare kurdan dike û civake kurd nasnekê û maafên wê nasnekê, êdî di temenê asîmlekirina wê de gava diavêje. Yanî, gavên ku di bin navê "dibistanên teybet" û hwd jî, ne bi armanca çareserkirinê na. Bi armanca, ku bertekên kurdan bidina şikandin û bi wê re êdî bê astangî ku karibin wan politikayên xwe ên asîmlekirinê bi rê ve bibin. Pakêt, bi vê armancê ya. Yanî, dewletê, bi wê pakêtê re, aliyekî din jî pêşxistiya ku şerê xwe yê bi kurdan re li gorî rêbazên demî pêşbixe û bide domandin. BI vî rengî bi pakêtê re hinekî qarakterê dewletê dihê guharandin bo ku hem karibê înkare kurdan û qadaxaya li ser zimanê wan bide domandin û hem jî xwe jî li gorî demê ku afirandî bide domandin. Di vê çerçoveyê û mantiqê de pakêt hatîya amede kirin.

Wê ji rayagiştî re bêjin ku "meyizênin, zimanê kurdî ne qadaxa ya, me dibistanên teybet vekirin, kursîyên kurdî, li zankoyan hena, tv´ya kurdî va me vekirîya" û hwd. Ev gotin jî, bi armanca li ser wê înkarê û qadaxaya esasî ya li ser zimanê kurdî bidina

domandin. ..Di vê temenê de, weke ku dihê ditin, politkayaka dewletê û bi teybetî jî hikimeta AKP`ê ya bo çareserkirina pirsgirêka kurd tûna ya. Gelê kurd û tevgera kurd, hertimî xwest ku poltikaya çareserkirinê çê bike û pêş bixe. Ya ku herkesek jî li bendê bû. Lê ya ku nebû jî ev bû. Piştî ku KCK´ê li ser navê gelê kurd weke aliyê gelê kurd deklerasyona xwe weşand û pê de, ya ku dewletê kir ew bû ku balefirên xwe li ser qandilê re bide firandin bû. Di heman rojê de destûra şer ya bo başûrê kurdistanê ji meclîsa tirk hat buhurandin.

Pakêta qaşo bi navê ´pakêta demokratîk´, pakêta xapandinê bû. Armanca wê ew bû ku bibêjin ku "meyzênin ku me gav avêtin", hat amede kirin. Lê wekî din, pakê ne armanca pêşxistina çareserîyekê bû. Dewleta ku nîyeta wê wê ya çarserîyê hebê, divê ku şert û mercên birêz Ocalan xweş bike û azadîya wî biafirêne. Divê ku di temenê statûya kurdan û naskirina statûya kurdan gav biavêtina. Divîyabû ku qadaxaya li ser zimanê kurdî rakiriba. Divîya ku şerê xwe yê bi kurdên rojavayê kurdistanê re ku dimeşêne, ne kiriba. Divîya ku jli şûna ku **´hêtên şermê´ di nava kurdan de çê bike hêhtirî di temenê pêşxistina têkildanînê de gavên demokratikî û di temenê biratîya gelan de biavêta. Lê ev jî, zihniyetekê divêtên. Ya ku tûna ya jî, ev a. Em li vir, di serî wî ´hêtê şermê´ ku dewleta tirk dixwest ku di nava kurdên bakûr û rojava de çê bike, kurdan bi girseyî şermazar dikir**. ..

Bi gotinekê em bibêjin, ji destpêka pêvajoyê ji roja newroza 2013´an û heta roja me, dewletê ji gavên şer û di temenê şerxwezîya xwe ya bi kurdan re û pê de ti gav ne avêtin. Hikimeta AKP`ê, bi pakêtê re rûpelekî din li wî dîroka dewletê zêde kir ku di wê de di ti belge û dokumentên fermî de navê kurd nebê û newê nivîsandin. Hê jî, wê kevneşopîyê didomênê. Ev jî, înkare a kurdan a. Ev, zihniyeta ku kurdan înkar dike û zimanê wan qadaxa dike ya.

..**Di 21´ê** adare newroza 2013´an de, serokê gelê kurd ew revakirinên ku wî digot ezê bikim û ku herkesek li bendê bû kir. Piştî ku nameya Birêz Ocalan hat xwandin û piştre, nîqaşên ku hatina kirin, di temenê ´xwe şûn ve kişandina hêzan a dervî sînor´ de bi sînor nîqaş hatina kirin. Ev nameya Birêz Ocalan, di dema ku em li nîqaşên ku li ser dihên kirin ku em li wan dinerin, em dibînin ku bi tememî ne hatîya fahm kirin. Hin Dordor jî, dibêjin ku "dema ku dewletê, pêvajo xira kir, êdî wê çi bibe?", di vê temenê de dipirsin. Yanî, vê denezenê tenê bi wê re bi sînor şîrove dikin. Ya ku di aslê xwe de bi vê nameya Birêz Ocalan re ku were nîqaş kirin jî divîyabû ku ne ev ba. Divîyabû ku di serî de bi zihniyet û têgihiştina di hundurê wê de bihata nîqaş kirin.

Di dîroka mirovatiyê de, çend pêvajoyên giring hena. Pêvajoya pêşî, bi derketina Nebî Musa re ya. Ya dûyemin jî, bî Nebî Îsa re ya. Pêvajoya sêyemin jî, ku em di dewam van herdû pêvajoyan de bênina ser ziman derketina îslemiyetê ya. Ev pêvajo, tenê bi derketina van mirovên ku ev pêvajo dane destpêkirin re nayê ser ziman. Di serî de, bi hizrên xwe de zihniyeta ku hanîna ser ziman, ew dihê ser ziman. Her yekê ku di dema ku hatîya û derketiya de, bi xwe re li gorî dema xwe zihniyeta nû hanîya. Bi Nebî Musa bahse dema derketin û pêşketina "yek-xwûdatîyê" ya. Bi Nebî Îsa re bahse felsefe û pêşketina wê ya di vê xatê de û ´wijdan´ dihê kirin. Bi derketina Îslemiyetê re jî, demeka nû ya bi zihniyetî derket. Hz. Mihemed, pêşî hêkel û peykelên Medînê dane ardê. Ev hersê pêvajo, di xate olî de, serkevtineka mazin ya dîrokî ya.

Piştî wê re, dema ku em têna sadsale 15´min û pêde, em dibînin ku dema ronasansê pêş dikeve. Ev dema Ronasansê, weke demeka nû û destpêka wê ya. Piştî wê demê de,

wele zaroyên wê demê, wê pêşî şoreşa Îngilistan, piştre jî şoreşa Emerika û Firansa tên û dibin. Şoreşa Emerika û Firansa weke dû şoreşên ku mohra xwe li dîroka mirovatiyê xistina na. Dema ku em bahse Şoreşa Emerika bikin, di cih de "**denezana Serbixwebûnê"** ya Emerika ku hatî denezendin tê bîra mirov. Piştre, di dema Abraham Lîncoln de, di temenê têgihiştina wê denezanê, destûra ku tê nivîsandin di wê de bi xalên ku tên bicih kirin, wê ew koladarîya ku heta wê demê hatîya li ewropa û ew cudabûna di nava reşik û sîpîyan de tê ji holê rakirin. Di dema ku Abraham **Lîncoln**, wê bi destûrî dinivîsêne û dide rakirin di dema xwe de, bêgûman di cih de ew cudahî û dijberîya li dijî reşikan ji holê ranabê. Bi demê re, ew bi tekoşîn û pêşketina wê re hin bi hin êdî bêwate dihê kirin û ji holê ra dibe. Piştre ku heta ku dem tê dema Martin Luther King, wê êdî bi wê tekoşîn û tevgera ku wî dayî dest pê kirin, wê derbeya dawiyê li wê cudahî û dijberî û bêmafîya reşikan were xistin.

Î ro, dema ku em ez li nameya Birêz Ocalan dinerim, ev rewş dihê berbîra min. Di serî de, Divê ku ez bibêjim ku zihniyeta nû ya bi şoreşa kurdistanê de derket li holê, êdî di vê temenê de zihniyeteka nû ya. Wê nameya wî ya ku di 21´ê adare 2013´an de hat xwandin, ku çend çend gotin jî bin, lê divê ku mirov di vê temenê de weke denezeneka azadîya gelan û zihniyeta wê bihasibne û bêne ser ziman. Zihniyeta nameyê, em nikarin tenê bi ´xwe vekişandinê´ û ankû bi sekinandina şer re bênina ser ziman.

Di serî de, denezen bi têgihiştin û zihniyeta Newrozê re hatîya şiştin. Newroz, çawa ku em dibêjin ku "bihare gelan" a, her wusa, di wê rojê de denezena wê têgihiştina bihare gelan dest pê dike. Roja, newrozê, piştî Kawayê Hesinkar ji sale 612´an û pê de, heta ku roja me ku 2625 buhurîya li ser re, ji nû ve bi vî rengî zihniyeta wê hat denezendin. Ev zihniyeta Newrozê, zihniyeta şoreşa kurdistanê ya û bûya malê gelên herêmê jî.

Em nikarin vê nameyê, tenê weke nameyekê jî şîrove bikin. Ji wê zêdetir, ew denezene şoreşa Emerika ya bi navê "denezena serbixwebûnê" dihê çi wateyê, her wusa, ev denezena ku Birêz Ocalan di 21´ê Newroza 2013´an de denezend dihê heman wate yê li gorî pêşketin, zihniyet û têgihiştina xwe. Ev name, dema ku em dîroka wê binivîsênin, em nikarin tenê ev 30 salîya dîroka tekoşîna azadîya kurdistanê jî, bi wê bênina ser ziman. Ji wê zêdetir, divê ku em vê dîroka vê xate ku li ser wê re Newroz di sale 612´an de ku bi kawayê Hesinkar ku afirîya û piştre ku heta roja me hatîya, divê ku em weke dîroka wê denezena ku divê ku em weke denezen azadîyê bi nav bikin, divê ku em werênina ser ziman. Her wusa, divê ku em bibêjin ku ew cewherê têgihiştin û hişî ku destpêka wê bi êzdatîyê bûya û piştre li ser wê xate cihûtîya Nebî Musa, xiristîyaniyete nebî îsa û îslemiyeta Hz. Mihemed, dem bi dem pêşketîya, divê ku em bi wê re di çerçovaya hundurê wê bibînin û bênina ser ziman. Li vir, di nêzîkatîya aqil û wijdan bi hev re, di temenekî azad de bi hev re jînbûn û pêşketina gelan, û hwd, bi hev re bi denezêne re dihê û digihijê li hevdû.

Gelên herêmê, ku heta nûha li wan kefen hatîya pîvan, ew kefen çirandin. Ew gel, êdî dixwezin derkevina dika dîrokê bi nav, deng û rengê xwe. Li herêmê, gelên weke kurdan ku navê wan û zimanê wan bixwe jî qadaxa ya, êdî bi nav, reng û dengê xwe dixwezin ku bijîn. ya rastî, hem ji bo roja me û hem jî bo pêşarojê denezena wê û zihniyeta wê hat denezendin. Zihniyeta ku heta nûha qadaxa dikir, ew bi vê denezenê re hat şermazar kirin û mahkûm kirin. Bo vê yekê, ku siba dîsa dewletê herê bi ser kurdan de û şerê kurdan û dewletê cardin ku dest pê bike jî, wê ev zihniyet û têgihiştina

denezêne newê ji holê rakirin. Ew şerê dewletê, tenê wê were wê wateyê ku dewletê li dijî wê zihniyeta denezêne şerê nemrûdîya zihniyeta xwe daye dest pê kirin. Wê tenê ev were hanîn li berçav.

Li kurdistanê, divê ku ez bibêjim ku ev denezendin, weke bilêvkirina têgihiştina Birehim Xelîl, bi lêvkirina têgihiştina Zerdeşt û Manî jî ya. Di roja newrozê ya ku li ser wê xate wan pêşketîya ev denezen li gorî gîyan û têgihiştina newrozê hatîya denezendin. Ev denezendin, bi kortasî, denezene gelên Mesopotamya ên dîrokî na.

Denezend, di temenê pêşketina gelên mesopotamya de, ku dema ku Marks "manifestoya kominismê" denezend û ku piştî wê re bi navê "çîna karkeran" çi pêşketin û pêvajo bi tekoşîn û serkevtina wan çi ancam derket li holê, wê ev denezend heman rol û weynê di pêşketina gelên herêmê ku li ser kok û nirx û dîroka xwe re ku pêş bikevin wê rol û weyn bileyizê. Bi vê yekê, ev denezen, wê li ser vê esasê û zihniyetê, wê karê xwe manifestoyî di pêşketina gelên herêmê û bidest xistina azadîya wan de wê rol û weyna xwe bileyizê. Hizrên Birehim Xelîl, piştî wî re, çawa ku bi di dema wî de bi êzdatîyê re pêşketin, piştî êzdatîyê re li ser wê xatê û têgihiştin û zihniyetê re cihûtî, xiristiyanîyet û îslemiyet bi pêşketina wan ya bi dîrokê re derxist li holê, her wusa, wê weyna wê ya dîrokî wê hebe. Çawa ku piştî Mîtra re, di xate avestayî de ku Zerdeşt hat û piştî Zerdeşt re ku Manî hat û ev pêşketina mazin da çê kirin bi pêşketina gelên herêmê re, wê heman rol û weynê bileyîzê.

Li vir, Zihniyeta denezenê, divê ku were fahm kirin. Ev zihniyet, di serî de mirov bi nirx dike û derdikeve li pêş. Mirov, weke qatek ji civatê wê dibîne. Li ser kokên wî di nava civate wî de ku pêş bikeve, azadîya civatî derdixe li pêş. Li vir, berî hertiştî, pirsgirêka kurd jî, denezen di vê temenê de bi zihniyetê dihilde li dest. Denezen, nabêje ku divê ku tenê pirsgirêka kurd were çareserkirin û ti alakaya min ji pirsgirêkên tûna ya. Bi zihniyetî dibêje ku zihniyet were guharandin. Nêzîkatîya ku bi pirsgirêka kurd re, bi gelên din re jî pêş bikeve. Komên civatî ên kêmnetew, komên olî ên jevcuda, ku karibin pêşketina xwe bi civate xwe re bidina jîyan kirin û lê ku karibin bi awayekî ku rêz û hûrmetê ji cûdahiyên dervî xwe re jî bigrin, bahse wan dihê kirin. Bo bê yekê, di denezenê de, bi teybetî û xûsisî dihê gotin ku *""Bi sedhezaran, bi milyonan kesên ku dilê wan bi agirê Newrozê geş dibê û qadan têr û tijî dikin edî biratî dixwazin, çareserî dixwazin. Serhildana min, a ku di destpêkê de wekî take kesî li hember, bê çaretiyê , nezaniyê û xulamtiya ku di nav de ez jê dayik bûme dest pêkir, armanca vê serhildana min, afirandina hişmendiyeke berxwedêr, ya li hember her cureyên çewisandin û afirandina hişmendî û riheke nû bû.""* Bêgûman, zihniyet û nêzîkatîya ku şoreşa kurdistanê, li vir, di vê temenê de nêzîkatîya xwe ya li gelên herêmê û hemû gelên din di temenê bidestxistin û parastina azadîya wan de nêz dibêt. Li vir, dema ku em vê zihniyetê fahm nekin, emê wê denezenê û zihniyeta wê jî bi başî û rast fahm nekin. Di temenê vê zihniyetê de jî, ku em lê dinerin, divê ku em bibêjin, ku ew çapameniya ku î ro ev denezen tene di temenê "agirbest" û hwd ku hilda li dest, wê di demek piştre de pirr vekirî bibîne ku çendî tang nêzî wê denezenê bûya. Û ankû ev aliyê wê yê zihniyetî ne dîtîya.

Li vir, di serî de, nêzîkatîya netew dewlet ya ku sînoran di nava gelan de dixîzêne, hebûna netewên demokratîk ku di nava wan de ti sînor ne hatîya xizkirin û dikarin bi azad û bi serê xwe pêşketina xwe bijîn û bidina kirin, dihêne ser ziman. Bi wê re jî, bihare gelan ku were û bijî. Newroz, ji xwe bihare gelan a. Zihniyeta Newrozê,

zihniyeta bihare gelan a. Ev zihniyet, di temenê denezenê de bi rengê xwe bicih a.

Bi vê rengê, bi reng û zihniyeta xwe re, demeka nû bi şoreşa kurdistanê re dibê. Î ro, ya ku hatî denezendin, tenê û tenê dane nîşandin li berçav ew zihniyeta wê ya ku heya. Pêşî di denezenê de tê gotin ku "ev ne dawî ya, ev destpêka tekoşîna sîyeseta demokratik a". û piştre li xwerê ev rêz tên ser ziman, *"" Heqîqetên ku di çîrokên Hz. Musa, Hz. Îsa û Hz. Muhammed de cih digirtin, îro bi mizgîniyeke nû dikevin jiyanê. Mirovahî hewl dide ku hundahiyên xwe carek din bidest bixe.*"". Li vir, divê ku em gotina "tekoşînê" ji hevokê derxin û bi serê xwe hildina li dest di temenê vê gotina "haqîqat"ê ku bahse cewherê wê bi wê xate têgihiştinî û olî re ku dihê ser ziman, hilde li dest. Hinekî jî, rengê wê têgihiştinê, li vir, dihê dîtin. Ev gotina Haqîqat û ankû rasteqînî, rengê xwe bi zihniyeta newrozê re dide li der. Bi wê re jî, têgihiştina gel û azadîya gelan, denezena wê hatîya denezendin. Rengê newrozê û gotina ´bihare gelan´, bi wê têgihiştina wê rasteqînîyê re bi hevdû re tenê rastiyekê dihênin ser ziman. Ew rastî j, êdî biserxwebûn û azadîyan û xwestina wan ya derketina ser dika dîrokê. Êdî ti zihniyetên înkarker, wê nikaribin li pêşîya vê bisekin in.

Denezen, ku em ji kîjan aliyê lê biner in, wê bandûra wê li wê ´modernîsma´ rojava jî bibêt. Ew zihniyeta, ku di temenê bi şavtinê de ku dihê li berçav, êdî ew zihniyet û bi wê zihniyetê wê modernîsmek nejî. Di vê temenê de, bi hev re di temenê herêkirin û rêzdayîna heyîn hevdû, wê gotin gel û ya azadîyê wê bi hev re zawacaka wan bibe. Ev zawac, ne ew a ku yek ji maf û azadîya xwe bi şûn de gav biavêjê ya. Ev zawaca, pêşî zawaca, gel û azadîyê ya. Piştre ya di rex hevdû de birêzdarî jîyînê ya. Di serî de, denezen, zihniyet asîmlasyonê û ankû bişavtinê şermazar û red dike. Ya ku di serî de, were dîtin ev a.

Li vir, ku em di kîjan temenê de lê bihizir in, divê ku em bibêjin ku êdî dem weke ku bi gîyan û têgihiştina denezenê re jî dihê ser ziman, bûya dema bihara gelan. Di temen û zihniyeta ku ya ku ´ti, ji xwe re rast nebîne û nexwezê ku li te were kirin, divê ku tû jî li ti kesekî nekê´ de, rêzdayîna li azadîya hevdû, weke rêgez û destûreka bingihîn ya denezenê ya. Denezen, bi vê yekê û temenê aqil û têgihiştina serdemê yê giştî li berçav hatîya girtin û denezen bo wê hatîya weşandin. Bi vê yekê re, êdî em dikarin bibêjin ku denezen, têgihiştin û manifestoya sadsale pêşîya me ya. Ya pêşaroja bi serkevtina bi gelan û pêşketina re ya di zihniyet û têgihiştina xwe de. Weke ku di vê hevoka ku bi gotina "bangawaziyê" dest pê dike, ""ez bangewazî dikim ku, herî kêm bi qasî Kurdan Tirkmen, Ermen, Asûr, Ereb û civakên din jî, tîrêjên azadî û wekheviyê wekî azadî û wekhevî ya xwe ya cewherî bibînin."" Yanî, li azadîya xwedî derkevin. Hebûna pêş bixin. Civatîtî û şarîştanîya xwe pêş bixin. Gotina "..azadî û wekheviyê ..", bi rastîya ku her gel, bi nirx, çand, dîrok, ziman û hwd, hemû nirxên xwe ku dikarê pêş bikeve û xwe bi rê ve bibe û ku li ser vîna xwe xwedî bîyar a, wê dihêne ser ziman.

Denezen, weke ku serbixwebûna ti gelên din înkar nakê, ya kurdan jî înkar nakê. Armanca, wê ew a ku bi ne bi rêyên şer bi rêyên aşîtîyane bigihijê armanca xwe ya. Denezen, nabêje ku bila gelek û ankû civatek, her heyîn û hebûna xwe ´tabîî civate din bike û xwe ji dîrokê bibe.´ Denezen, bi teybetî li dijî vê zihniyetê ya. Li gorî Mantiqê denezêne, wê gelê kurd, li kurdistanê xwediyê pergale xwe ya civatî, perwerdehî, û rêvebirinê ya xwe bê. Her wusa, li ser vê civatîtîya xwe re wê wekheviya wan hebe. Di vê temenê de jî, bi vê zihniyetê û mantiqê, ya ku piştî denezêne re, ew a ku dewlet êdî pirsgirêka kurd çareser bike û hemû mafê gelê kurd ê xwe bi rêvebirinê, qadaxaya li ser

zimanê wan were rakirin û ku karibin xwe bi çand û zimanê xwe êdî xwe perwerde bikin û pêş ve bibin, û di wê temenê xwe ku karibin sîyeseta xwe bikin. Dema ku di denezêne de dihê gotin ku " ..bo ewropa komur û madên tê çi wate, bo rojhilat jî dicle û firat dihê heman wateyê." Li ewropa, bi dehan netew bi hev re di çerçova ewropatitiyê de bi hev re dijîn. Ew bi hev rebûna ku bahse wê dihê kirin, di vê temenê de ya. Yanî di vê temenê de, pergela giştî li rojhilat were ava kirin û têde kurd jî, û ereb jî, û faris jî û tirk jî, xwediyê heman azadîyê û wekheviyê bin..

Di vê temenê de, ku mirov nêzî rewşa kurd û tirkan bibe, divê ku mirov bibêje ku çi mafê û azadîya tirkan heya, divê ku ya kurdan jî bi heman rengî di temenê azadî û wekheviyê de hebe. Li vir, divê ku ev gotin jî pirr baş di serî de ji aliyê nivîskarên tirk ve were fahm kirin. Li gorî vê, bo ku kurd, weke tirk, ereb û farisan li hevdû bi hevdû re û azad bijîn, çawa ku nûha wan pergale xwe ya perwerdehîyê, rêvebirinê û civatî ava kirina, bo ku wekhevî di naqabîna wan û kurdan de bibe, divê ku kurd jî bi heman rengî pergale xwe ya civatî, perwerde û rêvebirinê ava bikin. Her gel, bi nav, nirx û zimanê xwe, divê ku bijî. Di vê temenê de ti kesek û kom, nikarê ji kes û koma duyemin re bibêje ku tê weke min bijî. Nikarê, bêje ku tê ji ziman, çand û dîroka xwe ji bîr bike û weke min bijî. Ya ku di serî de were fahm kirin û dîtin ev a.

Weke ku çawa ku di nava pergale ewropa de, Firansizî, Almanî, Ingilîzî, îspanyolî, Îtalyanî û hwd dijîn di nava pergale ewropa de, di pergale rojhilat de jî, bi heman rengî, kurd, tirk, ereb, faris û hwd, wê bi wî rengî bi hev re bijîn. Weke ku çawa ku pergale ewropa, serbixwebûna ingilistan, almanya, firansa, Îtalya, ispanya û hwd, inkar nakê, wê ev pergale ku birêz Ocalan jî ku dihêne ser ziman. Serbixwebûna kurdistanê, tirkiya, Îran, û hwd înkar nakê. Weke ku çawa ku di denezenê de dibêje ku "înkarkirina aslê me dijî mirovatiyê ya", wê yek nikaribê aslê yê din înkar bike. Asîmlasyon, înkar û hwd, şucên mirovatiyê na. Di denezenê de ev dihê ser ziman. Di pergale ewropa de, çend ku kêmesîyên wê jî hebin, netewek hebûna xwe li ya din nakê kurban. Hemû, wekhevdû bi azadî bi hev re dijîn. Ya ku li vir, were dîtin ev a. Di nava sîyesetê û demokrasiyê de, bidestxistina maf û pêşxistina wan, li ewropa di nava pergale wê de heya. Di vê temenê de, ya ku tirkiya ji vê denezenê derxê jî ev a. Di vê temenê de weke ku di denezêne de dihê ser ziman Gelên asya û rojhilat navîn şîyar dibin û li aslê xwe xwedî derdikevin û dixwezin ku derkevina dika dîrokê. Denezen, ya vê ya. Denezen, di serî de li dijî zihniyete Lozanê û zihniyetên Lozanan weke artartnatifekê bi hebûn û navê gelên ku hatina înkarkirin re deketîya li holê. Gotina "demokrasiyê" jî di temenê herêkirin û rêzdayîna heyîna hevdû de ya. Em, weke gotina xwe ya dawî bi gotina birêz ocalan re bênina ser ziman. ""Me ji bo vê gelî, bi dehan salên xwe feda kirin. Me berdêlên gelek giranbûha dan. Ev fedekarî û ev tekoşîn tu yek jî ne belesebep bûn. Kurdan kesayetiya xwe ya cewherî û nasnameya xwe ji nûve bidestxistin."". Ya ku herî zêde rastiyê bi başî dihêne ser ziman ev a, ku bi teybetî bahse dike ku "kurdan keseyetîya xwe cewherî û nasnemaya xwe ji nûve bidestxistin". Li vir, ya ku divê ku di serî de were herêkirin ew nasnema û keseyet a. Denezen, di vê temenê de denezena herêkirin û pejirendinê hebûn, keseyet û nasnema hevdû ya. Ev keseyetîya ku afirî û nasnema wê ji nû ve derketîya li holê, êdî mafê xwe yên nasnemê û civatî bi wê nasnema xwe dixwezê. ..

..

**Piştî denezene pêvajoyê re weke pêvajoya duyem pêvajoya vekişîn bo Çareserîya pirsgirêka kurd pêş dikeve. ..**

Piştî di 25´ê avrêla 2013´an de ku KCK`ê ragihandina ku wê hêzên xwe vekişênina dervî sînor ku bo çareserîya demokratik bo pirsgirêka kurd û demokratîzakirina tirkiyê ku di roja 8´ê gûlanê de. Î ro, weke roja 8´ê gûlanê hêzên gerîlla bidest vekişînê kirin. Lê bi wê re jî, dilê kurdan ne rehet a. Kurd, gelek fêr û cerba wan bi dewletê re hay. Heta roja me, gelek caran dewletê sozdaye kurdan û soza xwe ne hanîya li cih û piştre jî, komkujiyên mazin ên weke komkujiya Dersimê bikurdan dane jîn kirin.

Di wê demê de jî, dewlet heyetekê dişêne û bi Sêd Riza re levdirûnihê û dibêje ku "emê dicih de gavan biavêjin û çareserîya pirsgirêkê bidina dest pê kirin." Lê piştre, ne bi demeka zêde dirêj biryare 4´ê gûlanê ya ku di civîna hikimeta wê de ku di bin serokatîya M. kemal de levcivîya, biryare sefera li dersimê da û komkujiya mazin li dersimê da kirin. Di wê demê de jî, kurdan bi gotina rayadarên dewletê ên ku li ser navê dewletê ji wan re hatina gotin bawer kirin. Dersimê, hingî piştî ku biryara civîna hikimeta demê de hat girtin û piştre bi deh hezaran kurd hatina qatil kirin.

Î ro jî, ya ku dilê kurd ji dêla carekê dûcaran li ser hevdû de lêxistin ev a. Dewletê, hertimî gotin ji wan re gotiya û li gotina xwe jî û li wan xîyanet kiriya. Î ro jî, di tirsihin ku ka wê xîyaneteka bi vî rengî were kirin. Tirsa, ji vê demê heya ku dewlet, ji dêla ku vê pêvajoyê bo çareserkirina pirsgirêka kurd, weke firsandekê bibîne û di vê demê çareserîyê ji pirsgirêka kurd re bibîne, kurd ditirsihinku vê pêvajoyê ji xwe re weke firsandekê bibîne û hewl bide ku vê pêvajoyê di temenê ku derbeyekê li kurdan bixe de bikarbêne. Ev tirsa kurd, ne vala jî ya. Dewletê, piştî ku KCK`ê, ragihand ku wê hêzên xwe bikişênina dervî sînor li başûrê kurdistanê, dewletê jî, lez da çê kirina qarakolan û veguhaztina hêzeka mazin li herêmên kurdan kir. Li her herêmên kurdan, di vê dema ku ez vê nivîsê dinivîsênim de jî, nûçeyên ku di ajansan de tên xwandin ew in ku dewletê hêzekê diveguhazê li herêmên kurdan. Dewletê, hertimî, her firsande ku ketîya destê wê de û ankû kurdan ji wê re daye nîşandin, bi wê firsande xwestîya ku derbeyekê li kurdan bixe.

Bi vê yekê, dema ku mirov li pêvajoyê dinerê, mirov bi rastî, dikeve tirsekê de. Her kurd, di dilê wî de, ev tirs heya. Heta nûha jî, ku em li zimanê rayadarên dewletê, kirin û kiryarên wan dinerin, ya ku em dibînin ew a ku weke ku dewlet dixwezê ku bi vî rengî bikarbêne. Ji ber vê yekê, herkesek, li bendê ya ku wê ka çi bibe.

Divê ku mirov bibêje ku ev pêvajo pirr giring a. Divê pêvajoyê de, herkesek, divê ku bibe yek deng. Herkesek, divê ku dest bide evdû bi hevdû re, di temenê yekbûneka civatî de, pirsgirêkê hildina rojava xwe û hewl bidin ku bi dewletê bidina çareser kirin. Ev, ne dema hevdû rexnekirin û li dijî hevdû sekinînê ya. Her mirovê ku piçekî jî wijdan û ahlaq pêre hebê, divê ku divê pêvajoyê de, li rex gelê kurd bisekinê bo ku dewlet, ti komkujiyên din ên weke komkujiya dersimê neyêne serê kurdan û hewl bê dayîn bo ku pirsgirêka kurd were çareser kirin. Pêvajo, têkherê û bi sernekeve, wê herkesek dibin de bimêne. Bi teybetî jî, wê zirer li gelê kurd bibê.

Em di demeka wusa de dijîn ku her kirin û gavavêtinên wê ên ku têde werina avêtin giring a. Ji her aliyê ve divê ku hewl bê dayin ku pêşketina civate kurd were pêşxistin. Temenê perwerdehîya bi zimanê kurdî divê ku were pêşxistin. Tenê bi gotina "zimanê kurdî qadaxaya" û xwestina wê ji dewletê û ji dewletê xwestina rakirina qadaxayê ji ser zimanê kurdî jî, wê tenê gotinaka bêwate bê. Ku ti kirin bo wê gotinê û xwestinê ne

hatibê kirin, hingî, wê temenê vala bê û bêwate bê. Bo vê yekê, di vê temenê de, bi çerçoveyeka civatî û bi pergalîtîya civatî divê ku rêxistinî pêş bikeve û herkesek têde cih bigrê.

Gelê kurd, di van salên ku buhurîna de, şerê ku dewletê li kurdistanê daye, herî zêde bandûra wê li civate kurd bûya. Dewletê, hertimî, hewl daye ku bandûra şer negihê rojavayê tirkiya. Hertimî hewl daye ku bandûr şer mazin bibe û tenê li herêmên kurdan bimêne. Bi vê jî, heta astakê bi ser jî ketîya. Î ro, ku em li rewşa civatî û hwd ku em dinerîn, em dibînin ku di her deverê de ew bandûr xwe dide nîşandin. Bi wê re jî, civate kurd, ji gelek nirxên xwe dîrokî jî dûrketîya. Lê bi tekoşîna azadîyê re jî, weke ku xwe ji nû ve bide afirandin pêvejoyek jî jîya. Bi wê pêvajoyê, î ro ji nû ve pêşketina xwe dijî.

LI herêmê, pirsgirêka kurd, êdî hatîya wê astê, ku newê çareser kirin, wê li rojhilat jî ti pêşketinên demokratikî wê nebin. Çareserkirina pirsgirêka kurd, bandûra wê wê li rojhilat û pêşketina wê û pêşarojê jî wê bibe. Bi vê yekê, ne tenê bi hêza xwe ya şer, her wusa, êdî bi hêza xwe ya civatî jî ku bi rêxistin kiriya û pêşxistîya, sazîyên wê xwe hanîna ser ziman û rêvebirin û perwerdekirinê biafirnê û demezrêne û bi wan li rojhilat jî ku karinê bi rol û weyna xwe re rabê.

... **Piştî** newroza 21´ê adarê a 2013´an, di demeka pirr kort de çend pêşveçûn çêbûn. Yek ji wan pêşveçûnan, ew bû ku li Meclîsî tirk di bin kontrola serokweizrê tirk de, komek ku ji wan re tê gotin ku "mirovên aqil" hat ava kirin û li heft herêman hatina belav kirin ku wê herin û hizir û bendewerîyên li nave xalkê wê kifş bike û wê bi raporê radestî hikimetê bike. Li vir, heta vir, hertişt di gotinê de asayî tê xûyakirin û dîtin. ..

Berî hertiştî, divê ku mirov bibêje ku piştî tekoşîan gelê kurd ya 30 salî, ev pêşketin û hatina dewletê ya vê astê ku êdî bahse "aşîtîyê" bike, giring a. Lê dewleteka ku ev 30 sal in ku bi kurdan re şer dike û hemû pergale xwe li gorî wî şerî dîzayn kiriya, wê çiqasî rast û di temenekê rast de ji dil tevbigerihê û wê gavan biavêje jî, ev jî weke pirsekê ya. Herkesek jî, di wê bawerîyê de ya ku "bi zihniyeta mirovên ku hertimî li gorî şer û şerkiirnê hizirî na, wê li gorî aşîtîyê rast tevnegerihê." Ev gotin, çendî ku ne xelat a. Lê li vir, divê ku mirov vê jî bibêje ku ev pêvajo, ji aliyê kurdan û serokatîya wan ve hatîya pêşxistin.

Li vir, berî hertiştî, divê ku kurd, bidina xwe û pêngavaka dîrokî ku ji hemû aliyan ve kurdan dike nava tevgerê de divê ku bidina dest pê kirin. Heta roja me, hertimî, dewletê, çi gav avêtiya, bi armanca xapandinê avêtiya. Î ro jî, di dema ku bahse "aşîtîyê" û "pêvajoya aşîtîyê" tê kirin de jî, dewleta tirk hêzeka mazin sevkî kurdistanê dike. Li gelek herêman qarakolan ji nû ve dike ku ava bike. Bi hezaran qadroyên çerdewanîya hatina derxistin û belavkirina. Bi kirina cerdewanîyê, bi hezaran mirov bi çêk hatina kirin. Dewleta ku jidil bê, ji ber çi wê bi hezaran qadroyan cerdewan ji nû ve çê bike?

Di serî de, li vir, wusa xuya dike ku tişta ku Hikimeta AKP´ê ji pêvajoyê fahm kirina ew a ku wusa zêde tiştek fahm nekiriya. Bi vê mantiqê, wê zêde pêşketin jî, bi pêşde neçê.

Hemû tiştî di bin kontrolekê dibin. Her wusa, zimanê ku Sîyesetmederên tirk, ku AKP´lî bin, CHP´lî bin û MHP´lî bin, di ancama wî zimanî de, kurd weke ku li amedê ev sê roj in ku li Zaningaha Dicleyê ku xwandavanên kurd di bin hêrîşên polis û komên ku bi polîsan re tevdigerihin de na. Ev rewş, hemû di ancama zimanê wan de ya.

Di pêvajoya ku tê gotin ku pêvajoya aşîtîiyê de, zimanê şer bikardihênin. Ji vê jî, weke ku kurd dihênin ser ziman, çendî ji dil in, ew jî, weke pirsekê ya di serê mirov de.

Yê min, dema ku ez li vê pêvajoyê dihizir im, ez xwe nagrim û pêvajoya hevdîtinan ya bi Sêd Riza re tê berbîra min. Di wê pêvajoyê de jî, heyete dewletê diçê û bi Sêd Riza re dirûnihê û dibêje ku "emê, pirsgirêkê çareser bikin û di cih de gavan jî biavêjin." Lê piştre çi dibê? Piştre, ya ku divê ew a ku sefera li dersimê dide ku di wê de ser sad hezarî re kurd hatina qatil kirin. Her wusa piştre di dawîyê de Sêd Riza jî biderve kirin.

Di vê temenê de, çend kurdên ku ez bi wan diaxivim, vê dihênin ser ziman. Di dema ku dibê bahse jidilbûnê jî, herkesek dibêje ku "bawerîye me, li dewletê tûna ya". Lê herkesek jî, bawerîya wê li tevgera kurd û birêz ocalan jî pirr a. JI ber vê yekê, ku mijar tê ser birêz ocalan û tevgera kurd, gotin jî nayê gotin ji ber bawerkirina li wan.

Lê dîsa, di serê herkesekî de gûman û tirs heya ku wê dewlet nemerdîyna din bike. Dema ku bahse ji nû ve derxistina qadroyên cerdewanan û avakirina dihê kirin û dihê gûhê mirovan, ew gûman zêdetir dibê. Her wusa, êdî herkesek gûmana xwe pirr mazin dihêne ser ziman.

Herkesek, qarakterê dewletê heya. Dema ku bahse vekişîna hêzên tevgera kurd dihê kirin, herkesek xwe rût hîs dike. Ev hêsta ku xwe rût hîs dikin jî, ji ber ku ji wê hêza tevgerîya kurd û pêve, ti hêzên din tûna na ku karibin wan biparêzên. Ji ber vê yekê, tirs ew a ku komkujiyên din weke ku di dema komkujiya dersimê bû û ankû komkujiyên din weke komkujiya roboskî werina serê kurdan.

Ji xwe heta nûha jî, oparasyon û bomba barandina dewletê û ya artişa tirk didomê. Ji xwe ti kesek nikarê bêje ku ji ber çi bombabaran jê dike. Ji ber ku ew hêza xwe ji destûra bingihîn û destûrên ku ji bo w hatina derxistin digirê. Yanî, ew tevgeriyên wê tenê xwe nasipêrina tedbîrên rêveberîyê. Ji ber vê yekê jî, di dema ku li ser vê hizir in dibê, êdî tirs zêdetir dibêe. Weke ku Birêz Cemil Bayik gotibû di axiftina wî ya ku ketibû çapameniyê de ku "hêzên me li hundurê rastî hêrîşê ne hatin, heya ku dervî sînor rastî wê hêrîş werin û wê ti kesek jî nikaribê bêje ku ji ber çi rastî wê hêrîşê hatina, ji ber ku destûra bingihîn a tirkîya wê mafê didiyê de." Her wusa, di dema ku li ser pêvajoyê hizirîn dibê, pirr aliyên ku gûmanan bi nêzîkatîya dewletê re di serê mirov de dide çê kirin hena û diafir in.

Dewlet, wusa xuya dike ku di xwezê ku li ser pêvajoyê re ku karibê kurdan di bike bin kontrolê de.Di vê temenê de dixwezê ku pêvajoyê bi rê ve bibe. Li bakûr ku tekoşîna kurdan bike bin kontrolê û li rojavayê kurdistanê jî bo ku pêşî li denezendina xweserîrîtiya herêmên kurdan bide girtin. Piştre jî, ku rejima sûrî hat xistin û parlamane nû afirî, di wê de êdî ku karibê bi destûra nû ya sûrî û hwd bê, kurdan dervî rewşa statûyî bidina hiştin. Yanî, hê jî dewlet tevî ku di vê pêvajoyê de bahse çarserkirinê û pêvajoya çareserkirinê dihê kirin jî, di temenê bêstatû hiştina kurdan de dixwezê pêvajoyê bi rê ve bibe. Ji ber vê yekê, ji herdemê zêdetir, divê kurd yek bin û dengê wan yek bê û pêvajoyê baş bixwênin û gavên xwe rast biavêjin.

Di vê pêvajoyê de, komêsyona ku ji wan re tê gotin "komîsyona mirovên aqil" jî, zêde baweriyê nadina mirov, Birêz Ocalan, di serî de, gotibû ku divê ku mirovên ku di nava civatê de ku werina herê kirin û gotina wan rêz û hûrmet jêre hebê. Lê dewletê, li gorî xwe komîsyonek ava kir. Çend mirovên ku nêzî xwe û nêzî hizrên xwe di wê de bicih kirina. Ev komîsyona ku em bahse wê dikin, çendî ku em giring dibînin ku hatîya avakirin jî, dîsa navaroka wê vala hatîya hiştin. Mirovên ku hatina naqadin li wê, ne di wê astê de na, ku karibin gotina xwe ji hemû beşên civatê de bibêjin û bidina herê kirin.

Ji wê jî zêdetir, mirovên ku gotinê karibin li ser navê civatê bibêjin, weke ku yek ji ji

wan ne hatiya hil bijartin. Bi teybetî, komên civate kurd û komên civate tirk, cuda û cuda ku karibin, xwe tê de bibînin û bibêjin ku "em di komisyonê de xwediyê temsiliyetê na", komisyon ne di wê astê û rengê de ya. Bi teybetî, ji elewî, êzîdî, sûryanî û hwd ku em dikarin pirr komên din ên navê wan ji bi bahs navê wan bibêjin, yek ji ji wan têde temsîlîyeta wan nayê kirin. Bi teybetî, civate kurd ya êzîdî û ya elewî, weke komên civatê ên ku herî zêde rastî komkuji û nehaqîyan hatina na. Li ser navê wan ku oldarê ji wan bin û ankû çend mirovên ku ji aliyê wan ve werina herê kirin di wê komîsyonê de tûna na.

Bi wê re, divê ku mirov bibêje ku ev pêvajo, bi vî rengî, di serî de, bi awayekî, pirr ji rêzê dihê bi rê ve birin. Bi wê re jî, wusa xuya dike ku mirovên dewletê ên ku aqil didin, pirr mazin nikarin bihizir in. Yanî jî, ne jidil in û rojevên wan vêşarî hena di vê pvêajoyê de.

**LI ser komîsyona ku "mirovên aqil" re, di nava kurdan de û di çapameniya wan de jî nîqaş hena û di wan de tê gotin ku "kurd, ji xwe pêdîvîya wan bi komîsyonê jî tûna ya, ji xwe ew zelal in, pirsgirêk li rojavayê tirkiye ya."** Di zane min de, bi vî rengî şîrove kirin, pirr tang û bi nezanî ya. Divê ku mirov di wê çerçovê de lê ne hizirê. Bi teybetî, rengê komsyona ku birêz Ocalan ku hanîbû ser ziman, di temenê wê rengê de bû ku dikarî pêvajoyê bi vê re bibe. Ji ber vê yekê, wê ne tenê aliyan hizrên wan hildê û pêvajoyê bi wan bide fahm kirin. Her wusa, wê weke astangiyekê jî li pêşîya xelatîyên ku dewlet dixwezê ku bi zanebûn di vê pêvajoyê de bike û li ser wan re pêvajoyê li gorî xwe bi rê ve bibe jî, wê di pêvajoyê de wê pêşîya wan bigrê.

Hemû xelatîyên ku di roja me de bi destê rêveberîyan tên kirin, mirov nikarê wan hemûyan wusa şîrove bike ku bi nezanî tên kirin. Gelek xelatîyên ku bi hasab û kîtap têk kirin û piştre ku tê gotin "binezanî bûya", ew gotin tenê weke gotinaka sergirtinê û masûm nîşandinê ya.

Ji ber vê yekê jî, divê ku kurd, ku karibê di vê pêvajoyê de di nava kurd de ku rol û weyn bileyizê, divê ku komîsyona xwe ya civatî ji nava xwe bide ava kirin. Her wusa, divêt ku fermîyeta wê ji aliyê meclîsê ve ne hatibê nasîn, lê divê ku were ava kirin û her wusa, ji her aliyê ve ku karibê pêvajoyê bi rê ve bibe. Ev yek, giring a bo kurdan di vê pêvajoyê de. Her wusa, ev komîsyon, wê ne tenê rêxistiniya kurdan pêşbixe di pêvajoyê de, wê karibê ku aliyên pêvajoyê ên ku newina fahm kirina bide fahm kirin û di wê temenê de beşên civate kurd bi hevdû re bike tevgerîyê de. Lê divê ku ji hemû beşêm civate kurd bê. Bi teybetî, li ser komîsyona meclîsê re hat gotin ku "têde, temsîlîyeta jinê tûna ya." Ev rast a. Û divê ku em bi serve bikin û bipirsin ku ka temsîlîyeta kîjan beşa civatê birastî têde heya.?

Heta roja me, di nava kurdan de,hertimî li ser olê re hatîya leyistin ji aliyê dewletê ve.Di vê hêrîşa ku weke "provakosyon" tê binavkirin a li zanîngaha li Diclê bixwe jî, şîrove û nîqaşên li ser wê re tên kirin, dîsa li ser gotina "Şerê huzbullah û PKK" na. Dewletê, di bin navê Huzbullah de, heta nûha, gelek rêxistinên xwe yên ne fermî bi rêxistin kirin û bi destê wan bi hezaran kurd hatina qatil kirin. Lê divê ku mirov van gotinên bi rengê "şerê hizbullah û PKK", bi oparasyonên dewletê ên ku hê didom in ên leşkerî û sîyasî re bi hev re şîrove bike. Her wusa bi van gotin û oparasyonên leşkerî re jî divê ku mirov zimanê rayadarên dewletê jî bi wan re şîrove bike. Lîstika dewletê ya li ser hizbullah re, tenê di nava kurdên sûnnî de bûya. Lê li ser CHP´ê re jî, biqasî, li ser elewîyên kurd re leyistîya. Di serî de, bi rêxistiniyên bi vî rengî ên di nava kurdan de, bi

reng û navê komîsyona civate kurd´, wê di serî de, karibê pêşî li lîstikên dewletê ên bi vî rengî bigirê. Di demên pêş de, heya ku lîstikên bi vî rengî ên pirr bi xatera bidina kirin. Ji bo wan jî, divê ku mirov agahdar bê. Zaneyên olî û ên civatî ên civate kurd, ku ji elewîyên kurd bin, ji êzîdîyan bin û ji sûryanîyan û hwd bin jî, divê ku di nava wê de cih bigrin.

**Di pêvajoya** afrîkaya başûr ya pêşketina aşîtîyê de jî, di dema hevdîtinan de, pêşî komîsyonaka ku ji 60 kesî tê ava kirin ku ev komîsyon heft û heft li welêt belav dibê û kar dike. Lê di wê dema ku hevdîtin dibûn de jî, bo ku pêvajoya aşîtîyê hildina ewlakarîyê û çavderîyê bikin, ser panzdeh(15) hezar mirovên çavdêrî re ku mirovên ku li gotina wan dihat hisandin ku ji nava civatê hatibûbûna hilbijartin û ku giranîya gotina wan hebû, pêvajo dişopandin. Aliyê kurd, di nava xwe de, bêşart û merc divê ku bi vî rengî komên çavdêrîyê herêm bi herêm li kurdistanê divê ku werina derxistin li holê. Ji ber ku şerê dewletê li kurdistanê didomê û pergal(sistem)a şer li kurdistanê ji aliyê dewletê ve hatîya ava kirin, giringiya wê ji nava kurdan ku li kurdistanê û komên çavdêrîyan li kurdistanê li herêm, wê aliyekî ewlakarîya pêvajoyê biafirênin. Herî dawî, bûyarên ku weke provakasyonekê jî hatin şîrove kirin ku li zanîngaha Dicle berî î ro bi dû û ankû sê rojan bûn jî, vê avakirina komên çavdêr û komîsyona şopandin û rastteqîniyê weke pêdîvî û pêwîstînîyeka zarorî dide nîşandin ku divê ku were û ava bibe**.**

Hemû beşên civate kurd, divê ku di nava pêvajoyê de, karibin xwe bi temsîlîyetê bibînin. Her wusa, ev nêzîkatîyên ji dewletê ku bi gotina "xelat" tên şîrovekirin, hemû jî xelatîyên bizanebûn ên ku tên kirin in. Ji ber vê yekê, di vê temenê de, civate kurd, divê ku xwe bi rêxistin bike û rengê xwe di pêvajoyê de, bi wê rengê derxe li pêş. Hikimeta AKP`ê, wusa xuya dike ku dixwezê ku vê pêvajoyê bi vê rengê heta dema hilbijartinên ku wê di dema pêş de bikin, dirêj bike û di wan hilbiartinan de ku karibê derbeyekê li kurdan bike û piştre bibêje ku "meyzênin, şer sekinî, êdî hemû ji holê ra bûn." Bi vî rengî di temenê li dijî maf û azadîya kurdan de wê bê xwediyê helwestna. Divê ku pêşîya van jî were girtin. Ya ku wê karibê bi rêxistinî bi navê kurdan li pêşîya wê bisekinê, wê komîsyonaka ku bigîştî ku karibê li ser navê hemû beşên kurdan gotinê bibêje ya. Ji ber ku ew valahî î ro heya, minaq, hikimeta AKP´ê dirabê qadroyên cerdewanan derdixe û biryara avakirina qarakolên nû dide.

An jî, DTK dikarê xwe bi wê rengê di temenê parlamane herêmî ya kurdistanê de di vê temenê de xwe bi xort bi rêxistin bike û li hemû herêmên kurdistanê karibê xwe bi rêxistin bike û wê karî bike. Ku kurd, komîsyonaka ku ser hezar û ankû hezar ûî pênsad kesî re bi rêxistin bike û wan li herêmên kurdan beş bike ku dayimî heta ku pêvajo bidomê ku hertimî heyîdarîya wan li ser pêvajoyê bê, wê aliyekî pêvajoyê û ewlakarîya wê biafirêne. ..

Di vê pêvajoyê de, sê tişt pirr giring in ku divê ku kurd bikin. Divê ku kurd bi vê komîsyona meclîsê re bi sînor nemênin û li kurdistanê komîsyonaka bi bandûr ku hemû bêşên civate kurdan ku elewî bin, êzîdî bin, jin bin, koma ku mafê zarokan biparêzê bê, û hwd, hemû beşên civatê divê ku ji wan temsîlîyet têde hebe. Mirovên oldar jî û ên aqilmendên civatê jî rewşenbîrên civatê û hwd jî, divê ku di nav de hebin. Her wusa, weke ku çawa ku di pêvajoya afrîkaya başûr de ku di dema pêvajoya demezrandina aşîtîyê de, ku ser panzdeh(15) hezaran mirovên çavdêr hatin kifşkirin û wan di pêvajoya aşîtîya afrîkaya başûr de çavdêrî kir. Kurd jî, li kurdistanê, ji ber kurdistan weke herême

şer a ku dewletê hertimî şerê xwe li wir bi kurdan re daye û pergal(sîstem)e şer li wir ava kiriya, divê ku ev kom li wir werina avakirin û bicih kirin. ... .. **Di destpêka** pêvajoya ´çareserîyê´ de, kurdan hêvî dikir ku gav werina avêtin. Berî Newroza 2013´an, rewşeka cuda hebû. Piştre ku nameya serokê gelê kurd birêz Ocalan hat xwandin û pê de, pêşî ´agirbes´ bû. Piştre jî, li ser banga serokê gelê kurd vekişîna hêzên kurd bû. Vekişîn, bi wê armancê bû ku wê rewşeka asayî were afirandin bo ku gav werina avêtin bo çareserkirina pirsgirêka kurd.

Vekişîn bû. Lê bi demê re, çend ku kurdan hêvî dikir ku zimanê rayadarên dewletê ê şer ku biguharê û hin bi hin gav werina avêtin û aşîtîyaka mayîînda ku werê pêşxistin jî, nebû. Ev hêvîyên kurdan nebûn. Dewletê, ji destpêka pêvajoyê, giranî da ser amedakarîya leşkerî. Li herêmên bakûrê kurdistanê, bi sadan qarakolên nû çêkirin û bi dehan bendavên bi armanca leşkerî çêkirina hat dayîn destpêkirin û çêkirin. Yanî, ji destpêka pêvajoyê ve, amedekarîya şer bû. Dewletê, ti gav neavêt. Pirsgirêka kurdan ya herî giring ew bû ku qadaxaya li ser zimanê kurdî were rakirin û kurd ku êdî bi zimanê xwe yê dayîkê êdî perwerdeya xwe bibînin.

Zimanê kurdan qadaxaya. Di vê demê de, dewlet, li rêyan digerihê ku wê çawa karibê ku wê qadaxaya li ser zimanê kurdî bide domandin. Di van rojên ku buhurî de, hat gotin ku "hikimet, pakêtê amede dike." Lê di aslê wê de, dewletê dixwezê ku bertekên gelê kurd ku karibê bi wê "pakêtê" bişikêne û piştre weke ku het roja me hatîya, vê qadaxaya li ser zimanê kurdî bide domandin. Yanî, pakêt, hem weke pakêta xapandinê ya û hem jî weke pakêta şikandina bertekên gelê kurd ên bo maf û azadîya wan a. Di vê temenê de dihizir in.

Dewlet, dixwezê ku weke ku heta roja me bûya, ´pakêtekê´ amede bike û bibêje "pakêta demokratikbûnê" û ankû "pakêta çareserîyê", piştre jî, li ser wê bibêje ku "heta vê demê, me ev kir, emê piştre gavên din jî biavêjin" Lê ev gotin jî, wê weke pakêtê, gotinên xapandinê bin. Wê armanca wan, ew bê ku pirsgirêkê bi rengê ku dixwezin bidina domandin û bi wê re jî giraniyê bidina pergale perwerde bo ku asîmlekirinê zûtir bikin. Bi sayaserê hin mirovên ku ji xwe re dibêjin "em dinivîskarên kurd" in û bi tirki nivîsênin, ji xwe re zû asîmlekirin dibe li ser serê kurdan. Lê dixwezin ku hê zûtir biikin. Yanî, "çareserîya" di serê hikimeta AKP`ê û dewletê de ev **a.**

Lê dewletê, amedekarîya şer dike. Bi sadan qarakol û bendavên bi armanca leşkerî hatina çêkirin. Bi wê re jî, li ser wan amedekarîyên xwe yên leşkerî re dihizirê ku şerekî bi kurdan re êdî bide destpêkirin, wê derbeyê li kurdan bixe. Hinekî jî, di vê temenê de, ji bo di serê dewletê de bi vî rengî hin plan û hizirkirin hena, li başûrê kurdistanê dîplomasîya pêşîlêgirtina li darxistina kongira netewî jî kir.

Kirinên dewleta tirk ên ku divê pêvajoyê de kirina, ku em werênina ber hevdû, bi avakirina çeteyan û bi çekkirina wan û şandina wan bi ser kurdên rojavayê kurdistanê de, di temenê ku dijberîya xwe ya ku li dijî li darxistina kongira netewî a kurd ku hanî ser ziman de hewldanên tirkiya ên bi armanca pêşîlêgirtina li darxitina kongirê, li bakûrê kurdistanê bi amedekarîyên leşkerî re çêkiirina qarakol û bi armanca leşkerî çêkiirina bendavan û hwd, çend ji wan hewldanên tirkiya ên di vê pêvajoyê de na. Her wusa, divê ku mirov bibêje ku di pişt hewldanên astengkirina avakiirina rêveberîya kurd ya li rojavayê kurdistanê de jî tirkiya heya. ..

Di vê pêvajoya ku kurdên bakûrê kurdistanê dabû bû destpêkirin de, kurdan hêvî dikir ku di temenê çareserkirina pirgirêka kurd bi rêyên danûstandinê ku gav werina

avêtin. Qadaxaya li ser zimanê kurdî were rakirin û kurd bi zimanê xwe êdî perwerdeya bibînin. Lê mixabin, di vê demê de jî, ew gav ne hatina avêtin.

Heta roja me, er 9 agirbestan re bûya. Tevgera zadîya kurd, bo ku pirsgirêk bi rêyên danûstandinê were çareserkirin, gelek caran gav avêtina. Lê, hemû gavavêtinên wê bêbersiv mana. Di vê pêvajoyê de, di destpêka pêvajoyê de, dewleta tirk, dizanî ku wê mudahele bi destê çeteyan bê û ankû bi destê Emerika û rojava û hwd bê, wê li Sûrî bibe. Wan jî, hizir dikir ku wê bi wê pêvajoya mudahaleyê re wê kurdan di bin pêvajoyê de bidina hiştin. Ev hizirkirin bûna.

Li vir, em dibînin ku dema ku dewletê, di destpêka pêvajoyê de, hemû hasabên xwe li ser mudahaleya li Sûrî re kirina. Her wusa, wusa hizir kirina ku wê li Sûrî bi serkevin. Wê, derbeyê li kurdan bixin.

Piştî ku kurdan, li rojavayê kurdistanê serkevtinek bidest xistin, êdî nûha dijberîya xwe li wê hanîn ser ziman. Bi teybetî, bo ku li rojavayê kurdistanê, kurd nebina xwedîyê ti statûyê, dewletê heta roja me piştgirî daye komên çekdar ku herina bi ser kurdan de. Nûha jî, dihizir in ku dema ku mudahaleyek li Sûrî bibe û Tirkiya jî di nava wê mudahaleyê de cih bigrê û ew yekser di nava wê mudahaleyê de bi hêrîşa hewayî bê û ankû bi hêrîşên artişî bê ku hêrîşî rojavayê kurdistanê bike. Hasabê xwe, li ser vê yekê çêkirina. Ji ber vê yekê, heta roja me, gav ne avêtina.

Her wusa, di vê demê de, tirkiya li başûrê kurdistanê û di vê demê de li dijî li darxistina kongira netewî a kurd´ ku bûya xwediyê helwestê jî. Li pişt paşvexistina li darxistina kongira netewî a kurd jî, wusa tê dîtin ku tirkiya heya. Ji xwe, di dema amedekarîyên bo li darxistina kongira netewî de jî, T. Ardogan bixwe, dijberîya xwe û hikimeta xwe hanîya ser ziman û gotinên bi armanca ´tehdîtkirinê" jî hanîna ser ziman. Gotinên weke "wê ew ji vê pêvajoyê zirer bibînin" jî, gotina T. Ardogan ya ku di dema ku amedekarîyên li darxistina kongira netewî a kurd dihatina kirin de, wî ev gotin li berçapameniyê gotina. Ev gotin, bi armanca "tehdîtkiirinê", wî ev gotin bi lêvkirina.

**Ev gotinên T. Ardogan ên bi armanca ´tehdît´kirinê ku wî bo rêveberîya başûrê kurdistanê bi lêvkirina û piştî wê re ku paşvexistina li darxistina kongira netewî a kurd bûya, divê ku mirov bi wê amedekarîya dewletê ya şer re şîrove bike. Ji xwe, piştî wan gotinên wî, kongira netewî a kurd´ li darxistina wê hatîya paşvexistin**(taloqkirin).

Dema ku civînaka ku di wê de kurd werina cem hevdû ku li dijî wê bin, wê çaxê mirov çawa dikarê bawer bike ku wê gav biavêjin. Her wusa, li darketina civîna kongira netewî a kurd bûyîna tirkiya û piştgirîya wê ya ji çeteyên ku hêrîşî rojavayê kurdistanê dikin û her wusa amedekarîyên wê ên li bakûrê kurdistanê ên leşkerî ku dihên kirin, di temenê înkar û dijberîya kurdan de divê ku mirov fahm bike.

Weke mijara sereka, divê demê de, ku dii rojava kurdan de jî ya, dema ku qadaxaya li ser zimanê kurdî newê rakirin, wê pêvajo bi tememî xira bibe. Her wusa, rayadarên hikimetê dibêjin ku "em pakêtê amede dikin." çî pakêtê ku amede bikin jî, ku dema ku di wê de perwerdeya bi zimanê dayikê nebê û her wusa ku di temenê naskirina navê kurd û kurdistanê û bi wê re jî bo statûya kurdan gav di wê de nebin, wê pakêta xapandinê bê. Ji xwe, Radayarên dewletê û bi teybetî, T. Ardogan bixwe jî, li ber çapameniyê gotiya ku "wê bi zimanê kurdî perwerde nebe." Li ser navê kurdan, çi nirxên wan hena, hêrîşî li wan dikin. asta wan hêrîşên dewletê ên qirêt gihiştîya wê astê ku hêrîş gorîstanan jî dibin. Zihniyeteka ku hêrîşî gorîstanan bike, ew zihniyet, mirov

wê çawa karibê ji wê hêvîya mirovatîyê bike? Mirov, nikarê, van hêrîşên weke ku li çîyayê bagokê li gorîstana pekrawanên kurd, tenê di temenê "provakasyon"ekê şîrove bikin. Ji wê zêdetir, weke nêzîkatîya ´konseptekê" dihê ditin.

Ev hêrîşa li gorîstanan, divê ku mirov bi wê amedekarîya leşkerî re şîrove bike. Divê ku mirov wê hêrîşê, ji dîplomasîya tirkiya ya li başûrê kurdistanê bo paşvexistina li darxistina kongira netewî a kurd, ji wê dûr şîrove nekê.

Pêvajoya bo çareserkirina pirsgirêka kurd li bakûrê kurdistanê ku kurdan dayî destpêkirin, hê dawî lê ne hatîya. Vekişîn hat sekinandin. Lê hê, agirbest didomê. Divê ku hikimeta AKP`ê, bi cîdîyetê nêzî pêvajoyê bibe û êdî gavên cidî biavêje. Bi teybetî, divê ku ez bibêjim ku ev pêvajo ku bii dawî bibe, wê rêya kurd û tirkan jî ji hevdû vaqatihê.

Li vekişîna ku hêzên kir jî, pirr bi bêcîdîyetî nêzîatîya dewletê bû. Di dema pêvajoyê de, hertimî, bi armanca piçûkxistin û bêrûmetkirinê nîqaş dane meşandin. Ji dêla ku gavan biavêjin, ketina nîqaşên rêjeya hêzên vekişî de. Ji xwe, ev zihniyeta ku heta roja me bûya temenê şer û kuştinan.

Bi hewldan û **dîplomasîya astengkirina li darxistina kongire netewî a kurd**, bi destê komên ku bi çekkiirna hêrîşkirina li kurdên rojavayê kurdistanê û i bakûrê kurdistanê amedekarîyn şer, wê çawa pirsgirêk were çareserkirin? Bo pirsgirêk were çareserkirin, divê ku ev zihniyeta ku di temmenê van kirin û kiryaran de ya ji binî ve were guhartin. BI vê re, divê ku mirov vê yekê jî, bibêje ku Birêz Ocalan, weke nirxekî gelê kurd a. Divê ku tecrîde li ser wî were rakirin û pêvajoya azadkirina wî destpê bike. Heta ku Birêz Ocalan di wê "çala mirinê" de bê, bila ti kesek hêvî nekê û bawer neke ku wê çareseriyek ji aliyê dewletê ve were pêşxistin.

JI aliyê zihniyetê ve, dewlet, li dijî statûya kurdan a. Bo vê yekê, li dijî hewldanên yekîtîya kurdan ya navxweyî disekinê û hewl dide xira bike. Hêrîşê bi destê çeteyan dibe ser rojavayê kurdistanê bo ku kurd rêveberîya xwe ava nekin. Dema ku em bahse statûya kurdan dikin, em bahse van dikin. Di serî de, divê ku ev dijberî û dijminatîya li kurdan were buhurandin.

Li vir, em weke gotineka dawiyê vê jî bibêjin ku paşvexistina(taloqkirin)a kongira netewî a kurd, newe kirin weke paşvexistina maddeya 140 ya bo bajarên kurdistanê ên Kerkûk´ê. Rewşa ku em dibînin, rewşê dixwezin ku bikina weke wê. Bi paşvexistina û ankû taloqkirina, rewşê dixwezin ku şîlo biikin. Ev yek, divê ku newê kirin. Divê ku ev xelatîya dîrokî ku di dema maddeya 140 ya bo wergerinadin bajarê kurdistanê li ser herêma kurdistanê, divê ku newê dûbara kirin. Biqasî ku mirov dibîne, heman zihniyet, di dewrê de ya. Ji xwe, paşvexistina li darxistina kongira netewî a kurd, dibe alikarîyek ji politikayên dewleta tirk ê mijulkirinê re. Ji ber ku ti nîyetên wê tûna na ku gavan bo çarwserkirina pirsgirêka kurd biavêje, êdî dixwezê ku heta ku jê were pêvajoyê dirêjtir bike.

.. ..

**Li pişt paşvexistina li darxistina kongira netewî a kurd, tirkiya heya. ..**

Li herêmê, welatên weke tirkiya, li dijî kurdan û pêşketina statûya wan in. Ji ber vê yekê, naxwezin ku kurd li herêmê bigihijina statûya xwe. Divê demê de jî, tirkiya, hemû giranîya xwe û dîplomasîya xwe daye li ser wê ku pêşî li pêşketina statûya kurdan bigrê. Li rojavayê Kurdistanê jî, ev yek wusa ya. Di vê temenê de, di temenê dijberîya kurdan de xwediyê hewldanê ya.

Li bakûrê kurdistanê jî, kurdan pêvajoyek dabû bû destpêkirin ku di wê de pirsgirêkê kurd bi rêyên aşîtîyane were çareser kirin. LÊ tirkiya, ew pêvajo jî, vala derxist. Tirkiya, pêvajoya ku li tirkiya kurdan dabûbû desstpêkirin ji 21´ê Newroza 2013´an û pê de, bênavber amedekarîyên şer kirin a. Heta roja me jî, li bakûrê kurdistanê ew amedekarîyên wê ên şer didom in. Piştî ku kurdan pêvajoya ´çareserîyê´ bo çareserkirina pirsgirêka kurd dan destpêkirin û pê de, êdî kurdan jî, bo ku yekbûnekê nava xwe de çêbikin. Çend konfarans li darxistin. Yek ji wan konfaransên yekbûna kurd li bakûrê kurdistanê û yek jî di nava kurdên li dîyaspora de li dar ket. Di dawiyê de jî, wê ´kongira netewî a kurd´ biheta li darxistin. Bo vê yekê jî komiteya amedekarîyê ya bo kongira netewî a kurd ava bû. Komiteyê, karekî baş jî kir. Lê Dewletên herêmê ên weke tirkiya ji vê karê baş ku bo yekbûna kurd dihat kirin, pirr nexweş bûn. Bo vê yekê jî, hê ji destpêka amedekarîyên bo li darxistina kongira netewî, dîplomasîya tirkiya bi rêveberîya Îraqê re bê, bi rêveberîya başûrê kurdistanê re bê û hwd, detpêkir û zêde bû.

Piştre, di ancama van dîplomasîyan de, Serokwezîrê hikimeta başûrê kurdistanê Nêçîrvan Berzanî çû tirkiya. Di dema ku ew li tirkiya bû, hat gotin ku "bo ku têkiliyên aborî werina pêşxistin, ev serdan bûya." Lê piştre hin bi hin û gotin bi gotin, dihat ser ziman ku Tirkiya, ji rêveberîya başûrê kurdistanê hin xwestekên wê bûa. Piştre jî, ew dîplomasîya tirkiya ya bi başûrê kurdistanê re bê û hwd, doma. Herî dawî, êdî rengê wê dîplomasîya tirkiya ya bi rêveberîya başûrê kurdistanê re bi axiftina T. Ardogan re hinekî Zelal bû. Gotinên ku T. Ardogan, ku di temenê dijberîya li darxistina kongira netewî a kurd de hanîna ser ziman, wê piştre rengê wan kifş bike. Gotina Pêşî ew bû ku "hin soz dane me, divê ku dernekevina derî wan sozan." Ev gotin, ji devê T. Ardogan, bo rêveberîya başûrê kurdistanê hatibû gotin. Piştî vê gotina T. Ardogan re, ji rêveberîya kurd ya başûrê kurdistanê, raagihandinên bi nakok hatina ser ziman û ketina ajansên nûçeyan de. ..

Wusa dihat ditin ku dîplomasîya li ser esasê "tehdîtkirinê" ya tirkiya ya bi rêveberîya ya başûrê kurdistanê re, weke ku hin bi hin ancamê xwe de dide. Piştre, ne bi gelekî re, ji komîtîya amedekar ya bo kongira netewî a kurd ku hat, ew bû ku li darxistina kongira netewî a kurd, hatîya paşvexistin(taloqkirin) li 25´ê mijdarê. Ev care duyemin bû ku kongira netewî a kurd dihat paşvexistin. Pêşî, bi hênceta ku amedwkarîyên wê nagihijin, ji tabaxê hatibû paşvexistin li 15 û ankû 16´ê Êlonê. Piştre jî, hat paşvexistin li 25´ê mijdarê. Ev paşvexistina li darxistina kongira netewî, ya care dawîyê, ditijbihê care pêşî çawa ku bi maddeya 140 re ku hatibû kifşkirin ku wê herêma başûrê kurdistanê a Kerkûkê, wê buhurîba li ser rêveberî û herêma başûrê kurdistanê. Ev herdû, paşvexistina dawiyê, hinekî jî, ditijbihê wê paşvexistina cibicihkirina maddeya 140´ê.

Di vê demê de, bo hênceta paşvexistina li darxistina kongira netewî a kurd´ bûya hilbijartinên başûrê kurdistanê. Lê mirovekî ku hinekî pêşketinên li herêmê bixwêne, wê bibînê ku mirov wê nikaribê wê pêşvexistinê bi tememî bi waan hilbijartinên başûrê kurdistanê werêna ser ziman.

Ev paşvexistina li darxistina kongira netewî a kurd, mirov wê nikaribê ji tirkiya dûr şîrove bike. Ji xwe, serokwezirê tirk T. Ardogan, bi awayekî vekirî dijberîya xwe di temenê "tehdîtkirin"a rêveberîya başûrê kurdistanê de jî gotina xwe hanîbû ser ziman. Hingî, T. Ardogan, gotibû ku "dervî Sînorên me dibe. Lê wê andamên wê yên ne baş bo wê rêveberîyê wê hebin. Emê, piştre têkiliya xwe di berçav de bi buhurênin." Piştre jî, T. Ardogan bi ser gotina xwe ve kiribû û gotibû ku "soz dane me, divê ku vajî sozên

ku dane me ti gavan neavêjin." Piştî van gotinên T. Ardogan, hin bi hin, gûman bi gelek kurdan re çêbû ku "wê astengî li pêşîya li darxistina kongirê werina derxistin." Ev gotin û bi gelek gûmanan re di serê kurdan de bûn. Di aslê xwe de, di serê min bixwe de jî, bûn. Piştî ku min ew gotinên T. Ardogan, ên di temenê dijberîya kongira netewî a kurd de ku min bihîst. Ez di serê xwe de li bendî tiştekî bi vî rengî bûm. Lê ji aliyekî din ve jî, dilê min jî digot ku "heya ku rêveberîya başûrê kurdistanê bi biryarî li ser rewşa li darxistina kongira netewî bisekinê û pêvajoyê bi Serkevtinê bibe sêrî. Piştî gotinên T. Ardogan, paşvexistina li darxistina kongira netewî bo min nebû weke sûprîzekê.

Gelê kurd, li her çar beşên kurdistanê prr dixwezê ku kongira netewî were li darxistin. Gelê kurd, vê yekê dixwezê. Li her çar beşên kurdistanê jî, xwesteka hemû kurdan ev a. Partî û rêxistinên kurd, ên her çar beşên kurdistanê jî, weke rastîyeka ahlaqî divê ku em bibêjin k u divê ku li wê xwesteka gelê kurd bihisênin û guh bidinêne de û kongira netewî li darbixin.

Herêma rojhilat, ji her aliyê ve dikelê. Li her deverê şer a. BI kurdan re, ji her çar beşên kurdistanê ve bi kurdan re şer heya. Di vê demê de, divê ku kurd kongira netewî li darbixin. Divê ku bizanibin ku tirkiya, hertimî dijberîya wê li dijî statûya kurdan hanîya ser ziman. Gelê başşûrê kurdistanê jî, û rêveberî û partî û rêxistinên wê jî, divê ku bizanibin ku heta ku li beşên pirsgirêka kurd newina çareser kirin, wê hertimî, talûkeyên li ser serê başûrê kurdistanê jî wê hebin. JI ber vê yekê, divê ku rêveberîya başûrê kurdistanê û rêxistinên wê jî, û her wusa ên hemû beşên din jî guh bidina gel û li gorî wê bikin. Divê ku bibin rêxistinên gelê kurd. Divê ku nebina rêxistinên desthilatdarîyên herêmê û li gorî berjewendîyên wan nekin.

.. **Pêvajoya** nû, bi awayekî fermî dest pê kir. Hêzên hêzên kurd, ji herêmên şer vekişîyan. Ev pêvajo, di wê de, tişta ku were kirin, divê ku êdî bernema û plangerîya wê were kirin. Tenê bi gotina, "gel, wê di vê pêvajoyê de jî tekoşîna xwe bidomêne" re pêvajo bi rê ve naçê. Ji wê zêdetir, divê ku sazûmana pêvajoyê were kirin. Di serî de, weke aliyên giring û ên ku divê ku bi zarorî werina kirin, sê tişt derdikevina li pêş. Yek ew a ku li kurdistanê ku navenda wê Amed bê, pergale sîyesî ya tekoşînê were pêşxistin. Saziyên ku wê êdî wê tekoşînê werina bi rê ve biirn, divê ku werina bi ava kirin. Di serî de, divê ku mirov bi bibêje ku DTK; ku di temenê parlamene herêmê de bê divê ku rêxistinîya xwe bide çê kirin. Li herêmê hemû beşên civatê, ku ji olî bê û bi kêmnetewî û hwd bê, her beşên civatî divê ku temslîyeta wan were berfirehtir kirin. Her wusa, komên olî ên weke Elewî û êzîdî û hwd jî, divê ku temsilîyeta wan were pêşxistin.

Her wusa, bi vir ve girêdayî ez dixwezim bibêjim ku divê ku DTK, di bin bane xwe de sê komîte û ankû komîsyonên giring ava bike. Yek, ew bê ku di nava kurdan de ku hertimî pêşengî û seroketîyê bike. Ya din jî ku weke komite û ankû komîsyona têkiliyên derve ên dîplomatîkî ku bênavber heta ku pirsgirêka kurd di çareserkirina wê de ku ancam were bidest xistin ku xwe bidomêne divê ku ava bike. Her wusa, weke komîte û ankû komîsyan sêyemin jî ya ku wê di bin bane xwe de ku hem ancam û hem jî serokatîya herdû komîsyonên pêşî di nava xwe de bike yek, ku komîsyona rêvebiirnê ya pêvajoyê bê, divê ku were ava kirin. Bi wê re jî, pêvajoyên fêrkirin û perwerdekirin û gihandinê, divê ku di nava civate de werina pêşxistin ku ev mirovên ku bi wê re pêş bikevin ku karibin civate kurd bi rê ve bibin. Her wusa, bi wê re jî, divê ku ev komîsyona sêyemin, divê ku bernema û plangerîya xwe bi nivîskî bi nivîsêne û ragihêne rayagiştî û bi wê re di çeçroveya pirsgirêka kurd û çareserkirina wê de wê çawa gav

werina avêtin, divê ku werina safî kirin. BI wê re jî, êdî herkesek bi wê re êdî di çeçroveê de bi keve nave tekoşîna demokratîk de ku bo çareserkirina pirsgirêka kurd.

Weke bîrînaka mazin ya civate kurd jî ew a ku pirsgirêka bi karhanîna zimanê kurdî ji aliyê sîyesetmederên kurd, rewşnbîrên kurd û hwd a. Ev jî, divê ku di vê pêvajoyê de, di çerçoyeka wê plangerîya pêvajoyê de bi awayekî vekirî divê ku li ser were sekinin û pêşxistin.

Divê pêvajoya ku hêzên kurd, vekişîyan û pêde, dewlet, wê hewl bide ku pêvajoyê di temenê mijulkirinê de bide dirêj kirin. Wê hewl bide ku pêvajoyê, di **sûrûncemê** de bide hiştin. BI wê hiştinê re jî, êdî hewl bide ku bi wî rengî bibêje ku "meyzênin, va pirsgirêk çareser bû." Li vir, berî hertiştî, ya ku li ser were sekin in ev a. Dema ku di vê pêvajoyê de, rêxistiniya pêvajoyê newê kirin, wê ew jî, di vê pêvajoyê de bi xwe re valahiyê bêne û wê dewlet, bi partiyên xwe û saziyên xwe hewl bide ku wê valahiyê li gorî xwe bi rêxistin bike û dagirê. Bi wê re jî, hewl bide ku li gorî xwe bide bi ancam kirin. Ev pêvajoyên sîyesî, pêvajoyên giring in û bi teybetî, bi gotinê bê û bi kirinê û bandûrê bê, divê ku mirov xwediyê hêzekê bê.

LI kurdistanê jî, di vê temenê de divê ku ji her aliyê rêxistinitî were kirin. Heta ku pirsgirêk, nekeve rêya çareserîkirin û ancam bi wê re bi dest newê xistin, divê ku ev rêxistinîtî hertimî were pêşxistin.

Divê pêvajoyê de, her gava ku were avêtin wê bandûra w pirr mazin bê. Divê demê de, hêza ku wê gavê bide avêtin jî, wê ya kurd bê. Wê tevgerîya kurd bê. Kurd, bo vê yekê jî, li herêmên xwe divê ku ti qadê valah nehêlin û rêxistiniya xwe bidina çê kirin.

Pêvajo, heta vê astê jî, çend ku bi vkeişîna hêzên kurd re gihiştîya ast û pêvajoya giirng jî, lê hê jî, ti ewlakarîya pêvajoyê tûna ya. Em nikarin bahse wê bikin. Dewletê, ji aliyê xwe ve, gavên ku bi veguhaztina hêzên leşkerî li kurdistanê bê û hwd, weke ku di xwezê ku vê pêvajoyê ji dêla ku weke firsandekê bibîne û bi wê re pirsgirêka kurd êdî çareser bike, wusa xûya dike ku dixwezê ku weke firsandekê bikarbêne ku derbeyekê li kurdan bixe. Divê temenê de, divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje.

Ev aliyekî giring ê ku hem telûkeyên mazin bo kurdan dide çê kirin û hem jî ku di temenê zihniyeta dewletê ya bi veguhaztina hêzê li herêmên kurdistanê di vê pêvajoyê de ku bi wê em lê dihizirin, em dibînin ku dewlet ne di hizreka baş de di vê pêvajoyê de bo kurdan. Wê hewl bide ku derbeyekê li kurdan bixwe. Divê ku em ji bîr nekin ku pêvajoya Şrî-lanka, de ku akomkujiyên wê destpêkirin, hingî, pêvajoyaka wan hevdîtinan li Oslo hebû û didoma. Tamîlîyan jî bawer dikir ku wê çareserî were û bi wê re xwe di pêvajoyê re bi rehewetî berdan û piştre bi wê re bûna temenê komkujiyên ku dewletê hanîn serê wan.

Divê pêvajoyê de bernema pirsgirêka kurd derxistina wê û li gorî hem rewşenbîrên kurd û hem jî sîyesetmederên kurd di yekdengî de ku bi hevdû re bi civate xwe de êdî di vê pêvajoyê de ku hewl bidin ku pêşketinê bidina çê kirin. Ya ku wê, ji wan re û bi wan re pêşketinê bênê jî wê ev bê.

Di pêvajoyên sîyesî de, bi hêza xwe ya hizrî û têgihiştinî ku serdest a û dikarê pêvajoyê bi sîyesî bi rêxistin bike, ew êdî wê serkevtîyê pêvajoyê bê. Sîyeset û qada wê, di vê temenê de, ji her herdû aliyên ku pêvajoyê dimeşênin û her wusa hêzên ku dixwezin ku pêvajoyê li gorî xwe bi reng û bandûr bikin jî derfetê dide wan. Divê ku di serî de ev yek were dîtin û fahm bikin.

Lê divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku dirêjkirina vê pêvajoyê bi vî rengî, wê berî

hertiştî zirerê bide kurdan û civate wan û tevgera wan. Pêvajoyên bi vî rengî, dirêjkirina wan, hertimî bi xwe re dikarê pêşketinên nû bêne. Li herêmê jî, hertimî rewş diguharê. Ev herdayimî guharîna rewşê ya li rojhilat jî, wê bandûrê li pêvajoyê bike. Ya ku di serî de, were dîtin ev a. Sîyeset, dema ku van pêşketinên ku wê di pêvajoyê de rûbidin ku nebînê û rewşên ku di biguharîn ku li rojhilat ku başî nexweêne, wê nikaribê xwe jî bi pêş bixe. Her wusa, wê xwe ji ketina pêvajoyê jê xilas nekê. Sazîyên kurdan, ên dîplomasî û saziyên civatî ên li kurdistanê k civate kurd bi rêxistin bikin û sazûmana wê pêş bixin, wê saziyên ku pêvajoyê bi rêve bibin bin.

Divê ku mirov vê jî fahm bike, veguhaztina hêzê ji aliyê dewleta tirk ve li herêmên kurdistanê û avakirina qarakolên nû, hinekî bi armanc û nîyeta, kirina bin kontrolê ya hemû tevgerîyên kurd ên rêxistinî na ya jî. Divê ku mirov ji vî aliyê ve jî lê binerê û li gorî wê karibê bibe xwedîyê tedbîr û bandûr li herêmên xwe. Ev jî, weke berpirsîyerîyekê dikeve ser milê saziyên kurd de.

Di vê pêvajoyê de, çapameniya kurd, karekî mazin dikeve ser milê wê de. Heta roja me, tenê rojenemeyek rojane ya bi kurdî ya ´azadîya welat´ heya. Ev, ti carî ne beş a. Bi teybetî li bajarên weke Wan, şemzînan, Amed, Merdîn, Êlih, Şîrnax, Cîzîr, Nisêbin, Agirî. Mûş, Sêrt, û hwd, dikarê di vê pêvajoyê rêxistiniya rojenemya kurdî ya rojena dikarê were kirin. Di destpêkê de, dikarin, heftene derkevin. Lê divê ku bi wê armancê bin, ku di demeka kin de ku xwe bikina rojene ku derkevin. Her wusa, çapamenî, di vê pêvajoyê re rêxistiniya wan divê ku werre kirin. Divê ku projeyên din ên tv´yên kurdî hewl bê dayin ku were pêşxistin. Bi teybetî, li tirkiya, ev divê ku hewl bêdayin ku were pêşxistin. Hewldanên, stasyonên tv´yên kurdî ên dervî welat ku derdikevin ku di hundurê welêt de werina vekirin û pêşxistin. Her wusa, temenê rojnameyên weke azadîya welat û hwd ku karibin li başûr, rojava û hwd jî ku derkevin divê ku were pêşxistin. Li van herêman bixwe jî, rojnameyên rojenam ên nû divê ku temenê wan were avêtin ku werina derxistin. Heta nûha, li rojavayê kurdistanê, çapameniya kurdî ya nivîskî, divîyabû ku şoreşek bi xwe re li rojavayê kurdistanê bide kirin.

Bi van aliyan û hê gelek aliyên din ên weke van ku divê ku werina kifşkirin ku divê ku werina pêşxistin, bi wan re temenê çareserkirina pirsgirêka kurd wê ji aliyê civate kurd ve werê afirandin.

Di vê demê de, divê ku bi karê rewşenbîrî û sîyesî, divê ku şoreşek ji nû ve li bakûrê kurdistanê were pêşxistin. Rêxistinî kirina rewşenbîrîtîya kurdistanê û li ser wê re pêşxistina civatîtîya kurdistanê û kirina sîyesete wê, wê aliyekî giring ku temenê çareserkrina pirsgirêka kurd ku li herêmê jî dide afirandin bê.

Ji aliyê têgihiştinî û ramanî ve, bi wî 30 salê tekoşîna kurd re temenekî wusa afîr ku em li ti deverên cihanê rastî wê newin. Lê divê ku em wê jî pêş bixin. Rêxistiniya li ser sazîyên şariştanî û ankû sivîl ve, wê pêşketina civatê jî, bi şoreşa çandî û hunerî û kûltûrî jî bibe sêrî. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî lê bihizirê û fahm bike. Dema ku em bahse plangerîya pêvajoyê dikin, em tenê bahse çend komel û ankû saziyên ku pêvajoyê bişopênin nakin. Ji wê zêdetir, gelek saziyên civatî ên mayînda bixwe jî, wê temenê wan di vê pêvajoyê de bo parastin û pêşxistina civatîtîya kurd û pêşxistina wê, wê werina avêtin.Di vê demê de, wê temenê wan were avêtin.Weke leşker û tekoşarên vê demê, divê ku rewşenbîr û sîyesetmederên kurd xwe berpirsîyar bibînin û derkevina li pêş. Lê wekî din jî, ku wê nekin û wê berpisîyarîya xwe neyênina li cih, wê dîrok wan afûr nekê.

Divê temenê de, bi awayekî rastî, xwandina gîyane pêvajoyê û li gorî wê afirandin û demezrendina saziyê civatî û kirina sîyesetê, wê temenê çareserkirina pirsgirêka kurd bide afirand û çareserîyê jî bi xwe re bêne. Heka, em dibêjin ku ev pêvajo jî, pêvajoya tekoşînê ya, ev alî, weke aliyên tekoşînê ên ku nebê nabê ya. Sîyeseta civatê jî, wê li ser du tistan re bê kirin. Yek, ziman û nirx û çand û dîroka civatê ya. Ya din jî, sazîyên civatî ên ku afirîna û ên bi pêwîstî ku werina afirandin in.

Aliyekî, rewşenbîrîya kurd ya ku bi kêmesî em bênina ser ziman li vir derdikeve li holê. Rewşenbîrîya kurd, ji xwe bêbawer a. Ji ber vê yekê jî, bi wê ji xwe ne bawerbûnê bi du rengan derdikeve li ber pêvajoyê. Rengê pêşî, bi tememî di temenê li dijî pêvajoyê bûyînê ya. Rengê din jî, bi ji xwe nebawerbûnê ya. Ji ber ku mejiyê rewşenbîrîya kurd, heta roja me, bo civate xwe li çareserîya negerîya ya û li ser wê serî ne wastandîya. JI ber vê yekê jî, dema ku dikeve rewşeka wusa de ku divê ku bihizirê û çareserîyan biafirêne, ya ku rewşenbîrya kurd xwe li ber wê kêm û bêhêz dibîne jî ev a. Heta roja me, bitirkî hizirîna û çareserîyên ku dewleta tirk, bo xwe û civate xwe afirandina li ser wan re, hizirîna û bi wê re jî, hewceyî bi hizirkirin û afirandinê ne dîtina. Ji xwe, civate kurd, bo wan weke civateka ku hatî jibîrkirî ya. Yanî, ji xwe ne di bîra wan de jî ya. Kîjan rewşenbîrên tirk çî gotiîya û ankû çawa hanîya ser ziman, bi tirkî çend gotin di temenê weke ku rexne li wê bike gotîya û hwd. Di aslê xwe de, ew gotinên ku weke rexne dibêjê, berê ya tevgera kurd gotina û yan jî, berê hin nivîskarên tirkî tirkî nivîsandina. Ew jî, bi tirkî dinivîsênin û wê dubare dikin. Bi wê re jî, heta roja me, bi vê rengê rewşenbîrîya kurd zan kirîya ku tiştek kirîya. ..

Rewşenbîrî, bi gotinî, dema ku em hildina li dest, di çerçoveya jîyan, raman û dîroka civate ku ji wê ya, bi pergalî rêxistiniyekê bi xwe re diafirêne. Li ser wê re êdî di nava civate de pêşketinên civatê dihêne ser ziman. Bi wê re jî, rê şanî civatê dide. Bi wê re jî, êdî pêşengtiya civatê dike. Pirsgirêkên civatê ên navxweyî û ên dervî wê, çawa na, wan fahm dike û çareserîyê ji wan re dike ku bibîne. Lê heta roja me, rewşenbîrîya kurd, yek jî ji wan karan û berpirsîyaran ji bo civate kurd ne hanîya li cih.

Ku mirov li kûderê jî bijî, mirov dikarê xwe bigihijêne kurdistanê û wê pêşketina ku mirov dixwezê di nava civate de bide çê kirin. Ji bo wê tenê tiştek heceyî pê heya. Ew jî, ew a ku divê ku dilê mirov û mejiyê mirov bixwezê. Ku dil û mejî xwest û lê hat girêdan û lê hizirî ku bike, êdî wê ti tişt li pêşîya wê kirinê nebê astang. Lê mirov xwest ku nebê û ji mirov ne hat ku mirov bike, mirov êdî bi wî mejiyê xwe bi hezaran sedeman dide çê kirin bo ku ji ber çi nakê. Ji bo ku xwe mafdar derxê wê sedeman derxê. Bo wê nekirina xwe meşrî bide nîşandin, wê bi mejiyê xwe re bihizirê û wê gelek sedeman bibîne û bide nîşandin. Lê ku wijdan, zanebûn û aqilê mirov hebê, mirov wê bike û ti tişt jî wê mirov ji kirinê dûr nekê.

Tevgera kurd, ev 30 salîn ku tekoşîya ku bi hezaran ciwanên kurd ên leheng jîyane xwe bi fedayene dan. Heka ku mirov bi wijdan û mirovatî hinekî jî di dil û bi mirov re hebê, divê ku êdî ew mirovên ku ji xwe re dibêjin ku rewşenbîrên kurd in, dibê ku gotinekê jî bê, divê ku wê di nava civate xwe de bi zimanê wê bênina ser ziman. Bi wê re jî, êdî meşîn. Di vê demê de wê sazîya sîyesetê û ya rewşenbîrîyê, wê pêvajoyê bi rê ve bibin. Ew, divê ku li gorî ve êdî bibina xwedî berpirsîyar û wê berpirsîyarîyê fahm bikin û bibînin û pêwîstînîyên wê bênin li cih.

**Pêvajoyên sîyesî, ku heyvek jî bin ku salek jî bin û ku deh sal jî bin, ku baş werina fahm kirin û şîrovekirin, pêvajoyên yekane û tekane ku civatê bi xwe re**

**diafirên in. Di van pêvajoyên bi vî rengî de, sîyeset û sazîyên rewşenbîrî ku karê xwe li gorî wê û têr bikin, weke pêvajoyên ku wê bi xwe re serkevtinê jî bênin in.** Di serî de, divê ku mirov vê yekê bi giringî fahm bike û bêne ser ziman.

Di pêvajoyaka ku divê ku rewşenbîr mejiyê xwe bikarbênin û pêvajoyê pêş bixin û bibina serkevtinê de ku ew mejiyê wan karnekê û çareserîyê di wê pêvajoyê de fahm nekê û nizanibê ku wê çi bike, wê weke ku çawa ku "spartakûs" û ankû "don-kîşot" dixwest ku jîyane berê bi şûn ve werênin û ku ketina xwestek û legerîna wê de, wê bi heman rengê ew mejiyê rewşenbîrîya kurd jî, wê bixwezê ku rewşa berê bi şûn ve were da qana xwe di ewlatiyê de hîs bike û ew nekevê bin wê berpirsîyarîyê de. Biqasî tirsa mirinê ku car bi car dikarê bikeve dilê mirov de, wilqasî jî tirsa ji pêşarojê jî car bi car xwe bi heman rengî dide afirandin. Lê mirov, di rêwîtîya xwe ya bi ber pêşarojê de bêplan û bêbernema bû û ti projeyên wî yên jîyane ku di serê wî de nebûn, wê hingî, bi tememî, ew tirs vegerihê ´sendromekê´ ku êdî wî bi xwe re dihizirê. Ev mejî, bi vî rengî, car bi car dawî li jîyane xwe hanînê jî, dikarê ji xwe re weke çareserîyekê ji xwe re bibîne. Rewşa mejiyê rewşenbîrîya kurd, hinekî jî, vê rewşê dihêne berbîra me û dike serê me de. Divê ku xwe ji vê rewşê rizgar bike. Heta roja me, mirovên ku weke rewşenbîrîya kurd, xwe ji dûvikîya rewşenbîrîya tirk ya nîjadperest xilas nekirina. Hineka, bi tevlîbûnê xwe kirina navê de. Hinekan jî, bi rexnekîirinê xwe kirina navê de. Lê di her halûkarê de, xwe bi wê ve kirina û kirina dûvikê wê. Êdî ev jî, bûya sedemeka ku ew li civate xwe ne hizirin û projeyan bo civatîtîya xwe ne afirênin.

Bi vî rengî û rewşeê, wê di vê pêvajoyê de, nikaribê ti carî wê axa mirinê ji ser xwe biavêje. Ji ber vê yekê, di serî de, di temenê xwe ji nû ve afirandin û gihandina keseyetîyeka civatî ya ku ew keseyetîya ku ew xwe bigihêniyê de keseyetiya civate wî ya, divê ku xwe biafirêne û bi wê re tevlî pêvajoyê bibe. Ya ku wê serkevtinê bi wî re di nava civate wî de jî bêne ev a.

Ev pêvajoya nû, pêvajoyaka giring a ku kar û barê rewşenbîrî bo wê pirr giring a. Bi wê yekê, di vê pêvajoyê de, tenê ku çend mirovên ku bi layiqî ku karibin karê xwe bi rastî bênin li cih, wê bi gotin û pênûsa şoreşekê di nava civate xwe de bidina kirin. Ev pêvajo, pêvajoya vê ya.

Şer û pevçûn, wê heta roja ´qîyemetê´ wê nedom in. Wê her di demekê de, dawî lê were. Ya ku wê cihê wê bigrê jî, wê kar û barê rewşenbîrî ku civat bi wê ku xwe diafirêne. Hizirkirin û pêxistina têgihiştinê, rêya ku civat li ser dimeşê ya. Di aslê wê de, pêvajoyên şer, van pêvajoyan ji holê dirakin. Ji ber vê yekê bû, ku tevgera kurd ya azadiyê, ji şer zêdetir karê herî mazin weke kar û barê rewşenbîrîyê kir. Bo vê yekê, bo tevgera kurd ya azadîyê hatîya gotin "tevgereka rewşenbîrî´ jî. Ev gotin, hinekî jî, li vir di vê xalê de xwe bi wate dike. Ji ber vê yekê, tekoşîna kurd, hertimî karê rewşenbîrî li pêş girt. BI wê re jî, pêşketina civatî afirand pêşxist. Şoreşên weke ên Firansa û yekîtîya sovyet û hwd, di temenê wan de pêşketinên hizrî û hwd berî wan dest pê kiribûn. Di aslê xwe de, Şoreşa Sovyet, ku berî wê jîyane mirovên weke dostyewskî, çaykowskî û hwd bi hizrên ku hanîna ser ziman temenê wê avêtin. Berî wan, dema ku em bahse şoreşa Firansa bikin, berî wê ji dema ronasanê û hwd, serdemna têgihiştinî ku pêşketin hena. Ji dema ronasansê heta ku tê dema ´Barok´ê û hwd, di temenê wê de bi têgihiştinî heya. Di van deman de, têgihiştin, huner û hwd pirr pêşket. Lê pêvajoya şoreşa kurdistanê, hemû pêvajoyên ku li ser pêşketiba, di nava xwe de afirand û vejand. Bi wê re jî, hertimî du-dîmenîtîya wê bûya û afirîya. Î ro jî, ji wê rewşa şoreşa kurdistanê ya du-

dîmenî, dîmenê rewşenbîrî derdikeve li pêş û serdest dibe li demê nû. Bo vê yekê jî, êdî bi wê re bo civate kurd, rewşenbîr dibina tekoşarên vê dema nû. Ya ku divê ku ew fahm bike û heta ku xwe li gorî w perwerde jî bikin bi keseyetiyê û bi wê re êdî bi karûbarê ku bikin re rabin. ...

... **Pêvajoya** ku di wê de li Oslo´yê hevdîtin bi tevgera kurd re dibe, hingî, biqasî ku ji aliyê tevgera kurd ve hat ragihandin ku "sê protokol" hatibûbûna amede kirin û li bendê bûn ku dewlet wan herê bike û pêvajo bi pêş de herê. Lê piştre di wê dema ku tê gotin ku tevgera kurd li bendî bersivê bû, T. Ardogan derdikeve telewîsyonê û ji bo birêz Ocalan dike û dibêje ku "em di wê demê de li ser desthilatdarîya ban, me yê ew bi darvebikira." Yanî, bi gotina ´ di wê demê de, qastî wê dema ku hikimeta Bilenc Ecewît ku li ser desthilatdarîyê bû û bo ku rewşa birêz Ocalan weke "şewişîn(´şantajê´)" bikarbênin ku gotin ku "emê cezayê biderve kirinê neyênina li cih." dihê gotin. Ev gotin, weke bersiva T. Ardogan, ya ji hersê protokolan re hat ditin û şîrove kirin.

Di vê demê de jî, herkesek li bendê ya ku hevdîtinên ku bi birêz Ocalan re dibîn vegerihina Muzakareyê. Lê hikimeta AKP´ê di vî warî de, heta nûha ti gav neavêtina. Vajî wê, berî î ro bi du rojan heyete BDP´ê ya ku çû Îmraliyê û bi birêz Ocalan re hevdîtin kir, û piştre jî peyame birêz Ocalan ragihand ku birêz ocalan gotîya ku "ez banga xwe ya dîrokî ji nû ve (carek din) dikim." Yanî, bangê li dewletê dike ku ev pêvajo êdî bi muzakareyê were domandin. Piştî ku hevdîtin bû û piştre, ku ev gotinên birêz Ocalan hatina ragihandin ji rayagiştî re, êdî roja ´cejna korbanê´ de T. Ardogan piştî ´mêja cejnê´ derdikeve ber çapameniyê û sîyesetmederên kurd bibîrîna têkiliya bi wezereta dadê re ´tehdîd´ dike. Ji xwe, wezereta dadê, weke wezereteka ku her mirovê ku hemwelatîyê tirkiyê ya, bi mecbûrî, divê ku têkiliyê bi wê re dêne. Lê wusa dihê ditin û fahm kirin ku ev gotinên T. Ardogan, ne tenê bo BDP´ê na. Gelo divê ku mirov van gotinan, weke wan gotinên T. Ardogan ên ku bi wan dawî li hevdîtinên li Oslo hat danîn bihasibêne û şîrove bike? Di rengekî wusa de, dihên gotin. Dibêt ku şert û merc û qad cuda bê, lê weke ku ji bo rewşeka bi wî rengî hatibibina gotin in. Ev gotinên T. Ardogan, ew gotinên wê demê ên ku piştre weke gotinên ku bi wan dawî li pêvajoya hevdîtinên li Oslo hat hanîn, hanîn bîra min.

Ji gotinan, bi vî rengî, tiştekî din jî dihê ditin û xwandin. Ew jî, ew a ku weke ku ji sîyesetmederên kurd re dibêje ku ´dernekevina dervî çerçoveya ku me kifşkirîya.´ Bi wê re jî, ji xwe hin dordor, di vê çerçoveyê de di temenê "hişyarîyekê" de şîrove dikin. Lê dema ku em rewşa pêvajoyê û gotina birêz ocalan ya ku wî di hevdîtinê de bi rêya heyete BDP´ê got û got ku **"ez banga xwe ya dîrokî ji nû ve (carek din) dikim",** dema ku em vê li berçav bigrin, weke ku weke bersivekê ji vê gotinê re bê, ku hatîya gotina, mirov fahm dike.

Ji xwe, ji rewşên ku dihên ditin û gotinên rayadarê dewletê û hwd, mirov fahm dike ku wan weke ku ji aliyê xwe ve dawî li pêvajoyê hanîna. Weke ku birêz ocalan di hevdîtina xwe de dihêne ser ziman, di pêvajoyê de ku weke rengê politikaya xapandinê "ne redkirin û ne jî pêşketin hat çêkirin", weke rengê kirina politikayê dihê bijartin. Ji aliyekî din ve, wusa dihê ditin ku weke ku dewlet jî dixwezê ku di wê rewşê de bihêle. Ne red bike û ne jî pêşketinê di pêvajoyê de bi pêşxistina muzakareyan û hwd bide çê kirin. **Yanî, bi vî rengî, di rengekî ku were cemidandin de bihêle. Rewşeka bi vî rengî dihê ditin. Di vê rewşê de jî, plansazîya ku li dijî tevgera kurd û civate kurd çêkirîya jî, bike merîyetê û bi wê re di hilbijartinan de bê û her wusa di qadên din**

**de bê, li gorî xwe ancamê bidest bixe.** Birêz Ocalan vê yekê jî, dibîne**.** Ji ber vê yekê, dibêje ku "bilez û bez, li gorî her heşt prensîbên me hanîbû ser ziman, pergale demokratik û xweser were pêşxistin" û bi wê re "jîyan were pêşxistin." Birêz Ocalan, dibêje ku "bilez û bez, divê ku ev di vê demê de were kirin."

**Pêvajo, di dewletê de xitîmîya. Ev yek jî, weke nêzîkatîyekê û politikayekê dihê ditin. Divê ku mirov wusa fahm bike.** Wusa dihê ditin ku heya ku li ser vê nêzîkatîyê re dirêjtir bike. Di vê temenê de, ne pêvajo veguharî pêvajoya hevdîtina bi muzakareyan û ne jî di temenekî ku bêje min xilas kirîya û ankû dawî lê hanîya de gotina xwe bibêje. Yanî, di vê rewşê de ku di rewşeka navê de bihêle. Ev rewş, weke lingekî dirêjkirinê ku were bikarhanîn a. Wusa dihê dîtin ku ev nûqta, weke nûqtaya navaroka lîstika hikimeta AKP´ê ku dixwezê pêş bixe jî ya. Li ser wê re jî, heta ku jê were pêvajoyê dirêjtir bike. Ev nûqta û çend nûqtayên din ên weke vê nûqtê, ku em bi teybetî li ser gotinên ku di temenê pêvajoyê de hin rayadarên dewletê dihênina ser ziman ên weke "kî pêvajoyê xira bike wê di bin de bimêne" û her wusa çend nûqtayên bi vî rengî ên weke ku birêz Ocalan dihêne ser ziman ku "ne redkirin û ne jî pêşketin hat kirin"û hwd de, li gorî xwe li ser çapameniyê re ku bi gotinan re dîzaynekê bike û bi wê re herê bi ser kurdan de. Di wê navberê de, bi gotinên ´reşkirinê´ re herê bi ser partî, rêxistin, sazîyên kurd de jî. Ev jî, weke lingekî vê pêvajoyê ku li gorî xwe şerê xwe yê li ser çapameniyê re li dijî kurdan bide domandin a. Hin sîyesetmederên kurd, van gotinan dibêt ku weke gotinên ku "di temenê propagandaya hilbijartinê de hatina gotin" ku şîrove bikin jî, wê bi tememî ne rast bê. Ji wê zêdetir, di vê zihniyetê, nêzîkatîyê û wan gotinan de heya. Yanî, bi gotinaka din, di rengê konseptekê de dihê ditin.

Hewldanên dewletê ên bi çêkirina hêtên weke ku kurdan bi nav kir "hêtên şerme" re jî di nava bakûr û rojavayê kurdistanê de, çend ku aliyekî wê ew bê, aliyê din jî bi wê re hem çapameni û hem jî mejiyê kurdan bi wê re bide meşkul kirin ku di temenê sazûman û sazîbûna jîyane kurdîstanî de ku hizirkirin û gavavêtin nebin. Yanî, di vê temenê de jî, hin armancên van nîqaşan jî heya. Di nava me kurdan de gotinek heya, ku ew jî ew a ku tê gotin ku "yekî dîn kevirek avêta binê bîrê û çil(40) mirovên biaqil nikarin ku wî kevirî ji binê wê bîrê derxin" Rewşa li ser çapameniyê û nîqaşan re, bûya ev. Rojekê, bêne rojevê ku wê "demirtaş, îstîfa bike ji BDP´ê." Roja din, bêje "têkiliya xwe ya bi wezeretê re xira nekin" û hwd. Bi vî rengî, ku tenê bi armanca nîqaşkirinê jî, hin gotin tên gotin. Ji ber ku car bi car kurd û sîyesetmederên kurd, dikevin zorê de ku rojeve xwe bixwe biafirinên, êdî li dûv nîqaşên bi vî rengî dikevin û diçin. Dema ku te rojeve xwe ne afirand, tê li dûv rojev û gotinên wan herê.

Di serî de, li vir, wusa dihê ditin ku T. Ardogan, ji xwe pêvajo bidawî kirîya. Lê weke ku bi dawî nekirî, wê gotinên xwe bibêje û bi vî rengî weke ku birêz ocalan dihêne ser ziman, wê ´ne red bike û ne jî bihêle ku pêşveçûn di wê de bibin.´ Ev, rengekî mujulkirin û dirêjkirina pêvajoyê ya. Yanî, ku em li politikayên ´xapandinê´ bigerihin, divê ku em li vir lê bigerihin.

Bi gotin û ankû pirsa ku me weke ´sernivîsê´ kir navê nivîsê **"Hikimeta AKP`ê, pêvajo bidawî kir??"** jî, em li vir, weke ku hinekî bersiva wê dibînin ku hikimetê pêvajo li gorî xwe bidawî kirîya. Lê wê weke ku bi dawî nekirî wê bixwezê ku bi rê ve bibe. Ya ku em li vir, di serî de kifş dikin ev a. Lê ji aliyekî din ve jî, ji ber ku hikimetê ji aliyê xwe ve bi dawî kirîya, wê gavan jî ne avêje. Wke pêwîstînîyên vê politikayê, cardina bi gotinên ku hêvîyê bide bê û carna jî bi hin gavikên piçûk, weke qasşo rakirina

qadaxaya li ser hersê tîpên kurdî ên weke ´Q´, ´W´ û ´X´ û hwd re bixwezê ku weke ku gav diavêje xwe bide nîşandin. Ev jî, weke aliyekî ku mirov divê ku cûda li ser bisekinê ya. Hikimeta AKP´ê, li vir, li gorî xwe bi wî aqilê xwe yê piçûk, li ser gotinan re dileyizê. ´Bi vî rengî, wê gotinên ku bi tememî di temenê redkirinê de bikarnehêne. Lê wê di temenê pêşveçûnan de jî ti gavê ne navêje´. Ev rewş, weke rewşeka ku rengê politikaya mujilkirinê ya hikimeta AKPê dide nîşandin a. **..**

.. **Li vir, em di nava mijarê de bicih bikin û bahse gotina "Kurdistan"ê û nîqaşên di derbarê wê de ên li meclîsa tirk hatina kirin jî bikin.** Gotina ´Kurdistan´ê, ku em tenê li dîroka wê binerin, emê bibînin ku wê dîroka osmanîyan jî di nav de, dû-qatî dîroka tirkiya xwediyê dîrokekê ya. Gotina ´Kurdistan´ê, î ro em em dizanin ku ji aliyê kurdên ´kekoyîdî´ û ´kurdên eyîrîdî´ ve dihat bikarhanîn. Ji ber çi, bi teybetî, min navê kurdên kekoyîdî û kurdên eyîrîdî pêşî hanî ser ziman. Bêgûman, nîşanakên ku berî demên kurdên kekoyîdî û kurdên eyîrîdî jî gotina kurdistanê hatîya bikarhanîn. Kurdên kekoyîdî jî û kurdên eyîrîdî jî, di sadsale 9´min xwe de xwedî dewlet bûn û dijîn. Dewleta kekoyîdîyan, pereyên wê ên bi navê desthilatdarîya wê jî hebûn. Her wusa, divê ku mirov bo kurdên eyîrîdî jî bibêje. Vêca, nûha em werina, li ser wê teybetmendîya ku ji ber çi me pêşî navê kurdên eyîrîdî û kekoyîdî pêşî bikarhanî. ...

Desthilatdarîya kurdên eyîrîdî jî û kurdên kekoyîdî jî, pirr xort bû. Artişên wan ên mazin hebûn. Lê di wê dema wan de jî, hêrîşên ku ji asya ên bi ser wan de dihatin û li wan dibûn hebûn. Hêrîşên Sancar û berî wî bavê wî jî di nava wan herîşan de na. Weke bavê xwe Sancar bi artişa xwe tê ber "sînorê kurdistanê" û bi kurdan re dikeve şer de. Gelek deveran kavil dike û ji naqşayî dibe. Lê çi dike û nakê li ber artiş û hêza kurdan bisernakevê. Piştre jî, rojevekê, Sancar ji wezirekî dipirsê ku "ev kîna ku wilqasî şervanîyaka mazin dikin." Wezirê wî, bersivê didîyê de û dibêje ku "ewên wusa şer dikin ku tu kesek li ber wan bisernakevê ´kurdistanî´ na. Piştre jî, Sancar, dibêjin ku ev gotin ji devê wî derdikeve û dibêje ku "ev kurdistanî çi şervanna mazin in." ...

Ji ber vê gotina ku Sancar bikardihêne, hatîya gotin ku "care pêşî sancar gotina ´kurdistanê´ bikarhanîya". Rasta, ku Sancar gotina ´Kurdistan´ê bikarhanîya. Lê em li vir nikarin bêjin ku care pêşî wî bikarhanîya. Lê em dikarin bibêjin ku di sadsale 9´min de sancar ku siltanê salçûqî, gotina ´Kurdistan´ê di dema xwe care pêşî pênasî kiriya û bikarhanîya. Ji ber ku nîşanakên pirr xort hena ku berî wî jî dihat bikarhanîn. ..

Divê ku em bibêjin ku kurdên eyîrîdî jî û kurdên kekoyîdî jî ku di sadsale 8´min ´ sadsale 9´min de demên xwe yên desthilatdarîyê ên zêr dijîn de, ev gotin di nava wan de dihê bikarhanîn. Ji xwe şancar jî, ji wan digirê û bikardihêne. Divê ku em vê yekê, li vir di serî de kifş bikin, weke rastîyeka dîrokî.

Dema ku em li ser rêzimanîya zimanê kurdî re herin û li ser wê re çend gotinan bibêjin ku temenê bikarhanîna gotina ´Kurdistan´ê, pirr kevn diçê û heta ku diçê demên berî zayinê, demên hûrîyan û mîtannîyan. Î ro, di destê me de binerter(dokument) hena ku di rêzimanîya hûrîyan de "...îsta", "..îstan", "...îstanî" û hwd, bi hersê awayên xwe re jî di rêzimanîya hûrîyan de heya. Îlsa Wegner ku rêwşenbîr û lêkolînvaneka bi aslê xwe alman bû, li ser zimanê hûrîyan çend lêkolînên wê li ser zimanên hûûrîyan bûna û hatina weşandin. Yek ji wan lêkolînên wê pirtûka wê ya bi navê "Introduction to the Hurrian Language" bûya û di vê pirtûka xwe de, ji dema hûrîyan û ji rêzimanîya wan, awayê rêzimanî ên weke "...îsta", "..îstan", "...îstanî" û hwd, kifş dike û bi şîroveyên xwe ên kûr û dîrêj re dihêne ser ziman. He wusa, em nûha werina ser navê ´kurd´ di berdewame

vê kifşkiirna rêzimanîya ji dema hûrîyan de. Dîsa ku ji dema hûrîyan tê kifşkirin, sê lêkolînvanên ku lêkolînên xwe bi aqadamîkî li ser zimanê hûrîyan kirina û pirtûka bi navê"HURRIANS AND HURRIAN NAMES IN THE MARl TEXTS" nivîsandina ´Jack M. Sasson - Chapel Hill, North Carolina´ û di wê pirtûkê de hewldane ku navê hûrîyan ji zimanê wan kifş bikin û binivîsênin,, di pirtûka wan de bi gelek rengên wê em rastî navê ´kurd´ bi rengên **"kur-da", "kur-d[a** ..", "**´kurda"** ku mirov rastî tê, nivîsandina û hwd tên. Hinek rengên din jî, ên nivîsandina navê ´kurd´ tenê di wê pirtûkê de zêdetir jî hena.

Ev tenê ji aliyê kevnerîya gotinê ve ku li ser rêziman ve me hanî ser ziman. Dema ku em li kifşkirinên ku rêzimanê ên Îlsa Wegner dinerin ên ´Jack M. Sasson - Chapel Hill, North Carolina´ ku di pirtûka xwe ya bi navê "Hurrians and hurrians names in the mari texts" dinerin, em temenê rêzimanê bo gotina ´Kurdistan´ê ji van deman jî kifş dikin. Minaq, ji dema hûrîyan, em navê "gulistan" bi rengên ""gul-lu-uš-ta-an-n(gul-lu-uš-ta-an-ni--gul-lu-uš-ta-an-ni--gul-lu-uš-ta-a-an-ni" ku çend rengan a, em ji dema hûrîyan kifş dikin. Ev minaq, me bo temenê gotina ´Kurdistan´ê ku ji wê demê da.

Ev rewş û gelek rewşn ku em dikarin li vir li vir vê werênina ser ziman, dide nîşandin ku navê ´Kurdistan´ê, navekî ardnîgarî, civatî û sîyesî jî bûya. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman. Nûha jî, navê ku bi vî rengî kevn, ketîya bin înkare rejima tirk de. Hê ku tirk ji asya navîn ne hatibûbûna rojhilat, ev nav li herêmê hebû û dihat bikarhanîn. Nûha jî, dema ku em ji vê aliyê ve lê binerin, em di serî de namerdîya dîrokî bi zihniyeteka bêahlaq ya qadaxakar re dibînin. Her wusa, bo navê ´kurd´ jî divê ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman.

Lê li vir, di aslê xwe de, dema ku parlamenên BDP´ê navê ´Kurdistan´ê hanîna ser ziman, hersê partî bi zîhniyeta kujar û înkarker bûna yek. Dibêjin ku dixwezin ku "navê kurdistanê ji arşîva meclîsê were derxistin." Ew, sîyesetê bi vî rengî dikin. Di vê temenê de, di rengê înkarê de dikin. Dibêjin ku "bikarhanîna navê ´Kurdistan´ê li dijî destûrê ya." Navê ´kurd´ jî li dijî destûrê ya. Nivîsandina bi kurdî jî li dijî destûrê ya. Hemû tiştên ku hebûna civate kurd dihênina ser ziman jî, li dijî destûra wan ya bi zihniyeta înkarker a. Ev nêzîkatîya hikimeta AKP´ê ku bi CHP´ê Û MHP´ê re di temenê înkar û diminatîya nav û hebûna gelê kurd de dane nîşandin, di temenê wê komkujiya li geverê de jî ya. Ku em li vê rewşê binerin, emê zihniyeta di temenê wê komkujiyê de bibînin.

Di dema gera Birêz Berzanî a li Amedê de jî, ji aliyê T. Ardogan ve bikarhanîna gotina kurdistanê bi armanca xapandinê ya. Ji xwe, di dema van niqaşên di melisê de, ev yek bi awayekî vekirî dihê ditin. Ji destpêka avakirina komarê ve, dewletê û rayadarên wê, hertimî giringî dane tiştekî. Ew jî, ew a ku ´di ti belge û dokumentên fermî de navê ´kurd´ û ´Kurdistan´ê newê bikarhanîn û newê nivîsandin. Di roja me de jî, dewlet vê dike. Hinekî jî, nîqaşên di nava meclîsa tirk de ku li ser gotina ´Kurdistan´ê bûn jî, hinekî jî divê ku mirov ji wê vê yekê fahm bike. Lê rayadarên dewletê, weke ên hikimeta AKP´ê û hwd, di nava gel de gotina "birayê min ê kurd" û hwd bikardihêne. Weke ku di gera birêz Berzanî a li Amedê de gotina "herêma Kurdistan"ê û hwd bikarhanî. Lê ev hemû jî, ne di temenê herêkirinekê de, lê di temenê xapandinaka ku di temenê politikayên xwe ên hilbijartinê de dike. Di hilbijartinên berê de "komir" û "makarna" belav dikirin û bi wê dixwestin ku piştgirîyê bigrin. ..

Ev jî, politikaya dewletê bû. Pêşî bi politikayên xwe faqîr û xizan dike û piştre wê faqîrî û xizanîya wan li dijî wan bikardihêne, bo serkevtinê. Di hilbijartinên buhurî de,

dît ku ev politikaya wê bisernekeve. Di vê demê de jî, êdî bo ku piştgirîyê bigrin û hebûna xwe li ser serê kurdan bidina domandin, ku diçina nava kurd, ji dev û b devkî gotina "kurd" û "Kurdistan"ê bikardihênin. Lê pirr bihey tevdigerihin ku ev gotinên ´kurd´ û ´Kurdistan´ê, nekevina ti belge û dokumentên fermî de. Hinekî jî, em divê ku wan nîqaşên di meclisa tirk de ên di di derbarê gotina "bakûrê kurdistanê" û û ankû "Kurdistan"ê de, hinekî di vê temenê de fahm bike. Di meclîsa tik de, di dema nîqaşên li ser ´bûtçe´yê de parlamenên kurd Hasip kaplan û hwd, gotina "kurd", "Kurdistan" û "bakûrê kurdistanê" bikarhanî. Lê di cih de, nîqaşên li ser "ûsûlê" dan destpêkirin. Piştre jî, di cih de, bi bûyîna yek ya AKP´ê, CHP´,ê û MHP´ê re xwestin ku gotina "kurd" û "kurdistanê" ji nava belgeyên fermî û dokumentên arşîvê ku werina derxtin.

Ev rengê politikayê, divê ku mirov hinekî li ser wê re çend gotinan bibêje. Di pretikê û jîyanê de, bo ku bikarhanîna navê ´kurd´ jî, biarmanca xapandinê ya. Heta roja me, tê gotin ku "gelek pakêtên demokratikî bo herêmê hatina derxistin. Lê win tenê di yekê jî ji wan de navê "kurd" û "Kurdistan"ê rastî wê nayên. Her wusa, heman tiştî ew divê ku wê pakêta ku qaşo, bi navê "pakêtê demokratîkbûnê" ku çendekê berî vekiirn û kurdan weke ´pakêta xapandinê´ jî bi nav kir, di wê de jî, di ti deverên wê de navê ´kurd ´, win rastî wê nayên. Hemû gotinên ku tên bikarhanîn jî, dervî fermîyetê dihên bikarhanîn. Piştre jî, bi politikayên dewletê, hewl tê dayîn ku ew ji jîyanê were derxstin. Bi vê rengî, êdî di ti belge û dokumentên fermî de win navê ´kurdan´ nabînin.

Di belgeyên berê de, ên destpêka komarê de ku hebûn jî, piştre hatina derxistin. Pirtûkên ku di wan de navê ´kurd´ û ´Kurdistan´ di buhurt, ji wan hatîya derxistin. Di vê temenê de, li ser temenê tûna hasibandin û înkare kurdan de sîyeset hatîya kirin. Bi wê re jî, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku destûra bingihîn a tirkî di temenê wê înkara kurd de hatîya nivîsandin. Di rewşên weke vê de jî, ku dikevina rojevê de, "ev ne li gorî destûrê û rêzikên wê ya." Bi vî rengî, Partîya AKP´ê jî, vê dike. Gelek caran, rayadarên AKP´ê jî, dema ku rewşên weke vê ketina rojevê de gotina ku "tiştek ji destê me nayê, di destûrê de dinivîsêne." Lê ev gotin, tenê xapandin a. Lê divê ku em vê jî bibêjin ku ên ku ew destûr nivîsandina jî, ew in.

Hertimî, ew destûr, derxistina ber kurdan. Bizanebûn, ev yek hatîya kirin. Zimanê kurdî qadaxa kirina, ku bahse zimanê kurdî û perwerdeya bi zimanê dayikê hatîya rojevê, gotina ku "di destûrê de dinivîsêne ku wê tenê perwerde bi zimanê fermî bibe û ew jî tirkî ya." BI heman rengî, di guharandin û qadaxakirina navên kurdî ên herêmê de jî ev yek wusa ya. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku bi vî rengî nivîsandina destûra bingihîn û bikarhanîna wê û bicihnekirin û ne hiştina bicûna navê kurd ´kurd´ û ´Kurdistan´ê jî di ti belge û dokumentên fermî de, di vê temenê de divê ku mirov bi hevdû re di temenê zihniyetê de fahm bikin. Di sale 2011´an de ku rojava zimanê dayikê de Ahmed Turk ku li meclîsê di civîna koma partîya xwe de, çend gotin bi kurdî gotibûn, hingî weşanên tv´ya meclîsê jî hatibûbûna birrîn. Bi wê rengê, hemû arşîvên ku bi nivîskî bê û bi awayên din bê, ji hemûyan pêşî navê ´kurd´ û ´Kurdistan´ê hatîya derxistin û piştre ew arşîvkirin bûna. Ev, weke rêbazek û prensibeka rejimê ku li ser temenê înkare kurd hatîya pêşxistin a.

Rayadarên hikimeta AKP´ê, di meclîsê de, herî zêde, ew li dijî gotina ´kurd´ û ´kurdistanê derketin di nava nîqaşên meclîsê de. Lê ku derdikevina nava xalkê jî, bêî ku şerm û fihêt bikin jî, bahse ´kurd´ û ´ heta ´Kurdistan´ê jî dikin. Ev rêbaza ku di jîyanê de bikarhanîn û lê ne hiştina ku di ti belge û dokumentên fermî de bibe navê ´kurd´ û

´Kurdistan´ê, divê ku mirov wê aliyê pirr baş li ser bisekinê. Ev rengekî, îstismarkirin ê rejimê ya ku hikimeta AKP´ê jî di dema xwe bikardihêne ya. Minaq, di vê dema hilbijartinê de, winê ji devê T. Ardogan jî û rayadarên din ên hikimetê jî û namzetên wî ên ku wî bo herêmên kurdan bijartina, winê navê ´kurd´ di vê demê de pirr zêde bi bihîzin. Lê weke ku li meclîsa tirk jî hat ditin, bo ku di ti belge û dokumentên fermî de bicih nebê jî, di nava kar û xabateka mazin de na.. Dijberîyeka mazin didina nîşandin.

Ev rengê di jîyanê de bo ku kurdan bi wê bixapênin bikarhanîna navê ´kurd´ û ankû gotinên weke "birayê min ê kurd" û hwd û an jî kû weke T. Ardogan bixwe jî di gera birêz Berzanî a li Amedê de bikarhanî "herêma kurdistanê" û hwd jî, di temenê politikayên wan ên di bin kontrolê de hiştinê de dihên kirin in. Bi wan gotinan di jîyanê de, di nava kurdan de bikardihênin û bi wê dixwezin ku xîtabî hêstên kurdan bikin û bi wê bikina bin kontrolê de. Yanî, ev gotinên ku bi vî rengî di nava kurdan de dihên bikarhanîn di temenê "politikaya kontrolkirinê" û "di bin kontrolê de hiştinê de" dihên dihên kirin. Bi wan gotinan, di jîyanê de poliitîkaya xwe birêve dibin. Bi wê politiaya kontrolkirinê û ankû di bin kontrolê de hiştinê de jî, dixwezin ku li gorî wê destûra bingihîn di temenê înkarê de bi rêve bibin.

Em di temenê "politikayên kontrolkirinê" bikarhanîna gotinên ´kurd´ û ankû ´Kurdistan´ê jî, di nava çapameniyê de jî wê bi kîjan rengê nivîskarîyê bidina nîqaşkirin û wê çawa bidina niqaşkirin jî, ew jî ji destpêkê ve dihê kifşkirin. MInaq, çend nivîskarên dewletê ên di rengê çar bi car xwe weke "dostên kurdan" jî bi nav dikin, bi rêya wan nîqaş dikin. Nahêlin ku hemû beşên nivîskaran jî wê nîqaş bikin. Ev beşkirina li ser nivîskaran jî, wusa dihê ditin ku li gorî hin "rengna" hatina dîyarkirin û wan re hatîya gotin ku wê kîjan di kîjan çerçoveyê de gotinê bibêje. weke ku çawa ku dewlet, herêmên kurdan ên bi bi tememî hatina asîmlekirin weke "herêmên sipî", herêmên ku nîvê wan hatîya asîmlekirin weke "herêmên zer" û her wusa herêmên ku hê hinekî kurdîtiya xwe diparêzên, ên weke Nisêbînê, şemzînan, gever, Cizîr, Şirnax û hwd jî, di temenê "herêmên Sor" de bi navkirina û li gorî wan beşkirinan politikayan kifş dike û diek merîyetê de, herwusa em di heman rengî hin kifşkirinan di nava nivîskarên tirk de dibînin. Ev di temenê beşkirinên nivîskarên tirk de bi ên ku xwe "dostê kurd" binav dikin, ên ku di rewşeka navê de hatina hiştin û ên ku bi tememî tirkitiyê dikin û rengê wan di dîtinê û nerînê weke ku vajî ên ku xwe weke "dostên kurd" didina nîşandin in, lê ku di temenê konseptekê bi hevdû re di temenê wê kontrolkirin û li gorî tirkiyatiyê bi rêvebirina civatê kar dikin, em wan kifş dikin û dibînin. Di vê rewşê de, rewşa "nivîskarên kurd" jî, pirr hazîna ku bi nivîsandina(´nivîsandina wan bi zimanê tirkî û bi wê ferzkirina zimanê tirk li ser civate kurd) wan û hwd, di wê rewşa li demê belavkirina jenosîda kurdan de ew lingekî giring in bo birina sêrî ya wê jenosîdê bo dewletê, ku bi zanebûnî bê û ne bizanebûnî bê. Ev rewşên ku em dikarin bi gelek rewşên din re jî kifş bikin û bi wan re werênina ser ziman, hemû jî di temenê politikaya "kontrolkirinê" û ankû "di bin kontrolê de girtinê" de dihên meşandin in.

Lê li vir, divê ku em vê yekê bibêjin ku di temenê ´nivîskarîya dewletê´ de, hemû çerçoveya wan ´tirkiyatî´ ya. Wê çawa, wê tirkiyatiyê serdest bikin û li gorî wê bidina meşandin bi politikayên dewletê re, li gorî wê dihê hizirîn. Em dema ku van aliyên politikî ên politikayên dewletê nebînin û fahm nekin, ku tevî ku tenê li ´bakûrê kurdistanê´ ku ser 20 milyonan re kurd dijîn, ku lê winê di navê wan weke ´kurd´ û ´Kurdistan´ ti belge û dokument û her wusa di arşîva meclîs û hwd de bê, ku nabînin. Ev

jêbirina navê kurdan ji hemû belge û dokumentên fermî, hinekî jî di temenê wê politikaya dewletê de divê ku mirov lê binerê û fahm bike. Ev ne tenê helwesteka. Ji wê zêdetir, ev pergeleka ku lingên wê ên li ser sîyesetê, çapameniyê û nivîskariyê, saziyên dewletê û arşîvên û hwd re hena ya. Em divê ku van lingên wê hemûyan bi hevdû re di çerçoveya ´înkare kurdan´ û her wusa "jenosîda kurdan" bi hewldanên ji dîrokê birina civate kurd re fahm bikin. Qadaxaya li ser zimanê kurdî ku hê didomê û ne hiştina perwerdeya bi zimanê kurdî, divê ku mirov di wê çerçoveyê de fahm bike. ..

Bêgûman, dema ku em vê hlwesta hikimeta AKP´ê lê bikolin, divê ku em dîroka komarê jî ku di nav de, dîrokeka dirêj ya ku di temenê înkare kurdan de hatîya nivîsandin û bi wê bi dehan komkujiyên kurdan hatina kirin, divê ku mirov werêne ser ziman. Li vir, ez dixwezim ku balê bikişênima ser vê jî. Di dema ku balefirên rejima tirk herêmên Qandîlê didane ber bombabaranê, bi dehan sivîlên kurd di ancama wan bombabaranan de jîyane xwe de ji dest dan. Malbate kurd ku li herêma Ranya ku di wê bombabarandina balefirên rejima tirk de hat qatilkirin û ku pitika bi navê "Solîn piçûk" ku bû weke sembola wê, dema ku ji aliyê balefirên rejima tirk ve hat kirin û ku piştî ku komkuji di çapameniyê de cihgirt, fermandarîya tirk hingî denezenek weşand û got "me ne kirîya." Bi vî rengî, hertimî, înkarkirin, hatîya bijartin. Lê ev rengê înkarê, bo ku ji bo wan komkujiyan ti belge bi fermî nebin jî dihên kirin. Yanî, bi rengekî ew li demê belavkirina ´jenosîda kurdan´, bo ku bo wê ti belge û dokumentên fermî di dîrokê de dibin, ev dihê kirin. Heman politika ku di van rojan de salwegera wê tê komkujiya roboskî jî, di wê komkujiyê de heman rêbaz hat hilbijartin. Wê çawa, bêî ku belgeyek fermî di derbarê wê de were çêkirin wê were ji holê rakirin û jibîrkirin û ji jîyanê dûrkirin, di wê temenê de dewlet saziyên xwe yên dadî û sîyesî bikarhanî û helwestek bo wê da nîşandin. Ev rewş, di hemû beşên jîyanê de dihê meşandin. Ew nîqaşên di meclîsa tirk lis er gotina ´Kurdistan´ê ku hatina kirin û piştre ku hikimeta AKP´ê bi lez û bez ket nava hewldanê de bo ku navê "kurd" û "Kurdistan"ê ji nava arşîvê derxê jî, tenê alî û lingê wê yê meclîsê diafirêne.

… **Berî** nûha car bi car, hin rayadarên hikimeta tirk, digotin ku "li almanya jî, beyenî hena", "li firansa jî beyenî hena", "lê yek jî ji wan bi dest şerê çekdarî nakê" û hwd, gelek hatina gotin. Di van rojên ku bahse ´vekişîna´ hêzên kurd dihê kirin de, ji dev Abdullah gul tê gotin "derfeta çêkirina destûraka ji holê rabûya." Bi wê re jî dîsa ji devê heman mirovî tê gotin ku "dewlet dewleta tirk a. Li Almanya jî beyenî hena". Dema ku ev gotin, em lê dinerin, em dibînin ku di hildina li dest ya mijarê pirsgirêka kurd de, dewlet ne xwediyê çareserîyeka ji dil a. Yanî kurd, li ser axa na û ew tên şibandin li beyenîyên ku ji welatên afrîqa û Asya û hwd weke pêneber ku diçina van welatan. Ev jî, bi serê xwe gotinaka û nêzîkatîyaka ku divê ku di serî de were şermazara kirin a.

Kurd, xalkê wê axê hêrî kevn a. Dema ku kurd li hebûn, dibêt ku navê tirkan jî li ser rûyê ardê tûna bû. Î ro, di destê me de bineter hena ku navê kurd bixwe jî bi rengê "kurda", "kurd" û hwd ji di dema gûtî, hûrî û mîtannîyan bixwe de jî dihê bi karhanîn. Yanî, ev nav bi xwe re jî, pirr kevn a.

Ev çi dide nîşandin? Ev dide nîşandin ku ev gel, dîroka wê berî zayînê bi hazar salan jî hebûya. Lê piştî zayîna Îsa, wê kom bi kom komek were û li welatê wan bicih bibe û piştre bibe xalk û piştre wê rabê û bibêje ku evder "warê tirk a" mafê ti kesekî lê tûna ya." Ev gotinên ku dîrokê qaydkirina na. Î ro jî, bi heman rengî gotin tên gotin.

Heta nûha dihat gotin ku "herkesek tirk a." Piştre ku pêvajoya tekoşîna kurd dest pê

kir, ev gotinên wan êdî vala derketin. Lê hê jî, gotinên di temenê nêzîkatîya wê de, dihên gotin û bi nîjadperestî. Gotina "dewleta tirk", bi navê "tirk" hanîna li ser ziman navê dewletê bi wê re salixkirin û dayîna naskirin û watekirin, rengekî din yê nîjadperestî û înkarê ya. Gelê kurd, çawa dibê ku ew warê wan dibê dewleta tirk? Gelê kurd, berî ku tirk werina ser van axan bi hezaran salan jî dijîn. Lê mixabin, kurdan, mirovatîyek kir û alikarîyek di dema Îdrîsê bedlîsî de da van komên ku hatina herêmê û piştre ku ew pêşketin, piştre navê kurd bixwe jî li ser axa wan înkar kirin.

Di rengekî ku weke pênebarên ku ji welatên afrîqa û Asya çûna welatên ewropa bi sedemên şer û ankû aborî û hwd, şibandina wan, ji bêahlaqî û bêmirovatiyekê pêde ne ti tiştekî din a. Cihê vê gotinê, di ti ahlaqê û felsefeyê de jî tûna ya. Mirovek û ankû zihniyetaka ku nesibê xwe ji mirovatiyê girtîbê, wê ti carî gotinê bi vî rengî neyênina ser ziman, û mirovên cih û warên wan nekin û ankû mirovên ku li cih û warên xwe dijîn, wê weke "penaber"ên almanya û firansa nedina nîşandin. Ji mirov û ankû zihniyetekî ku ev şibandin kir, divê ku mirov hêvî mirovatî û ahlaqê mirovatiyê nekê. Çawa ku divê ku mirov ji Hîtler hêvî mirovatiyê, divê ku nekê, her wusa ji vê zihniyetê jî divê ku mirov hêvîyê nekê. Ev zihniyet. zihniyeta ku pirsgirêka kurd heta roja me hanîya. Di ancama vê zihniyetê de, bi de hezaran ciwanên ku kurd bin û ku tirk bin hatina qatil kirin.

Heta roja me, vê zihniyetê gotîya ku "kurd tûna na". Heta roja me, vê zihniyetê zimanê kurdî qadaxa kirina. Heta roja me, vê zihniyetê ne hiştîya ku kurd li ser axa xwe tenê dibistanekê jî ava bikin û xwe pê bi zimanê xwe yê dayikê perwerde bikin. Yên ku ev dij-mirovatî kirîya ev zihniyet a. Ev zihniyeta ku hemû tiştî û rewşê bi navê nîjada tirk bi wate dike û dibêje ku "hemû tişt û welat yê tirk a" û mirovên din ên ku dijîn weke ku hin rayadarên dewletê di destpêka dewletê de gotibûn ku "yên ku ne tirk ku di vê welatî de dijîm tenê mafekî wan heya ku xulamtiyê ji milletê tirk re bikin." Ev zihniyeta ku bi gotinên Abdullah gul, tê dîtin û xwandin, ji vê zihniyeta ku bi vê gotinê tê dîtin û xwandin, ne cûdatira û ti farq di nava wan de tûna ya.

Pirsgirêka kurd, dema ku em bahse wê bikin, divê ku em bibêje ku ji ber ku navê kurdan li welatê wan ji wan bixwe re jî hatiya qadaxa kirin. Ji ber vê yekê, pirsgirêj derketîya. Hê jî, ew didomê. Tevî ku em î ro di sale 2013´an de dijîm jî, hê jî qadaxaya li ser zimanê kurdî didomê û mafê kurdan tûna ya ku bi zimanê xwe yê dayikê perwerdeya xwe bingihîn bibînin. Ev zihniyeta rejima tirk ku hertiştî bi "tirkitiyê" şîrove dike û dihêne ser ziman, di temenê vê pirsgirêkê û afirandina wê de ya. Bi gotinaka din, em dikarin vê rewşê bi gotinaka din şîrove bikin, tê gotin ku yekî ku bi mêhvanî ku çûyî malekê, li malê pêşî xwediyê malê dikujê, piştre tecewûzî jina malê dike û piştre jî ku tecewîzî jinê kir wê êdî wê jî bikujê û li wê malê xwedî derkeve û bêje ev male min a. Zihniyeta rejima tirk, ev zihniyet a û zihniyetê û pêde ne ti tiştekî din a. ..

Zimanê kurdan hat qadaxa kirin, Dîroka wan hat belevajî kirin. BI vê yekê, hat xwestin ku xêv(memory)a wan were jêbirin û ew werina kirina tirk. Î ro jî, ev rewş bi heman rengî didomê. Divê ku mirov herê bike ku zihniyeta ku di temenê pirsgirêka kurd de, ew zihniyeta ku navê kurdan qadaxa kiriya û zimanê wan qadaxakiriya û bi wan û nirxên wan hemû ku bişavtina û ankû asîmle kirina ya. Divê ku mirov car bi car bi car bibêje ku hê jî înkar di zihniyetê ne buhurî ya. Şibandina kurdan û rewşa wan li çend pênaberên ku ji welatên Asya û Afrîqa ku çûna welatên ewropa ên weke almanya û Firansa û hwd, tenê înkar a. Wê çaxê, divê ku mirov bipirsê, ku kurd weke mirovên ku

ji welatên afrîqa û Asya hatibibina tirkiya, divê ku bibêjin ku ji kîjan welatên cihanê hatina, wê jî bibêjin. Madem kû, rayadarên tirk derdikevin û dibêjin û rewşê dema ku îzah dikin, wî çaxî, divê ku em dîroka tirkan û ya kurdan li herêmê li berçav bigrin û vê pirsê jî bikin ku ka kurd ji kûderê hatina welatê tirk. An jî, em divê ku pirsê bi vî rengî bipirsîn ku kî hatîya welatê kê? ....

Ev zihniyeta ku bi gotinên Abdullah gul re, dihê dîtin, divê ku mirov ne zihniyeteka çareserîyê ya. Zihniyeteka ku dixwezê ku hê jî di nava tirkiyê de bihalêne. Çend ku dibêje ku "ku nexwezin, em nikarin bi zorê bikina tirk" jî, dîsa ev gotinên weke maske na. Di rojekê berî roja ku weke roja ku hatîya ragihandin ku wê hêzên kurd wê hêzên kurd bo ku derfetekê bo çareserkirina pirsgirêka kurd ku were çareserkirin bê afirandin ku divekişihin, hanîna li ser ziman ku êdî "derfeta çêkirina destûreka nû ji holê rabûya." hinekî jî, divê ku mirov bi vê zihniyetê û înkare kurdan û ew nîjadperestîya ku li gorî wê ew înkar hatîya kirin, divê ku em li gorî wê şîrove bikin. Ev zihniyet, di serî de, zihniyeteka ku were şermazar kirin û lenet kirin a. Kurd, li ser axa xwe dijîn. Çawa dibe ku kurd li ser axa xwe dijîn, dibina weke pênaberên afrîqî û Asyayî ku tên welatên ewropa û firansa û hwd? Ev zihniyeta ku kurdan li herêmên wan, wan weke pênaber dibîne, me berî nûha bi zihniyeta rejima baasê re dît ku li rojavayê kurdistanê bi sadhezaran kurd bênasnema jî hiştibûn.

Li vir, divê ku mirov vê pirsê jî bipirsê. Dema ku herêmên kurdan ên kurdistanê jî win di nav de bihasibênin û bêjin "dewleta tirk" û bi vî rengê hertiştî bi tirkitîyê bênina ser ziman, wê çaxê, divêt ku mirov bibêje ku gotina "dewleta tirk" û gotinên berê ku di temenê înkara kurdan û xalkên din de ku dihat bikarhanîn û dihat gotin ku "herkesek tirk a", çi farq di naqabîna wan de heya. LI wir, bi gotina "herkesek tirk a", herkesek weke tirk dihanîn ser ziman. Bi gotina "dewleta tirk" jî, ku rastîyên dîrokî ya gelên herêmê hemû tên înkarkirin û tên ji dîrokê birin di bin navê gotina "dewleta tirk" de. Yanî, bi kortasî, di zihniyetê de ti guharîn nebûya. Hê jî, di temenê wê înkarê de tê nerîn. Kurdek, li ser axa xwe ku doza mafê xwe dike, berê rayadarên tirk derdiket ber çapameniyê û got ku "ev maf xwestin li almanya û ankû li firansa tûnaya", Û ankû dihat gotin "fransa û ankû almanya, ev maf ji beyenîyan re nas nekirina." Di vê zihniyetê de, nêzîkatîya kurd tê dîtin, hemû tişt bi nîjadperestîya tirkitîyê tê ser ziman. Yên ku dervi tirk in û ankû ne tirk in jî "beyenî" na. Ev zihniyeta ku gelekî weke gelê kurd, ku li ser axa wan weke beyenîyan wan bêne ser ziman, zihniyeta kujar ya nazîyan a. Gelê kurd, çawa li ser axa xwe û li herêmên xwe ku dijîn, dibina beyenî? Ev nêzîkatîya ku divê ku pirr li ser were sekin in, zihniyeteka nîjadperest û nemerd ya dij-mirotaviyê ya. Ev zihniyeta dij-mirov û nemerd, heta roja me, xwûna kurdan bo kurd in rijandîya.

Ev zihniyeta ku gelekî weke gelê kurd, gelê herêmê yê herî kevna ku weke "beyenî" dibîne û dixwezê ku wusa bide rewakirin, gelo wê çawa di zihniyeta xwe de çareserîya bi mirovatî pêş bixe? Gelê kurd ne beyenîyê wê axêyê. Ew, ji wê axê ya. Ev zihniyeta rejima tirk ku kurdan li ser axa wan û li herêmên wan weke beyenîyên ku ji welatên afrîqa û Asya hatina welatên ewropî ên weke Firansa û almanya û hwd ku dibîne, û zihniyeta rejima baasê ya ku kurd bênasnema jî dihiştin, yek in û weke hevdû na. Çareserîyên ku ji vê zihniyetê derkevin jî, wê ne li gorî rûmeta mirov bin. Wê qadaxaya ziman û navan bê. Wê li darxistina oparasyonên leşkerî û sîyasî bin. Wê kirinên wê bi hewldanên xapandinê bin. Dîsa ya ku yên bi hezaran kurdan di zindanan de dide hiştin ev zihniyeta.

**Bi çêkirina bendavan re dîrok û mejûya herêmê bi civatîtîya wê re tê xwestin ku were ji holê rakirin. ..**

Di van rojên dawiyê de, weke mijareka ku herî zêde dikeve rojevê de lezdayîna çêkirina bendavan a. Car bi car, dema ku li ser bendavan, nîqaş tên kirin, bi teybetî, tê gotin ku "dewlet, bi vejen(**enerjîy)ê** wan çê dike." Her wusa, dema ku di çapameniya kurd de jî, bahse çê kirina wan tê kirin, tê gotin ku "bi armanca pêşî lê girtina tevgerîya gerilla ew bendav tên çê kirin." Ev herdû alî û gotin ne xalat in. Lê ev herdû û gotin jî, armanca sereke ya dewletê ya bi çêkirina bendavan re bi tememî nayênina ser ziman. Ji wê zêdetir, dewlet, armanca wê, sereke dîroka herêmê û bi teybetî dîroka xalkên herêmê ji holê rakirina wê ya. Yanî, weke şerekî dewletê û rejimê ya li dijî dîrok û mejûya gelên herêmê jî em dikarin bendavana bi nav bikin.

Bi teybetî, herî zêde, li herêmê botanê li herêma Şrnaxê û li herêmê Dersimê û li herêmê heskîfê û hwd, çend ji wan herêmên dîrokî ên giring in. Dewlet, bi vî rengî, bendavan, di temenê projeyaka dîrokê ya ji holêrakirin û ji dîrokê birina dîrok û navê gelan van bendavan bi kardihêne. Bi vê rengê divê ku mirov bibêje ku bendav, weke cûreyekî şerê dewletê ya li dijî dîroka kurdan û bi teybetî li dijî civata kurdan. Di vê temenê de, divê ku mirov hilde li dest. Bi teybetî, ji ber ku herême heskîfê pirr tê nasîn, li ser wê tê nîqaşkiirn. Lê bendavên ku li herêma Şîrnaxê ku tên çêkirin, bi teybetî, herêmên dîrokî ên giring tên hilbijartin û tê xwestin ku ew di bin avê de werina hiştin.

Herêmên li Dersimê jî, herêmên pîroz ên bo kurdên elewî tên binavkirin bi çêkirina bendavan re. Bendavên li dersimê ku tên çê kirin, em dikarin, di temenê windakirina tirba Sêd Riza de fahm bikin. Ji bo kurdên elewî windakirina tirba Sêd Riza tê çi wateyê, her wusa, divê ku mirov giirngiya wan bendavan jî bi wî rengî, bêne ser ziman.

Li herêmên kurdistanê, heta nûha, cihên ku bo çêkirina bendavan hatina hilbijartin, ku dema ku em li hemûyan jî binerin, divê ku em bibêjin ku cihna dîrokî na. Yanî jî, cihna pîroz in bo mirovên herêmê. Bi wê re jî, bi çê kirina bendavan re sê tişt li herêmê armanc tên girtin. Yek; cihên ku bi kevneşopî pirr giring in, du; cihên ku dîrokî na, sê; cihên ku giringiya wan di bawerîya mirovên herêmê de hena. Bi vî rengî, ev di serî de, dewlet li belge û dûkomentên dîrokê dinerê û dibîne ku ka kûder giring in. Piştî ku kifşkir, êdî piştre diçê bi ser wan de. Di nava şerê ku dewletê ku li kurdistanê dimeşand de jî, car bi car top diavêtin cihên dîrokî û ewder tarûmar dikir. Piştre digot ku "bi şaşî bûya." Lê ev ne rast bû. Ev jî, weke rêbazekî dewletê ê ji holê rakirinê bû.

Li herêmê, bi wê re jî, temenê civate kurd tê armanc kirin. Herî zêde, cihê ku lê dîrok pêşketîya, ew tên armanc kirin. Bi wê, divê ku mirov bibêje ku weke rêbazaka bêmirovkirina herêmê jî tê bikarhanîn. Lê dewlet jî, dizanê ku dema ku mirov ji herêmê

werina ravandin û goçkirin ji herêmê bibê jî, wê mirov piştre vegerihina li herêmê. Bo vê yekê, di serî de, dema ku dewlet, wan goçkirinan dide kirin, di serî de, weke tedbîrekê jî ku ew ji aliyê xwe dihilde, hemû cihê ku weke nirx in û wan bi herêmê ve girêdidin, ew tên armanckirin û ji holê rakirin. BI vê yekê re, êdî piştre, bi tememî dihê xwestin ku ew êdî nema werina herêmê. Bi vê rengê, weke politikayaka dewletê ya teybet heya. Ev politikaya dewletê, bi teybetî, dema ku em bahse wê dikin, di çapameniyê de qat bi qat tê ser ziman. Carna em dibêjin ku "dewlet, dixwezê herêmê bêmirov bike." Carna din jî, em dibêjin ku "dewlet, cihên pîroz armanc digrê bo ku wan dibin avê de bihêle bi çêkirina bendavan re." Carna jî, em dibêjin ku "dewlet, bo ku tevgerîya gerîlla kêm bike bendavan çê dike." Ev gotin hemû rast in. Lê hemû jî, çend ku bi serê xwe nêzîkatîyeka û politikayaka dewletê dihênina ser ziman, her wusa bi wê re jî, ev kirin hemû bi hevdû re tenê armancaka wan heya. Ew jî bi sereke mirov dikarê bi rengê ji holê rakirina temenê civatîtîya kurd bêne ser ziman.

Yanî, li vir, ev çêkirina bendavan, bi şer re kevilkirina herêman, şawitandina gundan, di bin avê de hiştina cihên olî ên pîroz weke ku li dersimê dibê û hwd dibê, hemû di çerçoveyekê de dibin. Ev çerçova jî, temenê civatîtîya kurd ji xwe re armanc dike. Yanî, nîqaşên ku tên kirin û li ser bidest xistina elektirkê û hwd re jî, tenê nîqaşna ku ji bo dewletê û wê politikaya wê bixwe jî dibina weke perdeyekê ku di bin xwe de diveşêrên.

Dewlet, oparasyonên leşkerî û sîyesî, çêkirina bendavan û valakirina gundan, ji holê rakirina cihên dîrokî û ên ku pîroz in bo mirovê herêmê û hwd, di çerçoveyeka ku bi wê dihê xwestin ku civatîtîya kurd were ji holê rakiirin dihên kirin.

Dema ku em çêkirina bendavan, tenê bi sedema bidestxistina elektirkê bênina ser ziman, emê ji aliyekî ve bina alîkarî jî ji dewletê re ku em ser wê kiryara wê ya biqirêt ser binûxûmênin. Dewlet jî, hertimî, dixwezê ku sedemekê ji wan kirinên xwe re, bibîne ku armanca xwe di bin wan de bide veşartin. Vêca, dema ku em ji vî aliyê ve bahse wê bikin û bibêjin bi armanca bidest xistina elektirkê ya, emê ji vî aliyê ve jêre bina alîkar ku ew politikaya wê ya bi armanca ji holê rakirna temenê civate kurd ji berçav bidina dûrkirin.

Li vir, divê ku em vê bibêjin, hinek nirx û tiştên ku weke xarcên civatê na ku wê didin afirandin hena. Ew jî, nirxên ku bi dîrokê re afirîna, cihên pîroz û nirxên baweriyê na û her wusa dîrok û mejûya ku hatîya jînkirin û şûnpêyên wê na. Ew şûnpêyên dîrokî jî, her wusa, bi cihên dîrokî re, em dikarin bahse wan bikin. Dema ku civat li wan cihan dinerê, pêşî, wê hinekî jî mejûya xwe bibîr bike û hizir bike ku ew demên berê ên wê çawa jîyankirina. Wê fahm bike ku ew xwediyê çi hizrê û bawerîyê na. Bi wê re jî, wê tenê van aliyan hemûyan fahm bike, wê di derbarê xwe û hebûna xwe de jî bi dîrokê û wê fahmkirina wê dîrokê re wê bê xwediyê têgihiştinekê. Ya ku li vir, armanc tê girtin bi bendavan re, ew a ku ew nirxên ku civatê ku li şûn xwe nerî ku li wan binerê ku bo ku xwe û dîroka xwe fahm bike, ew tên ji holê rakirin. Bi wê re jî, hewl tê dayin, ew cihê ku civat ku lê dinerê were xûrûxandin. Êdî bi vî rengî, dema ku ew dîrok hat ji holê rakirin, wê pêşî derbeyek li wê temenê civatî ê ku civat xwe bi wê diafirêne wê were xistin. Hinekî jî, dema ku bendav tên çê kirin, ev alî hemû tên hizirkirin. Her bendav, dema ku biryara çê kirina wê tê dayin, pêşî wê cihê herî giring ê bi vî rengî wê were kifşkirin. Li ser wê re jî, êdî li ser wê re biryar were dayin. Wê bi wê re jî, hewl were dayin ku were dayin ku werina ji holê rakiirn.

Minaq, ev vê yekê bibêjim, bi teybetî, gelek cihên li herêma Şîrnaxê li wan bendav

tên çê kirin, berê jî ne hatîya hiştin ku li wan kolanên arkolojikî werina kirin. Her herêma ku dibin avê de dihê hiştin, Berê li wanderan jîyan bûna, û li gelek deverên ku di bin avê de tên hiştin, bajarên demên berê, minaq ên dema sûmerîyan û hwd, ên dema gû, hûrî û mîtannîyan û hwd hena. Dema ku ev bajar bi kolanên arkolojikî werina derxistin li holê, ez karin ji sadî sad bibêjin ku wê li cihna pirtûkxaneyên mazin ên ku di wê demê de hatina afirandin û piştre ku ew êdî piştre wusa mana di wan bajaran de, wê derkevina li holê. Minaq, ji ber çi nayê hiştin ku li Heskîfê, ev kolanên arkolojikî werina kirin, wê li gelek cihên wê, wê rewşna bi vî rengî wê derkevina li holê. Li gelek herêmên li herêma botanê ên ku di van rojên dawiyê de ku dikevina çapameniyê de ku tişî av jî kirina, li wanderan gelek bajarên ku bi arkolojikî ku divê ku werina derxistin li holê hena û ew di bin avê de hatina hiştin. Li wanderan ku lêkolîneka ji rêzê bihata kirin, bi wê tenê li wê herêma şîrnaxê, wê deh qat ji wan nivîsên bizmarî ên ku tên gotin ên dema sûmerîyan ku hatina dîtin û heta nûha ku hatina xwandin, wê werina dîtin. Ev dikarim bêjim ku tenê di bin wan bendavên li herêma şîrnaxê, dehqatî wan nivîsên bizmarî ku hatina dîtin hena. Li herêma şîrnaxê ku heta ku digihijê ber diclê û ankû heta ku digihijê Cizîrî û Nisêbîn û Hazaxê û hwd, li wê qadê, ji bo ku ev rastî newina dîtin, dewletê, bixwe, car bi car hin komên leşkerî di rengê hin komên arkolojikî de didan ava kirin li gelek herêman, tiştên ku ditîn, li wir dihatina winda kirin. Tenê, di wan lêkolînên xwe bixwe de jî, dewletê bixwe jî dîtiya ku li gelek deveran, gelek bajarên ku î ro dibin axê de an û ku divê ku biarkolojikî werina vekirn û lêkolîn li wanderan bo fahm kirina dîroka herêmê werina kirin hena. Lê pêşî, ew herêm, tên kifşkirin ku bi teybetî, ew herêm, tên bijartin bo ku di bin avê de werina hiştin.

Bendav, bi vî rengî, divê ku mirov bibêje ku rengekî ku bi wê armanc dike ku temenê civatî ên li herêmê ku werina ji holê rakirin a. Di van rojên dawiyê de ku şer disekinê, dewlet bixwe êdî di cih de lezê dide wan bendavan. Armanc, bi teybetî, ji holê rakirina civatîtîyê ya. BI teybetî, armanc tê girtin bo ku cihên ku li wan dîrok bûya ku em dikarin her cihekî ji wan weke Akropoleka yewnanîstanê ku em dikarin bihasibênin li vir dibin avê de dihên hiştin.

.. **Pêvajoya** yekemin, pêvajoya vekişîna hêzên leşkerî û avakirina komisyonan û hwd bû. Aliyê kurd, tevî hemû astengîyên ku dewletê û hêzên ji wê ji wan re derxistin jî hema bêja bi dawî bû. Mijara komisyonan jî, bi hemû kêmesî û ne têrîya xwe bû. Lê mirov nikarê bêje ku komisyonên ku dewletê di vê pêvajoyê de avakirin bi tememî bersiv dane pêvajoyê. Lê tevî wê jî, bi hemû kêmesîyên wê re komisyon avabûn û li herêman gerîyan.

Nûha jî qonaxa duyemin dest pê kiriya. Di vê konaxê de, karûbarê destûrî wê bê kirin. Wê gavên destûrî werina avêtin. Wê guharinên di destûrê de bê û her wusa ji nû ve nivîsandina wê bê, ew êdî wê bên kirin. Nûha jî, herkesek ji vê aliyê ve ji hikimetê li bendî gavavêtinê ya. Êdî gok li aliyê dewletê û hikimeta wê ya.

**Di serê de, karên ku weke ku bên kirin ev in. Divê ku pergale cerdewanîyê were ji holê rakirin. Hêzên leşkerî ji herêmê werina kişandin. Astengiyên destûrî ên li pêşîya perwerdehîya bi zimanê kurdî divê ku werina rakirin û kurd êdî divê ku dest bi avakirina pergale xwe ya perwerde bikin.**

Minaq, zagona bi navê "zagona tekoşîna bi terorê( terorle mucadela kanunu= TMK)" û hwd, divê ku werina rakirin. Ev zagon, weke zagonaka rewşa awerta ya salên 1990´î û hwd in. Çend ku piştî Salên 1990´î hat gotin ku "rewşa awerta(OHAL)" rakirin jî, lê di

kirinê û pretikê de bi zagonên bi vî rengî ew valahî hat dagirtin. Di wê demê de dadgehên bi navê "DGM" hebûn. Ew jî, qaşo rakirin. Lê li cihê wan "dadgehên cezaya giran" û "dadgehên teybet" û hwd, hatin bicih kirin. Bi wê re jî, tenê nav hatina guhartin. Î ro jî, "dadgehên teybet" hatina avakirin û di wê de sîyesetmederên kurd tên darizandin. "Dadgehên teybet", şeklekî din ên DGM´yên berê na. Yanê, di wê demê de dema ku nav hatin guhartin û ´DGM´ hat rakirin, li cihê wê ne tenê dadgehek hat avakirin. "Dadgehên teybet", "dadgehên cezaya giran" û hwd, çend ji wan dadgehên teybet ên ku bi teybetî li herêmên kurdan li cihê wê hatina avakirin in. Yanî, rewşa ku piştî DGM´yan re hat afirandin bi vî rengî, di aslê xwe de hê girantir û kûrtir kirin.

Di serî de, divê ku ev dadgeh jî, ji binî ve ji holê werina rakirin. Êdî, divê ku bi zêdeyî, ev jî werina rojevê nîqaşkirin. **Destûrên di temenê van dadgehan û hwd de, saziyên herêmê ên hûqûqî, dikarin wan bibina dadgeha ewropa, weke ku çawa dozên wan dadgehan dibin**. Bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku heta roja me, bi sadan dozên ku ji dadgehan derketina çûna dadgeha ewropa ya bilind´ û li wir bi çûn ve hatina vegerandin. Bi teybetî, ev dadgeh û zagonên di temenê wan bixwe de, ji xwe "teybet" in. **Ev dadgeh, rengekî şerê dewletê ê bi civate kurd re na**. **Mirov, divê ku zagon û hebûna van "dadgehên teybet", bi şerê artişê ê li kurdistanê re şîrove bike. Bi hevdû re, divê ku mirov wan hilde li dest. ..**

**Ev dadgeh, dadgehna ku bi destûrî û zagonî li gorî wê zihniyet û destûra dewletê ´înkare kurdan´ û înkare navê wan didin domand in. Hemû destûr û zagonên ku ev dadgeh li wan dinerin û li gorî wan didarizênin jî, destûr û zagonên di temenê nîjadperestîtîya tirkitiyê de ku hatina avakirin in, hertiştî û herkesekî ku weke tirk dihasibênin. Bi vê rengê, ev hatina nivîsandin. Li gorî wan destûr û zagonan jî, kurd bi navê xwe û çanda xwe û zimanê xwe çi bikin, wê li gorî van destûr û zagonan suc û ankû gunah bê. Her kirinên dervî tirkitiyê bi wan destûr û zagonan tên darizandin. Ne tenê navê ´kurd´ û navê welatê wan ´kurdistan´ û her wusa nivîsandina bi kurdî û xwestina perwerdehîya bi zimanê kurdî li gorî van destûr û zagonên ku di wan dadgehan de weke suc tên dîtin. Her wusa bi wê re, çi kirinên din jî hebin weke suc in. Li herêmê, di nava kurdan de, ji aliyê olî ve û ji aliyê çand û zimanî ve jî pirr cudahî hena. Ew jî, li gorî wê suc in. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku li herêmên kurdan, zagon û destûrên ku di fermîyetê de na, li rojavayê tirkiya yek jî ji wan ne fermiyetê de na. Ev dadgehên teybet û destûr û zagonên wan, tenê bo kurdan û kurdistanîyan hena.** Ev astengiyeka din ya li pêşîya pêşketina kurdan û pêşketina pêvajoya nû jî ya.

Heta ku ev zagon û destûr bi van dadgehên teybet re hebin, mirov wê nikaribê li herêmê bahse aramîyê bike. Di serî de, divê ku ev ji kokê ve werina rakirin. Bi teybetî, hemû darizandinên ku van ´dadgehên teybet´, divê ku ji aliyê dadî ve di ´hikmê nebûnê´ de werina dîtin û zirer û zîyane ku ji wan xalkê herêmê dîtî were dayîn.

Ji "dadgehên serbixwebûnê" û heta "DGM" û piştre heta ku tê ´dadgehên teybet´ û ´dadgehên cezaya giran´ hwd, ti biryar û darizandinên ku wan kirina, yek jî ne li gorî dadîya mirovî û rasti û rastteqîniyê na. Di aslê xwe de, divê ku komisyonaka rastteqîniyê ya dadê were avakirin û ji destpêkê heta roja me jî, van darizandin û biryarên van dadgehên teybet ên bi metingerî divê ku lê bikolê. Di serî de, divê ku kurd vê yekê bikin û divê ku ´dokum´eka van dadgehan ji serî heta roja me werê derxistin. Ev jî, wê aliyekî din ê giring bê.

Ev kirin û derxistina dokumeka bi vî rengî, wê ji bo pêşarojê jî giring bê. Wê, têgihiştinekê jî, di nava civate kurd de were çê kirin. Î ro jî, ji xwe, tişta ku li pêşîya pêvajoyê asteng a, ev a. Ev destûr û zagon, di vê pêvajoyê de, werina ji holê rakirin û li şûna wan rûpelekî nû were ava kirin. Li herêmê, ev yek, heta ku newê kirin jî, mirov wê nikaribê bahse aramî û aramîbûnê jî bike. Ji ber ku ne tenê ev dadgeh û hebûna wan ya ku di roja me de hena, weke temenê pirsgirêk û alozî û neramîyê hena. Her wusa, dîroka wan jî, biryarên ku girtina û darizandinên ku kirina jî, bi heman rengî temenê wê ne aramiyê na. Ew, hertimî jî, weke bendekê na. ..

Li herêmê, divê ku rewşeka nû ya dadî were û biafirê. Ew jî, divê ku mirovên herêmê bidestê xwe wê biafirênin. Divê ku ew karibin wê bikin. Weke ku çawa divê ku ew pergale xwe ya perwerde biafirênin, divê ku wê jî biafirênin. **Li kurdistanê, hemû dadgeh û destûr û zagonên wan, dervî vîn û hebûna gelê herêmê na. Rêzê ji nirx, çand û ziman û dîroka herêmê re nagrin. kevneşopîyên xalkên herêmê li berçav nagrin. Rêzê ji wan re nadina nîşandin. BI her awa û rengê xwe re li dijî wan in. Hemû dadgeh û destûr û zagonên wan, destûr û zagonên tafisandina serhildane gelê herêmê ya bo maf û azadîya xwe ya. ..**

Ev qonaxa duyemin ya pêvajoyê, divê ku di wê de ev alî hemû werina ser ziman û li ser wan nîqaş bibin. Di serî de, di vê qonaxê de, divê ku komisyonaka ji mirovên dadvan û ankû hûqûqvan were ava kirin û bi wê dîrokê jî raxê li berçav. Divê ku dokûmeka vê dîrokê, ev komisyon derxê. Bi wê re jî, serî de û weke karê pêşî, ev destûrên ku di bin navê "terorê" de ku li dijî kurdan hatina avakirin, divê ku wan kifş bikin û bênina ser ziman. Bi wê re jî, ji aliyê hûqûqî û ankû dadî ve wê nêzîkatîyaka rast çawa bê, bi wê re perspektifekê jî dikarin bo wê bênina ser ziman. Wê ew perspektifa dadî û ankû hûqûqî, wê tenê bo pêvajoyê watedar bê. Wê tenê, astengiyên li pêşîya pêvajoyê ji holê ra bike. Herwusa wê nêzîkatî û zihniyeta xelal û şaş jî razê li berçav. Bi wê re jî, ya rast çawa ya û divê ku çawa bê, wê di derbarê wê de di serê mirovan de hizir û têgihiştin û hişmendî biafirê.

Ev qonax dûyemin, bi teybetî, wê bê weke qonaxaka destûrî jî. Dewlet, di xwezê ku pêvajoyê li gorî xwe bibe sêrî. Li herêmê avakirina qarakolan û bendavan û hwd, li dijî gîyane pêvajoyê na. Divê pêvajoyê bi aliyên destûrî re jî, divê ku ev alî jî li ser wan were sekin in û werina teşîr kirin. Dema ku li herêmê dewlet qarakolan ava bike û qadroyên cerdewanan ên nû derxê, wê temenê nîqaşên bi vî rengî ên dadî û ankû hûqûqî jî bo çareserkirina pirsgirêkê jî kêm bin. Wê bandûra van kiryarên dewletê ên qirêt jî, wê li wan nîqaşan hebe. Lê ji wê zêdetir, ev qarakol û rewşa cerdewanan, di serî de bandûrê li rewşa civatî ya kurd dike. Divê ku ev pirr zêde li ser were axiftin û nîqaşkirin. Bi vê yekê, wê temenê pêşketina civatê a destûrî û zagonî hem were ser ziman weke artenetifekê ji wan kiryaran re û hem jî biafirêne û pêşkeve. .. Wê temenê sîyeseta demokratîk jî wê biafirê. Bi wê re jî, wê temenê pergaleka hûqûqî ya rast ku herkesek jêre bêje herê wê biafirêne. Bi wê re jî, wê ew pergale hûqûqî ya herkesekî pêşwazî bike wê pêş bixe. Dema ku hem kiryarên ne rast û yên rast hatina ser ziman û yên rast weke artarnatif ji yên ne baş re hatina ser ziman, wê hingê ev temen xwe biafirêne. Lê dema ku demên buhurî, newina lêpirsîn û fahm kirin û xelatiyên wan newina dîtin û ser ziman, wê ev yek jî nebe. BI wê re jî, wê ev nekirin wê bibe temenê xelatiyên ku di demên pêş de werina kirin jî. Ji ber vê yekê, di vê qonaxa pêvajoya a duyemin de, weke ku karekî mazin dikeve ser milê hûqûqzanan de.

LI herêmê, bi teybetî li kurdistanê, di vê temenê de, ya ku ez dibînin, ew a ku pirr pêwîstî pê heya ku ji binî ve nîqaşaka kûr bi têgihiştina hûqûqî re were dayîn destpê kirin. Bi wê re jî, hemû kêmesî û xelatî werina dîtin. BI wê re jî, divê ku temenê lêpirsînê bi têgihiştina hûqûqzaniyê were afirandin û pêşxistin. Bi vê yekê re, wê mirov, rastiyê fahm bikin. Divê ku mirov jibîrnekê ku her mirov xwediyê hêsteka xwe ya ku bi wê di serê xwe de bidarizêne. Her wusa, mirov dikarê vê hêstê bi reng û navê "gotina "ramanê" jî werêne ser ziman. Dema ku mirovan di derbarê wê hêst û ankû ramana xwe ya darizandinê de xwe bi têgihiştin kir û ew serwer kir, wê hingî, temenê tekoşîna civatî a li dijî bêmafiyê zêdetir pêş bikeve û derkeve li holê. Di vê temenê de, rêxistiniya bisazî ya civatî bi têgihiştina hûqûqzaniyê, wê aliyekî pirr giring ê pêşketina civatî jî bi afirêne.

Divê qonaxa dûyemin de, di serî de, ji vî aliyê ve nîqaş û fahm kirin, divê ku pêş bikeve. Di serî de, li her bajarê kurdistanê jî, ´baro"yên parazvanan dikarin komisyonan ji nava xwe ava bikin û bi vî rengî herêm bi herêm hem lêkolîn bikin û hem jî bi nîqaş û seminerên ku di nava xalkê de bidin, dikarin bênina ser ziman.

Qonaxa dûyemin, bi teybetî, dema ku em dibêjin ku wê "sererastkirinên destûrî û zagonî werina kirin" û wê "mafê kurdan ên perwerdehîya bi zimanê dayikê jî were misogerkirin", em bahse hûqûq û ankû dadê dikin. Lê di vê warê de, tenê bi sererastkirinan û misogerkirinan jî wê bi tememî pirsgirêk newê çareserkirin. Di serî de, divê ku ev aliyên destûrî li herêmê werina pêşxistin. Bi wê re jî, ji aliyê destûrî, biqasî "rê paqijkirinekê" herwusa ew dîroka bi navê dîroka hûqûqê a li tirkiyê lê ku bi tememî bo kurdan dîroka ne hûqûqîtîyê ya jî, divê ku were ser ziman. Divê ku dokumeka wê were derxistin. Ev jî, wê temenê pêşketinaka giring bo kurdan û xalkên din ên herêmê bê. Di vê temenê de, divê ku li ser mijarên hûqûqê were sekin in. Divê ku ev dadgehên teybet, bi hemû ancamên wan re werina rakirin ji holê. Ew temenê bêdadî û bêahlaqîyê jî na. Hemû bêahlaqiyên ku rayadarên dewletê li herêmê kirina, hemû jî, di bin maskeya dadgehê de hatina vêşartina. Heta roja me jî, ti sucên ku ti radayerên dewletê ku li dijî kurdan kirina di derbarê wan de ti darizandin û mahkûmîyet ne hatîya dayîn. Ev jî, bûya temenê suc û bêahlaqiyên din ên ku ew li herêmê li dijî kurdan bikin.

Her wusa, di vê çerçoveyê de, divê ku mirov gotinekê li ser rewşenbîrên kurd jî bibêje. Êdî divê ku ew jî hinekî xwe rast kin. Her roj ku wê binivîsênin ku "filenkes ev gotin gotiya", û ankû ""ev weha dijber a", ji wê dêla wê, divê ku hinekî bi zimanê civate xwe li nava civate xwe jî bihizirin û pirsgirêkên wê bi ziman û çanda wê re bênina ser ziman. Divê ku êdî xwe ji dûvikê gotinên xalkê xilas bikin. Di nava me kurdan de gotinak li herêma botanê heya. Ew jî weha ya. Tê gotin ku "dînekî kevirek avêtîya bîrekê, lê çil(40) mirovên biaqil hewld din ku wê kevirî derxin nikarin." Rewşa rewşenbîrên kurd jî bûya ev. Dewlet jî, bi nêzîkatîyeka şerê teybet, hertimî dixwezê ku rojeva wan dagir bike. Bo vê yekê, hertimî hewl dide ku wê çawa bi rengê ku ew dixwezê wê wan bide nîqaşkirin. Carna ji devê nivîskarekî xwe gotinekê dibêje. Carna yekî weke T. Ardogan derdikeve û dibêje "her kurtaj, roboskiyek a". Carna, "bilant Arinc Derdikeve û dibêje "zimanê kurdî, ne zimanekî şariştanî ya ku bi wê perwerde bê kirin." Carna, Mirovekî ku weke Burhan kuzu wê derkeve tv´yê û bibêje ku "xwestina perwerdehîya bi zimanê kurdî karekî şaytên a." Ev gotin, hemû jî û hê gelek gotinên weke van, van û rayadarên dewletê gotina û dane gotin. BI van gotinan, armanca wan ne tenê reşkirin û piçûkxistin a. Ji wê zêdetir jî, armancaka dewletê ya bi wan re heya ku

nîqaşên di mejiyên rewşenbîrên kurd de jî bide kifşkirin a. Rewşenbîrên kurd, bûna dûvîkê nivîskarên tirk. Nivîskarên tirk pirsgirêkên civate xwe diaxivin û dihênin ser ziman. Rewşenbîrên kurd jî, li ser wan gotinên xwe dibêjin û li dûv wan diçin. ..

Di serî de divê pêvajoyê de divê ku xwe ji van rewşan xilas bikin. Divê ku di vê qonaxa duyemin ya pêvajoyê de bibina dengê civate xwe bi ziman wê.

Ev pêvajoya dûyemin, weke ku berê jî hat ser ziman, wê pêvajoyaka bi teybetî ku di wê de li ser hûqûq û rewşa hûqûqî ku were axiftin bê. Di vê pêvajoya dûyemin de, weke ku rayadarên dewletê jî dixwest, rojeve ti nivîskarên kurd, ji gotina "vekişînê" zêdetir bi wirde neçû. Yanî, ti gotinên wî nebûn ku di derbarê pêvajoyê de bibe. Gelo wê di vê qonaxa pêvajoya a duyemin de wê hebe? **Ev pêvajo, bi qonaxa wê ya pêşî jî qonaxa wê ya duyemin jî û qonaxa wê ya sêyemin jî, bi teybetî li ser aqil û pêşxistina aqil re dimeşê. Kî karibê bi aqil, xwe mazin bike wê pêvajoyê baştir fahm bike. Ku çendî baştir fahm kir jî, wê wilqasî zêde jî serdestîya wî lê hebe. Bi wê re jî, çendî ku serdestîya wî lê hebû, wê ewçendî jî bide kifşkirin**.

Di serî de, di vê pêvajoyê de, kurd dixwezin ku bi tememî ev pergale hûqûqê ya bi armanca bêdeng kirina wan ku bi rewşeka metingerî hatîya avakirin, were ji holê rakirin. "Dadgehên teybet" bi bi destûr û zagonên wan re werina ji holê rakirin. Pergala Cerdewanîyê, were ji holê rakirin. Astengiyên li pêşîya perwerdehîya bi zimanê kurdî werina rakirin. Kurd dixwezin ku bi zimanê xwe êdî xwe perwerde bikin. Divê ku astengiyên li pêşîya wê jî werina rakirin. Bi vê rengê, ya ku bi vê gotinê re dikeve ser milê kurdan de jî ew a ku temenê pergale xwe ya perwerdehîya bi zimanê kurdî êdî biafirênin. Divê ku êdî li vê bihizirin û li ser wê bihizirin. Bi vê yekê, hin sazgerîyên xwe yên zanistî ên nivîsandina pirtûkên zanistî bê ku ankû terçûmekirina çend pirtûkên baş bê, divê ku ava bikin. Di vê pêvajoyê de, ev qonaxa duyemin, di serî de, weke karên ku ev bên kirin in. Di aslê xwe de, hê di qonaxa pêşî û ankû demên berî wê de, ev karên ku bihatan kiribûn. Lê mixabin, ji xamsariyê, heta roja me, ne hatina kirin.

.. Di 29´ê hezîrenê de konfaranse aşîtî û demokrasiyê de tê li dar xistin. Konfarans, ji wan çar konfaransên ku birêz Ocalan bo pêvajoyê pêşnîyar kiribû yek ji wan a. Bi teybetî, di konfaransê de, "vegerîna li welêt" wê têde were nîqaş kirin. Her wusa, ji wê zêdetir jî, divê ku mirov bibêje ku bi milyonan kurd li dîyaspora na. Ev kurd, wê çawa di nava xwe de bi rêxistin bbin û lobî´ya xwe ya kurd biafirênin, divê ku wê jî pirr baş fahm bikin. Bi wê re jî, di vê pêvajoyê de i pêşxistina pêvajoyê de, divê ku rol û weyna xwe bileyizê.

Konfaransa aşîtî û demokrasiyê ku li Brûksel´ê tê li darxistin di bin siha komkujiya ku leşkerên dewleta tirk li Lîce li Xîzanê kir de dibê. Di vê demê de, bûna vê komkujiyê kirina wê ji aliyê hêzên dewleta tirk ve, dide nîşandin ku em di demeka çawa de di buhur in. Her wusa, ev komkuji, her mirovê ku dibêje ku ez mirov im, berpirsîyarîya wan zêdetir dike ku di temenê serxistina vê pêvajoyê de ku xwedî kar û xabat bê.

Ev pêvajo, berpisîyarîya wê dikeve ser milê her kurdî de. Birêz Ocalan da dest pê kirin. Weke ku birêz Ocalan di peyame xwe ya ku şandî konfaransê de jî, ku di wê de dihêne ser zimanê ku "hîmzemîneka mazin bo çareseserîye heya. Lê vîna ku wê birêxistin ku rola xwe bileyizê kêm e." Ev gotin, çendî ku weke gotinaka ku weke ku peyamê wê ji dewletê û rayadarên wê re jî ya, her wusa, ji kurdan re jî ya. Kurd, çendî ku yekbin û di vê pêvajoyê de bi yekdeng û yekbûnî pêvajoyê bi rê ve bibin, wê ser jî

bikevin.

Divê ku mirov vê yekê bibêje ku dîyaspora kurdan, di destpêka tekoşîna kurdan de rol û weyneka giring û mazin leyîstîya jî, lê divê ku mirov vê yekê bibîne ku pirsgrêkên wê ên navxweyî jî pirr in. Bi xwe re, asîmlesyona li kurdistanê birina dîyaspora û domandina wê û hwd, tenê yek ji wan pirsgirêkên ku divê ku mirov li ser bisekinê û bêne ser ziman a.

Berî hertiştî, divê ku nirxên xwe derxistina li pêş. Konfaranse aşîtî û demokrasiyê, di serî de divê ku bibe sedem ku kurd bi renge xwe yê kurdîstanî rêxistina xwe pêş bixin. Zimanê xwe di nava xwe de bicih bikin û rewşenbîrên wan êdî li rastîya xwe vegerihin û zimanê civate ya ku ew dibêjin ku em jê na, wê bikarbênin. Divê temenê de ku karibê xwe bi rêxisti bike jî, wê di yekbûna kurdan pêşxistina civate kurd de û barkirina wê ya li pêşarojê de jî wê rol û weyna xwe bileyizê.

**Tevî ku konfarane dîyaspora kurd jî bû, di wê de axiftinên ku bûn, pirranîya wan bitirkî hat kirin. Mirovên ku bi aslê tirk bi tirkî biaxivin ew rast a. Lê yên kurd, divîyabû ku bi kurdî axiftina bikiran. Ev jî, di aslê xwe de, ew bişavtina ku di nav wan de pêşketî jî radixe li berçav. Axiftina bi zimanê civate xwe bi zimanê kurdî, weke kêmesiyekê ji xwe re dibînin. Ev bi dev ne hatibê gotin jî, ya ku hat hîskirin ev a.** ..

Di serî de, divê ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman ku bi milyonan kurd li dîyaspora na. Lê rêxistinîya wan ya nava wan çend hinekî hebê jî, em nikarin wê rêxistiniyê bi tememî ji aliyê ziman, çand û kevneşopîya wan ve bênina ser ziman.

BI teybetî, ji aliyê ziman çand û kevneşopîya xwe ve divîyabû ku rêxistiniyeka mazin hebûba. Divê ku rojnema, kovar û hwd, heta ku malparên wan ên înternettî hemû bi kurdî ban ku ne tenê wan jê sûd bigrta ku li kurdistanê bixwe jî kurdistanîyan karîba ji wê sûd bigrta. Derfetê vê jî, di destê wan de hebûn ku bikiran. Lê pêşnexistin. BI vê yekê, divê ku mirov dubare bibêje ku pirsgirêka herî mazin ya dîyaspora kurdan, ew a ku asîmlesyona dewleta tirk bi xwe re hanî dîyaspora jî û li wir da domandin.

Ji ber ku dîyaspora kurd, asîmlesyon bi xwe re li dîyaspora jî da domandin, êdî di pêşxistina civatî û hwd de kêm ma. Tenê bi rêxistineka bi sazî û hwd re bi sînor ma. Rola wê jî, ji wê zêdetir ne buhurt..

Divê ku mirov bibêje ku dîyaspora kurdan ku tenê li ewropa ya, ser 2 milyonan re ya. Li ewropa, gelek welat û welatên ku hatina ava kirin jî, hijmara hemû hemwelatîyên wan ne ser 2 milyonan re ya. Yanî, kurdên li ewropa bi hijmara xwe re ser hijmara hemwelatîyên gelek welatên li ewropa jî na. Tevî ku wilqasî zêde hena jî, rola wan kêm e. Wê kêmbûna wan jî, divê ku mirov bi wê barkirina wan ya asîmlesyonê ya bi wan re bêne ser ziman. Li ewropa, pirtûkxaneyên xwe yên ku afirandin jî ne bi zimanê civate wan a. BI zimanê tirkî ya. Ev rewş, tenê bi serê xwe jî, lawazîya dîyasporaya kurdan radixe li berçavan. ..

Ku dîyasporaya kurdan we li ser ziman û çanda xwe re bi rêxistin bikira, wê karîba ku çend ku li dîyaspora jî ba xwe bikira temenê parastina çand, ziman û nirxên kurdîstanî jî. Lê ev yek nebûya. Î ro, mînaq, gelek welatên ku li ewropa kurd li wan dîplomasiyê dikin bo ku xwe bidina naskirin û alikariyê bistênin bo çareserkirina pirsgirêka kurd û hwd, hijmara wan welatên ewropî ji hijmara kurdên ku tenê li ewropa na kêmtira. Ji ber ku kurdan bi ziman û çanda xwe bi rêxistin nekir, êdî xwe ji van jî

mahrûm kir. Çend ku bi pêşbaziyan û hwd bê, çend awaz û rewşên xwe yên çandî dihênin li berçav jî, ev rastîya wan nayênê ser ziman.

LI ewropa, rojnema, kovar û her wusa pirranîya pirtûkên ku nivîskarên kurd dinivîsênin bi tirkî na. Karên xwe bitirkî dikin. Dema ku rewşa wan ev bê, wê çaxê divê ku mirov bibêje ku kurd, rewşa wan ya xirab, êdî bi dest wan û kirinên wan ên bi vî rengî xirabtir bûya. Ti astenîg li pêşîya xwandin û nivîsandin û her wusa pêşxistina bi zimanê wan kurdî nebû. Lê wan xwe bixwe kira asteng. Wan, zimanê xwe bikarnehanî. Rojnema, kovar, pirtûkên xwe û hwd, bi zimanê tirkî nivîsandin. Hê jî, ew rewş bi wan re bi heman rengî didomê. LI sazîyeka kurd, pirtûkên bi kurdî jî pirr kêm tên ditin. Li hinekan jî, hîc ti pirtûkên bi kurdî winê rastî wan newin. Divê ku ez nivîskarên kurd jî di nav de bihasibênim, ji hişmendîya civate kurd pirr dûr in. Bo vê yekê, dema ku dûr bin, wê lê xwedî jî dernekevin. Nivîskarên kurd, bi zimanê tirkî dinivîsênin û dibêjin em nivîskarên kurd in û bo kurdan dinivîsênin. Yekî, alman, dema ku bi almanî dinivîsêne, gelo dibêje ´ez bo firansizan û ingilizan dinivîsênim. Her wusa, yekî firansiz û ingiliz, dema ku bi zimanê firansizi û ingilizî dinivîsêne, dibêje ku ´ez bo civate alman dinivîsênim´.? Ji xwe, ji aliyê zihnîyetê ve jî û civaknasî ve jî ev yek ne rast a. Ti bi kîjan zimanî binivîsêne ku ew ziman, zimanê kîjan civate bê, ti bo wê dinivsêne. Ti nikarê bêje ez bo civateka din dinivîsênim**.** Kurdên li ewropa, rewşa wan, pirranî bi destê wan xirabtir bûya. Wan, bi destê xwe temenê xirabûna xwe afirandina. Her wusa, ku dîyaspora kurd, di roja me de xwe bi rêxistin kiriba, wê î ro di vê ppêvajoya nû wê weke hêza herî sereka ku di serxistina wê de wê xwedî rol û weyn ba.

Dîyaspora ewropa, ew rengê kurd û kurdistanê ku tirkiya û welatên din ên metinger ku înkar dikirin, li gorî wê înkarê meşî. Ew rengê ku welatên weke tirkiya înkar dikir û dikirin ku ji holê ra bikin, bi tememî lê xwedî derneketin û ne parastin. Minaq, zimanê kurdî qadaxa bû. Li ewropa li wê xwedî derketin nebû. Xwedî derketina ku bû jî, em nikarin pirr zêde mazin û bi bandûr bênina ser ziman. Yanî bi rewşa xwe, dîyaspora kurd, bi wê rewşa xwe ya ku hemû kar û xabatên xwe bi tirkî kir, bû lingek ji wê înkarê û ji holê rakirina rengê kurdan ê bi demê re jî.

.. **Ji destpêka sadsale 20**´an û pê de, kurd bi dunyê ketin. Ji war û welatê wan kurdistanê hatina dûrkirin. Ev jî, bi zorê hat kirin. Î ro ku em bahse dîyasporaya kurdan bikin, divê ku em bibêjin ku ser 10 milyonan re kurd ketina diyaspora de û li dunyê belav bûna. Bi teybetî, di çerçoveya dîyasporaya kurdan de herî zêde kurd hatina welatên ewropa. Welatên weke Almanya, firansa û hwd, welatên ku kurd li wan pirr zêde hena.

Li kurdistanê, ev 30 sale ku şerê dewleta tirk, Îran, Sûrî û Îraqê bi kurdan re didomê. Ev şerê van welatan ê bi kurdan re ku bi armanca ji dîrokê birina kurdan a, hê jî di roja me de didomê. Di vê demê ku bahse hevdîtinan bi serokê gelê kurd birêz Ocalan re dihê kirin, di wê çerçoveyê de jî hêvî çêbûna ku êdî dawî li wî şerê van welatan were hanîn û kurd jî êdî weke ku çawa bi dîyaspora ji welatê dûrketina, bi heman rengî vê carê êdî bi şûn ve vegerihin û herina welat û warê xwe û dawî li wê dîyaspora wan were.

Di dîyaspora kurdan de, ev çend nifş di buhur in. Lê hê jî, ew dîyaspora didomê. Kurd, êdî hêvî dikin ku ew dîyaspora dawî lê were. Vegerihina warê xwe. Kurdên ku li dîyaspora na, ez dikarim b teybetî ji bo sadî notûneh´ê wan ew hêsta xwe ya netewî jî ji bîrkirina. Li kîjan welatî mazin bûna, bi wê hêsta wê ya netewî ya wî welatî re hevnasî kirina. Lê ew hêsta xwe nejîna.

Kurdên ku derketina dîyasporan, bi teybetî ez vê gotinê bo kurdên ji salên 1970´î û de ku derketina dîyaspora dibîjim, bi xwe re ne çand, ziman û dîroka xwe jî birina welatên ku çûnê de. Ji bin zordarîya kîjan rejimê revî bin, bi teybet zimanê wê jî bi xwe re birina. Î ro, ne tenê mirovên ku ji welatê xwe goçkirina, her wusa ´rewşenbîrên kurd´ jî, çend ku derketina dîyaspora û welatê çûne de gotina ku "ji ber ku ziman, çand û dîrok û nirxên me yên civatî adaxa na û zor li ser me heya û ji ber vê yekê me goç kirîya" jî, lê dîsa wan bixwe jî, piştre çend ku bi dehan salan jî li goçberî û pêneberîyî mana jî, zimanê xwe yê zikmakî ê civate xwe bikarnehanîna. Vajî wê, wan bidestê xwe alikarîyek dane wê rejima ku gotina ku ji wê revîna di warê asîmlekirina civate kurd de. Bi destê wan, nifşa dawî ya kurd, hatîya asîmle kirin.

Rewşenbîrên kurd, divê ku lêborîna xwe li ber darizandina dîrokê bidina civate xwe ku wan herdû nifşên dawiyê ên cvate xe asîmle kirin. Ev yek jî, ku ji ji aliyên wan ve newê kirin, divê ku mirov hêvîya ti pêşketinê ji wan nekê.

Di aslê xwe de rewşenbîrên kurd, civate kurd di bin zordarîya rejimên serdest de halandin. Rejiman zora xwe dikir. Wan jî, bi zimanê wê rejima ku zordarî dikir di nivîsand û ew bi wê re tûna dikirin. Yanî di nêzîkatîyekê dedi aslê xwe de digihiştina hevdû. Dema ku em van rastîyan baş nebînin û fahm nekin, emê nikaribin dîroka sadale dawiyê ya kurd û kurdistanê jî baş û qanc fahm nekin. Ti rewşenbîrên kurd, heta roja me li ser pirsgirêkên civatî ne hizîrîna û ne hanîna ser ziman. Hertimî, li gorî rojeve tirkiya û ya ku tirkiya afirandî hizirîna û çend gotinên ku berê hatina ser ziman bi dubara hanîna ser ziman weke gotinên xwe. Di aslê xwe de, divê ku mirov bibêje ku beşa ku herî zêde di nava civate kurd de asîmle bûya jî, rewşenbîrên kurd in. Çend ku dinivîsênin jî, dema ku em li wê nivîsandina wan dinerin, em tenê ya ku bi wê nivîsandina wan re dibînin ew asîmlebûyîna wan a. Bi wê nivîsandina xwe re jî, hewl didin ku w asîmlebûyîna xwe bikina malê hemû civate kurd jî.

Bi teybetî, dema ku em di çerçoveya dîpasporaya kurdan de bahse vê bikin, divê ku em vê jî bibêjin ku kurdên ku barî welatên rojava ê ewropa kirina, hinekî jî bê bi xwe re çand û zimanê xwe birina. Lê ´nivîskarên kurd´, ên ku çûna dîyaspora bixwe re zimanê tirkî jî birina welatên ku çûnê de. Li wir jî, ew rewşa xwe domandin û dev û dest ji asîmlekirina civate xwe ne berdan a. Tevî, li welatên ku çûnê de derfetên wan hebûn ku zimanê xwe civate xwe pêş bixin jî, ew pêşnexistina. Hemû derfet û firsande ku ketina destê wan de jî, ne ji bo zimanê kurdî, her wusa bo zimanê serdestê xwe bikarhanîna û li dîyaspora jî bûna lingekî serdestên xwe.

Derfetên ku li dîyaspora ketina destê rewşenbîrên kurd de ew a bû ku bi karbihanîyan, herî kêm û hindîk wê pirtûkxaneya civate kurd biafirandan. Lê wan, pirtûkxaneyeka bi tirkî li ser navê serdestê xwe ji kurdan re afirandin. Bi vê yekê, rewşenbîrên kurd, li dîyaspora jî bûna lenetîyên civate xwe. ..

Bi sadan û hezaran kurdên ku bi malbatî ku li dîyaspora mana, tevî ku bi deh salan mana û ziman û çanda xwe parastina jî, bi sayaserê rewşenbîrên kurd ew jî li dîyaspora winda kirina. Bi wê re jî, bi sînor nemana û bi nivîsandina xwe re li kurdistanê piştgirî dane asîmle kirinê bi nivîsandina xwe ya bi tirkî re. Tevî ew ku li welatên ewropa dijîn jî, ji wan welatan bi bi tirkî dinivîsênin û bi rêya înternettê û hwd bê, nivîsên xw gihandina kurdên li kurdistanê û d asîmlekirina wan de weyn û rol leyistina.

Di vê konfaranse ku wê di nava kurdên dîyaspora de wê were li darxistin, gelo wê ew rewşenbîrên kurd dibêjin ´em rewşenbîrên kurd´ wê aqilekî bi vî rengî di çerçovaya

rêz girtina ji civate kurd de w jê bigrin bi xwe re? Ya ku ez lê dihizirim nûha ev a. Ya rastî, ez ji vê yekê çend ku di serê xwe de ji van "rewşenbîrên kurd" ew xwe bi vî navî bi nav dikin bêhêvî me. Lê dîsa tevî wê bêhêvîya xwe min ev hizra xwe hanî ser ziman.

Ya rastî, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku tevî li dîyaspora jî bûna û mazin bûna zaroyên kurd, pirranîya wan bi tirkî dizanîn û diaxivin. Di derbarê dîrok, çand û civate xwe de ti zanîn ti serê wan de tûna ya. li gorê adetê ku em bibêjin, tê gotin ku "rewşenbîr pêşengên civatê na". Mixabin, ew mirovên ku weke pêşengên nifşên nû na, ew bixwe jî zimanê civate xwe bikarnahênin û zimanê civate kurd terikendina. Bo vê yekê, li dîyaspora jî, ew pêşengvanê asîmlekirina kurdan in. Bo vê yekê, bo nifşên nû ên zaroyên kurd jî, em bibêjin ku pêşengên wan ên ku ew ji xwe re weke mînaq bigrin jî ne ti pêşeng û mînaq in. Ji ber vê yekê, bi wan "pêşeng"an re nifşên nû ên civate kurd ji destê heta nû winda kirina. Di aslê xe de, temenê têkçûna wan ji rewşenbîrên kurd ên ku li dîyaspora jî wan asîmle dikin. Li vir, bi vir ve girêdayî ez dixwezim ku vê gotina kurdan bibêjim. Di nava kurdan de weke gotinaka xalkê tê gotin ku "KÛRMÊ DARÊ NE JI DARÊ BÊ WÊ QALANDINA DARÊ JÎ NEBE". Vêca, dema ku kûrmê dawê ji darê b, hingî wê qalandina darê jî zûtir bibe.

Ev bi dehan salan a ku ev mirovên ku dibêjin ku em rewşenbîrên kurd in, ku bi kurdî nivîsandibûban, wê di roja me de dibêt ku pirsgirêka kurd jî heta roja me ne hatibûba. Yanî, derketina dîyaspora jî, li pêşîya rewşenbîrên kurd nebûya asteng ku wê rol û weyne xwe ya nebixêr bileyizin. Lê li vir, divê ku mirov biibêje ku dema ku mirov bi têgihiştina xwe civate xwe bê û hizreka bi mirovatî di serê mirov de hebe, di v dem û serdema ragihandin û zanîn de ti asteng li pêşîya mirov tûna ya ku mirov wê bêne ser ziman û bigihêne civatê.

Divê ku ez vê yekê jî bibjim ku rewşenbîrên kurd di bûyarên tecewûz û hwd ên weke ku li Dersimê bû û di çêkirina wan bendavên ku li kurdistanê ku bi armanca tûnakirina mejû û dîroka civate kurdistanê de divê ku paya xwe jî bibînin. Hinekî jî, berpirsîyarîya wan jî bi wê rewşa wan re heya.

Ez dixwezim ku vê bipirsim ji rewşenbîrên kurd ên ku li dîyaspora na. Bi konfaransa kurdên li dîyaspora re bahse "vegerîna li welêt dihê kirin." Gelo ku win vegerîyan nava gelê kurd, çî we heya li gorî rastîya wê civatê ku bi xwe re bibin û bidinê de. Wê, ev salên xwe çawa derbas kirin û çi afirand bo civate xwe? Çi keda we di warê ziman, çand û têgihiştina kurdistanê û hwd de, bû ku bênina ser ziman? .. Weje van pirsan ez dikarim hê bi dehan pirsan li vir li dûv hevdû rêz bikim. Lê ka ji wan pirsan û ji van pirsên ku min nivîsandin re tenê bersiveke we ya rast jî ku em li gorî wê rastîya civate kurd fahm bikin heya? ..

Bo rewşenbîrekî fêrbûn zimanê dûyemin li rex zimanê civate xwe divê ku bibe temenê baştir fahm kirin û afirandin û xorttir hanîna li ser ziman. .. Rewşenbîrên kurd, ên ku derketina dîyaspora, pirranîya wan herî kêm zimanekî duyemin fêrbûya. Lê wan, bi wê zimanê bêhtirî zimanê civate xwe jibîr kirin. Her wusa, ew fêrbûna wan, nebû temenê baştirbûnê di naa civate wan de. Bo temenê bêhtirî ji zimanê civate xwe dûrketinê. Ev jî, dibe nîşanaka vê yekê ku rewşenbîrên kurd ne xwedîyê têgihiştina civatî û dîrokê na. Rewşenbîrekî, dema ku li mirovekî ji civate xwe nerî û ew piçûk dît û ankû xwe li ser wî re dît, hingî bi wê hêst û dîtina xwe re wî di serî de winda kirîya.

Bêgûman, divê ku ez bibêjim ku her malbatên kurd ku ji dîyaspora herina kurdistanê wê tenê bi pêşketina xwe re bê, wê gelek tiştan bi xwe re bibin. Lê Rewşenbîrên kurd,

wê dest vala herin. Di wê çûyînê de wê rewşenbîrên kurd, çûyînaka bi xizanî û hajarî herin. .. Rewşenbîr, ew a ku bi zanebûnî ku karibê şert û mercên ku li dijî wî û civate wî jî bin, wan bi zanebûn û nivîsandina xwe re ya bi zimanê civate xwe, ku wê wergerênê derfet û îmkanên mazin di jîyane civate xwe de. Lê li dîyaspora jî, ew rewşa asîmlekirina ku car bi car bi gotina xwe re wan jî jê gazin kirîya, wan bi xwe re daye domandin. LI dîyaspora jî ew dane domandin. ..

Divê ku mirov bibêje ku dîyaspora kurdan van pirsgirêkan û rewşan ji ser xwe biavêje, wê rol û weyneka dîrokî bileyizê. Wê di yekbûna kurdan de jî, bê lingekî pirr giring. Di pêşxistina wê de jî, wê temenekî mazin biafirêne. Lê bo wê divê ku zimanê civate xwe êdî bikarbêne. Tevî ku hijmara kurdên dîyaspora ên ku tenê goçî welatên ewropî kirina ser 2 milyonan re ya jî, pirr kêm in. Bi wê re jî, weke ku me li jor hanî ser ziman hijmare hemwelatîyên gelek welatên ewropî ne li ser 2 milyonan re ya. Yanî hijmara kurdên dîyaspora ku goçî welatên ewropî kirina, ji ya gelek welatên ewropî zêdetira. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku dema ku dîyaspora kurd, xwe bi zimanê civate xwe bi rêxistin nekiribê û weke zimanê xwe hanîna ser ziman û afirandin û nivîsandinê di nava xwe de bicih nekiribê, wê çaxê wê nikaribê wê bandûrê jî bide çê kirin.

.. **Asîmlesyon bi pirsgirêkên demê û ên pêşketina keseyetîyê re bi nifşên nû re xwe dide domandin**. ..

Sedema hemû dîyaspora ji kurdîstanê, politikayên înkarê ên dewletê na. Ji ber ku hemû civat û komên civatê û her wusa kêmnetewên û hwd, ji ber ku hewl hat dayîn ku ew werina ji holê rakirin êdî goçberî û dîyaspora wan bû. Dîyaspora, di aslê xwe de, lingek û aliyekî giring ê jenosîda gelê kurdistanê û civate kurd diafirêne. Bi zor û şîdetê, mirov hatina derxistin ji herêmên wan. Bi wê re jî, her hat dayîn ku nav û nirxên ji wê herêma ku ew jê na, were jêbirin. Hinekî jî, dîyaspora armanca wê ya sereke ev bû. dîyaspora, wate wê ya dîn jî ew a ku mal û axa mirov ku yekî din were û bi zorê dest dêne li ser û yê xwediyê wê mal û axê ji wir bide goçkirin û derxistin a. Bi v yekê, mirovên ku ji axa xwe hatina derxistin êdî li dunyê belav dibin. Ya ku bûya ev a.

Li herêmê ji aliyê aborî ve bê û her wusa bi afetên ku bûna ku çi zor derketiya ber jîyane mirov, dewlet tirkiya jî, ew bikarhanîya bo ku mirov ji cih û warên wan werina kirin. Minaq, herî dawî ardheja Wan´ê ya. Piştî ku ardhej li wir bû, êdî dewletê bi hezaran mirov û malbat ji wir dane goçkirin. Bi wê yekê, valahîyeka mazin bo xwe afirand. Hemû mirov û malbatên ku ji herêma Wan´ê piştî ardhejê ku hatina goçkirin, bi armanca ku ew werina asîmlekirin ev bûya. Mirovên ku cih û warên xwe ne berdane jî, rastî astengî û zorên mazin hatina. Bi vê rengî, dîyasporaya ji kurdistanê li bajarên tirkiya bûya û ankû li welatên derve ên ewropa û hwd bûya, ku em bi hevdû re bênina ser ziman, emê bibînin ku ne bin 10 milyonan re ya.

Di dîyaspora de, herî zêde jin û zaro ketina rewşeka pirr xirab de. Ji xwe, zorek li ser serê wan hebûya. Lê piştî dîyaspora jî, bi şert û mercan re ew zora li ser wan bûya duqat. Zarokan mafê xwe perwerdekirinê bi zimanê dayika xwe ne dîtîna. Bi awayekî rastî mafê xwe perwerde kirinê bidest ne xistina. Li welatên ku çûnê de, li wan deran bi zimanê wan dewletan hewl hatîya dayîn ku ew werina perwerde kirin. Ew jî, ne tenê bûya temen û sedema ne serkevtina wan, her wusa bûya sedema ku dema ku ew zaro mazin bûn pirsgirêkên mazin ên derûnî, civaknasî û hwd, pirsgirêkên pêşketinê bijîn. ..

Ew malbatên ku ketina dîyaspora de, ku li dîyaspora bi destê nivîskarên wê civate wan bin û hwd, zimanê wan bikarne hanîn jî, wê piştre weke aliyekî din ê pirsgirêkî wê derkeve berwan. Ev rewş, bike ku ew çand û zimanê xwe dûrkevin. Wê bike ku ew zimanekî din û çandeka din re rû bi rû werin. Ji aliyê malbatî ve, ev jî, wê bê temenê pirsgrêkên derûnî, civaknasî û pêşketinê û hwd.

Di nava malbatên ku derketina dîyaspora, beşên civatê ên herî zêde ku rastî pirsgirêkan hatina jin, zarok û ciwan in. Ev hersê beşên civatê, mafê xwe pêşxistina wan û hwd ji destpêkê ji destê wan hatîya girtin. Ji ber vê yekê, pêşketina mazin nikarin bijîn. Her wusa, êdî nikarin bi tememî ji pêşketinên demê j sûd bigirin. Dema ku jin, zarok û ciwan û hwd, dema ku pêşketina xwe bi ziman û çanda civate xwe re nejîn, wê nikaribin pêşketinên mazin jî bijîn.

Bi vê rengê, divê ku mirov bibêje ku mirovê ku goçkirî û li dîyasporaya, ne civate ku çûya û tevlî bûya dikarê pêşketina wê bi rastî bijî û nejî êdî ji ber ku pêşketina civate xwe bi rastî nejîya ya êdî nikarê wê jî bijî. Ji herdûyan jî, mahrûm dimêne.

Rewşenbîrên kurd, ji dêla ku wê di wan waran de ku wê li ser pirsgirêkên civate xwe bihizirin û ji aliyê hizrî, têgihiştinî, çandî û zimanî hwd ve, wê çareserîyê ji wê re bibînin û pêşketina wê bidina çê kirin, ew jî bûna lingekî asîmlekirina wan. Bi gotinaka din, ew jî bûna lingekî din ê zor û şîdetê li ser serê civatê. Bi vê yekê re, ji dêla ku ew bibina bersiv ji bûhran û tengezerîya civatî re, bûna sedem ku ew bûhran û tengezerî hê kûrtir û maztir bibe di nava civatê de. Ev jî, piştre hin bi hin bûya aliyekî din ê bûhrana ku civate kurd dijî. ..

Nifşên ciwan ên civate kurd, dev ji wê berda ku civate xwe bijîn, ji ber pirsgirêkên pêşketinê û dûrketina ji rewşa xwe ya civatî jîya na. Mejiyê ciwan, ti carî di hizirkirina xwe de ew çand û zimanê civate xwe ne jîya ya. ew hîs jî, nekirîya. Jîyane dîyaspora, di mejiyê wî de bûya temenê pirsgiirêkên derûnî û civaknasî û her wusa pêşketina keseyetîyê. Ciwan, di nava civate xwe de ku bijî, wê pirsgirêkên nifşî bijî. Wê ji wan bi buhurê û wê xwe bibîne û keseyetîya xwe û civate xwe nas bike û wê êdî wê bijî. Lê ciwan û keseyetîya wî ya ku çûya dîyaspora, tenê tiştek jîyan kiriya. Weke keseyetîya civate xwe bijî û yan jî weke keseyetîya civate ku hatî û ketî nav de bijî. .. Ev jî, bi serê xwe bi wê keseyetîya ciwanan re bûya temenê pirsgirêk û şokên ku bijî. Bi vê yekê, bi keseyetîyeka ku wê nasnekê û fahm nekê dijî. Bi vê yekê re, êdî pirsgirêkên derûnî dijî. Lê ciwan, çend ku van pirsgirêkan dijî jî, ne di farqê de ya. Sazî û ankû aqilmendên civatê yên ku wê ew bidan fahm kirin bûn. Lê ew jî, ku em bi nivîskaran re bênina ser ziman, ne xwwediyê keseyetîya civatî ya civate xwe na, êdî nikarin van pirsgirêkan bibînin û li ser wê bisekin in û ji wê re çareserîyan bibînin.

Keeyetîya ciwanan bê, ya Jinan bê û he wusa ya mirovên din ên andamê civate kurd bin û hwd bin, piştî ku derketîya dîyaspora, hertimî bi keseyetîyê bûhran û tengezerîyek keseyetî, derûnî, civaknasî û hwd jîyan kiriya. Ew bûhran û tengezerîya keseyetî jî, ji destpêkê heta ku hatîya dawîya jîyane xwe jîyan kiriya. Gelek malbatên ku ji ber zorê bazdane welatên ewropa, gotina ku "emê jîyaneka baş bo zaroyên biafirênin." Lê ne di farqîya van pirsgirêkan de na ku mirovek dema ku ji nava civate xwe derket wê bijî. Ji ber vê yekê, êdî piştî ku goçkir û piştre, êdî hin bi hin rastî van pirsgirêkan tê. Piştre ew xîyela ku wan di serê xwe de çêkirî ji wan re ji malbatîtîya wan re divegerihê qabûsekê. ..

Ku mirov ku çend di farqê de jî bê û ne di farqê de jî bê, ku mirov di nava civate xwe de bû, mirov wê pêşketina xwe bi gelek pirsgirêkan re jî bê bi civate xwe re bijî. Ya herî giring ev a. Li vir, ya giring ew a ku mirov pirsgirêkên xwe di nava civate xwe de bigihijêne çareserîyê. Ya ku temenê pêşketina keseyetîya mirova û her wusa temenê pêşketina keseyetîya civatê û hwd jî ya, ev bixwe ya. Mirovê ku ji zimanê xwe dûrket û pêşketina xwe bi zaroktiyê bi zimanê dayika xwe nejî, wê piştre ku mazin bû jî wê pêşketina baş û li berçav bi keseyetîya xwe re nejî.

Li vir, dixwezim ku balê bikişênim li se vê jî. Hin mirov û ankû dê û bav, bawer dikin ku "dema ku zaroyên wan ji dema ku ji dayikê bûn ku bi kîjan zimanê mazin bûn, wê êdî pêşktina xwe bi wê piştre baş û mazin bijîn." Ev hizir û bawerîya ku bi wan re, divê ku were ditin û were dayîn fahm kirin ku ne rast e. Zimanê zarokê, ne zimanekî ku dema ku zarok, piştî ku bû bidest dixê ya. Ziman, hê ku zarok ji dayikê nebûya digrê û di wê de pêvajoyên pêşketinê jî dijî. .. Ji ber vê yekê, divê ku mirov bibêje ku zarok, divê ku têkiliya wî ji civate wî û zimanê dayika wî newê birin û divê ku pêşketina xwe di wê de bijî. Ya ku wê di pêşketina zaro de ku wê bi ser bixe jî tenê û tenê ev a. Ji ber vê yekê ku divê ku em car bi car li ser hevdû balê bikişênina li ser pêşketina civatî û ya mirov û keseyetîya wî ku di nava civate wî de û her wusa zimanê dayikê. Zimanê dayikê, ji ya ku em dizanîn bêhtirî û zêdetir giringîya zimanê dayikê bo pêşketina keseyetîyê heya. Bingihîn a.

Dema ku em ji vir re i pirsgirêkên malbatên kurd ên li dîyaspora binerin, emê hingî baştir û rasttir fahm bikin. Li vir, berî hertiştî li ser vê xalê, divê ku serî pirr were wastandin û hizir bi zimanê civate werina afirandin. Ji ber çi di vir de bi zimanê civatê hanîna ser ziman giring a? Ji ber ku di zimanê civate û ankû bi zimanê kurdî hanîna ser ziman, wê aliyekî wê weke dermanê ku li birînekê were kirin, wê giringîya wê hebe, wê bandûra wê li ya keseyetîyê hebe. Bi wê re jî, wê keseyetî, bi wê derûnîyê re, êdî wê bi ser xwe ve were. BI zimanê civatê nivîsandin, her wusa karekî wê yê weke dermankirina derûnî jî heya. Ji ber vê yekê jî, divê ku mirov binxat bike ku bi zimanê civate nivîsandin, wê dermankirina civatê a derûnî jî bide kirin. Ji van aliyan ve jî dema ku mirov li pêşketina bi zimanê civaê binerê, divê ku mirov bibêje ku pirr giring a ku mirov bi zimanê civate werêne ser ziman û fahm bike.

Em ku î ro, nifşên nû jî bi gotinekê jî bê, bahse wan bikin, divê ku em vê yekê bibêjin ku ji têgihiştin û hêsta civate xwe dûr mazin dibin. Xwe û civate xwe nizan in û di derbarê wê de jî, di serê û mejiyê xwe de ne xwediyê ti zanîn û têgihiştinê na.Mirovên ku weke ´nivîskar´ jî ku derdikevina li holê li ser navê civate kurd û dinivîsênin, ev gotin bo wan di buhurê. Di derbarê, dîrok, civat û civaknasîya civatê û teybetmendiyên wê de ne xwediyê zanînê na. Ku em î ro bahs bikin û bibêjin ku di nava kurdên di dîyaspora de jî ku asîmlesyon bi nifşên nû xwe re dide domandin, divê ku em di serî de berê xwe bidina van mirovên ku bi navê vê civatê ku ji xwe re dibêjin ´nivîskar´ û dinivîsênin. Yê ku wê asîmlesyonê bi nifşên nû re didina domandin jî, ev mirovên ku ji xwe re dibêjin ´em nivîskarên kurd in´. Bi vê yekê, hewceyî pê heya ku ev dordor bên analîz(dahûr)kirin û rastîya wan bi rastî jî were fahm kirin.

..

**Çareserîya ji holê rakirina vê asîmlasyonê çi ya`?**

Di serî de, li vir, dema ku em li ser çareserîya wê bihizirin, divê ku em balê bikişênina ser medîya û ankû çapameniyê. Çapameniya ku ji xwe re dibêje ku ´ez

çapameniya kurd im´ zimanê wê tirkî ya. Ev yek, weke aliyekî hem domandina wê asîmlesyonê ya û hem jî tûnakirina civatê bi nirxên wê re ya.

Di serî de, çapameniya ku bihijê civate kurd, di divê ku ji sadî sadê wê kurdî bê. Ev yek, hem li ewropa û ankû di nava kurdên dîyaspora de û hem li kurdistanê bixwe divê ku wusa bê. Rojnemeyên ku weke ´rojnemeyên kurdan´ derdikevin, divê ku zimanê wan bi tememî kurdî bê. Minaq, ku î ro ´ozgur gundem´ û ankû ´ozgur politika´ derdikeve, û hwd, dikar in bi du warsîyonan derkevin, Warsîyona ji kurdan bi tememî bi kurdî derkeve û di nava kurdan de were belav kirin. Her wusa warsîyona wê ya bi zimanê dîn ên ingilizî û ankû tirkî derkeve jî di nava wan milet û ankû xalkan de were belav kirin.

Di vê temenê de, di serî de li ser çapameniyê de pêwîstî pê heya çapameni xwe ji nû ve bi rêxistin bike. Bi wê re jî, malper û hwd, li ser înternettê û hwd re jî, divê ku ên ku xîtabî kurdan û hwd bikin, divê ku zimanê wan bikarbênin. Her wusa ên ku dervî wan derkevin jî, ku bi warsoyênên din, dikarin ew jî, di wê temenê girseya ku xîtabî wê bikin li gorî wê bin.

Li kurdistanê, bi teybetî li ser medîya û ankû çapameniyê re bi vî rengî çûna rêxistiniyekê, ji herdemê zêdetir di vê demê de giringîya wê heya. Civatên kurd, ên ku ji nava malbate xwe zimanê xwe fêr dibin, mixabin, dema ku rûpelekê înternettê û hwd divekin, rastî zimanekî din tên. Ew jî, êdî hin bi hin asîmle dibin. Yanî, êdî rewş hatîya û gihiştîya rewşeka wusa ku bi destê van dordorên ku dinivîsênin kurd tên asîmle kirin. Li vir, dema ku kurd, di nava xwe de bi sazîyên xwe yên çapameniyî û medîyayî ku van tedbîrên xwe negirin, gelo wê kî ji wan re bigrê.**?**

Herwusa, li ser pirtûkan jî divê ku mirov tiştekî bibêje. Pirtûkên ku bi tirkî na, yan werina wergerendin li kurdî û bên belav kirin di nava kurdan de û yanî divê ku êdî newina belav kirin. Aliyekî ku herî zêde, zirerê dide civate kurd jî ev rewş bixwe ya. Minaq, nûha li welatên ewropî rewşeka bi vî rengî bi navê "politikaya weşanê" heya. Ew jî, her wusa ew a ku minaq, dema ku wê pirtûkek min ku yekî alman nivîsandibê, wê di cih de were wergerendin li zimanên din minaq weke ingilizî, firansizî û hwd û wê were weşandin. Bi vî rengî, li welatên din jî di buhurê. Di vê temenê de, hem pêşketinekê di nava civate xwe de dikin û hem jî wê diparêzên.

Karê weşangerîyê, ne tenê weke karê çend mirovên ku xwe dane ber vî karî dihê ditin û kirin. Her wusa,, weke karekî bi sazî dihê kirin.. Minaq, li Almanya, Firansa, Norwêc, Îswêc û hwd, "sazîya rewşenbîrî û wergerînê" heya ku her pirtûka ku care pêşî hat weşandin bi zimanekî din wê di hundurê heyvekê de wergerênên li zimanên xwe. Bi wê yekê re, wê hem wê berhemê bi zimanê xwe bênina ser ziman û hem jî dewlemendiyekê di zimanê xwe de bidina çê kirin. Di vê temenê de sazîyên wergerînê, xwe li ser zimanekî û ankû çend zimanên ku herî zêde tên bikarhanîn re xwe bi rêxistin dikin û andam û mirovên xwe yên ku wî karî bikin pêş dixin û piştre jî êdî wê weke "sazîyeka mayînda" didina domandin. Dema ku goterek jî were weşandin, wê ew jî were wergerendin û wê were weşandin. Ev yek, weke karekî ku nebê nabê ya.

Di van waran de, em nikarin bahse çapameniya kurd bikin. Ya rastî, çapamaniya kurd, em nikarin wê bi navê kurdan ku derdikeve jî werênina ser ziman.Pirranîya sazîyên ku xwe weke´çapameniya kurd´dihênin ser ziman û bi nav dikin, zimmanê kurdî bi karnayênin û mirov nikarê wan weke sazîyên çapameniya kurd şîrove bike.

Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku dema ku rêxistiniyek nebê, mirov nikarê zêde bahse civaktiyê jî bike. Di roja me de, dema ku bahse vê serdemê dihê kirin, weke

serdema zanîn û ragihandinê dihê binavkirin. Dema ku ev serdem, serdema zanîn û ragihandinê bê, divê ku di vê temenê de bi vî rengî, saziyên rewşenbîrî ên wergerendinê û nivîsandina bi kurdî hebin û ew tenê ku hebin dikarin ji xwe re bibêjin ku ew ´saziyên rewşenbîrî ên kurdî û civate kurd in.´ Lê wekî din jî, em nikarin bahseê bikin. Gelek mirovên ku bi aslê xwe kurd in û bi tirkî nivîsênin, di nava xalkê de dibêjin ku "em rewşenbîrên kurd in" û ankû "em nivîskarên kurd in." Lê ev yekê ne rast a. Ew tenê bi koka xwe ve kurd in. Ew ne rewşenbîr û ankû nivîskarên kurd in. Ew nivîskar û ankû rewşenbîrên tirk ku bi koka xwe û ankû bi aslê xwe kurd in.

Li vir, divê ku mirov wate gotinan tevlî hevdû nekê û di çerçoveya wan de rast nêzîkatîyê bike. Ya giring ev a ku ji bo fahm kirinekê rast. ..

Di vê dema ku tê gotin serdema zanîn û ragihandinê, çendî ku mirov di van warên zanîn û ragihandinê de xwe bi rêxistin kir bo civate xwe, mirov wê ewçendî karibê bibêje ku li gorî gîyane demê û van gotinên ´zanîn û ragihandinê´ tevdigerihê. Di demeka bi vî rengî de, sazîyeka wergerînê û ankû ya rewşenbîrîyê tenê bi serê xwe ku kar û xabate xwe rast û li gorî civate xwe bi zimanê wê bike, wê karinê şoreşên mazin bi civatê bide kirin.

**Di roja me de, tenê ku em li ser weşandina rojnemeyan re bibêjin, gelek rojnema bi du û ankû sê warsîyonan tên weşandin. MInaq, li welatê ku derdikeve bi zimanê xwe yê civatî derdikeve. Lê dema ku li welatekî din bixwezê xwe bide weşandin, wê nav û sembolên xwe bikarbêne û wê bi zimanê wî xalkî jî ji wan re bide weşandin. Lê wê herdûyan tevlî hevdû nekê. Wê ne rojnemeya ku ji civate xwe re diweşene di nava xalkekî din de bide weşandin û ne jî wê wersîyona ku di nava xalkekî din de weşand wê di nava xalkê xwe de biweşene. Weke prensîb, ev ji hevdû tên vaqatandin**..

Politikaya weşandinê, ku mirov di farqê de bê û ne farqê de jî bê, pêşketina civatê û aliyê ku wê bi wê ve herê dide nîşandin û dîyar kirin. Bo vê yekê, di aslê xwe de, karmendên weşanê, rêveberîyên herî giring ên civatê bixwe jî na. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî û binxatkê û bêne ser ziman.

Ji ber vê yekê, dema ku em bahse civatê bikin, divê ku em bibêjin ku bo civatekê, politikaya weşanê, weke nan û avê ji wê re pêwîsta. Politikaya weşanê, hem bo pêşketin û pêşxistina wê ya li gorî demê û hem jî bo pêşaroja civatekê weke karekî ku êdî divê ku bibe hebê ya. Heta roja me, hem rewşenbîrên kurd û hem jî pirranîya çapameniya kurd, civate kurd bixwe xapandîya. Ji wê re gotîya ku "ez çapameniya tê me." Lê di rastiyê de, ev yek ne rast a. Zimanê ku bi kardihênin tirkî ya. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku ew ne nivîskarên kurdî na û ne jî bi wî rengî dibina çapameniya kurdî.

Minaq, ku mijar çapameni bê, divê ku em bibêjin ku CNN´ tv´yeka emerikî û ingilizî ya. Lê wersîyonên xwe ên bi zimanê din jî afirandî ya. Heta ku bi tirkî jî afirandî ya. Bi gelek zimanê din jî afirandî ya. Lê ew wersîyonên din, nabê û di nava girseya xwe ya ku xîtabî wê dike a bi ingilizî diaxivê di nava wê de nawêşêne. Ya ingilizî di nava ingilizan de di wwêşêne. Ya bi zimanê din jî bi zimanê wan gelên din ên ku di nava wan de derdikeve. Minaq BCC´ jî bi wî rengî, wersîyonên xwe yên ingilizî, arabî, farisî û hê gelek zimanên din jî pêşxistîya. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku êdî divê ku politikayaka zimanê kurdî ya weşanê bo civate kurd were pêşxistin. Bi wê re jî, êdî ev nivîs, goter, pirtûk û hwd, ên bi tirkî ku hena ne hêlin ku ew di nava civate kurd

de werina weşandin. Yan, bile werina wergerendin û pişte werina weşandin û yan jî bile ji binî newina weşandin. ..

Dema ku sazîyên kurd, bi vî rengî rêxistinîya xwe ya bi çapameniyê nekê, divê ku ne rabê gileh û gazinan jî nekê ku ew tê asîmle kirin. Ji ber kurd ya herî zêde civatê asîmle dike tenê û tenê ev a. Di nava nifşên nû de, domandina asîmlesyonê, hinekî jî bi sayaserê vê çapameniya bi vî rengî ya. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. Weke aliyekî din ê pirr giring jî, êdî divê ku rojneme û nivîs û pirtûkên bi tirkî di nava civate kurd de newina weşandin. Rojneme jî, ku ne bi kurdî bin, divê ku di nava kurdan de li kurdistanê newina weşandin. Yanî, weke ku me di paragrafa li ser vê de got, bila bi du warsîyonan derkevin. Warsîyan bi kurdî, li kurdistanê di nava kurdan de derkeve. Warsîyona bi tirkî jî li herêmên tirkiya ên ku lê tirk hena derkeve. BI vî rengî, bi qasî ku divê ku ev ji bo çapameniya nivîskî divê ku bi vî rengî bê, her wusa bo weşane dîmenî ên weke tv´yan û hwd jî divê ku wusa bê. Bi vî rengî, wê pêşîya asîmlesyonê were girtin.

Bi vir ve girêdayî, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku di aslê xwe de kurdan, qadaxaya li ser zimanê kurdî hê di salên 1990´î û hwd de şikand. Di wê demê de dewleta tirk zagonên 140, 141 û 142 rakirin. Bi wê re, di aslê xwe de hê hingî ev qadaxa şikeşt. Piştre jî, rojnemeyên tirk li kurdistanê dibêt ku sad lib jî ne dihatina firotin. Lê ji ber ku mirovên ku gotin em çaameniya kurd in ku bi tirkî nivîsandin, êdî wan ew asîmlesyon da domandin li ser civatê. Ew qadaxaya dewletê ya ku li ser zimanê kurdî, wan heta roja me hanî. Hê jî, di vê rojê de jî ew wê didina domandin.

**.. Ku mirov bahse pêvajoyê û pêvajoya çareserîyê bike, divê temenê de divê ku mirov bibêje ku hewceyî bi zihniyeteka nû bo kirina sîyesetê pêwîst a li rojhilat û welatên wê. ..**

Li rojhilat, dewletên herêmê ol weke bîrdozîya sîyeseta xwe bikarhanîna. Berê jî bikarhanîn û di roja me de jî bikardihênin. Li ser olê re, "fetwa" gelan dane. Bi olê, tundrewiyê li dijî komên din ên civatê ên cuda ên olî û ên cuda ên kêmnetewî û hwd, bikardihênin. Di roja me de, dema ku em bi teybetî li sîyeseta li Sûrîya dinerin, em vê yekê bi awayekî vekirî dibînin. Netewên yekbûyî´ jî, ku hertimî navê wê bi "parastina mafên" mirovan re dihê rojeve, ku mijar tê sîyeseta wê ya li rojhilat û bi teybetî kurdan, ew jî di sîyeseta xwe de dikeve cihêkarîyê de. Mînaqa herî li berçav ya vê jî, naqşaya netewên yekbûyî ya alikarîyê ya. Di naqşaya wê de dide nîşandin ku li hemû herêmên Sûrîya Alîkarî kiriya. Lê tenê li herêmên kurdan ew alîkarî tûna ya.

Ji aliyê presîbên ahlaqî ve divê ku mirov nêzîkî vê nêzîkatiyê bibe. Bi teybetî, Netewên yekbûyî jî, ku mijar tê kurdan, dikarê wê cihêkariyê û cûdakariyê bike. Kirîya jî. Wê kirina wê cudakirîya wê ya li dijî kurdan, mirov divê ku wê çawa fahm bike.? Ev pirs, weke pirseka ku divê ku mirov li ser bisekinê ya. ..

Di van demên dawiyê de bi sadan kurdên sivîl hatina qatil kirin li rojavayê kurdistanê ku di nava sînorê Sûrîya de hatîya hiştin. Di dema ku min ev di nivîsand de jî, nûçeyên ku diketin ajansên nûçeyan de, ew bûn ku çeteyên weke "cebeil-nasr" ew 500 kurdên ku dilgirtibûn û weke "mertal" bikardihênin jî qatil kirina. Lê li dijî wê, ne netewên yekbûyî û ne jî ti kesek ji wan deng derneket. Tenê, ya ku ew komkujiyên kurdan şermazar kirina, rêveberîya Rûsya ya. Rûsya, li dijî wê dîj-mirovatiyê bêdeng nema ya. ..

Lê hêzên din, ku heta roja me, gotina "mafên mirovan" ji devê xwe ne berda na, deng

ji wan derneketîya. Mirov di vê rewşê de pirr acêbmayî û hayîrmayî dimêne. Heta ku ew sazîyên ku xwe weke "sazîyên parastina mafên mirovan" jî bi nav dikin jî, deng ji wan jî derneketîya. Ev jî, bo wan aybeka û şermeka. ..

Dema ku bahse mafê mirovan hat kirin, divê ku ew gotina ´mafê mirovan´ bo hemû mirov û kesî derbas bibe. Divê ku newê gotin ku ji bo hinekan maf heya û bo hinekan maf tûna ya. Lê mixabin, heta nûha, nêzîkatîya ku derketiya li holê, ew a ku di temenê wê de ya ku dibêjin ku "bo hinekan mafê mirovan heya û bo hinek kesan jî, tûna ya." Kurd, di nava wan ´hinek kesên ku mafê wan tûna ya´ de na. Wusa, bi sîyesetê jî hatina bicih kirin. Bêdengîya ku di rayagiştî ya navnetewî de ya li ber komkujiyên ku tên serê kurdan, wê yekê bi awayekî vekirî dide berçav û nîşandin.

Li vir, ji ber çî sîyeset, di temenê ku ji hinek kesan re maf heya û ji hinek kesan re maf tûna ya" de ya tê kirin? Hinekî jî, dema ku em bahse zihniyetê dikin, em bahse vê zihniyeta cihêkar û cudakar dikin. Ev zihniyet, li herêmê ku mafê mirovan hat binpêkirin, wê li ber bêdeng nemêne. Lê ku li herêmekê mafê mirovan hat binpêkirin, wê li ber wê sîyeseteka cuda bimêşene û bêdeng bimêne. Wê ji nedîtî ve were. Ya ku nûha li ber kurdan, dihê kirin jî ev yeka ya.

Zihniyeta ku di destpêka sadsala 20´an de hat pêşxistin û piştre di ancama wê de du şerên cihanê bûn jî, hê jî xwe dide domandin. Ji ber vê yekê, hê jî li ser temenê wê zihniyeta ku di destpêka sadsale 20´an de ku hatî afirandin de, piştî du şerên cihanê, weke ku ew şer bi dawî nebûbin hê didom in. Î ro, di wê temenê de sîyeseta şer dihê kirin.

Heta salên 1990´î û hwd, Amerika û rojava, bi hêzên xwe mudahale li herêmên dervî xwe dikirin. Piştre, ji salên 1990´î û pêde, êdî ji serî ve ew desthilatdarîyên îslemî kirina bin kontrola xwe de. Dema ku mudahela li herêmekê bikin, wê bi devê wan rêveberîyên wan desthilatdarîyên dibin kontrolê de, çend gotinên di temenê gotina "cihad" û hwd de bibêjin û piştre weke ku li Libya û li Sûrîya û hwd bû, wê di cih de bi hezaran mirov ku bi olê çavên wan hatî tarî kirin, wê werina şandin û bidina şer kirin.. Êdî bi wê re, weke ku li Libya û li Sûrîya mirov dibîne, êdî weke ku Amerika û hêzên rojava, ku weke pêwîstî pê nabînin ku hêzekê biafirênin û bişênina Sûrî û Rojava. Ji ber ku li cihê wan hêzên ku bişênin, mirovên ku wê bidina şerkirin "bi navê olê" hatina ditin û berhevkirin û hatina şandin li wir ku şer bikin û werina kuştin.

Gotinên olê ên weke "cihad" û hwd, bi vî rengî hatina kirin bin kontrolê de û dihên bikarhanîn. Dihên îstîsmar kirin. Ya herî bitelûke jî ev bixwe ya.

Li Sûrî, ya ku em nûha dibînin ew a. Li rojavayê kurdistanê ya ku em nûha dibînin ew a. Mirovan bikom ji welatên araban ên weke Qatar, Sûûdî arabîya, yemen û hwd, di bin navê "cihad" de dihên berhevkirin û dihên şandin li sûrî bo ku şer bikin. Li wir, ev komkuji, hem li Sûrî li dijî gelê arab û hem jî li rojavayê kurdistanê li dijê gelê kurd û komên din ên kêmnetew dihên kirin. Her komkujiya ku heta nûha kirina jî, yek jî di çapameniya rojava û Amerika de cih negirtina. Çend gotinên bi rengê "şervanên kurd, li dijî komên tundrew biser dikevin û pêde diçin" û hwd, çend ku li xoşa çend kurdan herê jî, lê ji aliyê din ve jî, ji sorkirina şer û pêde di fêda gotinên bi vî rengî tûna ya. Aliyê kurd, li dijî aliyên din biserket û ankû aliyê din li dijî aliyê kurdan biserket, çi farqe wê heya bo vê zihniyeta ku ew gotin gotîya û hanîya ser ziman.? Her gotin, di temenê hin xafkna de tên gotin. Her gotinên ku tên gotin jî, şer gurr dikin û bêhtirî mirov didin kuştin.

Li vir, divê ku mirov di serî de, vê yekê û vê zihniyetê bibîne. Li vir, di serî de, bi rengê ku çapamenî bihêne ser ziman, divê ku di temenê mahkumkirina kuştina mirovan de bê. Her kuştin û komkujiya ku bû, divê ku werina şermazar kirin. Î ro, minaq, dema ku Çeteyên ´cebetil-nasr´ ew 500 kurd kuştin, ku ne hat şermazar kirin, wê piştre ne pênçsad bê, wê hezar bê. Yanî, wê her komkuji, piştî ya ku hatî kirin wê were. Li vir, ji dêla ku bi gotinên ku tên gotin pêşîya vê were girtin, bi gotinan bêhtirî şer tê sorkirin û dijberî dihê afirandin. .. Bi teybetî, gotinên weke "şervanên kurd, li dijî komên tundrew biser dikevin û pêde diçin" û hwd, dema ku li ser çapameniyê re hatina gotin, wê tenê şer gurr bikin. Komên din jî, wê bibêjin ku "nexwe, em hê bêhtirî ji wan bikujin û nehêlin ku pêde herin. Ji xwe cebilxane wan jî, ji rojava û ankû ewropa û tirkiya tê. Kurd, bo ku newina kuştin û pêşîya komkujiyên ku wê werina şerê wan, tê dikoşîn. Ya kurdan nabê şer, ew dibe "paratina cewherî". Lê hanîna ser ziman, ya wê parastina cewherî jî, di temenê, ´ şervanên ku li dijî komên tundrew pêde diçin jî, ne rast a. Kurd, pêde naçin û ne çûna ti deveran ku wan deveran îlhak bikin û bikina bin destê xwe de. Tenê li herêmên xwe na û herêmên xwe dipararêzên. Ji herêmên xwe derneketin û bi gavekê jî, bi ti deveran ve neçûna. Her wusa, ji aliyê din ve jî, dema ku komên çekdar komkujiyek kir û bi rengê "komên muxalif, li dijî rejima esad bi serdikevin" ku were ser ziman, wê ji wê komkujiyê hasab ne hatibê pirsîn, wê hê bêhtirî temenê komkujiyeka din ku wê were kirin wê hatibê afirandin. Piştre, di roja din de, bi çekên ku rojava û tirkiya diçina ji wan komên çekdar re, wê çend komkujiyên din jî wê werina kirin. Ew jî, wê di rengê serkevtina wan ya li dijî rejimê de werina ser ziman. Bi vî rengî, komkuji li dûv komkujiya din wê werina kirin. Êdî, wê pêşîya komkujiyan, êş û bîrînan di nava gelan de newê girtin. Wê êdî, birînên ku bi sadsalan newina dermankirin û girtin wê vebin.

Li vir, ev nêzîkatî hemû di temenê wan de zihniyetek heya. Divê ku mirov zihniyetê lêbikolê û fahm bike. Ji ber ku ev zihniyet, di temenê xwe de bi tememî ne demokratik a, çend ku çend gotinên bi navê "demokrasiyê" weke maske bikardihêne jî, di bin de xwe ji dayina kirina komkujiyan rizgar nakê.

Di aslê xwe de, heta roja me, zihniyeta ku li pêşîya demokatizekirina rojhilat bûya asteng û hertimî li rojhilat şer pêşxistîya jî, ev zihniyet bixwe ya. Li vir, di serî de divê ku mirov vê yekê bibêje. Li kurdistanê jî, ev zihniyet, bûya temenê înkare kurdan. Bi vê zihniyetê ev 30 salin ku şer bi kurdan re dihê kirin û welatê kurdan hat kavil kirin. Ser 5 hezaran gund, hatina şawitandin û valakirin. Herêmên kurdistanê, jî, ji sadî 70´yê wê, weke "herêmên leşkerî" û ankû "herêmên ku hatina mayîn kirî" hatina girtin ji jîyanê re. Bi wê re jî, di ancama wê de dîyasporaya kurdan pêşxistin. Ev zihniyet, zihniyeteka kujar a. Kurdan û tekoşîna wan, li dijî wê zihniyetê tekoşîn. Bo vê yekê, zihniyeta xwe ya demokratik afirand. Di wê zihniyetê de, î ro li rojhilat ku weke "rewşeka ne asayî" dihê ditin, jina kurd bi artişa û parastina xwe dike û ne li ber mêr û ne jî li ber rejimê serî ditawêne. Ew, hertimî bi rûmeta xwe dijî. Ya ku birûmet jî, ew a ku hertimî bi rûmeta xwe jîyandin a. Ti kesekî biqasî jina kurd, êş û elem û êşkence ne dîtîya û ne kişandîya. Rejima metinger ku bindest dike, bo ku bindest bike diçê bi ser wê de. Mêrê ku hatî bindest kirin û bûyî kola, koleyeka li bin wê kolatîya xwe jî ji xwe re dixwezê. Bi vê yekê, li dijî herdû kolatîyan tekoşîna rûmetê jina kurd meşand û hê jî dimeşêne.

Ev çi dide nîşandin? Ev wê tekoşîna kurdan, dide nîşandin.. Lê dema ku em tenê bi gotina "tekoşînê" re bahse wê tekoşîna kurd bikin, wê ti carî ew newê fahm kirin û newê

ser ziman. JI ber ku ew tekoşîn, bi zihniyeteka demokratik û mirovatî pêşket. Hemû nirxên mirovatiyê ku ji destpêka mirovatîyê li gorî cewherê mirovatîyê pêşketina, wateya xwe û xwe di wê tekoşînê de ditin. Bi vê yekê re, di temenê pergalîyekê de bi zihniyet û têgihiştina xwe ya nû re afirî û pêşket.

Di vê temenê de, li rojhilat, di aslê xwe de, bi tekoşîna kurdan re, ne tenê tekoşîna azadîya kurd dihê dayîn. Tekoşîna zihniyet û têgihiştina demokratikî û hizra mirovatiyê jî dihê dayîn. Zihniyeteka ku dikarê "fetwa"ya serê mirovan û ´fetwa"ya serê gelan bide, ne cihê wê di ol û bawerîyan de heya û ne jî cihê wê di ti felsefe û mirovatîyê de heya. Lê ya herî ku mirov xamgin dike, ew zihniyetên kujar, ku olê ji xwe re weke maske bikardihênin a.. Tevî ku ol dibêje "kuştina mirov haram a." Weke ku çeteyên "cebetil-nasr" û hwd dikin û dibêjin "kuştina kurdan helal a" , û "destavêtina can, mal û jin û namûsa wan helal a" û hwd, ev zihniyet fermana kuştina mirovan û gelan dide. Hebûna gelan pêşî înkar dike û piştre ji dîrokê dibe.

Ya ku şer û tekoşîna wê bi navê mirovatiyê û bi tekoşîna kurdan re dihê dayin ew a. Her kurd, li gorî nirxên Birehim xalîl, Zerdeştê kal, û hemû pêxemberên din dijîn. Hemû pêxember jî, li gorî wan nirxên ku kurd li gorî wan dijîn, ew jî dijîn. Jî ber vê yekê, projeya wan ya civatî ya ku di vê sadsalê de pêşxistin jî di temenê ´ahlaqî´ de bûya.

Li rojavayê kurdistanê, em di van rojên dawiyê de dibînin, ku çendî ku komkuji bûna, yek jî di çapameniya cihanê de cih negirtîya. Hemû jî, hatina piştguhkirin. Ji nedîtî ve hatina. Bi wê re jî, dema ku komkujiyek hat serê kurdan, ku ji nedîtî ve hat, êdî wê temenê komkujiya din ya piştre jî biafirêne û piştre wê komkujiya din ya duyemin bibe. Ev kirina komkujiyan jî, di temenê ´dîyelektikekê´ de hebûna xwe bi ber pêşarojê de dide domandin. Ji ber çi ser komkujiya Roboskî hatin girtin? Ji ber çi li ser komkujiya kurdan ku tê de sê jinên kurd li navenda Parîsê hatina qatil kirin hewl dihê dayin ku were girtin? Ji ber çi qatilên wan komkujiyan nayên derxistin li holê? Ji ber ku hê planên din ên komkujiyê ên ku wê bikin hena. Ev hêzên ku ser komkujiyan digirin, bi armanca ku wê komkujiyên nû di demên pêş de bikin, wê sergirtinê dikin. ...

.. **Li Îranê**, du rojan berê, hilbijartin bûn û di hilbijartinan de nemzetê nû ê bi navê Hasan Rûhanî hat bijartin. Berî wî, Ahmedînecat hebû. Piştî Ahmedî necat, bi hilbijartina Hasan Rûhanî re demeka nû dest pê dike. Hasanî Rûhanî, weke mirovekî xwenûkar(reformkar) tê bi nav kirin. Tê gotin ku wê di destûrê de bo perwerdehîya bi zimanê dayikê wê rastkirinan bike û wê guhartina di destûrê de bike bo ku astengiyên pêşîya azadîya ramanê rabike.

**Di dema Hasan Rûhanî de, kurd tenê tiştekî mereq dikirin. Ew jî, ew a ku ma gelo wê Hasan Rûhanî, politikayên dema Ahmedînecat ên di temenê dijberîya kurdan de wê bide domandin li dijî kurdan? Bersiva wê pirsê nîn a di serê kurdan de. Heta roja me, kîjan rayadar hatîya û bûya serokkomar li Îranê, weke ku çawa ku li tirkiya bûya, di dijminatîya li kurdan de sînor nasnekirîya**.

Rejima Îranê, piştî sale 1979´an de ku Hûmeynî şoreşa olî kir û rejima olî hanî û piştre, bo kurdan jî rewş guharî. Tevî ku di dema destpêka şoreşê de Humeynî soza da kurdan ku wê hemû mafên wan radestî wan bike jî, lê piştî ku wî şoreş kir, ew sozên xwe ji bîr kir û piştre dema ku kurdan doza maf û azadîya xwe kir û "fetwa" serê kurdan hat dayîn. Piştî wê re jî, her serokwizirê ku hat serê îranê, li dijî kurdan bû xwediyê nêzîkatiyekê. ..

Li Îranê, hêz û tevgerên kurdan, ji Îranê xwestina ku bi rêyên aşîtîyane û danûstandinê pirsgirêka kurd ya rojhilatê kurdistanê çareser bike. Lê îranê, weke ku di 2011´an de bû û hêrîşî herêmên qandîlê kir bi alîkarîya tirkiya û hwd, li dijî kurdan bûya xwediyê tevgerîyekê. Îran, di vê demê de dikeve demeka xwe ya nû de. Îran jî, dibîne ku divê ku di nava xwe de divê pêşketinekê bide çê kirin. Di warê azadîya ramanê, mafê jinê, û hwd de, divê ku sererastkirinan di nava xwe de bike. Di van waran de, ne tenê Îran, her wusa herêm bigiştî di rewşeka pirr xirab de ya.

Li Îranê, temen heya ku pirsgirêka rojhilatê kurdistanê bi destûrî û rêyên aşîtîyane û danûstandinê were çareser kirin. Bi wê rengê, êdî rejimeka baş were ava kirin. Dema ku bahse navê Hasan Rûhanî dihê kirin û dihê gotin ku ew "mirovekî xwenûkar a", gotinên di destpêka bûna serokwezîr ya T. Ardogan têne bîra min. Wî jî, di destê de, gotina "maxdûrîyetê" pirr baş bikarhanî. Pirsgirêkê civatê û bi teybetî jî pirsgirêka kurd bi nav kir û got ku "emê çareser bikin." Lê piştre, li dijî kurdan ew bû deccalê herî mazin. Di dema wî de bi hezaran kurd hatina qatil kirin ji ber ku kurd bûn. Zimanê kurdan û çanda qadaxa kir. Heta roja me jî, ew qadaxa didomê.

Li Îranê jî, rewşa kurdan ne kêmî ya kurdên bakûrê kurdistanê ya. Li wir jî, mafê wan tûna na. Pirsgirêkên ziman, maf û azadîyê ên kurdan ên weke ku li bakûrê kurdistanê hena, li rojhilatê kurdistanê li aliyê Îranê jî hena. Dema ku navê Hasan Rûhanî dihê ser ziman û dihê gotin ku "ew yekî xwenûkar a", gelo wê di derbarê maf û azadîya kurdan de çi gavan biavêje? Lê tirsa kurdan ew a ku wê politikayên di temenê dijberî kurdan de ku di dema Ahmedînecat de bûn di dema Hasan Rûhanî de jî werina domandin. Di dema Ahmedînecat de bi sadan ciwanên ku kurd weke Şêrîn Elemxûlî, Ferzzad kemangar, û hwd hatina bidarve kirin.Ji ber ku ev kurdbûn hatina bi dar ve kirin. Lê ji bo ku nebêjin ku ew kurdin û ji bo wan bi navê kurdîtîya wan neyênina rojê gotin "li dijî olê derketina" û ew bi derve kirina. Yanî, hênceta olî dîtina û li dijî ya bi navê kurdî bicih kirina û bi wê mirov bidarvekirina.

Îran, teybetmendîya wê ew a ku xwediyê mejûyeka pirr kevn a.Dîroka wê bi kurdan re pirr demdirêj a.Gelek kevneşopîyên kurdan di nava Îranê de jî bicihbûna. Lê rayadarên îranî rêz û hûrmet ji wê dîrokê re negirtina. Hertimî, dijberîya xwe li kurdan dane nîşandin.

Îran, wê politikaya bi dervekirinê weke di dema Ahmedînecat de ku bû, wê li dijî kurdan bide domandin û yan jî na? Li herêmê ku Îran pirsgirêkên xwe bi kurdan re çareser bike, wê derfeta wê ji hemû hêzên herêmê zêdetir hebe ku bi kurdan re tîfaqake herêmî weke ku di dema Axamanîşîyan û Sasanîyan û her wusa piştre di dema Sefewîyan û hwd de ku dabû çêkirin, wê bide çê kirin. Di van dema de, divê ku mirov jibîrnekê ku ji dema Şêx Seyfedînê Erdebîlî û heta ku digihijê dema Şah Îsmaîl û hwd de, kevneşopîya desthilatdarîyê a kurdan li Îranê pêşketîya û temenê desthilatdarîyên wê demê afirandina.

Di roja me de, Îran, di temenê nîjadperestîtîyaka persî de nêz dibe. Olê jî, bi vê yekê û rengê bikardihêne. Di vê temenê de, dema ku dor dihê kurdan, weke ku li tirkiya û rejima wê dike, li îranê jî înkare kurdan pêşdikeve. Kurd, li herêmên xwe jî, ne xwediyê gotinê na. Mafê wan tûna ya ku xwe bihilbijêrên li herêmên xwe. Li îranê, bi hilbijartinên serokkomarîyê re hilbijartinên herêmkî ên kifşkirina rêveberîyên herêmî jî dihê kirin. Di wan de jî, dîsa nemzetên ku rejimê kifşkirina û ne kurd in, ku dixwezê bêne serê kurdan, tevî kurd wan nexwezin jî.

Îran, weke tirkiya ku li bakûrê kurdistanê dike û ku ew jî li rojhilatê kurdistanê dike, bo ku kurdek newê serê kurdên rojhilatê kurdistanê û wan bi rê ve bibe, ew nemzetan kifş dike. Berî şoreşa olî û piştî wê jî, ti rayadarên kurd ên di asta rêveberîna herêmê de ne hatina hilbijartin. Ev rewş, di roja me de jî didomê. Îran, ji tahranê dide kifşkirin ku wê kî bibe nemzet û were hilbijartin. Tirkiya jî ji Anqara. Lê herdû jî, li herêmên kurda bo ku kurdek newê hilbijartin û nebe rêveber, çi ji wan û ji destê wan tê dikin. Ji ber vê yekê, minaq, ev sadsale ku me buhurandî, kî dikarê nemzetekî kurd li bakûrê kurdistanê ku rejima tirkiya bi piştgirîya rojava lê serdest bû û li îranê ku hatîya hilbijartin bide nîşandin. Ji kîjan nemzetê kurd re derfet hatîya nîşandin. Bêgûman, ku li rojhilatê kurdistanê ku nemzetekî kurd maf girtiba û xwe weke nemzet bide nîşandin, wê biheta hilbijartin.

Bo ku kevneşopîya rêveberîyê ya kurdan ne afirê û nebe, bi teybetî nayê hiştin ku yekî kurd ji aliyê kurdan ve were hilbijartin. Yekî kurd, bi rastî li rastîya xwe xwedî derkeve, dizanîn ku hat hilbijartin wê bahse maf û azadîya kurdan bike. Îran jî, vê yekê naxwezê. Bo vê yekê, derfetê nadê kurdan ku ew bidina kifşkirina ku wê kî wan bi rê ve bibe.

Li Îranê serokkomarê nû Hasan Rûhanî hat hilbijartin. Lê wê ji bo kurdan û maf û azadîya wan çi guhartin bibe? Di serî de, dema ku em ji aliyê kurdan ve li rewşê binerin, em ti tiştî nabînin.

Li Îranê, pirsgirêka kurd, çendî ku di wê temenê de bimêne, wê weke navîka îranê ya zayif jî bimêne. Divê ku Îran jî, vê yekê bizanibê. Îran, rayadarên wê, heta kengî dihizirin ku bi vî rengî bidina domandin? Heta kengî, wê navê gelekî înkar bikin û wê wan ji maf û azadîya wan dûr û bêpar bidina hiştin?

Ya ku em hêvî dikin ku Hasan Rûhanî, ew kiryarên qirêt ku radayarên îranê di dema Ahmedînecat de li dijî kurdan kirin bi politikayên dervekirinê, şîkandina rûmetê ku weke ku li Merîwanê û hwd bû, û hwd, wê nedina domandin. Divê ku bi zanibin ku dijberîya li gelekî û şikandina rûmeta gelekî, ti carî ne ahlaqî û mirovî ya. Ti felsefe, ol û rastî jî wê herê nakin û rast nabînin.

Îran, di vê demê de divê ku dijberîya xwe ya li dijî kurdan dawiyê lê bêne. Divê ku gava biavêje bo çareserkirina pirsgirêka kurd li rojhilatê kurdistanê. Ew politikayên dema Ahmedînecat ku weke ku dixwest ku rojhilatê kurdistanê bike girtîgeheka servekirî, divê ku dawî li wan were hanîn. Li rojhilatê kurdistanê, tv´yên kurdî û bi zimanê kurdî qadaxa na. Ev rewş jî, ku em ji aliyê azadîya ramanê ve lê binerê, dikevina wê çerçoveyê de jî. Lê ji wê zêdetir, zimanê gelekî ya. Qadaxakirina zimanê gelekî, tenê bi armanca ji dîrokê birina wî gelî ya.

Dema ku li îranê bahse azadîya raman dihê kirin, gelê wê kurd karibin li herêmên xwe komel sazîyên xwe û hwd vekin? Wê karibin rojnemeyên xwe bi zimanê civate xwe derxin? Dema ku bahse azadîya ramanê dihê kirin, wê kurd karibin, bahse azadîya xwe bikin`? ... Ku ev nebin, wê çawa karibin bahse maf û azadîyan were kirin? Wê çawa bahse wekhevîyê were kirin.? .. Kurdan, ji ber ku di hilbijartinan de, xwe nedîtin û qadaxayên dewleta îranê li ser maf, azadî û zimanê wan hebû, hilbijartin boykot kirin. Ji ber ku ti mafê wan nîna ku li ser navê xwe tiştekî bidina kifşkirina êdî boykot kirin.

…

**Li ser girtina sê telewisyonên kurd ji aliyê dadgeha Danimarka ve. ..**

Li kurdistanê, mafê kurdan tûna ya ku telewisyonekê bi zimanê kurdî vekin. Li kurdistanê, zimanê kurdî qadaxaya û nikarin bi wê perwerdeya xwe bi zimanê kurdî bibînin. Berî nûha bi çend rojan, dema ku civîna mirovên aqilmend bû, di wê de serokwezirê T. Ardogan, dibêje ku "wê perwerde bi zimanê kurdî nebê." Piştre jî, di wê çerçoveyê de gotinên xwe li dûv hevdû rêz kirin.

Piştî salên 1990´î û hwd, kurdên ku derketina dîyaspora di nava xwe de çend saziyên xwe yên ku di wan de dixwezin ku çand û zimanê xwe biparêzên ava kirin. Bi wê armancê, biryarên ku telewisyonaka kurdî ku bi zimanê wan jî weşanê bike vekin. Li tirkiya ew derfet ji wan re tûna ya. Kurdan, zan dikir ku li ewropa û bi teybetî li welatên weke Danimarka demokrastî û mafê mirovan û azadîya ramanê heya, wê êdî ew derfet ji wan re hebe ku bi zimanê xwe dayikê wê ew derfet ji wan re bê dayîn nîşandin û wê karibin ku bi zimanê xwe telewisyonekê vekin. vekirin jî, piştî ku vekirin jî, zor û zaxtên li ser bi dawî nebûn. Pêşî Medîya, tv, piştre Med tv, piştre jî, Roj tv, Nûçe tv, mmc tv û hwd, çend telewisyon kurdan vekirin, hatina girtin.

Dema ku ji min re bibêjin ku tirkiya ew girtina, ezê fahm bikim. Ji ber ku li wir zimanê kurdî qadaxa ya û asîmlasyon li ser serê kurdan bi politikayên dewletê tên meşandin. Lê welatekî weke Danimarka ku bahse demokrasiyê, mafê azadî û ramanê dike, mirov dikeve zorê de ku fahm bike. Li Danimarka, bi navê "parastina azadîya ramanê" ytringsfrihed" heya. Li gorî wê, çapameni wê biazad bê û we bêne ser ziman. Wê hizir û raman jî bi Azad werin ser ziman. Lê mixabin, ku mesela dibe kurd, ne Danîmarka ´ytringsfriged´e xwe nas dike û ne jî rêzê ji wê re digirê.

Girtina hersê telewisyonên kurd ên roj tv, nûçe tv û mmc tv, teybetmendiya wan jî ew a ku parastina zimanê kurdî dikin. Zimanê kurdî ji aliyê rejima tirk ve hatîya qadaxa kirin. BI van tv´yan, kurdan hewl dide ku zimanê xwe û çanda xwe ji tûnabûnê xilas bikin. Hinekî jî, bi vî rengî, ev tv´yan, teybetmendiya wan ji aliyê ziman û nasnemaya kurdî ve wateya wê heya.

Dadgeha Danimarka, biryara wê ya ku wê di 2´yê temûzê de bi rengê ku hatîya girtin, weke piştgirîyekê ji jenosîda kurdan û ji komkujiyên kurdan ku dewlet tirk kirina re jî ya. Heta roja me, ji ber ku telewisyon hebû û hemû kirinên dewletê dihatina ser ziman û diketina rojevê de, êdî dewletê jî zêde wre ne dikir ku zêde mirovan bikujê. Lê divê ku mirov êdî li bendê bê ku wê piştî vê biryara dadgeha Danimarka a girtina telewisyonên kurd, nûçeyên kuştina mirovan, êşkence û girtinan zêdetir werin û bibin. Weşanên tv´yên kurd, hinekî pêşîya wan komkujiyên ku dewletê dikir girt. Nûha jî, wê êdî komkuji zêde bibin.

Piştî ku nûçeya girtina telewisyonên kurd ku ji aliyê dadgeha danimarka ve hat girtin ku hat bihîstin, tirseka mazin ket dilê hemû kurdan de. Ev tirs, tirsa êşkence û kuştinên ku wê êdî piştî wê re ku dewletê bike bûn. Her kurd, dewletê û qarakterê wê pirr baş nas dike. Ji ber vê yekê, kurd dizanin ku dema ku sazgeriyeka weke ya telewisyonê ya agahdariyê tûnebê, wê dewlet kuştinan zêde bike. Ji ber ku telewisyonên kurd heta nûha hebûn, êdî dewletê zêde wêre ne dikir ku bike. Lê piştî ku telewisyonên kurd reşbûn û êdî weşan nebû, êdî wê kuştin û zor û şîdet zêdetir bibin.

Hertimî, ev demên ku telewisyonên kurd hatina girtin de, dewletê yan komkujiyên mazin hanîna serê kurdan û yan jî, tişta pirr mazin bi komplogerî hanîna serê kurdan. Nûha jî, divê demê de di temenê girtina biryara girtina telewisyonên kurd de kîjan ji van

heya, ew jî, wê di dema pêş de derkeve li pêş û were li holê.

Em hêvî dikin ku dadgeha Danimarka bi navê parastina mafê mirovan mafê parastina azadîya ramanê, biryara xwe rast bike. Ev biryar, ne biryaraka mirovî û rast a. Biryaraka ku were şermazar kirin a. Bi hênceta ku "şîdetê" girtin jî, ne rast a. Divê ku mirov bipirsê ku ka kî wê şîdetê dike.? Ew şîdeta ku di wan de tê ser ziman, ne şîdeta kurdan a. Şîdeta ku dewletê têne serê kurdan a. Yanî kurd, dema ku şîdeta li ser serê xwe tênina ser ziman, weke aliyê şîdetê didina nîşandin. Ev jî, ne rast û ne ahlaqî jî ya.

Dema ku di telewisyonekê de ku di weşanaka wê de, şîdet ku were kifşkirin jî, wê agahî bê dayîn li rayadarên wê telewisyonê re wê bê gotin ku ev şîdet a û divê ku newê kirin. Heta nûha, tiştakî wusa jî ji wezeret û ankû saziya bilind ya weşanê ya danîmarka bûya? .. Lê dema ku telewisyonek were girtin, ew ne rast a. Vêca rabin û bi tememî hewl bidin ku şirketê hemûyî bidina girtin jî ne rast a û ne wijdanî ya.

Ji aliyê din ve jî, di vê pêvajoya ku kurd weke pêvajoya aşîtîyê bi nav dikin de dayina vê biryarê, weke hewldanaka sabota kirina wê pêvajoyê ya. Yanî, hewldanaka ku bi wê dihê xwestin ku ew pêvajo were xira kirin. Dihê xwestin ku şîdet were kirin û pêşxistin. Em bang dikin û hêvî dikin ku dadgeha Danimarka vê biryara xwe ya ku piştgirîyê dide jenosîda kurdan û qadaxaya li ser zimanê kurdî, rast bike. ...

**.. Di dewama van girtinên tv´yên kurd de, divê ku mirov bahse çêkirina bendav û karakolên leşkerî di vê pêvajoya çareserîyê de bike. Li ser bendav û qarakolên ku dewleta tirk li herêma botanê çê dike, divê ku mirov bisekinê. Bi wê re jî, weke mijareka xwezayî, divê ku mirov bahse xwezaya kurdistanê, daristan û talana xwezaya wê birewşên weke birrîna 250 hezar darên ku li gundê Zortûla Erdîşa Wanê jî bisekinê. ..**

Dema ku min hizirkir ku ez vê nivîsê binivîsênim, di serê min de çêkirina bendavan ên ku dewleta tirk li herêmên şîrnaxê ên ên ên herêma botanê çê dike hebû. Bi wê re jî, minê bahse çêkirina qarakolan jî ku dewlet li herêmê bidest çêkiriya, ezê li ser sekinîya bam. Lê bi wê re, nûçeya ku ji herêma Wan´ê hat, ew bû ku dewlet bo ku "konut´ên "TOKÎ" ku li wir dixwezê çê bike, li wir bo wan dixwezê ku ser dusad û pêncih hezarî re darên li herêmê ku pirranîya herêmê bi wan debara xwe dikin jî, qût bike. Ji ber vê yekê, êdî mirov bi rastî şaş û mat dimêne ku kîjanê hilde li dest. Li herêmê, bi dehan û sadan bendav bi armanca leşkerî dihên çê kirin. Nîvê herêmê di bin avê de dihê hiştin. Bi wê re jî, beşeka mazin bo çêkirina qarakolan jî hatiya vaqatandin. Bi wê re jî, divê ku mirov jibîr nekê ku ji salên 1990´î û pêde, pirranîya herêmî hatîya mayîn kirin. Piştî Salên 1990´î û pêde heta salên 1995´an û hwd, ser 5 hrzar gundî re hat şawitandin û valakirin. Ev gûnd û herêmên li dora wan hemû jî hatina mayîn kirin. Yanî, bo jîyanê, mafê jîyanê li van herêman ji mirovan re ne hiştîya.

Bi vê yekê û rengê, bi mayinkirinê, çêkirina bendavan, birrîna daristanan weke ku li herêma Wanê ku bo konut´ên TOKÎ û hwd ku tê kirin û hwd, êdî bi tememî qada jîyanê hatîya tangkirin. Herêmên ku hatina mayînkirin, duqatî herêmên ku mirov hê li ser dijîn in. Yanî, pirranîya herêman hatîya mayîn kirin. Bi wê re jî, bi sînor namênin û bendav jî bi armanca leşkerî dihên çê kirin. Hemû herêmên ku li wan mafê jîyanê hena û ku mirov dikarê wan weke herêmna dewlemend jî bi nav bike, yan bi çêkirina bendavan di bin avê de hatina hiştin û yan jî hatîna mayin kirin. Bi wê rengî, weke herêmna ku êdî jîyan li wan nabê na.

Piştî Salên 1990´î û de, dewleta tirk, giranî da bimayînkirinê. Ji bo mirovên li

herêmê ji herêmê bide goçkirin û ji herêmê derfeta jîyanê ji wan nehêle ev mayînkirina ardan, weke metodaka valakirina herêmê hatbikarhanîn. Li cihanê, dema ku bahse ardên mayînkirî dihê kirin, bi teybetî bersînoran û kevîya sînoran dihê fahm kirin. Lê li kurdistanê, dewleta tirk herêmên ku bi mayîn kirina, hemû herêmên ku li wan jîyan hebûya. Gund hatina valakirin û piştre jî hatina mayîn kirin. Bi vî rengî, rewşek hatîya afirandin. Herêmên ku ne hatina mayînkirin jî, weke herêmên leşkerî hatina bikarhanîn û li wan qarakol û leşkergeh û hwd, hatina çêkirin. Yanî, herêm hemû hatina kirin weke herêmên leşkerî...

Çend ku piştî salên 1990´î hat gotin ku "rewşa awarta hat rakirin" jî, lê di rastîyê de ev ne rast bû. Rewşa awarta, bi hemû rewş û awayên xwe doma. Heta roja me jî, ew rewş, didomê. Î ro jî, tevgera kurd, bo çareserkirina pirsgirêka kurd serokatîya wê birêz Ocalan pêvajoyak da dest pê kirin. Piştî ku ev pêvajo ji aliyê wî ve hat dayîn destpêkirin, Hêvîya ku bi herkesekî re çêbû ku êdî rewş were asayîkirin û ardên bi mayîn werina paqij kirin û dîsa ji jîyanê re werina vekirin û leşkergeh û qarakolên ku di nava jîyane xalkê de hatina avakirin ku were rakirin. Lê dewletê çêkir? Dewletê, vajî wê, piştî ku tevgera kurd denezend ku ew hêzên xwe bi şûn ve divekişêne bo ku rewş bo çareserîkirina pirsgirêka kurd were afirandin û temenê gavavêtinan bo çareserkirinê were çêkirin û piştre, dewletê giranî da çêkirina bendav û qarakolan. Nûha jî, li herêmê, bi sadan qarakol, bendav û hwd dihên çê kirin. Yanî, ew qada jîyanê ku bo mirovan hatî tangkirin, dihê tangtirkirin. Ji xwe qada jîyanê bi herêmên mayînkirî û qarakolên çêkirî hatîya tangkirin. Nûha jî, hikimeta AKP´ê, dixwezê ku li wan qarakolan bi sadan qarakolên din zêdetir bike û hê zêdetir qada jîyanê tangtir bike.

Pêvajoya ku nûha kurdan û tevgera kurd û Birêz Ocalan daye destpêkirin, dewlet, wê weke fersandekê bikardihêne û herêmê, bêhtirî bi leşker dike. Divîya ku di derbarê çareserkirina pirsgirêka kurd de gav werina avêtin. Lê çend ku bi ser destpêka pêvajoyê re ev nêzî çar heyv in ku buhurtîya jî, dewletê heta nûha ti gav neavêtiya. Hê jî, oparasyonên leşkerî û tevgerên leşkerî li herêmên kurdan didom in.

Dewleta tirk, û biteybetî hikimeta AKP´ê, şer ne tenê li civate kurd vekirîya. Her wusa li xwezaya kurdistanê jî vekirîya. Bi teybetî, bi çêkirina bendavan re herêmên herî dewlemend ku mirovên herêmê bi gelek zor û astangîyan dijîn û ji wan herêman debare xwe dikin, ew herêm di bin avê de dihên hiştin. Bi wê re jî, nûha jî, daristana li Wanê ku dihê xwestin bo konut´ên TOKÎ ku bi tememî di bin avê de were hiştin jî, aliyekî din ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê.

Ev çend roj in ku li tirkiya û li Stembûlê, gel li qadan a. Tê gotin ku bo parastina parqa gezî´ ya. Li wir, çend dar hebûn ku hikimeta AKP´ê xwest ku wan bibirrê û li cihê wan "navendeka kirîn û firotinê çê bike." Lê li kurdistanê li herêma Wan´ê, daristanak tê tûna kirin.

Darek, heta ku mazin dibe, ser 20 salan re dem di buhurê. Heta ku ew dar mazin bibe jî, lê meyîzendina wê pêwîsta. Avdan, û hwd bo wê pêwîsta. Piştî ku bi kedaka mazin ew dar hat mazin kirin, êdî wê ew dar bidest dayîna fêkî bike. Lê heta ku darek were wê asta dayina fêkî bike, bi deh salan di buhurê. Gelê Wan´ê jî, bi teybetî, piştî ardheja dusal berê hat serê wan, hê jî di malên "prefebrîk" de dijîn. Ev jî, weke cezayekî hikimet tirk bû ji wan re. Piştî wê re, bi armanca ku dihê xwestin ku li wê mal werina çêkirin, herêmeka ku pirranîya xalkên herêmê ji wê û ji wan darên wê sûd digrin a. Herêma ku lê dar tên birrîn li gundê Zortûlê ya ku girêdayî navçeya Erdîşê ya. Erdîş jî,

navçeyeka ku girêdayî bajarê Wan´ê ya. Li wê herêma Erdîşê, ser 250 hezarî re dar tên birrîn. Yanî, derfeteka mazin ya jîyane herêmê bi wê re ji holê tê rakirin. Ev jî, bi navê çêkirina malan tê kirin.

Li herêmê, ti mirovê kurd û mirovên li herêmê, divê ku xalkê Zortûla Ardîşa Wan´ê divê ku bi tenê ne hêle. Ew herêm, wele ku li herêma taqsîma stembûlê ku ew nêzî du hefteyan in ku mirov li qadan in û tekoşînê didin, divê li wir jî wusa xwedî derketin bibe. Divê ku konên çavderî û parastina wir divê ku werina avakirin.

Dewleta tirk, heta nûha, bi şer û bombabarandinan, herêmên kurdistanê xurûxand û tûna kir. Î ro jî, di bin navê bendavan de û çêkirina Konut´ên TOKÎ´yê de vê yekê dike. Li wê herêmê, divê ku newê hiştin ku ew dar werina birrîn. Ev herêma ku bi birrîna daran re ket rojevê ya navçeya Erdîşê, dewlet, bi nêzîkatîya wan çêkirina bendavan nêzîkatîyê li wir dike. Bi vî rengî, ne tenê bi armanca çêkirina konut´an a. Li wir, dixwezin ku hin qarakolna jî çêbikin. Nûha, tenê bi navê çêkirina konut´an wê dikin. Lê wê di demên pêş de, ev nîyetên wan jî werina dîtin.

**Ev herêma** Erdîşê **ku lê dihê xwestin ku ser 250 hezar darî re lê werê birrîn, ev herêm herêmeka ku girêdana wê bi gelek herêmên din ve jî heya. Dewlet, hinekî jî, bi vê nêîzkatîyê nêz dibe. Berê, di dema li darxistina oparasyonan de bi sadan cih û daristanên kurdistanê dane ber êgir û şawitandin. Î ro jî, bi vî rengî, di şawitênin û ji holê dirakin. Ew şawitandinên daristanan, ti farqa wê ji van birrîna daristana li gundê tortûlê nîn a. Zihniyet heman zihniyet a. Divê ku mirov, vê yekê jî, bi teybetî bibêje**.

Li herêma Şîrnaxê jî, herêmên ku li wan bendav dihên çêkirin, herêmên ku dewlemend in. Herêmên ku ji aliyê dîrokî ve jî ku bi wate na. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku bi tememê dewletê şer li xwezaya kurdistanê jî vekirîya. Bi civatîtîya kurdistanê re dixwezê ku xwezaya wê jî tûna bike. Li ser bendav û qarakolên li herêma botanê ku tên çêkirin, divê ku mirov bi teybetî li ser wan bisekinê û wan ji rojevê dûr nekê û hertimî di rojevê de bihêle.

Di van rojên dawiyê de, weke mijareka ku herî zêde dikeve rojevê de lezdayîna çêkirina bendavan a. Car bi car, dema ku li ser bendavan, nîqaş tên kirin, bi teybetî, tê gotin ku "dewlet, bi vejenê wan çê dike." Her wusa, dema ku di çapameniya kurd de jî, bahse çê kirina wan tê kirin, tê gotin ku "bi armanca pêşî lê girtina tevgerîya gerilla ew bendav tên çê kirin." Ev herdû alî û gotin ne xalat in. Lê ev herdû û gotin jî, armanca sereke ya dewletê ya bi çêkirina bendavan re bi tememî nayênina ser ziman. Ji wê zêdetir, dewlet, armanca wê, sereke dîroka herêmê û bi teybetî dîroka xalkên herêmê ji holê rakirina wê ya. Yanî, weke şerekî dewletê û rejimê ya li dijî dîrok û mejûya gelên herêmê jî em dikarin bendavana bi nav bikin.

Bi teybetî, herî zêde, li herêmê botanê li herêma Şirnaxê û li herêmê Dersimê û li herêmê heskîfê û hwd, çend ji wan herêmên dîrokî ên giring in. Dewlet, bi vî rengî, bendavan, di temenê projeyaka dîrokê ya ji holêrakirin û ji dîrokê birina dîrok û navê gelan van bendavan bi kardihêne. Bi vê rengê divê ku mirov bibêje ku bendav, weke cûreyekî şerê dewletê ya li dijî dîroka kurdan û bi teybetî li dijî civata kurdan. Di vê temenê de, divê ku mirov hilde li dest. Bi teybetî, ji ber ku herême heskîfê pirr tê nasîn, li ser wê tê nîqaşkiirn. Lê bendavên ku li herêma Şîrnaxê ku tên çêkirin, bi teybetî, herêmên dîrokî ên giring tên hilbijartin û tê xwestin ku ew di bin avê de werina hiştin.

Herêmên li Dersimê jî, herêmên pîroz ên bo kurdên elewî tên binavkirin bi çêkirina

bendavan re. Bendavên li dersimê ku tên çê kirin, em dikarin, di temenê windakirina tirba Sêd Riza de fahm bikin. Ji bo kurdên elewî windakirina tirba Sêd Riza tê çi wateyê, her wusa, divê ku mirov giirngiya wan bendavan jî bi wî rengî, bêne ser ziman.

Li herêmên kurdistanê, heta nûha, cihên ku bo çêkirina bendavan hatina hilbijartin, ku dema ku em li hemûyan jî binerin, divê ku em bibêjin ku cihna dîrokî na. Yanî jî, cihna pîroz in bo mirovên herêmê. Bi wê re jî, bi çê kirina bendavan re sê tişt li herêmê armanc tên girtin. Yek; cihên ku bi kevneşopî pirr giring in, du; cihên ku dîrokî na, sê; cihên ku giringiya wan di bawerîya mirovên herêmê de hena. Bi vî rengî, ev di serî de, dewlet li belge û dûkomentên dîrokê dinerê û dibîne ku ka kûder giring in. Piştî ku kifşkir, êdî piştre diçê bi ser wan de. Di nava şerê ku dewletê ku li kurdistanê dimeşand de jî, car bi car top diavêtin cihên dîrokî û ewder tarûmar dikir. Piştre digot ku "bi şaşî bûya." Lê ev ne rast bû. Ev jî, weke rêbazekî dewletê ê ji holê rakirinê bû.

Li herêmê, bi wê re jî, temenê civate kurd tê armanc kirin. Herî zêde, cihê ku lê dîrok pêşketîya, ew tên armanc kirin. Bi wê, divê ku mirov bibêje ku weke rêbazaka bêmirovkirina herêmê jî tê bikarhanîn. Lê dewlet jî, dizanê ku dema ku mirov ji herêmê werina ravandin û goçkirin ji herêmê bibê jî, wê mirov piştre vegerihina li herêmê. Bo vê yekê, di serî de, dema ku dewlet, wan goçkirinan dide kirin, di serî de, weke tedbîrekê jî ku ew ji aliyê xwe dihilde, hemû cihê ku weke nirx in û wan bi herêmê ve girêdidin, ew tên armanckirin û ji holê rakirin. BI vê yekê re, êdî piştre, bi tememî dihê xwestin ku ew êdî nema werina herêmê. Bi vê rengê, weke politikayaka dewletê ya teybet heya. Ev politikaya dewletê, bi teybetî, dema ku em bahse wê dikin, di çapameniyê de qat bi qat tê ser ziman. Carna em dibêjin ku "dewlet, dixwezê herêmê bêmirov bike." Carna din jî, em dibêjin ku "dewlet, cihên pîroz armanc digrê bo ku wan dibin avê de bihêle bi çêkirina bendavan re." Carna jî, em dibêjin ku "dewlet, bo ku tevgerîya gerîlla kêm bike bendavan çê dike." Ev gotin hemû rast in. Lê hemû jî, çend ku bi serê xwe nêzîkatîyeka û politikayaka dewletê dihênina ser ziman, her wusa bi wê re jî, ev kirin hemû bi hevdû re tenê armancaka wan heya. Ew jî bi sereke mirov dikarê bi rengê ji holê rakirina temenê civatîtîya kurd bêne ser ziman.

Yanî, li vir, ev çêkirina bendavan, bi şer re kevilkirina herêman, şawitandina gundan, di bin avê de hiştina cihên olî ên pîroz weke ku li dersimê dibê û hwd dibê, hemû di çerçoveyekê de dibin. Ev çerçova jî, temenê civatîtîya kurd ji xwe re armanc dike. Yanî, nîqaşên ku tên kirin û li ser bidest xistina elektirkê û hwd re jî, tenê nîqaşna ku ji bo dewletê û wê politikaya wê bixwe jî dibina weke perdeyekê ku di bin xwe de diveşêrên.

Dewlet, oparasyonên leşkerî û sîyesî, çêkirina bendavan û valakirina gundan, ji holê rakirina cihên dîrokî û ên ku pîroz in bo mirovê herêmê û hwd, di çerçoveyeka ku bi wê dihê xwestin ku civatîtîya kurd were ji holê rakiirin dihên kirin.
Dema ku em çêkirina bendavan, tenê bi sedema bidestxistina elektirkê bênina ser ziman, emê ji aliyekî ve bina alîkarî jî ji dewletê re ku em ser wê kiryara wê ya biqirêt ser binûxûmênin. Dewlet jî, hertimî, dixwezê ku sedemekê ji wan kirinên xwe re, bibîne ku armanca xwe di bin wan de bide veşartin. Vêca, dema ku em ji vî aliyê ve bahse wê bikin û bibêjin bi armanca bidest xistina elektirkê ya, emê ji vî aliyê ve jêre bina alîkar ku ew politikaya wê ya bi armanca ji holê rakirna temenê civate kurd ji berçav bidina dûrkirin.

Li vir, divê ku em vê bibêjin, hinek nirx û tiştên ku weke xarcên civatê na ku wê didin afirandin hena. Ew jî, nirxên ku bi dîrokê re afirîna, cihên pîroz û nirxên baweriyê

na û her wusa dîrok û mejûya ku hatîya jînkirin û şûnpêyên wê na. Ew şûnpêyên dîrokî jî, her wusa, bi cihên dîrokî re, em dikarin bahse wan bikin. Dema ku civat li wan cihan dinerê, pêşî, wê hinekî jî mejûya xwe bibîr bike û hizir bike ku ew demên berê ên wê çawa jîyankirina. Wê fahm bike ku ew xwediyê çi hizrê û bawerîyê na. Bi wê re jî, wê tenê van aliyan hemûyan fahm bike, wê di derbarê xwe û hebûna xwe de jî bi dîrokê û wê fahmkirina wê dîrokê re wê bê xwediyê têgihiştinekê. Ya ku li vir, armanc tê girtin bi bendavan re, ew a ku ew nirxên ku civatê ku li şûn xwe nerî ku li wan binerê ku bo ku xwe û dîroka xwe fahm bike, ew tên ji holê rakirin. Bi wê re jî, hewl tê dayin, ew cihê ku civat ku lê dinerê were xûrûxandin. Êdî bi vî rengî, dema ku ew dîrok hat ji holê rakirin, wê pêşî derbeyek li wê temenê civatî ê ku civat xwe bi wê diafirêne wê were xistin. Hinekî jî, dema ku bendav tên çê kirin, ev alî hemû tên hizirkirin. Her bendav, dema ku biryara çê kirina wê tê dayin, pêşî wê cihê herî giring ê bi vî rengî wê were kifşkirin. Li ser wê re jî, êdî li ser wê re biryar were dayin. Wê bi wê re jî, hewl were dayin ku were dayin ku werina ji holê rakiirn.

Minaq, ev vê yekê bibêjim, bi teybetî, gelek cihên li herêma Şîrnaxê li wan bendav tên çê kirin, berê jî ne hatîya hiştin ku li wan kolanên arkolojikî werina kirin. Her herêma ku dibin avê de dihê hiştin, Berê li wanderan jîyan bûna, û li gelek deverên ku di bin avê de tên hiştin, bajarên demên berê, minaq ên dema sûmerîyan û hwd, ên dema gû, hûrî û mîtannîyan û hwd hena. Dema ku ev bajar bi kolanên arkolojikî werina derxistin li holê, ez karin ji sadî sad bibêjin ku wê li cihna pirtûkxaneyên mazin ên ku di wê demê de hatina afirandin û piştre ku ew êdî piştre wusa mana di wan bajaran de, wê derkevina li holê. Minaq, ji ber çi nayê hiştin ku li Heskîfê, ev kolanên arkolojikî werina kirin, wê li gelek cihên wê, wê rewşna bi vî rengî wê derkevina li holê. Li gelek herêmên li herêma botanê ên ku di van rojên dawiyê de ku dikevina çapameniyê de ku tişî av jî kirina, li wanderan gelek bajarên ku bi arkolojikî ku divê ku werina derxistin li holê hena û ew di bin avê de hatina hiştin. Li wanderan ku lêkolîneka ji rêzê bihata kirin, bi wê tenê li wê herêma şîrnaxê, wê deh qat ji wan nivîsên bizmarî ên ku tên gotin ên dema sûmerîyan ku hatina dîtin û heta nûha ku hatina xwandin, wê werina dîtin. Ev dikarim bêjim ku tenê di bin wan bendavên li herêma şîrnaxê, dehqatî wan nivîsên bizmarî ku hatina dîtin hena. Li herêma şîrnaxê ku heta ku digihijê ber diclê û ankû heta ku digihijê Cizîrî û Nisêbîn û Hazaxê û hwd, li wê qadê, ji bo ku ev rastî newina dîtin, dewletê, bixwe, car bi car hin komên leşkerî di rengê hin komên arkolojikî de didan ava kirin li gelek herêman, tiştên ku ditîn, li wir dihatina winda kirin. Tenê, di wan lêkolînên xwe bixwe de jî, dewletê bixwe jî dîtiya ku li gelek deveran, gelek bajarên ku î ro dibin axê de an û ku divê ku biarkolojikî werina vekirn û lêkolîn li wanderan bo fahm kirina dîroka herêmê werina kirin hena. Lê pêşî, ew herêm, tên kifşkirin ku bi teybetî, ew herêm, tên bijartin bo ku di bin avê de werina hiştin.

Minaq, **ev herêmên ku li wan bendav hatina çêkirin li herêma Şîrnaxê, heta ku ji dema gûtî, hûrî û mîtannîyan ve ku ji wê herêmê re navê "finîkê" jî hatîya bikarhanîn. Di roja me de jî, bi navê "**finîka gelî**", "**finîka Rawî**" û "**finîk**" hatina bi navkirin in. Li van hersê herêmên ku di kevina başûrê şîrnaxê de û ji nav şîrnaxê û pêde bi 35 kîlometreyan û pêde, ku cih bi cih herêmên ku li wan jîyan bûyîn na. Li hin ji wan herêman jî, bajarna mazin hatina avakirin. Ew bajar, heta roja me jî dewletê, ne hiştîya ku kolanên arkolojikî werina kirin. Lê li van hersê heraman jî, bi teybetî li van hersê herêman jî, bajarên ku di bin axê de na û divê ku werina**

**derxistin li holê hena. Tê zanîn ku di wan bajarên dibin axê de, gelek pirtûkxaneyên ku tên gotin tişî nivîsar in jî hena. Ev hemû tên binav kirin û tûna kirin. Minaq, " bajarê finîka" ku weke bajarê duyemin ê navend jî tê zanîn û li başûrê Şîrnaxa roja me dikeve û bi zanî(taxmînî) nêzî 34 kîlometre jê dûr a, heta sadsale 18´min jî, mîrên kurdan, weke cihê ´seyranê´ bikarhanîna. Ewder, weke kirman û ankû keleheka mazin jî ku weke akropolîsa ku li Atîna´ya û berî zayînê di sadsale 5´min û hwd de ku hatîya çêkirin ku weke wê bûya, heya.** Di destana tûfanê de jî bahse wê finika Şîrnaxê tê kirin. Şerefxanê Bedlîsî bixwe jî, di berhema xwe de bahse wê dike û dibêje ku "mîrên bota, ewder ji xwe re weke seyrangeh bikardihanî. Ev, herêmên dîrokî ku dîrokek li wanderan pêşketina tên binavkirin û tûnakirin. Bendav, bi vî rengî, divê ku mirov bibêje ku rengekî ku bi wê armanc dike ku temenê civatî ên li herêmê ku werina ji holê rakirin a. Di van rojên dawiyê de ku şer disekinê, dewlet bixwe êdî di cih de lezê dide wan bendavan. Armanc, bi teybetî, ji holê rakirina civatîtîyê ya. BI teybetî, armanc tê girtin bo ku cihên ku li wan dîrok bûya ku em dikarin her cihekî ji wan weke Akropoleka yewnanîstanê ku em dikarin bihasibênin li vir dibin avê de dihên hiştin.

.. **Piştî** ku di 21´ê newroza 2013´an de, ku pêvajoya nû dest pê kir, herkesekê herî zêde li ser vekişîna hêzên kurd hizrên xwe hanîn ser ziman. Lê hin bi hin pêvajo pêde diçê. Pêvejo, asil ji nûha pêde destpê kiriya. Pêvajoya duyemin ya vê pêvajoyê dest pê kiriya. Di wê demê de jî, herkesekê ku bahse vekişîna hêzên kurd dikir, nûha di derbarê tiştên ku hikimeta tirk bike û gavên ku ew biavêje de, bêdeng in. Ya ku asil ji nûha û pêde ku li ser were sekinîn û were ser ziman ev a. Pêvajoya asil ya ku wê aşîtîyê bêne ev a.

Di vê demê de, gelê kurd û hemû dordorên demokrat, li bendî gavavêtinê na. Li bendî gavavêtinên di çerçoveya çareserkirina pirsgirêka kurd de na. Herkesek li bendê ya, ku mafên kurd ên ku ji destê wan hatina girtin werina radest kirin. Ev pêvajo, hinekî jî bo vê giring a. Di vê pêvajoyê de, çêkirina destûreka nû û têde misogerkirina mafên kurdan û statûya kurdan, ya ku êdî herkesek li bendê ya.

Lê dewlet, heta nûha bêdeng a. Vajê wê, hin agahiyên ku tên guhê mirov ew a ku di komisyona meclisê a ku wê destûra nû çê bike de, di serî de hikimeta AKP´ê û rayadarên wê bi herdû Partiyên din ên dewletê ên weke MHP û CHP´ê re bûya yek û li dijî perwerdehîya bi zimanê dayikê ya. Bi vê yekê, ya ku tê dîtin, ku weke "xitimandinekê" tê dîtin di wê komisyonê de, wusa xuya dike ku di serî de, AKP wê pêş dixe û li ser wê re dixwezê ku vê rewşa bi înkara kurd û nexwestina radestkirina mafê wan, di xwezê ku bide domandin.

Çend ku AKP´ê piştre derkeve ber çapameniyê û bibêje jî ku li komisyonê "levkirinê nebû" jî, di aslê xwe de, mirov wê nikaribê wê rewşa bi navê ne levkirinê tenê bi helwesta partiyên ku di wê komisyonê de na fahm bike û bêne ser ziman. Ji wê zêdetir, di vê ku mirov bi nêzîkatîya dewletê ya ku di civînên MGK´ê de tê kifşkirin re û ku hemû partiyên pergalê ku li gorî wê tevdigerihin, divê ku mirov li gorî wê bêne ser ziman.

Hikimeta AKP´ê, di vê pêvajoyê de, herkesek li bendê ya ku piştî ku pêvajoya pêşî ya vekişîna hêzên kurd ku bidawî bû û pêde, êdî gavên bo demokratîzekirina tirkiya û maf û statûya kurdan gavan biavêje. Lê vajî wê, hikimet û dewleta tirk, di nava hewldanan de ya. Ji dêla ku di derbarê radestkirina maf û azadiyan de gava biavêje, li

herêmên kurdan giranî daye ser çêkirina qarakolan, derxistin qadroyên nû ên cerdewaniyê û sevkkirina hêzên nû ên leşkerî ya li herêmên kurdan li kurdistanê. Bi vê rengê divê ku mirov bibêje ku pêvajo, bi vê rengê ne li gorî ku tê gotin gav tên avêtin.

Di vê pêvajoyê de, bi teybetî, nivîskarên tirk, bi awayekî hereretî vekişîn nîqaş kirin. Lê mijare pêvajoya duyemin ku were ser ziman, di derbarê wê de bêdeng in.

Hikimeta AKP´ê, di vê pêvajoyê de, wusa xuya dike ku dixwezê ku pêvajoya hilbijartinan bide buhurandin. Ya ku li wê dihizirê ev a. Lê bi wê re jî, li kurdistanê, weke ku ji nû ve sistema şer bi rêxistin dike. Çêkirina qarakolan û sevkkirina hêzên leşkerî ên nû tê ve wate yê.

Di vê pêvajoyo de, divê ku herkesek rabê ser xwe û tevlî pêvajoyê bibe. Divê ku di nava tevgerê de bûn. Di vê pêvajoyê de, divê ku rêxistinitî hê xorttir bê kirin. Ji nû ve bi rêxistinkirina civatê û pêşxistina saziyên civatî ên perwerdekirinê û xwe bixwe rêvebirinê, divê ku were pêşxistin. **Kurd, dikarin bi tememî dibistanên tirkî boykot bikin û dibistanên xwe yên artartnatîf ava kin û di wê de xwe perwerde bikin**. **Weke ku çawa ku mêjên xwe derxistina dervî mizgeftên sistemê ku di wan de zimanê kurdî hatibû qadaxa kirin, di karin perwerdekirina xwe jî derxina dervî dibistanên tirk ku di wan de zaroyên kurd tên asîmle kirin û û di wan re jenosîdek tê bi rê ve birin.** Bi vî rengî, tenê mirov dikarê di vê pêvajoyê de bi ser bikeve. ...

Di vê pêvajoyê de, herkesek jî bi lêv dike ku "sistema înkarê hat şikandin." Ev rast a, hatîya şikandin. Lê bi wê şikandinê re valahî afirîya û ji aliyê kurdan û saziyên wan ve jî, hê ew valahî ne hatîya tişî kirin. Dewlet jî, ji ber çi hêzên nû sevkî kurdistanê dike. Bo ku wê valahiyê cardin li gorî xwe tişî bike. Ev valahî, du lingên wê ên giring hena ku divê ku mirov fahm bike na. Yek, sistema perwerdê ya. Ya din jî, avakirina sîstema xwe bi rê vebirinê ya. Dema ku sîstema înkarê hatibê şikndin, wê çaxê, divê ku mirov van herdû lingan bahse wan bike. Dema ku kurd, bi destê xwe sistema perwerdê û ya xwe birêvebiirinê ava nekin, wê nikaribin wê valahiyê dagirin. Êdî wê dewlet bixwe û hêzên xwe, hewl bide ku wê valahiyê tişî bike.

**Divê pêvajoyê de, di vê temenê de, dema ku kurd vê pêvajoyê, bi vî rengî di temenê bi rêxistinakirina civate xwe û avakirina pergale perwerdeya xwe ya bi zimanê xwe û bisazîkirina pergale xwe bixwe birêvebirinê ya xwe ya civatî, wê bi wê karibê di vê pêvajoyê de xwe bi ser bixe. Di vê pêvajoyê de, ji van aliyan ve bernema û projeyên pirr cidî pêwîstî pê hena**.

Divê pêvajoyê de, divê ku mirov vê jî bibêje ku weke ku çawa ku di sale 2009´an de ku ji tevgera kurd hat xwestin ku Agirbestê bike û ku tevgera kurd di 13 nîsanê de îlan kir û piştre di 14´ê nîsanê de oparasyonên qirkirina sîyasî dest pê kirin. Nûha jî, piştî pêvajoya nû, bi teybetî, li bakûrê kurdistanê ji nû ve çêkirina qarakolan û sevkirina hêzên nû divê ku mirov wusa şîrove bike. Bi wê re jî, piştî destpêkirina vê pêvajoyê re derîyê başûrê kurdistanê li rojavayê kurdistanê girtina wê, divê ku mirov, di temenê zihniyeta destpêkirina oparasyonên qirkirina sîyasî ku di 14´ê nîsanê 2009´an de ku destpêkiribûn şîrove bike.

Bi vî rengî, wusa xuya dike ku tirkiya, bi hêzên din ên li herêmê, dixwezê ku vê pêvajoyê vergerênê dorpêçkirina kurdan. Li herêmên afrînê hêrîşên çeteyên çekdar ên ku bi destê tirkiya rêxistinî na, girtina derîyê başûrê kurdistanê li rojavayê kurdistanê, li bakûrê kurdistanê ji nû ve bi leşkerîkirin û çêkirina qarakolan û hwd, hin ji wan hewldanên wê dorpêçkirinê na. Ev hewldan hemû jî, bi hevdû re di çerçoveyekê de bi

zihniyetê û planakê dihên kirin.

**Di vê pêvajoyê de, weke ku çawa ku mirov nikarê hêrîşên komên çekdar ên li rojavayê kurdistanê ji tirkiya cuda şîrove bike, bi heman rengê mirov nikarê girtina deriyê başûrê kurdistanê li rojavayê kurdistanê jî ji wan hêrîşên komên çekdar ên li herêmên afrînê cuda bihizirê. Bi wê re jî, em nikarin çêkirina qarakolan jî ji wê cuda bêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de bizanebûn hewldanên xitimandina çêkirina destûraka nû ku tê de mafê kurdan were misogerkirin jî, divê ku mirov bi hevdû re werêne ser ziman**.

Di vê pêvajoyê de, ku rêxistini ku tekoşînaka girseyî dernekeve li holê, wê hikimeta tirk ji ji dêla ku wê pêvajo bi çareserkirina pirsgirêka kurd û hwd re bibe sêrî û ancamê bide çêkirin, wê hewl bide ku vergerênê pêvajoyaka dorpêçkirina sîyeseta kurd û bi teybetî jî kurdan giştî. Kurdên rojavayê kurdistanê, di vê demê de derî li ser wan girtin, hinekî jî di vê çerçoveyê de divê ku mirov lê bihizirê û fahm bike.

Yanî, di vê pêvajoyê de dewlet, xwediyê plan û projeyekê ya. Lê ew plan projeya wê, ne di temenê çareserkirina pirgirêka kurd û hwd de ya. Di temenê dorpêçkirina kurdan û siyeseta kurdî bigiştî de ya. Ya ku nûha ew têne bi ser kurdan de ev a. **Ji van hewldanên ku li dijî kurdan tên kirin, ku tekoşîn newê xortkirin û mazintirkirin, mirov dikarê gav biavêje û bibêje ku wê di demên pêş de, ti ancam bo destûra nû a bingihîn ku tê gotin ku tê çêkirin wê dernekeve. Ev jî, wê tenê di nîqaşê de bimêne**. Ji ber vê yekê û ji bo hewldanên çareserîyê bigihina armanca xwe û wan nîyetên dewletên ên bi armanca vergerandin pêvajoyê li dorpêçkirina kurdan bigiştî bo ku werê vala derxistin, divê ku teşîn were bilindtir kirin. Ti kesek, divê ku di vê demê de li male xwe ne rûnihê, heta ku ev pêvajo bigihijê ancamê. ..

.. **Piştî Newroza 2013**´an, pêvajoyaka nû dest pê kir. Di vê pêvajoyê de, dema ku em li revakirin û gotinên serokatîya gelê kurd Birêz ocalan diner in, em dibînin ku di serî de pirr mazin hizirkirinaka mazin heya. Hemû tişt, di serî de safî û zelal a. Bi vê yekê re, pêvajoya hatîya dest pê kirin. Lê bêgûman, qarakterê vê demê, pirr giring a ku divêt ku mirov li ser bisekinê û wê fahm bike. Di vê demê de, herkesekê ku tiştekî bike heya. Di serî de, bi teybetî li kurdistanê, sazîyên sivîl û şariştan bi teybetî, bêî ku dem were winda kirin, divê ku xwe bi rêxistin bikin. Divê ku ji her aliyê ve rêxistinî bi sazî û komelên civatî were pêşxistin. BI teybetî, di dema nû de, karê herî mazin dikeve ser milê saziyên sivîl de. Di vê demê de, ew saziyên sivîl jî, çiqasî dikarin xwe bi rêxistin bikin û çiqasî dikin xwe bi hêz bikin, wê ew çendî pêvajo bi serbikeve. Di pêvajoyê, hêzên ku pêşketin bi dewletê jî bidina kirin, wê sazîyên sivîl û demokratik bin. Ji ber vê yekê, di qada perwerde, rêvebirinê, sîyesetê û hwd de, rêxistini û temenekî bi rêxistin ê pirr xort divê ku were afirand in. Saziyên kurd û ên dordorên demokrat jî, divê ku xwe ji nû ve di berçav de derbas bikin û ji nû ve xwe bi rêxistin bikin. Her mirovê ku di sazîyan de kar dikin, ji aliyê rewşenbîrî û perwerdehîya wî û ankû wê ya ku dikarê wê karê bi rêve bibe û cih bi cih ku li gorî gîyane pêvajoyê ku cihhat karibê vîyane xwe jî bikarbêne, divê ku di wan de kar bikin. Pêvajoya nû, bi teybetî, pirr xesas a.

Newroza 2013´an, manifesto û naqşaya pêvajoya nû ya. Ji her aliyê ve dahûrkirina newrozê û bi wê gîyane wê, hertimî û demî xwe zîndî girtin di pêvajoyê de, wê aliyekî ku hem pêşketina pêvajoyê bi demê re biafirêne û hem jî ewlatîya pêvajoyê bo kurdan bide afirandin a. Gîyane Newrozê, gîyane vê pêvajoya nû jî ya.

Dewlet, bi dilê xwe û hesanî wê gavan di derbarê çareserkirina pirsgirêka kurd de neavêje. Hêza ku wê bike ku dewlet gava biavêje jî, ew hêza wan ya bi sazî ya. Di vê temenê de, divê demê de, ji xwe, ku dewlet dilên ku di çerçova oparasyonên qirkirina sîyasî de û ku di bin navê `KCK`ê de ku girtina, ew wan ne berdê, ji xwe wê pêvajo, cardin were sêrî. Ji ber vê yekê, di serî de dewlet jî, divê ku oparasyonên sîyasî û leşkerî di cih de bide rawastandin û li meclîsê komisyonên ku pêwîstî bi wan heya, divê ku ava bike û gavên ku wê biavêje, divê ku ser wan re biavêje. Divê ku were zanîn, çendî ku pêvajo were dîrêj kirin wê bêbawerbûn li dijî pêvajoyê pêş bikeve û wê li gorî demê û gîyane wê, temenê pêşketinê jî ji holê ra bibe. Li vir, berî hertiştî, di cih de gavên ku dewlet, divê ku tavîlî wan biavêje hena. Pêvajo, tenê ku bi gavavêtinên wê bê û hwd bê, tenê were danîn li ser pişta tekoşîna azadîyê û serokatîya wê, wê ti carî bi wê yekalîtîyê pêşnekevê. Ji ber vê yekê, di serî de, divê ku êdî dewlet jî, bi awayekî pirr cidî û samîmî êdî ya ku dikeve ser milê wê de bêne li cih. **Dewlet, divê ku weke ku di dema Sêd Riza de kir, pêşî hevdîtin kir û piştre got "emê, gavan di cih de biavêjim" û piştre sefer li Dersimê da dest pê kirin, divê ku bi heman rengî dîsa nemerdîyê neke.** Li vir, ya ku herî zêde giring, ew a ku dema ku em dibêjin ku divê ku ji pêvajoyê fêr werina derxistin, di vê temenê de di serî de bo dewletê jî, em vê dihênin ser ziman. Gelê kurd bi serokatîya xwe û tekoşîna azadîyê re bûya yeklaş. Bi wê yeklaşîyê, bi girseyî newroz kir û piştgirîya xwe ji serokatîya xwe re hanî ser ziman. Gelê kurd, bi awayekî jidil gavê diavêje û dixwezê muzakare werina destpêkirin û pirsgirêka kurd êdî were çareserkirin. Lê hertimî jî, gûmana di serê kurdan de ew a, ku weke ku di dema Sêd Riza de bû, gelê kurd ku rastî wê nemerdîyê hat ku di vê demê de jî rastî wê were. ..

Pêvajo, ji bo kurdan û aliyê kurd jî, pirr xesas a. Divê ku ti carî rahewet pêşnekeve. Ku rahewet pêş bikeve, wê tişta ku hat serê Tamilîyan wê were serê kurdan. Wê kurd dersimên nû bijîn. Divê ku em carek din bibîr bixin ku dema ku tamiliyan jî pêvajoyaka hevdîtinan dabûbû dest pê kirin û pê bawer kirin û piştre Rahewet di nava wan de pêşket û rêxistiniya wan ya leşkerî û sîyasî bi wê rahewetê re lawaz bû, êdî piştre dewlet Sîrî-lanka jî, piştre ji wê îstîfada kir û ew komkujiyên mazin bi nemerdana hanîn serê temiliyan. Ev pêvajo, divê ku em ji bîr nekin ku di pêvajoyaka bi vî rengî de bûya. Di wê dema ku artişa Sîrî-lanka şer bi tamilîyan re da destpêkirin, hingî li Oslo hevdîtinên wan didoman.

Bi vê rengê, divê pêvajoyê de, di serî de, giringiya rêxistinibûna sazîyên sivîl û xwe xortkirina qada sîyeseta kurd, pêwîstî pê heya. Bi teybetî, di sîyeseta xwe ya hundur a nava kurdan de bê û di dîplomasîya xwe ya navnetewî de bê, divê ku sazîyên xwe yên giştî ku dikarê li ser navê kurdan gotinê bibêjin û ku ji aliyê herkesekî ve jî meşrû dihên dîtin, divê ku tavilî werina ava kirin. Divê demê de, pêvajo, lêbelê û lêbelê dikarê tenê bi wê hêza kurdan a civatî ku hertimî xwe zîndî bigrê wê pêkwere. Divê pêvajoyê de, divê ku hemû kurd jî bizanibin ku heta ku pêvajoya çareseriyê negihijê armancê û çareseriya pirsgirêka kurd pêknewê, divê ku ti carî xwe berdan û rahewet pêk newê. Heta ku pêvajo, bi gavavêtin şenber negihijê ancamê, wê ti carî, xateriyên li ser serê kurdan ên ji dewletê wê dawî li wan newê. Ya ku di serî de divê ku kurd û saziyên wan bizanibin ev a.

Bi teybetî, di vê demê de, karê mazin dikeve ser milê rewşenbîrîya kurd de jî. Ji herdemê zêdetir xwe bi zanebûn bike û xwe bi rêxistin bike. Ya ku wê ji herkesekê û ji hertiştî zêdetir li ser pêvajoyê bi baldar bê jî wê ew bê. Bi vê yekê, berpirsîyarîya ku

dikeve sermilê rewşênbîrên kurd de jî, ji herdemê û zêdetir û dûqattira. Herkesek, divê ku bêî ku ti gûman û dilqaswasî pêre hebê, divê ku xwe tevlî pêvajoyê bike. Ji her demê zêdetir, divê ku bi baldar bê. Her pêşketin û rûdawên ku rû bidin, divê ku necarekê deh caran werina şîrove kirin û xwandin. Ji dêla carekê deh caran hizirin û ji dêla kirina tiştekî di hundurê wê dema ku ew tişt bi tenê dihat kirin de kirina deh tiştan jî, pêwîstî, pêdivî û zarorîyeta vê demê jî ev a.

Ji ber vê yekê, di vê demê de, berî hertiştî saziyên sivîl û sîyas ên civatî ku dikarin vî karê ku di pêvajoyê de were kiirn ku hildina ser milên xwe û ku dikarin bi vê re bibin, divê ku di nava kurdan de werina ava kirin. Ji vî aliyê ve, nûha, valahiyek bi sazî û sîyasî heya. Bi pêvajoya nû re, ew valabûn zêdetir bûya. Her wusa pêwîstîyên demê jî bi wan sazîyan re zêdetir bûya. Divê demê de, Her qada jîyane û civatî û sîyesetê, divê ku sazîyên sivil û ên sîyasî wan dagirin. Ya ku wê bê ewlekarîya pêvajoyê jî ev a. Ku dewlet, ji xwe, hê wan astangiyên xwe yên li pêşîya sîyeseta kurd û sazîyên wê civatî ku bide domandin, ji xwe wê ew êdî bê nîşanaka nejildbûna dewletê û wê bi rengê ku di serê dewletê de hin rojevên vêşartî ên di temenê kirina komkujiyên mazin de hena wê bê xwandin.

Di vê temenê de, pêvajoya nû, pêvajoya pêşaroja gelê kurd a. Bi vê pêvajoyê re, wê gelê kurd civatîtîya xwe bide ava kirin, saziyên civatî bide ava kirin û pergela xwe ya perwerdehîya bi zimanê dayikê wê ava bike. Bi teybetî, karên bi awayekî pirr bicidî ku divê ku di van waran de werina kirin wê hebin. Ji ber wan jî, divê ku kar werina kirin. Bi teybetî, saziyên perwerdehîyê divê ku werina ava kirin. Dibistan û zankoyên artartnatif li kurdistanê di vê demê de divê ku werina ava kirin û amûr û pirtûk û hwd, divê ku afirandin. Bi vê re, pêvajo, wê hin bi hin temenê xwe biafirêne. Xweserîya demokratik ku di 14 tirmeha 2011´an de ku kurdan denezend divê ku di wê temenê de, xwe bi rêxistina ji aliyê pergale perwerde, saziyên civatî û sivil û siyasî ve divê ku were kirin. Rêxistiniya bi vê re, divê ku were zanîn ku wê temenê ewlakarî û parastina rojavayê kurdistanê jî biafirênin. Divê ku were dîtin û zanîn ku her kêmesîya ku di pêvajoya bakûrê kurdistanê de derkeve li holê, wê bandûra wê li rojavayê kurdistanê jî bibe. Bo vê yekê, di serî de, giranî dayîna rêxistiniya saziyên civatî ên ku li ser wan re civat ku karibe xwe û nirxên xwe û bi wê re jî ku pêşketina pêvajoya nû biparêzê, divê ku werina ava kirin. Saziyên ku hena jî, divê ku werina xorttirikirin hem ji aliyê zanebûn û têgihiştinê ve. Bi teybetî, di vê demê de, dema ku bi rêxistini di temenê qarekterê pêvajoyê de di nava civatê de newê kirin, divê ku mirov qabûl bike, ev pêvajo, wê hingî bê pêvajoyaka ku derbeyê li kurdan bixe. Ji ber vê yekê, divê ku ti kesek nebê ku "êdî tekoşîn xilas bû û êdî aşîtî wê pêk were". Divê ku ez bibîr bixim ku tamiliyan jî ev gotibû. Ji ber vê yekê, ti carî, ev newê gotin û her kesek karê xwe ji her demê zêdetir lê xwedî derkeve û hê bêhtirî karê xwe bike. Divê ku bê zanîn ku karê mirov ê ku mirov divê ku bike, bi vê dema nû re bûya dûqat. Yanî bêhtir bûya. Ya ku di serî de, ku divê ku were dîtin û fahm kirin ev a.

Pêvajoyên bi vî rengî, herî zêde, ji rahewetê re pirr vekirîna. Herî zêde, di pêvajoyên bi vî rengî de rahewet pêk tê. Ji ber vê yekê, di serî de, di vê temenê de li gorî demê û qarakterê demê divê ku mirov xwe di zihniyet û têgihiştina xwe de, divê ku xwe ji nû ve weke ku bi perwerde bike, divê ku xwe ji nû ve biafirêne.

Ev dem, demeka pirr xesas û telûkeyên wê pirr in. Çend ku kurd, xwe bi rêxistin bikin û rêxistiniya mazintir bikin, wê karibin, xwe ji wan telûka û xaterayan rizgar bikin. Li

herêmê, ku dewlet, wê valahiyê bibîne bi bûna rahewetê re, wê tişta ku tişta ku dewleta Sîrî-lanka bi xadarî hanî serê tamiliyan wê tirkiya bêne serê kurdan. Ji ber vê yekê, divê ku mirov bi teybetî, van xaterayan di bîrê de bihêle. Divê ku mirov pêvajoyê, pirr baş bixwêne. Dem, ne tenê dema axiftin û tenê gotin gotinê ya. Dem, dema kirin û karkirinê ya. Ya ku wê pêvajoyê bi ser bixe û pêvajo biserbixe û kurdan ji komkujiya xilas bike jî ev a.

Divê ku em ji bîr nekin ku dewlet, heta nûha jî, ji devê T. Ardogan bixwe jî, dijîtîya xwe ya li dijî perwerdehîya bi zimanê dayikê û statûya kurdan hanîya ser ziman. Divê ku em van gotinan ti carî ji bîrnekin. Divê ku ev gotin, hertimî weke guharên di guhê keçikan de, di guhê me de bin. Hertimî di bîra me de bin. Ev gotinên rayadarê dewletê, ku kengî me ji bîrkirin, emê hingî rastî komkujiyên ku dewlet bi me bide jînkirin werin.

Pêvajoya nûha wê li ser parlamenê re bi meşê. Meclîs, divê ku êdî komisyonên xwe ava bike û gavên pêwîst biavêje. Lê nûha de, weke li dijî hevdûbûna CHP`ê û AKP´ê derxistina li pêş, lîstika dewletê ya bi wê dixwezê pêşîya gavavêtinên ku ew divê ku biavêje bide gortin û êdî gavan neavêje. Di vê temenê de, ev hemû lîstik in. Ya ku divê ku em di serî de bibînin ev a. Di vê demê de, emê bibînin ku dewlet, çendî ji jidil a. Di vê temenê de, di nêzîkatîyên di nava partîyan de jî, dewlet wan dîzayn dike. Emê bibînin ku wê çawa wan têkiliyan bêne rojevê.

Divê demê de, bi teybetî, divê ku dewlet jî, dilên di destê xwe de berdê. Bi tevlîkirina wan jî, ji nû ve hem qada sîyesetê, hem qada civatîyê ên bi sazîyên sivil ên weke ziman perwerde û hwd, û qada sazîyên xwe bixwe rêvebirinê werina avakirin û xort kirin. Weke ku Çawa ku BDP´ê li her bajarê kurdistanê xwediyê rêxistiniya xwe ya, her wusa bi heman rengî, di temenê rêvebirinê de, divê ku DTK´ jî, xwe li her bajarî bi heman rengî û bi awayekî mayînda bi rêxistin bike. Bi vê rengê, li her navend, navçe û bajar û bajarokên û hwd divê ku xwe bi rêxistin bike û bîro´yên xwe her bajar, navçe, herêmên kurdistanê vekê. Bi vê rengî, temenê xwe bixwer rêvebirinê, divê ku biafirêne. Her wusa, divê ku ez vê jî bibêjim ku dema ku mirov bihizirê, mirov wê hê gelek aliyên din ê bi sazî ku divê ku mirov xwe di jîyane de bi rêxistin bike mirov wê kifş bike. Weke teybetmendî û qarakterê vê demê, divê ku ev werina kifşkirin û rêxistiniya wan ya bisazî were kirin.

Li qita Emerika û dewleta Emerika û li hin welatên ewropa jî, fêr û cerba zankoyên artarnatîf heya. Ev jî, divê ku bêî ku dem werê winda kirin, divê ku komîteyek were ava kirin û li wê lêbikolê û fêrna û cerbna bo avakirina pergale perwerde li kurdistanê ku divê ku were avakirin, divê ku jê derbixe. Ev ´zankoyên artarnatîf´ û ankû "Unofficial Université" dihê dîtin. Yanî, weke dibistan û ankû zankoyên dervî dibistan û zakoyên ku dervî dewletê hatina ava kirin in. Di wan de perwerde û hwd, ne li gorî zihniyete fermî ya dewletê û temenê politikayên wê n civatî na. Bi teybetî, ev dibistan û ankû zanko, tenê civatê bi dîrok, çand, raman û civaknasîya wê re esas digirê. Li ser wê re, pêşketina civatê, di temenê ku ne muhtacî dewletê bê kar dike. Yanî ev dibistan û ankû zanko(universite), di temenê zihniyeteka saziyên sivîl de hatîna ava kirin in. Li her herêmê, komên mamosta û ankû xwandevan, bi hevdû re xwe bi rêxistin dikin û temenê xwe diavêjin û dibistana xwe ava dikin bi zimanê xwe yê dayikî. Piştre, pêşdixin di temenê sazî û têgihiştina civatî de. Pirtûk, û hwd, hemû amûrên xwe yên perwerdekirinê, bi xwe bidestê xwe diafêirênin.

Li kurdistanê, ji her demê zêdetir, divê ku kurd heyîdar û baldar bin. Divê ku heta ku

pêvajo negihijê ancamê û çareserîya pirsgirêka kurd pêkneyê, divê ku xwe berdan û rahewet çênebê û rûnebê. Bêgûman, dewlet jî, wê hertimî hewl bide ku wê bide kirin. Ya ku li vir, ku herî zêde li ser wê heyîdarî were kirin jî ev a.

Gelê kurd, bi tekoşîna azadîyê û serokatîya wê ve, heta nûha gelek derfet bo çareserkirina pirsgirêka ji dewletê re hatina afirandin û dane nîşandin. Lê dewletê, heta nûha yek jî bikarnehanîya. Minaq, piştî 2001´an dema ku birê Ocalan hêzên kurd derxistin dervî sînor bû. Lê dewletê ew yek weke "bidawîbûn!" û tûnabûn!" bilêvkir û hanî ser ziman. Gavên ku bo çareserkirina pirsgirêka ku di wê demê de bihatan avêtin hingî nehatin avêtin. Î ro jî, ku defet didê dewletê ku gavan biavêje û pirsgirêkê çareser bike. Bi heman rengî, weke pêvajoya 2001´an ku nêzî pêvajoyê bibe û bibêje ku "teslim bûn!" û piştre gavên ku divê ku ew biavêje û ku neavêje, wê hingî pêvajo bixitimê. Gelê kurd, ya ku ketîya ser milê wê de bizêde jî kirîya. Serokatî û tekoşîna wê ya azadîyê jî ya ku ketîya ser milên wan de kirina. Divê ku êdî dewlet jî, gavên pêwîst biavêje. Divê ku pêvajoyê, wusa şîrove nekê ku bibêje firsand ev firsande û ku derbeyna bixwezê li kurdan bixe. Gelê kurd, jidil û bidil gavên pêwîst û ên ku ketina ser milê wê de bicih hanîna. Hem dordorên kurd jî û hem jî ên tirk jî, divê ku hem gotinên xwe bi cidîtîyekê bibêjin û hem jî bi berpirsîyar tevbigerihin.

Ev dem, demeka pirr giring a. Bi vê yekê û rengê, herkes divê ku bicidîyet û berpirsîyar tevbigerihê. Pêvajo, ji gelek telûka û xaterayan re vekirîya. Herî zêde, dema ku dewletê pêvajo dîrêj kir û bi gotinên xwe hêrîşî kurdan, tekoşîna wan û nirxên gelê kurd weke ku î ro dike ku domand û kir, wê hingî pêvajo têkherê. Dewlet, ku gavên ku dikevina sermilê wê de ku neavêje, ji xwe hingî wê bi tememî pêvajo bixitimê. Heta roja me, rayadarên dewletê, her derfet û firsanda ku bo çareserkirina pirsgirêka kurd ku bi rêyên aşîtîyane derketîya li holê, dewletê xwestîya ku di wir de derfetê bikarbêne û derbeyekê li kurdan û tekoşîna wan bide. Ji ber vê yekê ya, ku şik û gûmana kurdan ji dewletê heya.

Li herêmê, wê kurd û tirk jî di rex hevdû de bijîn. Ku kurd dewleta xwe ya serbixwe jî denezênin, wê dîsa ev rastî neguharê. Li vir, ya herî giring ew a ku weke ku birêz Ocalan hewl dide ku bike û berî î ro bi dehan caran hanîya ser ziman ku ´têkiliyên kurd û tirkan, bi hevdû re bi awayekî rast û pak bipeyman bike. Di wê temenê de ku êdî kurd jî û tirk jî, herkesek bi maf û azadîya xwe ku karibin bijîn. Li herêmê ku kurd jî û tirk jî, xalkên din weke ereb û faris jî, ku karibin di nava têkilîyên xwe yên civatî û sîyasî ên bi hevdû re ku karibin pirsgirêkên xwe çareser bikin. Li herêmê, di nava gelan de temenê vê heya. Lê rejimên ku avabûna û î ro desthilatdar in, ji xwe re xateka nîjadperestî hilbijartin û li ser wê re şer xwe hembi hevdû re û hem jî bi xalkên herêmê re dan kirin. Î ro, ev weke aliyekî pirr giring ku divê ku em di temenê pirsgirêkên herêmê ên ku afirîna şîrove bikin a.

Gelê kurd, gelekê herêmê ê herî qadîm a. Dîroka wê diçê ta dema Sûmerîyan. Kalkên kurdan, ji qasîtîyan bigirê heta ku digihê digihijê Gûtî, hûrî û mîtannîyan û piştre Medîyalîyan û piştî wan re Şadadî, Merwanî, Eyûbîyan û hwd, dîrokeka pirr

demdirêj a bi nirx li herêmê bi gelên herêmê re nivîsandina. Bi vê re, ya ku were dîtin ew a ku pêşaroja ti gelan ne di şer de ya. Ya hemûyan di aramî û aşîtîya nava wan û ya di herêmê de **ya**. ..

Ev dem, demeka jîyanî û pirr giring a. Her mirovê ku heta nû, ku hertimî bi çend gotinan yanî fêrî rexnekirinê bûna û yanî tenê bi gotina xwe ve bi sînor mana, divê ku ew jî ji aliyê xwe ve tişta ku bikeve ser milê wan de êdî bikin. Ev, pêvajo, bi serbikeve, wê bê serkevtina hemû kurdan. Lê ku têk herê û cardin komkuji, werina serê kurdan wê dîsa bi heman rengî bê êşa me hemûyan. Her wusa, divê ku ez vê jî bibîjim ku di rewşeka bi wî rengî ya biêş de, wê her dordorên ku yan xwe bi rahewetê berdan û hem jî ên ku xwe bi zanebûn bê û ankû ji nezanî bê ku xwe li dervî pêvajoyê hiştina jî wê berpirsîyar bin. Dem û pêvajo, hatîya wê astê û radê ku êdî mirov ji bo ku ti kesekî nikarê bahse nezanbûnê û hwd bike. Ev pêvajoya vî 30 salî a ku bi şer domîya, piçûk mazin ´, di herkesekî de têgihiştinek û zanînek bi demê re afirand. Herkesekî paya xwe jê girt. Nûha jî, dor hatîya ew tişt û zanîna ku herkesekî jêgirtî wê pretize bike û ji aliyê ve tevlî pêvajoyê bibe. Her wusa, ew seferberîya ku î ro li rojavayê kurdistanê ku bo rêxistini û avakirina sazîyên civatî ku destpêkiriya, divê ku em bi bakûrê kurdistanê re jî bikin û bi heman rengî, wê rengê û seferberîyê li bakûrê kurdistanê jî bidina dest pê kirin. Em, di serê her gotina xwe de dibêjin ku "ev pêşketina rojavayê kurdistanê, bi carekê nebû û di ancama tekoşînaka 30 salî de bû. Her wusa, heman tiştî divê ku mirov ji bo bakûrê kurdistanê jî bibêje. Bi heman rengî û gîyanê, di temenê kirina yek ya pêşketina rojava û bakûr de, divê ku em di nava seferberîyeka birêxistinî de bin bo bakûrê kurdistanê. Ya ku wê serkevtinê bi xwe re bêne jî ev a. Wekî din jî, pêvajo wê her pêla wê ya ku were, wê derbeyekê bi xwe re ji kurdan re bêne. Ew hişyarî û hişarîya li rojavayê kurdistanê ku bi rojavayê kurdistanê re derketiya li holê, bi heman rengî û ji wê zêdetir jî, bo bakûrê kurdistanê jî pêwîsta. Bi vê rengê, divê ku em kurd navaroka pêvajoyê ji aliyê xwe ve bi rengê xwe tişî bikin.

.. Di vê pêvajoyê de hikimeta tirk, pirr zêde li ser refaransên olê re dixwezê ku civakê bi bandûr bike û serdestîya xwe çê bike. Olê, di temenê weke «artarnatifeka» pêvajoyê de birêxistin dike. Piştî destpêkirina pêvajoyê de dîsa derketina li holê rêxistinên îstihbarî ên dewletê ên bi rengê «huda-par, hizbileh ku kurd weke ´hizbil-kontra´ bi nav dikin û hwd derketina li holê. Ev jî, dide nîşandin ku divê ku em dûbare li olê vegerihin û wê şîrove bikin û hwd bidin ku wê fahm bikin. Islamiyet çi ya û ne çiya, divê ku mirov wê baş û qanc fahm bike. Dîroka olan, ku mirov li wê dihizirê, mirov dibîna û fahm dike ku ol bi dîroka re, ji demên pirr-xwûdatîyê heta ku tê dema yek-xwûdatîyê, ol weke pergale rewîst(ahlaq)ê derketîya û pêşketîya rê şanî mirov bi têgihiştin û pêşketina wê re daya. Divê ku mirov olê hinekî jî bi vî rengî bêne ser ziman û bi dîroka wê re ji wê re bi dîroka wê re rêz û hûrmetekê bide nîşandin. Ji dema olên yek-xwûdatî ji Êzîdîtîyê û Cihûtîyê heta ku tê û gihijê Filehî(mesîhî)tîyê û Misilmantiyê, ev dîroka olên yek-xwûdatî, bi teybetî li ser temenê ahlaqê ava na. Ku mirov bahse olê û pirgale wê ya bi dîrokê re ku dem bi dem pêşketîya bike û bêne ser ziman. mirov wê bi têgihiştin û jîr û bîrewerîya mirov re, mirov wê dîrokeka teybetî ya ahlaqê jî bêne ser ziman. Ol, bi vî rengî û dîrok û pêşketina xwe re jî, hertimî bûya weke hêzekê. Ew hêza wê, berî herkesekî desthilatdar wê kifş dikin û dixwezin ku lê bibina xwedî. Di dîroka olê de fermîbûna olan, hinekî jî bi wê hêz û kifşkirina wê ya ji aliyê desthilatdarîya ve girêdayî

ya.

Ol, bi teybetî, ku em wê dîroka wê ya fermîkirina wê bênina ser ziman, divê ku mirov hinekî bi dirêjahî bêne ser ziman. Lê ew jî, bi wê dirêjahîya wê re bimêne weke mijara nivîseke me ya din. Li vir emê tenê du minaqan bidin û bi buhur in. Bi teybetî minaqa pêşî ji Filehiyê ya. Piştî ku Filehî derket û ku ser 315 salan li berxwe li ser temenê rastteqînîya xwe, piştre ji aliyê împaratorîya Roma ve ku wê hêza wê kifş dike, ji xwe re weke ola fermî dikin. Kostantînîsê Bizansî, bi çanda Filehiya ku di dema bavê wî de ne fermîya û bidizî tê jîyîn pêş dikeve û mazin dibe. Piştre, ew ku tê ser serê Bizans, êdî ew ola filehiyê ji xwe re weke ola fermî ya dewletê dibijêrê. Ew, derdikeve pêşîya bizansîyan û dibêje ku "min dûhû xewnek dî, û di xewne xwe de min dî ku wa leşkerên min li ser mirtalên wan xaçûsalîb hebû." Ev xewne wî tê şîrove kirin ji aliyê şêwirmendê wî re û weke peyemekê jî tê şîrove kirin. Piştre êdî bêî ku dem were winda kirin, Kostantînîs, wê ola filehiyê hilbijêrê û artişa xwe li gorî ku wî di xewne xwe de dîtîya wê bi şûr û mirtal bike. Tê gotin ku "wî, li pêşîya mirtalên leşkerê xwe hemûyan xaçûsalîb daye danîn."

Ola filehiyê, bi vê herêkirinê re êdî wê cara pêşî wê bê oleka fermî ji bo desthilatdarîyekê. Bizans, piştî ku filehî herê kir, hingî, aliyê împaratorîya roma a rojhilat ku li ber ji holê rabûnê bû, wê bi wê re bê weke hêzeka cihanî ku navande wê anatolia ya. Heta wê demê aliyê Împaratorîya roma a rojava ku li pêşîya aliyê xwe yê rojhilat bû, piştî wê re êdî aliyê rojhilat derdikeve li pêşî û serdestîya xwe li ser wê jî dide herê kirin. Piştre, aliyê împaratoriyê ê rojava ku piştî sadsalên 4.min û hwd, ku têkçûya û êdî ji hoilê rabûya, wê êdî bi li gorî bizansê ku xwe bi têgihiştin dike û filehiyê herê dike, piştre ew jî dibe weke hêzekê û derdikeve li holê. Romaya serdema navîn, wê êdî bi vî rengî bi ola filehiyê wê derkeve li holê. Piştî wê demê re, wê di hundurê dusadsalî de wê li rojava hema bêja hemû keyanî û desthilatdarî wî bina fileh. Êdî, filehî bîrdozîya roma ya.

Piştî wê demê re ne bi gelekî re wê êdî Îslamiyet jî derbikeve. Îslamîyet, wê vanqas pêşketina rast bixwêne û wê di destpêka xwe de, xwe bide herê kirin. Di destpêkê de, wî îslemiyet, ji desthilatdarîyê ne dûr derkeve. Di dema Hz. Mihemed de, ku wilo zêde hê nebûya ola desthilatdarîyê, ole îslamê, wê pêşketina herî bingihîn ya mazin di wê demê de bide jîn kirin. Lê piştî Hz. Mihemed re, wê êdî rêveber û desthilatdar ola îslamê herê bikin. Bi wê re, di demeka pirr kin de, wê cihaneka îslamî were afirandin. Hê ku Hz. Mihemed, li jîyanê bû, wê desthilatdarîya îslemiyetê wê nemeyan binivîsênin û bişênina rêveberî û desthilatdarîyên din ên herêmê re ku wan dewetî îslemîyetê bikin. Piştî hz. Mihemed re, wê êdî cihên ku bersivê nadin jî, wê seferên "fetih"kirinê dest pê bikin. Gotina "fethê" jî, hinekî jî ji vê ya. Peyamên olî ên ku hatina ser ziman jî, hemû jî pirranîya wan li jîyane desthilatdarîyê na. Peyemên Hz. Mihemed, ên ku wî bixwe hanîna ser ziman ji xalk û gelan re, ew jî, piştre di destê desthilatdarîyan li gorî wan û xwestekên wan têna şîrovekirin û rast kirin. Bi vî rengî, êdî desthilatdarî li Îslemiyetê pêş dikevin. Ti rêveberî li herêmê ku ne misilman ba, piştre êdî ne dikarî bijîya.

Îslemiyet, weke hêzeka mazin, bû û derketa li holê. Xalk û gelên ku ji olê bawer kirin û bawerîya xwe bi olê hanîn, bi dilekî safî û paqij bawer kirin û di rêya wê de meşîn. Lê mixabin, rêveberîyên ku piştre weke rêveberîyên îslemî jî bûn, mirov nikarê vê yekê ji bo wan bibêje. Wan, hertimî li desthilatdarîya xwe nerî. Di wê çerçovê de li olê û heyîn û hebûna wê nerîn.

Piştre, pirranîya desthilatdarîyên ku bûna misilman, piştre ew hêza olî ya mazin kifşkirin û bi wê xwestin ku mazin bibin. Di vê çerçovê de weke bîrdozîyekê nêzî wê bûn. Bi vê yekê û rengî, êdî ol ji bo xwe bikarhanîn. Desthilatdarîyên xwe, weke "desthilatdarîyên misilman" dan nîşandin û dane revakirin. Li gorî wê têgihiştinê jî, kirin û xwestin ku herkesek li gorî wan û xwesteka wan bijî. Bi vî rengî xalk û gelên herêmê li gorî xwe dane jîn kirin. Xalk û gelên herêmê bi dilê safî û paqij nêzî olê dibû. Lê rêveberî û desthilatdarî, tenê ji bo ku li gorî xwesteka xwe xalk û gelên di bin destê xwe de birê ve bibin lê nêz bûn. Yên ku li dijî wan dirabûn jî weke ên ku "li dijî olê rabûna û dijminatîya xwûdê kirina" hatina şîrove kirin û ser ziman. Bi van gotinên bi vî rengî, rêveberîyan gelek gotin afirandin û ew gotin, weke gotinên ster û parastinê ji bo xwe bikarhanîn. Minaq, di roja me de, kurdên ku doza maf û azadîya xwe dikin û tê dikoşîn li Îranê, ew weke "mirovna ku li dijî ola îslemiyetê muxelefet kirin û dijiminatîya xwûdê kirina" têna gûnahbarkirin û têna darizandin bi awayekî li berçav û piştre têna bidarve kirin." Ev minaqa bi vî rengî ya Îranê, birengna din Tirkiya jî, di nava xwe li dijî kurdan bikar dihêne. Minaq, di nava tirkiyê de gotinên ku têna bi karhanîn ev a, ku "em birayê misilman in, divê ku em hemû bi hev re weke xwe bijin û ji dewletê doza ti mafî nekin." Di nava vê gotinê de, gotina "divê ku em doza ti mafî ji dewletê nekin," di vê çerçovê de tê bikarhanîn. Li gorî wê gotinê jî pergaleka têgihiştinê tê afirandin û bi mirovan hewl tê dayin ku were herê kirin. Minaq, "yên ku li dijî tirkiye şer dikin Ermenî na" û hwd, hê ku gelek gotinên bi vî rengî dibêjin, bi van gotinan dikin ku pêşî li mafxwestinê werê girtin.

Bi vî rengî, li Kurdistanê, ji ber çi dewleta tirk xwestibû ku deh hezar meleyan bişenê tenê kurdistanê? Tevî ku misilmantiya kurdan ji ya wê hem di têgihiştinê de bê hem jî ji di rastîyê û kirinê de pêşketîtir û li pêştira jî, dibêjin ku emê deh hazar meleyan bişênina kurdistanê. Bi wê re jî, sazî û enstûtîtên fethulahçîyan jî dişênina kurdistanê û dikin û dixwezin ku di nava kurdan de biçih bikin. Ew jî, bi vî rengî olê tênina ser ziman. Lê divir de divê ku ez bibêjim ku dewletê di hemû mizgeftên ku li kurdistanê bê û ên ku li herêmên tirkiyê bê, di wan de axiftina bi kurdî qadaxa kirîya. Hemû gotin û kirin û waaz, bi tirki wê bibin. Ev yek, weke pêwîstînî û mecbûrîyetekê ya. Bi vî rengî jî, yên ku li dijî wê rabin, dikin ku bidina nîşandin, weke ku li dijî olê rabûya bidina nîşandin. Bi vî rengî jî, dixwezin ku pêşîyê li berrabûnê bigrin.

Ku mirov li dîroka kurdan binerê, divê ku mirov bibêje ku kurdî, ji destpêka îslemiyetê ve û heta ku tê ve demê weke zimanekî olî jî ya. Zimanê, weysel qaran, bawê tahirê Ûryanî, Êlî Herîrî, meleyê Cizîrî, Feqiyê Teyran. Mele hisêne bateyî, Şêx Ahmedê Xanî û hwd, kurdî bûya. Ev zaneyên weke van zaneyan, ziman kurdî bûya. Mirov karê hê weke van zaneyan gelek zaneyên din jî navê wan biniivîsêne û bêne ser ziman. Minaq, medreseya sor, ku weke medreseya sor di sadsale 14´min de ji aliyê mîrê bota yê wê demê ve hatîya ava kirina, zimanê wê kurdî bûya. Li cem zimanê kurdî têde zimanê erebî jî hebûya. Medreseya sor, divê ku ez bi teybetî û binxat bikim û bibêjim ku weke zankoyekê bû. Di dema xwe de gelek beşên wê hebûn. Beêşn ku ji bo yên ku ji destpêkê hê nû bidest xwandinê dikirin hebûn. Beşên ku tê de yên mazin weke ciwanên ku î ro li zankoya dixwandin têde dixwandin hebûn. Di wê dibistanê de, ji fîzîkî û matamatîk, felsefe û hwd, ku hê gelek beşên din ên ku bi teybetî lê bi wan perwerde dibûn hebûn mirov karê bahse wan bikin. Kurd, di van deman de, kurd, asta wan ya zanînê, ez

dikarim bêjim ku ji gelek aliyan ve ji ya roja me bixwe jî ku em têde dijîn pêşketîtir bû.

Bi vî rengî, ku pêşketinek hem bi ziman û têgihiştinê li kurdistanê hebû, dewletê, piştî ku avakirina komarê re, ev rewşê hemû bi zimanê kurdî re qadaxa kir. Herêm ji nivîsar û pirtûkên kurdî hat paqijkirin. Yên ku di wan deman de bi kurdî diaxiftin, rastî kuştinê jî dihat in. Bi vî rengî, dewletê, bidest hin pêvajoyna bişavtin(asimlasyon)ê bi hevaltîya rêbaz û rêyên tûndûtûjî û şîdetê dest pê kirin. Di pêvajoya tirkkirinê de bişavtin(asîmlekirin) û tûndûtûjî bi hev re hatina bikirin li ser serê kurdan. Î ro, roja ku em têde na, bişavtin(asîmlasyon) bi tememî hat şîkandin. Lê hê jî, ew pêvajoya ku dewletê bi wê dabûbû dest pê kirin, bi tûndûtûjîya ku dabû dest pê kirin, dixwezê bi heman tûndûtûjitîyê re bide domandin. Î ro, ew şîdet û tûndûtûjîya li ser serê kurdan ku di sînorê wê ti sînor nayêna naskirin, tenê ji bo wê ya. Bi vê yekê re, ol jî, dixwezin ku di wê de bikar bênin.

Kurdan, ji ber ku ev rastî pirr baş û qanc fahm kir ku dewlet ji bo ku pêvajoya asîmlasyonê bi olê bibe sêrî, êdî kurdan mêjkirinên xwe derxistina dervî mizgeftên dewletê ên ku di wan de zimanê kurdî heta roja me jî qadaxa ya. Ev kirina kurdan, bû weke derbeyekê li wê pêvajoya bişavtinê ya dewletê ya li ser serê kurdan bû. Ji ber vê yekê, piştî ku dewletê çi bertek da li dijî kurdan û kurd ji ya xwe ne hatina xwerê, êdî piştre dewletê projeya dibistanên "îmam Hatîp´an kirina rojevê de. Lê vê carê kirina van dibistanan li kurdistanê cûdahîuyeka wê ji ya demên berê hebû. Ew jî ew bû ku dixwestin ku dibistanên ku bidestê sazî û enstûtûtîyên Fethullahçîyan û dîyanaetê ku bi hev re ava kirina, dikin ku asta oldarîya di hundurê wan de zêdetir bikin û li kurdistanê biçi bikin. Bi van dibistanan dixwezin ku wê pêvajoya bişavtin(asîmlasyon)ê bidima domandin. Li vir divê ku ez vê bibêjim ku di wan dibistanên olî ên bi navê "Îmam Hatip"´an de jî kurdî weke zimanekî qadaxakirî ya. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. Lê di vê demê de tişta ku li van dibistanan tê zêdekirin ew a ku li wan dibistanan cihê razanê tê çê kirin. Yanî, dixwezin ku zaroyan hê di piçûkatîya xwe de, bikina wan deran de û ji malbata wan dûr bikin û nehêlin ku dê û bavê wan ên ku bi kurdî diaxivin ew dengê wan bikin, bi wî rengî êdî wê karibin wan bi tememî bişivtêne(asîmlekirin) nin.

Bi vî rengî, farqa van dibistanên "îmam hatîp"´î, ji ya wê dema komkujiya dersimê ya ku hêzên dewleta tirk, dê û bavê zaroyên kurd di kuştin û ew zaro dihatina hewkirin û dikirina komyonên leşkerî de û dibirina rojavayê tirkiye û ew zaro radestê malbatên leşkerî ên tirk dikirin ku wan weke tirk mazin bikin nîn a.

Î ro jî, ew desthilatdarîya tirk ya bi navê AKP ku lê desthilatdar a, rengê olê li dijî kurdan bikarhanî. Di dema ku hat ser desthilatdarîyê, çend gotin gotin û di wan de hanî ser ziman ku "mê pirsgirêka kurd çareser bikin." Lê ev gotin hemû jî tenê ji bo aqil ji rê biirinê bûn. Ol, tenê ji bo ku wî şerê ku li dijî kurdan dewleta tirk dide meşandin de ku karibê wê bikar bêne li dijî kurdan, ji ber wê ya. Dewleta tirkiye, hertimî li ser tiştekî sekinî ya ku hêsteka olî li dijî tekoşîna kurdan ya ji bo maf û azadîya xwe biafirêne ya. Ji bo vê yekê jî, ew dibistanên Îmam Hatîp û sazî û enstûtîyên ku fethullahçiyan li kurdistanê bicih kirin. Lê gelê kurd ji aliyê opldarîya xwe û têgihiştina wê ve hertimî heta vê roja me li ser wê têgihiştina dewletê re bûna. Ji ber vê yekê, dewleta tirk jî, li dijî kurdan bi ser neket. Li bakûrê kurdistanê ku bi aslê xwe Cizîrî bû Şêx Mihemed Nûrûllah hebû. Dewletê, pêşî xwest ku wî li cem xwe bibîna. Lê Şêx Mihemed Nûrûllah, ew yek herê nekir û li dijî dewletê rabû. Piştî wê re êdî ew bi çend oldarên din

ên weke wî bi rêz re di qazayaka bigûman de hat kuştin. Gelek mirovên oldar ên li herêmê, heta roja me jî dibêjin ku "dewletê, ji ber ku ew li cem wan nesekinî ew da kuştin." Piştî Şêx Mihmed Nûrûllah re birayê Şêx Evdil baqî hat dewsa wî. Lê dewletê piştre êdî ji malbate wan bi tevahî dilnexweş bû û zor li wan kir û çû bi ser wan de. Bi wê zor û çûna bi ser wan de ew ji wir ji Cizîrê kirina der û Şandina herêemeka weke Denîzlî ya li ber bahre sipî ku pirr ji kurdistanê dûr a. Li wir jî, hertimî pêşîya wan hat girtin ku têkiliyeka weke berê bi herêmê re dênin. Kuştina Şêx Mihmed Nûrûllah, weke ya Şêx Maşûqê Xiznavî ya. Ev herdû, mirov jî, serokna olî ên rûhanî ên li kurdistanê bûn. Bandûra wan pirr mazin bû. Ji wê jî, ew hatina kuştin.

Bi Kuştina Şêx Mihmed Nûrûllah re, hat xwestin ku pêşîya komên ku dewlet wan di bin navê olê de dişêne herêmê ên fethullatçîyan were vekirin. Piştî kuştina Şêx Mihemed Nûrûllah re li herêmê bi hezaran ew mirov hatina şandin li herêmê. Bidestê wan mirovan jî, gelek mirovên oldar û rewşenbîr hatina kuştin. Î ro, herkesek jî dizanê tenê bi destê fethullahçîyan, herî kêm ser 20(bîst) hezaran re mirovên kurd ên oldar, rewşenbîr û zaneyên civakê ên ku li pêş bûn hatina qatilkirin. Lê heman fethullahçî, dema ku diçina ewropa, ew weke "oldar" têna dîtin. Rastîya Fethullahçîyan ya li kurdistanê ev a û rastî wan ya li ewropa jî ev a. Divê ku mirov bibêje ku yekî ku li ser navê olê mirovan dikujê çawa dibê oldar?Divê ku rayadarên ewropî jî bersiva wê pirsê bidin.

Li kurdistanê, dewletê rêya partîya AKP,ê xwest ku xwe li kurdistanê weke "partîyaka oldar" bide nîşandin û bi wê re kurdan ji maf xwestina bide dûr kirin. Bi vê yekê, partîya AKP, partîya ku ol bi wê herî zêde weke maske hatîya bikar hanîna. Temenê AKP jî, li ser wê rewşa enstîtû û sazîyên fethullahçîyan ku me hanî ser ziman tê avakirin. Dibinî de, li kurdistanê, bi rêya van sazîyan û bi rêxistinkirina wan, dixwest ku li kurdistanê birêxistin bibe. Rêya ku di destê dewletê de mabû tenê jî ew bû. Partîyên weke CHP ku rêyê wan yê qirêj û kujar hatina dîtin, êdî ji kurdistanê hatina paqijkirin. Dewletê, heta salên 2001´ê jî li ser van partîyan re hanî. Lê êdî dî ku wê nikaribê ku li ser wan bide domandin. Li ser vê yekê, êdî partîya AKP, hat ava kirina weke rûyekî qaşo "nû" hat ava kirin. Tevî ku gelek partîyên olî ên weke "partîya refah", "Seadet partîya" û hwd hebûn jî, li ser wan re neçûna kurdistanê. Ji ber ku rûyê dewletê yê ku ol bikardihanî ê li ser van partîyan re hinekî jî hatibû dîtin ji aliyê gelê kurd ve. Di ancama vê de, pêwîstî bi avakirina partîya AKP ji aliyê dewletê ve hat dîtin. Lê dema ku ev partî hat ava kirin, çend ku dem bi dem AKP weke "hizbeke" ku ji "miillî gorûş"a ku Erbakan weke serokekî wî yê mazin dihat dîtin jî, lê dîsan, ew ev gotin û têgihiştinên bi vî rengî ên ku hatina afirandin jî bi zanebûnbûn û tenê ji bo ku kirasê têgihiştinaka "nû" li wê partîya nû ku hatibû ava kirina ya AKP bikin bû. Ji wê û pê de, ne ti tiştekî din bû.Bi vî rengî, di temenê serdestkirina tirkitiyekê de avakirina pertîyeka ku reng û kirasê olî lê bû, bi wê, êdî wê karîban bêhtirî olî li kurdistanê bikar bênin.

Li gor min, hê jî bi tememî ew partîya AKP û rengê wê bi tememî ne hatîya fahm kirin. Partîya AKP, di aslê xwe de, di têgihiştina xwe de ji partîya tirkiye ya MHP faşîşttir bû. Ji vî aliyê ve ti farqa wan nebû. Kurdan, ji ber ku ev rûyê vê partîyê ê qirêj pirr baş dît, êdî di dîroka xwe de di cara pêşî de tiştek kir. Bi girseyî bi sad hezaran derketina qadan û dirişma "katîl Ardogan" qêrîn. Heta vê demê, di dema ti serokwezirê tirk de, bi vî rengî bi girseyî ev dirişm bi vî awayê ne hatibû qêrîn. Lê di aslê xwe de ev qêrîna vê dirişmê ya ji aliyê kurdan ve bi girseyî, weke peyemekê jî bû ji dewletê re ku

jê re gotin ku ´me politikaya qirêj´ ya li ser Ardogan re kifşkirîya. Lê kurdan, tevî ku rastîya dizanîn jî, dem bi dem xwestin ku hin derfetna bidina dewletê ku bi rêyên danûstandinê ê demokratîkî ku pirsgirêka kurd were çareser kirin. Di çapemeniyê de, hin kes û rewşenbîr, ev weke "fersandekê ji hikimeta AKP re bû" şîrove kirin û hanîn ser ziman. Lê di aslê xwe de, li ser AKP re ji dewletê re bû.

Politikaya dewletê ya ku olê li dijî kurdan bi rêya enstûtîyên Fethullahçîyan û dibistanên "îmam Hatîp´an û hwd ku li dijî kurdan bikar bênin, di vê demê de pirr baş rûyê wê yê rast li ser kirinên AKP re hat dîtin. Lê di vê demê de, ku mirov bipirsê jî ji ber çi AKP wilo zêde li ser desthilatdarîyê hat hiştin, bersiva wê hinekî jî bi sîyeseta wê ya li dijî kurdan ku li welatê dimeşêne ve girêdayî ya. Heta roja me, tevgera azadîya kurd, weke "hêzeka ji aliyê rojava hatîya afirandin ji li dijî welatekî Misilman". Bi wê re jî, di nava çapemeni û rayagiştî ya ereb û persan de û her wusa xalkên din de li dijî kurdan ku karibin piştgiriyekê bistênin. Serokên olî ên mezheban jî, dewlet bi wan re dikeve têkiliyê de û di vê temenê de ji wan dixwezê ku ew gotina li dijî tevgera azadîya kurdistanê bibêjin. Bi dane gotinên bi vî rengê re, êdî li ser wan re sîyesetekê li ser temenê olî li herêmê li ser esasê li dijî statûya kurdan û kurdan bixwe dikin ku bidina meşandin. Bi vî rengî, dewleta tirk li ser AKP re xwest ku du alî û du rû bileyizê. Tevî bi vî rengî li ser AKP re li rojhilat bi olê li dijî kurdan bê û bi rengên din bê dileyizê, her wusa rûyê wê yê din jî ew bû ku li ser wê re ji ewropîyan re dihat gotin ku "wê tirkiya, were hanîn li asta ewropa" û hwd. Bi vî rengî, xate Sîyasî ya ku rêxistinîya wê li ser AKP re dihê kirin, dikin ku weke "serokekê bîrdozî" fethullah gulen were derxistin li holê. Ya rastî, ku di çapemeniyê de derdikeve liu holê ev a. Lê ev mirov bixwe jî, ne bi zanebûna xwe û ne jî biasta xwe ne di wê astê û radeyê de ku wê serokatîya ku ew lê baxş dikin ku bike. Heta roja me jî, ew mirov bixwe jî, gotinên seîdê kurdî û ankû Bedîûzzaman ku bi aslê xwe kurd bûya terçûme dikin û li ser wê re dikin ku serokatîyaka qarîqatûrî bidina kirin. Lê ya rastî ew a ku ew hizrên wî kurdî bixwe jî fahm nakin û bialîyê wê re tê nagihijin. Heta roja me jî, ez hê fethullahçîyan alî û rêya têgihiştina seîdê kurdî tênegihiştina. Fethullah gulen nîjadperestekî ji rêzê ê tirk a. Hemû hizir û nerîna xwe di vê nîjadperestîya xwe re lê dinerê. Di aslê xwe de, dewletê, xwest ku li ser vî nîjadperestî re bi teybetî di keseyetîya tarîqate kurd ya ´naqşîbendî´yê bikarbêne û li ser wê re tirkitiyê pêş bixe. Ev jî, aliyekî din ê bi guharandin û vajî nîşandina reng û awayê têgihiştina kurdî ya bi naqşîbendîyan re ku hebû bû. Bi teybetî, dewletê ne hişt ku naqşîbendîtî bi navê kurdî û zimanê kurdî pêş bikeve. Lê ev tarîqate kurd, çend ku li ser esas û temenê tarîqatî jkî bû, di temenê "ûmmetîtîyê" de, xwediyê têgihiştin û pergelaka têgihiştinê bû. Maf ne dane kurdan ku kurd vê bi navê xwe pêş bixin. Lê bi navê tirkitiyê, ku hemû nivîsar û pirtûkên wê jî hatina tercûmekirin li tirkî û li ser wê re hat xwestin ku dîrokeka tirkitiyê bê nivîsandin. Di vir de, lîstik li ser nîşandina awayê vê tarîqatê re ya. Mixabin, şêx, mirîd û oldarên vê xatê jî, ev lîstika dewleta tirk ya li ser tarîqate naqşîbendîtîyê re zêde fahm ne kirin û ne dîtin. Yên ku dîtin jî, bi awayekî weke ku dewlet bixwe jî dibêje hatina "bêbandûrkirin." Lê di asta bilind de, şêxên ve tarîqatê ên ku li dora Sêrtê û hwd dijîn jî, dewletê bi politikaya dewlet çû bi ser wan de. Ji bo ku ew li dijî kurdên ku doza maf dikin biseknin û ku neseknin jî bêdeng bimêni jî, pirr bi zanebûn çû bi ser wan re û bi wan leyist. Şêxên ku li dijî wan sekin in jî ên weke Şêx Mihemed Nûrûllah jî, hatina kuştin.

Ji ber çi Fethullah Gulen bi teybetî li dijî tekoşîna kurdan ya ku doza mafê kurdan dike, gotinên qirêt dibêje û hêrîşê li wan dike? Bi teybetî, di vir de divê ku mirov du tiştan fahm bike. Yek, li ser fethullahçîyan re weke ku li Ewropa dibe ku weke "oldaran" didina nîşandin, bi vî rengî li cihane ereb jî dixwezin ku wan bidina herê kirin. Bi vî rengî, rengê wê pergale têgihiştinê ya Naqşîbendîyan bi rengê nîjadperestîyeka tirkî bidina nişandin dibin rengê olê de. Li ser wê re, dikin ku li dijî kurdan têgihiştinekê di pergalê re bide afirandin li dijî kurdan û wê têgihiştinê bi wî rengî di olê de jî bidina rûniştandin. Bi vî rengî, di temenê reng nişandinê de ku tevgera kurdan weke "tevgeraka ne oldar" bidina nîşandin û li ser wê re dîmenekî bidina afirandin û olê li ser wê re hem li dijî kurdan temenê bikarhanîna wê bidina afirandin û hem jî bi wê tekoşîna kurdan û tevgerîya wê bidina mahkum kirin. Bi vê re, êdî kurdan bi tememî bêdeng bibin û ji holê rabikin. Di nava xalkên ereb, faris û tirk û bi teybetî kurdan de gotina "ûmmetîtîyê" bi teybetî tênina ser ziman. Di nava gotina olî ya ûmmetiyê de û bi teybetî di nava pergale tirkîtîyê de bidina halandin.

Di aslê xwe de, gotina "ûmmetîyê" ya ku olê ku Hz. Mihemmed têne ser ziman, li dijî vê têgihiştin û awayê gotina ûmmetîyê ya ku dewleta tirk li ser dîyanet û fethullaçîyan re têne ser ziman a. Di wê gotina ûmmetîyê ya Hz. Mihemed de, "millet" û ankû "gel" hena. Lê ev gotina millet û ankû gel ya ku ew têne ser ziman, di wê de pirralîtî heya. Yanî "gelek xalk û gel bi hev re bi nirx û cihêrengîya xwe re dijîn. Ev gotina ûmmetîyê ya ola Îslamê ku temenê wê Hz. Mihemed afirandîya, wê pirralîtîyê înkar nakê û red nakê. Lê gotina dewleta tirk ya Ûmmetiyê ku ew bahse wê dike, wê têgihiştina ûmmetî ya Hz. Mihemed Înkar dike. Gotina ku hatî malkirin li oldarên tirk, tenê di temenê tirkitiyê de tê ser ziman. Cûdahiyên din ên civatê red dike û înkar dike. Ji ber vê yekê, divê ku mirov bibêje ku tenê ev gotina ûmmetîyê bi rengê wê yê rast ji devê wan nayê ser ziman. Wê rastîya wê ya ku Hz. Mihemed hanîya ser ziman, di temenê wê têgihiştina înkarê de hatîya red kirin. Ji ber vê yekê, dema ku mirov wê gotina olî jî û ya ûmmetî jî ku Fethullahçî bahse wan dike, herdû ji têgihiştin û rastîya gotina ´ûmmetîya´ ku Hz. Mihemed hanîya ser ziman dûr a. Birhan(kanit)a vê jî ew a ku em bibêjin qadaxaya zimanê kurdî bixwe jî ya. Bi wê re jî, dijminatiya ku li dijî kurdan û komên din ên cihêreng ên weke sûryanî û hwd a**.**

Bi vî rengî, divê ku mirov bibêje ku ji aliyê têgihiştinê ve, gotina olê û ya ûmmetîyê jî, bi hev re ji aliyê van sazîyên fethullahçî ku weke sazîyên saloxgerî kar dikin û bi rêxistin in, "deforme" kirina. Ew deforma´tî jî, di têgihiştin û awa û rengê têgihiştinê de bûya. Gotina Ûmmetîyê ya esasî ya olî ya ola îslamê ku Hz. Mihemed têgihiştina wê hanîya ser ziman, nav û ziman û hebûna civak û xalk û gelên jev cûda înkar nakê û red nakê. Hemûyan bi cihêrengîya wan re dike nava xwe de. Di dema ku gotina Ûmmetîya ku Hz. Mihemed tê ser ziman ji aliyê oldarên kurd ên bizane ve ev gotin tê gotin. Tê gotin ku "xwûdê gotiya ku ´min we weke milletan afirand da ku win min nas bikin." Bi vê gotinê, bal tê kişandin li ser wê ciherengîya gotinê û navaroka têgihiştina wê. Li ser vê têgihiştinê wê re, êdî hewl tê dayîn ku ew rastîya wê were ser ziman. Di aslê xwe de ya ku fethullahçî înkar dikin, ew têgihiştina navarokî ya ku bi navê xwûdê tê ser ziman ya bi navê ku xwûdê ku tê ser ziman û tê gotin ku "xwûdê gotîya min we weke milltan afirand da ku win min nas bikin." Ji vê yekê, tê fahm kirin ku ev sazî û enstûtîyên ku navê olê bikar tênin, ne li gorî rastîya wê û mirovatîya wê tênina ser ziman. Wê înkar dikin.

Li herêmê, bi teybetî ji salên 1980´î û pê de, hertimî hewl hatîya dayin ku di nava olê de bahs û navê kurdan bi tememî were jêbirîn. Ji ber vê yekê, Oldarên kurd ên weke Şêx Mihmed Nûrûllah, Şêx Maşûqê xiznevî û hwd hatina qatil kirin. Li sûriyê, berî Şêx Maşûqê xiznevî were kuştin, hin gotinên ku li ser lêvan bi vî rengî bûn. Dihat gotin ku "divê ku dewlet navê şêxîtîyê ji ser şêx û keseyetiyên ku biaslê xwe kurd in ji ser wan rabike." Yanî, dihat xwestin ku ev jî ji aliyê dewletê ve werê kifşkirin. Piştre, bidest hêrîşan li mirovên şêx ên kurd bûn. Piştre jî, ji Îranê ji devê Hûmeynî "fetwa" serê kurdan û civake wan hat dayîn. Piştî wê fetwa´yê re "cihad li dijî kurdan hat rakirin û bi hezaran mirov weke oldar hatina şandin ku li rojhilatê kurdistanê li dijî kurdan werina şerkirin. Di ancama wê "fetwa" û "cihade" li dijî kurdan de bi hezaran kurd hatina kuştin. Li Îraqê jî, dema ku Saddam li dijî kurdan bidest komkujiyan kir, navê "enfal" bikarhanî. Navê ´enfal´, navê sûreyekî kûran´ê ya. Bi vî rengî, kurd, bi awayekî pirr bi sîstemetik, di temenekî de bi wan re hat şer kirin û ew şerê li dijî wan jî, hewl hat dayin ku di olê de temenê wê were afirandin û bi wî rengî bi olê were "meşrû" kirin. Li tirkiye jî, li ser fethullahçîyan re bê û li ser dîyanetê re bê, dijberî û dîjîtîya kurdan hertimî hewl hat dayin li ser sazîyên qaşo olî re were kirin. Ol, li ser wê temenê li dijî kurdan hat bikarhanîn. "Fetwa"yên li serê kurdan ku dîyanete tirk di sale 1997´an de ku qaşo li dijî kurdên êzîdî bû, di aslê xwe de li dijî kurdan hemûyan bû. Hingî, dîyanetê, denezenek weşand û tê got ku "êzîdî, bergê ji şeytên re dikin." Bi vî rengî, êdî piştî ku ev gotin hat bikar hanîn, li ser vê gotinê re û li ser çapameniyê re bi awayekî sîstemetikî nivîs jî hatina weşandin û bi wê re navê "kurd" bi teybetî hat xwestin ku weke "dij-ol" bidina nîşandin. Li ser wê re dema ku bahse Salahadinê Eyûbî ê ku bi aslê xwe kurd jî bûya ku bahse wî di hat kirin, dihat gotin ku "ew ne kurd a." Bi vî rengî, bi tememî hewl dihat dayin ku kurd ji olê werina paqijkirin. Ev nêzîkatî, bi teybetî, li herêmê di nava van welatên ku kurdistan di nava xwe de beşkirina, weke ku sazîyaka wan ya ku wan bi hevbeş û hevkarî avakirina û bi teybetî û sîstemetîkî li dijî kurdan bi vî rengî ji bo ku wan ji olê paqij bike tevdigerîya. Gotina "fetwa"yê ya ji devê Hûmeynî, gotina "enfal"ê ya ku saddam dabûbû oparasyonên ku di wan de kurd qatil dikirin, gotin û kirinên sazîyên fethullahçîyan û dîyanete tirk û gotinên oldarên ji Sûrîye ku li dijî kurdan dihatina gotin û hin ji wan gotinan ev bûn ku "navê ´şêxîtîyê´ ji ser kurdan divê ku were rakirin," û hwd, di wê temenê û çerçovê de bi hev re li dijî kurdan dihatina kirin.

Ev nêzîkatî, kirin û tevgerîyên ku me li jor hanîn ser ziman, bi kirinî bê û bi gotinî bê, hê em karin gelek gotin û kirinên din bi ser van ve bikin û bênina ser ziman. Bi vî rengî, di serî de, divê ku mirov vê yekê bibêje ku kurd, di vê demê de bi teybetî bi tememî dervî statûqû û statûya herêmê hatina hiştin. Ji hemû nivîsar û pirtûkên olî bixwe jî, bi awayekî bi zanebûnî kurd navê wan têde ne hatîya ser ziman. Ku bahse cihekî bi navê kurdan re biheta kirin, ku ew beşa kurd di nava sînorê tirkiyê de ba, ku ne gotiban tirk jî wê bigotan "li vê herême tirkiyê ev bûya" û hwd, bi vî rengî wê bi heta ser ziman. Her wusa li Îran, Sûriye û Îraqê ev bûya. Li cihê ku ne dikarîn, kurdan weke fars, tirk û ereb bidina nişandin, navê wî welatê li ser wan serdest bû dihat bihar hanîn. Divê ku ez vê yekê bi teybetî bibêjim ku bi vî rengî, êdî hertimî navê kurdan hewl hatîya dayin ku newê ser ziman. Mixabin, şêx û oldarên kurd jî ku ji tirsa bê û ji nezanî bê di wê çerçovê de tevgerîya na. Ku di nava oldarên kurd de bahse "kurd" û "kurdistan" hatîya rojevê û ser ziman, wan jî gotiya ku "ya giring ol û ûmmetîya wê ya." Ev gotina ku oldarên kurd ji dêla gotinên ku navê wan tênina ser ziman bi navê olê

çend ku ne xelat bûn jî, di dema ku dihatina bikarhanîn de jî bi wê awayê bikarhanînê xelatîyek li ser navê xwe û olê dikirin. Pergal(sîstem)a olî, ya ku serdest hatibû kirin, gotinên wê yên ku dihatina gotin, hemû di çerçove têgihiştin û zanîna desthilatdarîyên ku li herêmê serdest de bûn. Bi vî rengî, divê ku mirov bibêje ku biqasî wê hewldane oldarên tirk, hin oldarên ereb û faris ku dixwestin ku di navê kurd û kurdistanê ji holê derbixin û jê paqij bikin, ev nêzîkatîya oldarên kurd jî hem ketîya xizmeta vê hewldan van desthilatdarîya ku navê kurd û kurdistanê ku dixwestin ji olê paqij bikin û hem jî bidestê xwe wan oldaran civate xwe bidestê xwe dikuştin. Oldar, oldarê civakê ya. Divê ku rêz û hûrmete wî, weke ku olê gotîya û jê tê gotin li gorî olê, ku nirxên civate xwe biparêzê ya. Bi vî rengî, divê ku oldarên kurd, êdî bi navê xwûdê û pêxember zimanê xwe yê civake xwe di nava xwe de bikar bênin. Ku vê nekin, wê karibin bêjin ku rêz û hûrmete wan ji civak û mirovên ku xwûdê afirandîya wê hebe? Ji ber vê yekê, di serî de ev lîstikên ku li ser olê re tên leyistin, di serî de divê ku werina dîtin. Divê ku were dîtin ku fethullahçî ku ne oldar in lê xwe weke oldar didina nîşandin û li ser navê dewletê olê li dijî gelan bikar dihênin ji bo ku dewletê li ser wan serdest bikin. ..

Di van demên dawiyê de û bi teybetî jî piştî wê bombaya ku li Dîlok´ê ku ji aliyê MÎT`a tirk ve hat taqandin û bi isrer dixwezin ku biavêjina ser tevgera azadîya kurd û bi wê re gotinên ku ew tênina ser ziman, hinekî jî bi vî rengê sîyesete dewletê ve girêdayî ya. Rejima Bassê ya Sûriye ku heta roja me weke tirkiye li kurdan kiriya, dibêjin ku "têkiliya PKK û Esad bi hev re heya." Ji ber çi dixwezin wê têkiliyê bidina çêkiirn? Ji ber dû sedeman. Sedema pêşî ew a ku karibin tevgera kurd di nava rayagiştî de li ser wan gotinên têkildanînê re teşîr bikin. Sedeme dûyemin jî, ew a, ku bi Sûriye û rojavayê kurdistanê ve girêdayî ya. Bi teybetî li rojavayê kurdistanê, kurd êdî hin bi hin statûya xwe ava dikin. Tirkiye ji vê yekê nexweş a. Ew li dijî statûya kurdan a. Naxwezê ku kurd bigihijina ti statûyê li herêmê. Ji ber vê yekê û vê sedemekê, êdî dixwezê ku hêza tevgera kurd li ser gotinên bi vî rengî re teşîr bike û bi wê teşîrkiirnê re teng bike. Êdî bi wê re, bandûra rojavayê kurdistanê ya di nava kurdan de bişikêne. Ji wê wirdetir jî, ku karibin bikevina nava rojavayê kurdistanê û wê temenê statûya wan ji holê rabikin.

Tirkiye, di nava xwe de, bi hin hewldanên aqil ji rê birinê qaşo ên "çareserkirina pirsgirêka kurd", ketibû têkiliyê de bi tevgera kurd re. Tirkiye di wir de jî, tenê li ser bêçekkirina kurdan sekinî. Weki din jî, ti hasabên wê yên din nebûn. Lê piştî ku dî ku wê nikaribê bigihijê vê armanca xwe, êdî bidest hêrîşan kir. Piştî ku wê bidest hêrîşê kir, êdî kurd jî ketina parastinê de. Bigiştî êdî hêza gerîlla bixwe jî ket nava tevgerîyê de. Bi wê re şerê di naqabîna artişa tirk û hêzên gerîllayên kurd de zêdetir bû. Î ro jî, ku ev heyvek bi ser ve çû, li herême Şamzînanê hêza kurd qadgirtîya û têde bicih bûya. Herêmên stretejikî bidest xistina. Tirkiye wê nikaribê ku bi serbikeve. Tirkiye bi stretejîya dewletî ya ku meşîya, li herêmê hemû hêz hildane hemberê xwe. Sûûdî Arabîya û Qatar bixwe jî, ku î ro di çapameniyê de tê gotin ku "bi tirkiye re tevdigerihin" jî dikarin siba bêjin ku em ne bi tirkiyê re na û li dijî wê bisekin in. Weke ku Di naqabîna Îran û tirkiyê de pirsgirêkên dîrokî hene, ji dema Osmanîyan ku mana, pirr pirsgirêkên dîrokî di nava cihane ereb û tirkiyê de jî hene. ..

Tenê di sadsale 18´min de ew tevgerên ku di nava ereban de ku li dijî Osmanîyan pêşketîna mirov li berçav bigirê, mirov dikarê bêje ku wê tirkiye, nikaribê di nava cihane ereb de wilo zêde derkeve li pêş. Cihane ereb, ti carî tirkiye weke hêzeke herêmî

li ser serê xwe naxwezê. Cihane ereb, wê ew bixwe bibe hêzek. Wilo tê xûyakirin, derfetên zêde ên mudaxeleyê li Îranê ên Leşkerî nemana, ku mudaxele bibe jî, heya ku Îran jê bihêztir derkeve. Ti kesek li ser wê rewşê zêde nasekne. Çend ku li ser temenê mezhebî di naqabîna Îran û cihane ereb de hin pirsgirêk hebin û bi van şerên weke ku ên li Sûrîye re dihê xwestin ku ew nakokîyên ku di nava Îran û cihane ereb de hene werina kûrtirkirin jî, ji cihane ereb ku çend desthilatdar ji wê re hebin jî, wê gelên ereb ji wê re nebêjin herê. Ev jî, aliyekî din ê ku temenê mudaxeleyan zortir dike. Tirkiye vê nabînê. Weki din jî, tirkiye li ser temenê hin politikayên dixwezin ku nakokîyên mezhebî kûrtir bikin, wê zêde li ser vî temenî şerên mezhebî pêş nekevinê Cihane ereb jî wê li dijî wê derkeve. Ji ber ku ne li gorî berjewendîyên wan jî ya. Di vê rewşê de tirkiye hem xwe ji cihane ereb jî û hem ji Îranê jî û hem ji kurdan jî ku weke sê xalkên herêmê ên herî mazin û bi bandûr in, ji wan dûr kir û kira dijbertîyê de. Divê ku mirov di vir de vê jî bi ser gotina xwe bike ku bi desthilatdarî û rejimên dîktator ên li herêmê re, meşrûtîya desthilatdarîyên herêmê di serê xalk û mirovên rojhilat de weke berê nema ya. Ji ber vê yekê, mirovê rojhilat ku rewş were wê asta li ber sekinînê, weke ku li Sûdanê, Tunis, Misrê û hwd bû, dikarê li dijî wan bikave şer de jî. Hêza birayê misilman, ku tenê li ser temenê olî ava ya, ew jî, çend ku olî jî bê, nêvî bi nêvî meşrûtîya wê di serê mirovên li rojhihilat di nava ereban de heya. Lê di hin kirinên wê ên ne demekratik ên bi demê re, wê ew meşrûtîya wê bi nêvî jî wê kêmtir bibe. Meşrûtîya birayê misilman, î ro li misrê ne li ser ya dema Hûsnû Mubarek re ya. Ji ber vê yekê di vê demê de piştdayîna ti rêveberîyê li rojhilat ên ku li ser desthilatdarîyênê, mayîndabûnekê bi têkiliyan re û bi nêzîkatîyê re bixwe nayêne. Birayên Misilamn, zagonên şarîatê li misrê kirina dewrê de. Ev rewşa li wir ya li misrê, weke dîmenekî din ê rewşê di dema ku li Afganîstanê ku Talîban bû serdeste têne bîra min û berçavê min.

Rewşa li herêmê ya ku herî zêde têkiliyan aloztir dike hebûna kurdan û statûya wan a. Kurd, hê bi tememî bi statûya xwe nebûna hêzeka mazin. Lê di cewherê xwe de hêzeke mazin ya herêmî na. Bi rengî, wê rewşa kurd zêde dewam neke. Êdî ku tirkiye bixwezê jî û nexwezê jî wê pirsgirêka kurd çareser bike. Ji ber ku bi navê kurdan desthilatdarîyek derkeve li holê û ku êdî hêzên derve û ên herêmê karibin têkiliyê dênin. Ji ber vê yekê, wê kurd hin bi hin statûya xwe bidest bixin. Lê piştre li ser awa û şeklê wê desthilatdarîyê wê pirr çûn û hatin bibin. Lê ku desthilatdarîya ku çawa ava bibe jî, wê ne weke ya li Îranê û cihane ereb bi tememî di rengê olî de bê û ne jî wê di temenê nîjadperestîyê re de bê. Ji xwe derfetê wê di nava kurdan de jî, ne bi têgihiştina wan û ne jî bi hebûna civake wan temenê wê nîn a. Kurd, desthilatdarîya ku bi demê re ava bibe, wê ji herêmê û ji têgihiştina desthilatdarîya herêmê ya demên pêş re de bê nûbûnek û mînaqek. ev yek, wê pêşketinê bi xwe re ji kurdan û ji herêmê re bêne. Lê hêzên rojava jî û ne rojavayî jî wê bixwezin ku li ser wê desthilatdarîyê bibina xwedî bandûr û serwerî. Mijara kontrolkirina desthilatdarîya kurd, di zane min de wê di demên pêş de herî zêde weke mijaraka ku li ser were axiftin a. Di nava vê rewşê de, li ser AKP re jî, wê wilo zêde dewleta tirk nikaribê kirasê Îslemiyetê bikar bêne û li ser wê re pêş ve herê. Ji ber ku politika û stretejîya wê ya dewletî, dû aliyên wê bi pirsgirêk hene. Yek, li ser temenê serwerî û serdestîyê di temenê têgihiştine metingerî de êdî ti hêz wê nikaribê bijî. Aliyê din jî bi nîjadperestîya wê re dijbertîya wê ya ku heya ya. Ev herdû alî, wê tenê wê ji holê rabikin. Weki din jî wilo zêde wê ti fêde wê nebe. AKP, li ser vê temenê, weke rê û projeya xwe ya xilaskirinê dibîne. Lê ew jî êdî têk diçê.

Politikayên înkara kurd, di temenê wê de ol pirr zêde hatîya bikarhanîn. Gotina ´layikitiyê” weke maske hatîya bikarhanîn. Lê di bin wê de jî, hertimî oldarîyeka bi tirkitiyê dihê pêşxistin li ser hemû dordorên civatê tê farz kirin. BI partiyên weke CHP´ê re çawa layikiti, di rengê politikayên olî de tê kirin, em hinekî divê ku wê jî fahm bikin. Li ser levkirina AKP, CHP û MHP li ser înkara kurdan û qadaxaya li ser zimanê kurdî: Di van rojan de, nûçeyên ku ketina ajansan de ew bûn ku di wan de tê ser ziman ku "AKP´, CHP û MHP, levkirina li ser hersê xalên pêşî ên destûra tirk." Di serî de, ev levkirina wan, dibe levkirineka ku di temenê înkara kurd de. Ji xwe, ji destpêkê ve, rayadarên hikimeta AKP´ê, dibêjin ku "wê perwerdeya bi zimanê kurdî nebê." Ji xwe, dema ku zimanê civatekê hat qadaxa kirin û her wusa wê civate êdî li ser ziman û çanda xwe re êdî ku xwe ne afirand, ew civat, wê ji dîrokê herê. Ji bo ku mirov vê kifş bike jî, hewce nakê ku mirov zêde zaneyekî mazin jî bê.

Di destpêka komarê de, zimanê kurdî hat qadaxa kirin. Piştre jî, bo poliitkayên li ser pergale perwerdeyê re, hewldanên kirina herkesekî tirk jî destpêkir. Zaroyekî kurd, ku çûya dibistana tirk, ku ji destpêka dibistana xwe û heta ku tê dema dawîya dibistana wî û ankû wê, ku ne gotibê, "bila hebûna min feda bê ji hebûna tirk re" tûna ya. Her sibeh, ew dirisma bi navê "and" ku her sibe û êvar bi zarokan dihat dayîn xwandin, di wê de di dawîyê de dihê nivîsandin ku **"bila hebûna min feda bê ji hebûna tirk re."** Bi van dirişm û ankû "and"ên bi vî rengî, pêşî dihat xistin li serê mirovan de ku ew pê bawer bikin ku ew ´tirk´ in.

Di nava me kurdan de gotinaka xalkê heya. Em dibêjin ku "dema ku tû çil carî ji mirovakî bêje tû ´dîn î´, ew mirov wê di dawîya wê çil car gotinê de êdî bawer bike ku ew êdî dîn a. Ku ew mirov ne dîn jî bê, êdî wê bawer bike ku ew ditin a." Rewşa, zaroyên kurd jî, bûya ev. Ne çil carî, her wusa bi hezaran caran roj bi roj bi wan didina gotin "tû tirkî"..

Politikaya tirkkirinê, li ser vê re ya. Her wusa, temenê van gotinan jî hatîna afirandin. Her nirxên civatî ku hatina ser ziman, "di temenê tirkiyatiyê de" hatina şîrove kirin. Minaq, "Rûstemê zal" kurdan, ew jî qûrfek pêve hatîya kirin û kirina "zal oglu rûstem." Ji kurdî ´keçelok´ kirina "keloglan" û hwd. Bi vî rengî, bi hezaran, minaqan em dikarin werênina ser ziman. Yanî, ew hemû hatîna tirkkirin. Destan û çîrokên kurdan, ên berê ku dihatina gotin bi devkî, hemû jî, di temenekî de bi tirkî hatîna vegotin. Herî dawî ´Mem û Zîn´ mabû, ew jî, piştre fîlmê wê bi tirkî çê kirin. Li ser wê re jî, herkesek bi tirkî û zimanê tirkî hat perwerde kirin.

Mixabin, çend sêwelekên ku ji xwe re dibêjin "ez kurd im" jî, li ser wê re bûna "nivîskarê kurd". Çend ku van sêwelekan bi tirkî jî dinivîsand jî, ji xwe re digotin ku "ez nivîskarê kurd" im.. Lê ev derew jîî, weke derewên din ên dewletê bû. Lê di piretikê ve, ev derewa van mirovên ku ji xwe re dibêjin "nivîskar" jî, di gotinê de nema û wan jî bi zimanê metingerê xwe yê ku zimanê wan înkar dikin û qadaxa dikin nivîsand in. Ku bi zanebûnî bê û ne bi zanebûnî bê, ew "nivîskarên kurd" jî bi wê rewşa xwe ya ku heya wan ji dunyê tûnayî bûna qatilê civate xwe û civate xwe li ser navê rejima tirk asîmle kirin.

Di van demên ku em têre di buhur in de, ku hê jî, rayadarên tirk bahse domandina înkara kurdan û domandin qadaxaya li ser zimanê kurd bikin, divê ku mirov paya van dordorên ku ji xwe re dibêjin "nivîskarê kurd" ji bîr nekê. Dewlet û hikimeta AKP`ê pişta xwe dide wan dordoran û dibêje "nabê ku ji tirkî û pê ve bi ti zimanên din

perwerde bibe." Yanî, temenê wê domandina qadaxaya li ser zimanê kurdî jî ew diafirênin. Vala, pêşîyên me kurdan ne gotina "kûrmê darê ne ji darê bê, wê qalandina darê nebê."

Kurdî, zimanekî herî kevn ê şariştanî û cihanî ya. Zimanê kurdî, berî zayina Îsa li dora çar û ankû sê hezaran de bûya zimanê perwerde. Î ro, bo ku ev vê gotinê bibêjin di destê me de birhan hena. Bi teybetî, navê "kurd" bixwe jî, di dema hûrî û mîtannîyan de pirr zêde hatîya bikarhanîn. Tenê ku em li "Teksta Marî" bi navê " HURRIANS AND HURRIAN NAMES IN THE MARl TEXTS" binerin, emê têde bibînin ku bi rengê "kurd" û "kurd" û hwd, ku hê gelek awayên din ê navê ´kurd´ hena jî, emê tê de bibînin, dide nîşandin ku çendî ev nav kevn hatîya bikarhanin. Her wusa, gelek bineterên din jî, ên ku hena ku em dinerin bidina nîşandin hena ku tê de bahse navê kurd û kurdistanê dike ji demên kevn.

Her wusa, çend ku tê gotin û bawer kirin ku navê "Kurdistan"ê bixwe jî, ku care pêşî "siltanê salçûqî Sancar bikarhanîya jî, birhanên ku hin bi hin derdikevina li holê, ´tezê´ jê dirazêne. Herî dereng ku em herin, em dibînin ku di dema "desthilatdarîya kurdên Eyerîdî û ya desthilatdarîya kurdên kekoyîdî de, em dibînin ku gotina kurdistanê pirr zêde dihê bikarhanîn. Dema ku em li ser rewş rêzimanî û ankû "giramerê" re herin, em temenê gotina "Kurdistan"ê di dema hûrî û mîtannîyan de jî dibînin. Nivîskare Almanî Ilse Wegner û gelek nivîskarên din di lêkolînên xwe ên li ser zimanê hûrîyan de ku kirina de rewşên giramere zimanê hûrî ku kifşkirina, bi navê" kurd" î re ku em kifş dikin re ku em dihênina ber hevdû, em dibînin ku temen gotina "Kurdistan"ê pirr xweşik di zimanê wan de heya. JI xwe, navên weke "gûlîstan" bi rengê "gul-lu-uš-ta-an-n(gul-lu-uš-ta-an-ni--gul-lu-uš-ta-an-ni--gul-lu-uš-ta-a-an-ni--[gul-lu-uš-t]a-an-na-ti:--ku-lu-uš-ta--na-ti) " ku ne tenê b awayekê bi gelek awayan em rastî wê tên.

Zimanê kurdî, zimanê herî kevn ê cihanê ya. Zimanên din ên dervî kurdî li herêmê ku piştre pêşketina, bi sadan gotin û temen ji vî zimanê kurdî hildana û li ser xwe pêşxistina. Î ro, ev zimanê kurdî ê wilqasî kevn, di bin qadaxaya dewleta tirk de ya. Her wusa, li herêmê´, ne tenê dewleta tirk, îranê li rojhilatê kurdistanê, Sûrî jî li rojavayê kurdistanê û Îraqê jî li başûrê kurdistanê zimanê kurdî qadaxa kiribû.Di vê demê de, di çerçoveya pêşketinên bi pirsgirêka kurd re, çend ku astek hatîya û bûya çend ku bahse "çareserkirina pirsgirêka kurd" dihê kirin jî, rejimên weke tirkiya, hewl didin ku vê gotinê j li gorî xwe îstismar bikin û li ser wê re pêvajoyên qadaxaya li ser zimanê kurdî dane domandin û asteniyên ku danîna li pêşîya pêşketina civate kurd dirêjtir bikin û bi wê re êdî pêşîya pêşketina wê bigrin.

Di vê dema ku kurd bi yekdengî bahse çareserkirina pirsgirêka kurd dikin de jî, dewleta tirk, bi pêkatên ku dibêje ku "ez pakêtê amede dikim" jî, ew gotinên wê, ji xapandinê na buhur in. **Ti pakêt ku werina amedekirin, ku di wê de rakirina qadaxaya li ser zimanê kurdî nebê û di temenê statûtîya kurdan de gavên ku werina avêtin ku nebin, wê bina pakêtên xapandinê. Divê demê de, ti pakêtên ku werina amedekirin ku di wê de perwerdeya bi zimanê kurdî nebê, wê bê pakêta xapandinê. Di vê demê de ti pakêt ku werina amede kirin û ku di wê de di temenê statûya kurdan de gavavêtin tûnabin, wê bina pakêtên xapandinê.**

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje û pirsê ku ka tirkiya dixwezê bi kurdan re bijî û yan jî na? Kirinên wê ên ku heta vê demê bûna, didina nîşandin ku ne di wê xwestekê de ya.

Heta roja me, xirabîyek û ppsîtîyeka ku dewletê û saziyên wê ne hanîna serê kurdan tûna ya. Kurd, wê çawa bi wê re di vê temenê de pêşarojekê ava bikin. Her tişta ku hatî serê kurdan, wê kurd wê ji bîr nekin, ku bi ser ve bi hezaran sal jî bi buhur in. Tiştên ku werina serê civatan, ew tişt zû bi zû nayêna ji bîr kirin. Heta ku ew civat sax in û hena, ew tişt jî di hişê wan ê civatî de wê bizindî bijî. Weke ku bo hemû civatên cihanê ev yek wusa ya, wê bo kurdan jî ev yek wusa bê. ..
....

## YEKBÛNA KURDAN YA NAVA WAN

Li Kurdistanê, ku mirov lê dimeyîzenê, mirov nexweşî û şer û pevçûnên dibin, weke sedemeke wan ye din ji, nebûna yekbûna kurdan mirov karê bêne ser ziman. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov hinekî li ser konfaransa netewî ye kurdan hinekî rawastihê. Ev yek pir girîng e. Kurd, divêt ku yekbûneke netewî ye dîrokî di nava xwe de çêkin. Kengî, ew yekbûn di nava xwe de çêkirin, hingî mirov karê bêje ku wê pirsgirêkên xwe nêvî bi nêvî wê bigêhine çareserkirinê. Yekbûna kurdan, di dîroka wan de, çend ku bahs tê kirin û tê gotin ku hertimî bi aşîrî tevgerehene û çênekirinê ji, mirov nikarê vê hizrê bi temenî ji dîrokê û bûyarên ku têdebûna piştrast bike. Di dîrokê de. Tene weke hinek demne mirov bêne ser ziman, mirov karê ji deme Gûtî, Naîrî û Medan hinek mînaqan bide. Di van deman tenê de ji, mirov ku mirov li pêşketin û pêşve çûnên ku di wan de bûna lê dimeyîzenê, mirov wan pêşketin û pêşveçûnên ku bûna weke encamaka hevgirtina kurdan yên wan deman karê bêne ser ziman. Tenê wê hevgirtinê di hizirên xwe de kurdan avakiriya. Mirov karê vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Temenê pêşketinên mazin yên civakî ji di hevgirtin û yekbûnê de ya. Mirov divêt ku vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman.

Ji dîrokê, bi sereke ji bê, her weha mirov karê bêne ser ziman. Ku mirov li roje me dimeyîzenê, mirov hewceyîye yekbûna kurdan pir mazin dibîne. Ne tenê ji bo kurdan, ji bo herême û pêşketine herême ji mirov wê hewcebûnê dibîne. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. yekbûna kurdan, wê li herêmê, bê yekbûna herême bixwe ji. Divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Li herême, î ro, bi teybetî ji li herêmên kurdan, ew şer û pevçûnên ku dibin, hemû ji neyekbûna wan dibin. Divêt ku mirov wê ne yekbûna wan ji her weha weke sedemeke wan şer û pêvçûnan bêne ser ziman. Yekbûn, pêşî divêt ku di aliyê Rêzanî(siyesî) de pêk were. Ji wê ji zêdetir, hewceyî bi yekbûna zimên û çandî ji heya. Herêmên, kurdan ji aliyê çandî ve, çiqas mirov karê bêne ser ziman, wilqasî dewlemend in. Ji ber vê yekê, nahaka ji, gelek herêm bi serê xwe bi pêş ve diçin. Ji aliyê hevparkirina pêşketin û nirxên ku diafirin, de kêmesiyaka mazin heya. Ev yek, ji ber ku têgihiştineke yekbûnê ye ku mirov mazin bêne ser ziman, hê bicih nebûya. Di nav kurdan bi xwe de, yekbûn di seran de bûya. Lê

ku ew yekbûna ku di seran de bûya, nebe yekbûnaka civakî, wê li Kurdistanê, nebe temenê pêşketineke mazin di nav kurdan de. Ji ber vê yekê, di vê demê de, di vê deme ku ewqas bûyar û êrîşên mazin li ser kurdan û li Kurdistanê diqawimin de, divêt ku mirov hinekî dî pir mazin li ser vê yekê rawastihê û bêne ser ziman. Divêt ku mirov di vir de, bi gotinakê ji bê bêne ser ziman ku yê ku wê wê yekbûnê di seran de mazin bike û di jiyanê de bi wate û sazî bike, rewşenbîr û zanistên kurdan bixwe na. Bi vê yekê re, em di vir de hinekî ji, bi vê mijarê re berpirsiyariya rewşenbîrên kurdan bi bîre bixin û bi buhur in.

Ku mirov li dîrokê dimeyîzenê, mirov her weha pêşketineke mazin li Kurdistanê dîbîne. Bi teybetî ji, li ser deme Gûtîyan, divêt ku mirov hinekî rawastihê. Gûtîyan li herêmên xwe yekbûnaka mazin ava kiribûn. Ew dewletbûna wan ye ku gihiştibû asta împaratoriyekê di sayaserê wê yekbûna wan ye ku wan di nav xwe de avakiribûn bû. Li herêmê, di deme wan de, êl, aşîr û hozên ku hene, mirov wan ji dibîne û divêt ku mirov wan ji, ji berçavan dûrnegirê. Lê ew aşîr û êlên wan yên ku hebûn, divêt ku mirov hinekî li ser wan, awayên wan yê jiyanê û rêveberiya wan bisekinê. Ev yek ji pêdivî pê heya. Ku ev yek nebe, wê hingî, têgihiştineke mazin wê nebe. Ev yek pêdivî pê heya. Gûtîyan, di nav xwe de, rewşeke ku mirov ji aliyê pêşketinê ve hata ku bêje pêşketiya, afirandibûn. Bi wê rewşê jiyana xwe bi rê ve dibirin. Şer û pêvçûnên ku li herêmê dibûn ji, ew jiyana wan, ji binî xiranedikir. Ev yek ji, ji wê yekbûna wan ye xurt dihat. dewletbûna wan, pir xurtbû. Wan, pergalaka têgihiştî afirandibûn. Bi wê pergalê wan, yekbûna xwe afirandibûn. Naskirin, temenekî yekbûnê yê herî xurt û mazin e. Temenê ku yekbûnê bi têgihiştin dike ya. Divêt ku mirov biteybetî li ser hebûna naskirinê ji bisekinê. Ev yek ji pêdivî pê heya. Gûtiyan, bi têgihiştin, xwe afirandibûn. Der û berên xwe naskiribûn. Dordorên xwe naskiribûn. Bi zimanê xwe yekbûnaka wan hebû.

Ku mirov yekbûna Gûtiyan di hizirê, mirov nikarê tenê bi awayê pergalakê bêne ser ziman. Wan bi hebûna afirandina pergala olî ye bitêgihiştine hizir, yekbûnaka mazin afirandibûn. Ol, ji bû wan bûbû, temenekî mazin yê yekbûnê. Li ser wê yekê demne mazin yên pêşketinê jîn dikin û di buhurênin. Bi wê yekê re, demne pêşketinê yên bi hizir ji ku mirov karê bêje ku pir pêşketiya jîn dikin. Bi wê yekê, pêşketineke mazin di xwe de jîn dikin. Li Kurdistanê( ku di wê demê de li gor hinek belgeyan tê gotin "Kurda" an ji "welatê kurdan"ji=çavkanî: ´Xinasefon´=), di wê demê de aşîr hene. Her aşîrek li herême xwe xwedi hêz û bandûr e. Têgihiştineke wan ya pir mazin heya. Di nav xwe de pir mazin dijîn. Hizir dikin û hizirandina xwe tênine ser ziman. Cihê ku hizirandinên xwe tênine ser ziman ji, civatên wan yên ku têde her roj û şev lev dicivin in. Di wan deran de, di nav hevdû de hizrên xwe tênine ser ziman. Bi vê yekê re, civakariyaka mazin ji ye bitêgihiştin di xwe de jîn dikin û didina jînkirin. Ji demên wan, di derbarê jiyana wan de, wilo zêde dokumantên wan digihiştine destên me. Hemû ji di şer û pêvçûnên li Kurdistanê de hatina xuruxandin. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku windabûnaka mazin ya wan bûya. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman. Mirov tenê ji Cizirîe bota ku di deme wan de bi navê "Gerzûbaqarta" ji wan re navenditi( Mirov divêt ku vê navenditiyê weke paytaxtitiyê ji fahm bike.) kiriya ji, wê pêşketina wan ye ku mazin bûya, fahm bike. Qasra ku wan avakiriya ku îr di roje me de bi navê "birca belek" ji tê ser ziman, naqşaka pêşketinaka aqilê wan bixwe ya. Li rojavayê kurdistanê herême weke Qamişlo, kobanî, afrin û hwd, ku mirov li wan ji dimeyîzenê, mirov ji deman wan û ku hata demên berî wan diçê mirov pêşketineke

mazin dibîne. Li Rojhilatê kurdistanê avakirin û pêşketinên ku wan dana avakirin, piştre ji Naîriyan û Medan re malitî kiriya. Mirov karê vê yekê ji bêne ser ziman. Lê Medan, di demên xwe de, pir mazin ji afirandina. Li Kirmaşanê Hekmetenê, Urmiyê û hwd, li gelek deverên rojhilatê Kurdistanê avakirinên mazin yên dîrokî avakirina û naqş kirina. Mirov divêt ku vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Gûtiyan, Cizire bota û dordore wê hata ku digihê Riha û amede wanderan ji xwe de ji pêşketine xwe dikina navend. Bi herême botanê ve hata ku digihê ber araretê ji, pêşketineke mazin didina jînkirin. Ev pêşketin û bi rêve çûnên wan bi sayaserê yekbûna wan ye di nava wan bixwe de ya. Divêt ku mirov vê yekê bêne ser ziman. Naskirina wan ye di derbarê xwe bi xwe de, wan li her qadê û derê digihêne hevdû.

Zimanê wan yê ku bi awayê kurmancî bidest pêşketinê kiriya, pir mazin pêşketineke mazin jîn dike û dide jîn kirin. Zimanê wan, bi awayê ku pêşketiya, û ew awayê ku ew pê bi kar tênin, wan bihêz dike di serê wan de. Ziman, nirxekî mazin yê yekbûnê yê civakê ya. Pêşketin û pêşveçûna civakê bi pêşketina zimên ve girêdayî ya. Lê ziman, hertimî li gor pêşketina civakê di pêşektina xwe de ji ya. Hizre civakatiyê û afirîbûna wê, heya. Mirov wê yê dibîne. Kurmancî, kurdîya deme civakatiyê ya. Dîroka pêşketina kurmancî mirov divêt ku bi olî Êzîdîiyê re bêne ser ziman. Êzîdîti ji, bi derketin û pêşketina xwe re diçê demên berî deme Gûtiyan bixwe ji. Mirov divêt ku vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Biqasî ku mirov ji gûtiyan fahm dike, demeke ku mirov nikarê ji wê deme antik ye ku li ber bahra reş û wanderan rû daya, jîn kirina. Mirov vê yekê bi teybet û biêmin karê bêne ser ziman. Ji awayê rêveberiya wan ye ku pir pêşket û gihişt asta împaratoriyekê, mirov vê yekê baş fahm dike. Piştî ji, mirov divêt ku ji bîr neke û bêje ku demên xwe yên xweş yên ku jînkirin, ne bin 400 an ji 300 salî re bû. Wilqasî zêde li ser lingan mayîn, têgihiştineke pir baş mazin ji mirov dixwezê, Ev yek ji, her weha vê yekê bi me dide têgihiştin ku bi wan re têgihiştineke mazin bûya. Di qasta bilind de xwediye têgihiştineke mazin ye dewletbûnê ne û pê jîn ji dikin. Lê ku mirov ji serî tê haya bin, li bin, mirov nêzîkatiyaka ku bi konfadaralî were ser ziman mirov rastî wê têt. Mirov vê yekê her weha pir mazin li berçavan dibîn. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Ji binî çend ku bi konfadaralê her weha hebe ji, lê dise, mirov dibîne ku di asta bilind de hevdû girtinaka wan ye ku tê berçav heya. Mirov vê yekê ji her weha dibîne. Li ser vê ji sekinandin pêdivî pê heya. Ev herdû nêzîkatiyên ku têne berçavên mirov, mirov dibîne ku hevdû dipejirênin û di parezên. Mirov vê yekê ji dibîne. Herêm bi aşîrên xwe ve, weke ku tê ser ziman û î ro ji di nav kurdan de tê ser ziman "mîr" hene. Mîr, di nav aşîrê de û di asta herî bilind de bi nirxên ku bi xwe re têne ser ziman û kevneşopîyên ku pêre diafirin, ew avakar e.Mirov vê yekê ji dibîne. Di aşîrê de, ji bo mîr bê pirs û sûal çûna mirinê, ma mirov çawa karê bêne ser ziman, wekî dî?

Wekî dî ji mirov aliyekî din yên ku bêne ser ziman dibîne. Ew ji her weha, ev e, ku çend ku herême bi konfadaralî wilo jîn ji dibin. ku êrîşek li herêmekê bû, ku xeber digihê herêmeke din ji wê herême, mirov dibinê ku di cih de bi hawara wê herême ve çûyin heya. Ev ji, nêzîkatiyaka ku hêze hevdû parastin a. Ev yek û kirin, weke nirxeke bi rûmet heya. Yên ku hawar gişta wan û bi yên ku hawar ji wan re şandina ve neçin, wê di civatan de û wekî din ji di civatan de wê bêne ser ziman û bêne şermazar kirin. Ev yek ji, bi teybetî dibêt. Divêt ku mirov wê bêne ser ziman. Her herêm, xwediyê jiyanaka ku pê jîn dike ya û her weha bi vê yekê û awayê jiyana xwe û hebûne wê di parezê. Lê ku hêzên mazin têne ser serê wan, ji herêman gihiştina hevdû û bi hev re hêzeke mazin

afirandin û li ber wê hêze mazin sekinandin ji dibêt. Ev yek ji her weha heya. Li ber êrîşên hovana ji, bi hev re bi alikariya hev disekin in. Vê pêşketinê û awayê pêşketinê mirov hata ku tê deme Naîriyan mirov dibîne û di deme Naîriyan de, digihê astaka xwe ye nû, ev pêşketin û hebûna wê, bi têgihiştin û pêşketine xwe ye hizrî û dîrokî re.

Ji deme Gûtiyan ku dem tê deme Naîriyan, êdî mirov ji aliyê pêşketinê ve pêşketineke dî ya ku di asta xwe ye hebûnê de pir mazina û pêşketiya dibîne. Naîri, deme ku li herême deme antik ye herêmê jîn dikin. Divêt kuu mirov vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Zimanê wan ji, weke yê Gûtiyan pêşketiya û serweri jiyana wan e. Di jiyana xwe de, pir pêşketî tevdigerihin. Mirov vê yekê her weha dibîne. Li herêmê, ji deme Gûtiyan hata ku dem tê deme Naîriyan, pir pêşketin û pêşveçûnên mazin hene. Mirov divêt ku vê ji bi teybetî bêne ser ziman. Bi ser de, weke pêşketineke herêmê "demên asuriyan" ji mirov divêt ku ji bîr neke û bêne ser ziman. Ku dem tê deme Naîriyan, êdî naîrî ji mazin pêş dikevin û li herêmên xwe, ji botanê hata ku ber araretê û ber Zagrosan û riha û amede wanderan ji, xwediyê serweri û serdestiyaka mazin yer herêmî ne. Naîrî, ji xosletên Gûtiyan yên ku wan xwe birêxistin kiriya bi dewletî, ji wê ne dûr û cuda xwediyê rêxistinekê ne. Çawa ku weke ku Gûtiyan di nav xwe de, bi nêzîkatiyaka konfadaralî pergala xwe ye giştî avakiribû û di bin de ji pergalên erêman yên aşîran avakiribûn û bi vê yekê ji, bi wan pergalên xwe yên herêmî pergala xwe ye mazin ye giştî bi rê ve dibirin, her weha mirov karê ji wan ji bêne ser ziman. Bi zan ji sadsala 13(berî zayînê) hata sadsala 11 min, demeke xwe ye ku mirov weke ´demeke zêr ´ bêne ser ziman jîn dikin. Bi wê re ji, di sadsala 11. min de bi bilindbûna asuriyan li herêmê, di nava wan de şer û pevçûn dest pê dikin. Weke demekê ev şer û pevçûnên wan, bi herêmî dest pê dikin. Asurî ji, li herêmê, xwediyê hebûn in. Ew ji, bi bandûr in. Demne wan ji yên ku mirov ne asta împaratoriyê de bêne ser ziman. hene. Lê deme wan ya herî mazin ji sadsala 12 min dest pê dike û di sadsala 11 min de ku di sala 1128an de bi naîriyan de dikevine şerekî pir mazin de û wan têk dibin li qada şer, êdî ku serwerî herêmî bigiştî dibin, dibe. Bi vî şerî re, deme Naîrîyan ye Zêr weke ku bi dawi dibe. Li herêmên xwe, ew pergala xwe ye herêmî ye giştî serwerîye wê winda dikin. Lê yên herêmî yên ku bi aşîrî ji bê hebûna wan di parezên. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku dise serweriya wan li herêmên wan heya. Hê ji, serweriyên xwe yên li herêmên xwe didina berdewam kirin.

Naîrî, demeke xwe ye zêr ku ne bin 300 salî re ya jîn dikin. Piştre ji li herêmên wan serweriya jîn dibe. Lê bi herêmî, çend ku serwerin ji, bi giştî li herêmên xwe ne serwer in. Bi vê yekê re, êdî demne raperîn û serhildanan ji bo wan li herêmê bi pergalên wan yên herêmî yên aşîrî dest pê dike. Weke demên xwe yên berê serweriya xwe dixwezin, careka din. Lê dîrok, ti carî du caran dubara nakê. Ji ber vê yekê, wê demên berê ji bo wan li wan ne vegerihin. Divêt ku li gor demê êdî rewşên xwe bi afirênin û xwe bi hizir, çandî û rêzanî ji nû ve bi rêxistin bikin. Êdî vê yekê dikin. Lê divêt ku mirov bêne ku weke şerne wan yê azadiyê ku mirov weke serhildan û raperînên herêman bêne ser ziman, ji sala 1128an ji, wê demê, ji wî şerî, hata sadsala 8 min û wan berdewam dike. Di vê demê de, weke ku êdî deme nû dest pê dike. Êdî ji xwe ji nû ve bi rêxistin kirin ji bo wan dibêt. Ji sadsala 8. min hata u dem digihê sadsala 7. min û an ji 6. min demeke wan ye di nav wan şer û pevçûnan xwe ye xwe nûkirinê ya. Mirov divêt ku vê yekê bi teyebêtî bêne ser ziman. Zadeganên wan yên ku bi navê ´kawa´tiyê têne ser ziman, ji wê demê re pêşengtiyê dikin.Ji deme Gûtiyan hata ku

digihê wê demê, pêşketinê hizrî û yên din yên dibin, di wan de û di xêve wan de pêşketin û levhebûneke mazin dike. Ev ji, wê ji sadsala 7. min pêde, wê bê sedema wan ye ji nû ve rabûnaka wan ya dîrokî yeke pêşketî. Wê hin bi hin bi pêş bikevin. Ji deme Nebî Nuh ve, di demên piştre, herêmên ku piştre navê xwe standina û weke "mada" têne naskirin yên kurdan, bi serketina wan aşîr û herêmên wan yên bi wî navî, êdî wê wî navê wan bike, navê gelemperî yê wan hemûkan ku di bin de bijîn. Ev ji, dibe demeke nû ji wan re ku bi navê "Mediya" tê ser ziman. An ji mirov karê bêje "dewlete Mediya". Ji deme naîriyan hata deme Medan her weha demeke pêşketinê tê jîn kirin. Li ser pergal û avabûna wê ye naîriyan ji mirov divêt ku çend gotinan bêje.

Naîriyan, pergalaka ku ji temenê bi pirranî bi hizir pêşketine xwe dide jînkirin, pêş dixin û jîn dikin. Pê jîn dibin. Di civatên wan de di her levcivinên wan de pêşketinên xwe tênine ser ziman. Zanistên wan hene. Lê zanistên wan weke yên deme Gûtiyan, zanistna ku mirov bêje, ne zanistna binav in. Lê dengekî wan yê pir xweş heya. Bi wê dengê xwe yên xweş û levanîna xwe re, di civatan de ji mirovên li dore xwe re tênine ser ziman û dikin di serê wan de naqş bikin. Hizir û bawerî, çend ku di gotinên wan de di nav hevdû de werine ser ziman ji, di têgihiştineke ku di têgihiştine hevdû na. Bîr û bîrewerîya wan bûya jevre. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha bi teybetê bêne ser ziman. Her weha di deme Gûtiyan de heya. Di deme naîriyan de ji heya. Lê di deme Naîriyan de, hinek dî bi pêşketî heya. Mirov vê yekê kifş dike. Naîrî, demeke antik di xwe de jîn dikin. Zanebûnên demên berî xwe ji bi zanebûnên xwe re tênine ser ziman. Bi vê yekê re, tehereke têgihiştine ye ku di mejiyê wan de bûya, ji ya roje me ne kêm pêşketitira. Di hizir de, hertiştî bi hev ve girêdan di wan de pir mazin a û xurt a. Li ser sedem û sebeban di sekin in. Hizir û têgihiştine xwe ku tênine ser ziman, bi wê tênine ser ziman. Bi vê yekê re, aqilekî wan yê pêşketi ku mirov acêmayî dihêle heya. Hizre "xwûdê" di deme Gûtiyan de pir mazin pêşketiya û weke ku navê wê pergala wan ye giştî ye li ser lingan ji bû. Di deme Naîriyan de ji mirov vê yekê dibîne. Têgihiştine xwûdê di wan de pir mazin heya û rûniştiya. Hizre wan, bi pergal a. Ji vê pergalbûna hizre wan ji, mirov fahm dike ku yek-xwûdatiyaka pir mazin û pêşketî jîn dikin, weke Gûtî û demên hê berî wan re. Naîrî, bi tgihiştin, pergalaka mazin ava dikin. Ew têgihiştine wan, di deme Medan de ji, dibe temenê pêşketina wan ye dîrokî. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Di deme Medan de pêşketineke mazin ye dîrokî jîn dikin. Bi têgihiştine ku di xwe de Medan çêkiriya, herêmên dore xwe ji pir mazin bi bandûr dikin. Pergala medan ye giştî ye ku afiri bihiizir bû. Pir pêşketi bû. Bi têgihiştine xwe, ku mirov bêje ji têgihiştine pergalaka roje me ku herî pêşketiya ne kêmtir pêşketibû, wê ne xelat bê. Medan, xwe gihanda sînorê serweriya Gûtiyan. Hata ku mirov karê bêje ku ji wan ji buhurandin. Yekbûnaka mazin ye dîrokî di nav xwe de çêkirin. Bi wê yekbûnê mazin pêşketin û di herêmê de mazin pêşketin û bi pêşketinên ku di wê deme xwe ye wilo zêde ne mazin de, pêşketin û têgihiştin pişt xwe re dana kifşkirin. Pêşketineke wilo pêşketî çima ji destê xwediyê têk çû? Divêt ku mirov vê pirsê ji bike û di çerçove dîrok û jînbûyînên ku rûdana de bersiveke dîrokî bidinê. Wê ev yek, mirov ji bo demên piştre ji bigihêne têgihiştineke dîrokî..

Medan, yên berî wan, pêşketineke wilo jînkirin ku di dinyê de deng bide. Bi wê pêşketineke xwe bûna yên herî li berçav. Çûna Thales û Heredot li wir û xwe perwerdekirin ji, bi vê yekê re mirov karê bêne ser ziman. Ku dem tê deme Medan, êdî li jiyanê serwerbûna xwe bi bawerbûn jînbûn, derdikeve pêş. Keyê Med yê bi navê

dayaqos, mirov ji deve Heredot hisdike ku ku gotiya "ez xwe ji rêveberiya rêzanî divekişênim û didime pêşketine di civaknasiyê". Gelo ev gotin bi hatina ser ziman re, ancama çi pêşketineke mazin ye dîrokî ya ku hatiya jîn kirin? Bêguman ku mirov li ser bersive vê pirsê di hizirê, mirov dibîne ku ancama pêşketineke mazin ye dîrokî ku ji demên xwe yên berê bi bav û kalên xwe re jîn kirina. Bawerbûna wan li hebûn û pêşketine pergala wan ye giştî ye pêşketi û heyî, wan her weha dike ku bênine ser ziman.

Kurd, bi vê pêşketin û dîroka pêşketine xwebi rê ve çûnaka mazin jîn dikin. Piştî ku med têk diçin û hin bi hin, serweri û serdestiya persan tê ji, ev pergala wan ye ku heya hebûna de dide berdewam kirin. Pers li wê pergalê xwedi derkevin û mazin dibin. Bi wê lê xwedi derketinê re, êdî kurd, ji ji binî ve mafê pargalên xwe yên konfadaralî yên herêmî ku bidina berdewam kirin bidest dixin. Piştre, di deme derketina rêveberiyên persan deme bi dem ji, ji dem aqamanîşan hata ku digihê deme Sasaniyan ji, wilo ya. Kurd, di van rêveberiyan de bihizir, çand û kevneşopîyên xwe yên pîroz bi gotin û bandûr in. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku pêşketineke bi vê awayê heya. Lê divêt ku mirov vê ji bêje û piştre bi buhurê. Çend ku Bi aqamanîşan re û bi Sasaniyan re rêveberiya persan derdikeve û serwer dibe ji, serwerî û serdestiya wê bidest xistina pergala giştî ye herême ye kurdan a. Lê ji binî pergalên herêmên yên ku wê pergala mazin li ser lingan digirê ji, di destê kurdan de ya. Weke ku hevbeşbûnak bi vê rewşê re di nav wan de diafirê, bixweza. Ku pergala giştî nebe wê yên binî wilo zêde nikaribin xwe li ber der bi parezên. Û ku pergalên herêmên ku yên kurdan di nav xwe de afirandina yên bi awayekê konfadaralî ji ne bin, wê pergala herêmî ye giştî ji wê hebûna xwe bi serdestî û mazin nikaribe bide berdewam kirin. Di wê demê de kurd ji û pers digihijine vê têgihiştine. Di wê gihiştinê de digihine hevdû û bi hev re weke bi hev re bûnaka dîrokî di nava xwe de çêdikin. Ku pergala giştî ye mazin di destê kê ji wan de bê û yên bin di destên kê ji wan de bin ji, di nêzîkatiyaka ku gihiştinê de û di xwe de bitêgihiştin kirina hevdû temen dikin û hebûna wê didina berdewam kirn. Di qasra aqamanîşan û sasaniyan serdestiyên zadagenên kurdan ku mirov bi vê yekê bêne ser ziman, ne vala ya ku mirov bêne ser ziman..

Di demên piştî zayînê de ji, mirov vê yekê û nêzîkatiyê bi têgihiştin li herême di nava wan de dibîne. Lê ji sadsala 3. min wan de, ku mirov weke destpêkekê ji bêne ser ziman bi kuştina Manî ye ji aliyê Behremê yekem ve têkili bi ber xirabûnê ve dikin. Manî, piştî tê kuştin, êdî ew bandûraka mazin li kurdan dike. Ji ber vê yekê ya ku piştî kuştina wî re gelek aligirên wî çêdibin û piştre weke oleke ew pêş dikeve û zû ji pêş dikeve. Piştre weke pêvajoyaka nû destpê dike. Têkili, ji rêveberiyê bi ber xirabûnê ve diçin. Lê di nav xalkên kurd û pers de têkili hebûna xwe baş dide berdewam kirin. Ev rewş, hata derketina musumantiyê ebûna xwe dide berdewam kirin. Bi derketine muusmantiyê re demeke nû weke nû li herêmê bi giştî dest pê dike. Têgihiştine wê pergala ku ji li berdiclê û firatê heya, temenê musulmantiyê yê demên wê yên pêşî ji di afirêne. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku ew pêşketina ku me li jor bahsa wê kir, wê derketinê, pêşketine wê bi bandûr dike û ji gelek aliyan ve ji kifş dike. Musulmanti, piştî ku derdieve, kurd, li herêmên xwe hewld didin ku pergala xwe bi nirxên xwe re li gor wê pêşketin û pergala civakî ye ku derketiya bênine ser ziman. Vê yekê, hata sadsala 9. min pêk ji tênin. Piştî derketina musulmantiyê, kurd, dewletê xwe ye wê demê ye pêşî ye bi hizir û nirxên musulmantiyê ava dikin. Divêt ku mirov dewlet û pêşketine

Şadadiyan ji ji bîr neke. Ji deme behremê yekem ve aliyekî pêşketina kurdan bi pêşketina Şadadiyan re hebûna xwe dide berdewam kirin. Piştre dewletbûna wan ji, wê aliyê pêşketina wan, di çerçove pergala wan ye demê de têne ser ziman û bicih dike. Çend ku Şadadiyan pêşketineke mazin ye dîrokî ji kiribin. Divêt ku mirov di wê deme de hnekî bi teybet li ser Merwaniyan bisekinê. Pêşketine Merwaniyan, di aslê xwe de, piştre, wê bibe temenê derketina Salahandinê Eyûbî ji. Şadadî, î ro ji, hê wilo pêşketina wan teze û baş ne hatiya fahmkiriin ji aliyê kurdan bixwe ve ji. Hata deme êrîşên Selçûqiyan yên li wan li ser lingan dimênin. Piştre ji, ji hole winda nabin, çend ku pir êrîşên mazin ji di binîn. Merwanî, di wê demê de derkatina wan, mirov karê weke dewlete kurdan ye hemdem ye deme musulmantiyê binavkê û bêne ser ziman. Pêşketinê wê ji hê ji gelek aliyan ve divêt ku were têgihiştin û ser ziman. PêşKetina merwaniyan ku newê fahmkirin, di dîroka herême de kêmesiyeke mazin bi afirê. Mirov nikarê pêşketin û derketina dewlete Merwaniyan weke ye aşîrekê an ji demekê ji bi navkê. Ji wê zêdetir, ew pergala kurdan ye giştî weke ancamaka wê ye demê ya û pir mazin bi nirx, hizir û kevneşopîya li gor deme xwe di demê de.

Bi pêşketine Merwaniyan re mirov karê bêne ser ziman ku li gor ole nû musulmantiyê û ji nû ve birêxistinbûna herême, merwani, pêşketina pergala kurdan ye giştî demê ji ya. Kurd, ji deme Medan hata wê demê, cara pêşî pergala xwe ye giştî bi awayekî dikina destê xwe de. Ew awa ji, her weha dewlete merwani bixwe ya. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov ji gelek aliyan ve wê bêne ser ziman û fahmbike. Merwani, li ser nirxekê û kevneşopîyeke dîrokî ku li gor demê xwe anîya ser ziman û ku mirov karê bêje ku xwe nû ji kiriya afirîbûnaka pergala ya giştî ye kurd a. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybetî bêne ser ziman û bêje. Merwani, pergalabûna ji nû ve ji ya. Ev ji rast e. Di deme Merwaniyan de, êdî li gor wan, li herêmên din yên kurdan, xwe ji nû ve birêxstinkirin û afirandin dibêt. Li gor wê nêzîkatiyê êdî li kurdistanê pêşketin dibin. Bi merwaniyan û pêşketina wan re, li Kurdistanê têgihiştine pergala giştî ye demê di rûnihê di nav kurdan de. Piştre ku dem tê deme Salahadinê Eyûbî ji, êdî ew ji derketina wî, li gor wê yekê ya. Salahadinê Eyûbî, ew pergal û têgihiştina wê pir mazin fahmkiriya. Lê xosletekê Salahadinê Eyûbî yî din ji heya û wê ji divêt ku em di vir de di serî de bênine ser ziman. Di deme pêşketine musulmantiyê de, salahadinê Eyûbî, wê pergala kurdan û têgihiştina wê, bi wê, di xwezê ku musulmantiyê ji bêne ser ziman. Nêzîkatiya wî ya musulmantiyê her weha li gor vê yekê ya. Bi vê yekê re, ew yekbûnaka mazin diafirêne. Kurdan hata wê dmeê, di nav xwe de bi wê pergala xwe hertimî yekbûna xwe diafirandin û çêdikirin. Lê di deme salahadinê Eyûbî de, êdî ew bi wê nêzîkatiyê, di cihana îslemê de ji yekbûnekê bi wê pergala û hizre wê û nêzîkatiya wê dide çêkirin. Ev yek ji, divêt ku mirov wê kifş bike û bêne ser ziman.

DEMÊN PIŞTÎ ZAYÎNÊ, YEKBÛNA kURDAN Û PÊŞVEÇÛNÊN KU DI NAV KURDAN DE Û BI KURDAN RE DIBIN Û HER WUSA DEMÊN KU SERWERî Û SERDESTIYA PERGALA KURDAN YE GIŞTÎ JI DESTÊ WAN HIN BI HIN DIÇÊ Û ŞERÊN KU JI BO WÊ JI DIBIN, ÊDÎ DEMÊN WÊ DESTPÊ DIKIN..

Ku mirov bahsa demên piştî zayînê bike, divêt ku mirov despêka bûn û hatina musulmantiyê ye li Kurdistanê weke destpêkeka dîrokî bêne ser ziman. Ev yek ji ber ku wilo ya. Li Kurdistanê, ji deme Medan hata demên piştî zayînê û derketina musulmantiyê, çend ku serweri û serdestiya kurdan ye pergala wan ye giştî ji destê wan hinekî çûbû ji, lê dise, ji gelek aliyan ve ew kifşkar bûn û serwerbûn. Ji deme

aqamanîşan hata ku dem tê deme Sasaniyan û wan, Kurdan, weke ku bi persan re di temen û hîmekî re levkirina di bi rêvebirin û hebûna pergalê de. Ev awayê levkirinê, li ser temen û hîmekî ku ji binî ve kurd hema bêja bi giştî kifş dikin bû. Lê ji serî ve, ji destê wan çûbû û ketibû destê persan de. Wan kifş dikir. Ji ber ku ji bin ve û nirxên ku ji sêrî ve bi rê ve dibirin ji temenê wan û hebûna ji gelek aliyan ve kurdan afirandibû, êdî bandûr û hebûna wan mazin bû. Wan, ji ger aliyî ve aqildanti dikir. Ji ber ku hemû tişt li gor nirxên wan bû, aqildantiya wan ji, divêt ku bê zanîn ku pê pergala giştî ji sêrî bi rê ve diçû. Mirov divêt ku vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Ev dem û pêşketin, di demên ku bi Sasaniyan re kurd jîn dikin re êdî hin bi hin dikeve demeke ku êdî rê di têgihiştinê de weke ku jev divaqatihin. Her weha rewş tê berçavên mirov. Lê ne rêvebere persan û ne ji kurd, nikarin bi tememî qûtbûnekê di wê rewşê de bikin. Ji ber ku ji herdûyan re ji, wê ne baş û qanc bûbana. Bi vê yekê re, êdî dikevine demeke ku bi hev re ku weke ku bi mecbûrî bi rê ve herin dibêt. Pers, bê kurd, ji ti aliyî ve nikarin wê pergalê bi serê xwe bi rê ve bibin. Kurd ji, bê pergal nikarin bijîn. Her weha di hebûn parastinê û jîyan berdewam kirinê de weke ku levkirinaka wan dibêt. Kurd, vê yekê dibînin. Kurd, bi têgihiştineke konfadaralî bi nirx bi rêxistin in. Ji xwe bi bawer in. Hertişt binirx û hizre wê ve û bi wan ve girêdayî ya. Bi vê yekê, ji her aliyî ve bi xwe bi bawer in. Lê dem ku hin bi hin di buhurê, êdî hewldanên ku kurdan bi tememî ji rêveberiyê dûr bikin dibêt. Ev kirin, weke destpêka wan, mirov karê deme sasaniyan bêne ser ziman. Ev kirinên ku di deme Sasaniyan de dest pê dikin, piştre di deme derketina musulmantiyê de ji, hebûna di parezên. Piştre, ku musulmanti ji, derdikeve, êdî bi hebûna musulmantiyê bi wê yekê xwestina çûna serkurdan dibêt. Lê kurd, li ber wê yekê bi hêz di rabin. Kurd, hata wê demê, li Kurdistanê ji nîvê wan êzîdî na. Mirov divêt ku vê yekê ji weke xalaka girîng bêne ser ziman û pir ji li ser bisekinê. Ji ber ku wê ev yek û xal, wê bê bingihê şer û pevçûnên ku bi kurdan bibin, gelekan ji wan wê bê temen û hîm ji wan re.

Di deme derketina musulmantiyê de, di çûna ser kurdan de, mirov karê şerê ku bi kurdên Xorasanê re weke destpêkeke demê bide nîşandin. Bi teybetî ji, bi mîr an ji keyê kurd, bi Mislimê xorasanî( di hinek dokumentan de navê wî weke "Abû Mislimê Xorasanî" ji di buhurê) re mirov karê bêne ser ziman. Teybetmedniye Muslimê xorasanê, bi nirx û kevneşopîye xwe ve girêdanbûna wî bixwe ya. Şerê di naqabîna wî û xelîfê Abasiyan de, ew bi hêze xwe re şerketinaka mazin dide nîşandin. Lê piştre ku xelîfê fahm dike ku wê nikaribine wî, êdî xevkekê jê re çêdikin. Dibêjinê de, ´emê bi te re levbikin û em dixwezin peymeneke aştiyê çêkin û mohrkin û bi wê ji em şerê di nav xwe de bi dawi kin´. Mislimê xorasanî ji wê yê erê dike û ji xelîfê bawer dike û piştre bi çend mirovên li dore xwe re dikeve rê de û diçê qasra xelîfê û pêre diaxivê û piştre weke ku levkirinekê ji dikin û mohr ji dikin. Piştre dikin ku bi hev re xwarinaka aştiyê bixwûn. Di wê deme ku diçina ser xwarinê û xwarinê dixwûn de, bi xeyîntî mislimê xorasanî tê kuştin. Destpêka şerên di demên piştî derketina musulmantiyê de bi kurdan re bûna de, ev bûyar û şerê bi kurdan re, mirov karê wê weke destpêkeke di wê de bêne ser ziman.Piştre, çûna bi ser kurdên êzîdî de dibêt. Weke ku qalandinaka wan dibêt. Hingî gelek nivîs û pirtûkên wan yên ku ji demên berê mana û dîrok û nirxên wan û hizre wan tênin ser ziman, hatina şawitandin. Ji gotina, bi qasî ku di nav xalkê de tê gotin û bi gotin hata roje me hatiya, tê gotin ku bi hezaran pirtûk diavêtina ser hevdû û agir dihata berdwan li wan. Ev bûyar, çend ku bi dîroka kurdên êzîdî re were ser ziman

ji, di çerçove dîroka Kurdistanê ye giştî de xwediyê wateyaka pir girîng û mazin a. Ji ber ku bi wan êrîş û çûyînên li ser wan re, weke ku demek her weha tê girtin û yek tê vekirin dibêt.

Kurd, ji ber ku di herêmên xwe de kevneşopî û pir kur bicih in, êdî wilo zêde ewqas êrîş ji wan ji holê ne rakê. Lê belê, pergala wan ye giştî, serwerî û serdestiyan wan lê kêm dike. Divêt ku mirov vê yekê ji, bêne ser ziman. Sasaniyan, çend ku hinekî kurd, di asta bilind de di pergala giştî de xwestin bi sînor bikin wan, di dawiyê de ew ji kêmbûnê xilasnebûn. Lê ji holê ne rabûn. Bandûra wan weke berê li ser kurdan namêne. Kurd, ku dem tê sadsala 8 û hinekî dî ji bi vir de 9. min ji, êdî bandûra wan bi temenî weke ku ji ser xwe di rakin. Berî hingî ku temenê wê avakirina û piştre tê avakirin dewletê kurd ye Şadadî û dewlete kurd ye Merwanî, mirov karê weke ji holê rakirina wê bandûra wan ji, di vê xalê de bêne ser ziman. Dem, ku tê deme avabûna merwani, mirov karê bêje ku kurd, bi giştî hema bêja li herêmên xwe bi rêxistin serwer in. Ev yek, weha ya. Ji sadsala 7 min, hata ku dem tê sadsala 9 min û pêde, mirov karê bêje ku kurd nirx û kevneşopîyên xwe li gor demê tênine ser ziman û bi rêxistin ji dikin. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet ji bêne ser ziman. Lê çend ku bi avakirina dewletên kurd yên weke Merwani û Şadadî re, serwerî û serdestiya xwe ava dikin ji, piştre bi bûyara weke bûyara kuştina Hasan-Huseyin ji, êdî qatbûna pergala kurdistanê ji temen dest pê dike. Bi kuştina(Pakrewan) wan re, êdî di serî de rojhilat û başûrê kurdistanê bertekên xwe didina nîşandin û di cih de xwe aligirên wan di denezênin. Bi vê yekê re, êdî temenê "Şîitîyê" ji tê avêtin. Kurd, bi nirx û rêxistinên xwe yên ku bi navê "dergah"an, wê temenê di avêjin. Têkiliya kurdên rojhilat û başûr bi xanadana "sefevî" ku piştî bêbandûrbûna Sasaniyan re derketiya pêş, xwe weke aligirê wê aliyê şîitiyê di denezêne. Ku wilo xwe di denezêne, êdî kurd ji, piştgiriyaka mazin didinê de ku mazin bibe û derkeve pêş. Li ser mîreteye sasaniyan, hinekî bandûra wê ye mazin heya. Lê piştê ku kurd ji piştgiriyê didinê de, êdî di zû mazinbûna xwe de sînoran nasnakê. Piştre, di demeke kin de, dewlete mazin ye bi navê ""dewlete Sefevî" derdikeve hole. Bi kurdan re bi hinek levkirinên ku dike re, xwe ji temen dihilde ewlatiyê. Di serî de, weke ku kurd û sefevî bi hev re wê rêveberiyê ava dikin. Lê piştre ku mazin bû û hata asta împaratoriyakê, êdî bidest çûna ser kurdan kir û xwest ku wan bike bin hêze xwe de û bi rê ve bibe. Bi vê yekê re, demên piştre, wê şahên seffevîyanê yên weke Mohammed xudebendî ku herêmên kurd yên weke "şîvanê" bidest komkujiyan dikin, derdikevin. Kurdan ji, ji ber ku êdî bi şîitiyê mazin dibin li van herdû aliyên kurdistanê û ev rêveber ji xwe ji wê nirxê di hasibêne û têne ser ziman, êdî çend ku bertekan bidina nîşandin ji, wilo zêde bi pêşve naçin. Lê li herême ku bi şaxsiyetên ku bi aslê xwe kurd in, bi mirovên weke Îdrîsê bedlîsî re serwerî û serdestiya li kurdistanê mazin kirina, hêzên weke hêzên "osmaniyan" derdikevina hole û serwer dibin. Êdî ji vir pêde, mirov karê bêje ku rewşeke nû ye ku li ser kurdan di afirê dibêt. Piştre ne bi gelekî re bi hatina ber hevdû ye osmaniyan û dewlete sefevîyan di qada şer de, êdî bi zêdeyî wê baxtê Kurdistanê bide kifşkirin. Ew qatbûna ku bi afirîbûna şîitiyê re bûya, êdî di piştî wî de bi peymenên weke yên "qasrî şêrîn" tenê fermîkirin û êdî Kurdistanê bi xwe û pergala xwe ve dibêt dû qat. ..

Piştî şerê di naqabîna dewlete sefevîyan û dewlete osmaniyan yê li Kurdistanê li Çardiranê bûya ji, êdî çend ku osmani bi Îdrîsî bedlîsî re peymene Amasya mohr dikin ji û li gor wê peymenê, wê rêveberiyê di nav xwe de bi par bikin û li gor wê rastkirinê ji

tênekirin ji, lê yê ku ew peymen bi Îdrîsê Bedlîsî re mohrkiriya Yavuz Selim, piştî mir û qanûnê siltan suleyman hata dewsa wî, êdî wî ew peymen bi fermenkê ji hole rakir û hêzên ku di bin destê xwe de afirandin ajotina ser kurdan. Li aliyê sefevîyan ji, mirov karê bêje heman rewş bû. Di wan şeran de, yên ku herî zêde widahi dan û hatina kuştin kurd bûn. Kê şerkir ji wan hêzan, di şerên wan de bi zêdeyê kurd hatina kuştin. Li herdû aliyan ji wilo bû. Piştî peymene qasrî Şêrîn hata mohrkirin, êdî ew peymen, hebûna wê bi kurdan dana erêkirin, ji bo wê şerekî li dijî kurdan bi wan hêzên ku li ser wan serdest in bi wan re dest pê kir. Ji wê peymenê pêde pirtûk û nivîsên kurdan ji holê hatina rakirinê, Yên ku navê wan ku navê Kurdistanê bixwe ji têde dihata ser ziman, ji holê hatina rakirin. Piştre ol ji, çend ku temenê wê ole mazin ji kurdan bixwe bû, hewldanaka ku wê li dijî kurdan bicih bikin dest pê kir. Piştre gelek "fetwa" li ser serê kurdan hatina dayîn. Ji her aliyê ku li ser serê kurdan serwer û serdest bû, fetwa bûn. Fetwa herî dawî ji, ku mirov ji roje me di vê xalê de minaqekê bide, mirov karê "fetwa" serê kurda ya damazrînerê komara Islemê ye îranê Humeynî ye ku di sala 1988an de dayî mirov karê bibîr bêne. Ew kirin, ji dîrokê hata wê rojê yên ku bûn, hemû ji, ji bo bi kurdan peymana qasrî şêrîn bê erêkirin bû. Peymene qasrî şêrîn ye duyemin ji "Peymene Lozanê" bû. Şer û pevçûnên ku piştî qasrî şêrîn re dibin, yên ku wê bi kurdan bidina erêkirin bûn. Divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman.

Kurdan, di nav xwe de ji demên piştî qasrî şêrînê hata vê demê ji, li berxwedan. Ev rewş û hebûna wê di nav xwe de erê ne kirin. Bi vê yekê re, şerên li dijî kurdan bûn û zêdebûn. Kurdan, di nav xwe de hebûna xwe xwest. Lê hêzên li ser serê wan serdestbûn ev yek ne xwestin û li ber wê sekin in. Çare ku dîtin, ku kurd wê erê nekin wê ji dîrokê birina xwe erê bikin. Bi vê yekê, pêvajoyna mazin yên li êrîşî li hebûna wan dest pê kirin. Kurd hata roje me hatin. Î ro ji, di wê rewşê de na. Em î ro di sadsala 21. de dijîn. Lê hê ji, zimanê wan yê kurdî li wan bixwe ku pê xwe bi perwerde bikin û bixwênin qadaxa ya. Divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman. Ziman, xalaka girîng e, di yekbûnîya gelekî de. Temenekî bingiha. Ji ber vê yekê pir girîng e. Kurd, î ro, ew yekbûnaka xwe ye ku di dîrokê de afirandibûn û windakirina hewldana avakirina wê didin. Tekoşîna wê didin.

DE Î RO DE YEKBÛN, ÇENDÎ PÊWÎST Û GIRÎNGA, DÎROK ŞANÎ ME DIDÊ

Ku mirov li î ro bi hizirê, mirov wê gelek tiştên bêne ser ziman di çerçove mijara xwe de bîne. Lê bi sereke mirov karê weha bêne ser ziman. Piştî peymene Lozanê ku di sala 1923an de hata mohrkirin, êdî ji bo kurdan bigiştî pêvajoyaka nû dest pê kir. hemû mafên wan yên mirovahî ji destê wan hatina girtin. Zimanê wan yê kurdî bixwe ji li wan bixwe ji hata qadaxakirin. Ev rewş, ji deme ku ew peymen bû, bi sedeme şer hata ku tê roje me. Î ro, di roje me de, hê ji, kurd, tekoşîna mafên xwe yên mirovahî didin. Di sadsala 21an de wê tekoşînê didin. Ji bo ku ji wê tekoşîna xwe bêne dûrkirin û wê rewşa ku li ser wan hatibû ferzkirin bi wan bidina erêkirin, kurd "terorîst" ji hatina denezandin li CIHANÊ. Hê ji ew rewşe ku ji bo wan hatiya afirandin, li ser wan tê berdewam kirin. Di sadsala 21an de di 2010an de zimanê wan yê kurdî yê ku wê perwerde xwe bidinîn û pê jîn bibin ji, li wan hatiya qadaxa kirin, Nûserê(nivîskarê) van rêzan bixwe ji, xwe nûserê zimanê xwe yê ku lê bixwe ji hatiya qadaxakirin dibîne.

Li ber vê yekê, î ro, tiştên ku kurd bixwe bikin hene. Ew ji her weha ew in, ku li zimanê xwe xwedi derkevin û vê rewşe ku li ser serê wan û zimanê wan heya, bi buhurênin. Ji bo wê tekoşînak, wê ji rûmete wan tê hasibandin. Î ro, çend ku dî dîrokê

de awqas êrîş û çûyînên ser wan bûn ji, hê ji kurd, bi hêz hebûna xwe di parezên. Ya ku di keve ser milê wan ye bi rûmet ew e, ku werine çend hevdû û yekbûnaka demî di nav xwe de çêkin. Ev yek ji bo wan hemûkan teneê weke pêdivîyeke demê ya, wekî din ji riya tenê ya ku pê rûmet xwe xilas bikin ji ya. Di roje me de bahsa konfaransa netewî ye ku pêk bê anîn tê kirin. Ev yek, wê bê temenê yekbûna wan û dem ye ku ji wan dixwezê ya.

Ku mirov ji î ro, bahsa kurdan û rewşe wan ye ku heya li ser serê wan bike, divêt ku mirov pêve, hinekî bişûn ve herê û bêne ser ziman. Bi teybetî ji ji deme şerê Çardiranê û peymene Qasrê şêrînê mirov divêt ku dest pê bike û bêne ser ziman, Ev dem, ji bo kurdan û dîroka wan pir girîng e. Kurd di vê demê de, temenê van rojên ku têde dijîn tê avêtin. Bi teybetî ji, ji vê demê pêde û bi vir ve, derketina osmaniya û li ser herême serwerbûn û serdestbûna wan, bi vê rewşê re bi temen dibê. Peymene qasrî şêrîn ji bo osmaniyan girêng e. Wan li ser herême bi hêz dike weke hêzeke herêmî. Ev yek, baxtê herêmê bi vê yekê dide kifşkirin. Bi teybetî ji baxtê kurdan dide kifşkirin. Piştî vî şerî re, li Kurdistanê hem li rojhilat û başûr bi îraniyan re û hem ji li bakûr bi osmaniyan û kurdan re pir şer û pevçûn rû didin. Gelek çûyînên li ser wan dibin. Piştî şerê Çardiranê û peymene Qasrî şêrîn re, mirov karê bêje ku êrîşe osmaniyan ye bi pergal bi qanûnî siltan suleyman re dest pê dike. Di deme Yavuz Selim de ji, êrîşên ku dibin hene. Yên di deme Qanûnî siltan suleyman de bûna, wateyeka wan ye dîrokî ji bo dîroka kurdan hena. Ev ji hena. piştî wî peymenê re ji bo ku dana erêkirin ye wê peymenê êrîşe bi artiş ye bi pergal ye pêşî ya. Ji bo vê yekê ji ev yek her weha giring e. Ji ber vê yekê, deme qanûnî siltan suleyman, ji bo kurdan, demeke ku pir girîng e. Yê ku peymene ku di nav Îdrîsî Bedlîsî û Yavuz Selim de piştre bi fermenekê ji ji hole dirakê dise ew bixwe ya. Vê yekê ji divêt ku mirov bi teybetî bêne ser ziman. Li aliyê Sefevîyan ji, kurd, ji wê rewşe cuda najîn. Kurd, hem bi wan şerên weke yên Çardiranê yên ku wan hêzên serserê wan yê serdest di nav xwe de kirina û hem ji yên ku wan di nav xwe de bi xwe bi xwe re kirina re ji kal dikevin. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku wilo zêde êdî hebûnaka mazin ye dîrokî nadina nîşandin. Ev rewş û dîrok, hata ku têne sadsala 18. min, êdî dikeve pêvajoyaka nû ye din de. Ev pêvajoya ku êdî ji bi şerê herdû navendên ku dibêjin em "musulman" in re li dijî kurdan ku dibe û êdî kurdan tavahî dide berxwe, bi pêvayoyaka ku ji ya sadsala 8. min û 9. min ku li dijî kurdên êzîdî pêk hat, cuda pêşnakevê. Di wê deme ku li ber êzîdîyan sekin in û çûna ser wan de, li ser wan çi nivîs û pirtûk hebûn hemû hatina şawitandin. Di wê demê de ji, çi nivîs û pirtûkên ku navê kurd û kurdistanê dixistan nava xwe de û têde hebû, ji hole hata rakirin û an ji hata şawitandin. Bi vê yekê re, êdî pêvajoyaka nû ji bo kurdan dest pê kiribû. Ev pêvajo hata ku tê sadsala 19. min, dawiya Ermeniyan û hinek herêmên kurdan heme bêje têne. Kurdên ku dimênin ji, bi çûna ser serê wan û tefisandina re, êdî pêvajoyaka nû dest pê dike. Pîr û kalên kurdan yên weke Şêx Saîd û Sêd Riza li ber vê yekê dikin ku bisekin in. Lê ew ji çawa ku dengê xwe derdixin têne girtin û piştre têne bidarvekirin. Kurdên ku dimênin ji, bi pêvajoyên bişavtinê re êdî rû bi rû dimênin. Ev rewş, weke ku bi peymeneke ku dayimî li ber kurdan bi wan hêzên li ser serê kurdan serdestin re hebe, li her herêmên kurdan ev rewş û pêvajo, bi pêvajoyên bişavtinê li her derê kurdistanê tenê berdewam kirin. Ewropî ji, weke ku ji kurdan re bêjin, ´we em di deme hatina seferên xaçiyan, we em di pêşengiye Salahadinê Eyûbî de têk birin, winê êdî di dîrokê re dibin´ ji kurdan re bêjin, piştgiriyaka dîrokî didina wê rewşe li ser serê kurdan. Ku ev yek ne

wilo bana, ma gelo mirov wê çawa bêne ser ziman, ku î ro em di sadsala 21ê de dijîn ku di 2010an de hê ji zimanê kurdan yê zikmakî li wan qadaxa ya û ew rewş bi piştgirtiyan tê berdewam kirin? Bi vê yekê, piştgirî ji wê şerên li dijî wan tê dayîn û ev rewşe li ser serê wan, bi peymene ku ewropê li bajarê firanse li Lozanê di sala 1923an de daya mohrkirin, ku kurdistan têde bû çer qat, tê berdewam kirin. Ewrope, çend ku bi ser ve hezar sal ji buhurtie û î ro, pêşketinaka mazin ji jîn kiribe, hê bandûra Salahadinê Eyûbî bi têkçûna li Kudusê ji ser xwe ne avêtiya.

Kurd, î ro, di rewş û pêvajoyaka ku yekbûna xwe bi kanfaransê netewî yên xwe bin û her weha bi levciivin û an ji saziyên ku wî karî bicih bênin, ku newine avakirin, nikaribin, wê rewşe li ser serê xwe ji ser xwe rakin. Ev yek, her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman. Ji ber vê yekê, konfaranse netewî, ji herdemî, î ro, pêdivîya kurdan pê heya. Yekbûn, ku bi kurdan re bû û pêşketin li ser wê bûn, ew pêşketin, wê herêmê ji bi pêşve bibin. Bê ku kurd yekbûn û pêşketine bibe, wê herê wilo zêde ji pirsgirêkên xwe ne buhurêne. Ji ber vê yekê, mirov karê bêje ku konfarase netewî ye kurdan, wê karê konfaranse rojhilata navîn ye pêşketin û bi pêşveçûnê bibîne. Di ziman, çand, herêmî yên xwe de gihiştina têgihiştine yekbûnê, wê pêşketina nava wan bi awayekî geometrik wê zêde bike û bide kirin.Ku mirov ji î ro ji roje me minaqakê bide wê têgihiştineke mazin ji mirov çêke. Komara tirkî ji aliyê aborî ve di başûrê kurdistanê de ya. Bi vê yekê re, mirov karê karê bêje ku bi vê yekê, aliyekê pêşketine kurdan dike bin destê xwe de. Aborî, xalaka girîng e, ji bo pêşketin û yekbûna kurdan. Kurd, hê ne xwediyê politikayên xwe yên aborî ji bo xwe na. Divêt ku mirov vê yekê ji bi teybetî bêne ser ziman. Ji aliyê hebûna aboriyê ve pêdivî pê heya ku têgihoştinaka mazin di nav kurdan de bibe da ku di vir de pêşketin bibe. Wê hingî baş û qanc bê fahmkirin ku çima tirkiya wilqasî li ser aboriya başûrê kurdistanê disekinê û hemû kar û xabet û têkiliyên aborî pêre dêne. Ev politikayên ku î ro têne kirin yên dem dirêj in. Divêt ku ev yek ji pir baş û qanc were têgihiştin. Aliyekî netewî û yekbûnê ji ev xala girîng e, ku divêt ku mirov pir mazin li ser bisekinê û wê pir mazin û baş û qanc fahm bike. Di deme şerê duyemin yê Îraqê ketine rojeve ye ku kurdên başûr kurdistanê wê elfebete latini bi kar bênin û li ber wê sekinandin ye ji aliyê tirkî ve û xwestine gihiştine serweriyê aboriya başûrê kurdistanê, heman mijarê dike hişê me de. Ew ji her weha li ber yekbûnê sekinandin a. Têkiliyên wê yên bi Îran û sûrî re ji li ser vê esasî na. Bi "Îraqa nû" re ji li ser vê esasî na. Ev yek, her weha pêdivî pê heya.. Bûyarên ku bi êrîşên nijadperestên tirkan li dijî mal, kargah û kurdan bixwe li "Înegol"e Bursê û li "Dortyol"a Hatayê pêkhatin, li serweriya kurdan aliyê wan yê aboriya ji. Ev rewş ji, bi vê yekê ve girêdayî ji divêt ku mirov li ser bi sekinê.

Li ser yekbûnê sekinadin, î ro di roje me de giringiye wê hê bêhtir xwe dide der. Divêt ku mirov wate wê hê bêhtir li ser bisekinê û bide fahm kirin. Kurd, divêt ku pêşketin û politikayên ku dibin ji, fahm bikin û derxina têgihişt û zanebûnê. Ev yek, her weha pir girîng e. Ku mirov li ser mijara yekbûna kurd û konfaransa kurd ye netewî bi sekinê, ev mijar û hê gelek mijarên din bixweza xwe bi diyarî didina berçav.. Bi vê yekê re divêt ku mirov li ser bisekinê û bêne ser ziman. Ji aliyê zimên, çand û aboriyê ve yekbûn, temenê mazin e. Ku kurd bahsa yekbûn û konfaranse netewî bikin, divêt ku van mijaran ji pir baş û qans li ser bisekin in û fahm bikin û derxina têgihiştin û zanebûnê. Li başûrê kurdistanê, ji aliyekî ve, bi peymenên ku hatina kirin, heman mirov karê bêje ku serweriya kurdan ye aborî ji wan hatiya standin. Ev yek, hewldanaka ku kurdan hê

fahm nekiriya lê ye pêşî li yekbûn û konfaransa netewî girtina. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha pir baş û qanc fahm bike.

Yekbûn, ku bê avakirin, di van mijaran de serweriyê ji mirov dixwezê, Wê çaxê, wê pêk were. Ji van aliyan ve li ser van xalan sekinandin û derxistina têgihiştinê pir girîng e. Kurd, ji her demê vê demê divêt ku ew vê yekê fahm bikin û li ser bisekin in. Li başrê kurdistanê, ketine rojeve ye elfebete latinê ye kurdî, girîngî ye wê heya. Pêşketine wê heya. Ji bo ku pêşîye vê yekê bigirin ji, li Başûrê kurdistanê bi saziyê îstihbarî yên weke yê "fethullahciyan" ev yek tê bi rê ve birin. Di aliyê perwerde de ji li wir vekirina dibistanên wan, divêt ku mirov bi vê yekê ji gelek aliyan ve bêne sr ziman. Mirov bi çand û zanebûnaka ku ne xwediyê têgihiştine netewe xwe ne mazin kirin û careka din bi wan saziyan pêşîya pêşketine wê têgihiştine di nav kurdan de girtin, her weha bi van saziyan tê rojeve. Pêşketine yekbûna kurdan, bi têgihiştin û gihiştine farqa van pêşketinan û têgihiştine wan ye ku ew pê hatina demazirandin û kar pê dikin. Ev yek, ji wê pêşketineke mazin derxe hole di nav kurdan de. Yekbûn, temenê pêşketine kurdan ye î ro ya. Xalên ku wê wê pêşketine bi rê ve bibin û mazin bikin û bi srbixin ji, ziman, çand û serweriya aboriyê ye wan bixwe ya. Li herêmên xwe, bi serê xwe rêxistinbûna wan, wê temenê vê yekê her weha bi afirêne. Divêt ku bi vê yekê bê fahm kirin ku ziman, perwerdebûna wê temenê hebûn û pêşketine çandê ya. Ku ziman nebe, wê ew ji pêşnekeve û jê wirdetir ji wê nebe. Ev hersê xal, hevdû di pêşketinê de diadilênin û bi rê ve dibin. Ev hersê xal, di têgihiştinke civakî de pêşketine dîrokî ya civakê didina kirin. Ev xal, hemû divêt ku werine nîqaşkirin, Ew nîqaşên ku wê bi van xalan re bibin, wê temenê yekbûn û konfaransa kurd ji bin. Ku ev yek, nebe, çiqas bê gotin û bahsa konfaransa kurdî ji bê kirin, wê teneê ev yek bi têgihiştin û hizrekê re bi sînor bimêne. Ji vê yekê, divêt ku mirov li ser vê yekê pir mazin bi zanebûnaka dîrokî bisekînê û hizrên ku wê temenê yekbûne netewî biafirênin divêt ku derkevine holê.

Di dîrokê de, yekbûna kurdan pir mazin bûya. Çend ku bê gotin ku di demên berê de "aşîrî hebû, yekbûn nebû û pêşketin bi vê yekê re nebûya" ji, mirov ku li dîrokê dimeyîzêne, mirov vê yekê wilo nabinê. Mirov yekbûnên mazin yên ku kurdan di nav xwe de çêkirina dibîne. Yên demên ku herî zêde têne berçavên mirov ji, bi rêzê yên demên Gûtîyan, Naîriyan, Mediyan, Şadadiyan, Merwaniyan, Eyûbîyan û hwd. Her weha hê gelek hevgirtinên din hene, yên ku mirov wan bêne ser ziman. Dîrok, ji vî aliyî ve li bendî xwandin û lêkolinkirinê ya. Di demên Gûti, Naîrî û Medi, merwan û Eyûbîyan de gihiştine asta Împaratoriyê û demne mazin bi wan deman jînbûna wan, mirov karê bi wê pêşketin û têgihiştine yekbûnê bêne ser ziman. Deme Gûtîyan, deme wê yek serwer û serdest ne bin 300 salî re ya. Deme Naîriyan ji wilo ya. Demên din ji xwediyên demên dirêj in. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet ji bêne ser ziman. Ev dîrok hemû dîroka têgihiştine yekbûnê ya. Yekbûn, bê têgihiştin pêk nayê. Di wan deman de ji, mirov dibîne ku têgihiştineke mazin ye dîrokî bi kurdan re heya. Ku nebû bana, wê her weha mazin pergalaka mazin ye pêşketin û têgihiştine ku serwerî Kurdistanê hemûye, wê ava ne kiriban. Bi vê yekê re, wê bi têgihiştine ewqas çand, kevneşopî û bi teybetî ji zimanê wan wilo pêşketî nebana. Zimanê kurdan, hê di deme Mîtaniyan û Hûrîyan wan de xwe gihandiya têgihştineka mazin. Kurmancî bixwe ji, divêt ku mirov bi teybetê bêje ku awayê wê yê deme civakatiyê ya. Û kurmancî ji bi dîroka xwe ye pêşketinê re ji deme sûmeriyan bi dest pêşketine xwe dike. Biqasî wan lêvelbar(tablet)ên sumeriyan yên ku wan nivîsandin û hata roje me mana, ne kêmtir

kurmancî ji xwediyê pêşketin û têgihiştineke mazin ye dîrokî ye di xwe de. Kurmancî, zimanê kurdi yê ku mirov weke wan kêvalbaran hildê dest û lêkolinê li ser bike ya. Ev yek, ku zanista zimanê kurdî ya pêşketi afiribana, wê bizanebûnaka ne maizn ye piçûk ji wê kifş kiribana. Bi zimên re, ku mirov li ser yekbûna kurd û kurdistanê diaxivê û dinivîsnê, mirov weke xalaka din mirov ku li ti derên din rastî newê mirov rastî hebûne têgihiştinê ji têt. ..

…

**Plana ´şarq û îslahatê´, komkujiya ermenîyan, komkujiya zilanê, komkujiya Roboskî, Komkujiya Geverê, û bi komkujiyên li deverên bajarên din ên bakûrê kurdistanê re isrera dewletê ya ´bêstatû´ hiştina kurdan û pêvajoya ´çareserîya demokratîk. ..**

Komkujiya li geverê ku hêzên dewletê li ser serê gelê kurd kirin, hinekî jî divê ku mirov bi zihniyeta dewletê ya ´înkarker´ re hilde li dest. Bi wê re jî, divê ku mirov vê komkujiyê, weke nîşanaka ku rejima tirk, dixwezê ku ´pêvajoya çareserîyê´ di temenê ´tasfîyakiirna´ tevgera azadîya kurd de bikarbêne de fahm bike. Bi vê yekê re, divê ku em fahm bikin ku piştî gera Birêz Berzanî ya li Amedê û pêde, pêşî li ber sînorê Nisêbînê û Qamişlo du kurd ên sivîl hatina kirin. Duhû jî, geverê, hêzên dewletê(polisêne dewletê) gûla barandina ser xalkê sivîl û du kurd qatilkirin û bi dehan jî birîndar kiirna.

Bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku bo civatekê pekrawanên çîmentoya civatî ya. Bo ku ev nirxên ku temenê pêşketina civatî a civate kurd nebin, ev hêrîş dibin. Yanî, ev komkujîya li Geverê, komkujiyaka ku dijî pêşketina civatîtîya kurd û nirxên wê jî na. Ji xwe, berî wê jî, bi dehan caran li goristanên ciwanên kurd ku jîyane xwe di tekoşîna azadîya kurd de dane hêrîş bûna. Ev hêrîşên bi vî rengî, wusa xuya dike ku bi plan û program tên kirin. Ku mirov tenê di çerçoveya pêvajoyê de bi gotina "provakasyonê" werêne ser ziman, wê kêm bê. Li vir, ji wê zêdetir, divê ku mirov di vê hêrîşê de bixwêne.

Bi teybetî, hêrîş li xal û nûqtayên ku em dikarin weke xal û nûqteyên ku civatîtîya kurd diafirênin dihên kirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê di serî de kifş bike. Her wusa, em vê jî bibêjin. Di vê demê de, gotina ´provakoasyonê´ jî dewletê jî, pirr caran gelek kirinên bi vî rengî kirina û bi wê gotinê bi navkiirna û piştre ew ji rojevê hatina dûrkiirn. Yanî, weke gotinên ´pêvajoyê´ ´çareserîyê´ û hwd, gotina ´progavasyonê´ jî, dihê bikarhanîn. Ji kûderê, mirov vê yekê fahm bike? Weke ku çawa di demên berê de bû, di vê pêvajoyê de xwekirina rola ê ´maxdûr´ a AKP´ê, mirov vê yekê fahm bike. Li ser van kiryaran re, nêzîkatîyaka bi vî rengî dihê pêşxistin. Yanî, bi vî rengî, hem hêrîşê dibina ser nirxên civate kurd, hem jî piştre li ser wê re xwekirina rola maxdûrîyetê´ de, hinekî jî bizanebûn dihê kirin. Ji xwe, gotina "maxdûrîyetê", hertimî hatîya îstîsmarkirin. Rejimeka ku şer li dijî hebûna civatekê dimeşêne û zimanê wê qadaxa kirîya û hebûna wê tûna dihasibêne û ji holê ra dike, çawa dibe ku dibe "mexdûr"?

Asil leyistik û bêahlaqî di vir de ya. Dema ku em vê yekê di serî de fahm nekin, emê nikaribin bi tememî pêvajoyê re dewletê jî bi politikayên wê fahm bikin. Ji xwe, dema ku em gotina "provakasyonê" bi vê komkujiya geverê a ku hatî serê kurdan re bikarbênin, emê bi awayekî xweza temenê gotina "mexdûrîyetê" bo dewletê û hikimeta AKP´ê biafirênin. Lê ev ne rast a.

Ji xwe, dewletê, hê hevdîtinên ku bi birêz Ocalan re jî herê nekirîya. Temenê wan hevdîtinên ku dibin tûna ya. Weke ku çawa ku dema ku dewletê dawî li hevdîtinên ku Oslo ên bi tevgera azadîya kurd re hanî û piştre tecride li ser birêz Ocalan zêdetir kir û parazerên wî hemû girtin û avêtina zindanê û hwd, ji ber ku temenê wan tûnaya siba ku di vê pêvajoyê de jî, heman rewşê werêne serê kurdan, kî wê karibê çi bike û bibêje? Ji xwe bi hezaran sîyesetmederên kurd, di zindanê de na. Di vê dema ku tê gotin ku dema "hilbijartinan" jî ya, rojek namêne ku em nûçeyên di derbarê serdegirtinên malan û girtinên andamê BDP´ê ji çapameniyê nexwênin.

**Di vê pêvajoyê de, ev komkujiyên weke ku li geverê bû û li li sînorê di nava Nisêbînê qamişlo de ku bi qatilkirina sê kurdên rojevayî û hwd, em nikarin bi tememî di temenê provakasyoneka li pêvajoyê de bixwênin. Em dikarin di temenê konsepta dewletê ya ku dixwezê ku ´pêvajoya çareserîyê´ bike temenê pêvajoyaka ´tasfîyakiirna´ tevgera kurd de fahm bikin. Bi wê re jî, divê ku em di temenê de, ku em li pêvajoyê binerin, rasta, bo kurdan û aliyê kurd pêvajoyeka heya. Ku em ji aliyê kurdan ve û ji wê gotina ji aliyê wan ê ´ppêvajoya çareserîyê ve hildina li dest, rasta ku dibe ´provakasyonek´. Lê em ji aliyê dewletê ve nikarin vê yekê bibêjin. Ji ber ku ji aliyê ve pêvajoyek tûna ya. Dewlet û hikimeta AKP´ê, tenê dixwezê ku li ser wê pêvajoya ku aliyê kurd dayî destpêkirin bijî û ji wê li gorî xwe sûdbigrê û bi wê re êdî ku karibê derbeyekê li kurdan bixê. Bi vê yekê û awayê, em divê ku ji aliyê gotinan ve, aliyê kurd û aliyê dewletê, weke hevdû şîrove nekin.**

Di temenê de, dema ku em li komkujiya geverê jî binerin, weke ku birêz ocalan jî hanî ser ziman, provakasyonaka´ li pêvajoyê û li aliyê kurd. Ev ji vê aliyê ve rast a. Lê dema ku em heman şîroveyê û gotinê ji aliyê dewletê û hikimetê ve werênina ser ziman, wê ne rast bê. Di aslê xwe de ku em ji aliyê dewletê û hikimetê ve werênina ser ziman, wê kiryar û konsepta ku dewlet hikimet bo tasfîyakiirna tevgera kurd di vê pêvajoyê de hin bi hin pêş dixe, wê bibe maske û sernûxûmandin jî. Yanî, wê rengê kiryarên dewlet û hikimetê ser bininûxûmêne.

**Komkujiya geverê, divê ku em ji sê aliyan ve lêbinerin û şîrove bikin. Aliyek, bi wê komkujiya ku hatî serê kurdan ya berî î ro bi çend rojan ya li ser serê naqabîna Nisêbîn û qamislo ku bû, bi wê re di temenê konsepteka dewletê ya li dijî tevgera kurd û tekoşîna azadîya kurd, divê ku mirov lê binerê. Aliyê dî ê duyemin jî; ew a ku divê ku komkujiyê di temenê vê dema rasthatina komkujiya roboskî de hilde li dest. Komkujiya roboskî, bi gîyaneLozanê û paxta sadabadê bû. Armanca wê, çavtirsandin jî bû. Bi wê re, komkujiya geverê, bi vê aliyê duyemin re dide nîşandin ku ev xate herêmên kurd, ji Nisêbîn, şîrnax, şemzînan û heta ku digihijê geverê û hinek herêmên din û hwd, ku bo wan xwediyê hin politikayên teybet a. Aliyê din ê sêyemin jî, ew a ku em divê ku di çerçoveya pêvajoyê de hildina li dest ku ji aliyê kurd ve ku mirov lê dinerê, weke ku birêz Ocalan jî dihêne ser ziman, ´provakasyonek´ a. Lê bi vî aliyî ve girêdayî, divê ku em bibêjin ku dewletê, rengê pêvajoyê, ne di temenê gavavêtin û çareserkirina pirsgirêka kurd de di serê xwe de şîrove kirîya. Di temenê ku di vê demê de ku karibê, derbeyekê li kurdan bixe û vîna wan bişikêne. Di dema hilbijartinan de, bi dadî û hêzên ´îdarî´î ên polsiîya û hwd, her roj bi serdegirtina malên sîyesetmederên kurd û hwd, di temenê wê politikaya ku hêzên dewletê bi wê û bi mantiqê wê ew komkujiya ggeverê kirna, divê ku mirov li mijarê binerê. Zihniyeta di temenê wan serdegirtinên malên sîyesetmederên kurd û ya di temenê vê komkujiya ku li geverê bû de, weke hevdû na. Di aslê xwe de yek in. Em, nikarin ji hevdû şîrove bikin.**

Li vir, ku em kirinên ku di vê demê de dihên kirin ku em rast bixwênin, divê ku em bibêjin ku pêşî, hewldanên çêkiirna ´diwarê şermê´, piştre hewldanên kişandina têlan, piştre hewldanên têlkirina sînorê roboskî, piştî wê re hêrîşên li goristanên pekrawanên gelê kurd û hwd, ev hemû û bi gelek kiryarên din ên dewletê re ku em divê ku bi vê kirina komkujiya geverê re bixwênin û hildina li dest û li berçav bigrin in. Li vir,

dema ku em ji vî aliyê li pêvajoyê binerin, emê çêkiirna qarakolan û bendavanên bi armanca leşkerî ku li kurdistanê tên çêkirin bi ziniyetî bi wê komkujiya geverê re bixwênin. Ji ber ku ew zihniyeta ku wan qarakol û bendavên bi armanca leşkerî li kurdistanê li ser serê kurdan çê dike, di temenê vê komkujiyê de jî ya. Yanî, pêvajoyaka ku di wê de dixwezin ku karibin, ku bi çi rengî bê, kurdan binbixin. ..

Di vê temenê de, di aslê xwe de, ev komkujiya li geverê û hêrîşên piştî wê komkujiyê re ku li gelê kurd ê geverê bûn jî, didina nîşandin ku di serê rayadarên dewletê de gotina ´pêvajoyê´ ku bikardihênin jî, tenê biarmanca xapandinê ya. ne bi armanca çareserîyeka mirovî û rast a. Bo vê yekê, divê ku em komkujiyên vê demê hemûyan ên ku bûna û ên ku wê bibin jî, bi wan serrdegirtina malan re di temenekî de hildina li dest û şîrove bikin. Ji ber ku hevdû jî, di temenekî û bi konseptekê dihên kirin. Gelê kurd, hertimî tekoşîna demokratik da bo ku dewletê ji vê konsepta xwe ya şer bi şûn de gav biavêje. Lê wusa xuya dike ku hê ji wê bi şûn de, gav ne avêtîya. .. Bi vê yekê, bi komkujiya geverê re, hemû komkujiyên ku hêzên dewletê kirina li ser serê gelê kurd şermazar dikin.

.. **Em li vir, divê ku di destpêkê de bi çend gotinan bahsa komkujiya Roboskî bikin. Komkujiya Roboskî, nîşanaka înkar û zilma li ser serê kurdan jî ya.**

Komkujiya roboskî, di 28´ê kanûna 2011´an de bû. Ev komkuji, bi ser ve du sal buhurt. Lê dewleta tirk, hertimî hewl da ku ser wê binûxûmêne. Komkuji, bi plan û program hatîya kirin. Di saatekê piştî civîna "MGK" ku weke ´lijneya ewlakariyê" jî tê bi navkirin tê kirin. Plangerî komkujiyê bi van gotinan di metne dadgeha leşkerî ya tirk de bi vî rengî cih digirê. "bo ji destûrê bigrê, serokfarmandarê duyem, bi telefonê li serokfarmandarê giştî gerîyeya. Serokfarmandarê giştî jî, bo civîna MGK li qasre(mal) xwe bûya. Serokfarmandarê giştî, bo pêdandinê naqşa(xarîta) xwestîya ku agahi ji wî re werina şandin. Piştî ku agahî çûna wî jî li wan nerîya û piştre fermane bombabarandinê ya." Ev sorkfarmandarê giştî jî Nejdet Ozel a. Bi fermane wî, komkujiya roboskî dihê kirin.

Komkujiya roboskî, ji ya ku em dizanîn zêdetirî di temenê wê de agahiyên giring hena. Lê hemû vêşartî na. Dema ku em li ser komkujiyê dihizir in, em vê yekê bi awayekî vekirî kifş dikin. Di saate ku civîna MGK´ê tê li darxistin de, serokfarmandar, hê ku di nava civînê de ya, agahî û zanyarîyên di derbarê herêma ku bê bombabarandin de dixwezê ku werina wir ser masaya wî. Ew jî, piştî ku agahi diçina ser masaya wî û berdestê wî, êdî fermanê dide. Lê li vir, ev jî, dihê ditin. Dihê fahm kirin ku di civîna MGK`ê de li ser wê hatîya axiftin. Di saate ku serokfarmandar di civînê de ya, nîqaşê li ser kirina komkujiyê dikin û biryar didin û piştre fermane bombabarandinê jî di wê dema civîna civînê de dihê ditin.

Ev rewş, komkujiya roboskî, bi asta xwe ya ku bi wê hatî kirin dihêne û dike rewşeka din de. Li vir, dihê dihê ditin ku cihê ku wê lê komkuji were kirin, wê kî were kuştin di bombabarandinê de û hwd, hemû agahî di bin dest de hena. Yanî, serokfarmandar jî û rayadarên din jî, dizanîn ku ew gundîyên roboskîyî na. ..

Li vir, pirsek dihê aqilê me ku divê ku mirov bipirsê. Tevî agahi di destê wan de hena û dizanîn ku ew gundî û sivîl in, bi armancê ew bombabarandin hat kirin? Her wusa, pirsa din jî, ew a ku ji ber çi biyara vê komkujiyê di MGK´ê de û di dema kirina MGK´ê de dihê girtin? Ev, weke aliyna teybet ên vê komkujiyê ku hê jî bi tememî safî nebûna na. Rayadarên dewletê, hertimî, înkar kirina. Rêyên înkarê bijartin. PÊşî, kirina,

piştre gotina me ne kirîya, weke ku di dema bombabarandina li Qandilê de ku di komkujiya Kortekê de. Komkujiya kortekê jî, piştî ku hat kirin jî, piştî ku di çapameniyê de cihgirt, serokfarmandarê a giştî bi çend gotinên ku weşandin got "me ne kirîya" û bi wê rêya înkarê bijart.

Kortek, herêmeke ku li Başûrê Kurdistanê li herêma Qendîlê dimênê ye. Balafirên artêşa tirk di 21'ê tebaxê de devera Kortek a di navbera Qendîl û Ranyayê de bombebaran kir, di encamê de 4 jê zarok, jinek ducanî û bi giştî 7 kesên sivîl jiyana xwe ji dest dan.

Tê gotin ku "serokfarmandarê gştî ê tirk, "li male xwe naqşeyên cihê ku wê komkuji were kirin xwestîya." Di metne dagehê de tê gotin ku "heta seat 8´an, hemû kirarên wê bi dawî bûna." Ev seat jî, seata ku di wê de civîna MGK´ê jî bi dawî dibê ya. Piştî ku ev kirarên ku tê gotin ku heta seat 8´an bi dawî bûna, heta wê demê de di civînê de bê û ankû bi dervî civînê bê, piştî ku ev kirarên ku bi dawi kirina, êdî ferman ji aliyê serokfarmandarê giştî ê tirk ve hatîya dayîn û bombabarandin hatîya kirin. Yanî, li vir, hemû tişt dihê zanîn. Dihê zanîn ku ew sivil in. Tevî ku ev agahî hemû di bin destê wan de hena jî, wê biryarê didin. Yanî, biryara bombabarandina sivîlan didin.

Ji xwe, ti kurdî hêvîya dadê ji ti dadên dewletê ne dikirin. Tevî wê jî, li bendê man. Pêşî, doz li dadgeha sivil hat vekirin. Piştre doz hat dirêjkirin. Ditin ku bertek zêdebûn. Li meclîsê komisyonek hat avakirin û piştre rayadarên tirk bi serokwizir re derdiketina berçapameniyê û digotin ku "li bendê rapora komisyonê bin." BI vê rengê bendawar hatina afirandin. Lê piştre ew rapor, di temenê paqij derxistina rayadarên dewletê û ser komkujiyê nûxûmandinê de hat nivîsandin. PIştî ragihandina raporê re, bo ku wê sernûxûmandinê pêkbênin, doza ku di "dadgeha sivil" de ku hatî vekirin, hat şandin li ´dadgeha leşkerî´. Di dadgeha leşkerî de jî, oz weke demekê hat hiştin. Ev jî, bi zanebûn hat hiştin. Ev dirêjkirin, heta 7´ê rebendanê hat domandin. Di 7´ê rebendanê de jî, dadgeha leşkerî a tirk, di derbarê kirina komkujiya roboskî û kiryarên wê ên ku komkuji kirinê de "biryara neşopandinê" da. Ev "biryara ne şopandinê" jî, bi armanca ser komkujiyê bi tememî girtin bû. BIryar, bo ku di derbarê komkujiyê de ti biryarên ku bo komkujiyê bibina dokument newina girtin û kujar werina parastin, ew biryar da. Ji ber ku ev politikayên dewletê ên ku bi wan komkujiyên bi vî rengî dike hê didom in. Ev "biryara ne şopandinê" dide nîşandin ku emê di demên pêş de jî rastî komkujiyên nû ên ku wê bên kirin bibin. ..

..**Min pêşî** xwestibû ku berî roja hatina helepçe, ez li ser wê binivîsênim. Lê dema ku ez li ser wê hizirîm, êdî min xwest ku ji 12´ê adarê nivîsa xwe binivîsênim. Di salwegera komkujiya qamişlo a 12´ê adarê de li qamişlo hêrîşek çeteyan li kurdan bû û 8 mirov hatina qatilkirin. Ev jî, didA nîşandin ku hê pêvajoya jenosîda kurd a helepçe hê didomê. Ev nivîs hem bo roja 12´ê adarê ku roja tevkujiya qamişlo ya 16 adarê roja tevkujiya helepçê bê. Helepçe birîneka civate kurd a ku hê êşa wê di dilê her kurdî de weke ku î ro ew bûya zîndî ya. Her mirov li ser wê dihizirê, mirov di mejiyê xwe de di nava wê êş û elemê de xwe winda dike. Mirov dema ku di axiftinekê de bidest avakirina hevokên xwe dimejiyê xwe de dike û dihê ser ziman de, ku mirov bi hevokên herênî destpê dike, piştre irov hew dibînê ku êdî mirov di dawîyê hevokên xwe bi nerînî ava dike. Ev bi derûnîya mirov re bi xwezayî dibê.

Helepçe, di 16´ê adare 1988´an de bû. Hingî, hê hin bi hin nûçeyên ku diketina ajansan de ew a ku ew şerê ku heft salan di nava rejima îran û ya Îraqê de destpêkiriya

ku bi ber dawiyê ve diçê. Nûçeyên ku dihatin û di weşîyan, di wan de di hinekan de jî dihat gotin ku "şer bi dawî bûya." Lê hê rewş û pozisyona hêzên îranî û îraqî weke xwe didomîya. Piştre Saddam berê xwe da kurdan. Hê bi awayekî vekirî û fermî, herdû aliyan bi hevdû re ne ragihandibû ku şerê di nava xwe de bi dawî kirina. Di vê navberê de, hizra ku ketîya serê Saddam de jî, ew a ku wê pêşî bi vî rengî bi tevkujiyek mazin wê kurdan bikujê û wê piştre bibêjin ku korbanîyên ku di dema ku şer di nava hêzên îranî û Îraqî de qawimî, ew jî rastî hêrîşê hatina di wê navberê de." Yanî, di navberê de mana. Hasab û kîtap li ser vê rewşê hatina kirin.

Yanî Saddam wusa hizir kirîya ku wê ´bi kevirekî du çûkan werênê xwerê´ Bo vê yekê, pêşî, hinekî berî wê demê oparasyona ku rejima Saddam li dijî kurdan li başûrê kurdistanê dayî destpêkirin hebû. Ew oparasyona ku dabûbû destpêkirin jî, navê wê kiribûbûna "anfall". "Anfall", navê sûreyî di kuran´ê de jî bû. Dii 16´ê adara 1988´an de dema ku komkujîya helepçe hatkirin de, piştî wê bi sê rojan di 19´ê adarê de konfaransa yekîtîya araban li hevdû civîyabû. Lê ti gotin jî, di wê de ji devê yekî jî ji wan derneketibû di derbarê wê tevkujiya kurdan ku di wê de bi hezaran kurd hatibûbûna qatil kirin.

Tirkiya jî, heya wê ji komkujiyê hebû. Di wê demê de, di asta serokomariyê de tirkiya jî di wê konfaranê de dihat nimînêrkirin. Tirkiya, wê piştî komkujiyê bi gelek salan wê li xwe mikûr were û bêne ser ziman ku "berî ku rejima Saddam bidest tevkujiya helepçe kiribû, agahî dabûbû wan" Yê ku wê bêne ser ziman, Abdullah Gul bû ku di dema ku ew wezîre karê derve bû, hingî wî ev gotin hanî ser ziman. Ji vê gotinê tiştekî din jî, dihê fahm kirin ku di wê demê de, ev hêzên ku kurdistanê di nava wan de hatî qatkirin, bi hevdû re li ser tevkujiyê nîqaşkirina. Xwestina ku wê jî, weke tûfanaka ku di nava şerê dû aliyan de ku hatîya serê gelê ku ji raya giştî re werênina ser ziman.

Hinekî, ku ne demeka zêde berî ku tevkujiya Helepçe destpê bike, wê li Îranê Hûmeynî jî "fetwa" serê kurdan bide. Ev jî, pirr manîdar bû ku rastî wê demê dihat. Ji vê yekê dihê fahm kirin ku van hêzan bi hevdû re ev mijare tevkujiyê bênina serê kurdan bi hevdû re nîqaşkirina. ..

Çendekê ber tevkujiya helepçe ji aliyê hûmeynî ve dayîna fetwa´ya serê kurdan û piştre weke ku Abdullah Gul jî hanîbû ser ziman ku "berî ku tevkujîya helepçe were kirin, agahî hatiya dayîn li tirkiya." Ev rewş, didina nîşandin ku van hêzan di nava xwe de, ev rewş nîqaşkirina. Heta ku li ser mijarê nîqaşkirin ku pitî komkujiyê ji ên ku wê ji komkujiyê bi ravin re wê ti dewletên cîran sînorê xwe nevekin. Di wê demê de, gelek kurd, hatibûbûna sînorê tirkiya, Tirkiya hingî sînorê xwe ne xwesibû ku vekê. Li ser hin bertekên hundûrîn û ji derve, êdî weke ku mecbûr mabû ku sînor vekiribû. Piştre jî, ji xwe ji ber ne dermankirinê bi sadan kurd, di wan wargehên ku li ber sînor ji kurdan re vekiribûn, di wan de jîyane xwe ji dest dan. Alikarîya wê jî, nebû bû. Yên ku alîkarî dikirin, kurdên herêmê bûn ku bi qamyonan di nava xwe de didan li hevdû rê dikirin li wan wargehên ku kurd di wan de bicih kiribûn.

Di meha reşemî(sibatê)ê de, oparasyona `anfall´ê hêzên Saddam dabûbûna destpêkirin. Wê di wê oparasyona ku anfalê ku heta 6´ê razberê k u tê gotin ku didomê, wê herêmek, gundek, çavçeyek û bajar û bajarokekî kurd nemêne ku di wê de xûrûxandin newê kirin. Oparasyona Anfallê, wê ji parazgeha herêma başûrê kurdistanê a Silêmanîyê dest pê bike. Wê piştre gav bi gav li herêman were belav kirin. Helepçe, weke ancam û dawîya wê bû. Yanî, bi tevkujiya Helepçê re, weke ku didan nîşandin ku

ancam mazin bidest xistina. Di wê dema ji 23´ê reşemîyê û heta 6´ê razberê, ku tê gotin oparayona enfalê li dijî kurdan rejima baasê meşand de, wê ser hijmaraka li dora dusad hezarî re kurd werina qatil kirin. Bi wê re jî, bi deh hezaran keçikên kurd, weke ku di dema tevkujiya dersimê re rejima tirk kir ku keçikên kurd ên zaro berhev dikirin û dikirina qamyonan de û di birina rojavayê tirkiya û li malbatên tirk ên ku kifşkirina ku belav dikirin, wê heman rewşê rejima Saddam jî bike. Rejima Saddam, wê bi vî rengî bi deh hezaran zaroyên keç ên kurd, wê bên berhevkirin û bên şandin li welatên din ên arab jî.

Bi vî rengî, bi tememî ji hevdû felişendinek ku di nava civate kurd de bikin, dabûbûn ber xwe. Ya rastî ku mirov bibêje ku ew felişendin, pêk hanîn jî. Ji wê demê û heta vê demê, ev herêmên başûrê kurdistanê ku li wan çekêm kimyewî li dijî kurdan hatibûbûna bikarhanîn, hê jî li wan nexweşî û hwd kêm nebûna. Heta ku li gelek herêmên wê jî, gaye jî şîn nabê. Di destpêka tevkujiyê de, kurdên feylî wê rastî wê tûfanê wê werin. Wê pêşî, ji wan bidest tevkujiyan were kirin. Li ber firatê û wan, û heta ku digihişt, herêmên kerkûkê, musilê, tûzxûrmat û hwd, hemû herêmên din ên başûrê kurdistanê, wê li wan oparasyonên demdirêj ên "paqijkirina kurdan" wê bikin.

Di wê dema Saddam de ku Saddam bi armanca jenosîda kurdan ew tevkuji kirin, ji wê demê û heta vê demê ti tiştek ne guharî ya. Hê jî, ew komkujiyên kurdan didom in. Piştî jenosîda helepçe re, ku ji wê demê û heta roja me, ku li demê hatî belavkirin, weke ku pêvajoyek tevkujiyên kurdan dihê bi rê ve birin. Di vê temenê de, ne tenê li başûrê kurdistanê, her wusa bakûrê kurdistanê, rojhilatê kurdistanê û rojavayê kurdistanê jî di nav de ya. ..

Deh sal berê, di dema ku tevkujiya Qamişlo bû, nîjadperestên arab, dibakirina kurdan, "winê li vir, helepçeyek din bijîn.", "emê helepçeyek nû werênina serê we." û hwd. Î ro, ya ku dikin jî ew a. her roj, hêrîşên li rojavayê kurdistanê, divê ku em di vê temenê de hildina li dest. Di dema ku komkujiya Til-hasil û Til-êran hat kirin û bi vir de, her roj bidestê çeteyên ku Îran û tirkiya û hwd ku bi rêxistin kirina û dişênina biser kurdên rojavayê kurdistanê de, bi destê wan tevkujiyan dikin. Di wan tevkujiyan de, kurd dihên qatil kirin. Ev tevkujiyên ku li rojavayê Kurdistanê bidestê van çeteyan didin kirin, bi wan re helepçeyek nû ya ku li demê hatî belavkirin dihê hanîn serê kurdan. Li vir, di serî de, min xwest ku gotina "komkujiyê" ji aliyê deronî ve hildima li dest. Ev gotin, rengekê wê ku em dikarin bi deronîya kurdan û bi gotina ´sendromê´ re jî bênina ser ziman bi jîyane kurdan re heya. Gotina ´komkujiyê´, di nava kurdan de, temenê gelek sendromên civatî ya. Ev gotin, dîrokeka wê ya teybet bi dîroka kurdan re heya. Ku em li dîrokê jî binerin, em rastî komkujiyên weke ´komkujiya geliyê zilanê´, ´komkujiya qelqeliyê´, ´komkujiya dibistana amûdê´, ´komkujiya dersimê´, ´komkujiya helebçê´, ´komkujiya şêngalê´, ´komkujiya roboskî´, ´komkujiya kortekê´, ´komkujiya ku hatî serê kurdan a li parîsê´ û hwd, bi vî rengî, em dikarin navê bi sadan komkujiyên ku hatina serê kurdan li dûv hevdû rêz bikin. Ev, navên çend ji wan komkujiyên ku hatina serê kurdan her yekê ji wan ku di wan de bi sadan û hezaran kurd hatina qatil kirin in. Di van komkujiyan de jî, bi hezaran kurd hatina qatil kirin.

Ên ku ev komkujî kirina jî, yek jî ji wan, ne hatina derizandin. Di derbarê ti komkujiyên kurdan de, win ti biryarên dadî(hûqûqî) ên ku di nava sînorê wan welatên ku ew hanîna ser ziman û di nava qada navnetewî de jî, ti biryarên mahkumkirina wan komkujiyan ne hatina girtin. Çend roj berê, me komkujiya roboskî li şûn xwe hişt. Di

wê ´komkujiya roboskî´ de ya ku 34 ciwanên kurd ku pirranîya wan bin 18 salîya xwe de bûn, hatina qatil kirin. Dadgeha tirk, bo ku serkomkujiyê binûxûmênin "biryara ne şopandinê" di derbarê kirina komkujiyê û kiryarên wê de hat dayîn. Ev jî, bû sedema nerazîbûna civate kurd bigiştî.

Komkujiya ku li Parîsê hatî serê kurdan de jî, bi heman rengî hewldanên ser wê nûxûmandinê, weke ku dihên dayîn nîşandin. Tevî ku kurdan bi sadan xwepêşandin bo wê li darxistin jî, hê jî derizandinaka bi adilane ne hatîya kirin û kiryarên wê bi tememî ne hatina li darxistin li holê.

Ji vê aliyê ve dema ku ez li komkujiya ku li parîsê hanîna serê kurdan ku lê dihizirim, ´bûyara direyfûs´ dihê bîra min. Di rohnîkirina vê bûyarê de nivîskarên demê ên weke Emîla Zola, rolek û weyneka mazin leyist. Gelo roja me de, mirovên weke emîla Zola li Firansa hena û ankû mana? Ez bixwe, ji vê yekê di serê xwe de bigûman im. Lê min pirr hêvî dikir ku yekî weke emîla Zola ku dikarî rûmeta firansîzîyan biparêzê heba.

Komkujiya geliyê zilanê, Komkujiya dersimê, komkujiya helebçê, komkujiya roboskî û komkujiya ku hatî serê kurdan li parîsê, çend ji wan komkujiyên ku bûna temenê sendrûmên mazin li ser serê civate kurd. Ev komkuji, bandûra wan û deronîya ku di mirovê ku andamê civate kurd de daye çêkirin, di temenê sendrûmê de ya. Ev komkuji, ku mirov bi çavekî deronî li wan binerê, divê ku em bi navê wan gelek rewşên deronî jî kifş bikin. Serokê gelê kurd birêz Ocalan, komkujiya ku li parîsê hatî serê kurdan şiband komkujiya dersimê. Lê divê ku em vê jî, bi ser vê gotinê bikin. Komkujiya dersimê, ji aliyê kirina wê ve û ji aliyê deronî û sendrûma wê ya ku di nava kurdan de çêkirî hê jî dijî. Ji ber vê yekê ya ku kurdan digot ku "dersim 38" dijî!" Ji gav hat avêtin û hat gotin, ´dersim 38 dijî!´?. Piştî wê komkujiya dersimê jî, komkujiyên ku hatina serê kurdan dawî li wan ne hat. Ji jinek ji wan jinên ku di komkujiya ku hatî serê kurdan a li parîsê de ku hatî qatilkirin Sakina Cansiz, bi aslê xwe jî dersimî bû. Yanî, ew newîya wan dersimîyên ku ew komkujiya mazin ku li 1937-38 de ku jînkirin bû.

Heta nûha, bi sadan komkuji hatina serê kurdan. Lê ew dade navnetewî jî, hê jî, di wê de jî, ti biryar ne hatina girtin. Ji ber ku çi, bi teybetî, li dijî wê dihê sekinin ku komkujiya ermenîyan di meclîsa emerika were herê kirin? Hinekî jî, di temenê wê de jî, heman zihniyet heya. Di derbarê komkujiyên ku hatina serê kurdan de, heta roja me, ti biryarên dadî ne hatina girtin bo mahkûm kirina wan. JI ber vê yekê ya ku komkujiya ku hatî serê kurdan a li parîsê jî, tevî ku ev salek bi ser ve çû, hê doz jî ne hatîya vekirin. Weke ku çawa ku pergale dadê a tirk bo komkujiya roboskî "biryare ne şopandinê" da, gelo wê pergale dadê a firanse jî bi wî re tevbigerihê? Ji ber ku zihniyet heman zihniyeta, êdî divê ku mirov vê pirsê jî bipirsê.

Çi farqê di nava wê zihniyeta ku ew komkuji kir û ankû dakiirn û ya ku li Sûrî her roj çeteyan dide hêrîşkirin li ser herêmên kurdan û bi dehan sivîlan dide kuştin de heya? Ti farq di nava wan de tûna ya. Li kûderê bê, zihniyeta kujar hertimî kujar a.

Gotina ´komkujiyê´, weke gotinaka ku mejiyê her kurdî wê pirr zêde nas dike û di derbarê wê de pirr bi têgihiştina. Ji ber ku bi dehan komkuji hatina serê kurdan. ev dîroka kurdan, hem ya demên berê û hem jî ya hemdem jî, ku em ji kîjan aliyê ve kîjan dema wê lê biner in, emê muhaqqek rastî komkujiyeka ku hatî serê kurdan werin werin. Ev di nava herîkîna jîyane de bi bûya weke karekî xweza. Li ber kuştina kurdan jî, ne tenê rêveberîyên herêmî û ewropî jî, hemû sazi û komelên mafên mirovan jîbêdeng

dimênin. Çapameniya ewropa jî û ya herêmê jî, li ber wan komkujiyan bêdeng a. Ji nedîtî ve tê. Bo vê yekê, êdî kurd jî, hertimî bi komkujiyên ku hatina serê wan re êdî bi tenê mana di nava wê deronîya wan komkujiyan a giran de. Bi wê re, her komkujiya kurd, ya serê wê hatîya nûxûmandin û ji rojevê hatîya derxistin. Û ku ew komkujiya kurdan ku derbarê wê de serî li dadgehekê jî hatibê dayîn, weke ku di komkujiya roboskî de hat ditin, wê dadgeh jî "biryara ne şopandinê" bide û serê wê bigrê. Ev, weke rêbazên dadî jî na, ku bo sernûxûmandina komkujiyên kurdan dihên bikarhanîn in.

LI kûderê bê, dad(hûqûq) jî, sînorê wê heta kurdan a. Dûhû jî wusa bû. Î ro jî wusa ya. Bi vê re, em dikarin bêjin ku mirovatî jî, sînorê wê bûya heta kurdan. Ji kurdan ne buhurê. Minaqa wê, komkujiya wê komkujiya roboskî û biryara dade tirk ya "biryara ne şopandinê" ya. Minaqa wê, hewldanên ser nûxûmandina komkujiya ku hatî serê kurdan a li Parîsê ya.

..**Nîşanaka ku komkujiya Roboskî biqastî hatîya kirin şeklê nivîsandina rapora komisyona mecilîsa tirk a di derbarê wê de ya.** Nîşanaka ku komkujiya Roboskî biqastî hatîya kirin şeklê nivîsandina rapora komisyona mecilîsa tirk a di derbarê wê de ya**::.** Komkujiya Roboskî, di dawîya sale 2011´an de hat kiirn. Di dema ku hat kirin de jî, piştî ku komkuji bû jî çapameniya tirk, komkuji ku heta bi ser ve nîvroj buhurt jî, ne hilda rojeva xwe. Piştre ku li ser komkujiyê bidest nivîsandinê kir, bi gotinên rayadarên dewletê ku di temenê manipûlakirinê de, bidest nivîsandina li ser wê kirin.

Lê divê ku ez vê carek din bibêjim ku komkujiya roboskî, seata ku pêkhat, berî wê seatê bi seatekê lijneya bilind a tirk ya bi navê MGK´ jî levcivîya bû. Piştî ku MGK´ê, civîna xwe bi dawî kir bi seatekê û piştre komkujiya roboskî hat kirin. Berî ku komkuji bibe, dewlet bi heronan herêmê keşîf dike. Pêşî herêmê hemûyî dike bin çavderîya xwe de. Mirovên ku tên ji sînor, dewlet wan jî dibîne. Gelek ji wan, weke ku xizmên wan jî piştre hanîna ser ziman, heya qarakola herêmê jê hebû. Agahî dabûbûnê. Qarakolê jî, fermandarên wê heya wan jî heya. Ji xwe, dema ku kerwana Roboskîlîyan tê û heronan li ser serê xwe dibînin, piştre di cih de telefonê dikina xizmên xwe. Di wê demê de, weke ku di çapameniyê de jî cihgirt, gelek ji wan ji nava kerwanê telefonê dikina qarakolê û dibêjin "em in roboskîlî na." Piştî wan, malbatên wan jî, bi heman rengî dikevina dewrê de û telefonê dikin hewirdorê. Herderî agahdar dikin.

Li ser wê agahdarkirina kerwanê ya qarakolê û malbatan, êdî dilê wan jî weke ku hinekî hem rehet dibe û hem jî ew qanaat dikeve dilê wan de ku wê karibin heta ku herina malê wê di rê de bimeşîn û wê tiştek newê serê wan. Lê gûman û tirs jî, di dilê wan de çêbûya. Li ser wê gûman tirsê jî, ew gavên xwe bilez dikin û dikin ku demek ji ya din zûtir werin û bigihijina malê xwe. ..

Lê ku Piştî bidawî bûna civîna MGK di nava saetên 7 û 8´an de, wê piştre seat 9´an de, wê balefirên artika tirk hewa kevin û herina herêmê. Ti balefir, heta ku destûr ji wê û ji pîlotê wê re newê nawê dayîn, nikarê bi serê xwe hewa kevê. Hemû firîn û sortîyên balefiran di bin kontrolê de dibin. Her balefirek, di dema hebûna xwe de, çend caran difirê û her care ku firî çend caran barkirî difirê û çend caran ne barkirî difirê, hemû jî di dokumentên wê qaydkirî na. Hemû qaydên firîn û barkirinên balefiran di qaydan hena. Her wusa her balefir di dema ku firî ji aliyê kîjan pîlotî ve hat firandin jî, ew jî, qayd kirîya. Pîlot, di dema ku firî, ku di balefirê de ku têkilî bi pêre hat danîn, ew deng û têkilî û axiftin hemû jî di qaydan de hena. Ev hemû, herttimî tên rapor kirin. Tenê, di dema ku oparasyeonekê de, herwusa di dema ku tatbîqatekê de jî, ev yek wusa heya.

Nîqaş û Birhan(kanit)a vê çî ya? Hertimî, di dema ku balafirên tirk Qandilê bombabarandin, di dema ku ew beşek ji qaydan bo ku oparasyona serkevti bidina nîşandin ku diwêşênin, didê nîşandin. Her wusa, ew komkujiya li Kortekê ku li herêma Ranya ku ji aliyê balfirên tirk ve hat kirin, qaydên wê komkujiya ku bi navê "komkujiya Kortekê" di nava rayagiştî ya kurd de cihgirt de jî di qaydên balefirên tirk de hena. Ji ber ku di hemû balefiran de, bo ku hemû rewşê bi şopênê, kamara hena.

Ew kamara û qaydên wan, ne tenê bo ku komkujiyan qayd bikin bikardihênin. Ji wê zêdetir, kamarayên ku di şevê de jî ku dikarin weke rojê pirr vekirî bibînin dihên bikarhanîn. Herî zêde, bo ku ew kamara û qaydên wan bo ku cihan jî kifş bikin û qadê û ankû herêmê nas bikin jî hertimî dahûr û ankû analîz dikin. Bi vê yekê, her balefira ku li qandilê difirê, divê ku mirov tenê bi armanc bombardimanê şîrove nekê. Herwusa, bi armanca ku kifşkirina herêmê jî ya. Balefirên Heronan jî, ji wan balefiran, baştir û qanctir teknolojiyek hatîya bicih kirin. Di wan balefirên Heronan de, ne tenê kamarayek heya. Herî kêm ser 2 kamarayan re hena. Ji ber vê yekê, divê ku mirov bibêje ku ne bi derfeta ku weke di çapameniyê de dihê gotin ku "bi tememî di dîmenên heronan de nayê kifşkirin" jî, ne gotinaka rast a.

Lê li vir, ku mirov bipirsê ku ka kê ferman daya ku komkujiyê pêk bêne, ku mirov bipirsê, divê ku di serî de, herîna wê şevê ji pîlot bipirsin. Li gorî ku tê zanîn, pêşî lîsteya firînê tê nivsandin û tê kifşkirin ku wê kîjan balefir û pîlot bifirê ew tê kifşkirin û piştre agahî tê dayîn li wî û piştre ew firîn li hewayê dibêt. Pîlotek, nikarê bi serê xwe balefirê ji çekan bar bike û bide firandin. Ev rewş hemû jî di bin destûrê de na. Yek jî, ne dervî destûrê ya. Her balefir jî ku barkirî firî, wê barê xwe li kûderê vala bike û kûderê bombabarandin bike jî, ew jî pêşî tê kifşkirin. Piştî ku ew bombabarandin kir, di qaydên pîlot de tê dîtin ku wî çawa armanc girtîya û çawa bombabarandin kirîya. Ku bombardimanek, berî girêdane li armanc û ankû cihê ku wê were bombabarandin bê kirin jî, qayda wê jî heya. Yanî, pêşî, hemû girêdan divê ku were kirin. Di wê dema ku girêdan hat kirin de jî, weke ku çawa ku di ´ekrana´ pîlot ya di hundurê balefirê de ev tê dîtin, her wusa di navende farmandariya de, bi heman rengî şopandin heya. Yanî, tişta ku pîlot dibînê û dikê, her wusa yên li farmandariyê de jî ku dişopênin dibînin. Yanî, tenê bi dîtina aliyekî nabê. Her wusa, tenê bi dîtina herdû aliyan, yanî ya pîlot û ya navendê farmandariyê jî dîtin bi sînor namêne. Hemû tişta ku di wê kamarayê de dihê dîtin, wê qayda wê jî di kompîtûran de were kirin. Piştre jî, ku kengî hat xwestin dikarin herîn û wê qaydên wê demê û kêlîkê ku bi nav û dîroka wê tên qayd kirin, vekê û lê binerê.

Weke ku li jor me hanî ser ziman, mirovekî ku piçekî ji di derbarê teknolojiyê de xwediyê zanînê bê, wê karibê dahûr bike ku kifş bike. Yanî, bi wê re, mirov fahm dike ku bêxwestin, dikarin di hundurê 24 seatan de qatilên komkujiyê werina derxistin li holê. Lê ev komkujiya roboskî, giirng ku politikaya dewletê ya jenosîdê rengê wê radixe li berçav.

Di dema ku bombardimana li Qandilê jî dest pê kir, dewletê ji serokfarmandariyê înkar kir. Hertimî bi vî rengî nêzî komkujiyan bûna. Di kirina komkujiyan û înkarkirina wan de, dewleta tirk xwediyê rêbazekê ya. Ev rêbaz, bi vî rengî, weke ku di komkujiya Kortekê û di komkujiya Roboskî û hwd de ku bû, red kirina. Bi teybetî, di hemû komkujiyên kurdan de ev rêbaz hatiya bikarhanîn. Rêbaza ku bi wê komkujiya Roboskî

hatîya kirin, di Jenosîda Dersimê de jî hatîya bikarhanîn. Her wusa di jenosîda Ermeniyan de jî hatîya bikarhanîn.

Hertimî, li dijî jenosîda Ermenîyan dîplomasîya ku dewlet tirk kir di temenê înkarkirinê de bû. Ji bo ku ji bo wan komkujiyên wê biryerek dernekeve, hertimî ket nava hewldan û dîlomasiyê de.

Ji ber çi bo dewletê giringa ku biryarek di derbarê komkuji û ankû jenosîda kurdan de newê girtin? Ji ber çi giringa ku ji bo dewletê giringa ku biryaraka sîyesî bo jenosîda ermeniyan newê girtin? Hinekî bersiva van pirsan, di şerê dewletê ku heta roja bi kurdan re dide meşandin de ya. Şerê dewletê ê ku ew bi kurdan re dide meşandin, weke neynik û bersiva wan pirsan a.

Dewletê ku komkujiya Roboskî ku di çerçova jensoîda kurdan de ku kirîya, ku biryereka sîyasî di derbarê wê de hatiba girtin û ku qatilên wê hatiban derxistin, wê dewletê nikarîba ku wî şerê xwe yê ku bi kurdan re ku bide meşandin. JI ber ku dewlet, hê di rojeva wê de heya ku şerê xw ebi kurdan re bide meşandin, ew rapor di temenê sernûxûmandina komkujiyê de hat amede kirin. Rapor, temenê domandina şer ê li kurdistanê dide afirandin Rapor, di temenê ku belgeyek di derbarê jesosîda kurdan de nebê hatîya afirandin. Ji van aliyan ve giringiya raporê heya. Rapor, bi teybetî, bi zimanekî teybet bi vî rengî û di vê temenê de hatîya aemde kirin.

Rapora komkujiya roboskî, bi armanca sernûxûmandina komkujiyê ya. Aliyê sernûxûmandina raporê kifşkirina wê pirr giring a. Lê divê ku mirov bibêje ku bi teybetî, du aliyên wê raporê ên din jî hena. Yek, di temenê domandina şerê dewletê û bi kurdan re ya ku dewlet di xwezê ku wî şerê xwe bide domandin a. Aliyê din jî, her wusa, di temenê ji holê rakirin û tûna kirina birhan(kanit)ên komkujiyê hattiya ava kirin. Komsiyona qaşo lêpirsîna komkujiya roboskî, di serî de bi vê armancê hat ava kirin. Du serî de bi du armancan hat ava kirin. Yek, bi armanca ji holê rakirina kanitên komkujiyê û windakirina wan a. Aliyê din jî, ew bû ku pêşî lê were girtin ku biryerek ji dadgehê derkeve. Yanî, armanc ew bû ku pêşî ku mahkûm kirinekê ku bibe were girtin.

Aliyê din jî her wusa, ew bû ku heta ku komisyon hebû, doza qaşo ku tê gotin ku bo komkujiya roboskî hatîya vekirin were domandin. Hinekî jî, bo ku sedemekê bo domandina wê û dirêjkirina dema wê hatibû ava kirin. Bo ku Dadgeh biryerê nedê û mahkûmkirin dernekevina li holê bû. Di vê çerçovê de, armanca komisyonê ew bû ku doz were şandin li dadgehên weke dadgeha mafê mirovan û ewropa jî. Hinekî jî, bi armanca pêşî lê girtina li vê bû.

Di vê temenê de, komisyon bi erk û kar bû. Komisyon, di vê temenê de, karê wê bi teybetî, pêşî lê girtina bertekan jî bû. Ku kê bertekên xwe didan nîşandin, T. Ardogan bixwe derdiket ber çapameniyê û digot ku "me komisyon ava kirîya, li bendê rapora wê bin." û hwd. Ev weke aliyekî din ê di temenê mijulkirinê de ku li ser komisyonê de dihat bi rêve birin bû.

Ku komisyon ji dilba, ti carî hewce ne dikir ku dusalan maba bo ku rapora xwe ji rayagiştî re vekiriba. Bi teybetî, ku ji dil ba, divê ku mirov bibêje ku di hundurê 24 sesatan de dikarî ku wê zelal bikira. Lê ji ber ku ev jidilbûn pêre û di ahlaqê wê de tûnabû, êdî bi vî rengî tevgerîya.

Ku komisyon jidilba, wê tenê li qaydên balefirê binerîyan û tenê ku bi wê ve bi sînor jî maba, wê derxistiba li holê ku ka kê ewder bombabaran kiriya û kê ferman daye. Ji xwe hemû jî li wir, biqaydî hena. Bi teybetî, divê ku em bibêjin ku ew serdozgerîya ku

divîyabû ku dosya komkujiya roboskî amede bikira jî, bi komisyonê re di ahangê de bikerk kar kirîya. Ji ber vê yekê, bi teybetî, heta nûha jî, di dosya û berdosyayên ku têde bahse ti şûcan bike tûna na. Ev jî, di aslê xwe de, aliyekî din ê ku divê ku mirov bi teybetî bi komisyonê re bêne ser ziman a.

Rapora komkujiya roboskî ji aliyê pêvajoya ku destpêkiriya jî divê ku mirov hilde li dest. Bi teybetî, ji du aliyan ve divê ku mirov bi pêvajoyê ve girêdayî hilde li dest. Yek, di temenê wê de bû ku rastî vê demê hat hanîn ku di vê demê de raporê ji rayagiştî ve vekin û bi wê re bibêjin ku "pêvajo, xesas a ha divê ku ti kesek di temenê dijberiyê de gotinê nebêje û bahse wê komkujiyê jî nekê, wekî din, wê pêvajo xirabibe." Di vê temenê de û bi vê mantiqê ev rapor di vê demê de bi vî rengî hatîya gihandin li rayagiştî.

Aliyê din jî ê ku divê ku mirov bi pêvajoyê de hilde li dest, ew a ku dewlet, ne jidilbûna xwe di pêvajoyê de dide li der. Bi teybetî, hertiştî dike ku bo ku pêşî li nîqaşkirina li ser wê qadaxaya ku dewletê lis er çand û zimanê kurdî danîya ku newê rojevê di vê demê de. Aliyekê vê yê bi pêvajoyê ve girêdayî jî ê bi vî rengî heya. Lê aliyê din sêyemin jî, me li jor hanî ser ziman ku di temenê ku dokumentên fermi di derbarê  kurdan ku hê dewleta tirk wê dimeşêne de ti dokumet li holê nebin.

Di vê pêvajoyê de, bi teybetî, komkujiya roboskî, teybetmendîya wê ya sereka, ew a ku "The Wall street Journal" di gulane sale ku bi komkujiyê re em ketinê de nivîsandibû ku "ji Pantegonê, îstihbaret çûya û tirkiya jî kirîya ya." Ev gotin, dema ku di vê rojenemê de hat nivîsandin, di serî de T. Ardogan, hemû raydarên dewletê li dij wê berteka xwe dan nîşandin. Weke ku li ser şûc hatibibina girtin, heketina hêrîşê de. Berî hingî jî, balyozê Emerikî Firancis Rîccardonê derketibû ber çapameniyê û gotibû "Em mijarê de li aliyê hikimeta tirk in". Ev gotin, rengekî din ê komkujiyê bû di dide nîşandin.

Lê divê ku mirov bibêje ku divê demê de hanîna raporê li ser ziman, bi teybetî, armanca wê ew a ku bi teybetî bêbaweriyê di nava gelê kurd de jî bide afirandin. Di vê dema ku divê ku herkesek bo çareserkirina pirsgirêka kurd di heman yekdengî de bê, bo ku bê gotin ku "yekdengî di nav de tûna ya. "

Komkujiya roboskî, di dema ku hat kirin de, dewletê ew di MGK´ê de nîqaş kir û ew da kirin. Piştî civîna MGK´ê bi seatekê ev komkuji hat kirin. Di wê demê de çi hasab, di serê dewletê de hebû bo ku dewletê ji bo wê ew komkuji bi xadarê û hovî kir, î ro jî, di dema ku wê raporê ji rayagiştî re divekê jî, bi heman rengî di temenê nêzîkatîya bi nemerdî de wê helwestê dike û raporê di vê demê de divekê.

Divê ku mirov bibêje ku Ewopra jî, girtina Sîyesetmederên kurd jî, divê ku mirov li di dewam nivîsandina xwe de gotinekê li ser bibêjin. Di dema ku em pêvajoyê û komkujiya kurdan A li Parîs´ê ku bi hovî hat kirin de û tê de sê jinên kurd bi xadarî hatin qatil kirin re girtina sîyesetmederên kurd jî, di temenê hêrîşeka li sîyeseta kurd ya li pêşîya pêvajoyê ya. Bi teybetî divê ku em bibêjin ku di van rojên dawiyê de bahse sîyesetmederên kurd li Belçîqa ku tê gotin ku li ser xwesteka Îspanya hatiya girtin jî divê ku mirov di vê çerçovê de bêne ser ziman. Bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku li dijî ETA, hem firansa û hem jî Îspanya bûna pîspos ku li ser hevdû re li dijî wê oparasyonan li dar dixin. Ev oparasyona li Sîyesetmederê kurd jî, ku çend ku weke li "xwesteka îspaniya" jî were ser ziman jî, di dema ku em dahûrîyê li ser rewşê bi pêvajoya ku destpêkî re dikin, em weke oparasyona Firansa ku li ser îspanya re ku

hatiya kirin bi wê rêbaza Îspanya û Firansa ku li ser hevdû re ku oparasyon li dijê ETA li dar dixistin. Divê ku mirov di dewama komkujiya kurdan a li Parîs´ê de şîrove bike.

**Em, divê ku li vir, hinekî navberê bidina hanîna ser ziman a şîroveya xwe ya li ser komkujiya Roboskî û komkujiyên din û em ku weke zagonaka ku bo kirin û ´meşrû kirina temenê van komkujiyan, em li ser "zagona şarq îslahat" ê û têcîra kurdan ya ku bi wê hat kirin bisekin in.** Di van rojan de, gotina "zagona şarq îslahat" ket rojevê de. Ev gotin tê çi wateyê? divê ku mirov hinekî bi teybetî li ser wê bisekinê. Ev gotin, têkiliya wê bi jenosîda kurdan re pirr mazin heya. Heta ku ez dikarim bibêjim ku têkiliya wê bi kirina ´komkujiya zîlanê´ bixwe re jî heya. Çawa têkiliya wê bi komkujiya zîlanê re heya". Em bi gotinekê bersivê bidina vê pirsê û bi buhurin. Bi teybetî, di destpêkê de, dewletê biryar girtîya ku gund û çavçeyên wê herêmê vala bike ji mirovên li herêmê û mirovna din li wir bicih bike. Ji ber vê yekê, jin û zarok dane berxwe û wan dikujê. ..

Zagona ´şarq îslahat´, bi teybetî, armanca wê civate kurd a. Bi teybetî, armanca wê zagonê ya sereka û bingihîn ew a ku hebûna civatîya kurd li herêmê ji holê ra bike. Ji ber vê yekê, êdî çûya bi ser kurdan de. Di aslê xwe de, divê ku mirov bibêje ku hinekî jî di destpêka serhildane agirî de, em dikarin weke sedemekê jî vê zagona şarq îslahatê bênina ser ziman. Bi teybetî, ji sale 1924´an û pê de, hin bi hin dewlet civate kurd dide berxwe. Di wê demê de, piştî ku konfaranse Lozanê bi dawî bû û kurdan dît ku êdî dervî statûyê hatina hiştin û hemû maf û azadîya wan ji destê wan hatîya girtin. Êdî hin bi hin wê hinek rewşenbîrên kurd ên wê demê de wê ew di cih de vê rewşê kifş bikin û wê berteka xwe bidina nîşandin. Li ser wê jî, dewlet bixwe jî, êdî dihizirê. Ew dema ku dihizirê, êdî hin bi hin bi wê hizirkirina xwe re wê artişa xwe ya leşkerî hin bi hin wê bişêne herêmên kurdan û li hin herêmên kurdan bicih bike. Kurd wê vê yekê kifş bikin û wê hin bi hin kurd jî bikevin rewşa xwe amedekirina ji rewşna re jî. Lê çend ku kurd, xwe ji rewşna re amede dikin jî, bi tememî di serê wan de rengê wê ne safîya ku xwe ji çi re amede dikin.

Lê kurd, wê veguhaztina leşkerî a li kurdistanê weke amedekarîya ji tiştna re dibînin. Di wê demê de, bûyarên li dora pîran û xîzanê dibin. Piştre jî, serhildane şêx Seîd dest pê dike. Serhildane şêx Seîd, wê bê destpêkek giring di têkiliya kurd û tirkan de jî. Kurdan ku serî hildan, êdî piştre hertimî dewleta tirk jî bi tememî xwe li dijî kurdan û li ser esasê tûna kirina kurdan bidest xwe birêxistin kirinê kir. Serhildane şêx Seîd, dema ku destpêkir, wê di demeka kin de, wê kurd li ser gelek herêmên xwe serdestîya xwe bidest dixin. Yanî, gelek herêmên wan ji bin destê desthilatdarîya dewlet tirk ya ku nû hatî avakirin tên rizgar kirin.

Piştî ku serhildanê destpê kir û piştre bi alîkarîya îngiliz û firansizan hat tafisandin, êdî piştre dewletê berê xwe û hêzên xwe da bi ser gelê sivîl de. Li herêmê, êdî gelek herêm vala kirin. Gelek aşîr, bi zorê ji herême dane goç kirin. Hine herêmên li dora Anqara, Konya, Aydin û her wusa çend herêmên din ên li ber anatolîa bûna herêmên ku ew aşîrên kurd werina goçkirin li wan. Di aslê xwe de, kurdên li dora anqara jî, Konya jî, Aydinê jî û her wuse gelek herêmên din jî, cihên ku piştî salên 1925´an, êdî cihên ku aşîrên kurd bi komên li wan hatina goçkirin. Ev goçkirin, ne goçêkirinna asayî bûn. Ev goçkirin li gorî wê zagona bi navê "zagona şarq îslahat" dibin. Di vê temenê de, bi vê zagona şarq îslahat, di serî de demografîya kurdistanê, hewl tê dayîn ku werê guharandin.

Dewletê, dema ku aşîrên kurd dide goçkirin, di serî de, di serê xwe de kifşkirîya ku wê kê li cihê wan bicih bike. Li gotî wê ´zagona şarq îslahat´, wê cihên aşîrên kurdan ên ku ew jê hatina goçkirin wê aşîrên azarî, tirkmen ku herêmên qafqasya dihên hanîn wê li wir werina bicih kirin. Li gorî, plan û ´zagona şarq îslahatê´, "wê ji herêma Wanê heta ku digihijê herêma Mîdyadê, wê kurd ji wan herêman werina derxistin û wê ev aşîrên azarî û tirkmen werina bicih kirin." Bi wê re jî, divê ku mirov bibêje ku di dema komkujiya Zîlanê wê de wê ne tenê komkujiyên weke komkujiya zîlanê wê bibin. Wê hê gelek komkujiyên din bibin. Bi teybetî, li herêmên Sêrtê, wanê, Mûş, agirî û hwd, wê bi kuştun û komkujiyan werina bê mirov kirin. Piştre jî, wê ew cihên ku bi komkujiyan hatina vala kirin, wê ev aşîrên azarî û tirkmenan ku ji herêmên qafqasyan dihanîn, wê li wan bicih bikin. Di aslê xwe de, tenê di sale 1925´an de yanî di sale ku ev ´zagona şarq îslahat´ tê derxistin de, wê herêmên weke agirî, Erzûrûm, Sêrt û hwd, wê pîrranîya wan ji van aşîrên azarî û tirkmen ku hatina hanîn li herêmê û bicih kirina wê bibin. Çend ku li gundan kurd hebin jî, wê navendên wan bajar û herêman bi van aşîrên azarî û tirkmen werina tişî kirin. Wê ji aliyê hijmarê ve hijmara wan zêdetir bê.
..

**Planaka ´şarq û îslahatê´ û bi wê re "Pirsgirêka 55´an". ..**

Ji salên 1925´an, wê dem hin bi hin bi buhurê. Lê çend ku dem di buhurî jî, dewletê bala xwe pirr zêde dabûbû ser herêmên kurdan. Ji sale 1925´an, bi komkujiyên weke komkujiya zîlanê, komkujiya Dersimê û hwd, wê herêm bi kuştinan were kêmkirin û bêmirovkirin. Bi wê re jî, di rex wê de, li gorî zagona şarq îslahat´ê, wê ji herêmê mirov werina goçkirin li rojavayê tirkiya. Li wanderan jî, wê bi wan were dayîn bawer kirin ku ew tirk kirin. MInaq, "zagona ´îskan´ê", "zagona navan", "zagona çêkirina mal û semyan" û hwd, wê çend ji wan zagonên ku wê di wê temenê de werina çêkirin û ankû piştî ku hatina çêkirin ku wê di wan de rastkirin werina kirin bin. Li gorî "zagona navan", wê navê hertiştî tirk bê. Wê navên herêmên kurdan ên gund, navçe û bajaran jî werina guharandin. Wê navê wan ên kurdî werina qadaxa kirin û wê navê tirkî li wan were kirin. MInaq, weke ku çawa navê hezex´ê bikin "îdîl", navê amedê´ werê kirin ´dîyarbekîr´ û hwd. ..

Heta ku sal hat sale 1930´î û hwd, êdî bi tememî ev rastkirin li ser rûpel û ankû qaxizê hatibûbûna kirin. Ya ku êdî mabû ew bû ku di pretîkê de werina pêşxistin û domandin. Di wê çerçoveyê de jî, sînorên ku hatibûbûna afirandin jî, wê werina jîdandin. Nayê hiştin ku buhurandin li wan bibe. Hemû buhurandinên ku dibin jî, bi "bêdestûrî" û ankû weke ku di tirkî de tê gotin "bikaçaxî" na.

LI aliyên din ên sînora, minaq li rojhilat û başûrê kurdistanê jî, tevgerîyên kurdî hena. Çend ku bi komkuji û goçkirinan herêm hatina vala kirin jî, dîsa deng hinekî jî bê, ji kurdan derdikeve. Lê herêm nêvîyê wê bêhtirî ji wê hatîya goçkirin kuştin bi komkujiyîn weke komkujiya zîlanê û komkujiya dersimê û hwd.

Kurd, piştî ku salên 1930´î û hwd û pê de, wê hin bi hin êdî weke ku werina xwe li wan werê. Ew bandûra komkujiyên ku jînkirina, wê êdî hin bi hin ji serxwe biavêjin. Bi teybetî, di wê bi bandûrbûn û rabûna ser xwe de, wê avabûna komare kurd a Mihabadê´ û serhildane ku mela Mistefa Berzanî ku pêşengî û serokatîya wê dike wê zêdetir bibe. Li herêmê jî, ev serhildan, bi teybetî li herêmên çolemergê, botanê, êlih û Sasonê, agirî, Wan, Mûş Sêrt, Dersim û hwd, bigiştî li hemû herêmên kurdan, wê bandûra wê pirr mazin û zêde hebe.

Bi teybetî, piştî salên 1950î, êdî wê nifşên nû ên kurdan wê weke ku êdî werina xwe li wan werê. Bi teybetî jî, çend mirovên ku xwandina, wê bandûrê zûtir hîs bikin. Li herêmê, mirovên xwanda kêmbûn. Dewletê, derfet, zêde ne dida kurdan ku bixwênin. Ji ber ku ji wan ti tirsaha ku wê kurdîtîya xwe bibîr bikin. Lê di wan salan de, bi teybetî, li herêmên kurdistanê wê tevgerîyaka mazin biafirê. Ev tevgerî, wê di sale 1967-1968´an de wê xwe bi dîyarî bide nîşandin. Di wê demê de bi awayekî hemdem "nûmeyîşên li kurdistanê" tên li darxistin. Ên ku ji wan nûmeyîşan re pêşengîtîyê dikin jî, çend xwandavan, û hin zaroyên serokên aşîran û hin zaroyên şêxan bixwe jî di nava wan de hena. Ev hersê kom, di wê demê de weke sê komên pêşeng ji pêşketina kurdistanê de derdixina li holê. Dewlet jî, wê yekê kifş dike. Piştre, dewlet, wê êdî di nava wê bixwe de jî, nîqaş werin û bibin ku ka wê çi bikin. Di wê demê de "derbeya leşkerî ya 69´an" bibe. Çend ku ev derbe, weke "derbeya çend sûbayan" jî were ser ziman jî, lê di aslê xwe de ev derbe, weke derbeyeka ku temenê mudahaleyekê ku karibê li herêmên kurdan bike jî ya. Aliyê wê derbeyê ê herî ku lê hatî hizirkirin ew a. Lê aliyê wê yê ku heta roja me jî, zêde li ser ne hatîya axiftina jî.

´Derbeya 69´an´, wê temenê mudahaleyê li herêmê biafirêne. Di wê demê de, li meclisê bixwe de jî, weke ku çawa di destûra bingihîn de hatîya nivîsîn ku "serwerî bê şart û merc ya gel" jî, wê ev gotin bi rengê "serwerî bê şart û merc ya miletê tirk a", wê were guharîn. Yanî, wê hertiştî bi navê tirkîtîyê bênina ser ziman.

Di wê demê de, bi derbeya 69´an´ re, wê pêleka din ya mazin wê goçkirin ji kurdistanê were dayîn dest pê kirin. Di serî de, bi sê rengan wê vê carê goçkirin were dayîn kirin. Yek, bi yek kesîtî ya. Ya duyemin bi malbatîtî ya, ku malbatekê didina goçkirin ku herê û li herêmeka din bicih bibe. Rengê sêyemin jî, wê mirovên ku dikarin weke serok di nava gel de ji kurdan re serokatî û pêşengtiyê bikin û hinekî zanebûna wan heya, wê ew bên kifşkirin û wê werina sûrgun kirin li cihekî ku hatî kifşkirin. Di wê demê de, di destpêka derbeyê de, hê ku berî derbe were kirin 55 mirov hatina kifşkirin ku werina sûrgun kirin. Êdî çawa ku roja derbeya 69´an ku bû, wê di cih de ev 55 mirov werina kifşkirin û werina sûrgun kirin. Di nava gel de ev bûyar weke "bûyara sûrgûna 55 mirovên ku serokên aşîran, şêx û pêşengê civatê" na, wê were bi navkirin û bikeve nava rûpelên dîrokê.

Bi vî rengî, di aslê xwe de, derbeya 69´an, piştî ku bû û piştî van sûrgûnan bûyara 55 ´ kesan re, êdî nûmeyîşên li kurdistanê ên ku salekê berê wî sale derbeyê sale 69´an ku destpêkirina, êdî wê weke ku deng ji wan dernekeve. Derbe, bi wê yekê, weke ku gihiştibê armanca xwe. ..

Lê wan bergir(´tedbîr´)ên dewletê jî pêşî li şîyarbûna kurdan negirt. Kurd, êdî hin bi hin, weke ku werina xwe li wan hat. Bi teybetî, bi bandûra bayê sosyalismê û pêşketina yekitiya sovyet jî, wê di nava ciwanan de ronakbîrî û rewşenbîrîyek pêş bikeve. Ev rewş, wê hin bi hin di nava ciwanên kurd de jî, dengna bide derxistin. Heta wê demê, navê kurdan û kurdistanê jî hatibû qadaxa kirin. Wan profesorên tirk ku ji qama xwe fihêt ne dikirin li ser kûrsîyên zanîngehan digotin ku "kurd tûna na, kurd, dema ku li ser berfê meşîn bûya û ji bin lingê wan dengê ´qart qûrt´ derketîya êdî wan jî ji xwe re gotîya kurd." Lê piştre, ev derew hemû hatina derxistin li holê. Piştî ku di vê demê de rastîya kurdan hat kifşkirin, wê êdî hin bi hin tevgerên kurdan ên ku tekoşîna kurdistanak serbixwe bidin wê ava bibin. BI teybetî, divê ku mirov carek din bibêje ku

bandûra tevgera Berzanîyan û berî wê avabûna komare kurd ya Mihabedê wê pirr zêde li ser van pêşketinên destpêkî wê hebe.

.

**. Berfirehkirina sînorê ´zagona şarq îslahat´ê bo pêşxistina dîyasporaya kurdan..**

..

Piştî derbeya 69´an´, êdî weke ku demeka nû destpê kir. Di aslê xwe de, ev derbeya 69´an´, li dijî wê destpêka şîyarbûna kurdan pêk hat. Bi tememî, wê derbeyê hemû kiryarên wê yên leşkerî û zor û bi şîdetî li kurdistanê li ser serê kurdan hat kirin. Piştre, bi sûrgûnkirina 55´ kesên kurd ên serok aşîr, şêx û kesên peşeng û hwd, êdî sînorê wê ´zagona şarq îslahat´ê jî li meclîsê bi nûkirin û lê zêdekirina hin xalna û herêkirina wan li meclîsê, wê sînorê wê zagona şarq îslahatê jî were berfirehtir kirin.

Di wê demê de, wê êdî hin bi hin êdî zorê li herêmê bikin ku malbatên kurd werina goçkirin. Piştre jî, bi wê zor û şîdetê, wê li dûv hevdû bi hezaran malbatên kurd, ji cih û warên xwe biqarihin û goçî dervî welêt bikin. Her wusa, di nava welêt de jî, wê goçkirin were kirin. JI herêmên kurdistanê li rojavayê tirkiya goçkirin wê pirr zêde were dayîn kirin. Piştî ku tevgera kurd PKK´ê derket, dewletê jî, bi hinceta ku temenê tevgera kurd ji holê ra bike, ser 5 hezar gundên kurdan re hatina şawitanin û velakirin. Bi wê re di hundurê salekê û ankû du salan de ser pênc şeş(6) milyonan û ankû heft(7) milyonan re kurd ji cih û warên wan hatina goçkirin.

Di aslê xwe de, wê di temenê de jî, berfirehbûna sêyemin di vê zagona şarq îslahatê de di vê dema valakirina gundan de ya ku ji aliyê hêzên dewletê ve wê were kirin. Wê temenê wan valakirina bi hêncetên "ewlakariyê" wê werênîna ser ziman. Lê mirovekî ku ji herêmê bû, zanibû ku ew ne rast a û derew a.

Piştî vê, yanî piştî bûna derbeya 69´an û di wê demê de berfirehkirina sînorê zagona şarq îslahatê û piştre di dema valakirina gundan de ku weke care duyemin ya piştî wê re berfirehbûn di wê zagona şarq îslahatê de dihê kirin, wê êdî bi van herdû dem û berdû berfirehkirinan, wê temenê dîyasporaya kurdan were çêkirin û afirandin. Bi wê re jî, wê zorê bidina dayîn ku mirov werina goçkirin ji cih û warên xwe. LI herêmê jî, bo ku temenê daberekirina wan tûna bê, dewlet nahêle ku pêşasazî û karsazî û hwd li herêmê pêş bikeve. Ev ne hiştin, wê di temenê wê politikayê de were kirin. Herêmên ku hatina vala kirin jî, wê yan di bin bendavan de bidina hiştin û yan jî, wê weke "herêmên leşkerî ku ji ssivîlan re girtî" na, wê werina denezendin. Ev jî, weke sergirtina wê politikayê bû. LI herêmê, weke tedbîreka din ya duyemin ku dewletê bi wê dixwestin ku herêmê bêmirov bike û kurdan ji cih û warê wan bike, mayînkirina herêman a. LI kurdistanê, î ro, dûqatî herêmên ku herêmên ku li wan jîyan heya herêm hatina mayn kirin. Hênceta, "mayînkirina bersînoran," du sedemên wê hebûn. Yek, têkiliya kurdan ji hevdû birrîn bû. Ya din jî, qadên jîyanê kêmkirina wan bû. Dema ku qadên jîyanê kêmbûn, êdî mirov wê jî derfet jîyanê ji xwe re nebînin û wê bixweza êdî wê goç bikin. Dewletê, ev politika, bi awayekî pirr mazin û kûr meşand.

Di roja me de kurd, di rojava wan de ya ku pêşî li wan wre vekirin ku vegerihina li herêmên xwe. Lê pirranîya herêmên wan hatina mayînkirin. Yanî, derfeta jîyanê ji wan re ne hatîya hiştin. Bi wê re jî, ji aliyê rêveberî ve jî, astengiyên ku hatina derxistin hena. Ev hemû jî, hê jî dibin. Lê divê ku mirov vê yekê bibêje ku çend ku bê gotin ku "zagona şarq îslahat"ê, zagonaka berî salên 1950´î hwd de jî, divê ku mirov bibêje ku ew hê di merîyetê û fermiyetê de ya. Armanca wê ya destpêkê, ew bû ku bi tememî êdî

temenê civatîya kurd ji holê ra bike. Piştre bi şîrove û xalên ku lê hatina zêdekirin û ku î ro di fermiyetê de na jî, di temenê pêşîlêgirtina pêşktina civate kurd de kar dike. Yanî, bi wê zagonê şarq îslahatê, ew civatîya ku xira kir, bi wê nahêle ku ew êdî xwe biafirêne. Hêrîşç temenê wê dike. Nahêle ku herêm bi mirov bibe. Derfeta jîyane ji mirovan re nahêle. Î ro, di roja me de, çêkirina bi sadana bendavan li herêmên kurdan, û mayînkirina herêmê û her wusa bi şerê ku meşandî û hwd, di temenê xirakirina wê temenê civatî de ya. ..

Zagona şarq îslahatê, ji sale 1925´an yanî ji sale ku hat derxistin û heta roja me, di fermiyet û merîyetê de ya û li dijî pêşketina kurdan û civate kurdan a. Hersê xalên destûra bingihîn a tirkiya bixwe jî li gorî wê hatina şîrovekirin. Ji ber vê yekê, dema ku ew hatina guharandin, wê di serî de bandûra wê, li vê zagona şarq îslahatê jî bê.

Minaq, î ro zimanê kurdî qadaxa ya. Li herêmên kurdan, win tenê dibistanakê jî nabînin. Hin malên bi armanca piştgirîya bi perwerde re ku kurdan ji xwe re vekiribûn di bin banê partîya BDP´ê de, ew jî, di vê temenê de û di temenê domandina wê qadaxaya li ser zimanê kurdî de hatina girtin bi biryarên walî û qaymaqamên herêmê û hwd. Li herêmê, hemû leşker, polîs, rayadarên dewletê û hwd, hemû jî tirk in û ji rojava tên şandina li herêmên kurdan. Di vê temenê de jî, kurdên ku li dijî wan gotin êdî gotina, ew mafê jîyane li herêmê ji wan re nayê hiştin.

Piştî derxistina ´zagona şarq îslahat´ê, armancaka wê ya din jî ew bû ku zimanê tirkî li wir serdest bike û bi wan bide bawer kirn ku ew tirk in. Piştî salên 1925´an û hwd, êdî di aslê xwe de, di çerçoveya vê zagona şarq îslahat´ê de zagonên li ser ziman û perwerde ku ku hatina derxistin bi wê hatina şîrovekirin. Di wê çerçoveyê de, armanca wê jî, ew bû ku nifşên piştre ên ku ji xwe re bibêjin "rewşênbîrên kurd" nebin û ankû hebin jî, zimanê civate biterikênin.Rewşenbîrên kurd´ jî, ev yek kirin. Zimanê civate kurd terikendin û zimanê tirkî li ser wê farz kirin. Yanî, li gorî, politikaya dewletê ya tirkkirinê, ev dordorên bi navê "rewşenbîrên kurd", rol û weyneka mazin leyîstina di asîmlekirina kurdan û pêşxistina jenosîda kurdan de. Ez dikarim bibêjim ku van mirovên bi navê "rewşenbîrên kurd" derbeya dawî û ya herî mazin wan li civate kurd daye û hê jî wê lê dixin bi vî rengî. ..

Armanca ´zagona şarq îslahat´ê, ew bû ku bi tememî civate kurd bi navê wê ji holê ra bike bû. Bi wê yekê, di demên berê de, bi komkuji û goçkirinê û li cihê yên ku goçkirina ku hin komên din bicih bike, ew kir. Lê di roja me de, metodên wê kirina jenosîda kurdan hem guharîna û hem jî bi pêşketina teknîkê û hwd hatina zêdekiririn. Bi vê rengê, em dikarin bibêjin ku bi vê zagona şarq îslahatê ew tûna kirina kurdan ku hatibû destpêkirina, di roja me de jî bi metodên nû dide meşandin. Ev zagon, bi vî rengî bi armanca xwe ya ji holê rakirina civatîya kurdan û tûnakirina wan ji herêmên wan û hwd re ´zagona şarq îslahatê´, zagona ku bi wê jenosîda kurdan hatîya kirin a. Belgeya vê zagona şarq îslahatê jî, belgeya jenosîda kurdan a.

.. **Bo fahmkirina** vê demê, pêvajoyê tevgerên kurd, em hinekî di dewama vir de bahse Mistafa Berzanî û tevgerên demê û temenê pêşketina wan jî bikin. Mela **mistefa Berzanî**, weke keseyetekî mazin, di nava civate kurd de navê wî pirr zêde hatîy bihîstin. Çi rasthatina ku Mela Mistefa Berzanî, di 14 adare 1903´an de hatîya dunyê û dîsa di heman meha adarê de di 1´ê wê de di 76 salîya xwe de çûya berdilovanîya xwe. Hê ku sêsalî bû weke kurdekî rûyê zindanê dît. Li başûrê kurdistanê, di wê demê wî de, çend ku bi rengî olî û aşîrî jî bê, tevgerîyeka kurdistanî ya mazin hebû. Di wê demê de, li

kurdistanê hin bi hin pirsgirêkên mazin ên civatî rûdidin. Civat, hîs dike û dibînê ku azadîya wê ji dest diçê. Êdî bivê yekê bi dest hewldanên pêşxistina tekoşîna azadîya xwe dike. Di wê demê de jî, li başûrê kurdistanê, rewşek aloz heya. Herêma başûrê kurdistanê, hin bi hin bale ingilizan jî dikişêne û ew diherikina wir. Hêzên herêmî ên wee Osmanîyan jî, êdî li wê herêmê bandûra wan şikeştîya. Lê di hin deverna de têkiliya wan bi ingilizan re heya. Minaq, li başûrê kurdistanê û li dora baxdadê ew têkiliya wan bi hevdû re heya.

Îngilizan, heta demekê ji Osmanîyan jî sûdgirt. Hin komikên wan ên hêzî ku li wan herêman di çûn û hatinê de bûn, ne di temenê li dijî ingilizan bisekin in, lê di temenê bi wan re di tevgerîyekê de bûn. Bandûra wê têkiliyê herî zêde li başûrê kurdistanê dihat hîs kirin. Ji ber ku li her çar beşên kurdistanê tevgerî hebûn. Ev jî, di wê demê de herî zêde li başûrê kurdistanê dihat bihîstin. Li başûrê kurdistanê, di wê demê de malbate şêx mahmûdê berzencî, serdest û serwer bû. Li herêmê, ingilizan dema ku hatina herêmê, kirin û xwestin ku xwe nêzîkî wan bikin. Kirin jî. Ji wan re di serî de gotin ku ´emê desthilatdarîya we ya ku win ava kin piştgirî bikin.´. Li Îranê jî, rejima şah, têkiliyên wê yên bi emerika û ingilizan re, bandûra wê li wan têkiliyan jî bû. Kurd, piştî ku bandûr li jîyane wan bû, êdî piştre, ketina nava tevgerîyê de. Tevgerîya berzencîyan, wê li herêmê, bi teybetî li başûrê kurdistanê, wê bandûrê li giştîya kurdan bike.

Bi wê re jî, di nava kurdan de li rojhilatê kurdistanê jî, tevgerîyên weke ên malbate simkoyê şîkakî û hwd pêş dikeve. Bandûra wê li rojhilatê kurdistanê bi sînor namêne. Li başûrê û bakûr jî dibe. Lê zêdetirî li başûr dibê.

Li başûrê kurdistanê, di van salan de mela Mistefa Berzanî hin bi hin derdikeve li pêş. Lê di aslê xwe de, ê ku pêşî di nava malbate wî de pirr zêde weke serok û mazin derdikeve li pêş jî, birayê Mela mistefa berzanî Avdilselam bû. Avdilselam berzanî, di wê dema xwe de, di nava tevgerîyeka kurdistanî de jî bû. Li başûrê kurdistanê, bi teybetî li herêma ´Berzan´ ku malbate Avdilselam berzanî lê ya, wê li wir tevgerîya wan destpê bike. Di demek kin de, wê navê Avdilselam berzanî were bihîstin. Ew bihîstina navê wî, wê biqasî ku dilê kurdan û civate wî xweş bikira, wê ewçendî jî dilê dijminên gelê kurd jî ne xweş bikira. Di wê demê de, ingilizên ku ew navê wî bihîstin, biqasî ku jê ne xweş bûn, wilqasî jî, nexwestin ku li dijî wî û tevgerîya wî tiştekî bikin û bibêjin. Ev jî, bi destên desthilata demê ya têkçûyi ya li herêmê ku weke wîleyeteka Osmanîyan kar dikir wê bêkirin. Wê bi dorpêçkirinaka sîyesî û hwd, wî bigrin û piştre di cih de cezayê bi dervekirinê bidinê de û wê biderve bikin. Bandûra bi dervekirina Avdilselam berzanî, wê li herêmê û aşîrên din ên kurdî jî hebe. Lê piştî bi dervekirina Avdulselam Berzanî, wê tevgerîya wî ne sekinê. Hê ku ciwanekî ku nû sûretê wî derdikeve û simbêlên wî mazin dibin Mela Mistefa Berzanî, wê hin bi hin derdikeve li pêş.

Hêzên ku Avdulselam Berzanî bi dervekirin, ji wê bi dervekirina wî hêvî dikirin ku wê bandûraka neyînî û xirab li giştîya civate kurd were û bike. Lê rewş vajî wê bû. Wê rewşa bi dervekirina Avdilselam Berzanî, şîyarbûnak civatî di nava civate kurd bigiştî de li wê herêmê da çêkirin. Bi wê yekê re, êdî tevgerîya wê pêş pêşket. Di vê temenê de, sal ku tê salên 1920´an û hwd, wê hin bi hin li herêmê desthilata xwe ava bikin. Desthilata Şêx mahmûdê berzanî divê ku em hinekî jî di ancamê vê tevgerîn û şîyarbûnê de fahm bikin. Lê malbata Berzencîyan, bi aşîrî pirr çendî û mazin bûn. Li herêmê serdestîya xwe çêkirin. Di dema şerê cihanê ê yekemin de, osmanîyan, bitêkçûnên ku li rojhilat û herêmên din ên weke balkanan ku li ber tekoşîna azadîya gelan xwarin, wê

bikin ku ew xwe bi şûn ve bikişênin. Bi wê re, li herêmê wê valahîyek jî biafirê. Aşîrên kurd jî, ji xwe, li herêmê li başûrê kurdistanê desthilatdar bûn. Lê piştî wê re wê êdî desthilataka kurdî denezênin li herêmê. Ev desthilat jî, wê ´keyanîya şêx Mahmûdê berzencî bê.

Ev rewş, wê li herêmê zêdetirî pêş bikeve. Berzencîyan temenê dewletekê avêtin. Lê piştî hêrîşên hêzên ingilizî ên bi bombardimana balefirên şer li herêmên ku desthilatdarîya kurd lê ava ya, wê pirrzanîya mazin û şervanîn kurd wê biherikina rojhilatê kurdistanê de. Lê ew denezene keyaniyê a ji aliyê şêx mahmûdê berzencî ve, wê bandûra wê pirr zêde hebe. Şêx mahmûdê Berzancî, ew bixwe jî, bavê wî ji aliyê Osmanîyan ve hatibû qatil kirin di sale 1908´an de. Bandûra wê qatilkirinê jî, kiribû ku kurd êdî têkiliyên xwe ji wê beşa kurdistanê bi osmanîyan re bi tememî bibirrin. Bavê Şêx Mahmûdê berzencî şêx seîd, şêxek bû û bandûra wî pirr zêde hebû.

Di wê demê de ku di sale 1916´an de idi nava ingiliz û firanse û hin hêzên din ên li herêmê de di temenê parvekirinekê de peymane Sîkey-picot hatibû morhkirin, li gorî wê jî, ev herêm di bin desthilata ingilizan de diman. Di wê temenê de, ingilizan bi piştgirîya Iranê jî, dixwestin ku herêmê hemûyî di bin destê xwe de bigrin û navende wê baxda bê. Serdestîya li baxdadê, hertimî, dilê her hêzê ku lê xwe serdest kirîya xweşkirîya. Kurdan di wê demê de, ew xwesteka wan ya xwestina avakirina desthilatdarîya xwe li başûrê kurdistanê, wê rastî hêrîşên Îngilizan were. Piştî ku keyanîya kurd ji aliyê Şêx Mahmûdê berzencî ve hatibû denezendin û piştre ku ser sê-salan re jî ku desthilatdar mabû û piştre ku hatibû xûrixandin, êdî wê bike ku kurd tekoşîan wê û azadîya xwe bidin. Di wê demê de, têkiliya aşîrên kurd bi hevdû re xort bû. Di vê demê de, wê mela mistefa berzanî û birayê wî Ahmed berzanî re li rex hevdû, heta salên 1931-2´an û hwd, wê di nava tevgerî û tekoşînekê de bin. Di wê demê de, başûrê kurdistanê bûbû qada tekoşînê. Lê sal ku tê salên 1935´an û hwd, wê tekoşarên kurd li başûrê kurdistanê derbeyna bixwûn. Bi wê re jî, bo ku karibin xwe bigrin, wê Mela Mistefa Berzanî jî û gelek peşmergê jî wê herina rojhilatê kurdistanê. Li wir jî, tevgerka xort ya kurdistanî hebû ku ev tevger wê piştre bi avakirina komare kurd a Mihabadê re bi ancam bibe.

Di heta dema avakirina komare kurd a Mihabadê, wê bênavber wê tekoşîna azadî û serbixwe bûna kurdistanê bidomê. Piştre jî, ku komare kurd a Mihabadê hat avakirin, wê êdî Mela Mistefa Berzanî di avakirina wê de cih bigrê û wê karê serokfarmandarîyê ê komare kurd a Mihabadê hilde ser milê xwe. Piştî keyanîya kurd a başûrê kurdistanê avakirina komare kurd a Mibahadê bûbû fêr û cerbeyeka duyem bo kurdan. Di nava sedsala 20'an de, piştî hikûmeta Başûrê Kurdistanê ku Şex Mehmûd Berzencî li Silêmaniyê denezend, Komara Kurdistanê ya Mihabadê, di warê dewletbûyinê de, ji bo kurdan bû tecrûbeyeke duyem. Di 22'ê çileya sala 1946'an de, berî 65 salan weke îro, bi alîkariya Yekîtiya Sovyetê, li qada Çarçira ya Mihabadê, Komara Mihabadê ji aliyê Qazî Mihemed ve hat denezendin. Lê dîsan bi vekişîna xwe ya sovyetê re, wê komare nû a kurd, wê rastî hêrîşên kurd ên rejima îranê werin û were xûrixandin.

Temenê komare kurd a Mihabadê, zêde dirêj ne kişandibû. Lê pêşketinên mazin ku wê bina temenê pêşveçûnên piştre jî bi xwe re dabûbû çêkirin. Berê hertiştî, bandûra wê avakirina komare kurd a Mihabadê, tenê di nava sînorê rojhlatê kurdistanê de nema. Wê li başûrê jî, başûrê û beşên din ên kurdistanê jî bandûra wê hebe li er gîyane mirovê kurd. Li bakûrê kurdistanê heta salên 1937´an, bi jenosîda dersimê re komkujiyên ku bûn li ser serê kurdan wê deronîyeka xirab ya têkbûnê li ser mejiyê mirovê kurd bide

afirandin. Lê bi komare kurd a Mihabadê re ew deronî jî hat şîkandin û buhurandin. Demên piştre jî, wê êdî bina demên tekoşînê. Piştî xûrîxîna komare kurd a Mihabadê, wê Mela Mistefa Berzanî vegerihê başûrê kurdistanê û wê hewl bide ku tekoşînê bi azadîya serxwebûna kurdistanê gurr bike. BI vê yekê, wê Mela Mistefa Berzanî, temenê partîya PDK´ê biavêje. Êdî piştre bi demê re ew partî tê avakirin û li kurdistanê di nava kurdan de tê nasîn û bi awayekî veşarî bê û vekirî bê, wê li herçav beşên kurdistanê malên wê ên ku hatibûbûna avakirin wê hebin.

Mela Mistefa Berzanî, berî ku komare kurd a MIhabadê li rojhilat were avakirin, di pêşengîya wî de di sale 1943´an de ji mintaqaya berzan şer bilindkir bo ku bi tememî herêm were azadkirin. Di hizra Mela Mistefa de, ew hebû ku wê ji Mintaqa Berzan destpê bike û piştre pêl bi pêl wê herêmên din û aşîrên din jî tevlî bibin û wê xilasbûn bê kirin. Ev rewş jî, dida nîşandin ku ji aliyê rêxistiniyê ve, temenekî wusa xort ne hatibû pêşxitin. Bawerîya bi aşîran û xilaskirina wan ya herêmên xwe re, ew pêngava ku Mela Mistefa berzanî dabûbû destpêkirin, wê piştre bi derbe xwarinê re bi ancam bibe. Piştî ku ew çûbû rojhilat û di avakirina komare kurd de cih girtibû û piştre ku ew komare kurd jî hatibû xûrixandin, êdî cardin mela Mistefa Berzanî vegerîya bû wê herêmê. Cardin, ketibû nava geşkirina tekoşîna azadîyê de.

Ev tekoşîna mela Mistefa Berzanî, wê heta salên 1957´an bidomê. Di vê navberê de, Birayê wî Ahmed Berzanî jî li rex wî bû. Heta roja me jî, bi teybetî li herêma botanê, hin serokên aşîr û civatî bin ku Ahmed Berzanî dîtina di derbarê wî de dibêjin ku "ew, mirovekîî pirr bizane û mazin bûya. Wî gotina xwe bi herkesekî bi rengekî baş dide herêkirin." Di nava tevgerîya Berzanîyan de, wê heta salên 1970´î jî bandûra Ahmed Berzanî wê hebe. Wê navê wî zêde were bihîstin. Ahmedê berzanî, kurê Mihemedê Barzanî bû û yek ji pênc kurên bavê xwe bû.

Herçendî ku şert û mercên kurdan ku ew têde bûn gelek xirab bûn jî, Ahmedê Barzanî xweseriyeke di binê siya îngilîzan de napejirîne. Êla barzaniyan bi giştî wê demê hin li dijî berjewendperestiya îngilîzan û êlên ereban têdikoşin, him jî di nava kurdan de li yekîtiyekê digerin. Ahmed Barzanî sala 1931'ê de li dijî ingilizan jî dikeve nava şer de. Artêşa esmanî ya îngilîzan, piştî wê re êdî baregehên pêşmergêyên bombebaran dikin. **Ahmed Barzanî, di nava wê bombabaranê bi dizî derbasê Bakurê Kurdistanê dibe. Li wir, ji aliyê tirkan ve tê kifşkirin û dîl tê girtin. Piştre di sala 1935'an de ji destê tirkan bi alikarîya çend şerokên aşîrî ên ji herêma botanê ku di nava Xoybûnê de na diravê û xilas dibe û êdî cardin piştre vedigere Başûrê Kurdistanê(nûqteya ku di gera Bîrêz Berzanî de ku T. Ardogan navê mela Mistefa Berzanî hilda hanî ser ziman kir û bahse alikarîya tirkîya ji wî re ev bû. Lê ew gotinên alikarîyê hemû jî derew bûn. Ku wan aşîrên ku kurd Ahmed Berzanî xilas nekiriban, dibîyabû ku di wê demê de ji wê ji aliyê rejima tirk ve biheta qatilkirin.) .** Ji aliyê îngilîzan ve cardin tê dîlgirtin, wî û malbata wî dibîna başûrê Îraqê û li wir di bin çavde wan digrin. Ahmed Barzanî, dibin wê çaverîyê de li rêyên têkildanînê digerihê û rêyê çê dike û bi kurdan û tevgera xwe re têkiliyê datîne û wan ji nû ve birêxistin dike. Di sala 1937'ê de, vê ji ber hêrîşên artişa araban ya di bin fermanderîya Abdul Cabar Al-barjnî de, bi wan re dikeve nava şerekî giran de û wan bi şûn ve dide kişandin ji herêmên kurdan û hêrîşên wan dike ku demekê li kurdan rawastihin jî.

Ahmed Berzanî, di aslê xwe de ku em bibêjin mirovê ku piştî xûrîxîna komare kurd a Mihabadê re ku temenê PDK´ê jî avêt û tekoşîn da geşkirin ew bû. Mela Mistefa

berzanî jî weke ku di şopa wî de bûn. Piştre ji ber wan kirinên wî û tevgerîya wî, wê ew pirr zêde were li berçav. Piştî xûrîxîna komara Mihabadê rere ji dil tê girtin û dihê şandin li Îraqê û dihê xistin li zindanê de. Hingî cezayê bi dervekirinê li wî dibirrin. Lê piştre ew cezayê wî dihê vergerandin li cezayê zindanê. Wê Ahmed berzanî, heta sale 1958´an di zindanê de bimêne. Di sale 1958´an ku Avdilkerim Qasîm ku dawî li keyanîya Îraqê tênê û komarê ava dike, êdî wê di wê demê de Ahmed Berzanî jî derkeve ji zindanê. Malbeta ku Evdulkerim Qasîm biaslê xwe jê jî ya, ji kurdên feylî bûya. Di dema Evdilkerim Qasîm de, wê PDK´ê jî, were û fermî bibe û li başûrê kurdistanê bicih bibe. Qasim, dixwezê ku kurd jî, li herêmên xwe bi mafê xwe û xweserîya xwe hebin. Wê tevgera kurd, di dema Ahmed Berzanî de xort pêş bikeve. Geş bibe. Lê piştî sale 1969´an ku ew ji ber nexweşîya xwe çû berdilovanîya xwe, êdî weke ku valahiyek bigiştî di nava tevgera wî de jî û di nava tekoşîna başûrê kurdistanê de afirî. Mela Mistefa Berzanî, piştî wî re êdî derket li pêş.

Mela Mistefa Berzanî, hemû barên ser milê birayê wî Ahmed, ketibûbûna ser milê wî de. mela Mistefa Berzanî Berzanî, zanîna wî ya tekoşînê û leşkerî pirr baş hebû. Lê ji aliyê sîyesî û mijarên Sîyesî ve jî Ahmed Berzanî, bi heman rengî li pêş bû. Ji bi wê zanîna wî ya sîyesî bû ku Ingilizan peşmergeyên wî bombabarakirin bi balefirên leşkerî û hwd. Di aslê xwe de armanc ew bû. Ew valahîya piştî mirina Ahmed Berzanî ku afirî, wê ji aliyê fahmkirina sîyesî ve bû. Têkiliya Ahmed Berzanî, bi tevgerên bakûrê kurdistanê ên weke Xoybûnê û hwd re jî pirr xort bû. Danûstandinên wî, bi wan re hebûn. Bi bedirxanîyan re jî têkiliya wî baş hebû. Ahmed, berzanî, ku em wî weke serokekî sîyesî û mazin ê kurdistanê bi fahma wî re şîrove bikin, wê rast û di cih de bê. Di dema Komare Mihabadê de jî, di nava karûbarên sîyesî ê komarê de bû.

Piştî Ahmed Berzanî re heta sale 1979´an, wê Mela Mistefa Berzanî wê serokatîyê bike. Piştî Mirina Ahmed Berzanî re, hin bi hin wê temenê pêvajoya bi ber çûyina konfaranse Cezayirê wê were çêkirin. Di vê demê de, Mela Mistefa Berzanî, weke ku ew didît. Lê weke ku ji aliyê sîyesî ve di nava dorpêşkirinekê de bin, xwe hîs dikirin. Ahmed Berzanî, di nava hewdîtinên dane herêkirinê a rêveberîya başûrê kurdistanê de het dawiyê hebûya. Lê berî çêkiirna peymane sale 1970´î ew bi salekê ew çû ber dilovaniya xwe. Piştre peyman çêbû û xweserîya kurdan li herêmên wan hat pejirendin. Vê rewşê xwe 5 salan domand. Piştre, ku konfaranse Cezayirê bû, êdî wê bo kurdên başûrê û rojhilat jî, pêvajoyek nû destpê bike. Wê ew xweserîya wan ya bi sînor jî ji wan were girtin. Piştre ku hebûna rewş û xweserîya kurdan hat ji holê rakirin, wê mela Mistefa Berzanî, ku bi wî re li dora 500 mirovî ya wê bi wan re bi buhurina li nava sînorê Sovyetê. Lê yekîtîya sovyet, ji wan xwest di derdêla ne kirina ti tiştî û tevgerê wê destûrê bide wan ku li wir bimênin. Yanî, wê dev û dest ji karên sîyesî kiriban.

Di dema Mela Mistefa Berzanî de, kurê wî Idris ku bi zanebûna xwe re hebû. Idris berzanî, weke ku çawa di dema mela Mistefa Berzanî de birayê wî Ahmed Berzanî bi aqilê xwe yê sîyesî û zanîna wê re derdikeve li pêş, wê di wê dema Mela Mistefa berzanî de jî, Idris Berzanî bi heman rengî bi aqilê xwe yê sîyesî û zanîna wê derkeve li pêş. Wî, xwe bi vî rengî bi hewirdora xwe û mirovên ku wî naskirina daye herêkirin. Ji aliyê aqilê sîyesî û afirandina têgihiştinên stretejikî ve ew li pêş bû. Ew bi vî aliyê xwe derdikeve li pêş li berçav. Êdî wê ji aliyên pirr dordorên dijminên kurdan ve ji ber vî aliyê wî yyê sîyesî û zanîna wê ya bi wî re wê ew bibe armanca hêrîşan. Di dema wî de, weke ku çawa bi mirina Ahmed Berzanî re ku em dikarin weke windahiyeka mazin

şîrove bikin û bênina ser ziman, em dikarin bi heman rengî ya Idris berzanî jî bi heman rengî şîrove bikin û werênina ser ziman.

Mela Mistefa Berzanî, ji salên 1975-6´an û wan û pê de, wê wê nexweşî bi wî re rû bidin. Lê di wê demê de, dîsa karên xwe dev û dest ji wan ne berdaye. Heta dawiya jîyane xwe, wî ew karên xwe domandin û birina sêrî. Weke serokekî kurd, wê pişrî mirina birayê wî re zû derkeve li pêş. BI rêxistiniya PDK´ê re, li herêmê wê zû derkeve li pêş û were naskirin. Heta salên 1979´an û hwd, wusa zêde ti serokên kurd ên mazin li holê ku pêşengîyê ji civate xwe re bikin nemabûn. Di wê demê de, tenê Mela Mistefa Berzanî mabû. Mela Mistefa Berzanî, ya ku ket sermilê wî de weke serokekî kurd hanî li cih. Di dema Ahmed berzanî, de hin hewldanên Ahmed Berzanî hebûn ku rêxistiniyeka li ser aşîran de bide pêşxistin. Bandûra Xoybûnê jî li ser wî hebû. Piştî wî re birayê wî Mela Mistefa Berzanî jî, ew hewldan da nîşandin. Lê wusa zêde bi serneketin. Sînorê aşîrîyê derbas nebû. Ya rastî ku mirov bibêje Idris Berzanî ev yek pirr vekirî didît. Wî ew hizra bavê xwe jî, pirr bi başî dîtibû û fahm kiribû. Ji ber vê yekê, piştî ku li bakûrê kurdistanê tevgera azadîya kurdistanê PKK´ê destpêkir, wê wî têkilî bi wê re danîba. Heta ku Idrîs Berzanî, çûya dem serokê gelê kurd birêz Ocalan bixwe jî û bi wî re danûstandin kirîya. Têkiliyeka pirr baş û pak û li pêş daye çêkirin.

Divîyabû ku min li jor bahsbikira lê li vir min xwest ku bênina ser ziman. Di dema gera Birêz Mesûd Berzanî a li Amedê de serokwezirê T. Ardogan, bahse Mela Mistefa berzanî û hatina wî ya li Amedê û parastîn û têkiliya bi wî re ya rejima tirk kiribû. Ev gotinên ku bahse wan kiribû, di pretikê de jî, ti rastîya wan tûna ya. Heta ku weke me li jor hanî ser ziman jî, di dema ku Ahmed berzanî di dema salên 1935´an de ku bidîzî di buhurê bakûrê kurdistanê û tê dilgirtin. Ên ku wî rizgar dikin û xilas dikin jî, çend serokên aşîrên herêma botanê ku di nava tevgera Xoybûnê de cihgirtibûn bûn. JI xwe piştî ew ku ew hat xilaskirin jî, wê piştre jî, çûyina bi ser wî de bibe. Heta ku ez dikarim bibêjin ku wê tirkiya hertimî acizîya xwe hem ji malbate berzanîyan û bi teybetî ku di dema xwe de weke serokekî bû ji Ahmed Berzanî werêne ser ziman. Ev rewş, wê ne tenê di wê demê de bibin. wê di demên piştre de jî, bidomê. Tirkiya rejima wê, hertimî, dijberî kirîya. Weke ku çawa ku ew dijberîya li dijî Ahmed Berzanî kirîya, bi heman rengî li dijî mela Mistefa Berzanî jî kirîya. **Serokwezirê demê ê tirk İsmet İnönü giliyê Ahmed Barzanî li cem serokwezîrê Îraqê *Nûrî as-Sadî* dike û Inonu, dibêjîyê de heger "heger hûn li dijî Ahmed Barzanî tevbigerin, dê Tirkiye jî alîkariyê bide artêşa Îraqê".** Tenê, ku em li vê gotina Îsmet Înonu jî binerin, emê bibînin ku ew gotin T. Ardogan derew in.

Mela Mistefa Berzanî, weke Qazî Mihemed, weke serokê gelê Abdullah Ocalan, du rêveberên ku di divê ku wan di kirinîya serokatîya wan de di berdewemiya hevdû de werênina ser ziman. Hinek rêber û serokên kurdan ku mohra xwe li dîrokê xistina û dimejiyê gelê kurd de cih girtina, ên weke Salahadinê Eyûbî, Qazî Mihemed, Abdullah Ocalan û hwd, ku hena, divê ku em Mela Mistefa Berzanî jî di nava wan de werênina ser ziman.

Mela Mistefa Berzanî, bo bajarê herêma başûrê kurdistanê ê kerkûkê digot "dilê kurdistanê". Di vê temenê de, giringîyek dida wê. Gelek herêmên başûrê kurdistanê ên weke herêmên Şengal, tûsxûrmatû, xanaqîn, kerkûk û hwd, ku dervî herêma kurdistanê hatina hiştin hena. Ev jî, bi armanca qatkirina kurdistanê û kirina bin kontrolê ya pêşketina kurdan hatîya kirin û pêşxistin. Î ro, pirsgirêkên ku di nava

rêveberîya kurd ya baxdad û hewlêrê de ku dihên derxistin de, bi wan beşên kurdistanê ku dervî herêma kurdistanê hatina hiştin, gavê bi şûnda didina avêtin û sîyeseta kurdistanê lawaz dikin. Ev jî, di çerçoveyekê de bi plan û program hatîya kirin û di roja me de dihê domandin. Bêgûman ku Mela Mistefa Berzanî sax ba, wê tekoşîna ji her aliyê ve hem bo pêşxistina wan herêmên kurdistanê ku derve hatina wê bide pêşxistin. Ji xwe ew gotina mela Mistefa Berzanî ya ku digot :***" Li ser xwîna min şer germ nekin, li ser Kerkûkê şer bikin"***. Mirovekî bi vî rengî ku dilê wî bi kurdistanê ve bû, ku î ro sax ba û helwesta rêveberîya başûrê kurdistanê a li dijî rojavayê kurdistanê bidîta, wê pirr fihêt û şerm bikira. ..

**.Li ser Komkujiya Ermeniyan. ..**

Komkujiya Ermaniyan, weke komkujiyaka ku di sadsale 20´an de ku ji aliyê dewleta osmanî ve hatîya kirin a. Ermanî, weke gelekî ku li herêmê hertimî bi kurdan re jîyane xwe derbas kirina. Berî heta ku sal were sale 1915´an, wê ser bi hazara salî re dem bi buhurê lê wê hertimî wê bi hev re jîyanbûnê bijîn. Wê hertimî jî, karibin ku wê bi he re bûnê bi parêzên. Dem, hata ku hat sale 1915´an, demek çawa buhurt? Ev pirs, di zane min de, pirseka pirr giring a ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Li vir, dema ku em hinekî herîna berî wê demê, divê ku bi teybetî, em herina dema serhidane şêx ubeydullahê Nehrî ku bo serbixwebûna kurdistanê serî hildaya û di dema serhildane xwe de ez dikarim bibêjim ku pirranîya herêmên kurdan kirina bin destê xwe de. Di vê emê de, wê kurd, di dema ku serî hil didin, wê herêmên weke Sason, Amed, û hwd, wê herêmên rizgar kirî bin. Serhildêrên serhildane şêx Ubeydullahê Nehrî, wê herêmên xwe rizgar bikin. ..

Di aslê xwe de, dema ku em bahse demeka giring bikin, divê ku em bi teybetî li ser vê demê bisekin in. Di wê demê de, piştî ku Şêx Ubeydullahê Nehrî hat girtin, wê piştre dewleta osmanî, wê berî xwe bide bi ser kurdan de. Wê pêşî, hewl bide ku herêmên rizgar kirî cardin bike bin dest de. Artişa osmanî, piştre stretejiya ku li dijî serhildêran dimeşenê, ne stretejiyeka ku rastûrast wan dilhilde hemberê xwe. Ji xwe, ew bixwe jî dizanê ku wan hilde hemberê xwe wê nikaribê li ber wan serbikeve.Ji ber vê yekê, çend ku di demên xwe yên pêş de, weke ku li ber wan bisekinê jî, lê ew sekin in, ne sekinînaka ku mirov dikarê pirr mazin û ji dil bihasibêne. Rewşa serhildane şêx Ubeydullahê Nehrî, bi teybetî di tijbihê rewşa serhildane Birehimê Misrî ku serî hilda û misir gihand azadiya wê ya. Rewşa birehimê Misrî hem osmani pirr kiriya zoraka pirr mazin de û hem jî hêza wê bixwe jî zayîf bikiriya.

Li herêmê, ji ber vê yekê, qasra osmanî, bi teybetî, li ber kurdan, di serî de di hemû destpêkê xwe yên wê demê de metoda xapandinê bikarhanîya. Di dema komara botanê bixwe de jî, ev rêbaz bikarhanîya û serokfarmandarê artişa komare botanê Yazdan şêr, bi gotinên ku "wê Qasr, wî weke mîrê bota nas bike" û hd, ew xapandya û pişte çûya bi ser herêma botanê de û li wir bi hezaran mirovên sivil ji aliyê artişa osmaniyan ve hatina qatil kirin. Piştre, ku yazdan şêr, xelatîya xwe dît, êdî weke ku carna kurdan bi devkî digot "ji dest filîtî bû." Piştre, qasra osmanîya, tişta ku hanî serê Artişa Mîr avdalê Botî, êdî piştre hanî serê artişa yazdan şêr bixwe jî,

Ayse Hûr, di nivîsa xwe ya bi navê "rola kurdan çi bû di 1915´an?", ji aliyekî ve hewl dide ku dewletê paqij derxe û ji aliyê din ve jî, dike ku hemû komkujiya Ermeniyan ku bûya, bide nîşandin ku herêm bi herêm "çeteyên kurd" wan kuştina. Lê li vir, ez divê ku

vê yekê bibêjim ku Ayse Hûr bixwe jî, civaknasi û demografiya kurdan ya demê ti carî nizanê û yanî jî dizanî, bizanebûn dixwezê ku şaş werêne ser ziman û ji bilî dewleta tirk çend navnîşanên din jî bide çêkirin û dewletê di nava wan destnîşankirina navnîşanan de bike "rola hekemekî" de û bi wê re bêne ser ziman.

Bi teybetî, ez li vir jî dixwezim ku li ser vê gotina "çete" ku Ayşe Hûr bo kurdan bikardihêne jî, li ser bisekin im. Navên weke navê "çeteya Alo", "çeteya Amero" û û navên din ên ku Ayşe Hûr navê wan dinivîsên, di jîyane de yek jî ji wan di rastîyê tûna na. Kurdên ku hatina xapandin û di nave ´çeteyên hemîdîya´ de cihgirtina jî, bi navê olê û "biratîya olê" û hwd, ên k hatina xapandin in. Bi nivîsandina dîrokeka xiyalî ku ji aliyê mirovên weke Ayşe Hûr û hwd re, hewl dihê dayîn ku bi teybetî, hem rastîyên dîrokî ku hatina jînkirin werina berevajî kirin û hem jî hewll dihê dayîn, ku gotinên ku dewleta tirk heta roja me bi lêv dike ku "ti komkujiyên ku weke ku tê gotin nebûya" ku temenê wan biafirênin. Ji ber ku ev yek, dema ku yekî ku rewşa aşîrî û hwd ya kurdan bizanibê, wê fahm bike ku ev gotin ti carî ne rast in. Rewşeka aşîrî ya bi kurdan re heya ku ne tenê di temenê xwe ji komenekê ditin dihê ser ziman. Her wusa,di temenê ku hertimî herkesek li gorî zagonên navxweyî ên aşîrê tevdigerihin. Ti kesek, bi serê xwe nikarê biryarê bide û herê û li herêmê, hêrîş û yan jî ne haqiyekê li mirovekî bike. Ku bike jî, wê derkeve pêşîya mazinên aşîrê û wê bibêje ku wî çima ev kiryar kiriya. Ku Mazinên aşîrê, biyara mirina wî jî bidin, wê ti kesek ji wê re nebêje na. Ev yek, weke ku zagonaka ku herdemî xwe daye domandin. Ji ber vê yekê, weke tayrê ku bi refê xwe re bifirê, hertimî di nava aşîra xwe de ya. JI xwe, di dema ku çûyina bi ser aşîrekê de dibû, pêşî dihat nerîn ku ka ew aşîr xwediyê çend mirovî ya. Dema ku çûyîna bi ser wê de bû û piştre ku ew aşîr di komkujiyê de jî bi buhurê, wê çend ji mirov ji wê sax mabin, wê tevlî aşîrên din ên ku ji wan xizm in bibin. Ev yek jî, bi heman rengî didomê, Yanî, ti kesek li navendê namêne bi serê xwe ku herê kare ´çete´tiyê bike.

Em piştî vê re cardin vegerihina mijare xwe. Me ji dema Şêx Ubeydullahê Nehrî dest pê kir. Divê ku ez bibêjim ku li her herêmê, kurd jî û ermenî jî di nava hevdû de dijîn. Ku dema ku Agirî jî bê, li Wanê jî bê, li Sêrtê jî bê, li Sasonê û hwd jî bê. LI Amedê jî hebûn. Li vir, divê ku ez vê yekê bibêjim, di serî de,em bê gotin ku ma çawa ewqas mirovên azarî û ankû tirkmen bi aşîrî li herêmên Mûş, Sêrt û agirî û her wusa Îdîrê û hwd bûn, divê ku mirov bi teybetî herê vê dema sale 1915´an. Di wê demê de, bi teybet, ku Ayşe Hûr jî bi xwe jî bahsê nakê, dewleta osmaniyan "fermana serê ermenîyan" derxt. Heta roja me jî, car bi car, dema ku çen pîrên kurd li hevdû di rûnihin, dema ku tiştek ji wan hat pirsin û ku wan jî bersiv da, êdî wê pêşî axekê ji dil bikişênin û piştre bahsê bikin. Her wusa, dema ku bahse komkujiyên ermeniyan dikin jî, ew ji dev nabêjin ku "komkujiya ermeniyan", Ew dibêjin "tûfana Ermeniyan". Ev bixwe jî, weke nivîskarê van rêzan ji devê pirr pîr û kalên me yên kurd ên hem jin jî û hem jî mêr jî min bihîstîya. Di dema ku bahse komkujiya li cem wan were kirin, tişta ku pêşî were bîra wan ew ku ew "fermane serê ermnîyan" dihê bîra wan.

Heta ku car bi car, di dema ku bahse bûyarna kevn dikin jî, dibêjin ku "hiii, di dema dayîna fermane serê ermenîyan a ji aliyê osmaniyan ve bû." Ankû, dibêjin ku di dema ku "tûfana wan hat rakirin" de. Piştre jî dibêjin û bahse bûyara ku wê bahs bikin jî dikin. Di vê temenê de bahse wan dihê kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku Komkujiya ermeniyan û ya kurdên zaza li dûv hevdû hat kirin. Di demên komkujiyên li koçgirî û hwd de jî, hingî di wê demê de

ku weke serokfermandarekê mazin ê Evdulhemîdê duyem bûya Nûreddîn Paşa vê gotinê bi awayekî vekirî dibêje. Nûreddîn paşa dibêje ku ""me koka yên ku dibêjin "zû" rakir, nûha jî, dora yên dibêjin "lo" ya."" Yanî, bi qaste yên ku dibêjin "zû", bahse ermenîyan dihê kirin. Her wusa, bi qaste yên ku dibêjin "lo" jî, bahse kurdan dihê kirin. Ji xwe, piştre jî, wê ji salên 1916´an û pê de, wê êdî berê xwe bidina ser kurdên koçgirî jî. Ev herêm, ji ber ku herêmeka zindî bû û li wê herêmê tevgerîya kurdan jî zêde bû. Bo vê yekê di serî de, berê xwe didina bi ser wan de. Di wê dema ku çûna bi ser koçgirî de, hingî, bi komkujiyê komî, ermenî weke ku hanîbûn astaka ku êdî bêdeng werina kirin. Di wê demê de jî, dewlemendîyên ermeniyan û ên zazayên li dora Erzûrûmê, ew aşîrên tirkmen ku ji wan re "dadaş" dihên gotin hat hanîn li wê herêmê û li ser malên wan hatin danîn. Lî Agirî jî û li Îdîrê ku î ro dikeve sînorê Azarbeycanê de jî, gelek aşîrên azarî û tirkmen hanîn û danîna ser mal û semyanên wan. Mal, mirov ji wan hatibûbûna kuştin. Lê mal û tiştên di hundurê malan de wusa li holê mabûn. Ew aşîr jî hanîbûn û danîbûn li ser wan. Di aslê xwe de, hanîna çend aşîrên azarîyan li ser wan mal û semyanan, hinekî jî, di temenê politikayaka li ser wê komkujiya mazin ya li wir girtin bû.

Aşîrên kurd, heta ku dem tê wê demê, ji kal ketina. hingî serî hildane û hatina tafisandin, êdî hêz û qûweta wan nema ya ku rabina ser xwe. Li gelek herêman, di berdêla ku dest li wan newê xistin de jî, heta ku ´teslîmiyet´ jî herê kirina. Çend ku ew teslimîyet ji dil herê nekiribin jî, lê dîsa di rewşeka wusa de dijîn. Bi teybetî, di destpêka salên 1900 û 1901 û hwd de, wê bibandûra komkujiyên ku li herême Sasonê, botanê, çolemergê, Agirî, wan û botanê û hwd, wê weke ku bêdengiyek biafirê. Di wê demê de, kurdên zaza, piştî serhildane sale 1821´ê û pêde, êdî piştî ku di wê demê de wanqasî komkujiyên mazin ku di wan de bi hezaran mirov tên kuştin ku dijîn û piştre, heta ku dem tê wê demê, wê êdî weke ku cardin werina xwe. Lê di wê demê de, ew hinekî ji xwe ne bi bawer kirin ku wê bi serhildanen biser bikevin û yan jî bi sernekevin. Bo vê yekê, serokên wan ên weke Sêd Riza û hwd, wê serokên din ên aşîran li dora xwe bidina li hevdû û wê bixwezin ku bi danûstandinê pirsgirêka xwe bidina çareser kirin. Heta ku denezenan jî di weşênin bo ku mafê wan werin radest kirin. Piştî weşandina denezenan re, wê bale qasra osmaniyan herê bi ser wan de û wê êdî berê xwe bidina bi ser wan de û wê bi dest kirina seferên leşkerî li wan bikin.

BI dehan seferên ku li wê herêmê hatina kirin hena. Lê ji ber ku aşîrên kurd bi kom û bi hevdû re tevdigeriyan, êdî ji gelek seferan sax filîtî na. Dewleta osmanî, vê yekê dibîne û êdî ku dibînê ku seferên wê fêde nakin, êdî weke ku li koçgirî û piştre di salên 1930´an û wan de weke ku li gelîyê zilanê û hwd kir, wê berê xwe bide bi ser sivîlan de û wê bi komî wan ji holê ra bike. Di wê demê de, di dema ku qasra osmaniya ""ferman serê ermeniyan"" da, wê di wê demê de, ne tenê ermeniyan bide berxwe. Wê kurdên ku deng ji wan derdikevin jî wê bidina berxwe. Ev yek, êdî wê di temenê de paqijkirinekê de bibe.

Qasra osmanî, ji ber çii fermane serê ermeniyan da? Hinekî jî, divê ku mirov bo ku sedemên vê yekê bibîne, divê ku mirov herê heta dema serhildane misrîyan ya dibin serokatîya birehîmê misrî de. Di wê demê de, misrîyan di bin serkêşîya wî de serî hilda û bi serketin. Dewleta osmani ku êdî di wê demê de hin bi hin ax winda dikir, bo ku axna din winda neke, bi teybetî li herêmên kurdan û ermeniyan, ew dane berxwe. Bi wê re, wê xwest ku temenê serhildanên nû bo xwe ra bike. Di wê demê de, ciwanên kurd jî û gelek ciwanên ermenî jî bo azadîya xwe bizanebûn bûna û rabûna serpîyan. Ya ku

osaniyan ditirsand ev bû. Bo vê yekê, her herêmên ku li wê xalkên cuda dijîn, wê li wan herêman, komên çete biafirêne û bişêne bi ser xalkên wan herêman de. Li i herême bahre reş, ethemê çerkez, Osmanê kulek û hwd, li kurdistanê jî hin çeteyên bi navê hemîdîya ava kirin û li dijî gelan xwestin bikarbêne. Çend ku di wê demê de bahse "meşrûîyeta yekemin" û ya duyemin û hwd dihê kirin jî, ev rewşên ku bahse wan dihê kirin, weke kirasna pirr berfireh bûn bo qasra osmaniyan. Ev rewşên bi vî rengî, çend ku çend nivîskarên tirk bahse wê dikin û hin nivîskarin ne tirk ku ji nezaniya xwe jî bê ku bahse wê bikin jî, divê ku em bibêjin ku di qasra osmaniyan de rewşeka bi vî rengî tûna ya. Vajî wê, rewşê bi aqil û pêşketinê ku di temenê "modernite"yê û "hemdemi"yê de dihên ser ziman jî, çend mirovên ku ji nava gel ev hanîna ser ziman, ji aliyê siltanên qasrê ve weke "karên şaytên" û ankû "mirovvên ku ji rê derketî" hatina ditin û pêşneketina.

Ji ber çi pêşneketin? Ji ber ku hetaa wê demê jî qasra osmaniyan ol bikarhanîya weke amûrekî xwe serdest girtinê. Piştre jî, dema ku dibîne ku bi aqilbûn, wê dema wê bide girtin, êdî bi tememî li dijî wê disekinê. Rewşên ku weke çêkirina rêyên tirêne û hwd jî ku bi destê almanan hwd jî, ne ku ji ber fahm kirinekê bû. Almanan, bo ku li herêmê bicih bibin, hingî, ew rêyên tirenê çê kirin. Lê firansizî hatibûbûna herêmê. Bi wê re jî, piştî ku wê şerê di sale 1911´an ku M. Kemal bixwe tê gotin fermandarê wê bû li Îtalya ku gelek komkuji kirin û piştre têkçûn, êdî rê ji îtalyana re jî vebû ku heta bi ser axên ku tê gotin ku osmanî serdest werinê de. Di wê demê de. Di wê demê de, weke ku heta roja me jî tê gotin ku "li dijî firansizan şerê netewî" û ku hatîya dayîn jî, ew jî, weke derewna li holê dimênin. Firansizî, wê heta sale 1937´an jî wê li ser wan axên ku hatinê de wê bimênin. Îskenderûn û xatay jî, bi civîna sadabadê û anqarayê biryar hatîya girtin ku tevlî sînorê tirkiya were kirin.

Di wê demê de, di aslê xwe de biryar ji aliyê Qasra osmaniyan ve hatîya girtin ku wê kurd û ermenî bi hevdû re ji herêmê werina paqij kirin. Ev raştî, wê piştî komkujiyên ermenîyan û ên kurdan ên weke komkujiya koçgirî û hwd, wê bi fermîkirina wê rewş bi zagonên weke ên "Şarq îslahatê" û hwd re wê were ditin. Çend ku heta roja me jî, tê gotin ku armanca "zagona şarq îslahat"ê, goçkirina kurdan ji herêmê bûya jî, tevî ku ev rast jî, lê ne tenê ev armanc bi wê zagonê re hebûya. Zagona şarq îslahat´ê, bi teybetî, armanca wê kurdên herêmê bûn ku wan ji herêmê bidina goçkirin. Lê bi vê zagonê re, herêmên ermeniiyan ên ku bi komkujiyan hatina valakirin û bêmirovkirin jî ku çend aaşîrên azarî û tirkmen hanîbûn û li cihê wan û cihê kurdan jî bicih kiribûn, wê bixwezên ku wê rewşê jî bi wê zagonê meşrû bikin. Piştî têkçûna serhildane şêx Seîd re, êdî dewletê hizirkir ku astengiyên li pêşîya wê plana û zagona xwe rakirina û êdî wê herêmê li gorî xwe rat bike. Malên kurd û ermeniyên li îdîrê û agirî û li gundên li dora wê, piştî ku ew hatina kuştin, êdî aşîrên azarî û tirkmen hanîn û li ser wan danîn û ji tûnebûnê ew kirin xwedî mal û semyan. Bi teybetî, bi zagonê herêmên kuu weke armanc ku di w de hatina salixkirin, ji herêmên agirî, îdîr, wan, mûş, sason, Amed, Mîdyad û hwd ku çend herêmên din jî di nav wan de na, ev herêmên ku kurd û ermenî li wan bi hevdû re lê dijîn, wê piştî komkujiya ermenîyan û kurdan wê vala bibin. Piştre, ew cihên wan ên ku vala bûna, wê bi hanîna aşîrên azarî û tirkmenan ku li cihê wan bicih bikin re wê bibe. Ev zagon jî, vê rewşê wê bixwezê ku meşrû bike. Bi vî rengî, du armancên vê zagona ´şarq îslahatê´ hena. Yek, ji ber komkujiyên ku kirina cihên valabûna bi aşîrên azarî û tirkmenan ku wê werênina herêmê cihê wan dagrin. Armanca

wê ya duyemin jî, herêmên din ên kurdan jî, bi heman rengî kurdan bi aşîrî ji wan bidina goçkirin û hin aşîrên din werênina cihên wan û li herêmê bi wan hêzekê ji wan biafirênin ku karibn pişta xwe bidina wan. Î ro, ku em bahse malên kurdên wê demê û ermeniyan bikin ên li wê herêmê, hemû jî radestî wan kirina. Piştre jî, pirranîyan semyanên weke zêr û zîv û hwd ku hena jî, qasra osmaniyan berhev kirina û bi wê re, deynê wê ên ku di ancama paymana "mondrosê" ku weke "muterekeya **mondrosê**" jî tê zanîn, ku ji wê afirîîna ku wan deynê xwe bibin. Wan bi mal û semyanên ermeniyan û kurdan wê ew deyn werina dayîn. Welatên ewropî ku hizirin ku û gotin ku "wê osmanî ti carî wan deyne xwe nedin" jî, piştre ku bi wan semyanên ku piştî wan komkujiyên ermenyan ku bidest xistina ku didin, êdî ew jî dimênina şaş û mat.

Heta roja me jî, tê gotin ku "piştî komar ava bû, di demeka kin de deynê xwe hemû dan û deynê osmaniyan jî hildan sermilê xwe û dan." Lê nayê gotin û nayê nîşandin ku ji çi ew deyn hatina dayîn. Di aslê xwe de, dayina wan deynan jî, weke ancamaka ku dewleta tirk û ankû komara nû ku li ser temenê osmanîyan ava bû ji wê komkujiya ermeniyan û ên din bidest xistibû bû. Di nava kurdan de, heta roja me jî, gotina "komkujiyê" zêde nayê bikarhanîn. Bi teybetî, pîr û kalên kurd ên ji wê demê bikarnahênin. Ew, hertimî gotina **"rakirina fermana ermeniyan" û** ankû **"rakirina tûfana ermeniyan"** bikardihênin.

Di wê demê de ku weke "îtîhat-tirakkî"yên wê demê ku di vê demê de, herêmeka ku ji kurdan û ermeniyan paqijkiribûn xiyal kiribûn. Bo wê yekê jî, ew komkujiyên mazin kirin. Ermenî, ên ku di cih de hatina kuştin ji xwe êdî hatina kuştin. Lê ên ku weke jin û zaro û hwd ku hatina berhevkirin, weke ku **´Franz Werfel´ di pirtûka xwe ya bi navê "çil roj li çîyayê musa"** de ku dihêne ser ziman,, wê werina kuştin. Bi komî, wan, weke ku çawa ku nazîyan cihû berhev dikirin û dişandina wergehan wê wan jî berhevkiriban û bikirina riyan de û bikiran ku ew di rêyan de jîyane xwe ji dest bidan. Di aslê xwe de, ku bi awayekî rast hijmara ermeniyên ku hatina kuştin ku werina derxistin, wê bê ditin ku pirr li ser wê hijmara ku tê gotin ku hatina kuştin re ya. ..

Li vir, ez dixwezim ku li ser wê rewşa ku **Ayşe hûr di nivîsa ya bi navê "rola kurdan çi ya di 1915´an de", ku bahs dike û bahse çend mirovn ermeni ku sûrgûnî çankirî hatina kirin dike. Dibêt ku ev mirov jî ji wan mirovên rewşenbîr ên ermenî bi teybetî hatibûbûna berhevdû kirin û hatibûbûna şandin li wir. Lê Ayşe Hûr, îhmal nakê, li çankirî jî "çeteyeka kurd" ji serê xwe û ji xiyale xwe diafirêne û dinivîsêne. Ne ti kurd, li çûbin û çûbin, kurdên ku hatina sûrgûnkirin dikarin werina şandin li çankiri, weke ku çawa ku bedirxaniyan digirin û sûrgûnî girave yewnenistanê dihên kirin û li wir bi salan dimênin. Di wê dema ku bidest komkujiya ermeniyan dihê kirin, wê pêşî mirovên wan ên zane û rewşenbîr werina kifşkirin û berhevkirin û wê werina şandina li cihekî ku ti kesekî nizanê. Heta roja me jî, ew cihê ku tê gotin ku "ser çarsad rewşenbîrên ermeni hatina berhevkirin û girtin û hatina şandin cihekî ku ne dîyar."a. Bêgûman, hijmar ji vê zêdetir a. Lê ew hijmara ku gelek nivîskaran jî bikarhanîya, ez bikar dihênim. Rola kurdan çûbû di 1915´an de? Ez li vir bersiva wê bidim. Î ro, rola cerdewan û ankû ku weke bi tirkî ji wan re tê gotin ku "korûcû" ku rola di komkujiyên kurdan ên di roja me de çi bê, rola wan çeteyên bi navê hemîdîya ku hinek aşîrên kurd jî di bin navê "biratîya misilmantiyê" de hatina tevlîkirin ew bû hem bo kurdan û hem jî bo ermeniyan.**

Di aslê xwe de du tişt bûna sedem hem ji komkujiyên ermenîyan re jî û hem ên kurdan re jî, Yek, ew a ku doza azadî û mafê xwe yên civatî kirina.. Ya duyemin jî, tekoşîna wan ya demokratik bo maf û azadîya xwe bûya. Ku em hinekî herina berî dema sale 1915´an, em li wir bibînin ku serhildane şêx Ubeydllahê nehrî wê bibe.. Di wê demê de, ermeni jî, li er lingan in û bi serhildêran re di tifaqê de na. Ji xwe, mijareka ku li dijî şêx Ubeydullahê Nehrî û Serhildane wî ku weke propaganda dihê bikarhanîn jî ev rewş bixwe ya. Qasra osmanî propaganda dike û dibêje ku "şêx bi kafiran re levkirîya û li dijî dewleta misilman serî hildaye." Bi vî rengî, gelek gotinên ku hê tên gotin hena.

Serhildane şêx Ubeydullahê Nehrî wê li dora sale 1880´î dest pê bike. Lê wê di demeka kin de serkevtinên mazin bidest bike. Wilqasî zû bi serketina wan dibê, heta ku li herêmê ´çarê rûs´ bxwe jî, heyet şandina ku wê şerhildanê bişopênin. Bi teybetî, tenê ji belgeyên ji arşîva rûsîya ku hatina weşandin jî, mirovê vê rastiyê pirr baş û qanc jî fahm bike.. Ji xwe, piştî serhildanê, wê artişa osmanî, ku bidest derbe lê xistinê li serhildêran xist wê ji Sasonê û ji wan komkujiyên ku li wir kirina wê dest pê bike. Li vir, di aslê xwe de, hinekî ew çeteyên hemîdîya bixwe jî, bi zanebûn xelat tên şîrove kirin. Ew çete, di destpêkê de, ava kirina wan, bi armancca çêkirina hêzêkê li dijî serhildêrên serhildane şêx Ubeydullahê nehrî ya. Di serî de, ew çete li dijî kurdan hatina bikarhanîn. Lê ew jî, aşîr bûn û aşîrên kurdan bûn. Weke prensîbeka aşîrî em li vir dûbara bibêjin ku serokê aşîrê çi bêje û çawa bêje, li gorî wê dihê kirin. Derketina dervî wê nabê. Lê di wê demê de jî, di nava zane û civate kurd de, ew rewşa çeteyên hemîdya, bûya sedema înfîalê jî. Ji ber ku ew rewş weke care pêşî ya û ne li gorî kevneşopîya wan a. Kurd, weke gelekî ku pirr kevneşopîyên wê hena û pirr bi wan ve girêdayî na. Weke Ayşe hûr bixwe jî di nivîsa xwe de dihêne ser ziman, wê nivîskarên ku bi aslê xwe kurd in, ên weke Avduleh cewdet û hwd jî, wê çend ku di wê demê de di nava civate kurd de rewşeka cuda ku civate kurd wê herê nakê de dijîn jî, ew bixwe jî, wê li dijî wê bêrûmetîyê berteka xwe bidina nîşandin.

Bi teybetî, li vir, ez gotinaka din jî bi teybetî dixwezim ku li ser bisekinim. Ew jî, dema ku Ayşe Hûr bahse kurdan dike û gotina "çete" bo an bikardihêne li ber diclê. Li ber diclê, kurd, heta ku ji wan tê bi hêza xwe serdest in. Ew serdestîya wan, derfetê ji ti kesekî re nadê hiştin ku weke çete ku ji wan bê û ku ji derve bê li wir bijîn. Her wusa, civateka ku bi kevneşopî û wilqasî, bo kevneşopîyên xwe diçê mirinê, gotinên weke ´çete´ bo wê bikarhanîn jî, ku ne ji nezanîbûnê bê, bi zanebûnî vajî nîşandina rastiyê û pêve ne ti tiştekî din a. Ayşe hûr, hewl dide ku bi nivîsên xwe re çend hevalbendan ji kujarîya tirkî re bide çê kirin. BI teybetî li ser navê kurd re wê dike. Korûcû´ û ankû weke ku kurd bi nav dikin "cahş" û ankû cerdewanên î ro li cem dewletê na, bi heman rengî çeteyên hemîdîya jî li cem dewletê na. Di vê demê de ev korûcû û ankû ´cahş´ çendî kurd in û temsilîyeta kurdî diin, di wê demê de çeteyên hemîdîya jî, kurdbûn û temsiliyeta kurd dikirin. Ne korucû û ankû ´cahş´ên roja me dikarin bêjin em kurd in temsiliyeta kurdan dikin. Û ne jî çeteyên hemîdîyan ên wê demê dikarin vê yekê bibêjin. Di roja me de, ev cahşên roja me çina, di wê demê de çeteyên hemîdîya ew bûn. Gotina ayşe hûr, ku dibêje ku di wê demê de **"kurd bi dewletê re di nava têkiliya jidahî de bûn"** jî, ji rastiyê dûr a. Rastiyê nayêne ser ziman. Tenê, heta ku dem tê wê dema sale 1915´an, wê bi dehan raparîn û serhildanên kurdan ên giştî û herêmkî wê bibin. Her serhildane ku bûya jî, piştî wê artişa osmaniyan komkujiyên mazin di ancama wê de bi kurdan dane jîn kirin. Ji xwe, di wê demê de, ez dikarim bêjim ku têkiliya kurd û tirkan

heta ku tu bêje nîn a. Çend ku kurdên ku li cem wê na, weke wan çend kurdên ku î ro li cem wê na û li gorî gotina wê bi her devî ku dikarin biaxivin in. Hertimî, kurdan, ku bahse têkiliya bii tirkan re hatîya kirin, gotina "baxtê romê nîn a" bikarhanîna weke bersiveka wê gotina têkiliya kurd û tirkan. Di dema ku dewleta osmanî komkujiyên ermeni dike û fermana wan rakiriya di salên 1915´an û ankû 1916´an hwd de, di heman salan de bi tafisandina serhildane kurdan ya koçgirî re meşkul bû. ..

.. **Bi teybetî**, dema ku em bahse civatekê û ppêşketina wê bikin, divê ku em ji bîr nekin û bi giringîyeka mazin li ser dîroka wê û awayê nivîsandina wê bisekin in. Ev yek, weke aliyekî giring ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Di van demên dawiyê de,, di derbarê beşên dîroka kurdan ên giring de hin bi hin hin nivîskarna dewletê jî dest diavêjina wan û li gorî xwe dixwezin ku binivîsênin û li gorî xwe reng bidinê de. Civatek, dema ku serdestîya nivîsandina dîroka xwe nekiribê destê xwe de, wê nikaribê serdestîya rengê pêşketina xwe ya pêşarojî bidest bike. Hinekî jî, li vir, ev gotin pirr giringa ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê.

Di van deman de, nivîsên ku li ser dîroka kurd tên nivîsandin û mirovên weke Ayşe hûr û hwd ku dinivîsênin jî, bi zanebûn, gotinên weke "kurdên aşkîya", "dijberî û dijminatîya di nava têkiliya kurd-ermenîyan de" û hwd dixwezin ku weke gotinna temen di nava nivîsandina dîroka kurdan de bicih bikin. Di serî de, dewleta osmanîyan, di dema berî ya komarê de, çû bi ser ermenîyan de û mal û milkên wan jî telan kir. Ji vî aliyê ve jî, gotinên weke "kurdan, hêrîşî gundên ermenîyan kir û telan kir,", "wergîya ku wê kurdan bidan dewletê barê wê jî danîn ser ermenîyan" û hwd, bi gotinên bi vî rengî, gotinên ku tên hilbijartin tên gotin. Mixabin, kurd jî, ji dêla ku van nivîsên bi vî rengî lêbikolîn û rastîya derxina li holê, hin kurd bi heman rengî ji rojnemeyên tirk digrin di nava kurdan de diweşênin. Dema ku wan bi wî rengî di nava kurdan de weşand jî, weke ku ew rast bê, qanaatek bi mirovan re çê dibe. Lê ev ne rast in ..

Bi teybetî, di nivîsandina dîrokê de jî, hertimî serî li nivîskar û profesorên tirk xistin jî, weke şaşîya dîrokî ya kurdan divê ku mirov li vir li ser bisekinê û wê bêne ser ziman. Ev alî, giring a ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Dema ku serî li wan hat xistin jî, êdî weke ku çawa ku dewlet dixwezê ku dîrokê bide nivîsandin û hwd, ew tê kirin. Yanî, kurd, êdî di nivîsandina dîroka xwe de, hêst û ramana xwe ya dîrokî û civatî ya xwe ya xwemalî winda dikin. Heta vê kêlîkê jî, ya ku bûya ev a.

Di vê temenê de, diivê ku mirov bibêje ku metodên ku bi wê dîroka civatê tê nivîsandin, biqasî hebûna civatê û pêşketina wê bo wê giring in. Bo vê yekê, divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. Li vir, dema ku dema ku dîrok hat nivîsandin de ku lêpirsîn li ser nivîsandinê de ne hat kirin, wê hingî, ew dîroka ku hatî nivîsandin, weke ku çawa hatî nivîsandin wê wee herê kirin.

Minaq, Ayşe hûr, di nivîsana xwe ya bi navê "hele bila ava bibe ermenistan, wê tenê kurdek jî nemenê" de, bahse dema şêx Ubeydullah dike. Berî ku ez bahse wê dema şêx Ubeydullah bikim, di serî de li ser navê nivîsê bixwe ez gotinekê bibêjim. Ev gotinaka dewletê ya ´yekî bi yê din dane tirsandinê´ ya. Piştî vê gotina "hele bila ava bibe ermenistan, wê tenê kurdek jî nemenê", gotina "ermenîstana mazin" tê ku tirkiya hertimî weke propagandayekê bikarhanî ya. Bi wê re jî, divê ku mirov bibêje ku dema ku bahse têkiliya kurd-ermenîyan kirin gotinên weke "du nîjadên ku dijminên hevdû" bikarhanîn jî, têkiliya kurd û ermenîyan nayêne ser ziman. Ew, di temenê jenosîda ermenîyan de têkiliya rejima tirk û ermenîyan dihêne ser ziman. Kurd û ermenî, bi hezar salan bi

hevdû re jîyane. Hertimî, karîna ku bi hevdû re bijîn.

Dem, ku tê dema şêx Ubeydullahê Nehrî, wê hingî, dewlet olê pirr zêde bikar bêne. Gotinên weke "em birayên hevdû ên misilman in,", "wê ola me ji dest herê.", "ew ermenî na û em birayê hevdû ên misilman in" û hwd, çend ji wan gotinên ku hatina bikarhanîn û ku hatina îstismarkirin jî na. Bi wê yekê, di wê demê de, heta ku ez dikarim bibêjim ku wê bi van propagandayên li ser olê re wê çend kurdan hildina li cem xwe jî, "alayên hemîdîya" wê ji wan werina afirandin û hem li dijî kurdan di serhildanên wan de werina bikarhanîn û hem jî li dijî ermenîyan jî wê werina bikarhanîn.

Lê li vir, zimanê ku bi wê dîrok dihê nivîsandin, pirr giring a ku divê ku mirov wê fahm bike. kurd jî û ermenî jî, li ser axa ku dijîn bi gotina "aşkîya" hanîna wan ya li ser ziman, tenê zimanê serdestiyê ku divê ku mirov wê red bike ya. Ya rastî ew a ku ev rengê dîrokivîsandinê û domandina wê, tenê hêst û ramana dîroka gelên herêmê ji holê ranakê, her wusa temenê tûnekirinên ku wê piştre werina kirin jî diafirêne.

**Ku em li vir, bi çend gotinan bahse dema şêx Ubeydullah** jî **bikin, divê ku em bibêjin ku Şêx Ubeydullah, bi hemû beşê civatî ên kurd û ên ne kurd re têkilî danîya û piştgirî jî ji wan girtîya. Ermenî ji di nava wê de na. Ji xwe, di wê demê de aliyekî ku dewleta Osmanî li dijî şêx Ubeydullah û serhildêrên wê demê ên bi wî re ku weke propaganda jî bikardihêne jî ev a. Hingî, propagandaya sereka ku bi teybetî li herêmên botanê, Mûş, Wan, Agirî, Amedê û hwd ku dihê kirin ew a ku "şêx, bi kafiran re têkilî danîya û bi wan re li dijî dewleta misilman serî hildide" ya. Bi vî rengî, wê gelek gotin werina gotin. Heta ku divê ku ez bibêjim ku wê gelek serokên aşîrên kurd bixwe jî wê di bin bandûra wan propagandeyên dewleta osmanîyan de bimênin û wê xwe serhildane şêx Ubeydullah dûr bidina girtin. Ji br vê yekê, tevî ku gelek caran jî, şêx Ubeydullah serî li wan aşîrên kurd jî dixê, ew bixwe jî ji şêx Ubeydullah re dibêjin ku "em ne li dijî ne te na, em di rêya te de na". Tevî vê gotinê dibêjin jî, bi bandûra wan propagandayên dewletê ên li dijî wî û serhildane wî, wê ew di dema serhildanê de hêzên xwe ne kina tevgerîyê de. Di aslê xwe de, ku di wê demê de wan hêzên xwe kiriba tevgerîyê de wê serhildane şêx Ubeydullah bi serketiba. ..**

**Temenê serhildane şêx Ubeydullah ê serkevtinê pirr zêde jî hebû. Du tişt wê di temenê têkçûna serhildane wî de hebin. Yek, ev propaganda na. Ya din jî, dewletê fahm kiriya ku bi leşkerî, tevî ku hemû aşîrên ku kurd bi bandûra wan propagandayan ne bi wî re na jî, wê li dijî wî bi ser nekevin. Êdî dikin ku xwe bigihênina wî bixwe. Di dawîyê de ku li çend herêman ku şerê di nava kurd û dewletê de didomê jî, dewlet xwe digihêne şêx Ubeydullah bi alîkarîya çend kurdên berê li cem wî jî bûn. Êdî piştre propaganda tê kirin ku şêx hatîya girtin. Êdî gelek serhildêrên kurd tevî ku dema ku di serhildane xwe domandiban jî ku wê bi serketiban jî, êdî ew gotina "girtina şêx" wê bandûrê li wan bike û êdî w dev ji şer berdin. Şê Ubeydullah jî, piştre tê şandin li sûrgûnê li Medînê**.

Di aslê xwe de, piştî girtina şêx Ubeydullah re ku kurdan serhildan domandiba, wê serketiban. Lê bandûra gotina girtina şêx li wan mazin bû û giran ha. Piştre serhildan ne domandin. Di aslê xwe de, serhildane şêx Ubeydullah, ji têkçûnekê zêdetir, em divê ku bibêjin ku bi vî rengî dawî li serhildanê hatîya hanîn. Yanî, dema ku serhildan dawî lê hatîya, kurdan hingî ti têkçûnên mazin jî nexwarina. Divê ku em rewşa serhildêrên li Sasonê hinekî jî bi vir ve girêdayî bênina ser ziman. Tevî ku têkçûn nebûya jî dev ji şer

berdan, hin kurdan aciz jî dike. Ji ber vê yekê, kurdên li dora Mêrdîn, êlih, Amedê û hwd, dixwezin ku berxwedanê bidomênin û pêde herin. Bo vê yekê, piştî dema serhildane şêx Ubeydullah û heta sale 1895´an û hwd jî, wê ev herêmên kurdistanê di bin dest û desthilatdarîya kurdên serhildêr de bin. Yanî, ew serhildane Sasonê ji serhildanekê zêdetir, dewama serhildanekê û rewşa serkevtina wê dihêne ser ziman.

.. **Dîroka kurdan**, dema ku em ji kîjan aliyê ve lê dinerin, em ratî komkujiyakê têde tên. Komkujiya gelîyê zîlanê ku weke ´komkujiya gelîyê zîla´ jî tê bi nav kirin, piştî têkçûna serhilane şêx Seîd pêk tê. Li herêma agirî û bi teybetî li ber çîyayê agirî, ji destpêka avakirina komarê ve tevgerî, raperînên aşîrî û hwd bûna. Dewleta tirk jî, hertimî, çendî hêza wê hebûya, li wan herêman bicih kirîya û li dijî kurdan bo oprasyonên leşkerî ên weke ´oparasyona li herêma tendûrekê´, ´oparasyona li li stawrê´ û hwd bikarhanîya.

Mirovekî ku demografî û civaknasîya herêmê bizanibê, wê bi hesanî bizanibê ku gelê herêmê ê kurd û komnetewên din ku bi wan re dijîn bi serê xwe dijîn. Weke dewlet dijîn. Kengî ku kurd li herêmên xwe bidest serhildanan kirin? Dema ku bi ser wê jîyane wan de çûyîn bû jî, êdî rabûna ser xwe û serî hildane. Li vir, bi vir ve girêdayî ez bi teybetî binxat kim û vê yekê divê ku bibêjim. Heta roja me, weke rexneyekê jî ku hatîya kirin li serhildanên kurdan ku hatîya gotin ku "ji ber ku bi aşîrî hildane têkçûna" û ankû hatîya gotin ku "ji ber ku herêmî ma na, êdî têkçûna." Ev gotin, çendî ku rast jî bin, lê dema ku em li sedem û temenê wê ne nerin, emê nikaribin wê fahm jî nekin. Li her herêmê, jîyane kurdîstanîyan di aslê xwe de bi rêxistin bûya. Heta wê dema ku bi ser wan de çûyîn nebûya jî, zêde mudahele li jîyane wan nebûya. Ankû, çendî mudahele bûna jî, wan ew mudahele ji holê rakirina. Bi wê re jî, êdî ew jîyane xwe ya biserê xwe û Azad parastina. Pergale aşîrtîyê, em divê ku divê temenê de, di temenê pergale parastinê re jî lê binerin ku bi hêzî xwe û herêmên xwe diparastin.

Piştî serhildane şêx Seîd, wê êdî ew serhildanên kurdan ên herêmî û ankû aşîrî wê zêdetir bibin. Di aslê xwe de, em nikarin tenê wê serhildanên kurdan ên aşîrî, tenê bi serê xwe weke serhildanna hildina li dest. Ew serhildanên aşîrî, weke ku çawa ku bi plan û xafka li Pîranê ku çend leşkerên tirk diçin ku çend kurdan dixwezin ku wan bigirin û xalkê herêmê wan mmirovan nadin û piştre serhildane şêx Seîd dest pê kir, di temenê lîstikna bi vî rengî de divê ku mirov li wan serhildanan jî binerê. Li kîjan herêmê hêzên kurdan hebûna, wê bi wî rengî, pêşî bi çûyîna bi ser wan de êdî wê wan acîz bikin û piştre ku wan jî serî hilda wê bi hêzeka mazin herina bi ser wan de û wan têkbibin bi komkujiyan. Di rewşa serhildane Agirî bixwe de jî, di dema ku serhildanê dest pê kir, bi oparasyona leşkerî a li tendûrekê re, ew hêze şêx Avdûlqadîr ku wê bi hêzeka mazin tevlî serhildêrên serhildana agirî bûba û wê bikira ku ew biserketan, pêşîya wê girt. Bi vî rengî, di aslê xwe de, gelek serhildanên aşîrî û herêmî ên kurdan ku bûn, destê çûyîna bi ser wan de û engizandî(´tahrîk´) kirina wan re da kirin. BI wê yekê re, armanc ew bû ku hêzeka kurdan qat bi qat li herêmê were şikandin derfet newê hiştin ku hêzeka mazin ya kurdistanî ku karibin ji nava xwe derxin bo kurdistanê.

Hinekî jî, di vê temenê de weke ku dewletê bi xwe plan û programaka mazin pêşxistibû. Bi teybetî, piştî têkçûna serhildane şêx Seîd bi alîkarîya firansizan û Îngilizan ya ji tirkiya re, êdî dewletê giranî dabû bû tahrîk´kirina aşîran li herêmên xwe serî hildin û ew herê bi ser wan de û hêzên wan bide şikandin. Di aslê xwe de, gelek herêmên kurdan bi vî rengî weke ku bêparastin jî hat hiştin. Aşîr bi aşîr serî hildan jî, wê

bike ku ew li dijî hêrîşên artişa tirk bişikihin. Di vê temenê de, herêmên ku bê parastin man, êdî piştre di wan de wê mirovên sivîl wê rastî hêrîşan werin. Di wê demê de, piştî hin bi hin şikeştina serhildane agirî, wê hemû gundên li dora gelîyê Zilanê û agirî, pirranîya wan wê werina şawitandin. Bi dehan gundên ku li wê herêmê hatina şawitandin. Ew gundên ku hatina şawitandin, li wan ti hêzên kurd tûna na. Hemû gund jî, ji ber ku mêrên wan bi aşîrî û biryara aşîrê tevlî serhildane agirî bûna û piştî şîkeştinê pirranîya wan jîyane xwe ji dest dane jî, êdî ew gund, tenê jin û zaro û pîr û kal mana. Ji wan pêve, wê zêde ti mirov nebin. di wê dema ku komkujiya zîlanê bû ji hefteya dawî ya hezîrenê heta tîrmehê, wê bi hezaran jin û zaro ji aliyê leşkerên tirk ve werina kuştin. Gund, bê mirov man. Ji çend gundan jî, çend mirov û ankû malbatên ku sax filîtî na, ew jî barî Erdîşê dikin. JI ber ku di gundên wan de êdî mirov nemana û jîyane êdî mirîya, ew jî xwe li cihên ku mirov lê dijîn digrin û tevlî wan dibin.

Di wê demê de, tenê di komkujiya li gelîyê Zilanê de, ku di 12 tirmehê de ku rojnemeya tirk ya bi navê "cumhurîyet" jî ku bahse wê dike, ser 16 hezaran re mirov, tenê li ber wî çemê gelîyê zîlanê tê kuştin. Lê gelek mirovên ku piştre ji komkujiyê filîtî na, divê ku "hijmara kuştîyan ya li wir, ji ya ku bahs tê kirin sê û çar qat jî zêdetir a." Ev gotin, tenê bo kuştîyên ku li ber çemê gelîyê Zilanê tê gotin. ..

Piştî ku dewletê, di sale 1925´an de li dijî serildane şê Seîd, bi piştgirîya ku ji wê re ji ingilizan û firansizan hebû ku biserket, êdî piştre, hemû hêza xwe veguhazt li herêmên kurdan. Herêm bi herêm, bi leşkerî têkiliya wan ji hevdû tê birrîn. Piştre jî, li wê herêma ku bi birrîna têkiliyên wê ya bi herêmên din re, êdî wê çûyîna bi ser aşîr û herêmê de bibe. Bi wê yekê, êdî bi hezaran komkujî bibin. Ev rêbaza tahrîkkirin û piştre çûyîna bi ser aşîran de wê bi teybetî piştî serhildane şêx Seîd û têkçûna wê re zêdetir bibe. Êdî bi wê rengê, wê ew şikeştina ku bi serhildane şêx Seîd re ku kurdan xwar, wê bê kirina malê hemû kurdan û kurdistanê. Sale piştî têkçûna serhildane şêx Seîd ya sale 1926´an û pê de, wê êdî hin bi hin ev raperînên aşîrî pirr zêde bibin. Ne tenê li herêma dersimê agirî û ankû bi navê wê yê giştî sarhadê, botanê û hwd wê bibin. Lê li beşên din ên kurdistanê jî wê bibin. Kurdên rojhilatê kurdistanê, di wê demê de têkiliya wan ya xort ya bi kurdên bakûrê kurdistanê re, wê cih bi cih bike ku bi aşîrî ew jî piştgiriyên xwe bidina serhildanên kurdên bakûrê kurdistanê. Wê hêzên leşkerî jî ji kurdan re bişênin. Heta ku em dikarin bibêjin ku wê di destpêka de wê aşîrên kurd ên rojhilatê kurdistanê wê hêzên leşkerî jî ji nava xwe bifirênin û bi sûwarî bişênina alîkarîya serhildane agirî de. Di dema ku kurdên bakûrê kurdistanê ´komara kurd ya agirî´ denezendin, wê kurdên rojhilatê kurdistanê, wê hêzeka mazin pêşî ku ne bin du hezar suwarîyan re bûya wê bişênin ku alî wan bikin. Piştre jî, ji aşîrên weke ên Şêx Avdilqadir û hwd, wê hin bi hin hêzna mazin werina afirandin ku werina şandin li alîkarîya wan. Di wê demê de, dewleta tirk jî wê yekê kifş dike û dibîne. Minaq, di wê demê de hin deverên tendûrekê ku dikarî xwe li wê bigirê wê bi deh hezaran hêzeka artişî svkî wir bike. Armanca wê ew bû ku pêşîya alikariyê ji rojhilatê Kurdistan li bakûrê kurdistanê bide girtin. Hinekî jî, bi ser jî ket. MInaq, di wê demê de gelek alikariyên leşkerî ku wê bûban pêşîya wan hat girtin. Pêşîya mifrezeya leşkerî ku bi hezaran leşkeran ku şêx Avdûlqadir amede kiribû û bi wê dihat alî serhildane agirî hat girtin.

BI vî rengî, di aslê xwe de, herêmên kurdan hatina bêhêzkirin. Aşîrên kurdan, di destpêkê de, ew yek kifş nekirin. Bo vê yekê, çendî ku têkiliya wan bi hevdû re hebû jî, têkiliya wan hatibû birrîn. Di wê demê de, gelek mirovên ku agahîyan ji aşîrê bibina ji

serokên aşîra duyemin re di rêyan de dihatina kifşkiin û girtin û kuştin. Yanî, di aslê xwe de, dewletê li ser rêyan jî bi vî rengî ewlakarîyak dabû bû girtin.

Herêmên kurdan, wê bi raperînên aşîrî, heta ku sal tê sale 1929´an û hwd, wê bi tememî pirranîya hêza wan bi wî rengî were şîkandin. Piştî ku dewletê jî dît ku êdî derfeta kurdan nemaya ku hêzeke mazin li dijî wê êdî ava bikin, êdî bi teybetî, dewletê berê hêzên xwe da bi ser gund û navçeyên kurdan de. Êdî bidest komkujiyên mazin kir. Ku di wan demên ku dewletê hêzên mazin di ajotina bi ser gund û çavçeyên kurdan de ku hingî, tenê hêzeka piçûk jî ku ya kurdan li wan deveran heban, wê karên mazin kiriban bi pêşî lê girtina komkujiyên mazin re. Lê ew nema bû. Minaq, komkujiya gelîyê Zilanê, ku di bi hezaran jin û zaro û kal ku destê wan çek negirt ku xe biparêzên hatina qatil kirin. Herêm, bi vî rengî, hatîya bê mirov kirin.

Di wê demê de, wê ne tenê artişek were bi ser kurdan de. Dewletê, ji sê çengan ve artiş amedekiirina û şandina bi ser kurdan de. Bi teybetî, artişa dibin serokfermandarîya Salih Omurtak, ku ji gelekên herêmn agirî bigra heta ku digihijê herêmên botanê ên weke stawrê, Cizîrê, Nisîbinê û hwd, wê li herêmeka mazin bi hezaran mirovan bikujê. Heta ku vê artişê, bi hêzên mazin ku li wê hatina destek dayînê(**taqwîya)** kirin wê xwe gihandîya herêmên weke hezex û mîdyadê bixwe jî. Li gelek gund û navçeyên van herêman jî komkujiyên mazin kirina. Artişa di bin serokfarmandarîya wî mirovî de, teybetmendîya wê ew bû ku piştî serhildanê, hemû herêmên kurdan bêne wê rewşê ku êdî nikaribin serîhildan li wan bibin. Bi vê yekê, vê artişê, bi teybetî, berê xwe da sivîl û zaro û kalan bi deh hezaran kurd kuştina. Piştî oparasyonên leşkerî ên ku bi destê vê artiş dewleta tirk ku li ser serê kurdan hatina kirin, wê di dawiyê de wê herêm bibe kavil. Gelek mirovên ku ew dem jîyan kirina, piştre ev gotin gotina û ev gotin di nava xalkê de li herêmên kurdan bûya weke gotinaka xalkê jî, ku hatîy gotin ku "wê vê artişê, mirov weke haywanan dikuşt." Di gotin ku "dema ku çawa ku êşek dikevê nava sawalan de û bi carekê hemû bi hevdû re dimirin, wilo li me mirovan jî kirin."

Gelîyê zîlanê, dema ku bahse wê dihê kirin, weke komkujiyaka ku di wê demê de ku hatî kirin, ku tê gotin ku "laş li ser laş bû". Bi wê re jî dihat gotin ku "ava ku di wir de diharikî xwûn bû." Heta ku dihat gotin ku "gelek mirovan, xwe di bin laşên mirî, weke ku mirî daye nîşandin û bi wî re xilas bûna." Ev gotin jî, di nava xalkê de bo komkujiya Zilanê di nava xalkê de li herêmê dihê gotin. Komkujiya Zîlanê, rûyê dewletê ê rast pirr baş dabû bû fahm kirin. Dewletê, bi teybetî, piştî sehildane şêx seîd û ya agirî û pê de, berê xwe daye bi ser mirovên sivîl de. Wê piştî wan re jî, wê oparasyonên çavtirsandinê û kontrolkirinê wê ne sekin in û wê bidom in. Ku piştî komkujiya dersimê re tê li darxistin di ´paxte sadabadê´ de wê ev rewş jî werina ser ziman. Bi teybetî, biryara "jidandina sînoran" wê di ancama wan nîqaşan de wê were girtin. Hêzên ku tevlî paxtê bûna, hinekî jî bê kurdan nas dikin û dizanin ku kurd wê wusa bêdeng nesekin in. Êdî piştre, wê çawa bergir(tedbîr)an bigrin, li wê dihizirin. Heta ku di dema serhildaneka kurdan de wê çawa piştgirîyê bidina hevdû jî di nava de wê pirr bîryara di nava xwe de bigrin û wê piştre jî bikina fermîyetê de. Bi komkujiyên weke komkujîya geliyê zilanê ku li herême agirî û ankû serhadê, bi komkujiyên weke komkujiya dersimê ku dersimê hat kirin û hwd, dewletê piştre bawer kir ku êdî bi tememî Kurdistan û kurd bêdeng kiriya. Lê ew hasabê ku wê kiribû weke yê wê derneket. Kurd, piştre jî, wê bertekên xwe bidin kirin. Ji dema komkujiya geliyê zilanê û komkujiya dersimê û hwd, heta ku dem tê salên 1980´î û hd, wê oparasyonên

çavtirsanênê wê bênavber bidom in. Di wan oparasyonan de jî, hertimî hewl dide ku herêm were bêçekkirin. Minaq, gelek aşîr û ankû mirovên ku dewletê gûman dikir ku çek di destê wan de hebûna, wê bi derewîn pêşî çend mirovan biafirêne bi devê wan gotinê bide gotin ku ´di destê wan de çek heya´ û piştre wê oparasyonan li ser serê wan bide kirin. Ev jî, weke metodeka dewletê ya sereka ku pişte bikardihanî bû. Ev metod, bi metodên weke girtin û êşkence li wan kirinê û hwd re dihat bikarhanîn. Di wê demê de, ji bilî çend mirovên li rex dewletê, ti mirovên ji herêmên nikarin bibêjin ku wan êşkence ji dewletê hêzên wê ne dîtîya.

Komkujiya zîlanê, weke ya dersimê ku dewleta tirk kir, hinek armancên wê bi wê hebûn. Dewletê, bi komkujiyên weke komkujiya geliyê zîlanê û komkujiya dersimê û hwd re, xwestibû ku temenê rabûna serpîyan ya kurdan ji holê ra bike û temenê doza maf û azadîya xwe kirina wan ji holê rakirin kiribû. .. Armanca van komkujiyên ku piştî tafirandina serhildanên kurdan re ku kiribû ev bû. teybetmendiyeka din ya van komkujiyan ew a ku ne di dema raperîn û ankû serhildanên kurdan de na. Hemû di demên kurd bêdeng de bûna. Bo ku temenê serhildanan were jii holê rakirin. Yanî, di temenê politikayaka ku hatî kifşkirin de ew komkuji dihatin kirin. Dema ku em vê politikaya dewletê jî bi başî fahm nekin, emê bi tememî kirin û bûyîna wan komkujiyan jî fahm nekin. Di serî de,, zihniyeta di temenê kirina wan komkujiyan de bi wê politikayê divê ku were ditin û kifşkirin û fahm kirin. ..
..

**Zihniyeta CHP´ê,**

CHP, partîya sîstema tirk ya ku tê gotin ku ji aliyê Mî Kemal ve hatîya ava kirin a. Bi teybetî, dîroka wê partiyê, divê ku mirov bi teybetî hildê li dest. Ji di naqabîna salên 1923 û 1950´ û hwd de, deme "yek partîtîyê" ew dibê desthilatdar. Ji salên 1923´an heta ku dem tê salên 1950 û hwd, ew part li tirkiyê weke partîya baasê ku li Îraq û Sûrîyê bûya desthildar ew jî li tirkiyê bûya desthilatdar. Di vê demê û salên ku ev partî li tirkiyê bûya desthilatdar de, komkujiyên mazin li kurdistanê hatin jîn kirin. Komkujiya Zilan, Agirî, Botan, Dersimê û hwd, bûn. Di van komkujiyan de bi gelemperî herî hindîk dusad hezar mirov hat kuştin. ev parrtî, ji van komkujiyan hemûyan berpirsîyar a.

Piştî salên 1950 û pê de, ku dema "pirrpartîtî"yê dest pê kir, êdî partiyên din ava bûn û bûna desthilatdar. Lê ev partî yanî partîya CHP, di van demên ku piştî salên 1950 û pê de jî, çend ku ne bû desthilatdar û li muxelefetê ma jî, bi aliyekî ve ji binî ve weke partîya desthilatdar li tirkiyê rol leyist. Malbata Înûno ku heta ku digihijê erdal Înûno hwd û piştî wan re heta ku digihijê Bilant Ecewît bixwe jî di nava wê de di nava sîyesetê de pijîyan û pêşketin. Piştî ku salên 1950 jî, ku bahse partîya CHP dihat kirin, weke ku bahse dewletê bihata kirin dibû. Bi vî rengî, CHP piştre bandûra wê bû. Çend ku dem bi dem navê wê hatîya guhartin ji ji DSP heta ku digihijê SHP û piştre ku tê dema CHP û hwd jî, ku dem bi dem nav diguharin jî, lê xat û têgihiştin yek. Hemû partîbûn ên ku dibin jî, bi armanca li gorî demê wê partiya dewletê bidina domandin bû. Î ro, ku dema ku tê gotin CHP; weke ku ev xate dewletê ya ku ji dema M. Kemal tê destpêkirin û heta vê demê tê, bahs tê kirin.

Di serî de divê ku mirov bibêje ku CHP, di afirîna pirsgirêka kurd de, weke xat û partîya yekemin a. Partiyên piştre ku dewletê dana avakirin jî, hemûyan jî, tenê ew xate ku CHP

bi navê dewletê daya dest pê kirin û pêşxistiya, wan partiyên piştre, tenê dane dest pê kirin.

Yê min bixwe, dema ku bahse CHP digihijê guhê min, dîrokeka kurdan ya dema komarê ku bi komkujiyan hatîya nivîsandin tê bîr û hişê min. Ev partî, bi vî rengî, divê ku mirov bibêje ku partîya ku ku ji gelek komkujiyên ku li ser kurdan bûna û hatina kirin ya ku xwediyê berpirsîyar a. CHP; î ro, weke partîya di meclisê de ya Muxalefetê tê zanîn û ser ziman. Lê weke partîya ku çavdarkvanê komarê jî tê dîtin. Bi vî rengî, lê tê nerîn. Politikaya komarê ya li dijî kurdan ku heta roja me li ser temenê înkara kurdan hatîya domandin, hê jî reng û awa û wêne wê di CHP de dijî. CHP, di roja me de jî, wê înkara kurdan bi awayekî pirr "sinsî" dide domandin. Bi awayekî pirr xirab diçê nava kurdan. Dema ku li CHP dinerîm ku di dema CHP de komkujiya dersimê ku li ser serê kurdan pêk hat, tê berçavên min. Mixabin, CHP, li dersimê ku karibê hê wekîlan derxe, divê ku mirov vê bi wan politikayên wê sînsî ên ku wê li ser serê kurdan dana meşandin re şîrove bike û bêne ser ziman.

Di vir de, ez cihekî vekim di nivîsê de û çend gotinan li ser dersimê bibêjim. Dersim, kurd in û Elewî na. Bi teybetî, bi van herdû xoslet û teybetmendîyên xwe re tê zanîn. Ew herêm, î ro jî, ji bo kurdên elewî, cihên herî pîroz li wir in. Komkujiya li dersimê ku pêk hat di salên 1937´an de bû. Lê piştî wê demê re jî dem bi dem ew komkuji li Dersim bi politikayên bişavtinê bê û bi oparasyonên leşkerî bê, çûna bi ser dersimê de bûya. Birez **Îsmail Beşîkçî**, di pirtûka xwe bi navê "**Rêbaza zanistiyê, bikaranîna li Tirkiyeyê 1. Bicihkirina bi darê zorê ya Kurdan**" de bahse 97 seferên ku leşkerî ên ku li Dersimê û dora wê hatina kirin dike. Lê di sefereke tenê de jî bi serkevtin nebûya. Di hemûyan de jî, bi koman komkuji bûna, lê nebûna sedeme ku kurd dev ji tekoşîna azadî û serxwebûna xwe berdin. Ev sefer û oparasyonên ku bûn piştî avabûna komarê dibin. Di wê demê de jî CHP li ser desthilatdarîyê ya bi awayê "partîya millî ya şef(serek)"a.

**Piştî salên 1937´an jî wê dem de li kurdistanê bi teybetî li dersimê oparasyon lê werina kirin. Lê divê ku mirov bibêje ku tenê di vê demê de yanî di sale 1937´an de, li gorî zanîn ji nava gel ser 140 hezar mirovî hatina kuştin. Lê ev zanîn ku mirov bi xalkê herêmê re ên ku ew dem jînkirin û bûna şahidê wan komkujiyan dibêjin ku ev hijmar ya herî hindik a. Yanî dixwezin ku bibêjin ku komkuji dema ku bû di wê de ji wê zêdetir kuştin bûn. Heta roja me jî, bi awayekî zelal nayê zanîn ku çendî mirov hatina kuştin. Rojenema "cumhûrîyet"ê di hijmara xwe ya 13 tirmehê ya 1930´î de di sernivîsa wê nivîsa de dinivîsê ku "paqijkirinê destpêkirîyan, yên di newala Zîlanê de hemû hatina kuştin". Rojnema, ji dêla gotina kuştinê gotina "îmha" kirinê bikar dihêne. Tenê di heman nivîsê de dibêje ku "Yek jî ji wan xilas nebîûya" Yanî dibêje ku mirovên li herêmê bi tevahî hatina kuştin. Tenê di vê mijara ku rojnema dinivîsêne de, ser 15 hezar mirov bi carekê di rojekê de têne kuştin. Ji salên 1930´an û hwd, heta ku salên 1937´an û hwd, dem bi dem û roj bi roj mirov têne kuştin. PIştî ku dewlet hêzên wê, li dersim û Zîlanê di wê demê bi hezaran û deh hezaran kurd dikujê ji ber ku kurd in, piştre, wê sefera xwe ya qirkirinê di harikên herême agirî. Di vê demê de weke ku di heman**

**rojnema û nivîsê de jî tê ser ziman kurd weke "eşkîya" têne binavkirin weke ku di roja me de ji kurdan re dibêjin "terorîst".**

Dîroka salê 1937´an, bûya dîrokeka sembol ji bo kurdan û di wê komkujiyê de. Ji ber ku di wê komkujiyê de tenê di wê salê de ser 30 hezar mirov têne kuştin. **Lê divê ku ez vê jî bi ser vê gotinê bikim ku her mirovên ku têne kuştin "zaroyên wan yên piçûk ên ku hebûn ji aliyê leşkerên tirk ve tenê berhevkirin û wan dikina kamyonên leşkerî de û dibina rojevayê tirki û radestî malbatên leşker ên tirk dikirin ku wan weke tirkan mazin bikin."** Heta vê roja me de ku em têde dijî di 2012´an de jî ew zarok aqûbeta wan hê dîyar nebûya. Ev jî, ji aliyekî din ve jî, weke mijareka ku di dil û serê kurdan de weke mijaraka dîrokî cih girtîya ya. Ev li gorî politikayên dewletê ên li ser CHP ên bi rê ve diçûn bûn.

Ji van komkuji û bûyarên ku bûna CHP, weke artişê hêza demê ya pêşî ya berpirsîyar a. CHP, teybetmendîya wê, ew jî ya ku artiş di nava wê de bicih a û artiş hizrên xwe hertimî li ser wê re têne ser ziman a. Ji ber vê yekê, hem di nava kurdan de jî û hem jî di nava tirkan de jî weke "partîya Artişê" jî tê binavkirin û ser ziman. Ev partîya ku di dîroka kurdan ya bixwûn de kifşkar a, divê ku ez bixamgînî bibêjim ku hê jî ji herêmên kurdistanê ên weke dersimê dikarê wekîlan derbixe. Ev rewş, di aslê xwe de, rewşeka ku mirov divê ku wê hem ji aliyî dîrokî û deronî(psikolojikî) ve ku lêbikolê ya.

Dewletê, piştî ku ew komkuji ku navenda wê dersim bû li kurdistanê û li gelek beşên ên kurdistanê kirin, piştre jî, pêvajoyên teybet ên bişavtin(asîmlasyon)ê çû bi ser herêmê de. Piştî wan komkujiyan re zimanê kurdî hatibû qadaxakirin û bi awayekî pirr bi şitt diçûna bi ser kurdan de. Yên ku bi kurdî diaxiftin jî, yan dihatin kuştin û yan jî bi cezayekî din ê pirr giran ku nekêmî cezayê mirinê bû, bi wî re rû bi rû dihatin. Ev bi vî rengî divê ku ez bibêjim, biqasî ku xalkên herêmê ji dev dibêjin ku ji ber ku bi kurdî axiftin bi sadan mirov tenê li berçavên xalkê li qad(meydan)an hatina kuştin li berçavên gel ji bo ku wan çavtirsandî bikin. Lê tevî wê jî, dewlet di ya xwe de bi serneketîya. Kurdan, piştî ku bandûra wan komkujiyan hinekî ji ser xwe avêtin, tekoşîna azadîyê ya PKK ku î ro, ji sadî 90´ê kurdan wê weke rûmeta xwe dibînin ava dibê û dest bi tekoşînê dike. Lê divê ku ez dîsan bi ser gotina xwe ve bikim ku piştî ku tekoşîna azadîyê ya kurdan dest pê kir jî, piştre jî, ew bandûra deronî ya dersimî ji ser kurdan ne çû. Kurd, ji aliyê deron(psikolojik)î ve heta roja me jî di bin wê bandûra wê komkujiyê de dijîn. Hê jî, kurd, ji bin bandûra wê komkujiyê derneketina û bi ser xwe ve ne hatina. Hê jî, di bin deronîya wê komkujiyê de na. Ev komkuji, bandûra wê pirr giran bû. Piştre, bandûra komkujiya Helepçê di nava kurdan de belav bû. Bi vê yekê re, her çend ku wê bandûrê kurd ji xîretê nekir jî, lê dîsan divê ku ez bibêjim ku deronîya wan kir.

Ku mirov hinekî ji aliyê deronî ve lê binerê, ku divê ku mirov bibêje ku di heta roja me, ev partîya dewletê ya bi navê CHP ku li kurdistanê û bi teybetî li wê herême hebûna xwe diparêzê, hinekî jî bandûra wê komkujiyê ji ber wê ya. Ji ber ku piştî ku komkujiyê, êdî ziman jî tê qadaxakirin û bi wê re hemû lûleyên bêhnstandinê têne birrîn. Êdî weke ku mirovê wê herêmê weke ku bê bêhn dimêne. BI wê re jî, tenê ew lûleya CHP tê ber wan. Êdî ew xwe di wê de tênina ser ziman. Bi vê rengî, di xwe hanîna li ser ziman ya

dersimîyan de hinekî ji wê rastîya xwe ya dîrokî ravîn heya û hinekî jî bi wê re bêbêhn hiştina wan ve girêdayî ya.

**Heta ku dem tê dema Bilant Ecewît, êdî ku ew di salên 1978 û piştre bû serokwezir, êdî di nava kurdan bi navê "karaoglan" hat nasîn. Bi vî rengî, weke lehengekî di nava kurdan de hat derxistin li pêş. Derketina Ecewît û bi vî rengî di nava kurdan de weke leheng hanîna wî ya li ser ziman, di aslê xwe de nîşanaka tiştekî jî bû. Nîşanaka wê bû ku dewletê li dersimê bi politikayên xwe bişavtinê re li ancam bidest xistîya û li ser wê re û li ser Ecewît re dixwezê ku heman ancamê li kurdistanê bigiştî bidest bixê. Hinekî jî, bi vî rengî divê ku mirov wê derxistina Ecewît ya li pêş fahm bike. Karaoglan, ev nav bixwe jî, ji kurdan beyenî ne dihat. Navekî ku bihesanî dikete serê kurdan de jî bû. Temenê wî navî di tirkî de ji "keloglan" tê. keloglan jî, di aslê xwe de navekî ji kurdî hatibû tercûmekirin bû. Navê "Keçelok" ku bi hezaran çîrok di nava kurdan de pê dihatina gotin, hatibû wergerandin û ew navê jê hatibû deranîn. Bi vî rengî, hinekî dema ku ew nav dihat ser ziman, weke ku "xîtabî" hin hêstna kurdî jî dihat kirin ji vê temenê ve. Êdî di nava kurdan de bicih bû. Bi vê rengê, di dema ku Ecewît, bû serokwezir, bi teybetî, wê partîya wî DSP, ji kurdistanê pirr deng girtibûn û bûbû desthilatdar.**

Piştî salên 1980 û hwd jî, ev partî, bi teybetî, li kurdistanê bicih bû. Kurdên ku xwe avêtina sîyesetê di nava de xwestin ku cihê xwe bigirin. Di wê demê de CHP, kevneşopîyên wê demê weke SHP û hwd, xwe weke partîya kurd jî dida nîşandin. Ew xwe kurd nîşandin, ne bi rengê kurdîtîyê lê yanî weke "partîya wan" dide nîşandin. Di wê demê de bi politikayên dewletê ên ku xîtabî hêst û ramanên kurd dikirin ku wan bikê nava wê partiyê û di nav de bêhtirî wan bihalêne, dikirina meriyetê de. Kurdan jî, ev bi vî rengî dixwandin. Lê piştî ku diketina navê de, êdî bi awayekî li ser navê tirkitiyê ew dihatina perwedekirin dibû. CHP, bi vî rengî ew xate wê, heta vê deme me jî, dewletê ew li dijî kurdan bikarhanîya. Di roja me de jî wê bikar dihêne. Ku mirov bahs bike ku di roja me çîma yekî weke Kiliclaroglu hanînîna ser serê wê partiyê, hinekî jî bi vî rengî bi vê xate politikaya dewletê ya ku li ser temenê înkara kurdan dimeşê ve têkildar a. Di roja me de jî, bi vî rengî dewlet, hê jî li ser wê partiyê re tê bi ser kurdan de. Ev CHP´ya di vê demê de ku navê wê qaşo bi çareserkirina pirsgirêka kurd ve girêdayî tê ser ziman û hinekî jî şêrîn tê dayîn nîşandin, hinekî jî bi vir ve girêdayî ya. Di aslê xwe de, ev politikayeka dewletê ya ku li ser CHP re tê meşandin a. **Rengê vê politikaya dewletê ya ku di roja me de tê gotin ku qaşo "hewldanên çareserkirina pirsgirêka kurd" û bi kiliclaroglu re meşandin, ji politikayên dewletê ên ku di dema Ecewît de ku li ser navê "karaoglan" re dihatina kirin û bi rê ve birin ne cûdatir in.** Karaoglanê wê demê ku dihat xwestin ku kurd bi wî ve werina girêdan, bûya CHP´ya roja me ku qaşo "hewl dide ku pirsgirêka kurd çareser bike. Zihniyet, heman zihniyet a. Ne di wê demê de dewletê xwestibû ku ser Karaoglan re pirsgirêka kurd çareser bike û ne jî di vê demê de bi van gotinên ku li ser CHP re dihên gotin ku qaşo "hewldanên çareserkirina pirsgiurêka kurd" wê pirsgirêk kurd çareser bikin. Tenê wate van gotinên CHP ev in. Dewletê heta roja me li ser AKP re politikayeka aqil ji rê birinê bi rê ve bir, lê êdî ew politika jî bi şer ku AKP li dijî kurdan da destpêkirin re teşîr bû. Dewletê, êdî xwest ku heman gotinên ku ji dewletê T. Ardogan û radayarên AKP bi kavê qaşo "çareserkirin

apirsgirêka kurd" dane gotin, nûha jî bi devê CHP´lîyan dide gotin. Bi vê jî, dewlet dixwezê ku hinekî demê qizinc bike. Bi wê dixwezê ku hinekî dîn jî, wê pêvajoya înkarê ya li ser serê kurdan bi şerê ku bi kurdan re dide bide domandin.

Bi vî rengî, weke ku dewletê projeyeka xwe li ser CHP re kirîya meriyetê de. Bi vî rengî, rayadarên CHP´î jî weke ku ketina nava seferbelikê de li kurdistanê. AKP, êdî ji kurdistanê hat paqijkirin. Li wan cihên ku AKP jê hat paqijkirin, nûha jî, dewleta hewldana wê heya ku karibê CHP li wan deveran bicih bike. Ew hewldanên CHP, ên ku di van deman de di rojevê de cih digir in, hemû jî bi vî rengî bi plan in. Lê divê ku mirov bi vê re bibêje ku ev plan ji xwe re pêşneketîya. Heya AKP jî jê heya. Ji ber ku CHP û AKP, di vê yekê de li kurdistanê bi hev re kar dikin. Cihê ku yekê lê windakir, dixwezin ku ya din li wir biser bikeve. Li cihê ku AKP jî ku kurdistanê lê biserkeve, li wir AKP û CHP jî bi hev re ji bo AKP kardikin. BI heman rengî li cihê ku derfet hebe ku CHP wê lê biserbikeve, li wir jî AKP û CHP bi hev re kardikin ji bo serkevtina wê. Bi vî rengî herdû jî li kurdistanê bi hev re kar dikin. Armanc ji vê ew aku dewlet li wir li ser serê kurdan were hiştin.

Di van rojên dawîyê de ku Parlamenterê CHP yî ji aliyê hêzên parastina gel HPG ve hat bincavkirin, bi teybetî, ev rûyê CHP derket li pêş. Bi vî rengî, politikayên dewletê ên ku dewlet wan li ser CHP re dide bi rê ve birin, bi vî rengî, di aslê xwe de, weke ku derbeyek xwarin. Lê ev politikaya dewletê li ser AKP re û CHP re hê li kurdistanê bi vê re diçêt. Hê bidawî nebûya. Di vir de, hem li ser van binçavkirinên weke ên wekîlê CHP Huseyin Aygun re ku bûn, li ser wan binçavkirina re divê ku nivîskarên kurd jî vê rastî û aliyê dewletê jî divê ku bi dîroka wê ya li herêmê re li ser bisekin in û bênin û li berçavê kurdistanîyan û cihanê raxina li berçav. Piştî AKP re, ku ew ji kurdistanê hat paqijkirin, dewletê, weke projeyekê çêkirîya li ser CHP re û dixwezê ku li ser wê re hebûna xwe û politikayên xwe yên li dijî kurdan li herêmê bide domandin. CHP, partîyeka ku di dema wê komkujiyên weke ên Dersimê pêk hatin bû. Di dema wê de, weke ku di nava xalkê de jî tê ser ziman, ji salên 1923´an û heta ku tê salên 1950´î û hwd, ser dusad hezar kurdî re ji ber ku kurd hatibûbûna kuştin. Hemû politikayên bişavtinê(asimlasyon)ê li ser CHP re li kurdistanê û bi teybetî li Dersimê hatina meşandin. Bi binçavkirina Huseyin Aygun re, di aslê xwe de, ev rûyê dewletê, hatîya rayîxistin li berçav. Ew binçavkirin, li ser navê wan politikayên dewletê ên komkujiyan ku li dersimê û li herêmên din ên kurdistanê bi rê ve birina re bûya.
.. CHP´ê, weke partîya komarê ya destpêkê ku tê gotin ku ji aliyê M. kemal ve hatîya ava kirin a. Di destpêka komarê de, hemû politikayên jenosîda li ser serê kurdên elewî ku li dersimê hatina meşandin, bi fermana wê hatina meşandin. Ê ku, fermane komkujiya Dersimê daye CHP´ê ya.

Ji wê demê û heta vê demê, çi di zihniyeta vê partîyê de guharî? ne ti tiştek. Di wê demê de, hertimî hewl didan ku herkesekî bikina tirk. Di wê demê de, di dema ku Îsmet Înûno dibe serokê wê, ew dibêje ku **"ên ku ne tirkin, divê ku em wan bikina tirk."** Î ro jî, di sale 2013´an de, heman gotin ji aliyê serokê vê demê Kemal kiliclaroglu ve tê gotin. Herî dawî, li ser nîşaqên perwerdeya bi zimanê dayikê re li ser serokê CHP´ê û serokê wê Haluk Koc derdikeve ber çapameniyê û dibêje ku **"xwandavanên ku zimanê wan ê dayikê ne zimanê tirkî ya wê mecbûrî bi zimanê tirkî perwerde**

**bibînin."** Ev gotina Haluk Koç, ne tenê nêzîkatîya CHP´ê ya di vê demê de dihêne ser ziman. Her wusa, nêzîkatîya wê ya nîjadperest û faşîzan ya demên berê jî dihêne ser ziman.

Ev partîya Faşîzan a bi navê CHP`ê, heta roja me, bi xapînokan elewîyên li dora dersimê ên kurd xapandina. Lê wusa zan dike ku wê karibê, weke ku wan dixapanê, wê karibê hemû kurdan bixapanê. Ev partî û serokên wê, wî mafî weke Nazî´yan di xwe de dibînin ku bibêjin ku "xwandavanên ku zimanê wan ê dayikê ne tirkî jî bê, mecbûra ku bi zimanê tirkî bên perwerde kirin." Ev nêzîkatî, ji nêzîkatî û zihniyeta Nazîyan bêşereftir û bêrûmettira.

Ez bixwe, dema ku wê piştgirîya hin kurdên elewî ji CHP´ê re dibînim, wusa li min tê û tê berçavên ku weke ku çend Cihûyên ku di wergehên Nazîyan hatina qatil kirin ku ji tirbên xwe ra bin û herin û di nava partîya nazîyan de qayda xwe bikin û xwe di nava wê de bicih bikin. ..

Ti farqa CHP´ê, ji partîyan Nazîyan tûna ya. Partîyan Nazîyan jî, digot ku "wê hertişt bi almanî bê." Bi wê re jî, nazîyan bo nîjada alman digot ya "layiqî hertiştî" û "nîjadperest puxte" Li gorî, zihniyeta nazîyan, wê hertişt bi almanî ba û wê herkesekî almanî bizanîya. Hîtler, bo serdestîya wê nîjadê tekoşîya. ..

**Î ro jî, li tirkiya xalkên din hena, li gorî zihniyeta CHP´ê û herwusa ya T. Ardogan jî, divê ku "bi mecbûrî bi zimanê tirkî bixwênin" û mazin bibîn. Ji ber vê yekê, nabê ku bi zimanekî din perwerde bibe. Xalkên ku hena li Tirkiya, çend ku "zimanê wan ê dayikê ne zimanê tirkî jî bê, divê ku bi mecbûrî bi zimanê tirkî bixwênê." Vê yekeê weke "mecbûrîyet"ekê jî dihênin ser zman. Li ser navê CHP´ê, vê yekê weke "mecbûrîyet"ekê dihêne ser ziman. Bo CHP`ê û Haluk Koç, zimanê tirkî giringa ku bi wê perwerde bibînin. Zimanên din ên xalkên din, ne giring a û nabê ku bi wan perwerde bibe. Ev zihniyet, ji zihniyeta Hîtler jî paşverûtira. Cihê vê zihniyetê, di ti ahlaq û felsefe û olê de tûna ya. Tenê, cihê wê di zihniyet û faşîzma hîtler de heya.**

Li gorî zihniyete Haluk Koç û partîya wî ku bi zimanê wî yanî bi zimanê tirkî perwerde were dayîn, wê ew perwerde pêşketî û pêşvarû bê. Lê ku bo zimanên din ên xalkên din bibe, ew nabê pêşverû. Di vê temenê de, bi vê zihniyetê, heta roja me, komkuji û jenosîd kirin. Bi wê zihniyetê, di roja me de jî, komkujiyên di temenê zihniyetê de dikin.

Di aslê xwe de, ev zihniyeta ku Haluk Koç, bi gotinên xwe re hanî ser ziman, hem zihniyeta partîya wî ya û hem ya AKP´ê ya û hem jî ya MHP´ê jî ya. Yanî, gotinên din, ên bi navê demokrasiyê, tenê bo maskekirina vê zihniyeta dewletê û ya van partîyan dihê bikarhanîn. Her wusa, ol jî, bi rêya AKP`ê, weke maske ji wê re hatîya bikarhanîn û îstismarkirin.

**Berî î ro ku di roja 19´ê êlonê de ku Haluk Koç, van gotina bi lê dike, berî wî jî, gotinên ku em bi vî rengî zihniyeteka faşîzan bênina ser ziman, me ji Birgûl Ayman gûler bihîstîbûbûn. Bîrgûn Ayman gûler jî gotibû ku ""nîjade tirk û miletê kurd nabê ku bibe wek hev." . Bii vê rengê, ku em bipirsin ku çi farq di nava gotinên Bîrgûl Ayman Gûler û ya Haluk Koç de heya? Zihniyet heman zihniyet a. Ev zihniyet, di temenê şerê dewletê ê vî 30 salî ê bi kurdan re de ya**.

..

**Li ser rastî û dîroka tarîqate kurd a naqşîbendî. ..**

Dema ku em li rengên pêşketina civate kurd binerin, em rastî gelek awayên pêşketinê ên bi wê re tên. Bi teybetî, li ser olê ev reng û awayê wê bi teybetî hena. Li kurdistanê, hertimî ol weke amûrekî ku bi wê dixwezin ku bi wê civate kurd bikina bin kontrolê de hatîya bikarhanîn. Ev hewldan, wê ji sedsale 19´min û pê de, li dîjî kurdan zêdetir bibin. Li vir, dema ku em bahse oldarîya kurdi bikin, hinekî jî di vê warê de divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Ola kurdan û ankû rengên olî ên ku di nava kurdan de pêşketina çawa ku li dijî civate kurd bixwe hatina bikarhanîn.

Di aslê xwe de, em dema ku li rewşa olê ya di nava kurdan de dinerin, em dibînin ku heta sadsalên 15´min jî, wê di temenê pêşxistinaka civatî ya kurd de were bikarhanîn. Î ro zêde birhan û dokument ji demên Şadadî û Merwanî di destê me de tûna na, ku wan çendî bi civatî li wê hizirî na. Lê ji awayê wan ê bi herîkîna dîrokê mirov fahm dike ku rengekî kurdistanî jî heya. BI teybetî, di dema Şadadîyan de, em biawayekî vekirî rastî vê rastîyê tên. Şahên şadadî ên weke ´mûhemedê kurê şadadî´ ku weke şahê dewleta kurd a şadadîyan ê pêşî ya, giranîyaka wî ya mazin di dîroka wê demê de heya. Piştî wî re, şahên Şadadî, ên weke Şawûr, Mazrûbendî, Fadl, elîyê askerî û hwd, çend ji wan şahên vê dewleta kurd ên herî giring û bi bandûr in. Piştî wan re di dema dewleta kurd a Merwanîyan, Badê kûrê dostik, Aliyê kûrê merwan û hwd, çend ji wan şahên giring ên vê demê na jî. Bandûra wan bi kirinên wan re li dîrokê mana.

Çend ku em li dîroka wan dinerin, em vê yekê bi awayekî vekirî dibînin. Her wusa, weke dewlet jî, pêşketî na. Dewletbûna wan, di dema wan de pêşketîya. Î ro, dema ku hinek dîrokzan, dema ku van demên dîroka kurd û kurdistanê şîrove dikin û hwdl didin fahm bikin, di serî de weke gazinekê dihênin ser ziman û dibêjin ku ´ ji wê demê zêde agahî û dokument di dest tûna na´. Ev rast a. Lê ev rastî, ne weke rastîyeka ku em dikarin temenê ne afirandina wan de fahm bikin a. Ji wê zêdetirî weke rastîyeka ku bi talan û komkujiyan û tûfanên ku hatina ji holê rakirin re ku ji rabûya, divê ku mirov werêne ser ziman. Van desthilatdarîyên kurd, û her wusa desthilatdarîyên ku ên berî wan jî ku bi dewletî jîyane ên weke ´dewleta kekoyîdîyan a kurd´, dewleta eyerîdîyan a kurd ´ û hwd jî, heman rewş bi wan re heya. Berî van deman jî, di demên sasanîyan dejî, heman rewş heya. Di dema sasanîyan de, çend ku desthilat kûrkeyê kurd ´keyûş´ xwedîyê pirtûkxaneyên mazin bûna, î ro ji wan ti tişt di dest de tûna ya. Bi wê re jî, weke rastiyekê ku mirov bibêje ku civatên avesta ku piştî Zerdeşt re heta serdema Manî û hinekî piştî wî re jî ku dijîn bi ser hezar salî re xwediyê dîrokek dirêj a. Lê ev dem û pêşketinên wê çendî ku hatina qaydkirin û nivîsandin jî, hatina ji holê rakirin, tûnakirin û jiholêrakirin. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, bibêje ku avesta jî, xwemal(orjînal)a wê hatîya tûnakirin û ji holê rakirin.

Dema ku rastî ev bin bi dîrokê re, em nikarin bahse ne afirandinê bikin. Em dikarin bahse afirandê bikin. Lê di temenê wê gotina "ne afirandinê" de em dikarin di temenê

"tûnakirin û jiholêrakirin"´ê de bahse wê bikin. Ji ber ku ya ku bûya jî ev bûya. Piştre, di serdemên piştre jî, ev bûya. Her wusa, piştî derketina ola îslamê jî, heman tişt hatîya serê kurdan. Minaq, tenê ku em bahse dîroka kurdistanê û kurdan bikin, wê Cizîra bota weke "pirtûkxaneyekê" navê wê bidîroka kurdistanê re were ser ziman. Li wir di serdema Îslamê de jî ku ji dibistanên demî ên weke ´azharê´ ku ji wan maztir û bi bandûrtir jî "medreseya sor" hebû. Tişî pirtûk û nivîs bûya. Pirtûkxane di wê de hebûna. Lê hatîna tûna kirin. Her wusa, ev rewş hemû jî di temenî ji hevdû felisendina civate kurd de hatina kirin. Lê hê jî, ev rewş bi heman rengê xwe yê berê didom in.

Di serdemên îslamê ên li kurdistanê de jî, pirr zanyar hatiya afirandin. Tenê Melayê Cizîrî ku bahse wî tê kirin, tê gotin ku 43 berhem nivîsandina. Feqiyê Teyran ne kêmî wî nivîsandîya. Lê î ro, yek jî ji wan berhemên wî di destê me de tûna na, ji bilî çend qasîdeyên wî yên ku bi desvî hatina parastin û di roja me de hatina qaydkirin û pê de. Dema ku rewş ev bê, wê çaxê, ev rewş hewcedarî bi mihtacî fahmkirinekê heya. Ev rewş hemû bi hebşna civate kurd ve girêdayî divê ku mirov werêne ser ziman. Di nava çanda kurdan a çîyayê û hwd de, hertimî gîyaneka berxwedêr hebûya. Çand û bawerîyên kurdan ên weke Mîtratî, Zerdeştî û Manîtîyê de jî, ev gîyan bicih bûya. Di serdema Mîtra de hewldanên qatilkirina wî ku weke ´rîweyet´ tên vegotin, dema zerdeşt de ku weke ´rîweyet´ tê vegotin hewldanên kuştina Zerdeşt, piştî Mîtra û Zerdeşt re derketina Manî û qatilkirina wî bi awayekî hovane, Piştî Manî re ku weke şopdarên Manî Mezdek, Hûrem û Babek, derketina wan û bi awayekî yek bi yek di dema wan de qatilkirina wan û ´trejedîya wan´ ya ku bûya malê dîrokê jî, vê rastiya dîrokî radixe li berçav.

Piştre jî, di dema Îslamê de tişta hatî serê Hallacê mansur, Nesimî û hwd, bi vê rastîya civatî a li kurdistanê ve girêdayî divê ku mirov werêne ser ziman. Ev rastî hemû jî, hinek teybetmendiyên wan ên hevbeş hena. Ew jî, ew in ku ev mirov di demên xwe de li dijî desthilardarîyên demê li gorî nirx û çand civatî tevgerîyana û bûna korbanê wê rastiyê. Piştre jî, bi rêbazên cûr bi cûr hatina qatil kirin. Ev rastîya gîyane berxwedêr ku xwe bi van mirov û minaqa wan re dide berçav, ew gîyan û rastîya civatî ya kurdistanî û civate kurd a. Ev rewş, wê piştre di serdemên sedsale 20´an û 21´ê de jî xwe bide berçav. Her wusa, weke oldar û hwd, şêxên kurd, ên weke Şêx ubeydullahê Nehrî, Şêx Sedî, Şêx Berzencî û hwd, çend ji wan mînaqên dawî na. Ev şêx jî, weke gelek şêxên dîn, ji kevneşopîya tarîqa kurd a naqşîbendî ya. Tarîqate kurd a naqşîbendî li ser kevneşopîya xwe ya sûnnîtiyê re em dikarin wê bibina heta sedsala 15´min jî. Lê vê tariqate kurd jî, bi xwe jî, bi demê re di xwe de pirr guharîn buhurandiya. Tê zanîn ku berê di nava kurdan de li şûna sûnnîtîyê ´şafîîtî´ li pêş bûya. Ev tarîqat jî, bi vê kevneşopîyê bûya. Lê piştre, hin bi hin di temenê sûnnîtîyekê de peresendin bi xwe re daye çêkirin û guharî ya.

Ev tarîqate kurd a naqşîbendî, xwediyê kevneşopîyeka desthilatdarî û rêveberî jî jî ya. Di nava kurdan de, bi vê tarîqatê û aligirên wê re, weke ku tebeqeyeka civatî ya kurd a sêyemin afirîya dibê. Civate kurd, ku di nava wê de aşîrî pirr zêde li pêş bûya jî, wê piştre di temenê ji hevdû felişîna vê aşîrtiyê wê kurmancîtî pêş bikeve. Lê ev jî, lawaz dimêne. Lê weke tebeqeyeka ku van herdû beşên civate kurd ku di nava xwe de digihêne hevdû û hewl dide ku ji wan re bibe bersiv jî, ev tarîqatên kurd ên weke naqşîbendî ya. Ev tarîqate kurd a naqşîbendî, navenda wê herêma botanê û başûrê kurdistanê ya. Her wusa, li deverên din ên kurdistanê jî aligirên wê pirr zêde hena. Her

wusa, Ev tarîqate kurd a naqşî jî, weke civatekê hertimî hebûna xwe parastîya û domandîya. Bo vê yekê, fêr, ders û cerbên wê ên civatî bidemê re pirr zêde pêşketina. Temenê pirranîya serhildanên kurd ên di sedsale 18´min û 19´min de ev tarîqate kurd a naqşî aligirên wê û her wusa şêxên wê yên serek û rêveber diafirênin.

Ev kevneşopîyeka tarîqate kurd a naqşî, wê di sedsale 20´an de jî ku ne bi tememî bê, wê xwe bide domandin. Pêşengên serhildanên kurd ên weke serhildane şêx Seîd û şêx berzencî û hwd, ji wê kevneşopîyê na. Lê em divê ku vê yekê li vir binxat bikin û bibêjin ku wê rastîya svê tarîqate kurd a naqşî di destpêka sedsale 20an de hin bi hin veguharihê. Şêxên naqşî ku hertimî xwe weke berpirsîyarên parastina mafên civatî ên kurd dîtina, wê hin bi hin navê kurdî jî ji lîteretûra xwe derbixin. MInaq, şêxên dawî ên kurd û naqşî, şêx esadê erbilî ya ku ji başûrê kurdistanê di destpêka sedsalê de tê Îstembûlê ku doza mafên civate kurd ji Osmanîya bike.. Lê dema ku tê, pêşî bi hênceta ku aqilê xwe windakirîya wî digrin û dikina nexweşxaneya dînan de û piştre wî û kûrê wî Elîyê naqşî bi hevdû re tên birin li sêdarê û tên bi darve kirin. Piştî wî re wê weke şêxê dûyemin ku em bahse wî bikin ku ji vê kevneşopîyê ya şêx Seîdê pîranî ya. Wî jî, serhildan kirîya û piştre ew serhildana wî serneketiya û ew hatîya girtin û hatiya birin li sdarê. Piştî van şêxên kurd ên vê kevneşopîya naqşî, em zêde wusa ti şêxîtîyê bikin ku bo civate xwe rabûya ser pîyan. Li başûrê kurdistanê, tevgera berzanî û talabanî, hinekî jî bi bandûra naqşî û kevneşopîya wan re xwe girt û pêşket. Lê wan jî, aşîrtî ji xwe re kirina temen. Piştre xwe zêde ne dane li olê. Ji ber ku wan jî, bi demê re dîtîya ku rewşa olê hatîya xistin li rewşeka çawa li dijî civate kurd.

Ev tarîqate kurd a naqşî, ku hertimî bûya temenê bertekên civatî ên civate kurd li dijî desthilatdaran û temenê berxwedanên civatî ên kurdistanî afirandîya, piştre weke ´haspê xasandî´ lê hatîya kirin. BI tememî têgiha kurd û kurdistanê ji navaroka wê hatîya derxistin û ew bi rêbazekî din hatîya xistin li şeklekî din de. Di dema serhildane Şêx Seîdê pîran de, nîqaşên li ser "´dayîna piştgirîyê´ û ´ne dayîna piştgiryê´ a Seîdê Nûrsî û ankû seîdê kurdî li wê serhildanê jî, di zane min de giring in ku mirov divê ku wan di vê temenê de safî bike. Ji ber ku weke haspê xasandî li vê tarîqate kurd kirin jî, ji demê û pê de destpê dike. Seîdê kurdî(nûrsî) ku bi navê "bedîûzzaman" jî tê nasîn, di vê demê de bi şîroveyên wî yên ku wî pêşxistina wê, guharînên mazin di vê xate naqşîtîyê de werina kirin. Her wusa, wê li ser wan şîroveyên wî re, navberek were xistin li nava wê tarîqate û civate kurd û ankû bi tememî olê de jî. Bo vê yekê, em divê ku vê yekê bi tememî baş fahm bikin.

Wusa tê ditin ku gelek vegotin û şîroveyên bedîûzzaman bixwe jî hatina guhartin. Di vê temenê de divê ku mirov li ser wî û hizrên wî jî bisekinê. Ji xwe, piştre bi lêkolînan jî hat ditin û piştrast kirin ku gotina "kurd" û "Kurdistan"´ê ji nava pirtûk û şîroveyên Bedîûzaman jî hatîyan derxistin. Ev bi awayekî vekirî hatîya ditin. Ev ji ber çi hatîya kirin? Gelek sedeman em dikarin bi bersivandina vê pirsê re li vir li dûv hevdû rêz bikin. Lê sedema sereka ew a ku olê ji temenê serhildanên civatî ên kurdan û kurdistanî were derxistin a. Bo vê yekê, ew temenê ku li ser wê serhildane uyebdullahê nehrî, şêx seîd û şêx Berzencî û hwd, ku bûna, ku wan ji holê ra bikin. Bo ku temenê wan serhildanên wê rengê de ku piştre bibin jî ji holê ra bikin ev hatîya kirin. Hinekî jî, di destpêka komarê de, ´şîroveyên fermî´ ên rayadarên komare tirk ku serhildane şêx seîd, weke ´serhildanaka paşverû´ û ´ku bi armanca hanîna rejimek şariatê´ jî, divê ku mirov hinekî di vê temenê de wan şîrove bike û fahm bike. Piştre jî, hizrên bedîûzzaman

ku hatina ´dewşîrme kirin´, wê bên xistina temenê wê derxistina olê ji temenê civate kurd û serhildanê û hwd. Her wusa, li ser wan şîroveyên ´dewşîrme´ re derxistina li holê fethulleh gulen jî, "weke nûnerê vê civate nûrsîyan" jî, hinekî jî bi vê armancê ve girêdayî divê ku mirov werêne ser ziman.

Li vir, di serî de divê ku mirov fahm bike ku Fethulleh gulen, rengê asîmlekirî û tirkkirî ê tarîqate naqşîyan jî dihêne li berçav. Di vê temenê de, di temenekî ku ev tarîqate kurd a naqşî ku wê çawa li dijî civate kurd û pêşketina wê were birêxistin kirin, di wê temenê de ev tevgera fethulleh gulan hatîya birêxistin kirin. Di vê temenê de jî, di temenê fethulleh gulen de, hemû sazîyên îstîhbarî ên saloxgerîyê ên tirk weke alîkar û pêşxistina wê hena. Li ser vê tevgera fethulleh gulen re, li gorî rêbazên sesale 20an ên tevgerên çapgir rêxistiniyek hatîya pêşxistin. Ev rêxistinî jî, dulingî û ankû dû rûyî ya. Lingek û ankû rûyek li ser rûyê ardê ya. Rûyê dûyemin jî li bin ardê ya ku zêde ev rû nayê zanîn a. Ji xwe rûyê ku vê tevgerê birêve dibe jî ev rûyê dûyemin ê li bin ardê ya. Li kurdistanê, welatên ewropî, welatên arab û welatên afrîqa ev tevger hatîya birêxistin kirin li ser mizgeft, malgeh, dibistan û hwd re . Di temen û têgiha împaratoriyekê de hatîya birêxistin kirin.

Her wusa, ev tarîqate ku di demên dîrokê ên berê de di temenê serhildanên kurd û kurdistanî de bû, piştre hewl hatîya dayîn ku di temenê çêkirina dijberîya li ser wê re ku li dijî tevgerên kurdistanî ên weke PKK´ê û hwd re ku karibin, vê tarîqate naqşî bikina rengekî dijberî civate kurd û dijminê kurditîyê de. Di vê temenê de ku karibin, bi rê û destê vê tarîqate kurd, ku karibin derbeyekê li civate kurd bixwe jî bidin. Ev rastî, êdî bi awayekî vekirî hatina ditin û kifşkirin û hatina derxistin li holê li berçav.

Li vir, di serî de divê ku mirov vê yekê bi awayekî vekirî bibêje ku tarîqate kurd a naqşî ku di demên xwe tên berê de di temenê parastina nirxên civatî û kurdistanî de temenê berxwedan û serhildanên kurdistanî bû, êdî bi vî rengî dihê xistin xizmeta tafisandina bertekên civatî ên kurdistanî de. Her wusa, rêxistinên terorê ku li ser olê re hatina bi rêxistin ên bi rengê DAÎŞ´ê û hwd jî, di temenê birêxistinkirina wan li dijî pêşketin û civatîtîya kurd û kurdistanî de, dîsa ev rêxistinîya dewşîrme ya li ser wê re di hat xwestin ku naqşîtîyê wergerênin û biqûlûbênin vajî civate kurd a fethuleh gulen heya. Weke ku çawa ku civate kurd zimanê wê hatîya qadaxakirin û hewl tê dayîn ku were asimle kirin, her wusa bi heman rengî û zihniyetê di temenê asîmlekirin, dewşîrmekirina vê tarîqate kurd a bi navê ´naqşî´ de jî, heman politika hatîya birêxistin kirin û bikarhanîn. Hê jî, ev rêxistinkirin dihê bikarhanîn. Her wusa li dijî civate kurd dihê birêxistin kirin û bikarhanîn. Em li vir, divê ku vê rastiyê di destpêkê de pirr zêde û baş fahm bikin û werênina ser ziman. Dema ku em van rastîyan baş fahm ne nekin, emê êdî bi başî fahm nekin ku ku çawa ew tarîqate kurd a naqşî ku bi kevneşopîya xwe re di demên xwe yên dîrokê de ku di temenê berxwedan û serhildanên civate kurd û kurdistanî de bû, çawa hat xistin temenê dijberî heyînî û hebûnî civate kurd û her wusa li ser wê re çawa zihniyetek hat afirandin ku bi wê rêxistinên tûndrew ku li dijî heyînî û hebûnî civate kurd birêxistin bikin û derxina li holê. Di aslê xwe de, vê pêvajoya derxistina li holê a DAÎŞ´ê, di vê temenê de divê ku miriov hûrûkûr lêbikolê û divê ku mirov şîrove bike.

Pêvajoya derxistina DAÎŞ´ê li dijî civate kurd, hinekî jî, vê rengê dewşîrmekirina tarîqate kurd a naqşî jî, ji me dixwezê ku mirov lê bipirsê. Divê ku mirov wê hilde li dest û fahm bike. Her wusa, ji ber ku di temenê birêxistinkirin mazinkirina vê rêxistina

hov û kojar a DAÎŞ´ê de ev rêxistinîya fethuleh gulen a lingê wê yê duyemin ê li bin ardê heya. Bi vê rengî, divê ku mirov fahm bike ku ka çawa tarîqate kurd, hatîya dewşîrmekirin û li dijî civate kurd bixwe jî dihî bikarhanîn.

Li kurdistanê, tarîqate kurd a naqşî, di serdemên berê ên dîroka civatî a kurd û kurdistanê de xwediyê rêxistinîyeka pirr xort û kûr a. Her wusa, ev rêxistin, weke dewlet û desthilatdar jîya ya. Ji binî ve ya ku hebûna civate kurd birêvebirîya jî ev bixwe bûya. Şêxên dergehên vê tarîqata kurd a naqşî, weke şêx Seîd û hwd, pêşengî ji serhildanên kurd û kurdistanî re kirina. Ji xwe piştî vê serhildanê re, bi politikayên dorpêçkirina civate kurd re li ser guhartina navaroka hizrên bedîûzzaman re ev gûhartîn û asîmlekirin li ser naqşîtîyê re hat pêşxistin. Rêxistina fethullet gulen, di aslê xwe de rengê asîmlekirî ê vê tarîqate kurd a naqşî jî, temsîl dike. Bi vê rengê, divê ku mirov fahm bike ku wê çawa vê rêxistinê bikina dijberî civate kurd de, li ser wê kar û xabat kirîya. Şêxên kurd ên piştî vê serhildan şêx seîd, hinekan ji wan ji tirsa dengê xwe dernexistina. Hinekan jî, di temen berjewendîtîyê malbatî de li rex dewletê cih girtina. Di vê temenê de, êdîçi hatîya serê civate kurd û çi bêadeletî hatîya kirin, li ber wê ti dengê xwe dernexistin. Lê şêxên kurd ên ji wê kevneşopîyê ên weke "şêx Mihemed Nûrûllah" ku navend û dergeha wî li Cizira bota jî bû, ji ber deng derxistina wan, bi awayekî ji aliyê rayadarên rejima tirk ve hatina qatil kirin. Di dewama qatilkirina şêx Mihemed Nûrûllah de divê ku mirov qatilkirina Şêx Maşûqê Xizmewî ku dergeha wî li rojavayê kurdistanê bû, hatîya qatil kirin.

Şêx Mihemed Nûrûllah jî û şêx Maşûqê Xiznewî jî, du şêxên ku bandûra wan li ser civate kurd pirr zêde hebûn bûn. Her wusa, bi demê re kevneşoppîyekê şêxîtîyê di nava kurd de jî afirandibûn. Di aslê xwe de bo ku wê kevneşopîyê ji holê ra bikin û tûna bikin ew herdû hatina qatilkirin û tûna kirin. JI ber ku ew rewşa tarîqate kurd a naqşî ku hatîya dewşîrmekirin û bi wê re hatî asîmle kirin û bi wê asîmlekirinê re jî ku hatîya xistin bin kontrolê de, bo ku ji dest neçê û xira nebê ev herdû şêxên kurd hatina qatil kirin. Yanî, di vê temenê de, divê ku mirov di temenê politikayên olî ên ku êdî li ser tarîqate kurd a naqşî re ku hatina pêşxistin re mirov li van herdû qatilkirina binerê. Bo vê yekê, ev herdû qatilkirin bi plan hatina kirin.

Tarîqate kurd a naqşî, di vê temenê de bi politikayên bi demê re ku li ser wê hatina meşandin re hatîya xistin bin kontrolê de. Bi wê re jî, ev tarîqata kurd, di temenê ku êdî kurd nikarin li ser wê re rêxistinîyeka olî pêş bixin û her wusa ku karibin berxwedan û serhildanên weke ên serhildan şêx Seîd û hwd birêxistin bikin, bi vî rengî hatîya kontrol kirin. Di nava kurdên bakûrê kurdistanê kurdistanê de birêxistina rêxistinên li ser olê re ên weke "huda-par" û hwd ku li ser olê jî, divê ku mirov di çerçoveya vê tedbîra rejima tirk a li dijî kurda de werêne ser ziman. Di rengê oldarîya şêx Mihemed Nûrûllah û şêx Maşûqê xiznewî û hwd de kevneşopîya olî ya kurd û kurdistanî hebû û ew hat ji holê rakirin. Lê li aliyê din jî, li ser rêxistinên weke ´huda-par´ê û hwd re jî, rêxistinîya olî ku ji aliyê rejimê ve hatî xistin dijjberîya kurd û civate kurd de hatîya birêxistin kirin a. Yanî, di temenê dûrxistina kurdan ji olê de, ev rêxistin hatîya pêşxistin. Ev rêxistin, rêxistinek îstihbarî ya rejima tirk a. Çend ku weke rêxistineke ku rengê wê yê "kurdî" heyî dihê dayîn nîşandin jî, ev tenê bi armanca xapandinê ya.

Armanca li ser birêxistinkirina rêxistinên weke ´huda-par´ê û hwd re, ew a ku kurd têgihek lî bidest nexin û li dora wê newina li cem hevdû û li ser navê civate kurd ti hizrê newênina ser ziman a. Bi vê re jî, armanc ew a ku ti rêxistinên olî ku weke di nava

araban de bi "birayên misilman"(´ixwani-l mislimin)" û ankû weke ku bi îranê ve girêdayî hizbillehên kurd ku civate kurd diparêzên dernekevina li holê. Di temenê van de divê ku mirov li van poliitkayan bihizirê. Dema ku mirov di vê temenê de li van politikayan dihizirê jî, divê ku mirov di temenekî ku bi kurdan re şer dike derxistina rêxistinek weke ´huda-par´ê û ankû DAÎŞ´ê li dijî civate kurd û qatilkirina şêxên kurd ên weke şêx Mihemed Nûrûllah û şêx Maşûqê xiznewî û hwd ku ji aliyê rejima tirk û hwd ku dihên kirin bi hevdû re di temenê zihniyetekê de hilde li dest. Dema ku em van aliyan fahm nekin, emê fahm nekin ku çima olê bi kurdan re didina şer kirin. Her wusa bi wê re jî, mirov wê fahm neke ku ka çima navê "kurd" ji nava olê hatîya "paqij" kirin. Di "ansîklopedîya îslamî a tirk" de û her wusa bi wê re di ti belgeyên fermî ên olî ên dîyanete tirk de ku mirov rastî navê kurd nayê û ku navê kurd bi temî hatîya "sansûr"kirin jî, divê ku mirov di temenê vê politika û zihniyetê de hilde li dest.

Di aslê xwe de, ku mirov li dîroka tarîqate kurd a naqşî bihzirê, bo kurdistanê û civate kurd, di rengê ´hizbileha îranê û îxwani-l mislimîna cihane arab de ya. Bi heman rengî tarîqate kurd a naqşî ku pêşî bi temenê xwe re xwe li ser şafîtîyê birêxistin kirîya û piştre di temenê sûnnîya demê de têgiheka hevbeş ya olî ku şafîtîya kurdî a berê û sûnnîtîya demê jî dikê nava xwe de xwediyê dîrokek demdirêj a. Ev dîroka wê tarîqata kurd, divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê û wê fahmbike. Di aslê xwe de, ev politikayên rejima tirk ên li dijî civate kurd ku li ser olê re dihên meşandin, ku ev rastîya tarîqate kurd a naqşî û pêvajoyên dewşîrmekirina wê bi politikayên dewletê re werina fahm kirin, wê bi tememî ji aliyê civate kurd ve were vala derxistin. Î ro, temenê politikayên olî ên di temenê dijberîya civate kurd de ku rejima tirk pêşxistî ku li ser cemaeta fethulleh gulen û hwd re bê û ankû li ser dîyanetê û sazîyên perwerde ên weke "îmam hatîp"an re bê, di temenê wê li ser vê lingê olî ê bi tarîqate kurd a naqşî re heya. Di vê temenê de, fahmkirna vê rastîya dîroka tarîqate kurd a naqşî, wê temenê van politikayên dewletê ên di temenê şikendina civate kurd ên li ser olê re jî vala derxê. Li vir, bi awayekî rêkûpêk, di berçav de derbas kirinan dîroka tarîqata kurd a naqşî, wê van rastîyan hemûyan raxê li berçav.

Em dema ku bi vê rewşê re li tarîqate kurd a naqşî dihizirin, em dibînin ku li ser wê re û bi kontrolkirina wê ya bi vî rengî re, aliyekî civate kurd ê dîrokî û pirr giring dihê kirin bin kontrolê de. Di serî de divê ku mirov van aliyan fahm bike. Ol, piştî sedsala 20 ´an ku hat xistin bin kontrolê û pê de, êdî ew rola xwe ya bo civate kurd neleyist. Her wusa, bo ku cardin serhildanên ku li ser olê re hatina birêxistin kirin ên weke serhildana şêx Seîd û hwd nebin û hwd, çare di asîmlekirin û dewşîrmekirina tarîqate kurd a naqşî bi rêbazên ppêşxistina weke ya fethullehçîyan û hwd re hatîya kirin. BI teybetî, li ser tarîqate kurd a naqşî re birêxistinkirina fethullehçîyan û bi israrî, hanîna ser ziman, weke avaker û bîrdozvanê wê bedîûzzaman û ankû Seîdî Nûrsî(kurdî) jî, divê ku mirov bi vir ve girêdayî werêne ser ziman. Hewldane dane nîşandin wê rengê ku hatî dwşîrmekirî ê tarîqate kurd a naqşî li ser fethullehçîyan re ku weke kurd orjînî ya jî, bi vî rastiyê ve girêdayî ya. Em dikarin, weke lingê tarîqate kurd a naqşî ku hatî dewşîrmekirin û asîmlekirin, rêxistinên weke hûdar´ê DAÎŞ´ê û hwd werênina ser ziman. Her wusa, dîsa weke ancama dewşîrmekirina tarîqate kurd a naqşî jî, em dikarin tevgerên weke tevgera fethuleh gulen û hwd werênina ser ziman. Ev rêxistinên weke hûda-par, DAÎŞ û tevgerên weke ya fethulleh gulen, aliyê tarîqate kurd ku hatina asîmlekirin û tirkkirin in. Ew êdî ti têkilîya wan bi kurdîtîyê û civate kurd re nema na.

Lê di nava kurdan de birêxistina kirina wan û pêşxistina wan jî, ne tenê bi armanca bikarhanîna wan rêxistin û tevgeran weke rêxistin û tevgerên pêşîlêgirtinê na. Ji wê zêdetirî jî, êdî weke tevgerên tirkkirinê û asîmlekirinê ên li ser olê re na.

Em di vê temenê de dikarin bibêjin ku bi rêxistinên weke hûda-par, DAÎŞ´ê û tevgerên weke ên fethullehçîyan re, reng û lingekî xwe yê ji tarîqate kurd a naqşî çêkirîya û bi wê re hem civate kurd dixwezê ku kontrol bike û hem jî bi wê re ku karibê pêşîya tevgerên olî ên bi navê civate kurd ku derkevin bigrê. Nûha jî, di vê temenê de, wan rêxistin û tevgeran bikardihêne. Heta ku bi wê re bisînor nemanê, ew rêxistin û tevgerên ku ji binî ve weke kurd orjînîyî didina nîşandin û ji serî ve bi tememî di rengê nîjadperestîya tirkitiyê û parastina wê de kar û xabatê di nava civate kurd de ku li dijî dikin in. Bi vê rengî, ku bi çi awayê bê kurd tevgerên kurd derkevin li holê, li dijî wan tevgerên civatî ên kurdî û kurdistanî, dîsa ev rêxistin û tevgerên asîmlekirî ku ji binî ve weke kurd orjînî na û ji serî ve weke parastvanîya nîjadperestîtîya tirkitîyê dikin, dihên derxistin li holê û dihên bikarhanîn. Heta ku didina şerkirin jî. Di çapameniyê de, hertimî şerê dewletê ê bi tevgera kurd a PKK´ê re weke "şerê di nava PKK û hizileh" de dayîna nîşandin jî, hinekî bi vir ve girêdayî divê ku mirov hilde li dest û fahm bike. Ev tenê şêwayekî bikarhanîna van rêxistinên asîmlekirî li dijî kurdan in. Ev rêxistinên ku ji binî ve weke ´kurdî orjînî na´ û ji serî ve parastîya nîjadperestîya tirkitiyê dikin, al û sembolên rêxistina nîjadperest a MHP´ê ku li ser ala sor "sê heyv", li ser ala kesk dîsa ´sê heyv" bo van rêxistinên asîmlekirî dihên bikarhanîn. Yanî, ev wateya wê ew a ku ev rêxistin jî, di rengê olî û şîn de tirkitiyê dikin û tirkitiyê diparêzên û tirk in.

Ev rengên politikayê li dijî hebûna civate kurd li li ser olê re dihên bikarhanîn, divê ku mirov wan bi teybetî kifş bike û wan werêne ser ziman. Her wusa, em carna bahse "qadaxaya li ser zimanê kurdî ku rejima tirk danîya dikin". Lê ev aliyên din ên li ser olê re ku bi navê kurdî qadaxa li ser wan hatîya danîn û hatina asîmlekirin û bi wê re bi sînor nemana û ku li dijî civate kurd dihên bikarhanîn jî, divê ku mirov wan fahm bike û werêne ser ziman. Ev politika, bi temenî politikayên têbirin, şikandin û ji dîrokê birina civate kurd in. Her wusa, di wê de jî, hin nirxên olî û hwd, ên civate kurd ku bi dîrokê re afirîna rêbazîn asîmlekirinê hatina berevajî rastîya wan hatina kirin û li dijî civate kurd dihên bikarhanîn.

Li vir, ya ku em di dewama mijarê de werênina ser ziman ew a ku bi awayekî zanistî rastîya vê tarîqate kurd a naqşî bi dîroka wê re were rayîxistin li berçav. Divê ku rastîya wê pêşî were zanîn. Piştre jî, bi van rengên hin asîmlekirinên li ser dîrok û têgihiştina wê re ku tevgerên weke ên fethullehçîyan hatina pêşxistin û li dijî civate kurd hatina dayîn şerkirin do temenê tûnakirina civate kurd de. Heta sedsale 19´min jî, weke ku bi keseyetîn serek û şêx ên weke şêx Ubeydullehê nehrî, Şêx Seîd, şêx Esadê erbilî û kûrê wî, şêx Mehmedê berzencî û hwd re tê ditin ku bo civate kurd tarîqate kurd a naqşî, di rengê hizbilleh Îranê û îxwami-l mislîmina cihana arab de ya. Di vê temenê de tarîqate kurd, ez dikarim bibêjim ku li her çar beşên kurdistanê alîgirên wê hena û birêxistin kirîya û cih bicih jî, li dijî desthilatdarîyên herêmî ku zilmê li civate kurd dikin serî jî hildide û serhildanê dike. Piştre, bi rêyên qanih kirinê bin û ankû bi rengê girêdana wan ya li ser berjewendîyên malbatî û hwd re bin, wê ji serî ve şêxên tariqatê werina xistin rewşek vajî wê rewşa dîrokî ya wan û kevneşopîya wan de. Heta ku wê piştre li dijî hemû komkujiyên ku hatina serê civate kurd û zilma li ser serê civate kurd bêdeng bimênin. Ev rewş hemû jî, rewşna teybet ên ku divê ku mirov wan biteybetî kifş bike û

werêne ser ziman in. Di dema serhildan Şêx Ubeydulleh de û di dema şêx Seîd de tarîqate kurd a naqşî bo civate kurd, serî hildida û serhildan dikir. Lê piştre, ev rewşa wê guharî. Tarîqate kurd a naqşî, hat xistin di temenê ku karivê dijberîyê jî li beşên civate kurd û wê bixwe jî bike.

Em dema ku van aliyên dîrokî ên vê tarîqate kurd a naqşî li berçav negrin û wê newênina ser ziman, emê bi awayekî rast fahm biikin ku ka çima tarîqate kurd a naqşî çima ji civate kurd re nebûya weke hizbileha Îranê û îxwani-l mislîmîna cihana arab. Di aslê xwe de, temenê wê pirr zêde jî hebû. Lê tenê pêwîstî bi wê hebû ku şêxên tarîqate kurd a naqşî, ku li mejû û rastîya xwe ya dîrokî û civatî û kevneşopî şîyar bibin û xwe di berçav de derbas bikin in. Ev jî, bi rastî di temenê rexne li xwegirtinê a wan de biderfet a. Di serî de, divê ku li rastîya civatî civate xwe xwedî derkevin. Ev jî, weke lingekî giring ê ku divê ku mirov li vir li ser wê bihizirê ya. Her wusa, divê ku ew civate xwe biparêzên. Civate kurd, pirranîyan wê misilman a. Li vir, di temenekî hemdem de ku li ser navê civate kurd, ku karibê xwe birêxistin bike, wê li herêmê ev tarîqate kurd a naqşî, wê bibe temen û hêzeka guharînî a giştî jî. Ji xwe, ev tarîqate kurd, birengê rêxistinîyên ku sazîyên îstihbarê ku bi destê fethullehçîyan çêkirina, pêşîya wê girtina. Li vir, divê ku di serî de ev were girtin. Di vê temenê de divê ku tarîqate kurd a naqşî, ev rengên dewşîrmekirî ên bi rengê fethullehçîyan ku temenê hemû dijmanetî û rêxistinên li ser olê re ku dijberî civate kurd û derketina wan a, were şermazar kirin ji aliyê wê ve. Bi vê re, wê astengî û bendên ku li pêşîya wan rayadarên tirk bi rengê dewşîrme ê ê ji wan ên weke fethullehçîyan jî, were ji holê rakirin. Ji xwe, ti hebûna û temenê van tûna ya. Ya ku diafirêne jî, ev tarîqate kurd a naqşî ya.

Tevgera fethullehçîyan, çend ku qalikê wê yê tarîqate kurd a naqşî jî bê, navaroka wê qalikê bi refarans û dîroka tirkitiyêê û osmanitiyê hatîya tişîkirin. Bi armanca li giştîya bakûrê kurdistanê ya asîmlasyonê ev weke politikayakê dihê pêşxistin. Li ser wê re teswîrek hatîya pêşxistin. Bi vî rengî, hemû rengê wê kirîya weke rengê pêşketina osmanî jî. Di aslê xwe de, di vê temenê de dîrokek osmanî jî li ser wê qalikê tarîqate kurd a naqşî re tê nivîsandin. Bi vê rengî, gelek nirxên civatî ên civate kurd û bi teybetî jî ên dîroka vê tarîqate kurd a naqşî, di bin navê "dîroka osmanîyan" de dihê hanîna li ser ziman ji aliyê vê tevgerê ve. Ev jî, weke rêbazekî tirkkirinê ya ku divê ku mirov li vir kifş bike ya. Û piştre jî, li ser wê re temenekî ku bi rengê "tirkitiyê" hatî şîrovekirin dihê pêşxistin. Êdî dîrokek olî û bi rengê "pêşketina osmanî" û hwd dihê hanîna ser ziman. Dema ku bahse wê ´pêsketina osmanî´ dihê kirin, tenê tefsîrek tirkitiyê dihê kirin. Lê li herêmê, ew pêşketinên ku di bin wê navê û vê gotinê de dihên hanîn ser ziman, ên hinek ji wan weke ku ên vê dîroka tarîqate kurd a naqşî û hwd a, lê bi navê dîrok û pêşketina osmanîyan dihê hanîn ser ziman. Ev jî, weke aliyekî din ê ku divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê ya. MIjare me, ne lêkolînkirina navaroka ´osmmanîtîyê´ ya. Lê ku navaroka wê gotinê û dîroka ku di bin nava vê gotinê de hatî nivîsandin ku were lêkolîn û rastîya wê were derxistin li holê, wê çiqasî wê rast û osmanîtî derkeve holê û çiqasî wê jî wê bi vî rengî weke dîroka tarîqate kurd a naqşî ku bi wê re dihê hanîna ser ziman, wê were kifşkirin. Dema ku yek wê dîroka bi navê "osmanîtîyê´ hatî nivîsandin ku dixwêne, dibînê ku tenê hertişt bi navê tirkitiyê, temenê wê û osmanîtîyê dihê ser ziman. Wekî din, çend xalkên din li herêmê hebûna û dîroka wan û rastîya wan çi bûya, ew ji xwe ti kesek bahse wê jî nakê. Her wusa, dîroka olê ya civate kurd, di vê temenê de di bin navê "osmanîtîyê" de hanîna ser ziman û bi wê rengê

êdî hewldana ku wê bikina bin kontrola xwe de. Di vê temenê de divê ku mirov, rastîya van gotinan bi awayekî vekirî lêbikolê û werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov bibêje ku qalikê dîrokî û têgihiştinî ê tarîqate kurd a naqşî, dikarê bi dîroka xwe ya li hemberê re bike û bêne ser ziman weke beremberî ya dîroka osmanî. Ev temen û dîroka wê heya. Ev gotin, ne gotinaka binê wê vala jî ya. Dema ku mirov li dîroka herêmê binerê, mirov wê vê yekê bi awayekî vekirî bibînê. Hinekî jî, serdemeka din jî, ya di serhildanên ku şêxên kurd pêşengî ji wan re kirîya, ji wê rengê pêşengtîyê û pêşengiyê dihê fahm kirin ku ev tarîqate kurd a naqşî, li giştîya kurdistanê xwediyê pergalek civatî ya serdest bûya. Her wusa, di sedsalên sedsale 18´min de ji serhildane şêx abdulrehmenê Sorî ku li başûrê kurdistanê di sale 1806´an de ku bû, û piştre jî vê yekê didina nîşandin. Li vir, em nikarin tenê van serhildanên kurd ên ku şêx serkêşîya wan dikin, tenê weke hin bertekna bêrêxistin ûplan werênina ser ziman. Ku di temenê kirina serhildanê de planak û rêxistiniyaka mazin nebê jî, ji rêxistin û pergelîyek civatî a serdest û ku di wê de ew serdest in ev bertek bi rengekî pergalî û civatê dihê derxistin li holê. Ev yek, dide nîşandin ku di temenê giştîyek civatî de rêxistinîtî û pergalî heya. Her wusa, em bi heman rengî dikarin nakokîyên mezhebî ên li kurdistanê ku di wan deman de di nava elewîtî û sûnnîtîyê de ku hena jî, mirov dikarê weke nîşanak û birhana vê yekê bide nîşandin.

Civate kurd, li vir, mirov dibînê ku li ser mezhebê sûnnî re bê û ankû hin têgihên şafîî û hwd jî ku di nav de hebin û hwd, ku çawa bê bila bê, lê ev rastîyeka civatî ya ku miirov nikarê wê înkar bike ya. Heta sedsalên 17´min jî, rêxistiniya civatî bi pergalî heya. Ên ku wê bi rê ve dibin şêxê ku li dergehê rûniştîya û mîrê ku li qasrê rûniştîya. Ev herdû, serek, civatê bi hevdû re û bêî ku bikevina nakokiyê bi hevdû re birê ve dibin. Gotina wan giraniya wê di nava civatê de heya. Ev jî, weke rastiyekê ya. Her wusa, civate kurd, di vê temenê de em divê ku bibêjin ku tarîqate kurd a naqşî, weke tarîqatek di vê temenê de bikok a. Di aslê xwe de, dem êdî dema ku hatîya dema şêx Seîd û wan, êdî bandûra tarîqatan di nava civate kurd de, hin bi hin ber bi kêmbûnê ve diçin. Ev dikarin, weke rengekî pêşketina civatî bi hemdemî jî vê kêmbûna bandûrê bixwênin. Di vê temenê de, osmanîyên ku hê xwe bi olê dixwezin ku werênina ser ziman û olê bikardihênin di nava kurdan de bi rengê gotinên "weke "romo û dîn, neyên hevdû na" û "tirko û dîn, çi dibêjina hevdû" jî, di temenê piçûk xistinê de hatina hanîn li ser ziman. Piştre, dema ku ji salên 1970´î û pê de, di temenê rengekî dewşîrmekirî de li ser bedîûzzaman de rayadarên tirk ku xwestina ku di nava kurdan de eleqeyekê lê bidina çêkirin jî, kurdan ew eleqe lê ne daye nîşandin. Heta ku ew nêzîkatîya mezhebîtî ya ku bi navê bedîûzzaman jî ji aliyê gelek kurdên oldar ve jî ne dihat herêkirin û dihat redkirin. Bi vê yekê, ev hewldana rayadarên tirk jî, weke ku ne gihiştû armanca xwe. Piştre jî, ji salên 1980´î û pê de, bi derxistina li holê a ´îmam hatp´an re, xwestin ku wê temenê çê bikin. Îmam hatîp´ jî ku mirov bi gotinekê bibêje, ji aliyê rayadarên dewletê ve bi armanca şikandina wê bandûra "medreseyên kurdan" ku heta vê demê jî li hin deverna kurdistanê ên weke cizîrê û hwd ku bi bandûra xwe hebûn hatina pêşxistin. Îmam hatip, wê bi zimanê tirkî li şûna wan medreseyên kurdan ên ku di wan de perwerdeya olî bi zimanê kurdî ba, wê bigirta. Wê şûna wê bigrta. Ji xwe bi vê armancê jî, hatibûbûna pêşxistin. Lê Îmam hatîp jî, çend ku weke demekê ji ber kirina propaganda wê ya li ser wê re çend mirov bi wê hatina xapandin. Lê ew jî, ne artarnatîfeka ku wê li dora gihiştiban hevdû bibandûra olê.

Ji aliyê pergale perwerde vê bi îmam hatîp´an û hwd, ji aliyê tevgerîyê ve li ser fethullehçîyan û dîyenetê ve û ji aliyê desthilatdarîyê ve jî li ser hikimetan re bi politikayên olî û hwd, li ser olê re ev asîmlekirin û politikayên dijî civate kurd hatina pêşxistin. Dîsa bi heman rengê û şêwayê, tarîqate kurd a naqşî jî hatîya asîmlekirin û hatîya xistin xismeta van politikayên li ser olê re ku li dijî civate kurd hatina pêşxistin. Li vir, em divê ku vê yekê jî, bibêjin ku rayadarên dewletê, her timî hewldana ku bi rêya dîyenetê û tevgera fethullehçîyan, kontrola olî li ser civate kurd çê bikin. Di vê çerçoveyê de pêşxistina rêxistinên weke û hûda-par û DAÎŞ´ê jî, bi armanca ku bi navê civate kurd û di temenê parastina mafên wê de ku bi olî ti rêxistin dernekevin a. Yanî, ev weke rêbazaka pêşîlêgirtinê ya ku li ser van rêxistinê re bikardihênê ya. Bo vê yekê, ev rêxistin, temenê wan li kurdistanê hebe jî û nebe jî, wê hertimî di çerçoveya van politikayên dewletê de, ev rêxistin bi vê armancê wê hebin. Pergale olî û qalikê wê, di temenê pêşxistina heyînek şariştanî de pêşketîya. Dema ku mirov li dîroka wê jî binerê bivê armancê mirov wê kifş dike. Di vê temenê de pergalên olî ên li kurdistanê, hatina dorpêçkkirin û ankû hatina tûnakirin. Weke ku bi tarîqate kurd a naqşî bi tevgera fethullehçîyan hem asîmle bikin û hem jî kontrol bikin dikin. Her wusa, pergalên olî ên din jî ên weke êzdatiyê û hwd, kirina bin hêrîşên bi armanca tûna kirinê de. Ev jî, di vê temenê de, divê ku mirov fahm bike. Çend ku temenê cudahîyên olî hebin û werina ser ziman jî, ku bi rengê nakokî hwd bin, hewldanên bi tevgera fethulehçîyan ku asîmlekirin û dewşîrmekirina tarîqate kurd a naqşî û hêrîşên li pergale kurdistanî û olî a êzdatiyê, di temenê wê de zihniyeteka ku di temenê dijberî hebûna civate kurd de heya. Em nikarin ji hevdû cuda werênina ser ziman.

..**Cemaeta fethullahçîyan ku jiv ê temenê sûdgirtîya, ji dibistan û rêxitinên xwe yên li başûrê kurdistanê û bakûrê kurdistanê ciwanên kurd dişêne nava şerê Sûrî û dide kuştin.** Berî nûha jî, çend caran me ev mijar hildaya li dest. Lê divê demê de, hewceyî pê heya ku em divê ku carek din hildina li dest.. Bi teybetî, ev cemaeta Fethullahçîyan, bi teybetî li bakûrê kurdistanê û li başûrê kurdistanê xwe bi rêxistin kirin. Heta ku li başûrê kurdistanê bi dehan dibistanên û zankoyên ku bidest wan bûna hena. Di van rojên dawiyê de, bêhtirî ev sazîyên qaşo dibin navê "dibistan" û "zanko"yan de ku ava na jî, ketina rojavê de. Piştî ku şerê li Sûrî destpê kir, êdî ketina wê ya rojavê bû. ..

Lê li vir, di serî de emê vê bibêjin. Heta nûha, bi dehan ciwanên kurd ên ku ji başûrê kurdistanê û ên ku ji bakûrê kurdistanê ku hatina şandin li nava wî şerê li Sûrî bûna. Ev ciwanên kurd, hem ji bakûrê kurdistanê hatina şandin û hem jî ji başûrê kurdistanê hatina şand in. Teybetmendiya van ciwanên ku hatina şandin ên kurd, ew a ku hemû jî, yan di wan dibistanên fethullahçîyan de xwandina û yan jî bi malên wan ên dibin navê "camaetê" re ku têkilîyên wan hena na.

Piştî ku dîmenên ciwanekî kurd ji helebçê ku ket ajansên nûçeyan de, êdî bêhtirî rastîya vê rewşê hat ditin. Ew ciwanên kurd ên ku hatina şandin li sûrî li nava şer ku li Sûrî li dijî kurdan jî şer bikin, ciwanên ku di bin navê olê de bidestê van camaetan hatina xapandin in. Her wusa, em vê yekê jî bibêjin, heta ku ew dibistan û saziyên fethullahçîyan li vê herêmê başûrê kurdistanê hebin jî, wê rêveberîya başûrê kurdistanê bixwe jî nikaribê pêşî li kiryarên bi vî rengî bigirê. Heta ku em divê ku vê yekê jî bibêjin ku di sale 2011´an de bû ku li herêma Zaxo´yê ku hin bûyarên ku rûdabû bûn li dijî desthilatdarîya herêma kurdistanê jî, dîsa telîya van dordoran têde hebû.

Ev ciwanên ku di wan dibistanan de tên perwerde kirin, di perwerde kirina wan de ol dihê bikarhhanîn û ew weke mirovna "oldar" dihên bikarhanin. Lê di rastiyê de, dibin navê "ol" û "pewerdeya olî" de dîroka osmaniyan perwerde dikin û her wusa nîjadperestiya tirkitiyê bi wan didina şêrîn kirin ku ew bi wê mazin bibin û ku êdî ew karibin wan bikarbênin. MIxabin, ji salên 1995´an û hwd pêde, bi hezaran ciwanên ku di wan dibistanên fethullahçîyan de hatina perwerde kirin, hemû jî temen û potansîyala ku dijminatiyê li mirovên li dora xwe jî bidina nîşandin bi wan re heya. ..

Ji xwe, em dikarin deronîya wan ciwanên kurd ji wê rewşa wan ya şandina li nava wî Serê navxweyî ê Sûrî de fahm bike. Pirranîya wan ciwanên kurd, ketina destê komên olî ên tundrew de. Di destê wan de na, û wan dişênina mirinê. Heta ku wan ciwanên kurd, li dijî kurdan bixwe jî didina şer kirin. Di şerê van çeteyên "cebetil-nasr" de gelek ciwanên kurd jî hebûna ku bi destê wan mirovên sivîl ên kurd jî hatina kuştin. Yanî, mirov hatina xistina deronîyaka bi wî rengî de ku dikarin çekê li civate xwe bixwe jî bikişênin.

Li bakûrê kurdistanê di salên 1991´î û hwd de navê "huzbullah" bikarhanîn. Bi wê re gelek navên din jî bikarhanîn. Lê bi wan koman, bi deh hezaran mirovên sivîl ên kurd, rewşeênbîrên kurd, û hwd, bi destê wan koman hatina kuştin. Ol, weke birdozîyeka ku dihê bikarhanîn de şerê bi kurdan re de. Di van rojên dawiyê de, ku li rojavayê kurdistanê hêrîşî kurdan dikin û ew gotin li mizgeftan û li minarayan bang dikin ku "kuştina kurdan, helal a." "Yekî ku destdanî ser jineka kurd, wê herê bihûştê", "dest dênin ser malê kurdan, ji we re helal a." û hwd. Bi vî rengî gotinan dibêjin. Ev gotin, berê jî hatina gotin li dijî kurdan. Bi wê re jî, bi hezaran kurd, hatina qatil kirin û malên wan hatina talankirin û vêrankirin.

Li vir, em vê jî bibêjin ku dibistanên van fathillahçîyan ên li başûrê kurdistanê, divê ku ti kurd zaroyên xwe neşêne li wan. Divê ku rêveberîya başûrê kurdistanê tedbîrên xwe yên civatî li ber van bide girtin. Heta ku ev dibistan, di nava kurdan de bi rêxistin kirîbin, wê pirsgirêkên di nava civate kurdan de bi dawî nebin. Ev dibistan camaeta fethullahçîyan, armanca wan ew a ku temenê pêşaroja civate kurd ji holê ra bikin. Bi vê yekê, armancaka wan ya din jîî ew a ku pêşî xwandina civaknasî û dîroka kurd jî bigrin. Her wusa, karekî van ê bi vî rengî ku wan ji xwe re weke "berpirsîyar" dîtîya dikin. Hemû temenê şîdeta di nava civate de û temenê tundrewîya olî û hwd, bi destê van dihê avêtin di nava civate de û di nava ciwanan de. Bi wî rengî, hewl didin ku ciwanan ji rastîya civate wan dûr bikin. Ti farqa van, ji talîban û El-kaîde tûna ya. Ev jî, bi rengekî em dikarin bibêjin ku "el-kaîde´ya tirk a ku li dijî kurdan dihê biarhanîn a. Kurd, hem li başûrê kurdistanê û hem li bakûrê Kurdistan divê ku hertimî van sazî û dibistanên fethullahçîyan şermazar bikin û xwe ji wan dûr bigrin.

Dê û bavên kurd jî, heka rast zaroyên dihizirin û dixwezin ku zaroyên wan bi aqilekî baş û bi mirovatî mazin bibin, divê ku bi tememî zaroyên xwe ji wan dûr bikin. Rêxistinên ciwanên kurd ên li bakûrê kurdistanê û li başûrê kurdistanê jî, divê ku kampanya şermazarkirina van dibistanan bidina dest pê kirin û ciwanên ku diçina van dibistanan ji wan dûr bikin û xilas bikin. Dema ku rêxistinên ciwanên kurd ên başûrê kurdistanê û ên bakûrê kurdistanê jî ku vê nekin, wê ew jî berpirsîyar bin ji wê kujarîya ku bidestê van sazî û dibistanan ku li ser ciwanên kurd dihê meşandin.. ..

Di nava kurdan de, ti saziyên ku perwerdeya olî didin tûna na. Ti saziyên ku perwerdeya olî didin, bi destê kurdan heta nûha jî ne hatina vekirin. Ên ku hena, hemû

ên ku dewleta tirk vekirina na. Bi van saziyan, dewleta tirk, hewl dide ku ciwanan bike temenekî ku karibin wan bikarbênin. Saziyên kurd, ên rewşenbîrî û civatî jî, bêgûman berpirsîyarîya wan heya. Heta roja me, temenekî baş ê bi zanistî pêşnexistina. Yanî jî ku hewl hatibê dayîn jî lawaz mana. Ji ber vê yekê, divê ku ez bibêjim ku her ciwanekî ku di bin navê olê de hatî xapandin û hatî şandin nava şer de, divê ku ew jî xwe ji wî berpirsîyar bibînin. Divê ku ji xwe bipirsin ku çi kirin bo ku ciwanan ji wê rewşa qirêt xilas bikin? Bi teybetî, zanyarîyeka civatî û pêşketî, weke arttarnatif ji wê re ne afirandin ku wan sazîyên kujar ên weke yên fethllahçîyan ku bêbandûr bikin.

Ev sazî jî, bi dibistanên li başûrê kurdistanê û bi dibistan û malên camaetê ên fethullahçîyan ên li bakûrê kurdistanê, ciwanên kurd kom dikin û dibin nava nava wî şerî û didina kuştin. Ji xwe, fethullahçîyan, lingekî temenê şerê dewletê ê bi kurdan re ji nava kurdan li ser wan dibistan û malên camaetê re pêşxistîya û heta roja me hanîya.

.

**Hêrîşên li HDP´ê bi plan û ´organîze kirî´ tên kirin.**

Piştî ku HDP´ê ava bû û piştre, gelek dordoran digotin ku wê ev partî nikaribê zêde pêş bikeve. Hin dordorên kurd jî, ev gotin digotin. Lê ku demek kin bi ser ve çû, êdî hat ditin ku HDP´ê hin bi hin mazin bû. Çend ku gelê tirk jî, ew nas dikir, bêhtirî xwe li dora wê didan hevdû. Ji ber ku gelê tirk jî, di xwest ku ew tafisandina wan ya dinava AKP´ê, CHP´ û MHP´ê de didîtin û dixwestin ku êdî ji wê xilas bibin. Ya ku kir ku dewlet wan komên nîjadperest bide hêrîşkirin li ser wê jî ev bû. HDP´´ê, farqe wê ji partîyên din ên rejimê ew bû ku bi zihniyeteka nû a demokratîk derket li holê. Heta vê demê, ew girseya tirk ku di nava nîjadperestîya AKP´ê, CHP û MHP de hatibûbûna fatisandin. Dervî van hersê partîyên nîjadperest, destûrê nadin pêşketinên din ên civatî ku xwe bi rêxistin bikin û pêş bikevin. Ji ber ku li ser rewşa van hersê partîyan re hikimranîya xwe ava kirin a. Car bi car, dibê ku weke ku hin partîyên nû hatibibina avakirin û hwd, bi navna nû derdikevina ber gel jî. Weke ku çawa ku di salên 2002´an û hwd AKP´ê avakirin û kirina desthilatdar û hwd. Lê zihniyet û nêzîkatî, weke xwe dihê hiştin û ew naguharê. Tenê, dihê "makyaj" kirin. Minaq, nîşanak û biran(´kanit´)a vê hebûna AKP´ê û politikayên wê ên ji destpêkê û heta roja me dimeşênê ya. Her wusa, partîyaka ku ew nîjadperestîya ku di wê xatê de esas dihê girtin ku ne pejirendi bê jî, wê destûr ji wê û pêşketina wê re nebê. Mînaq, nîşanak û birhan(´kanit´)a vê jî, hêrîşên li HDP´ê û pêşketina wê na. Ji ber vê yekê, di cih de di nava gelan de HDP´ê hat girtin. Piştre, bo ku wan wê girtin û lê xwedi derketinê kêm bikin, ev komên nîjadperest dan hêrîşkirin.

Hertimî, rejimê, ev komên nîjadperest, li dijî tevgerên din jî ên ku di nava tirkan bixwe de jî derketina jî bikarhanîya. Bi van komên nîjadperest, ew tevger û pêşketina wan tafisandîya. Bo vê yekê, dewletê, hertimî, bo ku pêşîya pêşketinên nû li herêmê di nava tirkan bixwe de jî bigrê, ev komên nîjadperest bikarhanîya. Heta roja me ku tevgeraka demokrat ji nava tirkan derneketibê, hinekî jî, divê ku em sedema wê ji vê aliyê ve lê bigirin. Gotina "demokrasiyê" jî, hertimî, li gorî "berjewendîyên xwe" lê hizirîna û bikarhanîna. Lê di nava sîyeseta tirkiya de û di nava sîyesetmederên wê ên di meclîsa wê de jî, çend ku gotina "demokrasîyê" bikardihênin jî, ne ku ji wê bawer dikin û dixwezin bikardihênin. Di nava gel de, bawerîyek bi vê gotinê heya. Girseyên gel, di têgihiştina gotina demokrasiyê de na. Dema di demên hilbijartinan de, vê gotinê bikardihênin. Bi vê gotinê re, ji raya giştî dengan dixwezin. Piştî hilbijartin buhurandin.

Êdî dîsa, weke xwe dikin.

Di nava rayagiştî a tirkiya de jî, Komên nîjadperest, weke astengîyekê li ber pêşketina civatî dihên bikarhanîn. Rejim, dixwezê ku girseyên mazin, di bin rejima wê ya nîjadperest de bin. Lê nikarin, bi nêzîkatî û gotinên weke ´demokrasiyê´ û ´mafê mirovan´ van girseyan bi xwe ve girê bidin. Ji ber ku girseyên civatî rastîya van partîyan û partîyên wê û rejimê jî dizanîn. Ji ber vê yekê, wê çawa wan girrseyan di bin kontrolê de bihêlin, hinekî jî weke rê û rêbazaka wê, ev komên nîjadperest hatina bi rêxistin kirin û li dijî wan girseyan bikardihênin. Ev komên nîjadperest, komikên piçûk in. Ku bi rastî, hijmara wan were derxistin, dibê ku ne gihijina sed hezarî jî. Lê weke hêzek ´milîtarî´ li rex hêzên weke ´jandarma´ û ´ polîs´an û hwd weke hêzek sêyemin ji aliyê rejimê ve hatina bi rêxistin kirin û li dijî civatê bikardihênin. Rejimê bi rêxistina van komkên nîjadperest, di wê rengê de ya ku wê çawa girseyên mazin ê civatê di bin kontrolê de bigrê, di wê temenê de wan bi rêxistin kirîya.

Li her herêmê, gelek kermend hena. Minaq, dema ku kermendek li dijî rejimê xwe bike helwesta xwe bide nîşandin, wê di cih de, van koman bikina dewrê de û wê zirerê bidina karên wî. Bi vî rengî, di nava her beşên civatê de, rejim li ser van komikên nîjadperest re çav tirsandinê dide çêkirin. Herî zêde, ev komîkên nîjadperest, di demên hilbijartinan de ji aliyê rejimê ve dihên xistin li dewrê de. Minaq, di vê demê de piştî ku hat ditin ku wê HDP´ê pêş bikeve û wê karibê dengekî mazin bigrê, êdî ev komikên nîjadperest kirina dewrê de. Pêşî li Fethiyê, piştre li Bolu û û hwd, bi hinek deverên din re, bi destê van komikên nîjadperest bidest hêrîşê li bîroyên HDP´ê kirin. Ev hêrîş hemû, ji aliyê rayadarên dewletê ve bi ´plan´ dihên "organîze" kirin.

Ev komikên nîjadperest, ji aliyê rejimê ve bi rengekî "polisîya" lê weke "hêzek sivîl" ya kontrol kirina girse û beşên civatê ên mazin hatina bi rêxistin kirin. Li rex, hêzên weke ´jandarma´, ´polis´ û hwd, di nava jîyane civatê de weke "hêzek sêyemin" jî, ev nîjadperestên ku ji aliyê rejimê ve hatina birêxistinkirin û perwerdekirin dihên bikarhanîn. Bi teybetî, li herêmên ku li wan karê tûrîsm´ê heya, ev komikên nîjadperest, pirr zêde li wan deran hatina birêxistin kirin. Bi wê re jî, li herêmên weke herêmên kurdan jî, di temenê hêzên kujar û ´para-milîter´ de dihên birêxistin kirin û dişênina bi ser gelê kurd de.

Li vir, em divê ku vê jî bibêjin. Ev komik, ne zêde na. Lê ji ber çapameni jî, ji aliyê dewletê ve di xizmeta ragihandina kiryarên van dordoran de na, ew bandûra ku van komikên nîjadperest ku di nava jîyanê de bi hebûna xwe nekarîna ku bidina çêkirin, hewl tê dayîn ku bi rêya çapameniyê û rengê ragihandina wê were çêkirin. Bi vê rengî, ev jî, weke aliyekî din yê vê nîjadperestîyê ya, ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Bi rêya çapameniyê, nûçeyên ku dihên çêkirin û ragihandin, bi wan re dixwezin ku wê întîbayê çê bikin ku divê ku win(ji beşên din civatê re ku bi rejimê re ne diheman hizrê de na) li gorî ku em dibêjin ku tevbigerihin wê tiştên xirab werina serê we.´ Bi wê re jî, dixwezin ku wê întibayê çê bikin û bibêjin ku, "meyîzênin, ev partî û ankû dordor rastî hêrîşê hatin, ku win jî deng derxin, wê dawîya wê jî bibe weke ya wan." Bi vî rengî, payema ku li ser ragihandinê re bi çapameniyê didina rayagiştî a civate tirk jî, ew a ku "divê ku win li gorî gotina dewletê bikin." Rengê nivîsandina nûçeyan, nivîsan di rojnemayên bi tirkî û hwd de, bi wan kiryar û kirinên komikên nîjadperest de di ahangekê de ya. Bi vî rengî û bi wê nîjadperestiyê, civatê di bin kontrola xwe de digrin. ..

**Li rex vê(wan hêrîşên komikên nîjadperest) jî, divê ku em bahse wan saziyên lêkolînê ku "anketên hilbijartinan" û hwd, çê dikin jî bikin û wan bi teybetî hildina li dest. Ev jî, weke aliyekî din ê giring a, ku bi wê rengê politikaya dewletê dihê dayîn nîşandin. Bi anketên ku çê dikin, wê kîjan partî çi dengî hilde, dixwezin ku bidina kifşkirin. Ya rastî, di serî de, dixwezin ku sînorê wê bidina kifşkirin. Tenê ku em li çar hilbijartinên di salên ku buhurî de ku li wan binerê, partîyên kurd ku rêjeya wan ya dengan li dora 5 û ankû 6´an de bi ankêtan nîşan ddan û piştre di wê çerçoveyê de di hilbijartinan de derxistina ancamê, nîşanak û birhana vê politikaya dewletê ya li ser sazîyên ku ankêtan re ku çêdikirin ya. Pêşî, ankêt çê dikirin di gotin, ev partî, wê rêjeya dengên wê li dora 5û ankû 6´an bê û piştre dengê wê partîyê jî di wê çerçoveyê de bûn. Dengên zêde ku dihatin ku wê rêjeya dengên wê partîya kurd zêdetir dikirin jî, piştre ji tenekeyên çopê ku hatina şawitandin derdiketin.** Minaq, partîyên kurd ên weke DTP´ê ku hatîya girtin, ji aliyê dewletê ve û piştre partîya kurd a BDP´ê ku hê di nava sîyesete de ya, dema ku nikaribin pêşîya pêşketina girseya wê bigrin, bi anketên ku çê dikin, dixwezin ku sînorê wê kifş bikin. Piştre jî, hêrîşên nîjadperestan li bîroyên wê bikin ku bandûrê li wê kêmbûna dengê wê bikin. Piştre, ku dengên partîyên ku ji zêde dihatin û ankû gelekî li ser wê sînorê ku wan li gorî xwe kifşkirîya re bê, wê êdî yan dengan ji sandokan bidina winda kirin û yan jî wê bişawitênin. Heta roja me, hertimî, piştî her hilbijartinên ku bûna ji çopan berhevkirina qaxizên dengên partîyên kurd ên weke BDP´ê û hwd jî, hinekî divê ku mirov bi vir ve girêdayî hilde li dest.

Ev sînorê ku bi wan ´ankêtên hilbijartinanû û hwd, ku dihat afirandin, piştre wêneyekî derûnî di mejiyan de bi wê û bi rêya çapameniyê re dihat afirandin. Di çapameniyê de jî, dema ku ev ankêt û "ancamên di wê de", pirr zêde li ser wan ancamên ku wan li gorî xwe di wê de bicihkirina ku dihat axiftin, êdî ew întîba û derûnî di serê mirovan de bicih dibû. Piştî wê derûnîyê û întîbayê re jî, êdî piştre ku rêjeya dengan hat wê sînorê, ji wê sînorê pê de, çend deng hatina û hatina windakirin û ankû şawitandin, êdî zêde ne diket berlêpirsînan de di mejîyan de. Ji ber ku di mejîyan de, ew ´ancamên ku wan di wan berî hilbijartina di wan ankêtên hilbijartinan de ku bicihkirina, bi wan bawerî di mejiyê mirovan de didan çêkirin. Êdî mirov, ew sînorê, wan ankêtan, dimejîyan de dibû sînorekî ku pê bawer jî dikirin. Ev jî, rêyeka dayîna herêkirina ancamaka ku dewletê li gorî xwe ku dixwest ku bi kurdan bide herêkirin bû. Li ser serê tirkan ev metod, ji aliyê rayadarên dewletê ve hatîya bikarhanîn. Bi vî rengî, wê hertîmî, hebûna partîyan jî, û serkevtina wan jî, wê bi vî rengî daye kifşkirin.

**Di** her pêvajoya hilbijartinan de, bi vî rengî bi çêkirina ankêtan ew întîba û derûnî pêşî diafirandin û piştre diçûna hilbijartinan. Bi wê re, êdî li gorî xwe ancamên hilbijartinan jî, didan kifşkirin. Ji xwe, dema ku piartîyên ku li ber wan ankêtan gotin ne digotin û ankû diketina rewşeka ku weke bi bêdengîyekê re weke ku ew ancam herê dikirin jî, êdî bixwezayî dibûna temenê serketina wê politikaya dewletê jî. Ev rewşa bi çêkirina "ankêtên hilbijartinê", bi hebûna û bandûra wê re biqasî wan komikên nîjadperest ên ku di nava rayagiştî a civatî ku bo kontrolkirina wan dihên bikarhanîn, bi bandûr dihê bikarhanîn. Dema ku ankêtan hilbijartinê çê dikin jî, ancamên rast ên wan ên bidest xistina bi raya giştî re parve nakin. Ancamên rast, ji xwe re dikin refarans ku wê li gorî wê çawa û li kîjan herêmê nîjadperestan bikina dewrê de, di wê temenê de bikardihênin. Ancamên ku di bin navê ´ankêtên hilbijartinê´ de ku ji rayagiştî re dihên

ragihandin jî, ancamên ku ew dixwezin ku li gorî xwe bidest bixin a. Êdî li gorî wê, dikevina nava kar û bar de. Li herêmên ku wê ne li gorî xwestekan wan ancam derkevin, di cih de weke bergir(´tedbîr´)ê di cih de komikên nîjadperest dikina dewrê de. Li rex, van komikên nîjadperest, ev ´ankêtên hilbijartinê´ jî bo kifşkirina ancamê li gorî xwesteka rayadarên dewletê dihê bikarhanîn.

Di aslê xwe de, dema ku em van hêrîşên li HDP´ê dinerin, em divê ku em bênina ser ziman ku di çerçoveya ku wê çawa pêşketina HDP`ê di nava wan sînorên ku wan bixwe kifşkirina de bigrin, bo wê dihên kirin. Bi vê re, divê ku mirov bibêje ku bi teybetî, ew têgihiştina ku di temenê HDP´ê de a demokratîkî dihê xistin armanca wan hêrîşan. Ev hêrîşên bi komikên nîjadperest, hêrîşên bi sînorkirina pêşketina wê têgihiştina demokratikî di nava wê girseya giştî a rayagiştî a tirk de jî ya. Di aslê xwe de, li wê hêrîş dihên kirin. Nayê hiştin ku rayagiştî, ji bin wê kontrolkirina wan ya bi bidestê van komikên nîjadperest rizgar bibe. Bi wê re, bi wê nîjadperestiyê re ku wan girseyan li gorî xwe bi reng bikin û di bin kontrolê de bihêlin. Ev, rengekî ku bi rejimê ve girêdane jî.

Wusa xuya dike, ku wê hêrîşên li HDP´ê bên zêdetir kirin. Ji ber ku bi lêkolînên ku kirina fahmkirina ku wê HDP´ê ancamên mazin bidest bixe. Vêca, wê çawa wan ancaman kêm bikin û yan jî ji holê ra bikin, hêrîşên wê dihên kirin. Ev hêrîş hemû jî, bi plan û ´organîze´ kirî na. Weke ku çawa ku li dijî rayagiştî a kurd, ´tirs´ û ´nîjadperestîtî´ weke du çekên rejimê ku hatina bikarhanîn, li ser serê rayagiştî a tirk jî, bo ku di bin kontrolê de bihêlin, van herdu çekan di nava rayagiştî a tirk de jî bikardihênin, bi hevdû re. Bi vî rengî, rejim, pişta xwe nadê gelê xwe di temenê pêşketina rejimek demokratik de. Rejim, pişta xwe dide tirsandinê û nîjadperestîtîya ku pêşxistîya. Li ser tirsandinê û nîjadperestîtîyê re hebûna xwe li ser lingan digrê.

..

**Pakêtên mijulkirina pêvajoyê ku kurd weke "Pakêtên xapandinê» bi nav dikin.** ..

Ev çend roj in ku di çapameniiyê de tê gotin ku "hikimeta AKP´ê pakêtê amede dike." Dema ku tê pirsîn ku ka wê çi di pakêtê de hebe jî, tiştên ku di wê de nebin dihên ser ziman. Yek ji wan tiştên ku di wê de cih nagrê jî di temenê statûya kurdan de perwerdehîya bi zimanê kurdî ya. Ji xwe, hê di dema ku civîna "mirovên aqilmend" de gotibû ku "bo perwerdehîya bi zimanê kurdî ti xabatên me tûna na." Di heman rojê û civînê de, dema ku hatibû pirsin ku ka ´rêjaya ji sadî deh´ rakirin û ankû hanîna xwerê jî, bersiva ku hat dayîn ew bû ku "wê rêja, newê xwerê". Piştre, T. Ardogan bi ser gotina xwe ve kiribû û gotibû ku "bila, bixabitin û bibuhurin."

Mijara zimanê kurdî û qadaxaya ser zimanê, mijara herî giring û mirovî ya. Di wê temenê de, dewletê bi qadaxaya ku danîya ser zimanê kurdî re bi pergale perwerdê re asîmlasyonê dide domandin. Berî vê pêvajoyê, gotinên rayadarên dewleta tirk, ên di temenê reşkirin û dijberîya zimanê kurdî de hatibûbûna ser ziman. Bilant Arinc gotibû ku "zimanê kurdî, ne zimanekî şariştanî ya ku bi wê perwerde bibe." Piştre, T. Ardogan, bixwe derketibû berçapameniyê û gotibû ku "bila, ti kes bi xwestina mafê perwerdehîya bi zimanê dayikê dernekeve ber me." Bi van re, bi sînor nemana û hê jî, hêrîşên li zimanê kurdî bûna. Minaq, mirovên weke Burhan Kuzu ku bi zihniyeteka maqyawelîst in, gotibûn ku "xwestina mafê perwerdeya bi zimanê kurdî karê şaytên a." Di vê temenê de, di reng û awayê hêrîşa li kurdan û nirx û zimanê wan de, sînor nasnekirin.

Ev hêrîşên ku li kurdan dibin, tevî ku li bakûrê kurdistanê, kurdan û tevgera kurd pêvajoyek nû bo çareserkirina pirsgirêka kurd dane destpêkirin jî, ne sekinî na û domîyana. Di vê demê de, hê jî, ev didomê. Civate kurd, hê dibin hêrîşa çapameniya dewleta tirk de ya. Lê ev hêrîşên ku dibin, em nikarin tenê bi çapameniyê re bênina ser ziman. Hemû hêrîş jî, hêrîşên ku li ser çapameniyê re ku dewlet bi plan û program dike ya. Ev pêvajoya ku kurdan daye destpêkirin, di wê de het roja me ti gav ne hatîya avêtin. Bi gotinên ku "hê ne vekişîyan" û hwd, dixwezin ku temenê hêrîşên nû ên ku di rojên pêş de bidina kirin dixwezin biafirênin. Yanî, ew gotin, di temenê sîyeset şer û dijberî û înkare kurd de dihên kirin.

Di vê temenê de, gotinên di temenê "em pakêtê amede dikin" de ku tên gotin jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de şîrove bike. Gotina "em pakêtê amede dikin", tenê bi armanca xapandinê ya. Wekî din jî, ti armanca wan tûna ya. Ji xwe, di van rojan de bi nîqaşê qaşo li ser "pakêtê" tên kirin de, di temenê wê "çi di pakêtê de nebe" ew dihên ser ziman. Di vê temenê de, tenê bahse tiştên ku wê têde nebin dikin. Ji ber ku tiştekî ku di hundurê pakêtê de ku hebe û wê ji kurdan re bênina ser ziman tûna ya.

Di çapameniyê de, hin gotin tên gotin ku "bi armanca hilbijartinan û bidest xistina rayên nîjadperestan ev gotin tên gotin" jî, mirov nikarê ji hemû aliyan ve bêne ser ziman. Nûha, di van rojên dawiyê de, dîsa zêdekirina nîqaşên "pakêtê" jî, bi armanca manîpûla kirinê ya. Kurdan, heta 1´ê êlûnê dem nîşan kiribû. Armanca, van nîqaşên dawiyê jî, çêkirina tevlîheviyê ên di mejî de na. Armanc û xwesteka wan, ew a ku gavê neavêjin û pêvajoyê bi vî rengî bidina domandin û bi demê re kurdan ´tasfîya´ bikin a. Di vê temenê de, nêzîkatîyê dikin. Nîqaşên li ser "pakêtê" jî, bi vê armancê na. Çend ku bahse "pakêtê" dihê kirin jî, di aslê xwe de pakêteka rast´ jî li holê tûna ya. Weke ku çawa ku berê, hin pakêt li gorî xwe çêkirin bi armanca "guharîna destûran" û hwd, ev jî di vê temenê de ya. Di vê temenê de, dibêt ku bi çend gotinan pêşnûmeyek amede kiribin û navê wê kiribin "pakêt". Lê ev pakêt, di temenê de radestkirina mafên kurdan de wê gavavêtin di wê de hebin? Na, wê di wê de tiştekî wusa nebin. Ji xwe, ji berê ve, hanîna ser ziman, ku wê perwerdehîya bi zimanê kurdî di wê de tûna beê.

Wusa xuya dike ku xwe amede dikin û êdî bidina nîqaş kirin ku "meyizênin, me pakêt amede kir," me hinek gavavêtin, deka win jî piştgirîyê bidina me, emê piştre pirsgirêkên ên weke ziman hildina rojevê." Lê ev gotin ku werina gotin jî, wê derew bin. Wê bi armanca xapandinê bin. Bi armanca xapandinê bin ku kurd bi wan bawer bikin û piştgirîyê bidina wan rêxistiniya xwe ji hevdû bi felişênin. Piştre jî, ku piştgirî hildina û desthilatdarîya xwe xort kirin, êdî wê ew gotinên ku gotina, weke ku berê dikirin wê ji bîr bikin.

....

**Amedekarîyên "pakêta" xapandinê´ û ankû amedekarîya şer ya ku dewlet dike li dijî kurdan. ..**

**Dewleta Tirk, li bakûrê kurdistanê, di nava amedekarîyaka mazin ya şer de ya. Hemû hêzên xwe yên ku bi salan bi kurdan re şer dikin nû kirin. Hêzên nû sevkî herêmên kurdan kirin. Her wusa, heta nûha, artişaka nû şandîya herêmên bakûrê kurdistanê. Piştî ku ew qarakolên ku tên gotin ku tên çêkirin ku ew bidawîbûn jî, tê gotin ku wê ji rojavayê tirkiya çiqas artişa wê heya wê biherikêne herêmên**

**kurdan. Yanî, dewlet, hiizir dike ku herêmê bi tememî bike herêmeka leşkerî.. Bi vî rengî, bike ku êdî zêde gavavêtin têde nebê. Ya ku nûha, dewlet lê dihizirê ev a.**

Wusa tê ditin ku dewlet herêmên bakûrê kurdistanê, ji nû ve weke ku rast dike. Demografîya wê, bi ardnîgarîya wê re, bi wan bendavên ku çê dike, diguharênê. Bi wê re, hewl dide ku êdî bi tememî bakûrê kurdistanê bike bin kontrolê de û bi demê re jî êdî wê bi tememî bike herêmek tirk. Yanî, mirovên wê hemûyan bike tirk. Asîmle bike. Ji xwe, serokê wezerate parastinê Îsmet Yilmaz dibêje ku "wê ji bajarên mazin, leşker werina şandin li van herêman." Yanî, di vê temenê de, hizirkirina wan heya. Di vê temenê de, di aslê xwe de, di serê wan de di çerçoveya çareserkirina pirsgirêka kurd de, ti plan û proja tûna na.

**Di vê demê de, gotinên weke ên ku dibêjin "em pakête amede dikin" jî, gotinên vala na. Dibêt ku li gorî xwe pakêtekê amede bikin bo bêjin "ha meyizênin me pakêt çêkir" û ragihand ji rayagiştî re. Lê wê ew pakêt, ne pakêteka çareserîyê bê. Lê wê di bin navê çareserîyê de bênina ser ziman û bi nav bikin. Ji xwe, di destpêkê de gotina ku "ti amedekarîyê me bo perwerdeya bi zimanê dayikê tûna na." Bi wê re jî, gotina ku wê "benda ji sadî deh newê xwerê. Ji xwe, bi hezaran sîyesetmederên kurd di zindanê de na. Ji ber ku mirovên weke Hatip Dicle ji aliyê kurdan ve hatina hilbijartin, heta roja me tevî ku hatina hilbijartin jî di zindanê de na.** Her roj, ji zindana, gotina mirina ciwanekî kurd tê. Oparasyonên qirkirina sîyesî ku dewletê li dijî qada sîyesî ya sîyeseta kurd dabû destpêkirin, bêî ku navber bikeviyê de didomê heta roja me. Pergale cerdewanîyê, di vê demê de, ji dêla ku biheta belavkirin, vajî wê, qadroyên nû ên cerdeaniyê hatina derxistin.

**Ev rewş û hê gelek rewşên din ku hena û bûna, di aslê xwe de didina nîşandin ku wê çi di pakêtê bahse wê dikin de jî wê hebe. Rejimeka ku hê hebûna kurda herê nekirî û dixwezê ku wan bike tirk, wê çi gavê biavêje? Pakêta ku bahse wê dihê kirin, wê bi wê armancê de bê ku karibê hinekî din demê bi dewletê bide qizinckirin ku heta ku ew rewşa xwe ya leşkerî hê li kurdistanê xorttir bike. Pakêta dem qizinc kiriê bê. Lê wekî din, wê ne pakêta gavavêtin û çareserîyê bê. Lê wê, vajî vê, pakêtê bi navê ´gavavêtin û çareserîyê´ werênina ser ziman û hewl bidin ku bidina revakirin**. ..

Heta nûha, bi dehan pakêt hatina amede kirin û hatina buhurandin ji meclisê. Lê di ancama wan pakêtan de, ji destpêk û roja ku ew pêkata pêşî hatî amedekirin û piştre bii dehan pakêtên ku hatina amede kirin re çê pêşketin ji wê demê û heta vê demê, bûya.? Di jîyane kurdan de û her wusa di jîyane mirovên tirk de jî.? Li vir, divê ku mirov mafê wan rayadarên tirk nexwê. Heta roja me, jîyane mirovên tirk de, heta ku tû bêje bes a, pêşketin û başkirin dane çê kirin. Lê dem çendî ku bi ber roja me ve hatîya, hin bi hin jîyane mirovê kurd jî, roj bi roj xirabtir bûya. Jîyane kurdan, heta ku ji salên 1990´î dihê salên 2000´an, hê xirabtir dibe. Ji 2000´an û heta ku dem tê salên 2005´an, xirabûn hê zêdetir dibêt. Her wusa, ji salên 2005´an û heta ku sal tê salên 2013´an, hê zêdetir xirabûn bibe. Î ro, ew "farqe" di nava rojavayê tirkiya û bakûrê kurdistanê de, ji vê yekê ya. ..

Ji wê re jî, hêncetek dîtibûn. Di salên 90´î de digotin ku "ji ber ku şer li herêmê heya êdî pêşketin nabê." Lê ev gotin, tenê hêncent bûn. Derew bûn. Ên ku ew şer dimeşendin li dijî kurdan, ew bûn. Ên ku ser 4 hezaran re gundên kurdan şawitandin û valakirin ew bûn. Î ro jî, bi armanca leşkerî ên ku bendavan û qarakolên nû çê dikin ew in.

Hertimî, dema ku rayadarên tirk, bahse başkirina di jîyanê de kirina, minaqên ku ji rojavayê tirkiyê dane û bi wan çavên mirovan boyax kirina. Î ro jî, heman tişt dibê. Serokê gelê kurd birêz Ocalan, pêvajoyak da destpêkirin bo ku hem pirsgirêka kurd were çareserkirin û hem jî demokratîzakirina tirkiya were kirin. Ka vêca em ji destpêka vê pêvajoyê binerin ku ji destpêka wê û heta ku dem dihê roja me, çiqasî xirabûn hê zêdetir di jîyane kurdan de hatîya çêkirin.(?) Ev dema ku em bahsê dikin, ji destpêka pêvajoya ku tekoşîna azadiya kurd û serokê gelê kurd daye destpêkirin û heta roja me dihêne ser ziman. ..

Ev dem jî, nêzî heşt(8) heyvan a. Di hundurê van her heşt heyvan de, çiqasî jîyane kurdan hat xira kirin? Çend, herêmên dîrokî ên kurdan di bin bendavên ku bi armanca leşkerî tên çêkirin de hatina hiştin? Li çend malên kurdan, oparasyon hatin kirin û çend mirovên kurd hatina girtin? ..

Em dikarin, van pirsên bi vî rengî pirr zêdetir bikin. Ji xwe, hewce nakê ku em bahse piştgirîya hikimeta tirk a AKP´ê bikin ji wan çeteyên bi alîkarîya fethullahçîyan dane berhevkirin û dişênêne bi ser kurdan de û ku di ancama wê de bi sadan kurd hatina qatil kirin û bi hezaran kurdan cih û warên xwe terikendina.

Ev rewş hemû, di vê pêvajoyê de bûna. Kurdan, di serî de, hêvî dikir ku bi vê pêvajoyê gav werina avêtin û dawî li wî şerê dewletê ê bi wan re were hanîn. Her wusa, kurdan tiştekî din jî, hêvî dikir ku ew mafên wan ên ku ji wan hatina standin werina radest kirin li wan. Minaq, weke qadaxaya ku rayadarên dewleta tirk danîna ser zimanê kurd, ku kurd nikarin bi zimanê xwe yê dayikê perwerdeya xwe bibînin. ..

Lê kurdan çi kir û çi nekir, vê dewletê dev ji fêhlên xwe yên pîs ne berda. Di vê pêvajoya ku kurdan, tevgera azadîya kurd û serokê gelê kurd daye destpêkirin de jî, ji dêla ku gavan bo demokratîzekirina tirkiya û çareserkirina pirsgirêka biavêje, dewletê li kurdistanê sevkîyetên leşkerî dane destpêkirin, qarakolên nû çêkirina û bendavên bi armanca leşkerî bidest çêkiirna wan kir. Yanî bi kortasî, amedekarîya şerekî nû ê mazin ê bi kurdan re dike. ..

Di vê demê de, dewletê ti gav neavêtina. Vajî wê, hewl dide hêncetan ji xwe re çêbike bo ku gavan neavêje. Ji xwe, li kurdistanê bi amedekarîya leşkerî ya ku kiriya jî, dixwezê ku şerekî nû bide destpêkirin. Lîstika dewletê ya vê naqlê ev a. Lîstika vê naqlê ya di serê dewletê de, ew a ku dewletê hizirkirîya ku bi amekarîyaka giştî ya leşkerî re şerekî giştî li kurdistanê bi kurdan re bide destpêkirin û wê bi serkeve. Li gorî wê, piştre bi wê re wê tekoşîna azadîya kurd ji holê ra bike û êdî wê pirsgirêka kurd jî li holê nemêne. Mantiq û hizirkirina ku dewlet dike ev a. Di vê temenê de, dewleteka ku bi vî rengî hizir dike, bêgûman, wê gavan neavêje. Wê amedekarîyên xwe ên şer temem bike û piştre bi wan amedekarîyan herê bi ser kurdan de. Ya ku dewletê lê dihizirê jî ev a.

Yanî dewlet, hê jî, di hizirkirinaka ku dihizirê ku wê kurdan têkbibe û piştre wê wan bi pergale perwerde ya tirkkirinê û hwd, wê kurdan ji dîrokê bibe. Ev mejiyê dewletê, bi vî rengî, ev 100 sale ku di hizirê û bi wê hizra xwe şer bi kurdan re dike. Di ancama wê awayê hizirkirinê de jî, bi dehan komkujiyên weke komkujiya geliyê zîlanê, komkujiya dersimê, komkujiya helepçe, komkujiya roboskî, komkujiya kortekê û hwd, hanî serê kurdan. ..

Di vê pêvajoya ku herkesek dibêje ku "divê ku dewlet gav biavêje" de jî, ya ku dewlet, dike ew a ku karibê çend hêncetan bide çêkirin û li ser wê re êdî pêvajoyê dirêj bike û bi wê re bi demê re amedekarîyên xwe ên leşkerî bidomêne û piştre bi wan

amedekarîyan derbeyê li kurdann bixe. Nûha, ya ku di serî de dihê ditin ev a. T. Ardogan´ê ku diçe Almanya dibêje "asîmlasyon, sucekî mirovahîyê ya", ku tê tirkiya li ber kurdan dibêje "perwerdeya bi kurdî nabê." Û dibêje "perwerdeya bi zimanê dayikê nabê." T. Ardogan´ê ku dibêje "jin jî bê, zarok jî bê, kî bê bila bê, wê hêzên ewlakarî çi pêwîst bê, we wê bike" û ferman komkujiya roboskî dide û hewldide ser wê komkujiyê binûxûmêne, "hêstirên tîmsaha"n diparênê. .. . Politikaya hêstir barînê, weke ku çawa ku olê li dijî kurdan û hwd bikardihênin, di wê temenê de bi armanca îstismarkirina çend hêstên mirovî dihê kirin. Berê, ew ´hêstirên tîmsaha´n, me bi dawûtoglu re li filîstinê dît. Piştre jî, bi Bilant Arinc re. Î ro jî, bi T. Ardogan re. **Politikaya hêstir barînê**´, di rengê bikarhanîna olê de dihê kirin. Lê hasabên ku li ser vê politikaya hêstirbarînê re dihê kirin jî, ew a ku wê çawa dijberîyekê li dijî kurdan bidina çêkirin û çend mirovan bixapênin û bibina sûrî û li dijî kurdan bidina şer kirin a.

Dewlet û rayadarên wê, nûha hewl didin ku li ser çapameniyê de di serîyan li gorî xwe çend hêncetan bidina çêkirin û piştre li ser wê re hem gavan neavêje û hem jî pêvajoyê bi vî rengî di temenê mijulkirinê re bi rê ve bibe. Dewletê û hikimeta AKP`ê, hizir kirîya ku wê bi bendavan gelek qadên herêma bakûrê kurdistanê di bin avê de bihêle. Qadên ku di bin avê de nemana jî, bi çêkirina qarakolan û piştre sevkkirina artişa xwe hemûyî li herêmê li ser serê kurdan û hwd, wê kontrolkiirna xwe çê bike û wê kurdan bitafisêne. Yanî, dîsa ya ku lê dihizirê, ew a ku kurdan bitafisêne. ..

Politikaya tafisandinê, di vê temenê de dihê meşandin. Li herêmên bakûrê kurdistanê, hêzên gerîlla xwe vekişandin û qad ji sîyesetmederan re hiştin ku ew bi sîyesetê re pirsgirêka kurd bikina rêya çareserîyê de. Li gorî, levkirin hatîya kirin jî, wê dewletê û aliyê kurd, bi hevdû re gavbiavêtan. Lê heta nûha, tevî ku aliyê kurd gelek gav avêtin jî, dewletê ti gaav neavêt û tevî wê jî amedekarîyaka mazin ya şer bi sevkirina hêzên leşkerî û çêkirina qarakolan re dike.

"Pakêt"a ku tê gotin ku tê amedekirin jî, wê ti tiştek têde nebe. Bi teybetî, kurd hemû li bendê bûn ku qadaxaya li ser zimanê kurdî were rakirin û di temenê naskirina statûya kurdan hin gav werina avêtin. Ya ku dewletê soz dabû ku wê bi gavavêtinê bikira jî ev bûn. Lê ya ku mirov dibîne, ew a ku dewlet û hikimeta AKP´ê, amedekarîyê dike ku çend ku di bin navê "demokratîzebûnê" de weke gavavêtina di temenê pirsgirêka kurd de bide nîşandin. Çareserkirina pirsgirêka kurd û demokratîzekirina tirkiyê, du mijarên ji hevdû cuda na. Çend ku , bandûra wan li herdû hebe jî di pêşxistina wan de, lê em nikarin weke hevdû bênina ser ziman.

Di vê demê de, çî pakêt ku were amede kirin ku di wê de weke xale sereka rakirina qadaxaya li ser zimanê kurdî tûnebê û di temenê naskirina statû û xweserîya kurdan de gavavêtin di wê de tûnebin, wê bina pakêtên xapandinê. Kurd, êdî naxwezin ku bi wî rengî bidomênin bi dewletê re. Di aslê xwe de, ku çi pakêt, werina amede kirin jî, ku çi têde hebe jî, wê xwesteka dewletê ya dixwezê bi kurdan re bijî û yanî naxwezê bi kurdan re bijî wê bide nîşandin. Dewlet, wê biryara xwe bide ku dixwezê bi kurdan re bijî û yanî nejî. Pakêt, bi navaroka wê re, wê vê bide nîşandin.

Her ku serokwezirê dewletê T. Ardogan, devê xwe diveke, gotina "birayê min ê kurd". Lê di aslê xwe de, ew bixwe jî, çend ku wê gotinê bikardihêne jî biwê ne bi bawer a. Ev gotinaka derew a. Ji dereweke û pê de, ne ti tiştekî din a. ..

.

**Piştî berxwedana kobanê, pêvajoya ´Pêvajoya çareserîyê´ li bakûrê kurdistanê û helwesta rayadarên tirk. ..**

Piştî ku berxwedana kobanê û pê pê de, êdî ti tişt weke berê nema. Li bakûrê kurdistanê jî, wek berê nema. Ev ser du salan re ´pêvajoya çareserîyê´ ku dewleta tirk heta vê kêlîkê di wê de ti gav navêtina heya. Lê bi berxwedana kobanê re, ew pêvajo jî, ket rewşek din de. Wusa ji gotinên rayadarên tirk tê ditin û fahm kirin ku, hizirkirina ku di hundurê van du salan de, wê ´şîdet´ û tûndûtûjî nebê û wê êdî xalk jî jîyane xwe bidomêne. Piştre jî, bi wê rengê wê pergale metinger a li ser serê kurdan bidina domandin. Di van demên dawiyê de hin ´nivîskar´ên dewletê, gotina ku bilêv dikin ew a ku "du hundurê van du salan de, wan jî hin destkevtî bidest xistin, êdî vegerîna li dema ku di wê de şer hebûya wê zor bê." Ev rengekî hasabê di serê rayadarên dewletê de dihêne ser ziman. Yanî, bi gotinaka din, hêvî ji gotina rahawetê kirina. Ji xwe, ji nûha de ´nivîskar´ên dewletê dinivîsênin ku "wê gel, piştgirîyê nedê pêvajoyaka din ya şer." Di aslê xwe de, em dikarin vê gotinê ji gelek aliyan ve şîrove bikin. Ji aliyekî ve em diakrin şîrove bikin ku bi gotina şer çawa ku rejima tirk dixwezê gelê kurd ´terbîye´ bike. Lê ev aliyên wê yên bi şîrove kirinê bila nûha bimênin. Em li vir, di serî de li vir, biponijin ku rayadarên tirk, hêvî dikin ku ´karibin bi van herdû salên ku di wan de şer nebûya marjînalizebûnekê di nava kurdan û tevgera kurd de çê bikin.´ Her timî jî li vê yekê hizirî na.

Di vê çerçoveyê de dema ku mirov di nerîna ku rayadarên tirk dihênin ser ziman re ku mirov dinerê, ya ku mirov dibînê ew a ku "wê şer nebê. Ji xwe gel jî ji şer wastîya ya, êdî dema ku tevgera kurd, bibêje ezê tekoşînê cardin bikin, wê piştgirîyê ji nava kurdan negirê. herî kêm ku hinekî piştgirîyê bibînê jî, wê cardin destpêkirina pêvajoyek tekoşînê, wê girrseya civate kurd bike qat.´ Ya ku tê ditin ev a. Lê dema ku em li rastîya civate kurd dinerin, rastî vajî vê nerînê û ancamên wê yên ku rayadarên tirk hêvî dikin a. Di serî de, ev nerîna rayadarên tirk, dide nîşandin ku ew di derbarê rastîya civate kurd de ne xwediyê ti zanebûnê na. Bi wê re jî, dide nîşandin ku ew di serê xwe de, tenê xiyal dikin û ji xwûdê dixwezin ku ew a ku xiyal kirina werênê li cih. Bi wê re jî, ew jî, hêza dikina dewrê de ku ew ya li gorî dilê wan were li cih.

Berxwedana kobanê di 7 û 8´ê kêwçêrê de hemû bakûrê kurdistanê rakir serpîyan. Yên ku bi wê nerînê dinerîn û hizir dikirin ku "wê şer nebê. Ji xwe gel jî ji şer wastîya ya, êdî dema ku tevgera kurd, bibêje ezê tekoşînê cardin bikin, wê piştgirîyê ji nava kurdan negirê. herî kêm ku hinekî piştgirîyê bibînê jî, wê cardin destpêkirina pêvajoyek tekoşînê, wê girrseya civate kurd bike qat.", di 7 û 8´ê kewçêrê re li rastî hêtê berxwedana kobanê ku bakûrê kurdistanê rakir serhildanê hatin. Gotinên Dawutoglu ên ku wî di rojên destpêka berxwedana kobanê de bilêv dikirin û digot ku "ti têkiliya pêvajoyê û kobanê bi hevdû re tûna ya" û ku piştre heman gotin ji devê raaydarên din ên tirk jî dihat bihîstin, li ser vê temenê dihatina gotin. ..

Yanî, wusa hêvî kirina. Î ro jî, piştî ku serhildanên 7 û 8´ê kewçêrê li bakûrê kurdistanê bûn, êdî weke ku nizanibin wê çi bikin li wan hat. Şaş man. Hêvî ne dikirin ku wê wilqasî zêde serhildan bibin. Wan di serê xwe de hizir dikir ku di hundurê van herdû salan de ew rahaweta ku bi gelê kurd re afirîya û di nava jîyane xwe de bi wê dijî, wê derfetê nedê wan ku rabina serpîyan. Lê piştî ku ditin ku rastî vajî ya ku ew xiyal û hizir dikin a, êdî piştre ketina nava hewldana ku ka çi bikin a. Bidest derxistina zagonên ku erka polîsan zêde dike kirin. Bidest oparasyonên leşkerî kirin. Li herêma agirî di

ancama xafka leşkerên tirk de qatilkirina sê-ciwanên kurd jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Piştre, li çîyayê Cudî bidest kiirina oparasyona leşkerî jî divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Herî dawî, ku weke dewama van rewşan ku em werênina ser ziman ku "bilent Arinc derdikeve berçapameniyê û weke ku ´restê bikişêne´ dibêje "em ne mihtacê ´pêvajoya çareserîyê na" jî, divê ku em weke ancama wê bihizirin. Ya ku wan hizir dikir û ya ku li jîyane weke ratî hebû, ji hevdû pirr cuda bû. Ya ku bû temenê şokek mazin jî ev bû.

Di serî de divê ku em vê yekê bibêjin ku têgîna kurdan û civate kurd a di derbarê gotina ´pêvajoya çareserîyê´ de bi bendewarîyên wan re ji têgîn û bendewarîya di serê rayadarên dewletê de cuda ya. Kurd, hêvî dikin ku ´pêvajoya çareserîyê xira nebê û ew jî mafên xwe bidest bixin û ku karibin bi zimanê xwe yê dayikê perwerdeya bi zimanê dayikê biibînin û her wusa bi wê re hêvî dikin ku xweserîya wan di temenê mafên wan ên xwe bixwe birêvebirinê ku bidest bixin a. Ya bi gotina ´pêvajoya çareserîyê´ re ku di serê hemû kurd de ev a. Lê ya di serê dewletê û rayadarên wê de jî, ew a ku kurd ji tekoşîn û doza maf û azadîyê bên xistin û ku doza perwerdeya bi zimanê dayikê û bi giştî jî xweserî û ankû statûyê nekin a. Ev herdû nerîn û têgînên ji hevdû cuda, di temenê pêşneketina pêvajoyê de na jî.

Gotina "entegresyonê" ku rayadarên tirk, berî dema ku pêvajoya çareserîyê destpê bike de ku bilêv dikirin di serê wan de heya. Ev gotin jî, bi mantiqê wê yê ku ew bi wê difikirin, ew a ku kurd ji doza maf û azadîyê û bigiştî jî ji doza xwestina statûya xwe ya civatî bên bişûn ve gav avêtin. Dewlet, naxwezê ku statûya kurdan nas bike. Naxwezê ku bi kurdan re wekehevdû bê. Dixwezê ku herkesek bi zimanê tirkî perwerde bibînê û her kesek weke mirovekî tirk bijî. Nêzîkatîya ku rayadarên tirk ya di temenê gotina pêvajoyê de ev a. Di vê temenê de, pirsgirêka kurd weke pirsgirêka maf û azadîya civate kurd a, rayadarên tirk dixwezin ku weke ´pirsgirêka terorê´ bi nav bikin weke ku heta nûha bi nav dikirin û bi wê re di wê temenê de di temenê nêzîkatîyên ´ewlakarîyê´ de nêzîkî meseleyê bibin. Halîyla, dema ku zihniyet ev bê, wê çareserîyê jî li gorî xwe bixwe re bêne. Yan jî, wê ti çareserîyên civatî ku weke ku civate kurd hêvî dikin wê bi xwe re neyênê. Bo vê yekê, krîmînalîze kirina sazî û rêxistinên kurd, weke rêbazek rejima tirk a. Bo vê yekê, hertimî, ku kîjan rêxistina kurd bê, ku PKK´ê bê û ankû PYD bê, li dawîya hevoka ku navê wan di wê de tê ser ziman, gotina "terorê" bicih dikin.

Her wusa, di vê temenê de dema ku em li zihniyeta rayadarên dewletê bihizirê jî, em dibînin ku hê gavek jî bi şûn ve neavêtiya ji wê ´înkare kurd´. Nîşanaka wê jî, ew a ku di vê pêvajoya ku tê gotin ´pêvajoya çareserîyê´ de jî, rayadarên tirk di rabin pergale hevserokatiyê ku kurdan di nava xwe de pêşxistibû bi biryarên dadgehê û hwd, betal bike. Her wusa, bi wê re jî, hewl bide ku hemûyî bike yek reng. Li vir, divê ku mirov di serî de, rastîya zihniyetê bibaşî kifş bike. Dewletê û rayadarên wê, hê di temenê herêkirina kurdan de, di mejiyê xwe de ti gav neavêtin û ne amede na jî. Ya ku di serî de divê ku mirov vê yekê bibêje ku ne di wê hewldan û temenê de na ku xwe biikina rêyeka ku di wê de hebûna kurdan herê dikin de.

Piştî berxwedana kobanê û serhildanên wê yên li bakûrê kurdistanê, rayadarên tirk jî ditin û fahm kirin ku ew hêvî û bendewarîyên wan di temenê rahaweteka ku wê kurd bi wê ji maf,azadî û tekoşîna xwe ya bo maf, azadî û statûya xwe ku bi şûn ve gavêjin jî, vala derket. Piştî wê re, êdî bidest hêrîşê kirin û zimanekî hêrîşkarî bikarhanîn. Êdî

bidest çûyina bi ser kurdan de kirin. Dîsa bidest ´oparasyonên qirkirina sîyesî´ kirin. Bi hezaran sîyesetmeder, ciwan û pêşengên civate kurd di wan oparasyonên qirkirina sîyasî ên ku piştî serhildanên kurdan ên di 7 û 8´ê kewçêrê de ku bûn tên girtin. Bo vê yekê, êdî dîsa bidest şîdeta dewletê ya li dijî kurdan kirin. Bi şîdeta dewletê, dixwezin ku kurdan bêdeng bikin û bitafisênin. Ji ber çi, piştî serhildanên kurdan ên 7 û 8´ê kewçêrê de bidest oparasyonên girtinê kirin? ji ber ku ti planên wan ên çareserîyê tûnabûn. Di aslê xwe de, ku dewlet û rayadarên wê di gotina "´pêvajoya çareserîyê´ ku ew jî dem bi dem bi lêv dikin de ku cîdî û jidilban, wê serhildanên 7 û 8´ê kewçêrê, temenekî pirr baş bo çareserkirinê ji wan re biafiranda. Her wusa kurdan, bi serhildanên 7 û 8´ê kewçêrê ji rayadarên tirk xwest ku dest ji wê dijberî û dijminatîya kurdan berdin û politikaya xwe ya di derbarê rojavayê kurdistanê de jî rast bikin. Lê rayadarên tirk, ev jî rast ne xwandina. Ya rastî ew a ku ew peyamên kurdan dîtina û xwandina jî. Ji ber wê yekê, wilqasî bi şitt diçina bi ser kurdan de.

Rayadarên tirk, di temenê parastin û domandina desthilatdarîya xwe ya li ser serê kurdan de ku li pêvajoyê dinerin. Lê kurd jî, di temenê bidestxistina statûya xwe de lê dinerin. Her wusa, kurd ji aliyê çapê ve li pêvajoyê dinerin û ji aliyê ve dinerin û bi nîyetek baş ya di temenê bidest xistina maf û azadîya xwe de lê dinerin. Lê ji aliyê rastê jî, ji aliyê vajî wê ve jî, rayadarên tirk di temenê bêstatû hiştina kurdan û kirina wan ya tirk de li pêvajoyê **dinerin**.

- Berxwedana kobanê dîrok nivîsand. Berxwedana kobanê, rengê sîyesetê ê li rojhilat jî da nîşandin. Di aslê xwe de berxwedana kobanê, rengê sîyeseta pêşarojê a rojhilat da nîşandin. Ya ku di serî de em bi kobanê û berxwedana wê re fahm bikin ev a. Lê pêşî em divê ku vê bibêjin ku kurd, weke hêzekê derketina dîka dîrokê. Di kifşkirina sîyeseta rojhilat û kirina sîyesetê a li rojhilat de, ku kurd li ber çav newina girtin, wê êdî nema karibê were kirin. Politikaya tirkiya û rejimên din ên weke tirkiya li ser esasê tûna hasibandina kurdan a. Bo vê yekê bû ku rejima tirk dixwest ku bi DAÎŞ´ê ancamaka dîrokî bidest bixin. Di serî de, ya ku mirov dibînê ew a ku pirr jî bawer kirina ku wê DAÎŞ derbeyekê li kurdan bixe. LI ser wê derbeyê re wê li rojhilat ´sîyeset dîzaynkirinê ´, were kirin û pêvejoyek nû li ser esas û temenê bêstatû hiştina kurdan wê biheta meşandin. Lê ya ku tirkiya hasabê wê bi DAÎŞ´ê re kiribû ev bû.

Di vê temenê de sîyeseta li rojhilat ku bê kirin, wê êdî kurd û statûya wan jî di wê de hebe. Di aslê xwe de, bi vir ve girêdayî ku mirov bibêje, dîsa divê ku mirov bahse berxwedana Kobanê bike û bibêje ku berxwedana kobanê sîyeseta welatên ewropî jî û ya Emerika jî da guharandin. Heta roja me, sîyeseta Ewropa jî û ya Emerika jî, li ser esas û temenê tûna hasibandina kurdan bûû. Ev rengê sîyesetê, li gorî poliitkayên tirkiya bû. JI xwe, li ser wê temenê re tirkiya şerê xwe bi kurdan re dide meşandin. Komkujiyên mazin hanîna serê kurdan. Berî berxwedana kobanê, bi dehan komkuji hatina hanîn li serê kurdan. Lê yek jî, ji wan komkujiyan di rojava welatên ewropî û Emerika de cih negirtina. Di aslê xwe de berxwedana kobanê, ev rengê sîyeseta ewropa û emerika jî bi wan da guharandin. Her wusa, sîyeseta rejimên li rojhilat jî rastîya wê danî li berçav û da nîşandin ku sîyeseta li rojhilat ên ku hê rejimên weke rejima îranê û Tirkiya ku wê dikin, êdî mîade xwe tişî kiriya. Wê pêşaroja vê sîyesetê nebe. Berxwedana kobanê di vê temenê de rengê sîyesetkirina dema nû jî da nîşandin.

Rejimên herêmê ên weke tirkiya hêvîya xwe bi DAÎŞ´ê ve girêabûbûn ku derbeyê li kurdan bixin û li ser wê derbeyê re ´sîyeseta dîyzankirinê li rojhilat pêş bixin.´. Li vir,

em divê ku vê jî bibêjin ku Kobanê ketiba û li berxwe nedaba jî, wê sîyeseta bi vî rengî weke ku tirkiya û hwd, hizir dikir wê ne temenê wê  û ne jî pêşaroja wê êdî wê heba. Ya ku ew nabînin ev a. Dema ku sîyesetê û sîyesetkirinê bi felsefeya wêê re werênina ser ziman, divê ku em pêşketina demê û hebûna xalkan jî li berçavan bigrê. Dema ku ev li berçav hatina girtin, ji xwe wê êdî temenê sîyesetek bi vî rengî nebê. Sîyeseteka ku temenê wê li ser felsefeya jenosîdkirinê ya, û bi poliitkayên komkujiyên fizîkî bê ku bê meşandin û ankû bi politikayên bişavtinê û hwd bê ku bê meşandin jî, wê êdî pêşaroja wê nebê. Li vir, kobanê, bivî rengî, di aslê xwe de perspektifa pêşarojê danîya li berçav.

Tirkiya û bi wê re rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin, tevî ku bi wê sîyeseta xwe ya li ser esasê tûna hasibandina kurdan û xalkên din ên herêmê windakirina jî, di wê de isrer dikin. Ev jî, di van rojên dawiyê de dihê li berçav. Di pêvajoya çareserîyê de neavêtina ti gavan û derxistina destûrên nû ku bi wan rejimê bikina rejimek polîsîya û hwd jî, vê yekêê dide nîşandin. Ev rengê sîyesetê, wê bi tememî bi tirkiya bide winda kirin. Tirkiya, di aslê xwe de bi hevîkarîya wê ya bi DAÎŞ ´ê re û bi komkujiyên bi wê hevkarîyê ku DAÎŞ´ê li kobanê û herêmên din ên rojava û li herêmên din ên başûrê kurdistanê û şengalê kirina re, xateka mazin ya dîrokî ku em dikarin weke "hêtê çînê" bi nav bikin di nava xwe û kurdan de xîzkirîya. Ev hêt çînê di mejiyê her kurdî de afirîya. Bi alikarîya tirkiya ya ji DAÎŞ´ê re stûrtir bûya. Hin rayadarên tirk, vê yekê dibînin. Êdî ew jî dibînin ku ti pêşaroja wan bi kurdan re nemaya. BI politikayên ku li dijî kurdan meşandin re êdî wê têkiliyên wan û kurdan ne weke berê bê. Lê bi vê re, ez vê jî bibêjin ku çendî ku kurd dîroka xwe binivîsênin û bixwênin, wê hêtê di nava kurdan û tirkan de ê weke ´hêtê çînê´ wê hê stûrtir bê. Sedema wê jî, ew a ku hertimî rejima tirk bûya rejima şer li dijî kurdan.

Ne tenê rejima tirk bûya rejimek şer li dijî kurdan. Ji wê zêdetirî, em ku weke dîroka wê rejima tirk bihasibênin û werênina ser ziman, dîroka osmaniyan jî bûya dîrokek şer ya bi kurdan re. Ji sedsale 16´min û pêde, yanî ji dema ´şerê çardiranê´ û pê de, şerê osmanîyan bi kurdan re bi dawî nebûya. Hertimî, şer bûya. Dîroka osmanîyan ya ji sedsala 15´mn û pê de, ji aliyê kurdan ve ku mirov lê binerê jî, dîroka şerê bi kurdan re jî ya. Ev kevneşopîya osmanîyan ya şerê wan ê bi kurdan re di piştî avakirina komarê de jî domîya. Yanî, bi şerê bi kurdan re, Osmanîyan 500 salî bi kurdan re şer kir. Piştre jî, di dewama wê de komare tirk ku li ser temenê osmaniyan avabûya jî, dîroka wê weke dîroka şerê bi kurdan re û bi kurdan di hemû dîroka xwe de şer kir. Ev dîrok ku were ditin li berçav, wê êdî rastîya şerê roja me a rejima tirk jî baştir were ditin û fahm kirin. Bi gotinaka din ku em dîroka osmaniyan û komarê bi ser hevdû ve bikin, em dikarin bibêjin ku ev 500 salên dawiyê ê dîroka osmaniyan û komarê, bênavber bûya dîroka şerekî bi kurdan re.

Em dema ku van rastîyan li berçav bigrin, em dibînin ku êdî di her rewşê de rêya kurd û tirkan weke ku ji hevdû cuda bûya. Hewldanên rêberê gelê kurd, ku di temenê "biratîya gelan" de, hevpeymanîyekê di nava kurd û tirkan de ji vê demê û pê de pêş bixin jî, heta vê demê bi serneketin.

Li herêmê, êdî kurd gihiştina têgihiştina xwe. Bi bûna şoreşa rojava re, ew pêşketina ku di hundurê 10 salan de di mejiyê xwe de bikiran, di hundurê heyvekê de dan çê kirin. Berxwedana KObanê, kurdan bi meji, têgihiştin û bîrewerîya wan re 10 salan bi pêş de bir. Em vê yekê jî, divê ku weke aliyekî giring werênina ser ziman. Kurd, li ser vê pêşketinê li herêmê statûya xwe pêş dixin. Rejima tirk, rayadarên wê heta roja me xwe

li ser pişta kurdan didan jîyan kirin û bi kurdan û alikarîya wan, heta sale 2014´an de jî, desthilatdarîya domandin û hanîn, wê êdî ew rewş weke berê xwe nedê domandin. Rayadarên ewropî jî vê yekê dibînin. Ji ber vê yekê, êdî ji tirkiya û rejima wê hêvîya xwe dibirrin. Rejimeka ku alîkarîya kurdan ji wê re tûnabê, wê nikaribê êdî bi serdest li anatolîa û tirkiya jî, serdestî û serwerîya xwe bide domandin. Ev rewş, weke aliyekî din ê teybeta ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Tirkiya, li rojhilat, heta roja me jî, li ser wûcana kurdan a stretejikî a li rojhilat sîyeset kiriya di bin navê tirkiya de. LI herêmê weke "welatekî giring" hanîna ser ziman ya hebûna wê jî, divê ku mirov wê bi rewşa kurdan ve girêdayî werênina ser ziman.

Di serî de, divê ku mirov van aliyan weke aliyna teybet werêne ser ziman. Rejima tirk, xwe kirîya rewşek wusa de ku çendî ku weke rejimek dîktetor xwe birêxistin dike û diçê bi ser kurdan de winda dike. Vajî wê jî, ji ber ku bi zihhniyeta xwe ew 90 salê ji destpêka komarê ve vala derbas kir û bi demokratikbûnê re ne buhurand, êdî dema ku di temenê demokratikbûnê de gavê biavêje jî, wê were wê astê ku ji hevdû bifelişihê. Yanî, bi vî rengî, ew 90 salê ku weke dîroka komarê, bûya temenê ji dest windakirina pêşaroja rejima tirk li anatolîa bixwe jî.

Li rojhilat, ku em ji kîjan aliyê ve li rewwş binerin, dewra kurdan destpê dike. Emerika bo vê yekê, ji nûha de bo vê yekê dixwezê ku têkiliya xwe bi kurdan re di wê temenê de dêne. Hinekî jî, bi berxwedana kobanê re guharînên sîyesî û hewldanên li başûrê kurdistanê hwd, avakirina hin navendên leşkerî û sîyesî hwd, divê ku mirov bi vir ve girêdayî fahm bike. Serdestîya li anatolîa jî, wê weke ku çawa di serdemên berî zayina Îsa de hebû û heta serdema Bizansîyan jî, wê ji nû ve bo pêşketina ewropa û pêşaroja wê were dîzaynkirin. Wê, êdî ne tenê tirkiya li anatolîa serdest bê. Ev jî, wê di pêşaroja herêmê de guharînên dîrokî bixwe re bêne. Dîroka herêmê, di vê temenê de wê ji nû ve were pêşxistin. Li şûna ku herêma anatolîa were xistin, weke qadaka pêşketina cîvatî, felsefîkî, dîrokî hwd, ji aliyê tirkiya ve hatîya xistin weke navendek ku li wê rêxistinên kujar û hwd ên weke DAÎŞ´ê li wê tên pêşxistin. Ev jî, aliyekî din a ku divê ku mirov bi teybetî li serr bisekinê ya. Di dema osmanîyan de jî, wê osmanîyan nikarîbû ku li anatolîa xwe bigirta ku alikarîya kurdan ji wê re tûnaba. Bi wê re jî, divê ku mirov bibêje ku di salên dawiyê de, du tişt bûna temenê têkçûna osmanîyan. Yek, kêmbûna piştgirîya kurdan ji wê re ya. Û ya din jî, ew a ku nekarîya weke berê olê bikarbêne ya. JI ber ku temenê osmanîyan li herêmê bi civatî nebû. Ev herdû ling bûn, ku osmanîyan li herêmê li ser lingan xist.

Di dema Komarê de, tevî hemû pirsgirêka jî, kurdan alikarî da. Lê piştî ku komar ava bû, êdî rayadarên tirk, li ser esas û temenê dijminatîya kurdan, ew bi rêxistin kirin. Ew komara ku dihat gotin ku wê kurd û tirk bi hevdû re weke du milletan bijîn jî, piştre wusa nebû. JI ber ku wusa nebû, êdî dîroka wê komarê, bû dîrokek şer yê bikurdan re. Heta roja me jî, li ser wê temenê şer dikin. Êdî li rojhilat, weke berê bi artişên mazin wê serdestî nebê. BI zanebûnê wê hebe. Kî zanîna wî zêdetir bê, wê ew li pêş bê. Li vir, ku em ji kîjan aliyê ve jî lê binerin, di hundurê demek dirêj de, wê dewra van rejimên ku bi zihniyeta dîktator û tîranan xwe birêxistinkirina jî wê êdî li jîyanê nemêne. Bi navê gelan, demokratikîtî û hwd re, wê pêşaroj were. Şoreşa rojava, bikurdan re li herêmê di vê temenê de weke hêzekê derdikeve li holê. Kurd, wê ji vê demê û pê de, bi pêş de herin. Çend ku dem bi dem herina bi ser wan de û heta ku di demna de komkujiyan jî werênina serê wan, wê kurd bi pêş de herin. Di vê temenê de, em dikarin bibêjin ku

pêşaroj ya kurdan a.

Rejima tirk ku hebûna xwe li ser esasê tûna hasibandin û ´înkara kurdan´ avakirîya, êdî bi mecburî jî bê, wê dade xwe û ankû ´hûqûqa xwe´ ji nû ve biafirêne. Lê di vê temenê de, wê êdî kurd li ser pêşaroja xwe xwediyê gotinê bin. Rejimeka tirk ku weke ku kurd wê bi nav dikin ku "baxtê rûmê nîn a" jî, wê pêşaroja wê bi vê rengê wê yê roja me û zihniyeta wê re b kurdan re tûnebê. Ya ku di serî de li vir divê ku mirov kifş bike û werêne ser ziman jî ev bixwe ya. Sîyeseta li ser esasê metingerîyê û bindestkirinê û kirina bin kontrolê de, wê êdî ti ancamê bi xwe re li herêmê newênin. Ev rengê sîyesetê, wê tenê şer, pevçûn û komkujiyan bi xwe re bêne. Ne kurd û ne jî ti xalkên din ên herêmê jî, wê êdî sîyeseteka bi vî rengî ya komkujiyan bi rejima wê ya ku ew dike re herê nekin û ji wê re nebêjin herê. Hin rayadarên tirk, di vê pêvajoya çareserîyê ku birêz Ocalan daye destpêkirin de, mantiqê xwe li ser wê esasê çêkirina ku tevgera kurd bêçek bikin û êdî wê bêstatûtiyê pêşbixin jî, hewldanaka beykode ya. Ku tevgera azadiya kurd PKK´ê î ro denezêne ku dev ji tekoşînê berdaya û çekê berdide jî, wê dîsa rejima tirk nikaribê weke ku ew hizir dike bi kurdan re bimeşê. Ji ber ku wê kurd herê nekin. JI ber ku kurd êdî gihiştina wê têgihiştinê ku bi Azad û mafên xwe re bijîn. Zihniyeta rejima tirk a ku hemû çareserîyê, di çekberdana kurdan de dîtibû, bi ti awayê temenê wê li jîyanê tûna ya.

Kurd, wê êdî bi Azad bijîn. Kurd, weke civatekê bi nirx û kevneşopîyên xwe bijîn. Û kurd, wê pergale xwe ya perwerdeyê ava bikin û wê bi zimanê xwe perwerdeya xwe bibînin. Her wusa, wê li herêmên xwe êdî xwe bi rêve bibin. Ev êdî ku nebê nabê ya. Li kurdistanê, wê kurd, pergale xwe ya civatî ava bikin. Ava dikin jî. Rêveberîya kurdistanî a li rojavayê kurdistanê jî, nîşanaka wê ya. Rejima tirk, rûyê xwe yê rast bi nêzîkatîya xwe ya li rojava re dan nîşandin. Li kurdistanê, êdî kurd ne kurdên berê na. Ew rejimên ku li ser tûna hasibandina wan sîyeset dikirin, êdî wê nikaribin bijîn. Faşîştên weke T. Ardogan, ku dibêje "birayê min ê kurd" û piştre hêrîşî kurdan dike û bi vî rengî sîyeseta dirû û xapandinê dimeşênin, wê ew jî êdî nikaribin bijîn. Dewra mirovên bi vî rengî zihniyeta wan jî hatîya girtin. Êdî, ew navê wan li muzaxaneya dîrokê ya. Li rojhilat, êdî rengekî din ê sîyesetê pêş dikeve. Şoreşa rojava, rengê wê sîyesetê bi hebûna xwe re raxistîya li berçav. Ev sîyeset jî bi rengê xwe re, rêz û hûrmetê dide hebûna gelan û statûya wan, maf û azadîya wan diparêzê û xwe disipêrê wan û pêşketina wan. Ya ku temenê pêşaroja wê jî ya ev a.

**.. Di dewama berxwedana kobanê de divê ku mirov bahse levkirina li Dohukê û çûyîna Pêşmergeyan a li kobanê bike.** Çûyina pêşmergeyan li Kobanê, divê ku mirov weke gavek giring werêne ser ziman û şîrove bike. Heta ku mirov dikarê weke gavek dîrokî şîrove bike. Çûyîna pêşmergeyan li Kobanê, di temenê wê de biqasî wê levkirina kurdan a li Dohukê, ew gîyane berxwedanî a kobanê heya. Ew gîyane kobanê, bû navê û temenê yekîtîyek civatî bo civate kurd. Ji bakûrê kurdistanê buhurîna pêşmergeyan, weke ´koma aşîtîyê´ ya ku ji Xaborê buhurî bi milyonan kurd ew pêşwazî kir, gîyanek, çoşek û xweşîyek bi kurdan re çêkir. Bêgûman, li vir, ne hijmar lê çûyîn giring a. Dibêt ku bê gotin ku "bi 150 pêşmergeyî wê çi bikin. Li kobanê bi ser 20 hezarî re şervanên kurd ên YPG´yî hena." Ev rast a. li vir, aliyekî sembolîkî ê vê çûyînê heya.

Ku ev çûyîna pêşmergeyan ji aliyê rayadarên ên başûrî û partîyên kurd ve rast were xwandin, wê ancamaka giring bê di temenê pêşxistinek yekîtîya civatî û sîyesî ya kurdistanî. Lê ku vê çûyîna pêşmergeyan bikina xizmeta rejimên herêmê ên weke

rejima tirk de û bi wê bixwezin ku bandûra kurdistanîyên başûr bişêkênin û hwd, wê hingî, derbeyekê jî li kurdan bixe ev çûyîn. Bo vê yekê, di vê demê de, divê ku ev bûyarên dîrokî ku di vê demê de û di nava civate kurd de rû didin rast û baş bi sîyesî û civatî werina xwandin.

Li kurdistanê, êdî dem hem yekîtîyê û hem jî çareserkirina pirsgirêka kurd dixwezê. Bi berxwedana kobanê re dengê kurdistanî û civate kurd bi rengê wê re di qada navnetewî de jî deng veda. Yekê mijdarê, weke roja cihanê a kobanê hat denezendin û bi wê minasebetê bo piştgirîya bi kurdan re herkesek di wê rojê de li qada ya. Ev jî, bi serê xwe rewşê didê nîşandin ku çendî dîrokî ya. Rewşa kurdan, êdî gihiştîya astaka ku êdî çareserkirina pirsgirêka kurd nebê nabê ya.

Hemû hasabên rejimên herêmê ên weke rejima tirk li ser şikandina kurdan bi destê DAÎŞ´ê hatina vala derxistin. Berxwedanên ku bi serhildanî li hemû beşên kurdistanê bûn, hêza civatî ya civate kurd raxist li berçav. Ya ku di temenê hêrîşên wan de jî ev bixwe ya. Rejima tirk, ev pêvajoya çareserîyê jî haba kir. Êdî kurd, di pêvejoyaka nû de na. Kurd û çareserîya pirsgirêka kurd jî, di ast û mecreyeka nû de ya.

Çûyîna pêşmergeyan li kobanê, divê ku di çerçoveya rastîya civatî û yekîtîya wê ya civatî û sîyesî de were bikarhanîn. Bi wê re, ev çûyîn weke pêpeloka pêşî were ditin û li ser wê re pêpelokên din werina zêdekirin ku bo yekîtîya kurdan ya civatî û sîyesî were pêşxistin. Di vê temenê de, dvê ku li mijarê were nerîn. Rejima tirk û hin rayadarên wê, wê bixwezin ku vê çûyîna pêşmergeyan a li kobanê bi hewldana şandina çend mirovên ji "artişa Azad" re şîlo bikin. Di serî de, divê ku derfet ji vê re newê hiştin. Ji xwe, bo ku rengê kobanê ê kurdî were tûna kirin ew hêrîş lê bûn. bo ku rêveberîya wê ya kurdî û statûya wê were ji holê rakirin ew hêrîş lê bûn. Bi vê armancê, bo ku berxwedana kobanê jî, ne bi rengê kurdan were ser ziman, dixwezin ku çend komikên ji artişa Azad ku di bin kontrola artişa tirk de kar dikin û dimeşîn bişênina wir û rewşê jî bi rengê wan bidina nîşandin. Di vê temenê de rejima tirk, dixwezê ku şandina pêşmergeyan jî, di rengê komên artişa Azad ku li dijî kurdan bikarbêne.

Ji deriyê Xaborê buhurîna koma ´aşîtîyê´ çi ancam û wate wê hebû, buhurîna pêşmergeyan ji wî deriyî û buhurîna wan li kobanê bo afirandina temenê yekîtîya kurdan dihê heman wateyê. Di vê temenê de divê ku li çûyîna pêşmergeyan bê nerîn. Lê ku rayadarên başûrî, di xizmete rojev û politikayên tirkiya de û her wusa di çerçoveya hin armancên hegomonîkî de li mijarê binerê, wê bi tememî, ev çûyîna pêşmergeyan li kobanê li şûna ku bibe temenê yekîtîya kurdan wê bibe temenê tarûmarkirina temenê yekîtîya sîyesî û civatî a civate kurd. Bo vê yekê, ev çûyina pêşmergeyan, divê ku rast were xwandin û politikaya wê were kirin.

Di vê çerçoveyê de bi hevdû re tevgerîna hemû rêxistinên kurd jî, rast û di cih de ya. Bi hevdû re pêvajoya çareserîya pirsgirêka kurd bibina sêrî. Li vir, dema ku bahse ´pêvajoya çareserkirina pirsgirêka kurd´ dikim, ez bahse wê pêvajoya li bakûrê kurdistanê ku kurdan dabû bû destpêkirin û rejima tirk, di wê de ti gav ne avêtîya qast nakim. Ji wê zêdetirî, serdem û pêvajoya roja me, di vê çerçoveyê de rewşek li rojhilat bigiştî bi xwe re hanîya. Tirkiya, tenê aliyek ji wê ya. Dema ku kurd li hemû beşên kurdistanê yek bin û di nava yekîtîyekê de bi hevdû re tevbigerihin, wê karibin, di her rewşê de xwe biser bixin û çareserîya pirsgirêka kurd bidina çêkirin. Kurd, dema ku biserkevin, wê ew hemû biserkevin. Lê ku têkherin, wê ew hemû jî têk herin.

Li kurdistanê, piştî berxwedana kobanê, ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, pêvejoyak nû destpêkir. Di nava civate kurd de jî, heya wan ji hevdû bû û hemû beşên civatî, sîyarbûnek civatî bi wan re çêbû. Bi wê şîyarbûnê, li kobanê xwedî derketin.. Bi wê şîyarbûnê bo kobanê serhildan kirin. Serhildan, hêza civatî ya civate kurd li herêmê giştî raxist berçav. Bi wê re jî, ev yek, ji aliyê hemû cihanê ve hat ditin. Ji xwe ya kir ku cihan li ber wê bêdeng êdî nemêne jî ev bû.

Ev rewş hemû, bi çûyina pêşmegeyan li kobanê bê û her wusa bi berxwedana kobanê bê, êdî serdemek nû destpêkirîya. Kurd jî, divê ku êdî yekîtîya kurdistanî çê bikin. Î ro, bi kobanê û berxwedana kobanê ku çavê hemû cihanê li ser kurdan a ku kurd jî bi çêkirina yekîtyekê di nava xwe de çêkirin û bi yekbûnekê bersivê nedina pêvajoyê. Divê ku xabatên ku berî vê demekê bo li darxistina kongira netewî hatibûbûna destpêkirin û piştre hatibûbûna taloqkirin li demek ne dîyar, ji nû ve werina dayîn destpêkirin û kongira netewî a kurd were li darxistin. Î ro, temenê wê heya. Lê kurd jî, divê ku destê xwe zû bigrin û tavîlî divê ku kongira netewî li dar bixin.

Çûyina pêşmergeyan li kobanê, weke hatina koma aşîtîyê ku li xwesteka rêberê gelê kurd birêz Ocalan ji xaborê hatibû û bi girseyî lê xwedî derketina kurdan re ku deng veda bû ya. Her bûyar, di dema xwe ya dîrokî de li gorî xosletên dema xwe pêk tê. Ya î ro jî, li gorî xosletên xwe pêk hatîya.

..

**DAÎŞ, li ber berxwedana kobanê têkçû, plana şikandina vîna kurd a rejima tirk biserneket, êdî ji û pê de wê çi bibe?**

´Roja kobanê´ û ankû ´roja 1´ê mijdarê li cihanê roja kobanê´, ji gelek xalkan bo kobanê dirişma " kobanê biparêzê" hat avêtin. her wusa, kurdistanî jî, li her deverê li qadan bûn. Di vê rojê de cihanê bo kobanê bertek nîşanda. Ji gelek aliyan ve jî mirov divê ku werêne ser ziman wê li ser vê roja kobanê were sekin in. Ji aliyekî din ve jî, ev care pêşî ya ku bo kurdan û bi teybetî bo bajarekî kurdistanî bi vî rengî cihanê deng da. Ev rewş, weke rewşeka dîrokî jî ya. Ji aliyekî din ve jî, ev rewş bo kurdan jî weke rewşe ´guharîna qaderê´ jî hat şîrove kirin. Kurdên ku heta roja me, li hemberî hemû komkujiyên ku hatina serê wan cihanê bêdeng bûya, di kobanê de weke ku ew bêdengî xira kir. Her wusa, ev jî, ji vê aliyê ve yanî ji aliyê mirovî ve jî giringa ku mirov divê ku li ser wê bisekinê. Ev weke aliyekî din ê giring ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê ya. Bo kurdan jî, ´roja kobanê´ bû weke rojek newrozî. Ji xwe roja newrozê ku kurd bi destana kawa heta roja me pîroz dikin jî, di temen û têgihiştina wê de gîyanek berxwedanî heya. Serkevtinek dîrokî ya kurdan bi wê re dihê ser ziman. Kurd, wê bi awayekî vegotinî ê mîtolojikî di nava xwe de weke destpêke azadî, serxwebûnî û bidest xistina mafên xwe jî şîrove dikin. ..

Î ro jî, li Kobanê berxwedanek ku biteybetîyên wê berxwedana kawa dihê meşandin. Dahaqê roja me T. Ardogan jî, li dijî kurdan û maf û azadîya wan, her ku devê xwe diveke ji devê wî xazab û neyerî û rika xwe li dijî kurdan dihêne ser ziman. Her wusa, di vê temenê de dijiminatîyek mazin û dîrokî li kurdan dike. Bi vê dijminatîyê nêzîkatiyî pêvajoyê jî dibin. Xwestibûn ku bi DAÎŞ´ê re derbeyekê li kurdan bixin. Piştî ku kurdan berxwedan pêşxist û derfet ji wê re ne hiştin û biserketin, êdî ji aliyekî din ve jî rayadarên tirk jî bidest neyarî û kirina dijiminatiyê kirin. Di vê temenê de bidest kirina zirtan li kurdan kirin. Heta roja me jî, di vê temenê de dimeşîn. Her wusa, ev pergale komarê ku ev 90 sal a ku li ser esasê înkare kurdan avakirina, êdî ji ber ku nikarin

bimeşênin, êdî bi awayekî vekirî neyarî û dijimatîyê li kurdan dikin. Kurdan, weke ku çawa ku di demên Osmanîyan de ji politikayên wê di temenê neyarî û dijminatîya kurdan de re ne gotina herê, di dema komarê de jî ji wan politikayên wê ên li ser esasê înkara kurd û ji hevdû felişandina civate re jî ne gotina herê. Kurd, di bin pêvajoyên bi vî rengî heta roja me hatina. Bi tirkitiyek ku ji gelek netewan di nava wan de halandin hatina kirin re çûna bi ser kurdan de. Kurd, î ro, tevî vanqas hêrîşan jî karîna ku hebûna xwe biparêzên.

Piştî di newroza 2013´an birêz Ocalan pêvajoya çareserîyê dane destpêkirin û pê de, rayadarên tirk jî, li bakûrê kurdistanê bidest çêkirina karakol û bendavên bi armanca leşkerî kir. Herêma bakûrê kurdistanê, weke ku ji cardin weke dagirkirin bi leşkerî rewşek afirandin. Piştre jî, bi planên weke bi derxistina li holê a DAÎŞ´ê re planek amede kirin ku bi wê derbeyekê bigştî li civate kurd bixin. Wê bi DAÎŞ´ê derbeya sedsalê li civate kurd biheta xistin. DAÎŞ´ê weke plana rejimên herêmê a ku wê ev bikira bû. Bo vê yekê, DAÎŞ, weke rêxistineka ku di temenê wê de koalîsyonek heya ya. Hemû rejimên ku Kurdistan di nava wan de hatîya parvekirin û hêzên politikayê li ser pirsgirêka kurd û kurdan dimeşênin, li pişt DAÎŞ´ê destê wan heya. Em vê yekê divê ku bi teybetî werênina ser ziman. Di vê temenê de, divê ku mirov vê yekê bibêjin ku dema ku rejimên herêmê dixwestin ku derbeyekê li tevgera kurd azadiyêê bixwe û bi wê re ji çareserkirina pirsgirêka kurd xilas bibe jî, divê ku mirov tenê bi tevgera kurd a azadiyê şîrove neke. Li vir, dema ku bê gotin ku "wê tevgera kurd bisekişênin û piştre wê ji pirsgirêka kurd xilas bibin" jî, ev tenê derew û xapandinaka. Her mirovê ku piçekî aqil di serê wan de hebe, wê bibînin û fahm bikin ku heta ku derbeyek li civate kurd newê xistin, wê derbe li tevgera kurd a azadiyê newê xistin. Ev rastî, dema ku were ditin û fahm kirin, wê hingî, bêdîtin ku dema ku bahse li tevgera kurd azadiyê xistina derbeyê, li civate kurd xistina derbeyê ya. Ev yek, weke rastîyekê ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê û rastiyê biawayekî vekirî werênina er ziman ku di temenê hebûna tevgera kurd a azadiyê de hebûna civatî a civate kurd heya. Ev rastî, ji aliyê rejimên herêmê ên weke rejima tirk ku heta roja me bi kurdan re şer dikin jî dihê zanîn. Em pêvajoya salên 1990´î werênina berçavên xwe. Di van salan de, şerê rejima tirk ê bi tevgera azadiya kurd re ku derketibû asta herî bilind bû. Hingî, bi deh hezaran kurd hatina girtin û avêtina zindanan. Bi deh hezaran kurd hatina qatil kirin. Ser 4 hezaran re gundên kurdan hatina valakirin. Heta roja me jî, ew gundên ku hatina valakirin, ji jîyanê re hatina girtin. Di wê demê de bi zihniyeta "´bahrê biçikêna û masî bigra" bû. Di vê temenê de ser 10 miilyonan re kurd hatina goberkirin ji bakûrê kurdistanê. Ev qatilkirin, girtin û goçberkirin, biarmanca ku derbeyekê li tevgera kurd a azadiyê bixin hatina kirin. Lê ev biserneketin. Tevgera kurd a azadiyê li giştîya kurdistanê bihêz bû. Li başûrê kurdistanê, li rojavayê kurdistanê, li rojhilatê kurdistanê û li bakûrê kurdistanê bihêz bû. Temenê tirkiya nebû ku herê van beşên din ên kurdistanê û şerekî bigiştî bi civate kurd de bide. Bo vê yekê, rêxistina ku karibê li van her çar beşên kurdistanê bi kurdan re şer bike û bi civate kurd re şer bike, DAÎŞ pêşxistin. DAÎŞ, weke rêxistineka ku bi giştîya civate kurd re ku bikina şer de ya. Yanî, DAÎŞ, rêxistina van rejiman ku karibê li hemû beşên kurdistanê bi kurdan re şer bike ya.

Ev politikaya rejimên herêmê a li ser DAÎŞ´ê re ku li dijî civate kurd, divê ku mirov di vê temenê de fahm bike. Ji aliyê rejimên herêmê ên ku civate kurd û Kurdistan di

nava wan de hatî qatkirin, hatîya ditin ku tenê li beşekê derbe li kurdan were xistin jî, wê kurdan neşikêne. Bo vê yekê, planaka giştî hat amade kirin ku li hemû beşên kurdistanê ku karibê derbeyekê li civate kurd bixe û bi wê derbeya ku li civate kurd hatî xistin re êdî derbe li tevgera kurd a azadiyê were xistin. Plan û mantiqê planê ev a. Yanî, derketina kurdan a li dika dîrokê, ji xwe re kirina armanc. Di vê temenê de ku bi tememî temenê statûya kurdan were ji holê rakirin. Ev rewş hemû jî, bi hevdû ve girêdayî na. Li vir, dema ku em van rewşan bi hevdû re bi derketina li dika dîrokê a civate kurd bi tekoşîna azadiyê re fahm nekin, emê derxistina DAÎŞ´ li holê jî baş fahm nekin. Bi teybetî, hemû beşên kurdistanê ên weke başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurdî û kurdistanî di temenê pêşketina statûya kurd de hene, kirina armanca hêrîşên DAÎŞ´ê. Pêşî ev herêm hatin xwestin ku werina bi derbekirin. Hat xwestin ku pêşî, li van rêveberîyên kurd, derbe were xistin. Bo vê yekê, planaka giştî hatbû amede kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê li vir werêne ser ziman. Di rojên ku DAÎŞ li musilê bicih kirina DAÎŞ´ê re di cih de Îsraîlê jî şerekî giştî li dijî Filîstînê da destpêkirin. Bi hezaran mirov di wê hêrîşa îsraîlê a li ser Filistinê de hatina kuştin birîndar kirin. Di çapameniya cihanê de jî, wan hêrîşan pirr zêde cih girt. Di wan rojên ku DAÎŞ li musilê DAÎŞ bicih kirin de hêrîşkirina Îsraîlê li ser filistinê, di serê her mirovî de bû temenê pirs pirsînan. Herkesekî, digot ku acaba ji ber çi ev hat kirin. Bi pirsîna pirsan re, bersivan wan pirsan, hê jî ne hatîya dayîn. Lê em vê yekê bi awayekî vekirî jî li vir bibêjin ku hêrîşên Îsraîlê ên li ser filistinê di rojeve cihanê de cih girt. Gelek dordor ketina dewrê de. Lê gelek mirovên ku li dijî Îsraîlê bi wan hêrîşan re ku bi hêrs dibûn û dixwestin ku herin bi Îsraîlê re şer bikin jî, berê wan hat dayîn li nava DAÎŞ´ê. Ev yek, piştî dema ku hêrîşên Îsraîlê ên li ser filistînê sekin de hat ditin. Piştre ji vê rewşê êdî gelek mirovan hizrên xwe hanîna ser ziman ku "ev oparasyona îsraîlê a li ser Filistînê di rojên ku DAÎŞ li Musilê bicihkirina de, oparasyonaka ku bi wê dixwestin ku DAÎŞ´ê mazin bikin a." Piştre dîyarde û birhanên ku dihatina kifşkirin, ev hizir piştrast dikir. Di mejiyan de, ev rewş êdî bi hevdû re têkiliya wan bi vî rengî hatibûbû danîn. Ew oparasyona ku rayadarên Îsraîlî digotin "oparasyon bi armanca li Hamasê derbe xistina", bû weke oparasyonaka ku DAÎŞ bi wê hatibû mazin kirin. BI hezaran ciwanên ku bi wê hêrsa li Îsraîlê ku hatibûbûna xapandin, hatibûbûna şandin li nava DAÎŞ´ê. Di vê temenê de, divê ku mirov vê yekê biawayekî bibêje ku ew oparasyona Îsraîlê a li ser filistinê di rojên ku DAÎŞ li Musilê bicihkirina de, weke ku gelek dordorên ku pêvajo dişopandin û digotin ku "ev oparasyona Îsraîlê, oparasyona mazinkirina DAÎŞ´ê ya", ancamên dîrokî ji wê oparasyonê derketina li holê.

Di ancama wê oparasyona Îsraîlê a li ser Filistinê de, bi hezaran ciwanên Arab û ji milletên din ên misilman, hatina şandin li nava DAÎŞ´ê ku wê şerê DAÎŞ´ê bide meşandin. Dibêt ku ew ciwan, gelek ji wan ne difarqê de bûn. Gelek ji wan, dibêt ku dema ku dihatina hanîn şandin, hizir dikirin ku wê herin û li dîjî Îsraîlê şer bikin. Lê ew dihatin şandin li nava DAÎŞ´ê. DAÎŞ jî, piştre bi kurdan re didane şer kirin. DAÎŞ´ê tenê li herêmê hêrîşî kurdan kirîya. Bi hezaran ciwanên kurd hatina qatil kirin. Ev rewş, weke rewşeka teybet a ku divê ku mirov wê kifş bike ya. Li vir, dema ku em wê pêvajoya mazinkirina DAÎŞ´ê şîrove bikin, divê ku van bûyarên demî ên ku bi wan DAÎŞ hat mazin kirin, divê ku mirov bi awayekî kûr li ser wan bisekinê. Piştî çend rojên ku artişa Îraqê çekên xwe li şûn xwe dihêle û ji Musilê vedikişênin û ev oparasyona

Îsraîlê a li ser filistinê, mirov çiqasî dikarê weke rasthatinekê werêne ser ziman. Mirov, nikarê vê weke rasthatinaka demî şîrove bike û werêne ser ziman. Ji wê zêdetirî, li vir, planaka heya. Di temenê vê planê de çi heya, divê ku mirov wê biawayekî kûr lê bihizirê. Bêgûman, ev rewşa oparasyona Îsraîlê bi stretejîya li di temenê wê de, wê di demên piştre zêdetir li ser wê were sekin in.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê bi awayekî vekirî li ser bisekinê, Ev pirsgirêka Filistin û Îsraîlê, heta vê rojê domandina wê jî, divê ku mirov lê bipirsê. Ev bi dehan sala ya ku ne hatîya çareser kirin. Bêgûman ku nîyetek cidî ya bi armanca çareserkirina pirsgirêka filistin û îsraîlê ku heba, wê heta roja me deh caran biheta çareser kirin. Ev jî, aliyekî din ku mirov dikarê kûr li ser bisekinê ya. Domandina wê pirsgirêkê, bi van pirsgirêkên li rojhilat ên weke pirsgirêka kurd ve gîrêdayî divê ku mirov lê bihizirê. Sîyeset û rêveberîya meşandina tengezerî(krîz)yê li vir divê ku mirov lê bihizirê. Weke ku rêveberîyek ku bi mejiyê xwe timî weke rêveberîya meşandina tengezerîyan heya ya. Weke rêveberîya domandina pirsgirêkan û çêkirina koordînayê di nava pirsgirêkê de di çerçoveya sîyeseta li wê herêmê de dihê meşandin. Sîyeseta dîzaynkirina li rojhilat, hinekî jî bi vî mejiyî dihê meşandin. Ev rengê sîyesetê jî, ne mejiyê ku çareserîkirina pirsgirêkan werênê li holê û çêbike ya. Ev mejî, mejiyê ku karibê, wan pirsgirêkan bi hebûna wan re bide domandin û biparêzê ya. Yanî, di rewşek nexweşîyê de bihêle. Ne bihêle ku bimrê û ne jî bihêle ku bi tendûrîst û Azad bijî. Ev rewş, bi vê rengî dihê meşandin. Dema ku em li mejiyê di temenê oparasyona Îsraîlê a li filistinê ku di wan rojên ku DAÎŞ li musilê bicihkirina de ku hat kirin de ku hatkirin ku mirov lê dinerê, mirov di vê temenê de gihijê hin ancamna ku mirov divê ku bi teorîyeka giştî wan vê rengê sîyesetê hûrûkûr hilde li dest. ..

Ev rengê sîyesetê, divê ku mirov li ser bisekinê. Ji ber ku giring a. Di aslê xwe de, fahmkirina vê mejiyê wê derfetê bide me ku em karibin bi carekê û demê re ku li herêmek eke rojhilat ku di nava hevdû de ev pirsgirêk, çawa hebûna xwe dikarin wusa bidomênina li pêşarojê, divê ku mirov biwê re li wê bihizirê. Her wusa, ev jî, wê têgihiştinekê di derbarê pirsgirêka kurd û ne çareserkirina wê de jî bide me. Hemû hewldanên çareserkirina pirsgirêka kurd ku ji aliyê kê ve bin ku çawa û ji ber çi tên kriminalîze kirin, divê ku mirov hinekî jî, bi rengekî sîyesetê ê bi vî rengî û mejiyê wê re hilde li dest û fahm bike. Rêveberîyên herêmê, ti qûdretên wan tûna na. Ew tenê, weke hin mekanizmayên domandina wan pirsgirêkan in û hwd. Ji wê û pê de, wusa zêde mirov nikarê bahse rola wan bike. Ji xwe, ew hêz û qûdreta wan nîna ku ew hêrêma ku lê dijîn ku wan pirsgirêkên wê jî çareser bikin. Domandina pirsgirêka kurd heta roja me, domandina pirsgirêka îsraîl û filistinêê heta roja me û weke van gelek pirsgirêkên, vê rastiyê radixina li berçav. Her wusa, ew hêza wan tûna ya ku pêşîya afirîna pirsgirêkên din ên weke DAÎŞ´ê û hwd ku derkevina li holê jî bigrin. Yanî, bi gotinaka giştî mirov dikarê bibêje ku "bêvînbûn" weke mijareka ku mirov dikarê bi teybetî û giştî kifş bike ya.

Li kurdistanê, piştî ku tevgera azadîya kurd derket li holê û pêde, li şûna ku hewl bidin ku pirsgirêka kurd çareser bikin êdî hewldan ku wê ji holê ra bikin. Ku ev jî, nekarîn ku bikin, êdî rêxistineka ku weke wê bi wê re şer bike, derxistina li holê ku bi wê re şer bike. DAÎŞ, hinekî jî, di temenê mejiyekî bi vî rengî de hatîya amedekirin. Her wusa, rewşa pirsgirêkan jî, ji xwe mijareka ku bi serê xwe divê ku mirov wê hilde li dest a. Minaq, weke ku di wan demên ku DAÎŞ li musilê bicih kirin de, oparasyona Îsraîlê a

li ser filistinê û hêrsa ku li ber wê afirî di nava cihane îslamê de û bi wê hêrsê ciwanên ku hatina xapandin û hatina şandin li nava DAÎŞ´ê weke mijaraka sereka divê temenê de divê ku mirov li ser bisekinê ya. Ev neyarî û dijminatîya ku hatî afirandin, çawa ji wê sûd dihê girtin, li vir, ev weke mijarekê divê ku mirov hilde li dest û fahm bike. Di vê temenê de, sîyeseta bi karhanîna pirsgirêkan û xesasîyetên civatî ên ku li ser wan re afirîna jî, divê ku mirov di vê temenê de bike berlêpirsînê de. Dema ku em van aliyan bi hevdû re ne hilde li dest û fahm neke, mirov wê nikaribê wê bitememî hilde li dest. Li kurdistanê, dîroka civatî, di vê temenê de xwediyê gelek fêr û cerbên civatî ya. Dema ku em bahse "şerê teybet" û ankû "şerê deronî" ê li ser çapameniyê û amûrên ragihandinê re ku dihê meşandin dike jî, di van waran de bi van rengên politikayan divê ku mirov têkiliyeka wê dêne û bi wê re hewl bide ku fahm bike.

Li kurdistanê, me got ku di vê temenê de fêr û cerbeke wê ya dîrokî heya.. Ji ber ku hemû politikayên bi vî rengî ê di temenê şikandina vînê de li kurdistanê li ser civate kurd hatina ceribandin û bikarhanîn. Di vê temenê de, divê ku mirov mijarê hilde li dest û û hwd bide ku wê fahm bike. Pirsgirêk û xesasîyetên wê ên civatî, çawa dihên bikarhanîn, rejîmên herêmê û mejiyê li pişt wan, di derbarê wê de xwedî zanîn û fahm a. Her wusa, di vê temenê de rojhilat jî, weke labratûwarekê hatîya bikarhanîn. Di vê temenê de bi teorîyên deronî, civaknasî û ên felsefîkî ên "diktrînî" û hwd re, ev sîyeset tên dîzayn kirin. Bi teybetî, dema ku ev rengê şerên deronî dihên kifşkirin, nûqteyên zayîf ên mirov dihên kifşkirin û li wan dihê hêrîş kirin. Bi wê re, di aslê xwe de, di asta sîyeseta giştî de, wê çawa pirsgirêkan bi pirsgirêkan "terbîya" bikin, sîyeseta Emerika û ewropa di vê warê de hinekî jî hosta ya. Mijarên şerên teybet, divê ku mirov wan kifş bike. Di temenê şikandina vîna mirov de dihên pêşxistin. Mirovekî ku ketî bin armanca şerê deronî de, weke ku li çolekê bi av bi heyvan dijî ya. Ew mirov jî, bêavî çawa dikarê bijî jî, ew jî çendî zor a, li ber şerê deronî xwe girtin jî. wusa ya. Ev mijare teknîkên felsefeya deronîyê, ku êdî di sedsale me de bivî rengî weke temenê sîyesetê dihên bikarhanîn û biwê sîyesetê vîna mirov tê şikandin û serdestbûn li lê dihê pêşxistin, çawa ya û di çi rengê û şêwayê de ya divê ku mirov li ser wê bisekinê. Mirov, di sîyeseta rojhilat de, vê yekê bigiştî dibînê. Her wusa biteybetî jî, li dijî civate kurd û di temenê pirsgirêke kurd de, mirovekî çavdêr û nivîskar, dikarê bi hezaran metodên vê şerê deronî ku hatina bikarhanîn kifş bike.

Di dema şerê li Kobanê de jî, ev biawayekî vekirî pirr zêde hat kirin. Lîstikên li ser gotinê re, biqasî ku di ti demê de ne hatî kirin di vê demê de hat kirin. Yanî, çend ku li ardê li kobanê şerek bi kurdan re hebû, bi heman rengî şerek bi kurdan re jî hebû. Ev şerê gotinî, bi tememî armanca wê civate kurd bû. Bo vê yekê, ji vê aliyê ve jî, ev pêvajoya şerê kobanê, xwediyê fêr û dersên mazin a. Berxwedana kobanê, dîrok nivîsand û hê jî dinivîsêne. Ya ku hêvî dihat kirin ku wê DAÎŞ derbeyekê li civate kurd bixe û wê bi wê derbeyê re maban. Wê êdî çareserkirina pirsgirêka kurd ji rojevê biheta derxistin. Êdî piştre pêvajoyek din ya bib sedsalan bi êş û elem bo kurdan biheta dest pêkirin. Heta ku weke ku çawa ku bi tememî asûrî û xalkên din ên herêmê ji dîrokê hatibûn birin, wê kurd jî bi heman rengî bihetan ji dîrokê birin. Piştî wê derbeyê re, ya ku wê bûba wê ev ba. Bo vê yekê, weke ku çawa ku kawayê hesinkar bi şerê xwe digot "şerê man û nemanê" ya, bi heman rengî di vê demê de jî kurd di şerekî man û nemanê de derbas bûn. Em ku şerê li Kobanê di vê temenê de şîrove bikin û werênina ser ziman, wê rast û di cih de bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê weke rastiyekê werêne ser ziman ku cihane ku ev bi dehan salan li hemberî hemû kiryarên zalimana ku hatina hanîn li serê civate kurd bêdeng bûya, weke ku guneh derxê li ber berxwedana kobanê bêdeng nema û heta ku 1 ´ê mijdarê weke ´roja kobanê´ û ankû weke ´roja cihanê a kobanê denezend. Ev rewş, giringa ku mirov divê ku wê ji aliyê sîyesî, felsefîkîya civatî û demî û dîrokî ve hilde li dest. Di vê temenê de wê giring bê. Her wusa, wê bi fahmkirina wê re jî, mirov bigihîne têgihiştinek rast. Li vir, di serî de, êdî weke ku dihê gotin, gelo cihan jî, rêbazê diguharênê.? Heta roja me, li hemberê tekoşîna maf û azadiyê a kurdan bêdengbûn hebû. Î ro, êdî weke ku wijdan raparîn bikin, dengdayînek derket. Ev deng, di vê temenê de weke dengê wijdanê jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her kirin û bûyar, piştî ku bû malê dîrokê, êdî dewama wê çawa tê jî, weke aliyekî din ê giring ku divê ku mirov li ser wê bisekinê ya. Ya ku hinekî jî li vir ku divê ku miirov bi teybetî fahm bike jî, weke ku ev a. Di rastiyê de li vir, hewldana fahmkirina rastiyê, divê ku miirov pêşî di vê hewldan û qêrîna wijdanan de fahm bike. Kobanê û berxwedana wê ya wijdanî û mirovî ya di hundurê wê de ji vê re bû weke destpêkek. Em li vir, di serî de vê yekê, weke aliyekî giring werênina ser ziman.

Roja cihanê a kobanê, weke rojek giring divê ku mirov wê hilde li dest. Her wusa, ev newroza duyemina kurdistanê ya. Ev newroz, weke newroza duyemin a pîroz ku wê temenê gîyane civatî a kurdistanî û navê wê bê. Di vê temenê de bo kurdistanîyan hemûyan giring û biwate ya. Di vê temenê de, divê ku mirov li ser wê bisekinê û wê werêne ser ziman. Lê bi wê re jî, div ku mirov vê roja cihanê a kobanê, weke rojek giring binirxêne. Weke roja duyemîn a newrozê bo kurdistanîyan werêne ser ziman. Di destpêkê de, dema ku kawayê hesinkar tekoşîn kir û piştre şer kir, dibê ku ne dizanî ku wî wî newroz afirand. An jî, dibêt ku dizanî û di farqê de bû. Kawayên hesinkar ên roja me, di farqe vê de na. Ew vê dizanîn. Giringîya vê roja berxwedana kobanê dizanîn û li ser wê disekinin. Şîrove dikin û bi wate dikin. Hewl didin ku wê baş fahm bikin. Ji xwe, em di serdemeka zanîn û ragihandinê de dijîn. Teybetîya vê serdemê ew a ku fahmkirina. Vêca, di serdemeka weha de, fahm ne nekirin, biqasî bi zimanê civate xwe ya ku mirov ji wê ya ku nizanê ayb û fihêtîyeka dîrokî ya.

Ma di dewama vê de bi derfeta ku mirov li ´pêvajoya çareserîyê´ ne hizirê û wê neyênê ser ziman. Mijare herî giring jî ev a. Hemû taktîk û stretejiyên şer ên di vê de ku hatina pêşxistin li dijî hebûna civate kurd, di temenê wê de ev heya. Di serî de, divê ku mirov vê yekê li vir, dûbare werêne ser ziman ku pirsgirêka kurd, herkû dem têve diçê, bandûra wê zêdetirî tê hîs kirin. Civate kurd li rojhilat ser 50 milyonî re ya. Lê ev civate ser 50 milyonî re bêstatûya. Zimanê wê qadaxa ya û nikarê bi navê xwe ti tiştî bike û ti hebûnê bide nivîsandin. Di destpêka pêvajoya çareserîyê de, rayadarên tirk, dema ku bidest birêxistina DAÎŞ´ê kirin û stretejî û taktîkên xwe amede kirin û piştre ku DAÎŞ hinekî mazin kirin û ku ew li Musilê bicihkirin û piştre bi bandûra şerê Îsraîlê ê li dijî filistinê çend mirovên bi hêrs ên ku hebûn li wan gerîyan û ew berhevkirin û şandina nava DAÎŞ´ê, bi vê rengê, DAÎŞ, di demek pirr kin de, bû rêxistinek herêmî li ser wê re hêzên mazin û rejimên herêmê bi hevdû re dikin ku dîyzanekê bikin. Lê ev plan, li hêtê kurd aliqî û qalibî û ket li ardê. Piştre jî, piştî ku ket ardê li ardê xindirî û têkçû. Piştî berxwedana Kobanê hêrsa rayadarên tirk a li dijî kurdan a bi rengê neyarî û dijminanê jî, piştî vê re zêdetir hat ditin.

Ji ber çi, piştî berxwedana Kobanê ew hêrsa rayadarên tirk zêdetir derket li holê? Ji ber ku pêşî hasabek kiribûn û bawer dikirin ku wan hasabê xwe pirr baş kirina. Lê hasabê wan, ji xiyale wan û pê ve, ne ti tiştek bû. Bi wê xiyale kiribûn, wê DAÎŞ´ê li giştîya rojhilat derbeyek giştî li civate kurd bixista û piştre jî, wê êdî ji çareserkirina pirsgirêka kurd xilas bûban. Heta ku li piştî wê jî hizirî bûn. Bo wê jî, plan û programên xwe çêkiribûbûn. Bo vê yekê, êdî çûna bi ser kurdan de. Li kurdistanê giştî, piştî ku berxwedana kobanê destpêkir û pê de, ew serhildanên ku civate kurd bi gelemperî li darxist, ne tenê rejima tirk û rejimên ên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin hajand, hemû cihan hajand. Piştî wê re, êdî weke ku xwe silkênin û werênina xwe li wan hat. Weke ku ji xewek şêrîn rabin li wan hat. Ew xewa şêrîn ew bû ku wê kurd, bişikan bû. Lê ew xewn, dema ku şîyarbûn, êdî ew şîyarîya wan, li wan vegerîya xewnek bixilobat û kabûs. Ya ku piştre wan hêrs kir ev bû. Gelê kurd ê ku heta roja me, vîna wê bindest kirina, dixwestin wusa bidomênin. Kurdan ev red dikir. Wan jî, bi hemû amûr û mekanizmeyên zilmê û zordariyê dixwestin ku wê bindestiyê bi kurdan bidina herê kirin. Bo vê yekê û armancê diçûna bi ser kurdan de. Piştî ku berxwedana kobanê pêşket û li beşên kurdistanê ew berxwedan vegerîya serhildane civate kurd a giştî û pê de, li bakûrê kurdistanê rejima tirk jî ew ´oparasyonên qirkiirna sîyesî ku ev demek bû ku weke navber dabûbû wan, dîsa, bi hemû leza xwe dane destpê kirin. BI hezaran ciwanên kurd, mirovên pêşeng ên civate kurd yek bi yek dihatina kifşkirin û dihatina girtin û dişandina li zindanan. Zindan ji kurdan re ne beyenî û xarib bû. BI de hezaran kurd, di zindana de hena. Kurdan, ew zindan vegerandibûbûna kelehên berxwedanê û zanîngehên hemdem ên civatî bo civate kurd. Berhemên nivîskî ên bi zimanê kurdî ên giranbûha ji wan zindanan derdiketin. Di dewama wê de, ma hewceya ku mirov bahse pirtûkên ku rêberê gelê kurd ku li Îraliyê nivîsandina bike. ..

Civate kurd, di vê demê de di rabû serpîyan. Armanca hikimeta tirk a AKP´ê a ku bi wê dixwest ku bi DAÎŞ´ê derbeyekê li rojavayê kurdistanê û rêveberîya wê ya xweser bixe, bi serneketibû. Ya ku wê hêrs dikir ev bû. Tirkiya dixwest ku ew hersê kantonên ku kurdan li roajva weke rêveberîya xwe rêvebirinî ku avakirina werina ji holê rakirin. Ew rêveberî statûye civate kurd û kurdistanî bûn. Bo ku bi heman rengî li bakûrê kurdistanê jî, statûya civate kurd pêşnekeve dixwest ku ew rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê were ji holê rakirin. Di vê temenê de di aslê xwe de, cardin nîyeta hikimeta AKP´ a bi gotina ´pêvajoya çareserîyê" jî dihat fahm kirin ku di temenê şikandina kurdan de ya. Kurdan, ev vala derxistibû. Piştre, ya ku di destê rayadarên tirk de mabû, tenê ew pêvajo mabû. Di aslê xwe de ya ku li wê bi hêrs bûn ev bixwe bû. Ji ber ku wan dixwest ku bi şikandina kurda a bi destê DAÎŞ´ê pêvajoya çaresrîyê were ji holê rakirin. Piştî ku ditin ku bi DAÎŞ´ê ev nebû. Piştre rayadarên tirk ên weke "T. Ardogan derdikeve berçapameniyê û dibêje ku "wê tişta ku xiyal nekin were serê wan." Gelo, ji mirinê zêdetir û maztir tişta ku mirov xiyal neke heya? Na, tûna ya. Piştre, rayadarên tirk, ên weke bilent Arinc, li dûv T.. Ardogan, derdikevina berçapameniyê û dibêjin ku "em ne mihtacê pêvajoya çareserîyê na." Bi gotinaka din, wateya vê gotinê ew bû ku dawî li pêvajoyê hanîna. Lê wê çi li şûna wê bicih bikin, ew jî, weke pirsekê di serê wan de bû. Bo vê yekê, di serê xwe re diçûn wî alî û dihatin vî alî.

Berxwedana kobanê, tekoşîna azadiya kurdistanê 10 sal pêş de bir. Pêvajoya çareserîyê ku birêz Ocalan dabûbû destpêkirin, bir û kir pêvejoyek din ya nû de. Ya ku ti kesek ne li bendê bû ev bû. Bi wê re jî, di cihanê giştî de berxwedana kobanê den veda.

Hemû cihanê rastîya kurd, ku ne bi hemû aliyan jî bê, bi hinek aliyên wê re dît û naskir. Zilm û zordarîya li ser serê civate kurd dît û fahm kir. Ya ku di aslê xwe de, êdî temenê poliitkayên şer û zilmê ên rejimên herêmê ji holê rakir ev rastî bû. Hêrsa wan bi berxwedana kobanê re li vê rastiyê bû. Piştî vê rastiyê re wê çi biikiran, ew jî tenê weke pirseka bêbersiv bû. Lê tenê ya ku dikirin jî, li şûn divegerîyan û dîsa gotinên di temenê zihniyetek şerxwez de dihanîn ser ziman. Ev jî, weke aliyekî din ê ku divê ku mirov li wê bihizirê ya. Pirsa kurd û kurdistanê, li rojhilat, bi berxwedana kobanê re gihişt pêvajoyeka din. Her wusa, ew yekîtîya civate kurd, ku di dema amedekarîyên kongira netewî a kurd de, rayadarên tirk û Îranî bi zirt(tehdîd)an ku dabûbûn bi şûn ve xistin li demek ne dîyar, dîsa ketibû rojevê de. Pêvajoyeka ku ji gelek aliyan ve ku mirov dikarê wê şîrove bike û werêne ser ziman a.

Lê bi teybetî divê ku mirov ji aliyê yekîtîya kurd ve li vir çend gotinan vebêje. Ew jî, ev a ku piştî ku hêrîşên DAÎŞ´ê li kurdistanîyan û civate kurd destpêkir û pê de, êdî hêzên kurdistanî û kurd, di temenê yekîtîyekê de gihiştin hevdû û bi hevdû re civate kurd û Kurdistan parastin û bersiv dane hêrîşên DAÎŞ´ê ku tirkiya û Îran li pişt wan a. Weke ancamaka giring, ew a ku hêzên kurdistanî weke Pêşmerg, YPG´ê, HPG´ê, YPJ´ê, YBŞ û hwd bi hevdû re bûn yek. Di heman çeperan de ketin şer de xwûna ya giranbûha rijdandin bo civate kurd û parastina wê. Ev, ancamaka ku dihat xwestin ku bi kongira netewî a kurd re ku were bidest xistin bû û hatibû bidest xistin. Lê dîsa, di temenê şerkirin û birêxistiniyê de pirr kêmesî derketibûbûn. MInaq, di destpêka pêvajoya hêrîşên DAÎŞ´ê de hin rayadarên başûrî ku bi tirkiya tevdigerîyan pêşmerge ji herêmên weke şengalê vekişandibûn. Ev jî, weke birineka civate kurd ma. Her wusa, bi wê re jî, rayadarên başûrê kurdistanê, pêvajo kêm xwandin. Di demên berî hêrîşên DAÎŞ´ê de bawer dikirin ku wê karibin bi tenê başûrê kurdistanê biparêzên. Lê piştre hat ditin ku wê nikaribin. Piştre êdî li Maxmûr, kerkûk, xanaqîn, şengalê û hwd, di nava yekîtîyê de tevgerîyan. Bi heman rengî, yekîtîyek hat bi navê "hevpeymanîya dohukê" çêkirin ku li rojavayê kurdistanê tevbigerihin.

Pêvajoya ku kurd di wê de di buhurîn, kurdan di temenê pêvajoyek ´çareserîyê de lê dihizirin. Her wusa, di destpêka pêvajoyê de yanî ji sale 2013´an û pê de, şer nebûya. Rayadarên başûrî hatina bakûrê kurdistanê û tirkiya û çûna. Wusa dihat hizirkirin ku di nava civate de jî, ´rahawetek´ hatîya çê kirin. Bo vê yekê bû, ku dema ku hêrîş li kobanê destpêkirin, rayadarên tirk, digotin ku "ti têkiliya kobanê û bakûrê kurdistanê bi hevdû re tûna ya." Weke ku çawa ku bi pêvajoya çareserîyê a di nava tamiliyan û hikimeta Srî-lanka de ku rehewetek afirî û artişa Srî-lanka ji wê sûdgirt û bi alikariya çend aligirên xwe derbeyek dîrokî li tamiliyan xist.Tirkiya jî, planake bi vî rengî amede kiribûn. Ya rastî ew bû ku piştî ku berxwedana kObanî destpêkir û pê de, hêvî ne dikirin ku wê bakûrê kurdistanê wilqasî zêde mazin rabê serpîyan û serhildanê bike. Bi wê re şokek mazin a dîrokî jîyan. Piştre jî, plana wan ya li ser temenê şikandina vîna kurdan ku şikeşt û pê de, êdî bi gotinî û piretikî bidest hêrîşkirina li kurdan kirin. Ji xwe di hundurê wan serhildanên kurdan ên di 7 û 8´ê kewçêrê de ser 40 ciwanên kurd re kurd hatina qatil kirin. Bi hezaran kurd hatina birindar kirin.

Bi gotinên di temenê dawîlêhanîna pêvajoya çareserîyê re dixwestin ku li kurdan gef(´şantajê´) bikin. Dikirin jî. Di vê temenê de, gotinên T. Ardogan, Bilent arinc, Ehmed Dawutoglu û Yalcin akdogan û hwd, di vê temenê de bûn. Dixwestin ku kurd, ew çi bêjin herê bikin. Ew jî, bi zihniyeta xwe re di temenê şikandina kurdan û

înkarkirina vîna de diaxiftin. Li vir, di serî de divê ku mirov pirsgirêkê hinekî jî ji aliyê zihniyeta dewletê jî hilde li dest. Di temenê înkare kurdan de hertimî sîyeset kirina. Ji xwe ya ku wan hertimî bi kurdan re daye şerkirin û kirîyaku ew hertimî bi neyarî û dijminane herina bi ser kurdan de ev zihniyeta wan a. Î ro jî, dîsa di vegerîyan heman zihniyetê. Ya ku kurdan ji pêvajoya çareserîyê fahm dikir û ya ku rayadarên dewleta tirk fahm dikir ji hevdû cuda bûn. Ya ku fahm dikir ew bû ku pêvajo biserkeve û kurd jî bigihijina hemû maf û azadîya wan ya civatî ku ji wan hatîya standin û ku êdî ew xwe bixwe birêvebibin. BI vê rengê, ya ku kurdan fahm dikir ku bi wê pêvajoyê re bighiştiina vîn û statûya xwe. Lê ya ku rayadarên tirk fahm dikir jî, ew bû ku wê çawa kurdan bêstatû bihêlin û maf û azadîya wan radest nekin û di vê temenê de pêvajoyên asîmlasyonê bi gotinên weke "entegrasyonê" û hwd re bidina sêrî û bi dawî bikin. Bi wê re jî, dawîyê li heyîn û hebûna civate kurd werênin. Yanî bi kurtasî, ya ku rayadarên tirk dihizirin ew bû ku kurd, bêvîn û bêstatû werina histin. Kurd, mafê azadîya xwe bidest nexin û negihijina mafên xwe bixwe rêvebirinê. Ev herdû, fahmkirin ji hevdû cuda bûn.

Dema ku DAÎŞ´ê vîna kurdan ne karî ku bişikêne, êdî kurd bi vîna xwe derketina li holê. Êdî şerê bikurdan re ê rejima tirk vegerîya hêrîş li wê vînê û şikandina wê vînê.Yanî, bi gotinaka din şerê vînê êdî bi kurdan re destpê kiribû. Di vê temenê de gotinên "pêvajoyê", "pirsgirêka kurd" û hwd jî, hatibû xistin, weke gotinna ku li ser wan bazarî dihat kirin. Rayadarên tirk, hem bi rayadarên ewropî re w bazarî dikir û hem jî bi kurdan re. Yanî, bi gotinaka din, weke ku berê jî bo hikimeta AKP´ê û rayadarên wê dihat gotin, bi tememî bi mantiqê "bazirgan(´tucar´)" tevgerîyan.

Civate kurd, êdî gihiştiya astak pirr mazin û giring. BI teybetî, civate kurd, gelek pêvajoyên guharînê biser xwe re buhurandin. Ya ku ne dihat ditin ev bû. Kurd, ne ew kurdê berê ê bû. Kurdê î ro, bi keseyetîya xwe re dervî vînaka Azad ku bi mafê xwe re dijî û pê de ti tişt herê ne dikir. Wê nekiriba jî. Di vê temenê de, êdî bo şikandina vê vînê, rejima tirk, bi artişê dixwest ku wê vînê bişikêne. Berxwedana kobanê, berxwedana, vê kurdê bi têgihiştina Azad pêşketibû bû. Di temenê wê berxwedanê de ev têgihiştina kurdê Azad hebû. Î ro, ya ku wê berxwedanê kirina malê cihanê hemûî jî dîsa ev keseyetîya Azad a. Kurd, êdî bi vî rengî demeka nû bi keseyetîya xwe re dijîn. Rayadarên tirk, hêvî bi xistina kobanê ve girêdabûbûn. ku kobanê ketiba jî, wê ew vîna Azad dîsa bijîya û wê deh kobanê din biafiranda. Ya ku ne dihat fahm kirin ev rastî bû. Li kurdistanê, êdî her der kobanê bû. Her kurd, bi gîyane kobanê li serpîyan bû. Kobanê, bûbû bû navê gîyane yekîtîyê ya civatî a civate kurd. Em çend ku dibêjin ku di temenê berxwedana kobanê de ev keseyeta Azad bi vîna heya jî, lê divê ku mirov ji aliyê din ve jî li rewşê binerê û bibêje ku kobanê bixwe jî, ancamaka wê keseyetîya kurd a Azad ku bi vîna xwe derxistîya li holê ya.

.**Li vir**, divê ku mirov di çerçoveya berxwedana kobanê de mirov bibêje ku êdî ev berxwedan bûya berxwedanak navnetewî. Bi vê berxwedanê û qarakterê wê re cihan jî, weke ku bû duqat. Weke aliyê ´statûqûpêrêz´ û aliyê ´pêşverû´ derket li holê. KObanê, bi vî rengî weke ku di mejiyan de, "du qutub" jî afirand. Her wusa, Li dora berxwedana kobanê bûyîna kom û civîn, bi xweza dibû. Bi wê re jî, ew civîn, weke kombûn û civîna li hemberê zihniyeta statûqûparêz û rejimên ne demokratik jî pêş diket. Vê rewşa ´qutubî´ rewşa "qutuba li hemberî faşizmê" dihêne bîra me. Di vê demê de jî, li hemê faşîzmê qutubek ji xwe re afirîbû û piştre di bin navê "anîya hevkar a li dijî faşîzmê." Kobanê, rastîya mirovatiyê cardin bi bîra mirovan xist. Berî hertiştî wijdanê mirovan

bibîra wan xist. Ya ku mirovan bo kobanê rakir serpîyan wijdan bû. Ev bo hemû xalk û mirovên dostên kurdan wusa bû. Lê bo kurdan ji wê zêdetir, tekoşîna bi rûmet a mayîn û nemanê bû. Kobanê di vê temenê de çendî ku bo kurdan navê gîyane kurdistanî û berxwedane rûmetê bû, bi heman rengî bo hemû mirovatiyê jî navê wijdanê mirovatiyê û serdemê bû.

Li kobanê di roj 52´an de berxwedan didomê. Kurd, ji vê berxwedanê re dibêjin berxwedan rûmetê. Ev rast e. Ev berxwedana rûmetê ya. Lê ji wê zêdetirî jî bi kobanê û berxwedana wê re bûya. Bi berxwedana kobanê re malbetek kurd ku pekrewanek neçûya male wan nîn a. Ev jî, rastîya kurd û kurdistanê radixe li berçavan. Ji aliyê kurdistanîyan ve dema ku mirov werne ser ziman, divê ku mirov an aliyan bi rêz û hûrmet werêne ser ziman. Ev bi serê xwe aliyekî giring ê berxwedana kobanê radixin li berçav. Berxwedana kobanê, di roja 52´an de hemû kurdistanî û hêzên kurdistanî jî gihand hevdû. Çend ku tirkiya astengî li pêşîya wê derxistin jî, û hijmarek piçûk jî bê, çûyina pêşmergeyan kobanê bo tevlîbûnê, giring û biwate ya. Ev jî, aliyekî din ê giring a. Berê dihat gotin ku "du kurd nikarin bi hevdû re bijîn." Kobanê, ev întîba û gotinên bi armanca piçûkxistina kurdan jî vala derxist. Ne tenê, du kurd, hemû kurdistanî gihiştin hevdû. Kobanê, bi berxwedana xwe re bû, civîna sereka a yekîtîya civatî a kurdistanî. Ku mirov bi vî rengî wê bi nav bike wê rast û di cih de bê. Bi vê yekê û rengê berxwedana kobanê di qada navnetewî de jî deng veda. Di 4´ê mijdara 2014´an de ´konferansa kobanê´ li avahîya ewropa tê li darxistin. Ev jî, rastî roja berxwedana kobanê a 53´min tê. Di wê konferanse wê de giringiya kobanê û fêr û cerba wê were goftûgo kirin.

Rastîya kobanê biqasî bo kurdan giring a, bi heman rengî bo herêmê jî giring a. Ji vê aliyê ve jî, divê ku mirov bi teybetî li ser fêr û cerba kobanê rawastihê. Kobanê, weke kantonaka kurdistanî û rêveberîya xweser ku ava heya, ji xalkên herêmê re jî dibe weke modelekê. Ya ku li herêmê, bi teybetî rejimên herêmê hêrîşî wê dikin jî, di aslê xwe de ev rastî bixwe ya. Ji ber ku bikarhanîna olê û hwd, hertimî xalkên herêmê tafisandina. Di bin kontrolê de girtina. Vêca naxwezin ku ew ji dest berdin. Dixwezin ku hertimî wan gelan di bin kontrolê de bigrin. Fêra kobanê ya ku wê bide miroavayê pirr zêde ya û mazin a. Bi teybetî jî, li herêmê, wê tîpolojiya ramyarîya hogomenik bigiherêne. Ji ber vê yekê wilqasî hêrîşî wê dikin. Gelê kurd, ev 35 sale ku tekoşîna maf azadi û statûyê dide. Hê jî, wê Kurd, wê tekoşînê didin. Lê vîna civate kurd hatîya xistin bin kontrolê de û nayê xwestin ku were derxistin ji bin wê kontrolê. Wilqasî, li kobanê çûyina bi ser kurdan de, hinekî jî sedema wê ev rastî ya. Ji ber ku kurd dixwezin bi vîn û îredeya xwe bijîn û doza maf, azadî û statûya xwe dikin, rastî vanqas hêrîş û komkujiyên mazin în dîrokî tê. Dema ku mirov bahse fêra kobanê bike, ev alî pirr giring in. Her wusa, bi kobanê re gelek xalk û kêmnetewên herêmê karîna xwe ku xwe werênina ser ziman. Di vê temenê de rewşa statûya herêmê diguharê. Di aslê xwe de, li kobanê ya ku berxwedanê dike vîna gelan û rûmeta wan a û ya ku li dijî wê hêrîş dike û şer dike jî statûya herêmê ku ev bi hezaran salan hep metingerîyê dike ya. Di serdemeka ku weke serdema zanîn û ragihandinê dihê bi navkirin de êdî xalk jî bi vîna xwe dixwezin bijîn. Kobanê, bû berteka vê rastiyê. Di serî de, divê ku mirov vê rastiyê êdî rast fahm bike û werêne ser ziman.

Li Kobanê, bi berxwedana Kobanê re xalkên kurdistanî ên herêmê biserketin. Plana ku rejima tirk hizirkiribû û hasabê wê kiribû ku wê DAÎŞ derbeyekê li vîna civate kurd

bixe û wê kurd şikeştineka mazin bixwûn bû. Hasabê, wê hatibû kirin ku wê DAÎŞ´ê bi hêrîşên xwe derbeyek dîrokî ku civate kurd bixista û wê êdî li ser wê çareserîya pirsgirêka kurd jî ji rojevê derxistiba. Bi gotinaka din, wê çareerîya rejimên herêmê ên weke rejima tirk ku di temenê bêstatû hiştina kurdan de wê serdest kiriban. Nûha jî, ev plan biserneket. Li vir, êdî pirsa ku tê pirsîn ew a ku plana bi DAÎŞ´ê re ku hatibû kirin şikeşt û têkçû. DAÎŞ, li ber berxwedana kobanê têkçû, plana şikandina vîna kurd a rejima tirk biserneket, êdî ji û pê de wê çi bibe? Di vê temenê de ya ku nûha divê ku mirov êdî li vê bihizirê ev a. Kurdan, vîna xwe ya kurdistanî biserxistin. Ev jî, çareserîyek zarorî di çerçoveya pirsgirêka kurd de mecbûrî dide ditin. Çend ku rayadarên tirk, di vê pêvajoyê de, piştî ku T. Ardogan ji Gera xwe ya di 1´ê kewçêrê a 2014´an a ji Firansa vegerîya û pê de, êdî gotinên dijberî pêvajoya çaresrîyê bidest hanîna li ser ziman kirin. Di roja ku weke ´roja kobanê a cihanê´ hatî denezendin, di roja 1´ê mijdarê de çû Firansa. Ev ger, di vê rojê de kirina wê jî, weke gereka bi armanca "provaka kirina vê rojê" hat jî şîrove kirin. Di gera xwe de T.Arogan, dema ku bi Serokkomarê firansa Firancîs Hollande re derdikeve berçapamniyê û ku pirsên di derbarê kobanê de jê tên pirsîn dibêje "çîya hertimî, win dibêjin kobanê û kobanê". Bi vê gotinê T Ardogan Acizîya xwe ya hanîna ser ziman a nav kobanê û wilqasî li cihanê lê xwedi derketina li kobanê hanîbû ser ziman.

Acizîya T. Ardogan a li dijî Kobanê aciziya rejima tirk a li hemherî pêşketina statûya kurd di hundurê xwe de diparêzê. Her wusa acizîya T. Ardogan a li Kobanê Acizîya ku berê jî hanîbû ser ziman. Di bîra me hemûyan de ya ku destpêka şoreşa rojava ji Kobanê di 19´ê temûza 2012´an de destpê kiribû. Care pêşî, dema ku kurdan destdanî ser rêveberîya bajarê kobanê, T. Ardogan, dîsa derketibû berçapameniyê û gotibû "emê ji rewşek bûyî çêbûyî re nebêjin eywelleh´". Piştî vê gotinê re, êdî gav bi gav bi gav hêrîşên rayadarên tirk li ser rojava destpêkirin. Bi alikariya wan DAÎŞ´ê bi dest hêrişî kurdan kir. Piştre, dema ku berxwedana kobanê destpêkir de, dîsa T. Ardogan li dikê bû û derketibû berçapameniyê li Antebê û digot "kobanê ket, dikeve" ji çapameniyê re. Bi vî rengî hêvîya xwe ji dihanî ser ziman. Bi heman rengî, piştre her devera kju çûyê de û her care ku axiftîya, muhaqqeq gotinek di temenê neyarî û dijminatîya li kurdan hanîya ser ziman. Acizîya xwe ya ji kurdan hanîya ser ziman. Di gera xwe ya li Firansa de ev acizîya xwe ya li Kobanê hanîya ser ziman. Bi heman rengî di temenê dijberîya wî ya li kobanê de, çapameniya tirk jî, hertimî neyarî û dijminatî li kurdan kirîya. Piştî ku pêşmerga ji başûrê kurdistanê hatina Pîrsûsê û ku buhurîna li Kobanê û pê de, propagandaya dijber li dijî Pêşmergeyan jî di vê temenê de weke ku çawa ku lli dijî YPG´ê û rêxistinên din ên kurd dikirin, bidest kirinê kirin. Bo ku pêşmergeyan jî piçûk bidina nîşandin, her cûre nûçeyên ji şêwatê ahlaqê dûr dan çêkirin û weşandin. Minaqe van nûçeyên bêahlaq, ew a ku rojnemaya tirk a bi navê "taraf"´ê ku di 3´ê mijdarê de, di derbarê pêşmergeyan de dinivîsêne ku "hinek ji wan ravîn" û "hinek ji wan ne buhurîn li kobanê û li tirkiya man" û hwd. Bêgûman, ev nûçeyên di temenê neyarî û dijminatîyê de, bi têkneçûna kurdan a li kobanê ve girêdayî ya. Bi berxwedana kobanê a kobanê ve girêdayî ya.

Bi teybetî, bo ku wê hatina cem hevdû a kurdan xirabikin jî di nava hewldanê de na. Tirkiya li dijî yekîtîya kurdan a. Ji ber ku naxwezê ku kurd bibina xwediyê ti statûyê. Bi Alikariya tirkiya hêrîşên DAÎŞ´ê ên li başûrê kurdistanê jî, di serî de di nava gelê başûr de jî rûyê rast ê rejima tirk danî berçav. Bi alikarîya rejima tirk DAÎŞ´ê dema ku hêrîşî

başûrê kurdistanê kir, kurdên başûr alikarî ji rayadarên tirkiya xwestibûn. Lê ew alikarî ne girtibûn. Piştî wê re, êdî kurdan ditin û fahmkirin ku tenê dostê kurdan dîsa kurd in. Ya ku hinekî jî ew hanîna cem hevdû ev rastî bû. Ya ku Birêz Berzanî li Maxmûrê bi Gerîîlayên HGP´ê re dabû rûniştandin ev rastî bû. Ev rastî û gelek rastiyên din, êdî divê ku di temenê pêşxistina yekîtîya civate kurd de werina bikarhaîn. Kurd jî, yekîtîya nava xwe male xwe û civate xwe çê bikin. Em divê ku van gotinên ku di temenê hêrîşkarî de ku rayadarên hikimeta tirk li dijî kurdan bikardihênin û propagandaya reşkirinê ku dijî beşên civate kurd dikin û her wusa nebûna projeyeka wê ya bo pêvajoya wê ya çareserîyê divê ku mirov bi hevdû re werêne ser ziman. Ji ber ku projeyeka wê tûnaya êdî bi vî rengî hêrîş dike. Ji ber ku zihniyeta wê, ne di temenê zihniyetek çareserker de ya. Hê zihniyeta 90 sal berê ya di temenê înkare kurdan de li dijî kurdan bikar dihêne.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku piştî ne şikeştina kurdan li Kobanê û û têkçûna DAÎŞ´ê li ber kurdan, divê ku mirov bahse pêvajoya çareseriyê bike. Rejima tirk ya ku heta vê kêlîkê ti plan û projeyên wê ên çareserîyê tûna na, wê piştî vê ne şiketina kurdan re wê çi bike? Hinekî jî, di vê demê de bikarhanîna zimanê hêrîşkarî, divê ku mirov di temenê sernûxûmanadina wê nebûna ti plan û projeyên çreserîyê de jî fahm bike. Dema ku plan û projeyeka wê ya çareserîyê heba, wê zimanê xwe jî li gorî wê bikar bihanîya. Hemû hasabê rejimê li ser esasê şikandina vîna kurda bi destê DAÎŞ´ê ve girêdayî bû. Dema ku ev nebû, êdî rewşek nû derket li holê. Piştî vê ne şikeştina kurdan re, êdî bidest bikarhanîna zimanê hêrîşkarî kirin. Hinekî jî, ev ziman, ne tenê nebûna plan û projeyên wan ên bo çareserîyê bi me dide ravakirin, her wusa, çûnûhatina di nava **şewişîn**(yalpalama)ê de. Bi zimanê hêrîşkarî re hem nebûna plan û projeya bo çareserîyê de didina berçav û hem jî şewişîna xwe ya li piştî berxwwedana kobanê re dide berçav. Bi vê re, divê ku mirov vê jê bibêje ku dîsa ji ber ku plan û projeya wan ya çareserîyê tûna ya, Bilent Arinc derdikeve berçapameniyê û dibêje ku "em ne mihtacê pêvajoya çareserîyê na." Ev gotin jî, weke nîşanaka vê rastiyê ya. Rayagiştî a navnetewî li kobanê p berxwedana wê xwedî derket. Piştî vê pêvajoyê re wê êdî çawa pêvajoyek were jî giring a ku divê ku mirov bişopêne. Di vê temenê de konferanse kobanê a li avahîya parlamana ewropa di 4´ê mijdara 2014´an de jî giring a bo vê yekê ku têgihiştinê di raya giştî de bo çareserkirina pirsgirêka kurd were çêkirin. Her wusa, giringa ku pêvajoya çareserîyê jî ku bikina malê sîyeseta navnetewî. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de, asil kar û xabat divê ku ji vê demê û pê de sîyeseta kurd bo çareserkirina pirsgirêka kurd û pirsgirêkên civate kurd ku çareserîyê ji wan re bêne giring dibê. Karê sîyesetê, ji vê demê û pê de, hê bizanetir divê ku were kirin û pêşxistin. Ya ku pêvajo jî, dixwezê ev a. ..

15.11.2014/Abdusamet Yigit

…